## ROJHILATA NAVÎN

***Rêheval Rustem Cudî***

*Ev berhema bi nirx û hêja ya di destê we de di derbarê Rojhilata Navîn de ye. Ev yek ji waneyên ku Şehîd Rustem Cudî di Dibistana Navendî Ya PKK'ê dabû, hatiye berhevkirin. Bi dirêjahiya salan Heval li ser van xalan lêhûrbûn kiribû, di heman demê de weke wane gelek caran dabû hevalan.*

*Hevalê Şehîd Rustem di nava Têkoşîna Azadiyê de di gelek qadan de di asta kadroyekî pêşeng û rêveberiyê de kar û xebat daye meşandin. Em hêvîdar in û di wê baweriyê de ne ku ev lêhûrbûnên Hevalê Rustem di derbarê vê mijarê de wê ji hevalan re di aliyê fikrî û jiyanî de bibe pêşvekirinek.*

*Rustem Cudî kî ye? Hevalê Rustem Cudî bi navê rast Rustem Osman, di sala 1965'an de li Rojavayê Kurdistanê, li gundê Xirbê Dibsê yê girêdayî Serê Kaniyê ji dayîk bûye. Navê dayîka wî Huseyîna, navê bav Yûsif e. Hevalê Rustem, ji malbatêke welatparêz û netewhez bû. Dibistana seratayî, navîn û amadeyî li Serê Kaniyê xwendiye. Da ku zanko bixwîne berê xwe daye paytexta Sûriyê Şamê. Li wir beşê zîraetê xwendiye. Di sala 1985'an de dema li Şamê dixwîne rêxistina PKK'ê dinase. Wê demê Rêheval Rustem Cudî, di nava Tevgera Çepên Sosyalîst de cih digire. Bi hezkirina xwe ya ji zanistê re dereng namîne û timî hemû rewşa welat ji aliyê siyasî ve ji nêz ve dişopîne. Derbarê netewa xwe de timî di nava liv û tevgerê de ye.*

*Herwiha xwedî nerînên azad û kesayeteke di aliyê lêgerînê de serbixwe bûye, herweha hêza xwe ya analîzkirina rewşên siyasî û civakî timî di pêş de ye. Ew dema ku di nava lêgerîn û lêpirsînê de ye, têkoşîna azadiya gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê dest bi pêngava 15'ê Tebaxê dike. Weke bi gelmperî gelê Kurd, gelê me yê Rojavayê Kurdistanê jî û malbata hevalê Rustem jî ji qonaxekê derbasî qonaxa din a şoreşa gelê Kurd dibin. Bi vê taybetmendiya xwe ya lêgerîn û kûraniya lêkolînê dereng namîne û tevgera azadiya gelê Kurd PKK'ê nas dike. Bi naskirina xwe ya ji rêxistinê re tevlî xebatên ciwanan dibe. Piştî wê navê xwe yê tevgerê dike Rustem Cudî. Di sala 1987'an de li Lubnanê tevlî civîneke ku Rêberê gelê Kurd Abdulah Öcalan tê de diaxive dibe, tavilê digihîje wê baweriyê ku nêrînên Rêbertiyê û şoreşa PKK'ê şoreşek xwedî wate û bi nirx e û bi armancên gelê xwe ve girêdaye. Ji lewre bi biryareke bêhampa tevlî refên Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê dibe.*

*Piştî wê, di sala 1989'an de derbasî qada Lubnanê, dewreya perwerdeya Akademiya Mahsûm Korkmaz dibe. Di sala 1989'an de ji dewreya perwerdeyê derdikeve û derbasî nav xebatên gel dibe. Li wir di nava xebatên gel de jî hêza xwe ya pêşengiyê dide diyarkirin û baweriya hevaltiyê û gel bi xwe tîne. Bi wê sekna xwe ya bi prensîb, tevlîbûna li gorî xeta jiyana pêşengiya ji militanên PKK'ê re tê xwestin pêk tîne. Herwiha di dawiya sala 1989'an de derbasî qada Gapê dibe û li wir di asta berpirsyariya qadê de cih digire. Piştî vekişandina gerila ji herêma Gapê hevalê Rustem di sala 1993'an de derbasî herêma Botanê dibe. Piştî wê bi dirêjahiya salan re li Botan û Gabarê bi awayekî çalak tevlî xebatên gerîla dibe. Hevalê Rustem,*

*di sala 1995'an de tevlî kongreya 5. a PKK'ê dibe. Piştî kongreyê careke din berê xwe dide herêma Mêrdînê.*

*Bi taybetî li deşta Êlih,Bişêrî Misircê û çiyayê Mava maye, mirov dikare bêje qada ku negihîştibiyê nînbûye. Li Mêrdînê bi tevlîbûna xwe ya çalak di sala 1998'an de ji qada Mêrdînê vediqete û piştî wê di asta temsîlgerê rêxistinê de derbasî qada xebatê ya nav gelê me yê li Rûsyayê dibe. Piştî ji Rûsyayê vedigere di xebatên din de jî cihê xwe digire. Di sala 2003'yan de tevlî kongreya gel dibe, di kongreyê de weke endamê konseya rêvebir tê hilbijartin. Di wan salan de weke tê zanîn li hemberî xeta îxanetê ya ku pêşketî têkoşîneke dijwar dide meşandin. Li hemberî xeta tasfiyeyê xwedî sekneke ku tu carî tawîz neda û bi sekna xwe weke têkoşerekî azadiyê bi serbilindî têdikoşe. Herwiha cihê xwe di meclîsa PKK'ê ya nû de jî digire.*

*Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan jî li ser rêheval Rustem Cudî vê nirxandinê kiribû: "Hevalê Rustem xwedî kesayeteke kadroyê şoreşger û xwedî sekneke bihêz e."*

*Hevalê Rustem di encama êrîşeke hewayî ya hovane ya dewleta Tirk a li ser qadên parastina Medyayê li Xakurkê di 10'ê Cotmeha 2011'an de bi şeş hevalên xwe re jiyana xwe ji dest da û tevlî karwanên şehîdan bû.*

**NAVEROK**


Danasin
PÊŞGOTIN
**1-KAOSA ROJHILATA NAVÎN**
Li Rojhilata Navîn Pirsgirêk Û Careserî
Ronansesa Rojhilata Navîn
Rojhilata Navîn Çavkaniya Şaristaniyê Ye
Kapîtalîzm Tevgera Bêhêviyê Ye
Rojava Dîrokê Li Gorî Xwe Şîrove Dike
Rojhilata Navîn Timî Çareseriyê Di Fikir Û Jiyana Rojava De Dibîne
Sedemên Krîz Û Zîhniyeta Rojhilata Navîn
Dogmatîzm Çi Ye?
Pêşketina Fikir Û Mîtolojiyê
Li Rojhilata Navîn Derfetên Reformê Û Pêşketina Dînê Xiristiyantiyê
Li Rojhilata Navîn Hewildan Û Derbaskirina Rewşa Heyî
Dînê Yekxwedayî Di Asta Zihnî Û Fikrî De Şoreşeke
Li Rojhilata Navîn Têkoşîna Li Dijî Desthilatdariyê
Tevgera Xaricî
Tevgera Mutezîle
Tevgera Îxwan Sefa
Li Rojhilata Navîn Pêşketina Felsefê Û Zanistê
Zerduştî Lêgerîna Li Bilindbûn Û Xweşiya Jiyana Civakê Ye
Sedemên Nepêşketina Fikira Rasyonalîzmê û Ronesansê
Pêşketina Pêvajoya Civaka Neolotîkê
Têkoşîna Rêber Apo Li Hemberî Hemû Zêdegaviyên Sîstemê Ye

Bandora Zihniyetê Li Ser Qadên Jiyanê
Rojhilata Navîn Bê Hêza Ruhî Nikare Bijî
Divê Mirov Îlm Û Ruh Ji Hevdu Qut Neke
Li Rojhilata Navîn Serweriya Fikra Dewlet Netew
**2-DI ROJHILATA NAVÎN DE ROLA DESTHILATDARÎ Û DEWLETÊ**
Dîroka Mirovahiyê Û Dewletê
Nîqaşên Şoreşa Sosyalîst Li Ser Dewletê
Ferq Û Cudatiya Di Navbera Dewleta Rojhilat Û Rojava De
Pêşketin Û Hilhatina Demokrasiyê
Demokrasiya Roma
Destana Bilindbûn Û Mezinbûna Babilê
Li Rojhilata Navin Kevneşopiya Şidetê
Rêûresma Berxwedana Gelan Li Dij Dewletê
Li Rojhilata Navîn Rojanekirina Têkoşînên Dij Dewletî
Pêşketina Tevgera Qermîtî'yan
Pêşketina Tevgera Zenciyan
Tevgerên Rojhilata Navîn Bi Zihniyeta Dewletê Xwe Întîhar Kirin
**3-DI ROJHILATA NAVÎN DE PIRSGIRÊKA JIN Û MALBATÊ**
Tesbîtên Zanista Sosyolojiya Sosyalîst
Li Rojhilata Navîn Şikandinên Jinê Yên Cinsî
Bi Dînê Yekxwedayî Re Kûrkirina Şikestinên Cinsî
Li Rojhilata Navîn Çareseriya Pirsgirêkên Jinê
Li Rojhilata Navîn Şoreşa Jinê Û Pêşketina Wê
Li Rojhilata Navîn Malbata Yekalî Û Dewleta Biçûk
**4-LI ROJHILATA NAVÎN MILLIYETGERÎ, DÎN, MEZHEB, QEBÎLE Û EŞÎR**
Li Rojhilata Navîn Bandora Dîn, Mezheb Û Terîqetan
Derketina Mezhebê Şîa?
Di Roja Me Ya Îro De Liv Û Tevgera Wehabiyan
Di Krîza Rojhilata Navîn De Rola Miliyetgeriyê
Miliyetgerî Armanca Desthilatdariyê Ye
Di Sîstema Kapîtalîst De Teoriya Netewan
Li Rojhilata Navîn Li Şûna Umetê Netewgerî Pêşxistin
Li Rojhilata Navîn Rewşa Dewletan
Girîngiya Teoriyan
Panzehîra Miliyetgeriyê Netewa Demokratîk E
Pêşketina Rêxistinên Qebîle Û Eşîran
Li Tojhilata Navîn Ekonomî Ne Civakî Ye, Desthilatdariye
Kapîtalîzm, Endustryalîzm Û Netew Dewlet
Teqlîd Kirin Biyanîbûna Îdeolojîk E
Li Gorxwebûn Û Dogmatîzm Ne Guhertin
Dîroka Rast A Berxwedana Gelan E
Lêgerîna Li Heqîqeta Dîrokî Îlmê Esas Digire
Kevenşopiya Şidetê Ya Dijwar
Nerîna Li Ser Polîtîka Yê
Polîtîka Xwe Birêvebirina Civakê Ye
Polîtîkaya Demokratîk Ne Desthilatdarî ye
Têkoşîna Polîtîka Divê Bi Awayekî Radîkal Bê Meşandin
Serdema Îslamiyetê Û Avabûna Împeratoriyan
Li Rojava Lêgerîn Û Pêşketina Yektiyê
Li Dij Tevgera Eyûbiyan Şerên Xaçperestan

Bêbandorbûna Ebasiyan Û Hilhatina Dewleta Sefewiyan Û Osmaniyan
Yekemîn Pêngava Ewrûpa Ya Dagirkirina Misrê
Li Welatêm Rojhilata Navîn De Ferzkirin Û Pêşketina Modernîzmê
Sedemên Şerê Cîhanê Yê Yekemîn
**5-PROJA ROJHILATA NAVÎN A MEZIN LI SER ÇI ESASÎ HATIYE PÊŞXISTIN**
Îran Çawa Mezin Bû
Armanc Û Sedemên Pêşketina Şerê Cîhanê Yê Duyemîn
Di Îranê De Guhertinên Nû Û Sedemên Pêşketina Wan
Bandora Tirkiyê Li Ser Herêma Rojhilata Navîn
Pêşveçûn Û Pêşketina Miliyetgeriyê Li  Tirkiyê
Şaxeke Din Yê Îdeolojiya Resmî Li Tirkiyê Dîngeriye
Siyaseta Ku Îngilîz Û Fransa Dane Meşandin
Nêzîkbûna Dewelta Tirkiyê Ji Diyarde Û Buyeran Re
Li Tirkiyê Pîrozbûna Dewlet Netewe Ya Sînora Ye
Dive Sîstema Înkarê Bê Tesfiyekirin
Rola Tirkiyê Di Lîberalîzekirina Rojhilata Navîn De
Pêşketina Tevgera Nasirî Ya Bin Rêveberiya Cemal Ebdul Nasir de
Avabûn Û Pêşketina Eniya (Cebha) Şeabî Ya Filistînê
**6-ŞOREŞÊN LI MISIR, CEZAÎR, IRAQ, LÎBYA Û SÛRIYÊ**
Sedemên Li Xwe Îxanetkirina Şoreşên Li Rojhilata Navîn
Rola Dewleta Sûriyê Di Pêşketin Û Avabûna Partiya BeasDe
Girîngî û Dîroka Iraqê
Dijiberiya Miliyetgeriya Ereban Li Dij Tevgerên Kurdî
Bandora Partiya BeasLi Ser Îraq Û Sûriyê
Xweseriya Îraqê Û Erdnîgariya Wê
Têkiliya Hinek Tevgerên Kurd Bi Emperyalîzmê Re
Li Iraqê Nijadkujiya Tevgera BeasLi Ser Gelan
Komkujiyên Ku Rejîma BeasDi Iraqê De Li Ser Kurdan Daye Meşandin
Rol Û Bandora Siyaseta Îsraîl Li Rojhilata Navîn
Beramberî Îsraîl Pêşketina Tevger Û Serhildanên(Întîfada) Filîstînê
Bandora Miliyetgeriya Cemal Abdul Nasir Li Ser Tevgera Rizgariya Filîstînê
Li Filîstînê Pêşketina Tevgera Çep
Mezhebê Şia Ne Binesaziyek Homojen E
Kemalîzm Û Layîsîzm
Pêşketina Tevgerên Serbixwe
Bandora Emperyalîzmê Li Ser Kûrbûna Krîza Rojhilata Navîn
**7-ÊRÎŞÊN EMPERYALÎZMÊ LI SER ROJHILATA NAVÎN JEOSTRATEJÎK Û SÎSTEMÎK**
Emperyalîzm Li Rojhilata Navîn Dixwaze Li Ser Ptrolê Serwer Be
Armancê Emperyalîzmê Ji Parastina Îsraîl Çi Ye?
Nakokiyên Emperyalîzmê Bi Rojhilata Navîn Re Yê Şaristaniyê Ne
Divê Şerê Me Li Hemberî Zihniyet Û Şêwazê Jiyana Moderníta Be

Emperyalîm Şerekê Dîrokî Û Çandî Dike
**8-SOSYALÎZM BI CEWHERÊ XWE YÊ RAST JI RASTIYA ROJHILATA NAVÎN DÛR NÎNE**
Li Rojhilata Navîn Pêşketina Tevgera Komunîst
Nêzîkbûnên Tevgera Komnîst Ên Dogmatîk Ji Rojhilata Navîn Re
Li Rojhilata Navîn Pêşketina Dînê Îslamê
Tevgera Wehabî
Derûniya Tevgera Wehabî
Çêbûna Elqayîde
Pêşketina Tevgera Îxwan Muslimîn
Sedemên Pêşketina Mezheban
Pêşketina Mezhebê Nexşbendî Li Kurdistanê
Di Rojhilata Navîn De Sedemên Pêşxistina Îslalama Siyasî
**9-ÇARESERIYA PIRSGIRÊKA ROJHILATA NAVÎN**
Proja Çareseriya Emperyalîst A Kapîtalîst
Proja Rojhilata Navîn A Mezin
Dewlet Netewa Li Rojhilata Navîn
Emperyalîzm Pirsgirêkên Rojhilata Navîn Çawa Çareser Dike?:
1-Serweriya Bitendurustî
2- Ekonomî
3-Mijara Jînê ye
Çareseriya Statîkoperest
Sîstema Destpot Bi Tewîz Û Îtîfaqên Herêmî Emrê Xwe Dirêj Dike
Şêwazek Din Ê Çareseriyê Jî Şidet E
**10-ÇARESERIYA DEMOKRATÎK**
Ev Proja Azadiya Civak, Jin Û Ekonomiya Civakî Ye
Proja Demokratîk Ahenga Di Navbera Bajar Û Gundan De Ye
Demokrasî Tenê Ne Hilbijartin E, Kombûna Nirx Ye
Heqîqet Lêgerînek Bê Navber E
Şerê Li Hemberî Şêwazê Jiyana Fînans Kapîtalîzmê
Dewlet Netew
Dijberiya Dînê Çandî Bi Kaptalîzmê Re
Sedemên Pêşketina Partiya Hemas

## pêşgotin

Parêznamên Rêberê gelê Kurd, Abdulah Ocelan bi gelemperî tên xwendin. Bi taybet jî li ser çavkaniyên pirsgirêkan, xetimandin û rêkên çareseriyê ji aliyê prensîb ve, li ser berfireh hatiye rawestandin. Ji bo vê di nirxandina cîhanê de, bi taybet krîza li Rojhilata Navîn her demê ji bo me û kesên ku êdî li pirsgirêkan di çarçoveya nerîna modernîteya demokratîk de dinêrin referanseke. Mirov parêznamên Rêzdar Ocelan bi vî rengî bigire dest wê baş be.

## KAOSA ROJHILATA NAVÎN

Niha em kaos, anarşî, tevlîhevî, ango xerabiya li Rojhilata Navîn digirin dest. Kaos çi ye? Ji bo hîna bêtir bê fêm kirin, em ê bi mînakên piratîkî bigirin dest. Mirov wer texmîn bike ku çawa mirovek di nava pêlên deryayê de be, ew pêlên deryayê yên kaosê ne. Ji ber çi em wiha dibêjin, ji ber ku kaos nediyariye, xeteriye, krîz e, yanî wê çi bibe encam ne diyar e. Her demê îhtîmala ku pêl wî/ê di nav xwe de daqurtîne heye. Xelasbûna ji kaosê di wê dema ku mirov digihêje bejahiyê ye. Bi vî rengî mirov dikare çareseriyê bi nav bike.

Wê demê bi taybet rewşa îro dema em dibêjin kaosa li Rojhilata Navîn tê wateya ev herêm bi pirsgirêkên xwe, bi hemû rengê kêmasiya yên ku di hundirê vê herêmê de dijîn di rewşeke bêîstiqrar û nediyar de ye. Kengê wê pêlên deryayê daqurtîne nediyar e. Ji bo vê bi rengekî ji rengan hawildanek da ku bigihêje bejahiyê heye. Ev hewildan jî reng bi reng in.

Yek ji van hewildanan bi vî rengî ye; rêbazekê nîşan dide û dibêje xelasiya ji kaosê ev e, ya din jî dibêje xelasiya ji kaosê bi rengekî dine. Ji bo vê di meselê peydakirina rêbazên xelasiya ji vê xeteriyê jî pirsgirêk hene. Di roja me ya îro de nerîna serwer, nerîna hegemoniya kapîtalîst ya ku kapîtalîzmê weke sîstemeke cîhanî û ji bo hemû cîhanê pêwîst û pêdiviye; weke çawa rêka hemû pirsgirêkan nîşan dide, bi vî rengî nîşan dide ku heger Rojhilata Navîn nirxên kapîtalîzmê bi ezeztiyê, lîberalîzmê, piyaseya serbest, heger van tiştan qebûl bike ew rêka xelasiya ji kaosê ye. Bi vî rengî wê Rojhilata Navîn ji kaosê derbikeve. Jixwe çiqasî tecrubeyên hatine kirin berovajiyê vê îsbat bikin jî, lê hîna jî kapîtalîzm di vê derbarê de bi îsrar e. Kapîtalîzm bi îsrar dixwaze wiha nîşan bide ku rêka xelasiya ji qebûlkirina nirxên kapîtalîzmê yên cîhanî ne.

Bêguman hinek rêkên din jî hene. Bi taybetî proja bi navê modernîta demokratîk, li ser esasê ku rexên erênî di çand û civakbûna li Rojhilata Navîn mirov karibe bi nirxên çaxê yên bingehîn, bi taybetî milên wê yên cîhanî, teknolojî ve girê bide, bi vî rengî xelasî jî peyda dibe.

Bi gelemperî wê demê di roja me ya îro deek heye! Ev pir dijwar e. Dijwariya wê çavkaniya xwe ji ku digire? Niha dema mirov lê temaşe dike di gelek aliyên cîhanê krîz hene. Lê rêka derbaskirina ji krîzê li wan deran weke ku çawa di vê herêmê de biêş, derd û bi felaket nîne. Ji bo hinek taybetmendiyên xwe yên çandî û civakî, ew herêmana rewşa wan hîna destdaye zêdetir berendamên derve qebûl bikin û bi vî rengî li gorî xwe, xwe ji krîzê derbas bikin.

Mînak, li rojhilata Asya ew guhertinên lîberal yên ku çêbûn, li Endunuziya, Manîziya, Sengafor hwd, ew guhertinên ku çêbûne vê didin nîşandan. Dîsa heta dema dawiyê li Asya navîn Qefqasiya jî hinek meyldarî (yölelim) bi vî rengî çêbûne. Ew jî li ser esasê lîberal kirina sîstemê ne. Bi vî rengî rêka xelasiya ji krîzê xwe didin nîşandan.

Emperyalîzm di serî de welatên yekbûyî yên Emerîka jî di krîzê de dijîn. Ew jî rêka xelasiya ji krîzê bi çi diyar dikin, bi çi dixwazin pêkbînin? Bi rengê gelemperîkirina sîstema xwe li hemû cîhanê, di aliyê fikir, propoganda û îdeolojî ve cîhanê hemû di nav bombedomanê de hiştiye. Herwiha dibêje; proja sosyalîst îflas bûye. Lê nikare di aliyê dînî ve bibe alternatîf.

Ji bo vê jî hawildanên cîhanê, yên mirovahiyê her demê ji bo ku bigihêje çareseriyekê û ev çareserî jî di şexsê sîstema kapîtalîst de pêkhatiye. Yanî demokrasiya lîberal pêkhatiye. Ji ber çi, ji ber ku hemû sîstem û hawildanên hilweşandina Kapîtalîzmê bi ser neketin, dev jê berde ku bi ser neket, bi bin ketin. Radest bûn, ev îsbat dike ku di esas de sîstema motleq ya ku heqîqet di destê wê de ye; ya ku bi rengekî rast di şopandina heqîqetê de ye kapîtalîzm e. Ji bo vê divê ev sîstem bê qebûl kirin.

Lê belê beramberî wê nerazîbûnên tund hene, rayeksyon hene, lê wan rayeksyonana bi rengekî hov nîşan didin. Ew rayeksyon bi rengekî ku çawa hawildanên ku bi carekê de dixwazin dîrokê careke din bi paş ve bikişînin, ji bo vê wan ne însanîne, ne zanistiye, berovajiyê heqîqetê ye, nîşan dide. Li ser vî esasî jî divê mehkomê tinebûnê bibe. Ji bo vê jî bi hincetan ji êrîşên xwe yên li ser Iraq, Evxanîstan, Lîbiya hwd, dibîne.

Heta li ser hêzên demokratîk, mînak weke tevgera me, li ser van ji bo êrîşên xwe hincetan dibînin. Li ser esasê ku mifta heqîqetê di destê wê de ye, hemû kesên ku li dijî wê ne, li dijî heqîqetê ne, ji lewre tinebûn û şer heq kirin. Kapîtalîzm bi vî rengî dixwaze ji krîzê derbas bibe.

**Li Rojhilata Navîn Pirsgirêk Û Çareserî**

Li Rojhilata Navîn çareserkirina pirsgirêkê ewqas hêsan nîne. Ji ber çi wiha çareserkirina hêsan nîne? Gelek tişt li ser tên gotin. Her demê jî rastî tiştekî îsbat dike. Ev tiştên em dibêjin çi ne? Dibêjin hemû planên di derbarê vê herêmê de tên danîn, dema ku bi piratîkê re rû bi rû dimîne îflas dike. Weke ku Rojhilata Navîn bibe qebristana tasariyên ji der ve de tên hazir kirin.

Bi sala ye ji bo ku ev herêm bibe parçek ji hêzên cîhanî bi fikirên xwe, bi piratîka xwe bi her tiştên xwe bibe parçek ji wê, hawildan hatine kirin. Hawildanên guhertinê hatine kirin. Guhertinên civakî û yên çandî bi hev re hatine kirin. Lê belê bi ser neketine. Ev ne jixwe ve ye, ev rastiyê bi xwe re tîne û îro li gelek cihên cîhanê tên qebûl kirin. Çi ne ev rastî? Rojhilata Navîn wer zû ji bo qebûl kirina fikirê derve re ne amede ye. Ji çi tê ev neqebûl kirin? Ji ber ku çanda civakî ya hezarê salan hîna jî bi bandor e, ew kesayetê bi rêve dibe, moral, hest, şewazê wî/ê yê jiyanê diyar dike. fikirên ji derve de tên nikarin bi ser kevin. Yanî planên ji derve de ji bo dîzeyîna vê herêmê tên danîn serkeftina wan her demê demborî dimîne û mayende nabe. Nabin weke reçetekî ji bo çareserkirinê bê qebûl kirin. Ji bo vê çareserkirinek mayende ji herêmê re nabin. Pêwîst e mirov li ser vê rastiyê

raweste. Ev xeyaleke, îdiayeke bê bingehe, yan jî îdiayeke bi bingeh e?! Divê mirov li ser vê rawest e.

Lê belê tiştê herî destpêkê bi mirov vê rastiyê didin îsbat kirin çi ye? Projên ku ji derve de tên hazirkirin ji bo ji nû ve dîzayînê, pêşnûmên ji bo herêmê, ji kevn ve û îro jî biserneketin. Mînak, ev proje mirov dikare bêje heta astekê di rojhilatê Asya de biserket. Li Emerîka biserdikeve, lê belê li Rojhilata Navîn bisernakeve.

Ev çanda ku bi hezarê sala di vê herêmê de çêbûye, wê demê xwedî bandor e. Ji bo vê jî di hundir de yanî li ser esasê dînamîkê hundirin ji bo derbaskirina krîzê hinek hawildan çêbûn, lê ew hawildan biserneketin. Di heman demê de fedekarî hate kirin, aliyê wê yê zanestiyê hebû, hawildanên cidî bûn, ev tiştên he hemû hatin kirin, lê belê biserneketin. Ji ber çi biserneketin; ji ber ku di wir de jî pirsgirêk ew çand bû. Mînak ew hawildan li dijî mêtingeriyê bû, ev rastî bû.

**Ronansesa Rojhilata Navîn**

Mînak hawildanên ronesansê yên di dawiya sedesala 19.û destpêka sedsala 20. de li Rojhilata Navîn hawildanên li dijî dagirkeriyê û desthilatdariya derve bûn. Lê belê dixwestin bi çekên wan şerê wan bikin, bi vî rengî modernîta qebûl kirin. Xwestin rêka xelasiyê bi kopyakirina ji nirxên modernîta kapîtalîst di welatên xwe bikin.

Ji ber vê yekê heta asta herî dawî girêdayî modernîta kapîtalîst bûn. Weke çawa jê re koletiyê bike. Ev yek bê dudilî, bê nîqaş, her tiştê modernîta qebûl dikirin. Lê di heman demê de li dijî dagirkeriyê têkoşîn dikirin. Ev rewşek bi nakok bû, wê demê kopya kirin jî pirsgirêkê çareser nake.

Mînak, ev tevgera zanestiyê ya ku di Rojhilata Navîn de derket, bi giştî jî tevgerek pala xwe dida modernîta kapîtalîst. Yanî pala xwe dida nirxên moderin yên Ewrûpa yên ku ji şoreşa Fransî, Îngilîzî, demokrasiya Ewrûpa, Mafê mirovan ê Ewrûpa girtine, mafê takekesî yên li Îran, Misr û Tirikiye xwestin van tiştan pêk bînin. Kesên weke Cemalidîn Efxanî, Kewakibî, Mîrza Markon yê Îranî hwd, ev hemû hembûn. Hemû jî li dijî dagirkeriyê bûn. Li dijî monarşiyê bûn. Li gorî xwe xwedî projeyekî ronansasê bûn, ji nû ve zayînê bû li Rojhilata Navîn, lê belê biserneketin. Sedem çi bû ku bi ser neketin? Wê demê ne kesên ji derve de dixwazin sîstema xwe biguherin dikarin biserkevin, ne jî di hundir de kesên dixwazin bi nirxên derve, yanî çandina nirxên derve di herêmê de dikarin meselê çareser bikin. Ev her du nêzîkbûn jî şaş in û bi ser jî nakevin.

Ev nêzîkbûn li cihên din hêsan çêdibin, mînak li Efrîqya xwendevan diçûn welatên dagirker dixwendin. Diçûn Fransa, Belcîka, Îngiltera dixwendin, ev hemû hêzên dagirker ên li ser Efrîqiya bûn. Vê carê ew xwendevan dihatin li welatê xwe ragihandin dikirin. Karîbûn di welatê xwe de guhertinê çêbikin, bi ser jî diketin. Lê belê heman ev hawildan li Rojhilata Navîn

çêbûn, lê bi gel re nebûn yek, ji gel re nebû mal. Fikrê çep jî hat, ji bo vê pirsgirêk di vir de ye. Ji lewre krîz ev e, krîz hêza dînamîkên hundir têrê nakin ku derbas bikin, yanî kaosê derbas bike û bigihêje bejahiyê, hawildanên ferz kirina nirxan ji derve de di rêka êrîşên weke çawa li Îraq û Afganîstan êrîşên leşkerî dibin, çi jî di rêka ragihandinên çandî, ferz kirinên modelên civakî dibin, şêwazê jiyanê dibin, mirov lê temaşe dike ku bisernakeve. Xerab dike, yanî dema em dibêjin bisernakeve ev şaş neyê fêm kirin, yanî nayê wê wateyê ku bi temamî bê encam dimîne. Yan jî ji bo xwediyê xwe qet encamê nagire, na. Emerîka bi qezencan, qezencê digire. Lê em niha tiştekî din nîqaş dikin, em kaosê nîqaş dikin. Em kaosa Rojhilata Navîn nîqaş dikin, krîz pê nayê derBeaskirin. Yanî pirsgirêk dimînin. Şerê hundirîn, feqîrtî, nezanî hwd, gelek nîşaneyên ku dimînin, ew nayên derBeaskirin.

Ji lewra dema em vê waneyê bigirin dest, jixwe divê mirov hinek tiştan esas bigire, yanî hinek taybetmendî. Berî her tiştî dema ku em bixwazin di herêmekê de guhertinê çêbikin, yan jî bixwazin şoreşê çêbikin, pirsgirêkan çareser bikin, divê ku beriya her tiştî em endamê wê tevgerê bin. Mirov di wî zemînî de bimîne û pala xwe bide wî zemînî, li wî zemînî çareseriya pirsgirêkan bigere. Divê ku em vê zela bikin.

Ji ber çi ev şîrove û nêzîkbûn ji bo me pêwîst e? Pirsgirêka me ew ku em dema Rojhilata Navîn guftuguh dikin, em di wî zemînî de rûnanin. Ayîdbûna me tine ye, em bi meTUDEH'ên Rojava, yan jî bi nêzîkbûnên oryantelîst ên herî erênî em digirin dest.

MeTUDEHên Rojava û oryantelîst çi ne? Oryantelîst yanî di derbarê rojhilat de, kesek wer di dil xwe de xwedî agahî, xwe elaqederbûyî dibîne. Lê ya bingehîn di berhemê xwe de her demê îcar Rojava û ji bo ku teşe girtina însanê rojhilat de bi nirxên Rojava çêbin, her demê wî/ê tabîa bihêlin kesayetê çêdikin. Armancê van nêzîkbûnan ew e. Lê weke tevgereke erênî heta demekê ne zêde dûr jî, her demê oryantlîzm hatiye nirxandin. Di esas de ev tabiyet e. Bi taybet di şêwazê jiyanê û fikrî de jî Rojhilata Navîn bike weke mêtingeh, yanî herêmeke mêtingehek girêdayî Ewrûpa be.

Niha însiyatîf di destê Rojava de ye. Çim însiyatîf di destê Rojava de ye? Tevgera şaristaniyê ya zanistî, teknolojî, îro nasnama xwe di Rojava de îfade dike. zanist, felsefe, avahî yanî hemû beşên zanistî, zanista civakî, xwezayî, yanî her tişt îro xwe di Rojava de îfade dike. Ev di esas de tiştekî pir xwezayî ye. Ji ber ku pêşketin girêdayî şeert û mercên hey ye. Mînak îro di vê dibistanê de hinek şert hene em heta astekê dikarin pêşbikevin, lê dema em ji dibistanê derdikevin û biçin qadeke hîna firehtir, nav şert û mercên cuda li wir hebin, wê demê pêşketin û paşketina me jî li gorî wê dikare di mecalekê de di nav tevgerê de be.

**Rojhilata Navîn Çavkaniya Şaristaniyê Ye**

Ji bo wê jî çavkaniya şaristaniyê rojhilat e. Ev rastityeke, di roja me ya îro de bi dizîka, bi rengekî fediyokî, yan jî sergirtî be jî, êdî vê rastiyê qebûl dikin. Li xwe mikur jî tên. Lê belê ev şaristanî weke berhemekê dîrokî yê însanane, di zemînekî dîtir de hîna bêtir dikare pêşbikeve, ev jî tiştekî pir xwezayî ye. Ev ne kêmaniyek Rojhilata Navîn e. Divê mirov vê weke kêmasî nebîne. Wê demê kêmasî di ku de ye? Kêmasî di vir de ye ku nêzîkbûna Rojava ji zanistiyê û hunerê re, ji her tiştê ku asta însanan pêş dixe, zanebûnek Rojava ya nicadperestiyê pir li pêş e. Yanî nicadperestiye û xwe navend dîtine. Herwiha nêzîkbûnek cinsiyetparêziyê ye. Bi vî rengî zanistî weke malê însanan, yan jî rewşeke dîrokî ta beriya hezarê salan dest pêkiriye, ji dema ku însan di destê xwe de karîbûye kevir ji bo jiyana xwe bixebitîne, ji wir dest pêkiriye heta roja me ya îro gihêştiye asta(sîbernetîk-elektronîk-robot hwd), bi vî rengî nagire dest. Tam berovajiyê wê ji rehendê (boyutê) wê yê dîrokî serbixwe û jê qut, zanistiyê li ser bingehekî nicadperestiyê digire dest. Yanî zanistiyê weke berhemê zilamê spî yê Rojavayî digire dest. Ji bo vê jî kesên ji derveyî xwe dixwaze bêhêz û îrade bihêle. Bi taybetî jî dixwaze vê li ser Rojhilata Navîn mehkum bike û li ser hikum bike.

Rojava ji ber çi wiha dike? Bi taybetî ji ber ku li Rojhilata Navîn potansiyel û alternatîf heye. Şaristaniya Rojava li beramberî şaristaniya rojhilat li gorî xwe nû ye, ewqasî kevn nîne. Ji bo vê potansiyel û alternatîf beramberî şaristaniya Rojava li Rojhilata Navîn heye. Li ser vî esasî zanyarê Rojava sîstema wê ya siyasî hemû di nav hewldanekî dijwar de ne, ji bo ku însanê Rojhilata Navîn ji rastiya wî biyanî bihêlin, wan ji rastiya wan xerîb bihêlin, timî di nava hawildanan de ne.

Ji bo vê zanistiya Rojava çawa mijaran digire dest û nicadperestiya wê di ku de diyar dike? Nicadperestiya wê di vir de diyar dike, dibêjin zanistî bi şaristaniya Rojava re destpêkiriye. Bi Roma û Girêk re gava xwe ya yekemîn avêtine, bi ronansasê ji nû de jiyaye. Yanî di esas de ji nû de vejîna înanan na, ji nû de vejîna berhemên şaristaniya Girêk û Roma çêbûye.

Wê çaxê dibêjin li Misrê BZ hezarê salan nivîsandina hiyeroglîf heye, piramît hene. Herwiha asta zanistiya endeziyariyê bihêz e, astronomî heye, di Rojhilata Navîn de perestgeh, çandinî, avdanî, ev hemû hene. Lê dibêjin ev hemû tesaduf in. Ew di encama lêkolînek biaqil çênebûye. Bi vî rengî înkar dikin. Ne tenê wiha heta di hinek aliyan de naskirina zanistî û felsefa Rojava em ji bo xwe carnan weke referans, heta weke meteryalekî ku em zêde pala xwe didinê. Mînak vê bi rengekî eşkere tîne ziman, bi rengekî eşkere tînin ziman û dibêjin; di wir de tesaduf hene, ev jixweber in. Tu dibêjî astronomî pêşketiye, îlmê gerestêrkan heye, di van aliyan de gelek tesbît û teqwîm hene; lê ew dibêjin di esas de di wir de astrolojî (tencîm) heye. Yanî ji bo şensên xwe nas bikin, ji bo însan çarenûsa xwe fêm bike, ji lewre neçar bûn ku tevgera stêrkan bişûpînin. Vê jî hinek agahî li gel wan çêkir.

Tu dibêjî piramît hene, piramît bi xwe jî çêkirinek endeziyariye, heta roja me ya îro jî li ser wan zangonan

geometriyê, bingehê bînaya jî li ser esasê zagonên pîramîtan tên avakirin. Di endeziyariyê de formîlên wê hene. Lê ew dibêjin; na ne wiha ye, ew ji bo însan xwe nîşan bide, yanî meznaya xwe û Xwedabûna xwe nîşan bide tiştên wiha çêkirine. Tiştekî girêdayî aqil tê de tine ye. Lêgerînek, hewildanek aqil tê de tine ye.

### Kapîtalîzm Tevgera Bêhêviyê Ye

Ev tê çi wateyê; tê wateya di esas de Rojhilata Navîn beramberî xwe bêhêvî bihêle. Modernîta kapîtalîst, bandora wê li ser paş ve mayîn û paşketina însanan zêde-zêde heye. Ji ber çi, ev xwe navend digire, ji ber ku nicadperest e. Xwe esas digire yê derveyî xwe weke însanên gihêştî bihêz, dikare bifikire, dikare çareseriyê ji bo pirsgirêkên li pêşberî wî/ê derbikevin deyînin na, lê weke însanê hov, li ser esasê ku berhem bide na, tenê tiştê derve qebûl bike û wiha jiyana xwe bi rê ve bibe, Rojava dixwaze mirovan mehkumê vê bike. Ev gelekî pirsgirêkan derdixîne. Rojava di esas de armanca wê ev e! Yanî çanda Rojava modernîta kapîtalîzmê ev e.

Em bala xwe bidinê heta ku kapîtalîzm bi ser dikeve, însaniyet timî aramiyê di aliyê xeyal de, di vegera paş de dibîne. Di kapîtalîzmê de ev tişt tê guhertin. Di esas de ew çi ye? Însan bi zanebûn yan jî bêzanebûn dema ku di aramiyê de, di dîroka kevn de dibîne, yanî di esas de vedigere xwezaya civakî. Dixweze vegere wir, bi nirxên wê yên însanî, dada wê, wekeheviyê, ahenga di navbera însan û xwezayê de, dixwaze vegere wir. Kapîtalîzmê di esas de ev ji holê rakir. Em bala xwe bidinê cihê ku kapîtalîzm tê de bi ser dikeve kes li wir naxwaze li paş de vegere. Cihê ku fikirê kapîtalê tê de hakim dibe kes êdî naxwaze paş de bizivire. Heta di paş de mayînê bi çi îfade dike, paşketî, paşverûtî, hovitî, xerabî, ji bo vê di esas de komkujiya mezin di wir de pêk tê. Yanî înanan ji kokê wan tecrîd dike. Însanan dike weke meteryalekî ji bo sîstema xwe û nirxên xwe li ser bide rûniştandin.

Ev xeteriyek mezin e. Ji bo civakan jî tiştekî wiha dixwaze çêbike. Lewre civakan li beramberî xwe bêhêvî dihêle. Niha civaka li beramberî xwe bêhêvî ma çi dibe jê? Ew civak êdî hêza wê ya dayînê nîne. Baweriya wê bi xwe êdî namîne. Çi pêş dikeve, dibe weke rewşekî tenê qebûl bike. Tenê ji bo xwe digire, nikare bide, tiştê heyî qebûl dike, ev mirina civakê bi xwe ye. Yanî civakek encex bi vî rengî bimire, dema ku hêza çêkirinê, xuliqkariyê di xwe de wenda bike. Her demê li benda derve be, bi vî rengî însiyatîfê wenda bike, şêwazê xwe yê jiyanê, sîstema xwe ya siyasî xebatên xwe yên aborî hwd. Li gorî derve xwe eyar bike, wê demê di esas de xerabiya mezin çêdibe. Ev tişt jixweber çênabe. Ev bi bimberdomana îdeolojîk, çandî, fikirî ya ku li ser çêdibe wê ew encam derbikeve holê. Ji bo vê Rojava di roja me ya îro de çi dike? Li Rojhilata Navîn bi rengekî ji rengan dixwaze ku li bermaberî nasnama wê biyanîbûnekî çêbike. Yanî înasê li Rojhilata Navîn beramberî nasnama xwe biyanî be, nasnama xwe qebûl neke. Dema em dibêjin nasname di serî de çand, şêwazê jiyanê, nirxên civakî yên erênî, girêdayî hev girtinê, exlaq, van ji holê rabike.

## Rojava Dîrokê Li Gorî Xwe Şîrove Dike

Dîsa dîrokê bi rengekî rast negirtina dest, mînak em bala xwe bidinê nêzîkbûnên analetîk û yên dîrokî bi vî rengî ji hev cuda ne. Di parêznamê de Rêbertiyê li ser vê xalê bi berfirehî rawestiya ye. Di sosyolojiya modernîta kapîtalîst a pozitîvîst de çi heye? Analetîkbûn û nêzîkbûnek tehlîlî heye. Li ser çi esasî tehlîlî, yanî dibêjin rewşekî pir xerab hebûye, biaqil re nedibû yek, bi mentîq re nedibû yek, beramberî wê têkoşîn çêbû, şoreş çêbûn bi serkeftina kapîtalîzmê bi encam bû. Bi vê serkeftinê re rê li pêşiya zanistê, teknolojiya hwd, li pêşiya her tiştî vebû. Ev nêzîkbûnek tehlîliye û analetîk e. Ev çi bi xwe re tîne, ev bi xwe re boyutên dîrokî înkar dike. Lê belê eger boyutên dîrokî înkar nebe, wê demê ev derdikeve holê. Însan ji bo ku karibe hîna zêdetir însanîbûna xwe pêkbîne, şûpandina heqîqetê bi rengekî rast bişûpîne, her demê bûye xwedî hewildan. Ev hewildanan pir bi rengê xwe yê biçûk destpêkiriye. Gav bi gav ji mîtolojiyê gihêştiye asta pexşan ( metînan). Bi dîn hîna zêdetir weke gaveke din xwe nêzîkî heqîqetê kiriye. Bi felsefe û meTUDEHên zanistî yên din hîna zêdetir mesafe qetandiye. Hîna jî berdewam dike, ev milê wê yê dîrokî ye.

Dema hîna zêdetir em vî milê dîrokî bigirin dest wê demê divê ku em giringiyê bidin şaristaniya Rojhilata Navîn. Weke çavkaniya şaristaniyê divê em lê temaşe bikin. Dema ku mirov weke çavkaniyên şaristaniyê lê temaşe bike, wê demê sedemên mirov ên desthilatdariyê û hegemoniyayê ji holê radibin. Yanî sedemên Rojava yên desthilatdariyê û hegemoniyayê ji holê radike. Ji bo vê bi îsrar Rojava ji bo ku her demê xwedî sedemên hegemoniyayê be, bi îsrar vê rastiyê ji ber çavan wenda dike. Bi awayekî sînordar digire dest. Weke çawa di wê çarçoveya meselên zanistî û pêşveçûnê rewşek girêdayî erdnîgariyekê nabe yê Ewrûpa û Rojava. Bi tabetî jî bi jêhatîbûna zilamê spî peyda bûye, ev nicadperestiye bi zanebûn tê ferz kirin. Ev hemû ji bo ku însan beramberî xwe bêhêvî bimîne dike.

Jixwe ev bandorê çêdike, kengê bandor dike? Niha Ewrûpa çi bêje serbest e. Ji xwe hewildanên wê yên hegemoniyayê hene. Ji bo vê ji xwe re sedeman peyda dike. Ev sedem nicadperestî ne, îdeolojîkin, reng e, reng sedemin. Bi hinek xalên serkeftina xwe di meydanê jiyanê cuda cuda de serkeftina xwe ji bo xwe dike weke referans, tê fêm kirin ku bi vî rengî dixwaze xwe ferz bike.

Girîng e her kes li beramberî wê hêza xwe ya jiyanê îfade bike. Yanî hêza ku karibe pê bijî, li ser kokê xwe pê bijî. Yanî rêveberiyên wê/î yên esas taybetmendiyê wî/ê bi xwe bin, ne yê ji derve bin. Ew hewildan jî wê hebe, wê demê pirsgirêk dernakeve. Wê demê çi hikum dike? Çiqasî rêxistin kiribe, çiqasî zanistiyê esas bigire, bi vî rengî tu yî bikaribî encaman bigirî. Di wî aliyê de pirsgirêk tine ye.

## Rojhilata Navîn Timî Çareseriyê Di Fikir Û Jiyana Rojava De Dibîne

Pirsgirêk di ku de derdikeve? Pirsgirêk dema ku tu bi xwe li beramberî xwe bêhêz bî, niha pirsgirêka em dijîn ev bi xwe ye. Yanî kapîtalîm di esas de dixwaze vê encamê derbixîne holê. Di însan de li beramberî xwe bêhêvitiyê pêşbixîne. Yanî însan bi xwe, beramberî xwe bêhêvî be. Rêka xelasiyê di xwe de nebîne. Rêka çareseriyê di xwe de nebîne û ji xwe bêbawer be. Perspektîfê meşa ber bi pêşerojê ve jê re tine be. Ne xwedî proje be, pirsgirêk di wir de derdikevin. Wê demê ew kes çi dimîne, ew kes dibe madek ji bo pêkanînên projên yên din. Ew kes tenê digire, nade. Rola ku dileyîze dibe weke rola çanaqê. Mînak çanaq çi ye? Tenê ji bo ku mirov bi tiştên tên weşandin bigire. Lê çanaq nikare di heman demê de bide û belav jî bike. Ew ji holê radibe, ji lewre li beramberî xwe bêhêviye.

Tiştê ku di jiyana me de serwer dibe fikirê Rojava ye, şêwazê jiyana Rojava ye. Ji ber ku me hêvî bi xwe wenda kiriye, ji ber wê jî da ku em gavekî şaristaniyê biavêjin û krîza xwe derbas bikin pêdiviya me bi jiberkirina tiştên ku ji Rojava tên em esas digirin, di wir de em xelas dibin. Di wir de ev bi rastiya me ya civakî û çandî re berovajiye. Ji bo vê di pêkanînê de em rastî gelek nakokiyan tên. Ev jî li şûna ku çareseriyan bi xwe re bîne, krîzên civakî kûrtir dike. Nirxên li ber xwe didin hene, ên dînî, malbatî, eşîretî, qebîle, ev bi hev re berovajî tên û ev dibe sersebebê ku krîz li şûna ku bê çareserkirin, hîna zêdetir kûr dibe.

Ji ber wê dema em Rojhilata Navîn nîqaş dikin divê ku em xwe ji vê derûniya xwe xelas bikin. Ev derûniya ku timî dema behsa Rojava tê kirin, ji bo me weke ku îfada, zanistî, pêşketin û meznahiyê tê kirin. Divê ev jî bê zanîn em ê wiha fêm bikin, yan jî em ê rexnegir nêzîk bibin? Gelo wê hêza rexnê lê kirin li gel me wê peyda bibe; yan jî na? Heta niha jî em weke rêxistin xwe hêzeke pêşeng dibînin. Di nava tevgera me de heta niha dema hinek heval ji me cesaretê digirin û modernîta kapîtalîst rexne dikin, ew rexne û şêwazê rexnekirinê di navgîna me de hîna jî zêde rasteqînî nayê. Bi gotineke tewş ji kesekî/ê re wiha dibêjin: "Tu çi yî, tu kî yî ku tu modernîta kapîtalîst rexne dikî. Çi yê te heye ku tu beramberî wê rexnan dikî?"

Ev pirsgirêkeke, çima wiha dibe? Ji ber ku modernîta kapîtalîst li gel kesayetan tiştên ku di Rojava de pêk tên, weke dewlet netew, endustralîzm û kapîtalîzm pê re perel er, bi hêza fikirî û analîzên mezin, wê bi xwe re çi dest xistiye? Pê re ustinlikekî û serkftineke derûnî pêşxistiye. Beramberî wê li gel me binkeftinek derûnî pêşxistiye. Em bi çi dixwazin vê binkeftina wan temam bikin, dema ku em karibin bibin weke wan, ne weke xwe, em wiha dixwazin wê derûniya xwe derbas bikin.

Ji bo wê hêza me ya rexnê tine ye, ji rexnê zêdetir lêgerînek teqlîd kirinê heye. Teqlîd jixwe pirsgirêkê çarser nake. Niha pirsgirêk çavkaniyê xwe di vir de ye. Mînak di Rojava de zanista derûniyê, sosyolojîk, ananletîk heye, yê xwezayî û yê civakî jî heye. Li ser wî esasî dewlet hatine avakirin û civak hatine bi rêxistin kirin. Sanaî pêş de ye, wê hiştiye ku li Rojava dîmenek derbikeve. Yanî îmacek derbikeve û bê mayende kirin, herwiha hêzek peyda bibe.

Wê demê di têkoşîna me ya ji bo şaristaniyek demokratîk, an jî modernîta demokratîk, di vê têkoşînê de em ê bi çi têbikoşin, perspektîfê me yê têkoşînê wê çi be? Perspektîfê me yê têkoşînê wê ev bin ku em karibin di hundirê vê sîstema modernîta hemûyê de nirxên însanî, bi zanistî, wijdanî, wan nirxên însanî derbixînin û ew nirxên însanî bi şêwazek hostayetî bi rêka akademî, lêkolînên demokratîk, em karibin bi nirxên civakî û çandî, yên ku kolektîvîzmê, komînalîzmê, hevgirtinê esas digire, exlaq esas digire, baş bi hev ve girê bidin. Bi awayekî serbixwe, li gorî mercên xwe, dîrok, çand û exlaqê xwe li gorî wê çêbikin. Em ê karibin serkeftinê bi vî rengî bi dest bixin. Yan jî em ê teqlîd kirinê esas bigirin.

Niha temambûyîn û ne temam bûyîn, di nav me de pirsgirêk e. Mînak ez kengê temam im, ez kengê xwe temam dibînim? Dema ku ez dibînim, bi îngilîzî bizanibim, dema ku şêwazê min yê jiyanê weke yê Ewrûpiya be, cil û bergên min, şêwazê xeberdanê, rabûn û rûniştin, nêzîkbûna min ji mijaran re ji dewletê re, ji civakê re dema hebe ez wê demê xwe temam dibînim. Dema ku ez wiha nebim ez xwe temam nabînim. Lê em bala xwe bidinê yekî îngilîz ji bo ku nizane Kurdî ji bo xwe kêmasî nahesibîne. Lê dema Kurdek nizanibe îngilîzî ji bo xwe kemanî dihesibîne. Li Kurdistanê dema ku bînayên bilind tune be, em dibêjin welatekî feqîr e. Yanî ji bo vê derbaskirina kaosê derBeaskirina krîzê heta niha em di rêka şaş de lê digerin.

Em çawa lê digerin? Em dibêjin dema em jî bibin weke wan, em ê kaosê derbas bikin, ev tiştekî pir çewt e! Ji ber çi wiha ye? Ji ber ku Rojava ti carî nirxên xwe nake gelemperî. Ji ber ku polîsek îngilîz di zemanê xwe de li Îngeltera beramberî hemwelatiyek Îngilîz, di esas dirûşê de disekinî, lê di heman demê de wî polîsî li Hindistanê însan dikuştin. Ev tê çi wateyê, tê wateya ku hinek nirx, mafê mirovan zanistî, hwd. Ev ji bo hemû cîhanê nederabadar e, belav nakin. Dema ku dixwaze weke xwe bike, di her warî de di çarçoveke ku ew dixwaze me jî weke xwe bike. Bi me re berxwariyê ( tesrfkariyê) pêşbixîne. Qalibên zîhnê yê li gorî xwe li ser me ferz bike, ev hemû ji bo em ji sermaya wê re bibin metodek vê dike.

Mînak, di Îraqê de pirtûkan belav dike, tîpekî ciwanan derdixîne, yê jinê derdixîne, yê pazarê derdixîne, înformasyonê derdixîne, tîpê partiyê siyasî derdixîne, li gorî wî tîpek derdikeve. Ev da ku ew tîp ji bo tevgera sermayê destdayî be. Ji bo vê derdixîne, ne ku wan bike weke xwe. Wê demê di vê pêşbaziyê de em nikarin bi ser bikevin. pir zêde mirov xwe û rastiya xwe wenda dike. Ji kokê xwe dûr dikeve. Ev ne rêka çareseriyê ye.

Wê demê divê em baweriyê bi xwe bînin. Niha pirsgirêka me ev e, wê baweriyê em ê çawa pêkbînin? Çavdêriyek li gel me heye, Rojava tê wateya pêşketinê, rojhilatî tê maneya paş ketinê û hovitiyê.  Vê li ser me bandorek mezin kiriye. Timî bêbawerî bê îrade bûn, tim li dahurînên wir digere. Mînak ji bo ku em analîzekî rast bikin, em bi hêza xwe nebawerin. Rewşenbîrên Rojhilata Navîn ji bo analîza şaristaniyê bikin parêznamên Rêberê tevgera gelê Kurd Abdulah Ocelan naxwînin. Kê dixwînin,

nizanim Handîktiyon dixwînin, Fokoyama dixwînin hwd, oryantelîstan dixwînin, Birnar Liwîs dixwînin, hwd, ji bo xwe nas bikin wan dixwînin.

Lê analîzê wan jî li ser esasê Rojava ye. Yanî îdîalîzekirina Rojava ye. Her çiqasî hinek rexne tê de hebin jî, lê rexne li ser wê sîstemê tine ye. Ferzkirina wê sîstemê ji bo ku bibe sîstemek cîhanî tê kirin. Ji ber wê yekê divê em bi xwe vê bawer bikin ku însiyatîf ji destê me derketiye, em ji xwe bêbawerin. Ji lewre ev yek li ser piratîka me jî nîşan dide.

Mînak niha welatê Kufrezê hene, Kendava Erebî, welatê wê hene Sudiye, Qetere, Kuête, ji nişkê ve dîtin ku li ser deryakî petrolê rûniştine, ev petrol ji bo cîhanê pir bisûd e, alem lê digerin, yanî di aliyê ekonomî de desthatiyekî pir mezin tîne, ji bo vê destpêkirin li ser esasê firotina petrolê û dest bi nûbûnekî kirin, nûbûnek mezin çêbû. Bajar avakirin, xanî ava kirin, tîcaret pêşxistin, serfkarî pêşxistin hwd, pêdiviya wan bi mirovên zana hebû, bi psporan hebû, mînak tiştek wiha çêdibe, du kes dema biçûbana Siûdiya Erebistanê ji bo karekî, her du jî endeziyar bana, her du jî yek zanîngeh xwendibana, li zanîngehên herî bi nav û deng xwendibana her du biçûbana Siûdiya Erebistanê ji bo kar yek jê Ereba yê din Îngilîz ba, heger mûçeyê yê Ereb hezar dolar ba, yê Îngilîz du hezar dibû. Di heman cihî de xwendine, ev bêbaweriya li beramberî însanê Rojhilata Navîn e, mirov dikare vê di hemû aliyên jiyanê de bibîne.

Mînak hinek endiziyarên mezin hene, li Sûriyê û cihên din jî tiştên balkêş hene, tezên wan derbarê hendesê de, bîrkariyê de, lê belê dema projek çêdibe, Sûriyê psporan ji derve de tîne. Bi perayekî mezin û bi kire jî wan tîne. Gelek nirxên civakê tên xerc kirin, ji ber çi? Tê nerînekî bidî yan erê yan jî na, ya rastî wê nerînê endeziyarê ku li Sûriyê jî pir rehet dikare bide. Heta hîna rast dikare nerînê bide. Ji ber ku rewşa wan welatan hîna baştir dizane. Lê bêhêvitiya li beramberî xwe ev tişt bi xwe re anîne. Jixwe ev li hemû meyîdanên jiyanê mirov dikare peyda bike, di aliyê keyayetî de, li her derî mirov dikare vê peyda bike. Ji ber wê elaqeya me li beramberî Rojhilata Navîn lewaz e. Em zêde elaqedar nînin. Em şoreşa Fransî baş fêm dikin nas dikin, ya Îngilîzî nas dikin, ya Emerkî nas dikin, hilbijartinek çêdibe, mîtingek çandî çêdibe, hunerî çêdibe em baş dişûpînin, lê di Rojhilata Navîn de cîhan xerab bibe jî, di wê derbarê de bala me nakişîne.

Heta di welatê em tê de dixebitin jî, welatê ku em pê re bi rengekî organîk elaqedar dibin, li Îran, Surî, Tirkiyê, Îraq û cîhana Erebî de Farsî de,Ecemî de, di van deran de derbarê pêvajoyên siyasî û civakî de em zêde agahdar nînin. Sîstema siyasî li ser çi esasê hatiye avakirin, çanda serwer di van civakan de çi ye, însanê wê bi çi bandor dibin, li dijî çi xwedî rayeksyonin, di vê derbarê de em zêde kûrbûnê bi xwe re çênakin. Ew jî ji wî mantiqî tê, ji bo wê dema em vê dersê nîqaş dikin di esas de tiştên divê ku em pêkbînin ji bo ku em karibin vê pirsgirêkê derbas bikin, wê neayîdbûna xwe mirov derbas bike, mirov hîna zêdetir ayîdê xwe bin.

## Sedemên Krîz Û Zîhniyeta Rojhilata Navîn

Di serî de em ê sedemên yekemîn û serke yên ku hiştine di Rojhilata Navîn de krîz çêbibin çi ne, em li ser rawestin. Di serî de jî zêhniyet, em ê li ser rawestin. Niha zêhniyet weke berê me digirt dest li gorî dîroka meteryalîmzê, li gorî nêzîkbûna îlmê civakî yê pozitîv me digirt dest. Me di guhertina civakan de roleke bi bandor nedida seresaziyê (üst yapı). Me guhertin di encama faktorên madî û aboriyê digirt dest. Lê rola zihniyetê di guhertina civakan de ji wê zêdetir xwedî bandor e. Ji bo vê jî ji pirsigirêkên aborî mirov bigire, yên siyasî û gelek xalên ku dibin sersebebê gel di Rojhilata Navîn de di nav krîzan de bijî, sedemê wê bi zêhniyetê ve girêdaye.

Ji ber ku dema zêhniyetek vekirî tine be, derfetên madî di wan welatan de çiqasî hebin bila hebin, ew derfetên madî heger di çarçoveya zêhniyetek rast de, zanistî de neyê nirxandin, dewlemendî, bilind kirina asta jiyanê di hundirê wan civakan neyê pêşxistin, negengaze mirov behs jî bike.

Rewşa heyî jî ev e, bi erdnîgariya xwe ya fireh, bi erda xwe ya çandiniyê, bi nifûsa xwe ya ciwan,  bi sererd û binerdê xwe yê dewlemend, esas divê standartê jiyanê, yê kesan di Rojhilata Navîn de di aliyê ekonomî de Keneda jî derBeasbikiriya, Singafor jî derBeasbikira hwd. Lê belê di roja me ya îro de em lê temaşe dikin bêtirî nîvê nifûsê di birçîbûnê de dijî. Ev ji nêz ve girêdayî zêhniyetê ye. Ji ber ku zêhniyet ji nêzîkbûnekî razber(suyut) bêtir, yanî ji têgihêştinekî wiha zêdetir di esas de yunlendiriciyê hundirîne. Yê ku liv û tevgera însanan ê kesan diyar dike. Liv û tevgera civakan diyar dike. Nêzîkbûna ji nirxan re, ya ji meselên madî re, ya jiyanê û bi gelemperî jiyanê çawa digire dest. Ev hemû li ser esasê qalibên zêhnî, yên ku ew civak qebûl dike, ew kes qebûl dike li ser esasê wê çêdibe.

Ji bo vê jî pirsgirêkên zêhniyetê di aliyê peydabûna kaosê li Rojhilata Navîn krîza lê dijî mirov nikare wiha sedemekî besît bigire dest.

## Dogmatîzm Çi Ye?

Zêhniyet ji bo ku mirov vê meselê baş fêm bike girîng e. Em ê li ser dogmatîzmê rawestin. Dogmatîzm ew nêzîkbûnên ku ji nîqaşan re girtî, nêzîkbûnên derbarê meselan de yên ku ji nîqaşê re, ji lêpirsînê û rexnan re girtiye. Yanî weke heye tu neçarî qebûl bikî. Li gorî xwebûnê ye, mirov li gorî tiştên hey qebûl bike. Dogmatîzm meTUDEHê fikir yê li ser esasê ragihandinê ye, ne li ser esasê lêkolîn û aqil e. Yanî li ser esasê tenê tu radigihînî. Kalikê te ji bavê te re wiha dibêje, bavê te ji te re wiha dibêje, bi vî rengî berdewam dike. Tê de lêkolîn, lêgerîn lêpirsîna aqil yanî di ezmûna aqil re derBeasnabe.

Herwiha tiştên ku esas tê qebûl kirin jiberkirine, qebûl kirin û ragihandin esas e. Ji bo vê dogmatîzm rê li pêşiya guhertinê digire. Niha di Rojhilata Navîn de dogmatîzm pirsgirêkek cidî ye. Dogmatîzm tenê di Rojhilata Navîn de heye,

na li her derê heye. Em jî heta astekî dikarin dogmatîk bin, ji ber çi? Heta astekî dogmatîzm dibe ku pêwîst be jî. Di kîjan çarçoveyê de pêwîst e, mînak ez îro îdiayekî dikim, lêkolînê dikim, rewşa hey êdî aramiyê nade, rewşa hey êdî nema tê qebûl kirin, li dijî rewşa hey ez hewildanekî dikim, ji bo derBeaskirinê hewildanekî fikirî û yekî piratîkî dikim. Ez dibêjim ev hewildan rast e.

Ji bo vê ez ergomanan peyda dikim. Da ku ez ên derdûra xwe îqna bikim, jixwe ev heta astekî dogmatîzm e, lê divê ku her demê rê û rêbazê xebatê derfetekî bihêle ku em karibin meTUDEHên xwe di ber çavan re derbas bikin. Zanistiya xwe di ber çavan re derbas bikin. Her demê agahiyên xwe bi rewşa hey re bînin beramberî hev, wan bi hevu re bipîvin ka gelo rast e, yan ne rast e. Divê em wê derfetê bidin.

Dogmatîzm ewqasî zêde dibe û dihêle ku em wê derfetê nedinê. Muhafizekar dibe, li gorî xwe dibe, tiştê hey ji nedîtî ve nêzîk dibe weke çawa ku tine be nêzîk dibe û li ser ya xwe îsrar dike.

Jixwe di roja me ya îro de zanista pozîtîv jî di Rojava de dogmatîzm e. Ew jî tiştekî xerab e, lê li Rojhilata Navîn pir xerab û bandora wê ya mezin li ser tevgera civakê çêdibe. Nahêle civak tevbigere û pêşbikeve, weke ku bi zorê dixwaze di cih de bide rawestandin. Ev ji çi tê? Balkêşe dibe ku aliyê me yê erênî jî hebe, lê ger em karibin di asta mêjî de volqanekê çêbikin, hîna wê zêdetir orcînal be. Ev weke aliyê wê yê erênî ye, lê di roja me ya îro de aliyê wan fikrê Rojava yê neyînî temsîl dike. Çi ne ew tiştên neyînî ku temsîl dike. Rojhilata Navîn cih û warê destpêkirina gelek tiştan û çêbûna wan e. Di vir de fikir bi cih bûn, desthilatdarî li vir derketiye, dewletbûyîn di vir de çêbûye, mîtolojî, dîn hwd, yanî xebatên fikirî û piratîkî li vir xwe nîşandane.

Di esas de em bala xwe bidinê di cîhanê de jî tiştekî wiha zêde cuda di aliyê cewher de mirov nikare bibîne, huquq, bîrkarî, dewlet, avahiyên dewletê, sazî, desthilatî, heta îlmê xwezayî, hemû ji vir derketine. Niha ev derketin tiştê wiha biçûk nînin. Em bala xwe bidinê însanên Kurd rojekî ji rojan hay ji fikirê azadiyê, serxwebûnê, agno zanistiyek me tine bû, ji nişkê ve mînak dema em bînin bîra xwe hevalê ku destpêkê manefstû xwendibe pirtûka “Rêka Şoreşa Kurdistanê,” dema pirtûkê dixwîne weke ku her tiştekî ji nû ve di wir de bibîne. Weke çawa xelekên xwe yên wendayî bibîne. Cihîna wan a ruhî jê re aramî peyda dibe.

Wiha weke ku ji kelecanê canê mirov gurîzek bigire, bi vî rengî mirov bi heyecanekî dihese. Ji ber ku her tişt di wir de nû ye û tu nû dibînî. Wê demê ew tişt ji bo te dibin tiştên pîroz, tu naxwazî derBeasbikî. Ji ber ku tu heqîqetê di wir de dibînî.

Ji lewre em bala xwe bidinê însanê ku weke ku ji rewşekî pîrîmata hatibe weke ku ji rewşekî lawirî derketibe û vê carê derbarê rêxistinkirina jiyana xwe de bigihêje agahiyê, dîn, exlaq, eruf û edet, zanistî, bigihêje van tiştan, ev hemû tiştên pir mezin û balkêş in. Ji bo vê bi rengekî piroz qebûl dike, dibe parçek jê ji

lewer naxwaze dev jê berde û nikare dev jê ber de. Di Rojhilata Navîn de çavkaniya dogmatîzmê ev e, ji ber ku ev mijarên destpêkê ne.

Em bala xwe bidinê li cihekî din dogmatîzm bi vî rengî serwer nabe. Ji ber ku weke versyona ye. Rê û derfetên menavera yê ku karibe li gorî xwe, li gorî berjewendiyên xwe teşe bike tê de heye. Mînak, mîtolojî di Rojhilata Navîn de jî heye, di Girêk û Roma de jî heye. Lê mîtolojiya Girêk û Roma mîtolojiyekî hîna zêdetir însaniye, yanî hîna zêdetir hêza însan tê de heye, însan hîna zêdetir dikare li gorî mercên jiyana xwe teşe bidiyê, heta carna red bike û qebûl jî neke. Li dijî îrada wê derbikeve, ev hemû li gorî berjewendiyên xwe pêk tîne. Lê di Rojhilata Navîn de wiha nîne.

Di Rojhilata Navîn de mîtolojî heqîqet bi xwe ye. çavkaniya heqîqetê ye. Yanî ji bo her tiştekî her tevgerekî sedemên jiyanê ji bo xwe peyda bike, îfada xwe di mîtolojiyê de dibîne.

Ji bo vê mîtolojî îlmê destpêkê ye, yanî îlmê yekemîn e. Mînak di dema ku weke roja me ya îro bîrkarî, fîzîk, kîmya pêşneketibû, însan encax serê jiyanê mirin û çêbûnê, heta gav bi gav îfade kirina nakokiyên di navbera çînan de, derketina otorîta, dewletbûyîna van otorîtan encax dikarîbû di hundirê mîtolojiyê de xwe îfade bike. Bi mîtolojiyê îfade bike. Yanî dema ku meTUDEHên îlmî hîna pêş neketibû mîtolojî her tişt îfade dikir. Ji bo vê weke ku çawa di roja me ya îro de dema ku em bixwazin rastiyekî bînin ziman divê ku em keşfekî biyolojîk, fîzîk, kîmya rengereg em îlman ji bo xwe bikin referans, wê demê divê di mîtolojiyê de îfada xwe bidîtana, diviya bû sedemên rastiya xwe di mîtolojiyê de bidîta. Yan jî ne rastî bû, ne heqîqet bû, kes nikarîbû wêrekiyê jî bike da ku îfade bike.

Ji bo vê dogmatîzm di Rojhilata Navîn de zêde kûr e. Heta, di dema kevin de di Rojhilata Navîn de dogmatîzm nayê guhertin, tê îmah kirin. Mînak, Babil reform tê de çênabe, Asor reform tê de çênabe, Akad reform tê de çênabe. Yan heye motleq heye, yan jî bi temamî hildiweşe. Derfetên nîqaşê tê de tine ye, lêpirsîn, lêkolîn, lêgerîn, rexne kirin, nirxandin tê de tine ye, her tişt tê de motleq e.

Ji ber çi? Ji ber ku ew meTUDEHana perspektîfê jiyanê dane însanan. Jiyana însanan hîna zêdetir kirine dozenê, hîna zêdetir derfetên mayînê jê re peyda kirine. Xwarin-vexwarin, parastin jê re peyda kirine. Ji lewre vê ji bo xwe weke mizgîniyekî dibîne. Weke parçek jiyana xwe dibîne. Bi wê rastiyê re dibe yek, dibe tiştekî motleq.

Em bala xwe bidinê di roja me ya îro de, gelek hawidan çêbûn, çep, miliyetgerî hwd, da ku li şûna dîn cihê xwe bigirin, heman heman nikarîn cihê dîn bigirin.

Ev ji ku tê, binêrin hinek tişt divê ku mirov di zemînê wan yên madî de bigire dest û mînakê wan di roja me ya îro de jî

mirov dikare destek bibe. Em ferz bikin ku mirovek li gundekî be, ew gund felsefek wî ya jiyanê hebe, wiha radibe, wiha rûdinê, xeber dide, dixebite, wiha nêzîkî dê û bavê xwe dibe, nêzîkî ciranê xwe jî dibe û derdorên xwe jî dibe. Teşeyekî wiha digire û di gund de xwe wiha pêk tîne, ev însan piştî demekî çû Ewrûpa, yan jî çû bajaran û ji wî zemînî dûr ket, piştî demekî dema tu wî însanî dibînî, tu dibêjî ev mirov hatiye guhertin, lê yên li gund mayî hîna weke xwe ne. Sedemên vê çi ne?

Ji ber ku niha mînak gelek pirsgirêk hene di vê xalê de em dibêjin destpêk her dem di Rojhilata Navîn de çêbûne, di mezobotamiya jêrîn, derdora çemê Nîlê çêbûne. Heta beriya wê di Hilala Zêrîn de, yê Zagros û Torosa qada ku şoreşa Neolotîk tê de çêbûye, bi vî rengî weke cihûk-cihûkên avê xwe ber bi çemên mezin dane û li Mezebotamiya jêrîn bûye şaristanî. Bi wî rengî li cîhanê belav bûye.

Heger mirov bêje temam û her tişt destpêka wê ji Rojhilata Navîn dest pê dike, wê demê çima vê herêmê însiyatîf wenda kir? Heger Yunan ji me fêr bûn, çima em ji wan pêşdatir nebûn?! Sedem ev e, niha tiştek di zemînê xwe de mehkumê hinek nirxaye, dibêjin deyer yargî, mehkumê wê teşegirtinê ne. Ji wê nikare derbikevin, ne serbest in.

Ji bo vê însanek li rojhilat mezin bûbe, teqlîd dike, jiber dike, sîstema hey nifş bi nifş xwe diparêzin li ser esasê wê perwerdan dibînin, di malbatê de, di dewletê de, bi vî rengî xwe timî dubare dikin.

Lê dema mirovek ji zemînê Rojhilata Navîn derdikeve û diçe cihekî din, yan jî ji derve de lê temaşe dike, wê demê ew mirov çi dibîne? Di wir de li gelek berhemên baş dibîne avahî, astronomî, bijîşkî, endziyarî, bîrkarî... Ev tiştên ku em dibêjên hemû yên baş in. Lê her timî xwe dubare kirin heye. Ji ber çi xwe dubare dike? Ji ber çandeke wê/î ya civakî jî heye wan mehkumê dubarekirinê dike. Wiha çêbûye, wiha jiber kiriye, wiha jî berdewam dike. Heger wiha neke nikare bijî, ew urf û edet wî/ê diavêje. Mehkumê mirinê dike. Ji ber vê yê/a ku ji derve ve binêre çi dike, tiştê baş ji bo xwe digire, lê ne mehkumê teqlîdkirina wî şêwazê jiyanê ye. Ne mehkumê teqlîdkirina wan liv û tevgeran e. Ne mehkumê heman kopyayê ye, lê dikare wan tiştên baş ên girtî li gorî mercên xwe pêk tîne.

Eşkereye ku zaniyarê mezin yê ku rê li pêşiya bilindbûna Rojava, rê li pêşiya derbaskirina şeristaniya Rojava vekirin, yên weke Tals, Pîtagos, ev kesana li Babil, Misrê, fêrî astronomiyê, endeziyariyê, bîrkariyê û gelek tiştên din jî bûn. Lê belê van weke mirovekê/a Rojhilata Navîn kopya nekirin. Li gorî şert û mercên welatê xwe asîmîle kir, tiştên ji wan re bi sûd bûn pêk anîn.

Ev serbestbûn dihêle ku tiştek ji eslê xwe zêdetir pêş bikeve. Yanî esl çiqs e, koka wê çiqsî rojhilatî be jî, lê di Rojava de hîna zêdetir pêkhatin çêbûye. Ferq çiqasî di navbera Îngeltira û Emerîka de jî hebe, cewazbûnek zêhniye. Em bala xwe bidinê Emerîka mêtingera Îngeltira bû, Emerîka ji aliyê Ewrûpiyan ve

hate dîtin. Ew çûn di wir de bi cih bûn hikum kirin, ji bo xwe kirin mêtingeh, lê em bala xwe bidinê di roja me ya îro de Emerîka tenê bi dewlemendiya xwe ya madî, siyasî, hêza xwe ya fikir ji hemû cîhanê bihêztir e. Ji Îngeltira û Fransa jî bihêztir e.

Sedem çi ye? Sedem zêhniye, ji ber çi, ji ber ku meTUDEHê jiyanê yê ku însan Emerîkî ji Ewrûpa çû wir bi cih bû meTUDEHê jiyanê yê ji bo xwe esas girtin bi deyer yargiyê Ewrûpiyan nehatibû çêkirin. Bi felsefekî din hatibû çêkirin. Bi nêzîkbûnên nû yê Engilo-protestan ê li ser esasê ezeziyekî zêdetirîn, pragmatîzmekî zêdetirîn, li ser esasê sûda wî di ku de ye, tenê li ser bingehê sûda wî tenê, çawa dikare bijî, çawa dikare serbest be pêkanî. Ji ber vê ev desthilatdariya mezin bi dest xwe xist.

Yekî bêje mêtingeha Îngilîzan bû çawa ji Îngilîzan mestir bû, zanetir bû, dewlemendtir bû, ev hemû ji ber vê yekê ye. Ji ber ku însanê Emrîkî dema ji Îngiltera derketin, ne tenê weke fîzîkî derketin. Bi rengê ruhî jî ji Ewrûpa derketin. Ew nirxê ku li Ewrûpa, ew qeyd kirin, ew nirxanan ji bo xwe esas negirtin. Jiyana xwe li gorî berjewendiyên xwe eyar kirin.

Lê em bala xwe bidinê Kanada jî wê çaxê hate dîtin, Meksîka jî wê demê hate dîtin, Arjantîn jî, Berazîliya, Çîlî jî, ev hemû bi hev re hatin dîtin. Lê çima ew li paş in, çima welatên yekbûyî yên Emerîka li pêş in? Ji ber ku kesên zêhniyeta ku însanê Emerîkî bi rê ve dibe, zêhniyeta Angilo-protestan yê ku li ser nirxê ezeziyê, pragmatîst hatiya avakirin.

Ev bûye yê ku xwe ji hînbûn û elimandinên kevin tecrîd kiriye, (dûr hiştiye), tenê di çarçoveya berjewendiyên xwe de tevdigere. Ji bo vê yekî Yewnanî bên ji Asûran tiştekî bialimin, naçin weke Asûran najîn. Wê weke xwe bijîn, lewre ew tiştê ku ji Asûran dialimin di nav de weke ekleme na, weke sinercî çêdike. Yanî weke tiştekî lê zêde bike na, weke sinercîkî mezin çêdike. Qat bi qat wê mezin dike.

Ji bo vê di astê teqandinê de meznahîkî çêdikin, şaristaniya Rojava li beramberî ya Rojhilata Navîn di asta teqandinê de guhertinê çêdike. Ev niha girîng e.

Wê demê divê em pirsgirêkê di zêhniyetê de bigirin dest. pirsgirêka zêhniyetê çi ye? Em ê zêhniyetê bi rengekî dogmatîk di çarçoveya pîrozkirina alimandinan de bigirin dest, yan jî her demê qalibên xwe yên baweriyê yanî yên di hundirê mejî de û liv û tevgera xwe ya jiyanî bi tiştên zanistî re moqarene bikin (kariştirleştirme) bikin; bi vî rengî em ê bijîn?

Mixabin heta niha em bi jiberkirinê dijîn! Yan bi kopyakirina tiştên derve, yan jî bi alimandinên kevin, bi hêza urf û edetan em dijîn. Ev her du jî guhertinan baş çênakin. Ji bo vê zêhniyet her tiştî diyar dike. Rewşa ekonomî jî diyar dike. Em bala xwe bidinê Ereb, muslixê ptrolê qut bikin wê Rojava dîn bibe, ji hal de bikeve. Lê em bala xwe bidinê çavkaniyên madî tevî

ku di destê wan de ne jî, lê pir li paş de ne. Wê demê tenê çavkaniya madî têrê nake ku mirov tenê pêşketinê çêbike.

Zêhniyeta rast dikare çolê bike cinet, lê zêhniyeta çewt dikare cinetê biqulêpe çolê, bike cehnem. Ji bo vê di aliyê mijarê zêhniyetê girînge ku mirov baş li ser kûr bibe. Zêhniyet qalibin hatine danîn bi hêza îdeolojî, dînê Yekxwedayî û bi saziyên dewletê xwe bi zorê bi cih kirine û ew li pêşberî pêşketinê dibe asteng. Di vî aliyê de hewildanên derbaskirinê çêbûn, ew hewildan çima bi ser neketin, em ê li ser wan jî rawestin.

## Pêşketina Fikir Û Mîtolojiyê

Çima hewildanên derBeaskirinê yê zêhniyetê bi rengê tevgera ronansesê, rafermasyon û ronahîbûnê di Ewrûpa de karîbû dogmatîzmê derbas bike. Lê li Rojhilata Navîn her demê bi binkeftinê û bi boyerên tiracik re rû bi rû ma?

Di xebata fikirî de bi gelemperî merheleyên wê hene. Di merheleyeke wê heye ji bo pêşvaçûnê û tevlîbûnê nîşan dide. Yanî rê li pêşiya pêşvaçûnê vedike. Ji bo vê jî rolekî erênî dileyîze. Di hinek merheleyan de jî rolekî paşverû dileyîze. Yanî ji bo pêşvaçûnê astngan nîşan dide. Ji ber çi wiha dibe? Ger niha me behsa mîtolojiyan bikin, di esas de ji bo pêşxistina fikirê însanan, însanbûnê, civakêbûyînê rolekî baş dileyîze. Seretayî ev di encamê de ew jî weke çawa îro kîmya, fîziya, ji bo çareserkirina hinek pirsgirêkan, bilind kirina asta zanebûna însanan çi rolê dileyîze, mîtolojî jî heman rolê dileyîze.

Dixwaze şerê hey çareser bike, tiştê nayê fêm kirin, nayê zanîn, gerdûn çi ye, çawa çêbûye, însan çawa çêbûye, têkiliya di navbera mirin û jiyanê de çi ye, ji wê û bi şûn ve têkiliya di navbera însan de, însan bi xwe û xwe, însan û xwezayê de nîşan dide. Ji bo vê mîtolojî lêgerîna rastiyê û derxistina heqîqeta wê ye. Heta ji bo xelkê xwe û cihê lê derketî û ji bo însanên xwe heqîqet bi xwe ye, çavkaniya heqîqetê ye.

Zimanekî îşaretan sembolan dixebitîne. Yektiya jiyanê nîşan dide. Di mîtolojiyê de mirov dikare vê rehet bibîne aheng û baxên organîk di navbera însan û heywan, daristan û heywan, yanî ev tiştê ku em jê re dibêjin zindî û ne zindî, di esas de di wir de. Yanî xwezaya jiyanbûyî tê nîşandayîn. Dibe ku di serî de bi rengê xwe yê animîzmê weke çawa di her tiştî de jiyan heye û dijî, wer tê destpêkirin.

Lê di mîtolojiyê de hîna zêdetir ev derdikeve holê. Mirov rehet dikare van tiştan hîna bi awayekî hêsan di mîtolojiyê de bibîne, ka çawa mirov ji zimanê daristanê fêm dikin. Daristan jî zimanê însan fêm dikin. Însan û lawir jî dikarin ji hev fêm bikin.

Bêguman divê ev bi rengê ku çawa heye mirov fêm neke. Di encamê de îşaretin, tiştekî îfade dikin. Ne wiha valatiye û zimanekî mucerede, razbere yan jî ti têkiliya wê bi jiyana madî re

tine ye. Lê belê jiyana madî ya hey bi rengekî madî bi rengê îşaretan nîşan dide.

Dîsa di mîtolojiyê û rastiyê de berxwedana însan li beramberî krîza, çi yên xwezayê bin, çi jî yên civakî û çandî bin, mînak dema ku em dibêjin di mîtolojiya Sumeran de têkoşîna Înana ji bo mafê xwe, qanûnê xwe, yên bi rengê "Me" tên zanîn, dîsa leaneta Akada, weke çawa lorîkên ku Sumeran li dijî binkeftina bajarê xwe yê pîroz Nîpor re nîşan dane.

Di gelek tiştên din de jî nerazîbûn rayeksyon beramberî zilmê zordestiyê, zordariyê derdiket pêş. Di encamê de mafê mirovan azadî, wekhevî, lêgerîna van bênavber ji aliyê însan ve yê ku bênavber her dem heye, ev têkoşîn mirov dikare di mîtolojiyê de jî bibîne. Ji bo vê têkoşîna însan a ji bo azadiyê, hazir bûn û amedebûna însan ku li beramberî azadiyê tiştê giranbiha bide, tiştekî di roja îro de derketiye nîne. Ev ne şoreşa sosyalîste derxistiye holê, ne jî şoreşa rizgariya gelan derxistiye holê, ne jî şoreşên demokratîk ên gelan di serdema sedsala 18-19.de li Emrîka û Ewrûpa derxistine holê.

Ev lêgerîna azadiyê weke têkoşînekî bênavber a însan e. Ev di mîtolojiyê de jî diyar dibe. Lê belê mîtolojî, di heman demê de çi ye? Yanî jiyana mirovan jî rêxistin dike, têkiliyê di navbera însan de jî diyar dike. Lê pirsgirêk di vir de ye, însan dema ku digihêje wê asta ku zanibe di rêka mîtolojiyê de nema karibe pirsgirêkên xwe îfade bike, yan jî mîtolojî formîlekî rast ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwe nema pêk tîne, li şûna wê derbas bike, lêgerînên xwe vê carê seqet dike. Yanî li şûna ku mîtolojiyê derbas bike, lê belê mîtolojiyê derBeasnake, lêgerînên xwe bi sînor dike. Wer teslîmî têştên heyî dibe. Dogmatîzm ev e, ev di Rojhilata Navîn de pir balkêş e. Yanî însan bi çavên xwe rastiyê dibîne, lê ji nedîtî ve tê. Ji ber çi wiha ye? Ji ber ku dema bibîne, wê demê tiştên di serê wî de hey şaş dibin û ew naxwaze wan berde. Ji ber ku ew nirxekî wan ê pîroz e. Di vir de pirsgirêk heye.

Pirsgirêka duyemîn, mîtolojî tenê fikirekî azad nîne, her demê nîne, tenê rêka çareseriyê ji bo însanan nîşan dide nîne. Tenê pirsgirêkekî însan nikare bersivê bide. Di serdemkê de wiha ye. Lê jê û bi şûnda dibe desthilatdar. Dema ku dibe desthilatdar pirsgirêk derdikevin, mînak niha ez fikirekî bêjim, hevalê din fikrekî dibêje hwd, ev ne pirsgirêk in. Ev dewlemendî bûne. Gengaz e mirov di encamê de karibe hinekî zêdetir bighêje rastiyê encama fikrê curbecur hîna rehetir bigihêje rastiyê. Wê demê zêde zerera fikirê nîne.

Kîjan demê zerera fikiran çêdibe? Dema ku fikir bi desthilatdariyê re dibin yek, zerera wan çêdibe. Bi taybetî fikirê mîtolojî, dînî, di roja me ya îro de jî zanistiya pozîtîv vê rastiyê nîşan dide. Ji ber çi wiha dibe, her xebateke fikirî li gorî xwe bawer kiriye û gihêştiye heqîqetê. Yanî heqîqet girtiye destê xwe, motleq heqîqet girtiye destê xwe. Kes nikare vê pê re nîqaş bike.

Lê belê dema desthilatî ne di destê wê de be, tê jê re bêje; ev tiştê tu dibêjî ne rast e, ez bi vî rengî heqîqetê dibînim. Wê ew

bêje temam, lê dema desthilatdarî di destê wî de be wê bêje; çênabe tu şaş di fikirî, heqîqet ev e. Bi saziyên desthilatdariyê heqîqetê bi rengekî motleq li ser her kes ferz dikin. Ên ji deve de derkevin bi zagon û quralên cuda cuda tên mehkum kirin. Pirsgirêk di vir de derdikeve pêş, şekilgirtina dewletê jî li ser vî esasî hatiye çêkirin.

Tabî çima ev pirsgirêk di Rojhilata Navîn de heye? Gelo her derê mîtolojî tine bû, na hebû! Li her derê dîn tine bû, hebû! Herwiha li her derê felsefe jî hebû, li Yewnan, Roma û Ewrûpa jî hebû. Lê çima ev di Rojhilata Navîn de dibe pirsgirêk? Mirov neçar e, careke din vê meselê bi nav bike; Rojhilata Navîn çavkaniya van tişta ye. Mînak dînê Yekxwedayî li Ewrûpa derneketiye, Yahûdîtî, Xiristiyantî jî, Misilmatî jî hemû jî li Rojhilata Navîn derketiye.

Cudatiyekî cidî di navbera wan de tine ye. Di meselên civakî, exlaqî û baweriyê de cudatiyek cidî tune ye, çavkanî yek in. Mînak misilmantî, xirstiyantiyê red nake, Xiristiyantî yahoditiyê red nake, tenê ne wiha jî, pirtûka wan a pîroz jî yek e, yek bi navê “Ehdê Qedîm, ya din jî bi navê “Ehdê Cedîd,” yanî Tewrat û Încîl bi vî rengî tên nasîn.

Weke du merheleyan didin nîşan dan. Yanî di vir de çavkanî ev e, di vir de mezin bûye. Jixwe jî ji sifrê dest pê nekiriye. Mînak dibêjin; Tewrat weke axavtinên Xwedê ye, yanî Încîl axavtinên Xwedê ye, Quran jî weke axavtinên Xwedê tê naskirin. Lê belê ku pişt re erkolojî nîşan da hinek belge derxistin holê ku ew tiştên di Tewratê de jî, weke agahî nîşan daye, ji tofanê bigire û heta gelek meselên din jî, çêbûna însan, nêzîkbûna ji jinê re, ev belgana û agahî bi rengekî nivîskî di demekî wiha de hene, heta beriya wê jî hebûne. Ew dema ku ji Adem kevintir. Dîroka ku Tewrat ji dema Adem digire dest û çêbûna însan jê re nîşan dide, ji wê kevintir belge hene. Heman agahî tê de hene.

Wê demê ev dîn jî wiha bi rengekî razber, pêxemberek wehî hate ser, ji cem xwe derxist, ev agahî berê tine bû, xebera kes jê tine bû, ev jî ne rast e. Ji ber ku her kes wiha zanîbû ku yekem agahiyên derbarê tofanê de di pirtûkên semawî Tewrat û Quranê de heye, lê belê dema ku destana Gilgamêş bi rengekî tesadûf hate keşifkirin ku ew jî bi rengekî zêdetir xweş behsa tofanê dike. Wê demê ne Nûh heye, ne jî Adem hey, ne kesek din.

Wê demê ev zincîra fikirê çavkaniya wê vir e. Destpêkê di mîtolojiyê de, dîn bi rengekî din şekil dayê, ev jî bû nasnama însan. Em bala xwe bidinê her tiştê ku însanê Rojhilata Navîn jê fêm dike bilêvkirinên pirtûka dînî ye, zû jê fêm dike û pirsgirêkê pê re nakşîne.

Ji bo vê di dema ku tevgera milyetger, ya sosyalîst û gelek bizavên fikirî yên din jî zorîkî cidî kişandin da ku karibin xwe bigihênîn girseya gel, lê mirov temşe dike xîtaba dîn ewqasî zoriyê nakişîne, ev xaleke.

**Li Rojhilata Navîn Derfetên Reformê Û Pêşketina Dînê Xiristiyantiyê**

Ya duyemîn ji ber ku çavkanî ev e, derfetên reformê tê de çênabin. Niha dema ku ez însanekî ne ji vê herêmê bim û ez li ser esasekî nirxên çandî yên cuda hatibim mezin kirin, dema ez lê temaş dikim di îsalmê de tiştên baş hene, ez dixwazim weke bawerî Îslamê ji bo xwe esas bigirim. Ez bixwazim, nexwazim weke kesek Ereb, Kurd, kesek vê herêmê ez ê Îslamê negirim dest. Ez ê hinekî jî li gorî taybetmendiyên xwe li gorî şertên ez tê de dijîm bigirim dest.

Di wir de derfetên reformê zêdetir heye, derfetên mirov zêdetir reforman bike zêdetir e. Lê mînak yek dema Îslamê ji bo xwe dike nasname, nasnama wî/ê, ew bi xwe ye. Ji bo vê dema tu dixwazî nêzîk bibî, reform bikî û biguherî, rayeksyonan nîşan didin. Nerazîbûnekî cidî nîşan didin. Wiha qebûl nakin, ev di taybetmendiyên dînî dogmatîk di vê herêmê de diyar e.

Niha di vir de ferq û cudahiya wê û Ewrûpa dema mirov bigire dest mirovê çi bibîne? Niha Ewrûpa bi gelemperî dînê Xiristiyantî qebûl kir. Lê belê ev xirstiyantiya li Ewrûpa jî çawa çêbû? Ev jî girîng e mirov fêm bike.

Xiristiyantî navenda wê Rojhilata Navîn e. Bi taybetî Yahûdiyên tarîqeta Esenî, dîtin ku êdî Yahûdî nema dikarin pirsgirêkên însanan çareser bikin, êşên însanan nikarin hêmbêz bikin û êdî nema dikarin ji bo hemû însan hêvî bin, Yahûdîtî dînekî qewmî bûye, teng bûye; di gelek aliyan de însanên derveyî xwe nikarîbûn hêmbêz bikin û jê re bûbûya çare jî, ji bo vê Xiristiyantî derket pêş.

Xiristiyantî dînekî ji aliyê sîstema desthilatdar ve qedexe bû. Li dijî wî şer dihat kirin, Xiristiyan dihatin mehkum kirin, lê tevî vê jî bi hewildanekî mezin ev dîn belav bû.

Bi giranî li ku belav bû? Di Rojhilata Navîn de belav bû. Yanî li Asya biçûk weke Tirkiya niha, li Misrê, li welatê Fars, Xiristiyantî li van deran belav bû. Li Ewrûpa jî belav bû, lê ne weke çawa li Rojhilata Navîn belav bû.

Împeratoriya Roma pirsgirêk jiya, çi bûn ev pirsgirêkana? Bi taybetî jî Rojava pirsgirêk jiya. Êrîşên qebîlên Germenan li ser wan çêbûn, qismek jê ji împeratoriyê qut kirin. Yên Englozseksona çêbûn, wan jî qismek jê qut kirin, di encamê de pir biçûk dibûn. Beramberî êrîşên derve de nema dikarî li ber xwe bida ba. Di hundir de jî êdî weke dewletekî wisa di zemanê xwe de Paksa Romana (Aştiya Romayê), îstikrar ewlekarî, têr xwarin êdî li her derê nema dikarî belav bikira, lewaz dibû. Ji bo vê encax qada vebûnê împeratoriya Roma dikarîbû rojhilat navîn vebûya. Li ser vî esasî di sala 300-310'an de biryar girtin ku împratoriyê perçe bikin, da ku bijîn ev împratorî parçe wê bikiribana. Împeratoriya Roma rojhilat ya ku paşê navê wê bû Bîzans, ew jî navê Bîzansa pişt re dîroknasan lê kiriye, împratoriya Roma ya rojhilat çêbû û împratoriya Roma Rojava dihat.

Jixwe împratoriya Roma Rojava di ber bi tesfiyê ve diçû. Bandora wê êdî zêde nemabû, dewlet çêbûbûn. Îngilîz çêbûbû, German çêdibûn, yanî li dijî mentiqê nifûsa wê hinek hêzên din serwer dibûn. Heta vê demê Xiristiyantî qedexe bû. Di hemû Roma de Xiristiyantî qedexe bû. Çima wiha dibe, ji ber ku Xiristiyantî Xwedayên hey red dike, Yekxwedayî qebûl dike. Ji derveyî vê jî Xiristiyantî têkiliyê di navbera însanan de şaş dibîne, li ser esasê hîna zêdetir wekhevî û edaletê bi prensîbê biratiyê, dixwaze pirsgirêkên civakî çareser bike.

Dema ku navenda împratoriyê berê xwe da rojhilat, bi taybetî di dema împratortiya Konsantîn de, Konsantîn dît ku hemû mirov Xiristiyanin, Xiristiyantî bihêz dibe. Lwre Konsantîn çi kir? Biryar girt ku bibe Xiristiyan, ji ber ku eger nebe Xiristiyan, tevî zemînê hey jî nikare hikum bike. Wê demê împratoriyê ji holê radike. Ji bo vê Xiristiyantî qebûl kir.

Istenbûl ji bo xwe kir paytext, jixwe wiha paytext ma heta sala 1453'an heta dema Osmaniyan ji wan standin, ew paytexta Roma rojhilat ma. Navê bajar jî heman navê Konstantîn bû, ev yekem navê împeratorê Roma rojhilate.

Kostantîn di sala 325'ê PZ'ê, civînek ji rahiban û dîndarên Xiristiyanan re çêkir. Di hundirê vê civînê de Xiristiyantî bi rengekî resmî weke dînê dewletê hate qebûl kirin û împrator Kostantîn jî ew dîn qebûl kir. Lê ew dîn çawa qebûl kir? Ew dîn bi vî rengî qebûl kir, mînak di mîtolojiyê de dibêjin; yek hebûye li ser cihekî disekinî dema ku însanek bigirtiba ew ceza dikir. Cezayê wî çawa bû, textek wî hebû û li gorî pîvanê wî textê xwe însan dipîva, dema însanek ji wî textî dirêjtirba ew jê dikirin, lê dema kintir ba ew dikişandin. Lê ti carî textê xwe nediguhert.

Di esas de împratorê Roma heman tişt li Xiristiyantiyê kir. Di rastiyê de nebû Xiristiyan, lê Xiristiyantî li gorî mayendebûna dewletê eyar kir. Li dijî derketiba çênedibû, ji ber ku Xiristiyantî bûye potyensalek mezin. Her kes Xiristiyantî qebûl kiriye, lê nebûye desthilatdarî. Bi qedexekirinê, kuştinê, tine kirinê nema karibû rû bi rû li hemberî Xiristiyantiyê bisekine û ji ber wê yekê qebûl dike, lê dema wê qebûl jî bike ew prensîbên wê yên wekhevî, azadî, însanî, mirovheziyê ger qebûl bike wê demê sîstema xwe red dike. Ji ber vê yekê Xiristiyantî li gorî sîstemê hate eyar kirin.

Xiristiyantiya îro em nas dikin ev e, her demê li gorî sîstemê hatiye eyar kirin. Di sala 325'an de di wê civînê de her tişt bi dengdanê çêdibe. Mînak, Îsa Xwedê ye, yan jî ne Xwedê ye, ev jî bi dengdanê çêbû. Ji ber ku heta wê demê Xiristiyanan nedigotin ku Îsa Xwedê ye, digotin pêxember e û însan e. Lê eger Îsa bibe Xwedê hîna zêdetir di urf û edetên dînî, yên împratoriya Roma dibin xwedî her tişt. Ji lewer bi dengdanê Îsa bû Xwedê.

Di wê civînê de gelek kesên li dijî derketin jî hebûn, lê nêrîna resmî wiha derket. Ji bo vê Xiristiyantî dejenere bû. Ji taybetmendiyên xwe yên şoreşger mirovhez, wekhevî hate tecrîd kirin, bi temamî bû dîn û fikirê dewletê.

Ev di Roma rojhilat de jî çêbû, hêdî hêdî di Roma Rojava de jî çêbû. Bi vî rengî Xiristiyantî ji dînekî qedexe û di heman demê de dînî dewletê ew ceza dikir, lê dewletê ew dîn qebûl kir û dike dînê xwe yê fermî. Ev jî dewletê piştî ji taybetmendî û rastiya wî dûr xistin.

Ji lewere em dikarin îro bêjin yek rabe û civînekî çêbikin û ji nû ve Quranê di ber çavan re derbas bikin, tiştek wiha ne gengaz e, wê cîhan birûxe. Ev di Rojhilata Navîn de nayê qebûl kirin. Dibêje, Quran û Xwedê yek e, Quran jî zimanê Xwedê ye, gotinên Xwedê ne û çênabe tê de guhertin çêbibe. Mirov wiha jî dikare bêje; rast e, ev Quran gotinên Xwedê ne, lê belê ev Xwedê di destpêka Quranê de tiştekî dibêje û di dawiya wê de tiştekî din dibêje, wê demê di wir de guhertin dikare çêbibe! Çima em vê nikarin bikin, lê dibêjin ew Xwedê ye û dikare bike, lê em nikarin wiha bikin. Bi vî rengî paş de dimîne, yanî reformê red dike.

Lê Ewrûpa di reformê re derbas dike, çima? Ji ber ku ne yê wan e, jê re pêwîst e qebûl dike. Bi rengekî nisbî be jî mirov dikare vê taybetmandiyên Tirkan hinekî nêzîkî Ewrûpa ye. Di nêzîkbûna wan ya ji dînê Îsalmê re jî wiha ye. Mînak, împratoriya Osmanî bi gelemperî dînî Îslamî weke qebûl kirinekî cewherî qebûl nekirin, lê weke berjewendiyên xwe ji bo ku di serî de karibin gelê Rojhilata Navîn bigirin pişt xwe û bi vî rengî êrîşî Ewrûpa bikin, ji bo vê berjewendîparêz nêzîk bûn. Di roja me ya îro de jî berjewendîparêz nêzîk dibin. Ew heta astekî jê berjewendiyan peyda dikin, lê belê bi gelemperî gel wiha nêzîk nabin.

Ji ber vê em bala xwe bidinê Xiristiyantî çiqasî dogmatîk be jî, lê Ewrûpa nikarîbû asteng bibe li pêşiya ronansesê. Ji ber çi, ji ber ku ji esasê xwe de dema ku weke bawerî hatiye qebûl kirin, di encama pêdiviyekê de hatiye qebûl kirin. Weke nasname nehatiye qebûl kirin. Di encama pêdiviyekî siyasî de hatiye qebûl kirin û zagonên wê li ser wî esasî hatine danîn.

Her demê li gorî vê guhertin tê de hatiye çêkirin, li gorî berjewendiyên desthilatdariya siyasî guhertin tê de çêbûne. Mînak, di sala 1020'î û bi şûn de jî, dîtin ku hinekî divê bi berhemên felsefîk ve girêdin çi kirin? Tomasê Ekwînî çi kirin, ew jî bi felsefa Arosto û dînê Xiristiyantî kir weke hev, yanî tevlîhev kir, weke kompleksek di navbera dînê Xiristiyantiyê û felsefa Arsto de çêkir. Ji ber ku felsefa Arsto jî felsefekî heta astekî muhafezekar û motleqe. Li ser esasê hinek heqîqetan xwe dide rûniştandin. Ev kir weke parçek ji dînê Xiristiyantiyê.

Ya rastî Arsto bi xwe jî mirovek ne dîndar e. Di zemanê wî de Xiristiyantî jî tine bû. Lê ji ber ku jê re pêwîst bû, fikirê Arîsto di dînê Xiristiyantiyê de bi cih kir. Heta sedsla 16. jî qedexe bû ku bihatiba nîqaş kirin. Yên ku fikirê Arsto nîqaş jî bikiribana dihatin sêdar kirin.

Herî dawiyê 1600' zanyarekî weke Bruno hate şawitandin. Ji ber ku tiştên Arsto red dikir. Di encamê de hem di aliyê mîtolojîk de, hem jî di aliyê dînî de dema ku weke

versyonekî duyemîn yan jî sêyemîn fikirên ku çavkaniyên wan Rojhilata Navîn e, derbasî herêma Rojava dibe hîna zêdetir nerm û hîna zêdetir li gorî şert û mercên wan civakan xwe eyar dike (oyarlama). Ji bo vê jî weke çawa di Rojhilata Navîn de li pêşiya pêşveçênê asteng e, di wê astê de li wir nabe asteng. Yanî însan dikarin rehet li hemberî wê derkevin. Ne ewqasî her tişt weke gulûgulîstanê ye, ji ber ku însanê li hemberî wê jî derketine hatine kuştin, şewitandin, mişextî (sürgün) û tine kirin. Lê belê ne weke Rojhilata Navîn bû, li Rojhilata Navîn dogmatîzm pir zêde bihêz bû.

### Li Rojhilata Navîn Hewildan Û Derbaskirina Rewşa Heyî

Gelo li Rojhilata Navîn ji bo derBeaskirina vê rewşê qet hewildan çênebûne? Belê hewildanên pir mezin çêbûne. Niha tiştê em jê re dibêjin ronansas, reformasyon, ronakbîrî, felsefe hwd, ev di demekê gelekê beriya Ewrûpa, bi sedê salan ji beriya Ewrûpa li Rojhilata Navîn pêşketibû. Bi meTUDEHên ji Ewrûpya bêtir îlmîtir, dibe ku hinek gotinan em rastî wan nayên, mînak di sedsaliya 9-8. de di serdema hikumê Umewî, pişt re dema hikumê Abasiyan de dibe ku di lîtretora wê çaxê de em rastî navê demokratsiyê nayên. Lê belê ji demokrasiyê hîna zêdetir demokrasiyê îfade dikin, ji komînalîzmê hîna zêdetir komînalîzmê îfade dike, hewildanên civakî wê demê hene.

Dibe ku em rastî navekî jê re bêjin rasyonalîzm nehatibin, ew nav di lîteretora wê demê de tine ye. Lê aqilcitiya ku ji rasyonalîzmê derbas dike hebû ye.

Ev bi temamî weke encama kûrbûnê, lêhûrbûna însanê Rojava derketine holê nerast e. Jixwe dîn di rastiyê de qonaxa duyemîn a di fikirê însanî de ye. Eger em mîtolojiyê weke destpêkê bigirin dest qonaxa duyemîn ji pêşveçûna fikirê însan û zêhniyeta însan e. Ji ber çi, dîn hîna zêdetir wiha nêzîkî aqil e. Li gorî mîtolojiyê hîna zêdetir tê fêm kirin. Hîna zêdetir şînber e, her wiha zêdetir nêzîkî pirsgirêkên civakî yên însanî dibe. Ji bo vê mîtolojî hîna zêdetir nêzîkî heqîqetê ye. Heta di asta zîhnî ya fikirî de mirov dikare navê şoreşê lê bike.

### Dînê Yekxwedayî Di Asta Zihnî Û Fikrî De Şoreşeke

Dibe ku di aliyê civakî de mirov nikaribe navê şoreşê li mîtolojiyê bike bike, lê di aliyê zêhnî de weke şoreşekî ye. ji ber ku her tişt serûbinî hev kiriye.

Nerîna mirov li xwezayê, ya însan li însan, baweriya mirovan, liv û tevger, her tiştê mirovan hemû urf û edetên wan guheriye. Beriya dînê Yekxwedayî însan bi rengekî dijiyan, piştî dînê Yekxwedayî însan bi rengekî din dijiyan. Ev şoreş e, di aliyê zêhnî de şoreş ji ber ku her tiştê serûbinî hev dike. Dîn heta beriya bibe desthilatdar, ji îştîhadê re vekiriye, her demê li ser esasê bersiv dayîna pirsgirêkên civakî xwe dide rûniştandin.

Mînak dînê Îbrahîmî jî bi vî rengî ye. Dînê Xiristiyantiyê jî bi vî rengiye. Jixwe dînê Îbrahîmî bi rengê wî Musewî, Xiristiyantî, Îslamî jî bi vî rengî ne.

Dînê çavkaniya xwe ji kevneşopiya Aryan digire hîn zêdetir ji rastiyên civakî re vekirîne. Ev heta beriya bibin desthilatdar. Lê belê dema dîn bibe desthilatdar êdî ji îştîhadê re tê girtin, girtî dibe.

Îştîhad çi ye? Mînak bê ku tu tiştekî red bikî, tu tê de xuliqkariyê çêbikî. Em îro karekî û xebatekî dikin zagon û qaîdên wê xebatê hene. Em dikarin li gorî wan zagon û qaîdan jî karê xwe pêk bînin, rengekî xebatê wê derbikeve holê. Lê wê xwe timî dubare bike. Lê yek heye bi hunerê xwe tiştan lê zêde dike. Hîna zêdetir encamê digire, zêdetir xuliqkare, ew navê wê îştîhad e. Tiştekî lê zêde dike, şarezayê tê de dike.

Lê jê qut nabe, yanî dîsa tê Misilman bî, lê di Misilmantiyê de xuliqkariyê bikî. Mînak, dîsa tu PKK'yî, di nava refên PKK'ê de tu xuliqkariyê dikî. Bê ku tu prensîbê wê yên bingehîn berteref bikî.

Ji bo vê her demê ji îştîhadê re, ji nû bûnê re, ji bersivdayîna pirsgirêkên civakî re vekiriye. Guftuguyên azad ên ku di camiyên Pêxember yên li Medînê çêdibûn, îro di zankoyên şerîatê, li Ezherê, li Mekayê kes nikare bîne ziman jî. Lê wê dema berê guftuguh serbest bûn. Her tişt dihate guftûguh kirin, heta hebûn û tinebûna Xwedê jî dihate guftûguh kirin.

Hemû pirsgirêkên girêdayî însan dihatin nîqaş kirin. Jiyana rojane, têkiliyên jin û mêr, xwedîkirina zarokan, meselên ekonomî, her tişt dihatin nîqaş kirin. Lê di roja me ya îro de gelek ji van tiştan bûne tabo, kes newêre nîqaş bike. Piştî çiqasî wiha bû, piştî 1500'î sal di sere derBeasbûye. Yanî di wê çaxê de hîna zêdetir vekirî bûye.

Bi vî rengî desthilatî li fikir çi dike? Fikir ji îştîhadê re digire, girtî dihêle. Di çarçoveya berjewendiyên xwe de dihêle. Ji ber ku eger di fikir de guhertin çêbû ew dihêle desthilatî jî bikeve nîqaşê. Ji bo vê em bala xwe bidinê desthilatdarî bi gelemperî dogmatîkin. Desthilatiya di roja me ya îro jî dogmatîk e. Ji ber çi wiha ye, eger desthilatiyek pala xwe dide fikirekî, mînak, li ser m-Misilmantiyê, yan jî şerîatê, xwe dide rûniştandin; lê dema şerîatê nîqaş bike û rexne bike, wê demê desthilatdarî jî tê rexne kirin.

Ji lewre desthilatî çi dike, di bin navê pîroz de, di bin navê Xwedayî de qedexekirinê li ser nîqaşkirinên ji bo şerîatê datînin. Dibêjin; divê kes nîqaş neke! Weke çawa heye tenê tê jiberkirin. Ji ber çi wiha ye, ji ber ku dema însan tiştê ku heye nîqaş bike, rexne bike û lêgerînên wî/ê çêbibin, wê demê wê liv û şêwazê hikumdariyê jî wê bike nîqaşê. Wê bibe weke hêzekî venêrînê li ser desthilatiyê.

**Li Rojhilata Navîn Têkoşîna Li Dijî Desthilatdariyê**

Desthilatdariya li Rojhilata Navîn bi gelemperî destpot e. Ti hêza venêrînê li ser xwe qebûl nake. Ji bo vê îştîhadê li ser xwe red dike. Dogmatîzm jê re baş e, lê xuliqkarî jê re nebaş e.

Ji lewre însan û civaka însanan bi dîn xwestin azad bin. Yanî xwestin bigihêjin heqîqetê, xeleka xwe ya wendayî bigirin. Ji zilm û zordariyê xelas bibin. Bigihîjin wekheviyê, ango vegerin cinetê ev hêvî di dîn de hebûn, dîn van hêviyan dida. Bi taybetî jî bi hêza xwe ya ruhanî, bi hêza xwe ya exlaqî, bi şîretê ku dike, bi berhemên ku nîşan dide vê baweriyê li cem însanan çêdike.

Lê belê di pişt re însanan dît ku bi îxanetekî re rû bi rû man. Yanî ew tiştên ku ji bo wan bûn Mislman û Xiristiyan, desthilatdariya siyasî wê berpirsiyartiya xwe pêk nayîne, wekheviyê nayîne, dîsa zilum, koletî, kuştin û vê carê bi navê Xwedê. Berê dibe ku însan heta astekî karîbû serî hildaba, karîbû li derve de bijiya ba, ev hîna zêdetir navendî dibe, dewlet navendî dibe serwer jî dibe, artêşa wî çêdibe, her tiştî bi navê Xwedê dike, motleq e. Derfetên berxwedanê ji te re nahêle, tu li ber xwe bidî tu li dijî Xwedê derdikevî. Li dijî tiştekî motleq derdikevî.

Ji bo vê jî bê lêpirsîn wê demê tu yê kuştinê heq bikî. Li ser vî esasî tevger derketin, tevgerên ku xwestin dîn bi taybetî jî di şertên Rojhilata Navîn de di serdema desthilatiya Ereban û Îslamî de, hinek kes derketin û xwestin ku dîn ji nexweşiya desthilatiyê paqij bikin, jê bişûn. Ev tevgerên derketin em jê re dibêjin Xaricî yek ji wan e.

**Tevgera Xaricî**

Ev tevgera em jê re dibêjin ku xwestin dîn ji nexweşiya desthilatdariyê rizgar bike yek jê tevgera Xaricî ye. Tevgera Xaricî çi ye? Jixwe navê wê li ser e, Xarcî, xwe ji derve de dihêle. Yanî xwe ji derveyî çi dihêle, derveyî şerê li ser desthilatdariyê dihêle. Wê demê di serdemên destpêkê de ev şerê he destpêkiriye. Bi taybetî jî bi mirina pêxember re dest pê dike, lê di serdema Xelîfe Alî de hîna zêdetir kûr dibe. Arstoqratên Ereb yên ku dixwazin modêlekî desthilatdariyê weke çawa Bîzans, Fars bidin rûniştandin, yanî teqlîda wan bikin. Di navbera kesên ku dixwazin bi nirxên Îslamî yên wekhevî bijîn, li ser desthilatdariyê şer çêdibe.

Ev şer dibe sersebebê gelek kes derbikevin û fêm bikin ku ev ne Îslamiyet e. Ew dînê ku bi hêviyên çareseriya pirsgirêkên civakî tevlî bûne, ew dîn diviyabû nebe amûreke desthilatiyê û di navbera kesên di dîn de hemfikirbin, divê xwîn nerije. Lê belê di vir de xwîn dirêje. Komkujî çêdibin, ji bo vê li dijî derketin û xwe ji der ve de hiştin û xwestin vê meselê çareser bikin. Lê bi ser neketin, yanî derfetên wan yê ku karibin biserbikevin êdî tine bûn. Însiyatîf jî êdî ji destê wan derketibû. Dibe ku tiştê wan yê ku kariban pê tevdîr bigirtibana HZ Alî kuştin. Lê nekarîbûn Muawiya bikujin.

Li gorî xwe digotin heger em van her du kesan bikujin, wê demê şerê li ser desthilatdariyê wê di navbera misilmanan de

rabibe. Wê careke din yektiya m-Misilmanan çêbibe. Lê belê karîbûn Alî bikujin, lê Muawiya nikarîbûn bikujin. Bi kuştina Alî re bi temamî desthilatî ket destê Umewiyan. Ji vê kevneşopiyê rêbazek nû derket. Ew rêbaz bi navê Muatezîle bû.

**Tevgera Muatezîle**

Di dîroka Îslamê de, di dîroka Rojhilata Navîn de tevgera rasyonalîst(aqilcî) ya herî şînber û ya herî mezin e. Navê wan Muatezîle ye, Muatezîle çi ye? Ev nav ji gotina Azlê tê, yanî tu xwe ji cihekî tecrîd bikî. Tu ji cihekî berdî, yan jî tiştekî dev jê berdî, mînak dibêjin; filan topvan dev ji topê berda, piştî emrê wî hinekî mezin bû û êdî nema karîbû bileyîsta, ji lewre dev jê berda. Daxwiyaniyekî dide û dibêje; êdî ez ji topê qut dibim. Yanî înaîzal dike, ji wê karê xwe yê berê muatezil dibe.

Gelek nerîn li ser tevgera Muatezîle çêbûna wan heye. Di esas de di sala 80 hicirî, yanî di sala PZ'ê 740-30'î de, ji wê demê de dest pê dikin û heta bi sedsaliya dehan jî dewam dike. Yanî di hundirê dused-sêsed salî de ev bizav bi rengê cuda-cuda, dizî eşkere heye.

Li ser çêbûna wan gelek nihêrîn hene. Hinek nêrîn ber bi aqil ve naçin, hinek nêrîn hîna zêdetir nêzîkî heqîqetê ne. Ev wiha dibêjin; " Di esas de ji desthilatdariyê dûrketine. Bi taybetî jî weke nerazîbûnekî li dijî kurê Alî Hesen in. Ji ber çi? Ji ber ku Hesen tawîz daye Muawiya. Yanî weke xelîfe ew qebûl kir. Van jî nerazîbûn nîşan dan, ji lewre dev jê berdan. Weke çawa xwe ji her tiştî dûr bikin. Ji ber ku bêmafiye, mafê Muawiya di xîlafetê de tine ye. Dibêjin ku Hesen li gorî Husên yekî pasîf bûye, wiha zêde şerker nebûye. Lewre dev jê berda ye. Ji bo vê jî wan jî dev ji Hesen berdan e. Ev xaleke ku li ser disekinin.

Xala duyemîn, dibêjin; di encama şerê di navbera Alewî û Muawiya de, Umewî û Alewiyan de van gotine; ev şer diçe û tê, ji lewre van xwe dûr xistine. Bi meselê fikir ve mijûl bûne, bi yê zaniyariyê re mijûl bûne. Ev jî rêbazeke.

Yek jî dibêje; însanek hebûye weke rêhberekî wan bûye. Di derbarê mijarekê de li Iraqê li bajarê Basrayê di camiyekê de yekî bi navê Hesenê Besrî heye. Zanyarekî dînê Îslamê yê mezin e, di derbarê pirsgirêkekî de yanî gunehê mezin çi ye, nakokî di navbera wan de derketiye. Gunhê mezin ew ku yek dev ji Xwedê berde. Ew gunehê mezin e û qet nayê afu kirin.

Yekî hatiye û ji Hesenê Besrî ev pirsiye û gotiyê; "ev gunehê mezin tê afu kirin, yan nayê afu kirin? Dibêjin ev yê Muatezîle di cih de bersiv wiha daye û gotiye; "Eger mir û tube nekir, wê demê nayê afu kirin, lê beriya mirinê tube bike tê afu kirin." Yanî bi vî rengî nerm nêzîk bûye, rabûye ji meclîsê dûr ketiye. dibêjin Xwedêgiravî wê demê Hesenê Besrî gotiye; vî em îatîzal kirin. Yanî dûrî me ket. Dibêjin ji wir de ev dest pê dike.

Lê belê di esas de tevgerek derveyî desthilatiyê ye, bi zanistiyê û fikir ve mijûl dibin. Lê fikirê wan çi ye?

Yek ji nêzîkbûna vê tevgerê dûrbûna ji desthilatiyê ye, dijî desthilatdariyê ne. Ji xwe ev diyar dibe. Li dijî desthilatiyê ne. Lê belê nêzîkbûna wan ya ji zanistiyê re girîng e. Ev gotina ku dibêjin; "Xwedê li filan derê ye, çavên wî wiha ne, devê wî wiha ye, gotinên wî hene. Însan dikarin wî bibînin." Mînak di Quranê de jî ayetek heye, dema însan diçe cinetê li cîhana din, jixwe hinek cih li cinetê hene û qat bi qat e. Li wan cihan timî dikarin Xwedê bibînin. Xelata herî mezin jî li cinetê ji jixwe ew e.

Lê ev tevger dibêjin Xwedê nayê dîtin, tiştê bê dîtin ne Xwedê ye. Tiştê cihê wî hebe jî ne Xwedê ye. Tiştê boyutê wî hebe jî ne Xwedê ye. Ji bo vê dibêjin; hinek tişt heye di Quranê de heye, lê divê em esas negirin. Ji bo vê dibêjin Quran weke çawa Xwedê bi xwe ye, divê mirov negire dest. Mirov dikare hinek tiştê wê qebûl neke.

Mesela Xwedê de van red dikin, di Quranê de ev heye dibêje; Xwedê li jor e. Lê ev tevger dibêjin jor û jêr tine. Ji ber ku di gerdonê de jêr û jor tine ye. Ev rastiyek e, ji lewer cihê Xwedê ne diyar e, heger cihê Xwedê diyar be, wê demê nabe Xwedê. Boyutê wî jî diyar kiriye, nizanim wiha mezin, wiha ye hwd, ew tevger dibêje tiştek wiha tine ye.

Ya din jî nayê dîtin, ji lewre ev ayetên derbarê cihê Xwedê, rengê Xwedê, dîtina Xwedê de, ev dibêjin divê em van red bikin. Ji ber çi, ji ber ku nayên parastin. Ev tevger bi kesên derveyî xwe re nîqaş dikin. Bi Manîstan re, Zerduştiyan re nîqaş dikin. Beramberî vê ji wan re astengî heye, nikarin bersiva xwe bidin. Ji ber ku ne îlmî ne, ne mentiqî ye. Ji bo vê dibêjin divê em van sererast bikin.

Ya din jî dibêjin, bi fikir û aqil mirov dikare rastiyê û çewtiyê ji hev derbixînin, ne bi jiberkirinê. Ji ber vê tevgerekî rasonalîst e. Ev pirsên teolojiyê yên însanê Ewrûpî di sedsala 16-17'an de encax karîbûn pirskirban, wan wê çaxê pirs kirbûn.

Mînak dibêjin; Xwedê însan çêkiriye. Xwedê xuliqandiye, ew rast e. Lê belê jê û şûnda însan xwediyê xwe ye. Ji ber çi, dibêjin heger em bêjin însan ne xwediyê xwe ye, yanî ti rola aqilê însan tine, ji aliyê Xwedê de tê bernama însan tê diyar kirin, baş-xerab her tişt li ser eniya wî/ê nivîsandiye, wê çaxê ev însan xerabiyê dike?! Dema ku xerabiyê dike, wê demê Xwedê jê re gotiye xerabiyê bike. Ê baş e, heger Xwedê jê re gotiye xerabiyê bike, lê çima pişt re jê hesab dixwaze!? Yanî hem wiha çêkiriye, her tişt li ser eniya wî/ê nivîsandiye, ew dide meşandin, Misilman timî dibêjin çepê te, rastê de Xwedê heye. Di xewna te de, di şiyarbûna te de û di her tiştê te dikî xebera Xwedê jê heye.

Ew tevger jî dibêjin heger wiha ye û Xwedê vê çarenûsê ji me re datîne çima hesab ji me dixwaz e! Dema em gunehan dikin çima me davêjin cehnemê? Wê çaxê dibêjin; divê em gunehê xwe nekin stûyê Xwedê de. Aqil heye, bi aqil em ê rastiyê û xerabiyê ji hevdu nas bikin, bi biryara xwe em ê tevlî bibin. Xwedê em çêkirine, em xuliqandine jê û şûnda, divê mirov li Xwedê zêde tiştan bi Xwedê nedin barkirin.

Li ser vî esasî dibêjin, ji bo îqna bibe, aqil qebûl bike çi pêwîst be divê em wê bikin. Divê em felsefê wergerînin, ji ber ku tenê îlahiyat têrê nake. Hinek tişt hene tenê bi zanistiyê tên diyar kirin, bîrkariye, kîmya ye hwd, divê em van tiştan ragihênin. Ji bo vê derbarê felsefa Yewnan de, di derbarê gelek tiştê din jî agahiyên zanistî de jî lêkolîn bikin.

Di derbarê dadê de beramberî sîstema siyasî ew tevger xwedî rexne bû. Ev tevger weke di serdema Abasiyan de jî pêş ketin, bi taybetî dewletê carina rê dida wan. Lê çima rê dida wan? Hêza wan ya fikirî hebû, pirtûkên wan zêde bûn. pirtûkên wan ne diyar bûn, di demên dawiyê de li cihên weke Yemen û cihên din jî hatin dîtin. Eşker bû ku tevgerek rasyonalîst e, pir li pêş e. Bê ku teolojiyê red bike, bê ku Xwedê red bike, lê bi aqil digire dest.

Dewleta Îslamê çima ji wan sûd werdigirt? Bi hêza xwe ya fikirî beramberî dîn û fikirê çavkaniya wan Aryen in disekinîn, ji wê ji wan sûdwerdigirtin. Lê dema rê ji rexnekirina desthilatdariyê re vedikirin bi ser wan de diçûn û gelek ji wan bi rengekî pir xerab hatin kuştin. Bi vî rengî ew tevger tesfiye bû.

Ango guhertinek çênekirin, aqil hikum nekir, nebûn sersebebê ku aqil hikum bike. Encax rê ji aqil re vekirin, lê belê desthilatî ewqasî tund bû, rasonalîstbûna na, lê dogmatîzmê rê girt. Bi taybetî jî di sedesala 11'an de di rêka Îmamê Xezalî û Hamdê Xezalî de zêdetir dogmatîzmê xwe bi cih kir.

Di van xebatên fikirî de mirov fêm dike ku weke çawa roja îro hatiye diyar kirin, dogmatîzm, tembelbûna fikir, weke tiştekî xwezayî li Rojhilata Navîn heye; lê ne wiha ye tam berovajiyê wê ji serdema dest pêkê de her demê însan di nava lêgerînên nû de bûye. Di şopandina heqîqetê de sînor nas nekiriye. Çiqasî bi navê motleq, Xwedayî hinek fikiran xwestiye xwe rewa jî bikin, lê tevî wê jî muhalefetek dîtiye û jê re çêbûye. Di vê serdemê de mirov rastî gelek tiştên din jî tê, di derbarê zanistiyê de. Çi ne ev, mirov dikare hinek mînakan bîne û wê baştir baştir be.

### Tevgera Îxwan Sefa

Demekî berê yanî beriya çend salan demek dirêj çêbûye, hinek belge hatin dîtin. Ev belge navek li ser wan hebû, bi navê Ixwan-Sefa. Nêzîkî pêncî û du belgan e. Weke pirtûkekî ye, bi navê namen e. Ev name hatine nivîsandin, lê name çi ne, ew bi navê Sadet, Kêfxweşî, Xweşî, di zanistiyê de mirov digihêjiyê. Mesafa di navbera Xwedê û însan de dijî, bi zanistiyê kintir dibe. Yanî însan bi zanistiyê xwe nêzîkî Xweda dike.

Kêfxweşî, yan jî seadet ew jî bi zanistiyê pêk tê. Zanistî çi ye, kîmya ye, fîzîk e, byolojiya ye, felsefe ye, van li ser vê lêkolîn kirine û encamên ku girtine nivîsandine bi vî rengî belav kirine.

Di derbarê navê wan de kê ev tevger pêşxistiye, mirov zêde nizan in. Yanî ew ne diyar e. Lê ew namena tê de gelek tiştên balkêş hene.

Mînak dibêjin; bi zanistiyê Îsa bûye kurê Xweda. Bi Zanistiyê tariya Ehremîn ji holê radibe û ronahiya Yezdan derdikeve. Bi vî rengî her tiştê baş bi di esas de bi zanistiyê û lêgerîn û lêkolînê pêk tê. Lê eşkereye ku ev tevger hatiye veşartin û hatiye qedexe kirin, hatiye lêgerîn.

Kengê ev tarîqet derketiye? Di navbera sedsaliya 9-10'an de derketiye. Navbera sedesala nehan û denhan ya PZ'î, yanî di navbera 900-1000'î de derketine. Derdorê 250'yê Hicrî, vedigere wê dîrokê, derketiy.

Bi vî rengî mirov lê temaşe dike metinê dînî, dogmatîk, qalbger, di wir de ne serwer e. Tiştê serwer zanistî û lêgerînên îlmî ne. Di wan namê xwe de bi meTUDEHên îlmî agahî dane. Yanî wiha bi rengê şerîatê, jiberkirî, bi Xwedê rave kirin na, îlmê xwezayî weke çawa îlmê di roja me ya îro de heye, fîzîk, kîmya, zanista dîtir jî nîşan dane. Lê belê tiştekî din jî mirov dibîne, di vê terîqetê de tevî ku zanista wê yê zanyarî li pêş e, tesbît kirinên wê yên rastiya teqiyecitî tê de heye.

Teqiyecitî çi ye, ez tiştekî pê ne bawer bim, lê ji bo ez xwe pê bistirînim, ji bo ku tiştek bi min neyê, weke ku çawa ez pê bawerim nîşan didim. Da ku karibim sax bim.

Ev teqyecitî kengê derket, dema şerê di navbera Alî û Muawiya de derket. Ji ber ku Umewiyan, însan digirtin û ji wan re digotin divê hun ji Alî re xeberan bidin. Tê kufir bikî ji Alî û ziriyeta wî re xebarên nebaş bêjin. Ew kesên dihatin girtin girêdayî Alî bûn û Alî pîroz didîtin, ji bo vê jî xeber nedidan. Ji lewre li wan didan heta dikuştin.

Pişt re şîa yên li aliyê Alî di navbera xwe de gihêştin îtîfaqekî, gotin, diyar bi vî rengî em nikarin li ber xwe bidin. Divê ku em di dilê xwe de ji Alî hez bikin, lê dema ku ji me hate xwestin û gotin xeberan jê re bidin, em ê xeberan jê re bidin. Ev teqyecitiye.

Gotina Ixwan bi xwe jî gotinek Erebiye, yanî bira. Em bala xwe bidinê heta roja me ya îro jî di Xiristiyantiyê de tevgerên biratiyê pêş dikevin. Sefa jî, yanî kêf-xweşî, yanî birayê xweşiyê. Lê belê weke ku çawa mirov fêm dike kêf û sefa nîne! Seadet, kêfxweşî, ew tevger divêjin, mirov dikare wê Sefayê di rêka zanistiyê de mirov dikare bi dest xwe bixîne û pêş bixe. Lê ev kesan nêzîkbûna wan ya teqyecî zêde li pêş e.

Ji ber çi wiha ne? Eger şînber bi rengekî zanistiyê bi meTUDEHên zanistiyê her tiştê bînin ziman, bi meTUDEHên dînî re dikevin nakokiyê. Zotir dewlet dikare wan bikuje, ji ber ku bi dîn re dikevin nakokiyê. Bi hikmê şerîatê wê zû li ser wan hikm bê birîn û bên kuştin. Ji ber vê teqyecitî kirin. meTUDEHên zanistî bi qalibên dînî xwestin îfade bikin, carcanina wiha dikirin. Ev teqyecitî di wir de diyar dike.

Ev çi nîşanî me dide, zorî û zehmetiya fikirê nû di bin siya hikmê dewleta Îslamê de. Ev dewlet, bi taybetî jî dewleta Abasî, di

sala 1000'î de, di sedesaliya 10-11'an de piştî êrîşên Tirkan û serweriya Selcoqiyan, gav bi gav wiha bingehê împeratoriyê yê dewletê lewaz bû. Rêka parastinê di dogmatîzmê de, di çewisandinê de û tesfiyekirinê de, ji ber wê hîn bêtir tund bû.

**Li Rojhilata Navîn Pêşketina Felsefê Û Zanistê**

Li ser vî esasî em lê temaş e dikin, tevgerên zanistî, terîqetên komînal û fikirê wiha zêhniyetê dixin nîqaşê, em lê temaşe dikin ji vê serdemê û şûnda, di bin çewisandinekî cidî de rû bi rû dimînin. Ji lewre jiyana fîlezofan, zaniyaran û kesên ku em ji wan re dibêjin terîqetên batinî, yanî yên weke "Wehdetil Wicûd, Fena Filah, yektiya bi Xwedê re, wendabûna di hundirê Xwedê re, diyarbûna Xwedê di şeklê însan de" îdia dikin. Ev hemû bi êrîşên dijwar û mezin re rû bi rû dimînin. Bi şêwazê îşkencê yê herî xerab tên kuştin.

Gelek Feylezofên ku em nas dikin weke Helacê Mensûr, van feylezofan her demê di nav xweşiyê, rehetiyê de wiha xebatên xwe yên fikirî û zanistiyê pêşnexistine. Weke Îbin Sîn, Abo Bekir Razî, Kendî hwd, gelek kesên bi vî rengî hene. Alîkariyek wan a mezin di zanistiyê û felsefê de çêbûye. Mirov dikare bêje gav bi gav sedsaliya 12.û şûnda bi taybetî jî di kesayeta Îbin Ruşd de,(Îbin Ruşd fîlezofekî Mislman e) lê belê di esas de felsefa Rojhilata Navîn temsîl dike, lê ne li Rojhilata Navîn dijî. Li Endelusê dijî, wê demê Endelûs dewleteke Misilmanan bû, dewleteke Ereban bû.

Ev feylezof di sedsaliya 12.li Îspaniya di roja me ya îro, li wir ev fîlezof derdikevin holê. Ji nû de felsefa Yewnan terceme dikin, tenê bi tercemê bes nabin, vê carê meTUDEHên diyalektîk digirin dest. Mirov dikare bêje sûdek yan jî alîkariyek Îbin Ruşd ya cidî di pêşveçûna bizavên felsefîk di Ewrûpa de pêşketiye. Ji ber ku herî zêde nêzîkî Ewrûpa bû, li ser Ewrûpa bi bandor bû.

Em bala xwe bidinê heta vê serdemê jî dîsa jî fikirê fesefê û zanistiyê di esas de li Rojhilata Navîn pêşdikevin, Ewrûpa jê bandor dibe. Ewrûpa bi çi bandor dibe? Yan bi rêka temasa fîzîkî ya rasterast de bandor dibe, ew fîlezofên Ereb, şaîr, wêjevan yên ku li Endelûsê bûn, yên ku li Îspaniya bûn, ji nêz ve Ewrûpa bandor dikirin.

Yan jî di rêka şerê xaçperestan, yanî seferên xaçlî yên ku di sedsaliya 11.û şûnda ve dest pê kirin. Di sala 1700'î şûnda de dest pê kirin, heta sala 1300'yî berdewam kirin. Çûn û hatina van seferên xaçliyan li Şamê, Filîstînê, Misrê hwd, li van derana zêde-zêde ji zanistiyê û agahiyên felsefa Rojhilata Navîn sûd wergirtin.

Ev li Rojava bi xwe bû bingehê ronansasê. Yanî bingehê ronansesa Rojava, yek jê temasa di navbera felsef û zanista di serdema Îslamî de li Endelûsê bû. Ya duyemîn jî seferên xaçlî yên ku dihatin bi ser vê heremê de bû. Dema ew sefer bi ser vê herêmê de dihatin pê re agahî girtin û paş ve vedigeriyan. Pir ji lîteretora vê herêma Rojhilata Navîn sûd wergirtin. Edebiyata li

vir terceme kirin, li ser wî esasî li wir versyonê wê derxistin. Ji bo ronansesê zêde bingehek bihêz çêkirin.

Bi taybetî jî ya ku zêdetir bi bandor bû jî piştî Osmanî bi ser ketin, Îslamiyet li ser herêmên Bîzans, împeratoriya Roma ya rojhilat serwer bû, wê çaxê bi taybetî Xiristiyanên rojhilat, zaniyarên Xiristiyan ên rojhilat, rahibên Xiristiyan hemû yên di rojhilat de hemû neçar man piştî ku biçin Ewrûpa, piştî ku Misilmantiyê li ser van qadan hikum kir, di çûna xwe ya Ewrûpa jî de di rastiyê de fikirê Rojhilat jî bi xwe re birin Ewrûpa. Ji bo vê bo bingeh ji bo ronansesê.

**Zerduştî Lêgerîna Li Bilindbûn Û Xweşiya Jiyana Civakê Ye**

carek din em beramberî vê pradoksê dimînin. Heger ewqasî we sûd da alemê, çima we ji bo xwe nekir! Ew ne gengaz bû. Li Rojhilata Navîn bi taybetî fikirê însanî, zanistî, rasyonalîst, pêş nakeve. Ji ber çi wiha dibe, ji ber ku bingehekî dewletê yê heta asta dawiyê îlahî heye. Bi hikmê îlahî xwe diparêz e. Ji bo vê dema ku îştîhad çêdibe û guhertin çêdibe, di zêhniyetê de guhertin çêdibe, bingehê dewletê dileriz e. Wê demê dewlet bêtawîz bi ser van fikirê nû de diçe, qedexe dike, dikuje, tesfiye dike. Ji bo vê encax derveyî zemînê xwe derfetên jiyanê peyda bikin. Di zemînê xwe de nikarin jiyanê peyda bikin.

Jixwe ev tevgereke bû, ev tevgera me behs kir bi giranî wiha di zemînê, Samî de pêş dikeve. Lê belê tevgera zêhnî ya ku di zemînê Aryen de jî pêş ketî heye. Pir balkêş e, bi taybetî Zerdeşt, Manî, ev reng Pêxemberana yên ku bi vî rengî derketine rolek mezin ji bo mirovatiyê lîstine. Di esas de heta di roja me ya îro de jî bi bandor in. Lê belê du tiştên ku bûne sersebebê ku ev fikirana di Rojhilata Navîn de weke nebin çavkaniyên ji bo ronansesê, du sedemên wê yên bingehîn hene.

Yek jê dînê Zerdeştî bi taybetî jî weke berdewam kirina wî dînî Manîzm ji aliyê dînê Îbrahîmî ve bi rengekî zêde hatiye teşhîr kirin. Yanî em bala xwe bidinê Misilman ji bo Xiristiyanan nabêjin kafir, ji bo Yahodiyan nabêjin kafir, tam berovajiyê wê dibêjin xwediyê pirtûkê, ehlê û pêxembertiya wan qebûl dikin, dînê wan qebûl dikin. Lê ji bo Zerduştiyan dibêjin kafir, ji bo Maniyan dibêjin kafir. Tenê bi kafirbûnê bes nabin û zêde teşhîr dikin û her tiştê wê red dikin. qedexe dikin û dikin weke gunehekî mezin.

Li gorî xwe nîşan didin, mînak weke dînekî Yekxwedayî qebûl nakin. Weke ji rêderketinekî qebûl dikin û ji derveyî wê jî weke ku çawa hinek tiştên nesne îbadet dikin qebûl dikin. Mînak agir îbadet dikin, hwd. Bi vî rengî nêzîk dibin da ku di nava gelan de teşhîr bikin. Herwiha sedemên çewisandinê ji bo xwe peyda bikin, tine bikin, tesfiye bikin, van peyda dikin, ev sebebeke ji sedema ye.

Sebebê duyemîn, tundbûna dewleta Pers, di serî de Pers û pişt re jî Sasanî, tundbûna wê rengê desthilatdariyê, vê her

çiqasî di serî de bexişandin jî nîşan dabe. Herçiqasî di serî de dînê dînê Zerduştî weke nasnameyeke civakî qebûl kiribe jî, bi demê re li dijî wê kete nava hewildanan.

Ev dijberî ji bo çi pêşket? Zerduştî dînekî desthilatiyê nîne, Zerduştî dînê civakê ye. Di Zerduştiyê de exlaq, felsefe, dîn heye, mirov dikare bêje ev tiştên he hemû hene. Ji bo vê Zerduştî tê de di navbera felsefê û îlahiyetê xalên hevpar hene. Bi taybetî boyutê wê yê exlaqî balkêş e. Nirxandina însan, lêgerîna însan, nêzîkbûna ji xebatê re, nêzîkbûnên exlaqî pir balkêş in.

Mînak wiha di encamê de di Zerduştiyê de Xweda Xwedayê xêrê ye. Yanî zalim nîne, însanan navêje cehnemê. Gafan lê nake, Xwedayê xêrê ye, navê wî lê ye, nerm e. Li gorî taybetmendiyên çanda komînal ya ku erdnîgariya Aryen ne. Ji bo vê jî wiha dînekî desthilatdariyê nîne. Tê de berhemdarî tê de heye, şîret tê de hene, dîzayîn kirina jiyana însan tê de heye. Xweş kirina asta jiyanê tê de heye, ew jî dibe kar.

Mînak di Zerduştiyê de zêde qîmeta kar heye, qîmeta însan bi kar tê qezenc kirin. Însanek çiqasî dikare kar bike, di erd de kar bike, lawiran xwedî bike, ew însanekî/ê îdial e, bi wî karî asta xweşiya civakê ya jiyanê bilind dibe. Ji bo vê taybetmendiyên kar di felsefe û fikirê Zerduşt de pir li pêş e.

### Sedemên Nepêşketina Fikira Rasyonalîzmê û Ronesansê

Niha em bala xwe bidinê heta Nîçe lêgerîna însanê şareza yê pêşketî, zane, ji wir derxistiye. Yanî ji fikirê Zerduşt derxistiye. Esas ronenses ev e, lê dema ku mirov bêje ronenses, ronenses Ewrûpî dibêjin; ji nû ve ji dayîkbûne, yanî ji nû ve vejîn. Vejîna çi, vejîna çaxa Girêk û Roma. Lê bi çi awayî heye, bi lêgerînê bi tevgerê, bi çalakbûyînê bû vejîn. Yanî însanê wiha di cihê xwe de, xwe dubare dike, beramberî sîstemê bêdeng e, di çarçoveya tiştê jê re hatiye dayîn tevdigere, ew însan dibêjin îdial nînin. Li gorî dêrê îdial e, li gorî Xiristiyantiyê îdial e. Lê li gorî ronensesê ne îdial e, tam berovajiyê wê însanê di nava lêgrînê de di lêkolînê de, macercî, astengan li pêşberî xwe nas nake, ji astekî derbasî astekî din dibe derdorî xwe analîz dike, xwe analîz dike ji derdora xwe re helwestê xwe nîşan dide. Ew însanê îdial e, ew însanê li pêş e, Zerduştî bi xwe jî însan bi vî rengî dinêrxîne. Însanê ku her demê di nava lêgerînê de be, li cihekî nesekine, bi tiştekî bes nebe, çalak be. Ji bo vê bingehê ronensesê ji nû de çêbûyînê, nûbûyînê di wir de heye. Sînor li pêşiya pêşveçûna însan danayîne.

Mînak milê exlaqî heye, di milê wî yê exlaqî de du tiştên balkêş hene, yek îxanet, derew, qelêştî, van tiştên ha qebûl nake. Ji dijminê xwe re jî dibêje "tu yê îxanetê nekî. Lê belê şert çi dibin bila bibin, tê di fikirê xwe de tewîzan nedî. Yanî prensîbê xwe biparêzî, lê tu yê îxanetê jî bi xeyînê xwe re nekî.

Ji bo vê em bala xwe bidinê, aştîxwazî, lehevhatin, merdbûn, cumerdbûn, heta bi rengekî din jî li gorî roja me îro demokrasî wê demê nayê wê manê ku mirov tawîzan bide. Mirov

dikare vê bike bê ku mirov tewîzan bide. Ji bo vê di dema ku heta asta dawiyê de,(orekiyên wî) berîkên tije şiyarîne li hemberî îxanetê, lê di heman demê de jî di meselê bêtawîz parastina nirxên xwe, prensîbên xwe, di wir de jî ewqasî tije şiyarî ne. Ev jî ji hêza wî/ê ya exlaqî tê.

Dîsa di aliyê mijarên civakî de jî, demekî Rêbertiya me jî digot; "malbata Zerduştî" yanî taybetmendiyên malbata Zerduştî çi ye? Di Zerduştiyê de malbata yek alî tine ye. Malbata li ser esasê mulkiyetê zilam tine ye, wekhevî di malbatê de heye. Bi taybetî di aliyê jin û mêr de wekhevî heye. Ji bo vê malbata ku îro em nas dikin malbata ku xwediyê wê zilam e, di eksena zilam de çêdibe, di wir de tine ye.

Di vê derbarê de gelek tiştên ku nîşan didin hene, ji bo vê ew fikirê han karibe bibe zemînê ji pêşveçûnê re. Yanî fikirê Zerduştî dikare bibe zemînê pêşveçûnê re. Di roja me ya îro de jî rojanekirin, yan jî tezekirina Zerduştiyê û weke fersyonek wê Manîzm di esas de ji bo ronensesa Rojhilata Navîn, gavekî baş e. Nûkirin yanî bi agahiyên zanistiyê yên nû re têrkirin. Bandora vê li ser felsefê çêbû, li ser fikirê pêşketî, komînal, exlaqî, li cîhanê çêbû. Pir rehet mirov dikare bêje Bodîzm ji Zerduştiyê tişt girtine, Konfîçyoz ji Zerduştiyê tişt girtine. Felsefa civakî ya Yewnanê jî ji Zerduştiyê tişt girtin e, ronenses zêde-zêde tişt ji Zerduştiyê girtine.

Sedemên vê çi ne? Sedemên wê Zerduştî jî û Manîzm jî di zemînê ku lê derketine, ew zemîn nema ne. Mînak Manîzm li ku bûye weke baweriyekî civakî berfireh? Li Asya navîn yan jî derdorê Çînê di nava Oygiran de. îdiayek heye dibêjin; di zemanê xwe de li Palmêra, di çaxa ku hakima wan a jin ya bi navê Zenûbiya bû, wê demê belav bû.

Lê bi giranî jî li Ewrûpa berfireh belav bû. Li Fransa, li gelek welatên Ewrûpa yên din belav bû. Niha jî Zerduştiyê rasteqînî yên ku hîna bi Oretiyên Zerduştiyê, bi talîmê Zerduştiyê dijîin, difikirin, di esas de çavkaniyê ku mirov pê Zerduştiyê nas bike, li ku ne? Li Hindê ne. Mînak bajarekî Hindistanê bi navê Bombayî heye, li wir bi giranî kom dibin. Heta ronakbîrên Ewrûpî yên ku xwestin di vê derbarê de bibin xwedî agahî jî, diçûn wir. Li wir nas dikirin, ji ber çi? Ji ber ku derfet û zemînê lê derkeve nehiştin, çewisandin, zilum, kuştin, zordarî, nehişt. Li derên derveyî vî zemînî ji bo xwe karîbûn hinekî derfetên jiyanê peyda bikin, lê pişt re nekarîn li wir jî wan derfetan peyda bikiribana.

Bi taybetî di çaxê navîn de li Ewrûpa Manî yên ku dîyaneta Manî esas digirtin, hemû di dadgehên Engezîsyonê re derBeasdibûn û dihatin kuştin. Dihatin şewitandin. Ez nizanim çiqasî rast e, dibêjin ev gotina ku Tirik didin xebitandin gotina "manyak" ji wê tê, ji Manîzmê tê. Wê demê heman çawa Misilman tevgerên zanistî, yên li dijî xwe bi rengê zindîqtî, kafirtî, xerabtî, bi nav kirin, di esas de ew ji xwendinê veşartin, nehiştin ku gel rastiya wê nas bikin, qedexe kirin. Tenê di çarçoveya wan agahî dan, ew dan nasîn, heta asta dawiyê antîprpogandayek mezin

kirin. Di heman demê de mirov lê temaşe dike, Xiristiyan jî tevgerên derveyî xwe bi vî rengê xerab bi nav dikin. mixabin di roja me ya îro de wek tiştekî pir xwezayî em tînin ziman.

Wê demê tevgera zanistî ya zêhnî di Rojhilata Navîn de bi astengên desthilatiyê, bi dogmatîzmê re rû bi rû ma ye. Ji ber ku dogmatîzm bi hêz bûye, em lê temaşe dikin ku ev tevgerên ha encam negirtine. Ne ku şaş bûne, ne ku fedekarî jî nekirine, mesele hatin kuştin, bi îşkencê dihatin kuştin, tewîz nedidan, gav di paş ve nediavêtin. Kêm fedekarî nehatiye kirin. Lê dogmatîzm ewqasî dijwar e, li ser esasê vê dogmatîzmê desthilatdariya siyasî ewqasî şideta bêsînor bikar tîne ku weke peyda kirina pêvajoyekê nû, pir astenga li pêşiyê datîne ji bo vê jî me lê temaşe kir ku tevî ewqasî hewildan jî, di serdema Abasiyan de, nikarîbûn ronensesa Rojhilata Navîn çêbibe. Tam berovajiyê wê hate asteng kirin, di serdema Osmaniyan de jixwe ne gengaze mirov behsa pêvajoyekî bi vî rengî bike. Dewlet jixwe bi erkê astengkirina van tevgeran de hate avakirin. Bi vî rengî însiyatîfa fikir, pêşvaçûna fikir ket destê Rojava. Yanî derbasî Rojava bû.

Niha jê û şûnda di meselên zêhnî de pirsgirêkên me derketin. Yanî serdema Osmaniya serdemekî wek çawa em dibêjin çaxê navîn li Ewrûpa, di zemanê serweriya dêrê de, engizîsyonan, kuştina jinan, hemû rengê xerabiyê, dogmatîzmê û astengiyan, di Rojhilata Navîn de jî mirov dikare serdema Osmaniyan weke wê bi nav bike. Astengî û nehişt ku pêşvaçûn çêbibe.

Wê çaxê fikir li Rojava pêş ket. Lê ev fikirê Rojava fikirekî însaniye, ji bo pêşketina însanan pêvajoyekî nû ye, Di dîrokê de pêvajo rojane çênabin. Di dîroka mirovahiyê de pêvajoyên rojane çênabin. Sîstemên civakî rojane nayên danîn.

### Pêşketina Pêvajoya Civaka Neolotîkê

Ji bo vê sê-çar pêvajoyên esasî mirov dikare di dîroka însanan de peyda bike. Yek jê pêvajoya neolotîkê ye. Pêvajoya ku civakbûna însan tê de çêbû, zanistiya însan tê de çêbû, însan karîbû bi destê xwe, bi fikirê xwe û bi keda xwe jiyana xwe bike nava pergalekê. Zîraetê bike, heywanan xwedî bike, malê ava bike, gundan ava bike. Li ser wî esasî arac û gerecan peyda bike. Ji çimlek çanakan bigire, ji dukoman, tevin hwd. ev pêvajoyeke. Ji vê pêvajoyê û şûnda, wer di aliyê çendaniyî (nîcel) de dibe ku zêdebûn, mezin bûn çêbû, hinek di wî aliyî de dîsa di aliyê çendaniyî de guhertin çêbû, lê di cewherê xwe d yek bû.

Bi sedê sala bi hezarê sala wiha berdewam kir. Bandora vedîtin û tiştên di wê serdemê de derketine. Eger mirov zêde bide ber zorahiyê, mirov dikare bêje serdema Girêk û Roma jî, serdemek duyemîn bû. Em bala xwe bidinê ewqasî dewlet çêbûn, împeratorî çêbûn, qiraliyet hatin avakirin, hatin hilweşandin, lê dîsa jî mirov nikar navê serdemekî civakî di dîrokê de lê bike. Ji ber ku di esas de şêwazê jiyanê arac-gerec, zêde nehate bikar anîn, xanî hebûye û yek mezintir avakirin.

Di zemanê Roma û Girêk de hîna zêdetir guhertinên zêdetir bi kok, zêdetir şoreşgerî mirov dikare lê rast bê. Ji bo vê me got heger mirov zoriyê bidiyê, mirovê dikare bêjiyê qonaxa duyemîn e. Piştî hezarê salan.

Ronensas, yan jî bi taybetî jî tevgera hilberînê ya senaî ya zanistî, ya hizirî, ya di sedsala 17-18'an de ew qonaxa sêyemîn bû. Çima serdemeke sêyemîn bû, çima em dibêjin serdemên yekemîn, duyemîn û sêyemîn? Ji ber ku tiştên di van serdeman de derdikevin, jiyana însanan serûbinî hev dikin. Ji nû ve însanan li xwe û derdora xwe dinhêre, ji nû ve derbarê xwe de, dibe xwedî agahî. Ji nû ve hîna bêtir dikare qada jiyana xwe berfireh bike, yan jî teng bike. Tiştên wiha bi kok in, be wer serensera ne. Ji bo vê em jê re dibêjin pêvajoyên nû.

Li ser vî esasî tiştên ku di sedsala 16-17'an de li Ewrûpa çêbû serdemeke nû bû di dîroka însan de. Însan hîna bihêztir bû, hîna zanetir bû, hîna derbarê xwe de gihîşt agahiyên nû. Derbarê derdora xwe de gihîşt agahiyên nû, yanî ji nû ve, di rastiyê de dema mirov dibêje ronensas, çawa mirov bi nav dike û dibêjiyê vejîn, ev navek rast e.

Lê weke çawa Ewrûpa navend dike, weke ku tenê vejîna Girêk Roma na, di rastiyê de vejîna hunerê însan e, teqandina enrjiya di hundirê însan de ye. Eşker bû eger zîhniyeta însan bê guhertin, tiştekî ku nikaribe bike tune ye, di wê serdemê de. Niha ew serdem li ku çêbû, li Ewrûpa çêbû. Wê demê Ewrûpa bû navend. Ewrûpa bû çavkanî, agahî ji wir derdikevin, senaî ji wir derdikeve, zanistî ji wir derdikeve, felsefe li wir pêş dikeve. Vê çi kir, vê teşek da sîstema siyasî jî.

Sîstema siyasî jî li ser esasê pozîtîvîzma wê çaxê derket, yanî pozîtîvîzm, bozîtîf yanî tiştekî erênî mirov dikare bigire dest. Lê dema em dibêjin pozîtîvîzm digirin dest, yan jî dema em dibêjin zanistiya pozîtîf, pozîtîvîzm yanî tiştên tên (tiştên tetbîqî) danîn. Tiştê ku însan pêk tîne, yanî ji şarîatê dûr, ji agahiya Xwedê dûr, ji îradeyekî derveyî însan dûr, tiştê ku însan bi xwe datîne, pozîtîvîzm ev e.

Desthilatdariya siyasî jî li ser vî esasî hate avakirin. Monarşî, hilweşand, li şûna wê de huquq, hilbijartin, qanûn derketin. Dewleta modern derket holê. Wê dewletê di serî de xwest navê dewleta aqil li xwe bike. Li ser vî esasî jî weke çawa dewleta aqil e, her kes lê temaşe kir. Lê bi demê re çiqasî binakoke, çiqasî berovajiyê aqil e û dijminê aqil e, çiqasî aqil dide rawestandin. Di esas de çiqasî dogmatîzmekî nû di bin navê pozîtîvîzmê de datine, eşker bû. Bi mijarên cur bi cur de tê nirxandin.

Tiştê ku em dixwazin di çarçoveya mijara xwe de bigirin dest çi ye? Însan çûn Ewrûpa, di sedsala 19'an de, çûn Ewrûpa, li wir xwendin, çûn Fransa, Îngeltira, çûn van derana xwendin. Ji ku çûn, ji Rojhilata Navîn çûn wan deran. Li Rojhilata Navîn de monarşî heye, dogmatîzm heye, meTUDEHê zanitiyê di dan û standina meselan de tine ye. Hukim bi îradeyekî Xwedayî tê

birêve birin. Mafê te yê rexnekirinê tine ye. Mafê ku tu saziyekî vî hukmî venêrîn bike jî çêbike, tine ye. Yanî meclîs, rewabûn hwd ev tişt tine ne.

Ji bo vê ew kesên çûne Ewrûpa dewlemend, rewşenbîr, her çiqasî dîndar bin jî, çûn li Ewrûpa ev tiştana dîtin. Zanistî, demokrasî dîtin, îlmê civakî nas kirin. Ji ber ku îlmê civakî li Ewrûpa pêş ketibû, raform nas kirin hwd, ev tiştana nas kirin.

Dema vegeriyan Rojhilata Navîn bi taybetî jî di sedsala 19'an de di serdema sedsala 19'an û ber bi dawîbûna wê de, destpêka sedsala 20'an de, xwestin belav bikin. Ev hewildanekî ji bo guhertina zêhniyetê bû. lê belê bi ser neketin. Rast e sîstema siyasî asteng bû, lê belê ne ji ber ku her demê sîstema siysî asteng bû bi ser nektin. Ji ber ku van xwestin şoreşa zîhniyetê bi nirxên Rojava çêbikin. Bi ragihandina nirxên Rojava çêbikin. Dîtin pê kêfxweş bûn, rast e di wir de pêşveçûn çêkiriye, mirov dikare bi çav bibîne. Lê dema ku tu têyî û weke çawa heye derbasî Rojhilata Navîn bikî, tu lê temaşe dikî kes jê re hêmbêza xwe venake. Nabe girseyî, nabe civakî, eger bûbûya civakî sîstema desthilatdar nikarîbû bibe asteng li pêşberî wê.

Lê nebû civakî, ji ber çi? Carekî din eşker bû ku şoreşa zîhniyetê di rêka ragihandina nirxên Rojava di Rojhilata Navîn de çênabe. Ev kesana ne kesên biçûk bûn. Zaniyar bûn, zanebûn, Ewrûpa dîtibûn, bi zimanan zanîbûn, pirtûk çêkiribûn. Mînak xwe wiha mensûbê gelekî jî nedîtin, mînak Cemal Dîn Efxanî, Ereb weke Ereb dizanî, Fars weke Fars dizanî, Afxan weke Afxan dizanî, Tirik weke Tirik dizanî. Ji ber ku însanekî Rojhilatî bû. Di xwest ronensesa Rojhilata Navîn çêbike. Li dijî destpotîzmê bû, li dijî monarşiyê bû, lê heyaranê Rojava bû, digot; "xwezî nasnameyek min a Emerîkî hebûya, da ku min karîba serbest bigeriyaba ma". Ji ber ku nirxê însan di Rojavabûyînê de didît. Yanî proje ne modernîzsyon bû. Proje Rojavabûyîn bû, dema proje bibe Rojavabûyîn, nirxên di Rojhilata Navîn de hey li ber xwe dide û qebûl nake. Meydanê jê re venake, wê çaxê eger ew kesana bi wê zanistiya xwe karîbana nirxên hey modern bikiribana, dibe ku nirxên heyî modern bikiribana, nû kiribana.

Dev jê berde nirxê hey modern bikin, bi zimanê sîstemê ew dinirxandin. Mînak, ev tevgerên zanistiyê yên ku em behs dikin bi çavekî nebaş lê temaş e dikirin. Yên çavkaniyên wan Rojhilat e, lê dixwestin ên Ewrûpa bînin, heyranê wê bûn. Cemal Dîn Efxanî, Mihemed Ebdu ew jî Msrî ye, Rfeat Tetawî, Ebdurehman Kewakibî, Ebdulxenî Erîsî, Mîrza Malkom, hwd, yanî gelek kesên wiha hene, di derbarê destpotîzmê de nivîsîne. Derbarê demokrasiyê de nivîsîne, derbarê her tiştî de nivîsandine, ji bo reformê. Lê belê referans ji Rojava girtine.

Ji lewre dibêjin li Rojava ev mesele wiha çêbûye, dema ku te got Rojava, nirxê ku pala xwe didin dîroka hezarê salan qebûl nake. Asîmîlasyonê qebûl nake, qebûl kirinê qebûl nake. Li ber xwe dide. Ji bo vê proja ronensasê ya ku dawiya sedsala 19'an de, di destpêka sedsala 20'an de pêş ket, raste împratoriya Osmaniya asteng kir, dogmatîzm asteng kir, lêgerîn çêbû, lêpirsîn çêbû,

mixetî, rev, zindan hwd, ev tiştên he hebûn. Lê belê ne ev bûn sersebebê ku nebûn girseyî, sedemên ku nebû girseyî ew bû ku xwestin vê projê bi derbaskirina nirxên Rojava pêk bînin. Ev bû sersebebê ku nikaribin bi ser bikevin. Tevî ku însanên pir balkêş bûne, gelek alî jî bûne. Bi zimanan dizanîn, felsefe xwendibûn, agahiyên wan zêde-zêde bû, xîtaba wan hebû, dinivîsandin, lê belê ji bo guhertina civakê û ji bo guhertina zîhniyeta civakê nebûn bingehek.

## Têkoşîna Rêber Apo Li Hemberî Hemû Zêdegaviyên Sîstemê Ye

Jixwe Rojava jî asteng dike, tevgera fikirî ya serbixwe asteng dike. Rê nadiyê, mehkum dike, bi rengekî çewt dide nîşandan. Mînak em bala xwe bidinê di roja me ya îro de Rêbertiyê tevgerekî wijdanî û zîhnî pêş dixe û nû ye. Di rastiyê de gelek jiberkirin diguherin, pêvajoyek nû dest pê dike. Tenê di şertê Kurdistanê de na, di şertên cîhanî de pêvajoyekî nû dest pê dike.

Lê hêza desthilatdar di serî de Ewrûpa ya di Rojhilata Navîn de serwer, ji nedîtî ve nêzîk dibe, weke çawa tine be. Bi îsrar dema navê Rêbertiyê tê gotin, dibêjin; Marksîst, Lenînîstekî ortedoks e, ango Marksîst û Lenînîstekî qlibgere, klasîk e. Lê di rastiyê de rexnên ku Rêbertiya me li Marksîzmê dike pir zêde ne. Rêbertî dibêje "însanekî tud rê, têkoşîna çekdarî esas digire da ku bigihêje armancê xwe". Ji ber çi wiha ye? Ji ber ku heman lîstika berê ye.

Wek ku çawa împeratorî, dewleta Abasî beramberî Muatezîle, Îxwan Sefa, Fîlezofên wê çaxê weke Îbin Sîna, Helacê Mensûr hwd, bi rengê fikirên ji rê derketî, xerab, berovajî didan nîşandan, di roja me ya îro jî ew lîstik berdewam e. berovajî dide nîşan dan. Ji bo çi, ji bo ku bê berxwedan, bê rayeksyon, her kes fikirê wan qebûl bike.

Dema ku fikir hate qebûl kirin, dema zîhniyet hate qebûl kirin, wê çaxê civak dibe meydanek ji bo hegemoniya wan. Lê em bala xwe bidinê Rêbertî di vir de hem tevgerekî zîhniye, hem jî tevgerekî wijdaniye. Zêhniye ji ber ku heta asta dawî bi agahiyên zanistî, civakê û însan şîrove dike. Bi astê herî pêşketî di zanistiyê de digire dest, bi kuantomê digire dest, bi fîzîka kuantom digire dest. Rêbertiya me şoreşeke di zîhniyetê de, ango her demê aqil ji nûbûnê re vekirî dihêle. Weke sinduqekî girtî, wiha tije bû hate girtin na, vekirî û her demê xwe li ser esasê derbaskirinê tevgera zîhnî çêdike.

Em bala xwe bidinê, Rêbertî dîlê tiştê ku duh gitiye namîne. Em bala xwe niha jî bidinê di Parastina Gelekî de em lê temaşe dikin, hinek tesbîtên Rêbertiyê hene, di parastinên xwe yên roja me ya îro de dema em dixwînin jî hinek din hene, ne weke hev in. Ji ber ku di çarçoveya daneyê wê çaxê de encax Rêbertî ewqas dikarî bû îfade bikiriba, di çarçoveya daneyê îro de ewqasî dikare îfade bike.

Ji lewre ev li gel Rêbertiya me tine ye ku bêje min duh ev gotiye, divê ev wiha bimînim, ev li gel Rêbertiya me tine ye. Rêbertiya me tevgerek wijdanî berfireh pêş dixe. Mînak, hilwesta Rêbertiyê li hembeî dewlet-netew tevgerek wijdanî ye. Ji ber ku dewlet-netew her tiştî dadqurtîne, dixwe bêrhem e. Mezheb, dîn, komên etnîkî, eşîret, qebîle, hemû rengê ku pêdiviya wan ya jiyanê heye, hemû rengên ku jiyan heq kirine, bi mekanîzma dewleta netew a bêrehm û zalim tê daqurtandin û tê înkar kirin.

Rêbertî hesasiyeta parastinê derdixîne pêş. Ji bo vê Zêdegaviyên ku îro sîstem li ser mafê mirovan dike, ne Ewrûpa, lê Rêbertî şiyariyan dike. Zêdegavî çêdibin, mînak Rêbertî behsa wê dike, Rêbertî behsa asîmîlasyonê dike, ev zêdegavî ne. Rêbertî behsa navê netew, mezheb, cins, biçûk, mezin, di astê herî jorîn de behs dike da ku di însan de bicih bike û însan wan mafana qebûl bikin. Beramberî zêdegaviyên ku li ser wan mafan çêdibin, însan rayeksyonê nîşan bidin, ev tevgera wijdaniye, van pêş dixe.

Lê sîstema desthilatdar weke ku çawa tine ye nîşan dide. Her demê bi rengekî berovajî nîşan dide. Li gorî xwe nîşan dide. Beramberî vê desthilatdarî bi vî rengî her demê tevgerek xwestine rewşa hey derbas bikin û wiha nîşan dane, da ku wan tesfiye bikin. Lê astengiya bingehîn çi ye, ew despêka sedsaliya 19-20'an de tiştê ku hewildanê ronensesê di Rojhilata Navîn de ya ku çêbûyî çima bi encam nebû, sedemên wê bi nirxên ji rastiya vê civakê dûr xwestin vî karî bikin; ango bi nirxên ji rastiya vê civakê dûr. Bi nirxên ku pala xwe nadin danehevên çandî, civakî yên herêmê, li ser esasê ragihandina ji derve anînê, yanî barkirinê dixwestin pêk bînin. Tevî zanebûn, îsrar, înad û hilwestên wan yên car bi car wêrek jî, lê nikarîbûn bibin girseyî. Nikarîbûn bibin malê civakê, ji bo vê jî nûbûn pêk nehat. Dema nûbûn pêkneyê, kevn her demê xwe dide berdewam kirin.

### Bandora Zihniyetê Li Ser Qadên Jiyanê

Jixwe dema em zîhniyetê nîqaş dikin, ji ber bandora wê li ser gelek meydanên jiyanê heye, ji bo vê mirov dixwaze wiha berfireh bigire dest. Projên civakî jî dema ku di aliyê zîhniyetê ve zelalbûnê çênekin û li ser esasê mentiqekî rast xwe nedin rûniştandin, piratîkbûna wê jî zor e. Yan jî piratîkbûna wê bi xwe re pirek pirsgirêkên hîna cidîtir derdixîne, krîzan derdixîne. Ji bo vê xala zîhniyetê girîng e ku mirov li ser bisekine.

Bi giştî di jiyana mirovan de jî mirov bala xwe bidiyê, bawerî, zanistî, ev xalana şeklê jiyanê jî nîşan didin. Mînak em bêjin; eger îro di aliyê madî de Ewrûpa li pêş e, ev ji nêzîk ve girêdayî zêhniyetê ye. Tevgera zêhnî ya ku li wir çêbû di sedsala 14-15'an de jî ya însanan bi rengekî takekesî parastin, xwarin, vexwarin, tendurûstî, perwerde, li Rojhilata Navîn ji ya Rojava bilintir bûye.

Lê belê guhertinên zêhnî yên ku li wir çêbûn, bandor li ser jiyana madî jî çêkir. Li derekî ji rêzê mirov ku bigire dest bila bigire dest, mirov lê temaş e dike şêwazê jiyanê û fikirê însanan ji hevdu diyar dibin. Mînak em bêjin di bajarekî de Xiristiyan,

Yahudî, Misilman, Ereb, Kurd Rom hene hwd, heman mirov dikare li gorî şêwazê jiyanê koçên (mehelê) wan ji hevdu cuda bike û mirov dikare texmîn bike ka çiqasî felsefa pê dijî bandorê li ser şêwazê jiyana wan jî dike.

Di aliyê paqjiyê de, tendurûstî, xwarin, vexwarin, di gelek aliyan de. Lê dema tu di aliyê cihê hatina wan ya madî de tu bipîve gengaz e yek Misilman ji yê xirisitiyan dewlementir be, di aliyê madî de. Lê tu li asta wî ya jiyanê temaşe dikî, jê kêmtir e. Ji ber çi, ji ber ku di zêhniyetê de ferq heye. Ji bo vê em li ser zêhniyetê radiwestin.

MeTUDEHên zanistî di nêzîkbûna ji meselan re rê li pêşiya mirovan vedike. Em bala xwe bidinê, di gerîlatiyê de dubarekirin ji çi tê? Dubarekirin, jiberkirin, yanî însan xwe naguhere. Mirinê dide ber çavê xwe, lê guhertinê nade ber çavên xwe. Dogmatîzm di wir de ye. Ew jî mentiqeke. Herwiha gelek miletên cîhanê li ser vê xalê rawestiyane.

Mînak ev jî gotine; ferq û cudatiya di navbera aqilê rast û yê çewt de, di şer de çiqasî bandora wê heye! Aqilê rast, ew aqilê ku ti carî xwe dubare nake, di cihekî de asê nemîne. Her demê bi pîvanê û nêzîkbûnên nû nêzîk bibe, mijaran wiha bigire dest. Aqilê çewt jî ew aqilê ku di meselekî de asê dimîne. Di tiştekî de asê dimîne û ji lewre xwe dubare dike. Nikare bi rengekî cuda kar bike. Ev hîna beriya hezarê salan alemê îsbat kiriye ka çiqasî xerabiyê bi xwe re tîne. Aqilê çewt çiqasî xerabiyê bi xwe re tîne.

Lê belê em bala xwe bidinê di gelek aliyan de hewildanên guhertinê çênabin. Ji ber çi ye ev, ji ber ku ev mesele nêzîkbûnek zêhniye. Hînbûyîn, alimandin, jiberkirin û ragihandin esas tê girtin. Lê lêpirsîna aqil tê de tune ye. Ji bo vê zêhniyet kengê rast e, dema ku tiştên tu pê bawer, tu karibî bi zanistiyê re bipîvî. Wê çaxê mafê xwe yê hebûn û tinebûnê pêwîst e nas bike.

Yanî mesele eger baweriyek min hebe, ew bawerî kengî rast e? Dema ku rastî bi zanistiyê rastiya xwe îsbat bike. Bi tiştê hey rastiya xwe îsbat bike. Lê gelek tiştên em pê bawer, em pê bawer in, em pê tevdigerin, lê zanistî tesbît nake. Lê em digirin, weke nirxekî em diparêzin. Heta em li ser rexnan jî qebûl nakin. Ev pirsgirêk ne tenê pirsgirêka Kurd e. Pirsgirêka hemû gelê Rojhilata Navîn e.

Jixwe em li Rojhilata Navîn van meselan digirin dest. Li Rojhilata Navîn eşker bû ku her tişt bi rengê zanistî, pozîtîv mirov bigire dest jî nerast e. Ji ber ku hinek tişt hene li Rojhilata Navîn tenê bi zanistiyê rave nabe. Ji bo vê ew dijîtiya di navbera meteryalîzm û îdîalîzmê de, di navbera bawerî û zanistiyê de, ew dijberî weke çawa li Ewrûpa bi rengê dualîtekî li ser esasê hevdu red kirinê, mirov hewil bide li Rojhilata Navîn bide rûniştandin, ew zor e!

**Rojhilata Navîn Bê Hêza Ruhî Nikare Bijî**

Dibe însanek du-sê însan di van aliyan de zelaliyên xwe çêbikin. Ew jî dimînin kesên Elît bi civakê re nikarin bi yek bin. Ji ber ku hêza ruh di hundirê vê civakê de pir balkêş e. Bê ruh nikare bijî, çima? Ruh exlaq jê re peyda dike, yanî jê re pîvanên exlaqî peyda dike. Tenê mesele bi rengê zanistiyê, bi meTUDEHên zanistiyê girtina dest, bi menhecê zanistiyê girtina dest, wê çaxê pîvanê ruhî, wijdanî, exlaqî ji holê radike.

Ev di Ewrûpa de pêş dikeve. Heta roja me ya îro jî dimeşe, ev pênsed sal e, hema dimeşe. Nirxên civakê yên exlaqî, heta astekî li ber xwe didin, lê belê di esas de nasnama serwer, nasnama znistiya pozîtîve.

Lê ev di Rojhilata Navîn de çênabe, çima çênabe? Ji ber ku ezmûnê îsbat kiriye ku çênabe. Hinek kesan dîn înkar kirin û rastî jî xwestin bi rengê xîtaba serkeftinê nêzîkî civakê bibin, bi tevgera serkeftinê nêzîkî civakê bibin, heta mizgeft rûxandin, yên weke Mustefa Kemal Eteruk, qedexekirin, ev tiştên ha kirin, lê mirov lê temaşe dike ku zêde encam negirt.

Nizanim, eşîret qebîlet, red kirin, gelek desthilatî hene niha li Rojhilata Navîn dema ku bûn desthilatdar li ser esasê red kirina eşîretê, qebîletê, dîndariyê, lê piştî sî-bîst-pêncî salî ji desthilatdariyê, me dît ku careke din vegeriyan qebîlê, eşîretê, dîndariyê hwd, vegeriyan van tiştan. Wê demê ew nêzîkbûna pozîtîvîst ê Ewrûpayî, yê Rojavayî mirov li vir tetbîq bike û bêje ev şoreşeke zêhniyetê ye, ev pêk nayê û bi ser jî nakeve.

### Divê Mirov Îlm Û Ruh Ji Hevdu Qut Neke

Ji bo vê tiştê ruhî û zanistiyê divê ku li gel hevdu bimeşin. Di tiştê ruhî de exlaq, ne dogmatîzm. Di tiştên zanistiyê de jî wer bi rengê zanistî bibe weke dînekî na, lê zanistî bibe weke lêgerînek azadiyê. Yanî zanistî nebe fermî û nekeve xizmeta desthilatiyê. Zanistî ji bo berjewendiyên desthilatiyê û peyda kirina welatiyek homojen tîpîk yê li gorî desthilatiyê na, zanistî li ser esasê ku xwe înkar bike di esas de çêbibe, yanî her demê ji astekî derbasî astekî din bibe. Di cihekî de asê nemîne, di xizmeta yek desthilatiyê de asê nemîne. Her demê ji bo ku civakê nêzîkî rastiyê bike, nêzîkî heqîqetê bike di nava têkoşînekî de be. Yekdestî tê de tine be, di xizmeta filan kesimê de nebe.

Ji bo vê şoreşa zîhnî li Rojhilata Navîn wê bi çi awayî çêbibe? Gelo, şoreşa zêhnî weke çawa îro hinek hewil didin di rêka Îslama siyasî de, yan jî di rêka hinek rêxistinên lîberal, modernîstên dixwazin weke proje pêşkêş bikin, li ser esasê nirxên ezezî, lîberalîzmê. Bi vî rengî gelan pêş bixin û vê çandê belav bikin!? Derdikeve pêş, ev ya encamê nagire, xerabiyê çêdike. Pirsgirêkan derdixîne pêş, civakê perçe dike. Ji ber çi, ji ber ku ev nirxana xerîb in, biyanî ne û însan nikare bike perçek ji xwe. Nikare pê re bijî, kêm dimîne. Aramiyê nade, kes têr nake. Pirsgirêkên kesayetê yên civakî yên herêmê çareser nake, tam berovajiyê vê, bi gelek tiştan re berovajî dibe.

Mînak di roja me ya îro de civak li ber xwe dide. Yanî civak rêxistina wê tine, dewleta wê tine, hêzê wê yê leşkerî jî tine, lê li ber xwe dide û dike hewar û qêrîn. Ji ber çi? Ev êrîşa zîhniyeta modernîta kapîtalîst ya ku li ser, ew xistiye pêxîrtengiyê, xistiye krîzê û ji xwe biyanî kiriye.

Bi temamî şêwazekî jiyanê yê jê biyanî, wer ji exlaq, ji pîvanên exlaqî dûr tê ferz kirin, ev dibe sersebebê xerabiyê. Heta bi rengê rayeksyonên pir tund jî xwe nîşan dide, carinan jî xwe teqandinê, carina bi çalakiyên wiha heta asta dawiyê bêrehim, ew rayeksyon xwe nîşan didin.

Niha xalek din jî, vê dibêje; dibêjin jixwe pêdiviya me tine ye ku em guhertinê bikin tine ye, dîn, exlaq, fikirê me heye, ji ber ku em jê dûrketine em pirsgirêkan dijîn. Em carekî din lê vegerin pirsgirêkên me namînin. Di rastiyê de ew jî weke yê berê xerab e. Ji ber çi, ew vê carê tevgera civakê ji nedîtî ve nêzîk dibe. Ji ber ku civak tevger e, nifş e, ciwantiye, zayîne, her demê nûbûne. Ji nedîtî ve nêzîkî wê tevgerê dibe. Weke çawa tevger tine be. Dixwaze weke çawa demjimara zeman paş de vegerîne, civakê di pîvanê 1400-1500-2000'hezar sal berê bide jiyîn. Ev îrtîcaî ye, îrtîca çi ye? Îrtîca, gotinekî Erebiye, yanî paş de vegerandin. Vegerandina ku? Vegerandina koka, esl, selef, vegera wir. Ji bo vê tevgerên koktan, ji lewre em dibêjin tevgerên dînger, îrtîcaî, usulî, selefî em dibêjin, ev hemû jî navekin.

Armana jê vegerandina wir e, yanî dibêjin; pêdiviya me bi nûbûnê tine ye. Ev tevgerên ha çareseriyê nayînin, bi wê çekî beramberî Rojava nikarin bisekinin. Eger rojekî ji rojan bi ala Îslamê Selahedîn Eyûbî xaçperest ji Qudsê derxistin, ew wateyek wê hebû. Wê çaxê zîhniyet li Rojhilata Navîn ji Rojava pêşketîtir bû.

Ev zîhniyeta pêşktîtir jî bandora xwe di meydanên cuda, cuda de jî nîşan didan. Di aliyê leşkerî, siyasî û civakî de jî bandorên xwe nîşan didan. Ji bo vê weke dagirkeriyekî mayende, xaçperestan nekarîbûn di herêmê de bimana, ji bo vê Selahidîn rehet dikarîbû wan derxe ji herêmê. Lê belê Usama Bilandin nikare Emerîka ji herêmê derxe. Ji ber çi, ji ber ku Rojavaya îro ne weke Rojavaya seferên xaçlîne. Rojavaya îro destê wê de zanistiyê, felsefê, makîne, sîlah û zanistiyê de heye. Ev bi şûrê çaxê navîn bi kevneşopiya 1400 sal berê, nikare bê şer kirin, nikare berxwedanekî serkeftî pêk bê. Dema ku mirov li kokê van tevgeran jî temaşe dike, bi rengekî yan jî rengê din rasterast yan jî nerasterast, bi emperyalîzmê ve girêdayîne. Ji bo vê Rêbertî dibêje; "têkoşîna van encex li ser ku çawa karibin weke kuçikan li devê deriyê modernîta kapîtalîst bin ku ji bo xwe hinek hestî peyda bikin, hinek par peyda bikin. Weke proja avakirina civakekê bê krîz na. Wê demê wê çi bibe?!

Niha pirî caran em behsa tez-antî tez-sentez dikin, sentezbûyînek pêwîst e. Di roja me ya îro de tez çi ye? Tez Ewrûpa ye, yanî Rojava ye, tez modernîta kapîtalîste. Ev tez bi çi xwe nîşan dide, bi gelek taybetmendiyên xwe bi meTUDEHên xwe yên zanistî, yanî fikirên xwe yên îlmê. Ezeziyê, lîberalîzmê û

pyasa serbest esas digirin, lê belê di esas de zanyariya xwe dide pêş.

Ji lewre em îlmparêziyê red dikin, di wextê ku em heta dereca dawiyê îlm esas digirin û xebatên îlmî xebatên pîroz nas dikin, lê em îlmparêziyê red dikin. Îlmparêzî çi ye, yanî dema ev peyva parêzî bi van gotinan ve dibe wateya wan tê guhertin. Wateya wê çawa tê guhertin, dikeve xizmeta sîstemê. Yanî îlm di esas de lêgerîna li heqîqetê ye, ango azadî ye, ji bo vê sînoran nas nake. Ji bo vê ti carî qebûl nake bibe xolam ji bo sîstemê. Ji ber ku sîstem demborî ne, ne mayende ne. Lê îlm lêgerînekî mayende, bênavber bi dûv heqîqetê de ye. Însan her tiştekî nas dike, lê temaşe dike ku hîna hinek tiştên din nas nakin, ji lewre di nava hewildanan de ye.

Dewlet çi dikin, dewlet di çarçoveya mayendebûna xwe de îlm bi cih dikin. Îlm çiqasî jê re artêşê çêbike, çekan çêbike, peran peyda bike, karxanan çêbike, di wê çarçavê de digire dest. Ji bo vê îlm ji zemînê civakê derdixe û dike yekdestiya xwe. Ew îlmparêziye, ew dogmatîzm e, ew dînê nû ye, yanî dînê kapîtalîzmê yê nû ye. Heta ziyana ku îro dighîne civakan ji aliyê asîmîlasyon, xerakirinê ve, ziyana ku rahîbên Sumeran digihandin civakê ewqasî nebû. Yanî ziyana îlmparêziyê niha ji ya rahibên Sumeran divê çarçoveyê de zêdetir e.

Lê belê ev tez di encamê de derdikeve. Tez çi ye, yanî weke gotin, tiştek anîna navînê ye, dozek e, meselak e, bi xwe heye xwe nîşan dide, xwe îfade dike. Beramberî wê yê dijber heye, em vê jî bi navê antî-tez digirin dest. Di roja me ya îro de mirov dikare di aliyê şaristaniyê de, herêma Rojhilata Navîn weke antî-tez bigire dest. Bi baweriyên xwe, bi rewşa xwe ya erdnîgarî, bi sîstema xwe ya siyasî, weke antî-tez mirov dikare bigire dest. Ji ber ku berovajî ye.

Wê demê niha sentez çi ye? Sentez ragihandinên mîkanîk nînin. Mînak em li vir, Ewrûpa tez e, em jî antî-tez in, em hinek maşînên Ewrûpa bînin vir bikar bînin û hinek tiştên teknîkî, hinek pirtûkan wergerînin, wê demê mesele çareser dibe! Ev nêzîkbûnek berovajî ye, nêzîkbûnek mekanîk e. Tez-dozeke, antî-tez doza li dijî wê ye, wê demê sentez têkel e (karışım e). Tevlîhev bûna wê ye, yan jî hibirdank wê ye, ya ku ji her du yan pêk tê.

Lê ev hibirdank, hibirdanek mîkanîk nîne. Yanî wer bi neqandinê ez ê çend tiştan ji vir bigirim û çend tiştan ji wir bigirim û tevlîhev bikim, temam dibe, bi vî rengî nabe. Murekeb ji bo sentez çareserî be, girîng van esas bigire. Yanî bi mentiqê derketina ji krîzê yan jî derBeaskirina kaosê. Ji bo çareserî pêk bê girîng e van meselan esas bigire.

Niha li Rojhilata Navîn hinek tişt hene yên erênî ne, mînak hêza exlaq, ew erênî ye. Mînak civakbûyîn, erênî ye, hinek bandorên komunalîzmê, berpirsiyariya beramberî hev, ruhê hevşêwrînê, ev hemû tiştên erênî ne. Gelek tiştên weke van hene. Lê dogmatîzm, xerabî heye, dstpotîzm heye ev hemû tiştên xerab

in, van ti carî mirov divê weke rastiya xwe qebûl neke. Neparêze û nekeve rewşekî parastina wan.

Di Rojava de îlm û zanistî heye, wê demê sentez çi ye. Sentez aktûel kirina nirxên civakî, komunalîzmê, hevşêwrînê, exlaq, ruh û bi berpirsiyartiyê. Bi aktûel kirina van tiştan bi îlmê çaxê, bi çaxa ku em pê dijîn bi îlmê wê. Yekkirina wan bi hev re, divê ku tiştekî wiha çêbibe ku bi temamî nû be. Dema mirov lê temaşe bike, divê mirov wiha nebîne ev xal ji Ewrûpa hatiye, ev ji Rojhilata Navîn hatiye, ev nizanim çawa bûye! Divê ev tê de diyar nebin, dema ev tê de diyar bû, wê demê tê de tenê dimîne ragihandinek mîkanîk. Weke çawa car bi caran Tirik dixwazin bikin. Car bi caran hinek Ereb, Lubnanî dixwazin bikin. Tu lê temaşe dikî tu dibînî ku filan tişt ji Ewrûpa hatiye, filan tişt ji Rojhilat hatiye hwd. Bi vî rengî çêdibe. Ew ne sentez e, sentez nûbûyîne. Tiştekî nû yê civaka însanî ye, malê filan kes, bêvan kes nîne. Nirxên îdîal, civakî ye, komunal e, berpirsiyartî ye, exlaq û wijdan ên ku hîna li Rojhilata Navîn li ber xwe didin. Taybetmendiyên civaka xwezayî temsîl dikin, ya însanî temsîl dikin.  Em ê wan çawa bidin jîyîn, belê bi kevnarî na, bi meTUDEHên (menhecê) îlmî yên nû re em ê çawa bikin yek!

Bi vî rengî wê çawa rêbazekî nû yê jiyanê derbikeve. Ji bo vê şoreşa zîhnî li Rojhilata Navîn bi ragihandina Ewrûpa nîne, gengaze wê derbas bike. Demokrasiya Rojhilata Navîn teqez divê demokrasiya Ewrûpa derbas bike. pêwîst e mafê mirovan derbas bibe, divê pîvanên nû derbikevin.

Heta em wan ji bo xwe bikin pîvan, em nikarin pirsgirêkê çareser bikin. Ji bo vê ji nû ve çêbûyîn, yanî ronensesa Rojhilata Navîn, tiştekî wiha ye, tu rêkên çareseriyê peyda bikî, ne ku tu yê Ewrûpa biceribînî. Ew tiştên wan ji bo wir dibe ku karibûn ji kaosê derbikevin. Ne yê ku Emerîka ceribandine, bi temamî wê cuda bin. Li ser esasê hunandinekî wiha şareza, di navbera nirxên civakî û yên komunal ên însanî, yên ku hêj taybetmendiyên civaka xwezayî tên, di navbera meTUDEHên îlmî yên weke nasnama çaxê me yê îro ye.

ji ber ku bê îlm mafê me yê ku em di vê çaxê de bijîn tine ye. Ev çax ne çaxê mîtolojiyê ye. Ne çaxê dînê Yekxwedayî ye. Ne çaxê tenê felsefê ye jî, çaxê îlm e û ev çax rola xwe dileyîze. Îlm û teknolojiya pêş ketî di roja me ya îro de bo sersebebê ku li Rojhilata Navîn dewletên destpot, totalîter krîzê bijîn. Ji ber çi, pêşveçûna îlm di serî de li Rojhilata Navîn û li Ewrûpa jî bo sersebebê ku dewlet û saziyên bi dewletê ve girêdayî êdî nema dikarin pêdiviyên civakê bibersivînin. Zîhniyeta însanî pêşketiye, daxwaziyên însanan zêdebûne. Lêgerînên însan zêdebûne, pêdiviyên însan yên zêdebûne. Ev hemû îlm jê re pêşkêş kiriye. Teknolojiya pêşketî jê re pêşkêş kiriye, ji bo vê jî dewlet û saziyên bi dewletê ve girêdayî êdî nema dikarin bersivê bidin û krîzê dijîn. Ji lewre li beramberî rayeksyonên gelan nema dikarin li ber xwe bidin.

Ji lewre dîsa hewildidin kenalîzeyên berjewendiyên xwe bikin.  Lê babidin, îhtîwa bikin, beravêtî bikin, her rengê lîstikan

dixwazin bikin, lê di encamê de sîstem li ser esasê pêşveçûna îlmî leriziye. Ji bo vê jî bê qebûl kirina nasnama îlmî di vê çaxê de mafê me yê jiyanê tine ye. Em nikarin bijîn û vê mirov esas bigire.

**Li Rojhilata Navîn Serweriya Fikra Dewlet Netew**

Li ser vî esasî niha dema ku em dibêjin dogmatîzm, weke pirsgirêkekî serekî, li van welata ye, ew ji vê tê. Niha dîn hakim e. Weke dîn hinek tiştên din jî hakim bûne. Mînak fikirê dewlet-netew, îdeolojiyên nasyonalîst, heta cih bi cihnan de mixabin îdeolojiyên çep; niha dogmatîzm çi dike? Em vegerin mînaka Îmam Xezalî di sedsala 12. de 1111'dan de yê ku derketin û derbek mezin li îştîhadê xistin. Rê li pêşiya îştîhadê xistin. Yanî rê li pêşiya lêgerîn û lêkolînê girtin.

Ev pîvanan datîne. Ew pîvan li gorî wî divê bi tevgera zeman û mekan re bandor nebe. Yanî razber be, tiştek Xwedayî be, têkiliya wê bi tevgera zeman û mekan re tine be. Li her derê motleq be, pîvanê Îslamê ev bû. Niha ev bi vî rengî ferz dike û ewlet li ser wî esasî sazîbûyînê çêdike. Hikum çêdike, li ser esasê şerîatê zagonan derdixe.

Şarîat ji ku hatiye? Ji wan nêzîkbûnên dogmatîk, yên ku fikirê Îslamî ji zeman û mekan razber (suit) digire dest. Yanî dibêje; pê bandor nebe. Mînak li ku dibe û li her derê û li her demê divê ku weke xwe be. Ev bi hêza dewletê meşrûayetê qezenc dike. Dewlet her demê li Rojhilata Navîn bûye weke qalibekî ku hemû rengê lêgerînan asteng dike, tesfiye dike, dikuje. Ji bo vê dogmatîzm xerab e. Lê belê dema ku em dibêjin dogmatîzm xerabe û heta asta dawiyê divê mirov ji dogmatîzmê dûr bikeve. Ev divê ku rê li pêşiya hinek tiştên din, yanî ji rê derketinên din re rê veneke.

Lîberalîzm di roja me ya îro de dibêje; "tiştekî ku mirov biparêze nema ye. tiştekî ku hêjayîbe mirov biparêze tine ye. Lê ew dizane çi diparêze, zelale, ji bo vê Rêbertî dibêje; "înflasyona fikir çêdike, lê yê jê re pêwîst û li gorî berjewendiyên wê baş digire dest. Yê ku tine û yê ne li gorî berjewendiyên wê asîmîle dike û di nava xwe de dihelîne û dike xizmeta xwe. Ên xizmetê red dikin, ji derve de dihêle û tecrîd dike, ji derve dihêle û rêka jiyanê li pêşiyê qut dike.

Wê demê ew fikirê xwe nas dike, ji bo çi xizmetê dike jî dizane. Di vir de gelek caran em dibêjin; îdeolojî, îdeolojiya me hate guhertin, ne hate guhertin, girînge bê guhertin, yan jî neyê guhertin, ev rê li pêşberî nîqaşê ku wiha hêza me kêm dike û vala xerc dike vedike. Bêguman îdeolojî tiştekî motleq nîne. Îdeolojî û bi taybetî jî îdeolojiyekî şoreşgerî li dijî dogmatîzmê ye. Îdeolojî ahenga wê her demê divê bi tevgera zeman û mekan re hebe. Her demê xwe nû bike, her demê deriyê wê vekirî hebe û qalibger nebe, dogmatîk nebe.

Lê belê, îdeolojî çi ye? Îdeolojî exlaq e, baweriye, fikir e, çand e, sîstematîka van e. Lê belê ji vê girîngtir îdeolojî di heman demê de ji projeyekî civakî re xizmetê dike. Ew proje xizmeta çi

dike û li ser çi esasî xwe dide rûniştandin? Li ser esasê ferdî, ezezî, komunal ew wê nîşan bide.

Ji bo vê dema em xwe bigirin dest û em lê temaşe dikin ku sîstematîka me ya exlaq, bawerî, çand, fikir û bi taybetî jî armancê, yanî proja me ya civakî de guhertinên bingehîn ên bingehîn ên radîkal, çênebûne. Dîsa pîvanên exlaqî yên li ser esasê berpirsiyartiya beramberî, nirxên civakê em ji bo xwe esas digirin, wê çaxê jî me ji bo xwe esas digirt. Dîsa çandekî me yê li ser esasê wekheviyê heye. Dîsa proja me pala xwe dide nirxên komunal, ji bo vê em dibêjin; îdeolojiya me nehatiye guhertin.

Lê belê pradîgma me hatiye guhertin. Ferq û cudatiya di navbera pradîgma û îdeolojiyê de di ku de ye? Pradîgma nerîneke, yanî nêzîkbûnekî fikiriye, ev nêzîkbûna fikirî weke ku mirov çawa teswîr bike, weke zemînekî ye û li ser wî zemînî mirov li tiştê bingehîn temaş dike, pradîgma ew e.

Di wî zemînê fikirî de mirov li çi dinihêre? Mirov li civakê û dewletê temaşe dike. Nerîna xwe ya di derbarê dewlet û civakê de mirov zelal dike. Pîvanan diyar dike, em ê çi hilbijêrin, pîvanên me yên hilbijartinê diyar in. Yanî ferq û cudatiya di navbera başî û xerabiyê de ye û şêwazê gihandina armancan diyar dike. Şidet, ne şidet, rengên wê diyar dike. Ji bo vê em dibêjin me di pradîgma de guhertinên bingehîn çêkirine.

Nêzîkbûnên me yên ji dewlet û civakê re hatine guhertin. Nêzîkbûnên me yên ji takekes û komînê re hatine guhertin. Nêzîkbûnên me yên şêwazê têkoşînê hatine guhertin. Hezkirin û aciziya me ya beramberî pirek tiştan hatiye guhertin. Yanî tercîha me hatiye guhertin.

Lê belê proja me ya civakî dîsa pala xwe dide nirxên komunal. Ji bo vê dema ku em bêjin di aliyê îdeolojî de em hatine guhertin, dibe ku zehmetiyek be, lê me ewqas tişt di îdeolojiya xwe de dewlemendî çêkiriye ku êdî binya me ya çandî, ruhî, exlaqî, wijdanî mezin û berfireh bûye, ewqasî li beramberî hinek pirsgirêkan em hesas bûne. Pirsgirêka jinê, zarok, perwerdê, ya ayîdiyetê hwd, gelek pirsgrêkên din jî em ewqas hesas bûne, ev dewlemendiya îdeolojîk e, kûrbûna îdeolojiyê ye. Ev îsbat dike ku em ne dogmatîk in. Ne qalibparêz in. Gelo kesên qalibparêz di nava me de tine ne? Hene, îro jî di nava me de gelek heval hene, dixwazin bi îsrar nêzîkbûnên Rêbertiyê yên nû di suzgêça pradîgma xwe ya kevn re derbas bikin. Dibêje; Rêbertî weke min difikire, yên wiha hene. Bi şêwazên cuda cuda jî pûç dikin jî hene. Kesên ku henekên xwe bi pê dikin hene, seresera nêzîk dibin jî hene.

Dogmatîzm ew e, di kevn de asê mayîn jî ew e. Hayê wan jê tine ye ku ev îdeolojiya me, îdeolojiyek motleq ya di sala 70’iyî de nîne. Heman sîstematîk e, lê belê 2000’î û bi şûnda ye. Bi wî deriyê xwe yê vekirî karîbûye xwe dewlemend bike. Bi ne dijberiya xwe ya beramberî tevgera zeman û cih de, karîbûye xwe dewlemend bike. Bi ruhê zeman re dimeşe. Ruhê zeman agahiye, nûbûyîne, nifşê nû ne.

Bi vî rengî divê ku mirov nêzîkbûna di navbera prensîb û dogmatîzmê de ji hevdu derbixe. Li ser vî esasî zîhniyet esas e, zîhniyet jiberkirin nîne. Yanî formîl nîne, jiberkirin nîne, jiyan e, di xwe de rûniştandine, di xwe de bi cih kirine û esas guhertina zihniyetê kengê mirov dibîne dema ku di jiyana madî de xwe îfade kir. Wê çaxê mirov dibîne.

Ji bo vê mesele gelek kes gengaze dibêjin; bi xwendina pirtûkan em ê zîhniyeta xwe biguherin. Ew faktoreke, lê pê nayê guhertin. Jiberkirine, jiberkirina hinek îbare, formîla ye, zîhniyet ew nîne. Zîhniyet dema ku tu karibî tiştê tu pê bawer, tenê bi jiberkirinê bes nebî, ji bo xwe bikî yulendiriciyê hundirîn, yanî liv û tevgera te ya rojane, nêzîkbûnên ji başî û xerabiyê re ew diyar dike. Weke çawa motorekî di hundirê te de be, ew tewiciha te ber bi rastiyê, xerabiyê, yanî çalakiya te ya ji rastiyê û xerabiyê re diyar bike. Nêzîkbûna te ji meselan re diyar bike. Ji bo vê bi hezaran pirtûk bixwîne, lê dema pirsgirêkek tê ber te tu bi şêwazê bab û kalan tu çareser bikî, ew tê wê wateyê ku te ti guhertinên zîhnî çênekirine.

Tu nikarî nerazîbûnên xwe kontrol bikî, te guhertinên zîhnî çênekirine. Ji bo vê jixwe di vir de şaşiyek heye, gelek hevalên me dixwînin, bîst û çar seatan dixwînin, lê nerazîbûnên xwe nikarin kontrol bikin. Lê rêkên çareseriyê nikarin dayînin, lê nikare bi wan prensîban bijîn jî. Jixwe ev bi zîhniyetê re nabe yek. Pirsgirêk di vir de ye.

Ji bo vê ev pirsgirêk koklî ne, yanî gelek alî ne û her demê divê ku (silukê mirov yê ferdî) (yanî dewranişê me yê rojane), liv û tevgera mirov ya takekesî, yanî liv û tevgera me ya rojane divê hebe. Heger ew liv û tevgera me ya rojane ezezî be, lîberal be, kevneperest be, dogmatîk be, lê agahî çiqasî nû dibin bila bibin, ti fayda wê tune ye. Yanî ji bo şoreşa zîhniyetê, yan jî guhertina zîhniyetê rolekî naleyîze.

Jixwe ev pirsgirêkên derbarê zîhniyetê de bû, ji lewre îro zemînê guhertinê heye. Derfetên guhertinê hene. Ji ber çi derfetên guhertinê hene? Ji ber ku gelek qalib, mînak dînparêzî weke projeyekî dîzayîn kirina civakê, zêde nikare xwe ferz bike. Dera ku tê de hakim bû, serdest bû, krîzê bi xwe re tîne. Li Efxanistan, Îran hwd, cihên cuda jî krîz bi xwe re anî. Sosyalîzma pêkhatî, nikarîbû bi ser bikeve, modernîta kapîtalîst nikare bi ser bikeve. Yanî em îro lê temaşe dikin di Rojhilata Navîn de çalakiyên cur bi cur hene. Îdiaya wan ya pêkanîna civakê, yan jî îdiaya wan ya ku birêve birina civakê, qels bûye.

Ji bo vê îro ji her demê bêtir zemîn ji şoreşa zîhnî re pêkhatiye. Yanî zemîn ji şoreşa zihnî re pêk hatiye. Ji ber ku kesên asteng in ergomanên wan têra ku li ber xwe bidin nake. Yanî sedemên ku nîşan didin ji bo ku li ber xwe bidin û xwe heqlî derbixînin, xwe motleq bibînin têrê nake. Tam berovajiyê vê, hemû karê rojane îflas kirina wan îsbat dike.

Li ser vî esasî zemanê şoreşekî zîhnî heye, lê ev şoreşa zîhnî weke me got şoreşekî jê re ked pêwîst e, xwe rêxistin kirin,

bawerî, fedekarî jê re pêwîst e, di her şertî de wiha têkoşînekî bêhempa jê re pêwîste ku karibe bibe mînak.

Eger ew tine be nabe, mînak însanên ku karibin, yan jî têkoşînên karibin li ser civakê bibandor bin, divê ku însanên wan di wê astê de bin karibin bala civakê bikşînin ser xwe. Karibin bi taybetmendiyên xwe pîvan bin ji bo civakê. Weke çawa civak di teqlîd kirina wan de, di şûpandina wan de aramiyê bibînin. Xelekên xwe yên wendayî peyda bikin. Tiştê ku lê digerin peyda bikin, tiştên xwe yên wendayî di wan de bibînin. Moral ji wan bigirin, heyecanê bigirin, ger ev kesayetên wiha peyda bûn, wê çaxê civak dikare bê guhertin. Ger ev peyda nebûn wê demê civak nikare bê guhertin. Derbarê zîhniyetê de em dikarin van bêjin.

**DI ROJHILATA NAVÎN DE ROLA DESTHILATDARÎ Û DEWLETÊ**

Rola van herdu têgihan di astengkirina li pêşketina Rojhilata Navîn, çêbûna krîzê û kûrbûyîna krîzê em ê bigirin dest. Bêguman her teoriyekî civakî li ser esasê ku bi çi rengî civakê digire dest, desthilatiyê digire dest, yanî desthilatdariyê digire dest, nakokiyan digire dest, her demê li ser vê radiweste. Ji ber ku bi giranî heger dema em dibêjin teorî, teorî jî dîtina nakokiyê ye, şîrovekirina nakokiyan e.

Ji bo vê jî her kes û her teoriyek civakî eksena nakokiyê li gorî zanîna xwe, li gorî tesbîtên xwe derdixe pêş. Ji bo vê jî dema em teoriya civakî ya Marksîzmê bigirin dest, em lê temaşe dikin hemû di eksena çînî de ye. Bi giranî jî hemû lîteretora Marksîzmê, yanî giraniya wê ji bo ku pê bide îqnakirin, yanî di eksena çînî de di şîrovekirina teoriya civakî de, teoriya nakokiyên civakî ye. Ji bo yî ku pê bide qebûl kirin, li ser vî esasî îqnayekî çêbike, hemû bihanên xwe, sedem li gorî xwe bi rengekî mantiqî derxistine pêş.

Em dibêjin mentiqî, ji ber çi, Rêbertiya me di parêznamê de cudabûna di navbera mantiq û rastiyê de, yan jî mentiq û heqîqetê de aniye ziman. Mentiq her demê rast nîne, lê belê sîstemeke. Formîlasyone, li gorî xwe sedem û encaman bi hev ve girêdide. Bi vî rengî ahengek heye, nîşan dike. Lê her demê ne rast e, ji bo vê em dibêjin bi rengekî mentiqî Marksîzmê xwest nakokiyên civakî di eksena nakokiyên çînî de rave bike, li ser vî esasî hemû sedem û govan birhan muberirinên xwe peyda kirin. Yanî tiştê ku wê teoriya xwe li ser didin rûniştandin, peyda kirin.

Gelek qismên civakê jî îqna kirin. Mentiqî bû, yanî mentiqê wê hebû. Lê belê ji rastiyê dûr bû. Ji ber ku bi wî rengî gelek tiştên din jî înkar dikirin. Yanî gelek hêmanên (unsur) dîtir di kûrkirina nakokiyên civakî de, ji nedîtî ve nêzîk dibûn, înkar dikirin, bi rengekî talî nêzîk dibûn. Li ser wî esasî jî me dît ku piştî demekî eşker bû ku teoriya civakî ya Marksîzmê yanî teoriya sosyolojîk a Marksîzmê têrê nake ku civak pê bê îfade kirin, yan jî ravekirin.

Niha îro jî beşek ji teoriya me ya civakî em mentiq hîn bêtir dixwazin li ser rastiyan bidin rûniştan din. Hîna zêdetir

nêzîkî heqîqetê, ji bo vê jî Rojhilata Navîn di tesbîtkirina çavkaniyên gelek têgîn, yan jî gelek sazî, rolekî dileyîze. Ango Rojhilata navîn çavkaniya gelek van têgînên ku îro em nas dikin. Desthilatî dewlet, ji bo vê jî em li ser didin rûniştan din. Çînî bûyîn, şikandinên cinsî, ji lewre jî em her demê li ser vê şîrove dikin. Ev heta niha tevî ku îlmê civakî, erkolojî, dîrokî, gelekî jî pêşketiye. Tevî wilo jî tesbîtekî li dijî vê ku vê vala derbixe, em di roja xwe ya îro de lê rast nayên, derneketiye. Yanî teoriya me ya civakî bi taybetî beşên ku di çavkaniyên pirsgirêkan de pala xwe didin dîroka Rojhilata Navîn, heta niha teoriyên ku wer wê vala derbixe, cidî rexne bike derneketiye pêş.

Teoriyên ku rexne dikin, yan jî ji nedîtî ve nêzîkdibin, ew teoriyana teoriyên hatine birêvebirin yulendirme kirin. Li ser esasê berjewendiyên empryalîzmê, kapîtalîzmê jê re yun hatine dayîn, yan jî hatine yunlendirime kirin. Ji vê van weke berovajiyekî, pûç kirinekî em nagirin dest, yanî teoriya me pûç nake, rexnak cidî jî nîne. Ji ber ku di esas de li ser rastiyê nayê rûniştandin. Xwemerkez dîtine, nijadparestiya biyolojîk esas digirin. Ewrûpa ji bo her tiştî dikin navend, ev dibe sersebebê ku wer beramberî teoriya me ya civakî, ya ku em niha esas digirin, zêde rol neleyîz e. Her tiştekî nû derdikeve, her keşfek, her tesbîtek nû derdikeve hîna zêdetir tiştên ku em dibêjin, tiştên ku tevgera me dibêje, tiştê ku Rêbertiya me tîne ziman, rast derdixe.

Di vê çarçoveyê de mesela desthilatdariyê û dewletê jî em ê bigirin dest. Lewre desthilatdarî û dewlet tiştên ji hev cuda ne.

Desthilatdarî beriya dewletê heye, desthilatî çi ye? Dema di navbera civakê, yanî dema ku civak ahenga xwe ya xwezayî wenda dike û di navbera hêmanê ku civakê pêktînin, ew ahenga xwezayî ji holê radibe û li şûna wê bêhevsengî, zordarî, bi her awayî hevdu înkarkirin, devrede hiştin, ev pêş dikevin, ew rê ji otorîteyê re vedikin, rê ji desthilatiyê re vedikin.

Ji bo vê desthilatî pêvajoyekî desthilatdariyê, yan jî pêvajoyekî û rengekî hikum ê berî dewletê ye. Ev desthilatî yan jî ev taybetmendiyên desthilatiyê di Rojhilata Navîn de dest pê kirin. Çavkaniyên desthilatiyê weke zemîn, weke zeman li Rojhilata Navîn e. Di dîroka kevn de 4000' sal weke çawa berî BZ, heta zêdetir jî, vê axa ku em jê re dibêjin Mezopotamiya jêrîn, Mezopotamiya jorîn, gav bi gav derdora çemê Nîlê, yan jî Misrê, li vir hevsengiya civakî xera dibe. Li ser esasê zordarî û destdayîna li ser nirxên civakê yên zêde û bi vî rengî desthilatî derdikeve.

Ji lewre desthilatiya seretayî, desthilatdariya zilam li ser jinê ye, ya mêr di malbatê de, ya xwediyê kolan li ser kolan e, ya rahiban li ser gel e, bi vî rengî gav bi gav têgihînên desthilatiyê di nava civakê de pêş dikeve. Dewlet tine ye, lê desthilatî heye. Lewre ev desthilatî, eşker dibe ku bi rengekî erênî nayê bi dest girtin. Yanî desthilatî bi awayekî wiha ku her kes qebûl bike, bê dudilî qebûl bike, bê nerazîbûn, rayeksyon qebûl bike wiha nîne. Nerazîbûn hene, ev nerazîbûn mirov ji ku dizane hene, em niha ji ku dizanin hene? Dîrokekî nivîskî tine ye. Em ji tiştên jiberkirî, yanî çîrokên jiberkirî û gav bi gav çîrokên nivîskî yên bi rengê

mîtolojiyê gihîştine me, em fêm dikin ku ew desthilatdarîbûyîna di hundirê civakê de xerabûna ahenga civakî, bi rengekî wiha xweşbînî, qebûlkirinekî wiha bi îqna çênebûye.

Nerazîbûn hene, nerazîbûna jinê heye, ya însanên cuda cuda hene û ev di hundirê mîtolojiyan de bi rengekî eşker be yan jî dizî be mirov dikare pê bihese. Hela ku şîrovek wiha sosyolojîk, bi zanistî li ser wan mîtolojiyan çêbibe, weke bi rengê çîrok û çîvanok neyên bi dest girtin, bi rengê wiha qalib neyê dest girtin, eger baş lê bê lêkolîn, baş bê analîzkirin, mirov dikare vê encamê jê derbixe bê ka çawa desthilatîbûyîn, wer bê rayeksyon, bê nerazîbûn, nehatiye holê.

Lê belê, tiştê xerab çi ye ku ev koma desthilatiyê, yanî şebeka desthilatdariyê, zilam, mêrê malbatê, rahîb, dewlemed yê bi rengê ji rengan dest daniye ser nirxên zêde, ev di esas de şebekakî berjewendiya ye. Di esas de hevbeşbûyîna şebeka berjewendiyan ya ku komên desthilatiyê cuda cuda tîne gel hev, hevbeşbûyîna wan, di encamê de dewlet derdikeve pêş. Wê demê di bingeh de dewlet, hevbeşbûyîna şebeka berjewendiyane di hundirê civaka ku ji ahenga xwe ya xwezayî derketiye.

Ev li ku çêbûye; li Rojhilata Navîn çêbûye. Ji bo vê şîrovên li ser dewletê bi rastî jî balkêş in. Bi sala ye, em jixwe em şîrove dikin, lê belê weke min got, teoriya civakî, ger pala xwe dide kîjan ergomanan, kîjana ji bo xwe esas digire, kîjan di warê tesbîtkirina nakokiyê de kîjan çavkaniya esas digirin, her demê li ser bisekine. Ev tiştekî xwezayî ye, dema ku mirov Marksîzmê bixwîne, ji serî heta binî Marks çi gotiye, Engilîs çi gotiye, Lenîn çi gotiye, piştî wan yên weke Maw, Stalî hwd, çi gotine, mirov lê temaşe dike hemû di çarçoveya çînî de ye.

Her demê vê dibêjin, hinek dibêjin; Yewnan heye, Roma, Asor, Babil heye, ev hemû di encamê de çîrok in, di encamê de yek sîstem heye. Cimhuriyet be, qiraliyet be, împratorî be nizanim çi be, di encamê de yek sîstem heye, ew jî sîstema koledariyê ye. Yanî di eksena çînî de digire dest. Nabêje şaristaniya Girêk Roma, nabêje şaristaniya Rojhilat hwd, dibêjin navê wê koledariye.

Ji ber çi, ji ber ku ew teoriya civakî eksena çînî esas digire, nakokiyên çînî esas digire. Ji bo vê nav jê re zêde ne girîng e. dijmêrin, dibêjin, Roma, Girêk hwd, ev hemû vala ne, zêde guh nedin van. Yek cumhuriyetparêz e, yek meclîsa wê heye, yek senatoyê wê heye, ev jî hemû çîrok in. Ya girîng cewherê wê çi ye, cewherê wê kole heye, koledar heye. Ew ji bo wan girîng e, ji ber ku teorî li ser wê hatiye danîn.

Dîsa ji bo feodaliyê wiha dibêjin; ji bo birjiwaziyê wiha dibêjin. Hemû teoriyên civakî bi taybetî yên ji bo xwe desthilatiyê ji bo xwe esas digirin, her demê şaristanî û cewherê şaristaniyê dewlet, yanî şaristanî û cewherê wê dewlet di dîroka civaka însanî de, weke pêşketinekî bi rengekî îzafî be jî, hinek hîna zêdetir demokratin û hîna zêdetir di aliyê civakê de difikirin. Bi rengekî îzafî dibêjin, lê hinek jê jî bi rengekî şînber û motleq

dibêjin, di encamê de hemû teoriyên civakî hemfikirin ku dewlet çi bi rengekî îzafî be, nisbî be, çi jî bi rengekî motleq be, pêşveçûneke di dîroka însanan de. Yanî hemû neyînîbûnê bi xwe re anîne, tevî hemû nakokî û xerabiyên bi xwe re anîne, lê dîsa jî di aliyê pêşveçûna însanan de pêşketineke, bê wê nabe. Eger dewlet nebûna herwiha çîn nebûna, serdestî û bindestî nebûna, wê jiyana mirovan jiyanek xwe dubare bikira, hentalbûya, ziwabûya, berhem tê de tinebana, pêşveçûn tê de çênedibû, îdiayek e li ser vê îsrar tê kirin.

Hinekan jî li ser esasê vê rastiyê ber bi teorînî dîtir ve çûn. Çi gotin; dewlet tiştekî Xwedayî ye, yanî qanûnekî îlahî ye. Îrada însanan tê de tine ye. Ji ber çi, ji ber ku însan di hundirê xwe de sadîst e. Însan di hundirê xwe de dijmin e. Yanî têgihîştinên dijminayetiyê tê de heye. Êrîşkar e, ji bo vê însan gurê însan e. Ji ber ku însan gurê însan e, pêdivî bi saziyekî heye ku nehêle însan bi xwe û xwe hevdu bixwin. Ew sazî çi ye, dewlet e. Ji bo vê dewlet çawa weke neametekî ji Xwedê digirin dest. Kesên weke Tomas Hobis, hîn bêtir pê de diçin û dibêjin; dewleta motleq dermanê derdê însana ye. Yanî hikumê motleq, dewleta motleq ew dermanê derdê însana ye, ji ber ku heger desthilatiyek tîran e, yekalî bihêz motleq tine be, civaka însanî nakeve dîzayînê.

Ji lewre ev çi ne, ev hemû sedemên çîna serdetsin. Ji bo desthilatiya xwe, mayîndebûna xwe, ji bo ku jê re sedeman jê re peyda bikin, ji bo vê van îdiayana dixwazin ferz bikin û mirovan pê bidin qebûl kirin. Lê însan di roja me ya îro de gihîştiye wê astê ku qet têkiliya însanan bi dewletê re tine ye, derveyî ziyanê tiştekî ji aliyê dewletê ve ji wan re nayê, ti hevbeşbûna wan bi dewletê re tine ye, tenê ziyanê jê dibînin, koletiyê jê re dikin, leşkertiyê jê re dikin, bacê (vêrgiyê) didinê, ew însan jî di roja me ya îro de însanên herî zêde dewletparêz in. Ji dewletê re çepka dixe, dewletê diparêze û dewletbûyînê weke azadiyê digire dest. Yanî dewletbûyîn û azadiyê weke têgihîştinên bi hev re hevbeş digire dest. Bi taybetî di nava gelê weke çawa bê dewlet mane, weke çawa gelê Kurd. Ev rastî, yan jî têgihîştin hîna zêdetir kûr e.

Ji bo vê girîng e li ser dewletê bê rawestandin. Dewlet di dîroka însanî de weke pêşketinekî em ê bigirin dest? Yan jî weke ji rê derketinekî em ê bigirin dest? Îdîaya ku dibêjin; heger dewlet tineba pêşveçûn di civaka însanî de çênedibû, îdîayeke rast e, yan jî çewt e!? Însan bê dewlet karîbûye xwe bi rê ve bibe, nikarîbû xwe bi rê vê bibe? Karîbû pêşbikeve, nikarîbû pêşbikeve, li ser van divê ku mirov şîrove bike. Ji bo ku di dewletê de mirov bigihîje baweriyekî rast, pêdiviya me bi van şîrovan hene.

### Dîroka Mirovahiyê Û Dewletê

Ji ber vê careke din dîroka Rojhilata Navîn di wî aliyê de ders û îbretên cidî nîşanî me dide. Berî her tiştî ev tesbîtên ku dibêjin; dewlet nebûya pêşveçûn nedibû, ev tesbîtana tesbîtên nerast in. Ji ber ku însaniyet ne bi dewletê pêşketiye. Tam berovajiyê wê dewlet rê li pêşiya pêşketina însaniyetê girtiye. Ji ber çi, heger em dîroka însanî ya berî dewletê bigirin dest, dewlet

dîroka wê 5000’hezar sal e, bi rengê xwe yê cuda-cuda dîroka wê pênc hezar sal e.

Lê dîroka însaniyetê gelek-gelek hezar sal in. Ew însanê ku ji rewşekî pir xerab gihîşt rewşa ku gundan avabike, zîraetê çêbike, heywanan xwedî bike, bigihîje asta ku jiyan xwe bi gelek sembolan îfade bike, wele çawa di cihên bê dewlet de çanda Telhelef heye, çanda girên gubeklî heye, hinek çandên din jî hene ku îsbat dikin heta astê ku însan xwedî lîtretor e. Nêzîkî nivîsandinê zimanê sembolan pêş dixe. Ev hemû bê dewlet in, wê demê pêşketin ne bi dewletê çêdibe. Di esas de berî dewletê heye, pêşketin taybetmendiyekî xwezayî ya însan e. Mêjiyê însanî pêşketî dibe sersebebê ku her demê bîra wî/ê ya dîrokî, li ser esasê wê bîrê her demê dersê jê derbixe, li ser esasê dersê derxistî karibe her demê astê şêwazê jiyana xwe di ber çavan re derbas bike, her demê ji astekî baş ber bi baştir ve biçe.

Dewlet di esas de weke hêz li ser berhemên civakî, yên ku însanan komkiriye hatiye çêkirin. Ji bo vê dewlet saziyekî xwezayî nîne. Herwiha weke pêdiviyekî jî nîne, di aliyê pêşketinê de jî alîkariyek wê nîne. Tam berovajiyê vê bi van hemû taybetmendiyan re berovajiye. Ji bo vê dewlet dema ku neyê nîqaş kirin, demokrasî çênabe. Şoreş jî çênabe, her şoreşek dema ku dest pê dike, berî her tiştê divê ku dewletê nîqaş bike.

Şoreşên gelan ên di serdema 17-18-19’dan de jî, Holenda, Îngiltera, Emerîka, Fransa, pişt re yê Almanan jî dema ku dest pê kirin dewlet nîqaş kirin. Dewleta mûnarşî nîqaş kirin. Dewleta motleq, hikumê motleq nîqaşkirin. Li ser vî esasî didil xwe de, dewleta demokratîk avakirin, dewleta gel avakirin, lê belê ti têkiliya wê bi gel re tine bû.

Sedem ew bû ku ev dewleta he tevî ku hilbijartin tê de hebû, tevî ku li ser esasê suyî, xwînê desthilatî tê de çênedibû jî, lê belê cewherê mêtingeriyê red nekir. Mulkiyeta taybet ji holê ranekir. Dewleta ku çêbû, dewleta birjiwazî, çiqasî bi rengê dewleta gel xwe nîşan dida jî, lê belê di esas de cewherê wê yê kedxwariyê hebûye. Mulkiyeta taybet zagon e, rêzikên wê dewletê ne. Ew dewlet bi sedema parastina mulkiyetê heye. Ji bo vê jî çiqasî îdia bike jî û bêje ez dewleta gel im, çiqasî îdia bike û bêje ez ne dewleta çînekî me, ne desthiltdariya li ser civakê me, ew hemû derw in, nikarin pê însanan bixapînin.

Bi taybetî jî ev dewleta ku îdia dikir ku ya gel e, dema ku karker, cotkaran rayeksyonên xwe ji bo keda xwe nîşan didan, bi rengekî bêrehm, bi hêz xwe ya polîsan ya leşkerî bi çi awayî di komkujiyan re derBeasdikirin, di dîroka van piratîkên sedsalên derbasbûyî de şahid e.

### Nîqaşên Şoreşa Sosyalîst Li Ser Dewletê

Şoreşa sosyalîst jî dewlet nîqaş kir. Di derbarê dewletê de gihîşt hinek tesbîtên rast jî. Bi vê bawerî anî ku dewlet her demê tinebûye, lê prelel bi vê gotinê re dewlet weke qonaxekî pêşketî di dîroka însaniyetê de girt dest. Di vir de em pê re berovajî ne.

Xala duduyan got; dewlet mehkumê tinebûnê ye. Yanî tinebûneke wiha ji holê rakir, kirin weke çawa komên enerşîstan xwestin yan jî daxwaz dikirin na, wan gotin; bi demê re vemirandina dewletê. Biçûk kirina heta vemirandinê.

Lê ji bo ku ev pêk bê, motleq pêdivî bi dewleta proleteriya dîtin. Yanî dîsa pêdivî bi dewleta çînî, ne dewleta gel. Ji bo vê jî dewlet çi dibe bila bibe, dema ku yek çînî temsîl bike, dewletek antîdemokratîk e. Ji ber ku navê dewletê li ser e, heger dewlet saziyekî ji bo hikumkirina çînekî li ser yê din be, wê demê dewleta proleteriya jî bi vî rengî ye.

Dema ku em tebîtên şaş di teoriya civakî ya Marksîzmê de jî bigirin dest, bê çawa bi rengekî tewş civak di navbera proleteriya û kapîtalîstan de parçe kiribûn, çîn û kesimên din ên civakê ji nedîtî ve nêzîk dibûn û înkar dikirin, heta bi rengekî xerab lê temaşe dikirin, wê demê hîna zêdetir rewş xeternak dibe.

Wê demê dewleta proleteriya tenê ne li dijî birjiwaziyê ye, li dijî hemû rengê civakê yê dîtir e. Ji bo vê ev dewlet bi vî mentiqê xwe, tevî ku di seretayî de ji bo gelan weke mizgîniyekî bû, gav bi gav ber bi formekî totolîter ve çû, ber bi eznavend ve çû. Ev bo sersebebê ku ew hewildanên cidî ya civakên jêrîn yên ku karibin pirsgirêkê çareser bikin, ew hewildan jî bi hilweşandina Sovyetê re tesfiye bû.

Ji bo vê guftûgukirina dewletê pir girîng e, em jî niha di rewşekî şoreşê de dijîn, ji bo vê divê ku em dewletê nîqaş bikin. Yanî dema em pêvajoya şoreşê dijîn em dewletê guftûgu nekin, em nikarin şoreşê çêbikin. Şoreşa em çêbikin jî, wê ew şoreş bi xwe re îxanetê bike. Weke çawa hemû şoreşên rizgariya netewan, Vetnam, Çîn, Cezeîr hwd, ev şoreşên ku me ji bo xwe ji wan ders digirtin, ji bo xwe mînak digirtin. Perwerde li ser didîtin, ji ber ku bi rengekî rast dewlet guftûgunekirin, îxanet li xwe kirin.

Yanî desthilatî û dewlet, nêzîkbûnên desthilatîdar û dewletparêz ji ber ku baş nîqaş nekirin îxanet bi xwe re kirin. Antîdemokratîkbûn, bi navê gel rabûn, lê di roja me ya îro de astengên herî mezin beramberî gel in, ên herî zêde gel têşîne, tepeserkirinê li ser dimeşîne ew e.

Ji bo vê em dewletê nîqaş dikin, yanî nîqaş kirina dewletê meselak loks nîne. Carina hinek heval dikarin vê bêjin; dewleta me tine ye, çima em nîqaş dikin! Pirsgirêkên me yên ji vî aliyê ve tine ye. Gelo pirsgirêkek me yê wiha tine ne, di aliyê mentiq de ku em dewletê weke pêdiviyekî xwezayî dibînin?! Ev heye û li ser me serwer e, yun dide piratîka me. Ji bo vê ev nîqaş ferz e.

Niha em dewletê li Rojhilata Navîn de nîqaş dikin. Dewleta Rojhilata Navîn dewletekî tund e, dogmatîk e, aşîriye. Zêde bi têgihîşitina desthilatiyê hatiye çek kirin, dagirtin. Zêde rewa ye, yanî zêde rewabûnê ji bo xwe peyda dike. Bi sedemên Xwedayî rewabûnê ji bo xwe peyda dikin. Her tiştî ji bo xwe rewa

dibîne, ji derveyî desthilatdariyê û otorîteya dewletê weke çawa hucreke civakê nehiştiye.

Ji her derê bêtir li Rojhilata Navîn dewlet temsîlkirina xwe ya civakê îdia dike. Mînak dewletên Rojava ewqasî nikare îdia biki, dixwazin, lê gel bawer nakin. Lê li Rojhilata Navîn heta asta dawiyê xwe di şûna civakê de dihesibîne û civak vê qebûl dike. Hemû rexne, hewildan, helwestên beramberî dewletê sûcekî mezin e û ev sûc bi mehkeme, artêş, polîsan, qanûn, îdeolojiya fermî tenê nayê tesbît kirin. Ev sûc bi rengekî derûnî di hundirê her ferdekî/ê van welatan de heye. Dema ku rayeksyonekê beramberî dewletê dide nîşandan, weke çawa sûcekî mezin kiriye,  ew bi xwe pê dihese. Ev derûnî tevgerekî di dawiya sedsala 20'an de, di asta cîhanî de tevgerekek şoreşgerî weke PKK'ê endamên vê tevgerê hîna jî gelek xwe ji vê derûniyê xelas nakin.

Mînak, mijara efû, efû xwestin. Mijara ev rewşa ku gelek hevalên me yên ketine zindanan û derketin, li derve mane û dijîn, derûniya gunehbariyê dijîn. Beramberî dewletê min sûc kir, dewletê hesabê xwe ji min stand û ceza da min, em pata bûn, niha ez li mala xwe rûniştîme û ez bi xêr hûn bi silamet; em lê temaşe dikin dawî li têkoşîna xwe tînin. Gelek tiştên din jî hene.

Ji lewre ev meselek cidî ye, ev mijara însanê bindest e, ne mijara însanên serdest e. Jixwe însanê serdest bi dewletê tê temsîl kirin, ti derdek wan tune ye.

Lê însanê bindest dema dibêje dewleta me, ev dewlet weke çawa mafê wan temsîl dike, di hesibîne, pirsgirêk di wir de ye. Di roja îro de di nava Kurdan de jî rewşekî wiha heye. Mînak tu lê temaşe dikî feqîreke, li Başûr nan tune bixwe, dema mirov desthilatiya li Başûr rexne dike dibêje; wiha çênabe. Çima wiha dibêj; dewleta me ye! Dewleta te ya çi ye?! Yên ku vê dewletê îdare dikin hesabê wan yê bankê li Swîsra heye, li Îngeltera heye, li Fransa heye, nizanim ji bo xwe bi rengekî taybet pera ji Îtaliya tînin, teyarên taybet hene. Karxanên wan hene hwd. Ew bila li ser dewleta xwe bitirsin, tu çima ditirsî, nanê te tune tu bixwî, tu çima li ser ditirsî. Çi yê te di vê dewletê de ye! Lê dibêje; dewleta me ye, em bûne dewlet.

Ev yektiya di navbera dewlet û gel de, ango ev ji rê derketinek gelekî xerab e, ev di nava me de jî heye. Dibe ku di nava kadro, hêza pêşeng ya rêxistinê zêde bi bandor nîne, lê bi bandor e. Em wiha xwe zêde îdîal nehesibînin. Bi bandor e, lê çawa ev deh sal e em li ser perwerdê dibînin nîqaş dikin, rexne tên dayîn, rexnedayîn tên dayîn, ev hemû dibin sersebebê hêdî hêdî, bandora dewletparêziyê, desthilatîparêziyê lewaz bibe.

Lê belê dema ku em xebata xwe ya giştî digirin dest, em lê temaşe dikin ku hîna jî ev pirsgirêk li pêşberî me cidî ye. Ev pirsgirêka ku dewlet û azadî, dewlet û serxwebûn bi rengekî hemwate digirin dest, ev hîna cidî em dêşîne. Lê ya rastî dewlet li dijî serxwebûnê ye, diwlet li dijî azadiyê ye, ev di mînakê dewletên Ereban de mirov dikare peyda bike. Mirov dikare di

dewleta Tirkan de peyda bibe hwd, mirov dikar di gelek dewletên din de jî peyda bike. Mixanbin hîna jî di nava Kurdan de nerînek wiha heye azadî, serxwebûnê bi dewletbûyînê îfade dikin.

**Ferq Û Cudatiya Di Navbera Dewleta Rojhilat Û Rojava De**

Me niha got dewlet li Rojhilata Navîn tund e, dijwar e, zêde serwer e. Bi vî rengî em çi dixwazin bînin ziman? Bi vî rengî em dixwazin ferq û cudatiya di navbera dewleta Rojava û Rojhilata Navîn de bigirin dest. Dewleta Rojava nerm e, ji ber çi nerm e? Ji ber mercên tê de çêbûne nerm e. Dewleta Rojhilata Navîn dewleteke tund e. Ji ber mercên ku tê de avabûye, ji ber vê ye.

Niha li Rojava dewletên seretayî yên çêbûne, dewletên bajaran e. Dewletên ku tê de hikmekî motleq tine ne. Tê de zemînekî azadiyê heye. Tê de meclîs hene, tê de şêwazekî xwe bi rê ve birinê heye. Ev li ku mirov lê rast tê, li bajarê Îyûna, yê li derdora derya Spî û Ege, Îzmîra niha. Ji bo vê em lê temaşe dikin ku tevgera fikirî di wan bajaran de pêş dikevin. Talis, Hermenîdes, Fîtagos, hwd. Ev hemû li wan deran pêş dikevin.

**Pêşketin Û Hilhatina Demokrasiyê**

Wê demê di wir de tepeserkirin, qiraliyetek motleq, destpotîzm, di wê asta ku fikir asteng bike, azadiya însanan asteng bike nîne. Ev dema derbasî Atîna dibe, em lê temaşe dikin ku cara yekemîne, bi navekî, yan jî bi têgihîştinekî tê îfade kirin navê demokrasiye. Ev demokrasî çi ye? Yanî navê wê li ser e, hikumê gel, gelê ku xwe hikum dike. Ne demokrasiye, ji ber çi ye? danasîna gel kêm e, çewt e, her kesên di hundirên civakê de himbêz nake, nagire nava xwe.

Di wê demokrasiyê de kole tine ne, ji ber ku kole weke însanan nayên hesibandin. Di wê demokrasiyê de jin tine ye, ji ber ku ew jî weke însanan nayên hesibandin. Wê demê ev demokrasî çi ye, demokrasî, an jî hikumê gel, kîjan gel, hemwelatiyê Atîn yê azad yê ne kole, yê ne jin, demokrasiya wan e.

Lê dîsa jî ev demokrasî balkêş e, her kes derbasî hilbijartinê dibin, deng didin, meclîsa Atîna ji nav xwe derdixînin, meclîsa ji pêncsed kesî bi hilbijartinê derdixin, ew meclîs konseya rêveberiyê di nav xwe de derdixe.

Fayda vê çi ye, fayda vê ku di Rojava de çavkaniyên desthilatî û dewletê ne çavkanînî destpot in. Destpotîzm motleq hikum kirine, bê kontrol bê venêrîn hikum kirine. Lê di Atîna de meclîs heye, ew meclîs çi ye? Meclîs desthilatiyê venêrîn dike. Ji bo vê di wir de rêvebir li gorî xwe, weke çawa ew dixwaze her tiştî nikare bike, ji aliyê meclîsê ve tê kontrol kirin.

Wê demê dera ku kontrol li ser desthilatiya siysî hebe, di wir de dewlet nerm e. Yanî kesên ku liv û tevgera wê/î, şêwaz, şêwazê wan yê rêvebirinê, yê hikumkirinê di ber çavan re derbas

bikin, weke çawa di cih cihan de dezgîn bikin, di hinek cihan de hesab bixwazin, hew heye. Heta gelek mînakên balkêş hene. Ew bû sersebebê serkeftina wan ku hatin heta Hindistanê hikum kirin, heta Misrê hikum kirin. Weke çawa hemû cîhan hikum kiribin.

Rast e dibe ku di aliyê teknîkî de pêketin çêkirin, hesin, mizraq, komên ji nû ve birêxistin kirina siwariyan, dibe ku bandora van hemûyan jî li ser serkeftina wan ya leşkerî çêkir. Lê di esas de ew sîstema nû bûyî ku însan di hundirê sîstemê de bi hebûna xwe dihesiya. Ji bo vê jî bi navê wê sîstemê, çandê, fikirê hazir û amade bûn ku cîhanê fetih bikin. Tiştekî nû didîtin, beramberî destpotîzm û faşîzma bi rengekî îzafî beramberî wan Rojhilata Navîn dijiya, beramberî wê gavek pêktî bû. Heta di vê derbarê de gelek mînakên balkêş hene.

Di salên 5000'sedî berî BZ'ê, Pers derdora Atîna girtin. Ber bi Rojava ve fetih kirin, Anadol vekirin, her der hikum kirin heta ku di Atîna re derketin. Derdora Atîna girtin. Yewnan nekarîbû li ber xwe bida ba, fermandarekî ciwan planek pêşkêşî meclîsê dike û erê kirinê dixwaze. Planekî li ser sê qonaxan ku li dijî artêşa Persan wê planê pêk bîne û bi wî rengî serkeftinê bi dest bixe.

Wê demê meclîs ji xwe bê çare ye. Plan jî mentiqiye, ber bi mentiq ve tê. Li ser vî esasî meclîs planê qebûl dike. Bi rastî jî ew plan dikeve dewrê. Di serî de wiha tevgerekî ji halketinê beramberî artêşa Persan dide nîşandan. Di pişt re hêdî hêdî di çarçoveya çeperan de berxwedanê pêşdixe, yanî di meydanê cengê de, pişt re bi rengekî berfireh tearizê, bi vî rengî çemberê dişkînin û wiha Atîna ji hawêr (çember) xelas dikin.

Karê yekemîn yê ku meclîs piştî vê serkeftinê dike çi ye? Wî fermandarî ji erkê digire. Sedem çi ye, sedem eger fermandar ji erkê neyê girtin, bi hêza serkeftina ku li dijî Persan bi dest xistiye, dikare sîstemê hêdî hêdî qenalîzeyî rêyekî milîtarîst bike, karibe xwe weke destpot, serwer ferz bike, ji bo rê li pêşiya vê çalakiyê bigirin, wî ji erkê digirin.

Ev rengekî xwe parastinê ye, di esas de rengekî demokrasî parastin e. Demokrasiya li gorî têgihîştinên xwe yên wê çaxê. Lê belê ev demokrasî her demê wiha nema. Carna hinekan karîbû bi hêza xwe ya leşkerî, bi hawirdora xwe, bi hêza xwe ya madî bibin motleq, lê belê weke urf û adetan her demê dewlet bi şêwazê wer çawa li Rojhilata Navîn destpot nîne.

**Demokrasiya Roma**

Dîsa li Roma demokrasiya komarê hebû. Komara arîstoqrat, komara gel, mînak ya îstiqrat çawa bû? Carna komar wer çêdibûn, hemû kesên wiha dewlemend di navbera xwe de nunerên xwe hilbijartin, ew nuneranan dibûn senato û wan konsol, yanî rêvebirên Roma derdixistin.

Carna ji vê hîna pêşdetir bûn, tenê arîstoqrat na, vê carê hemû gel, jixwe derveyî kolan û jinan, hemû gel wê carê nunerên xwe hildibijartin. Wan nuneran desthilatî kontrol dikirin.

Di pişt re de li Ewrûpa jî bi vî rengî bû. Mînak, sîstema Magnakarda ya ji sala 1250'î destpêdike û heta roja me ya îro, di Îngltera de mekanîzmekî kontrol kirin a desthilatiyê ye, yanî desthilatî bi serê xwe tenê hikum nake, hêz hene, sazî hene wê kontrol dikin.

Li Rojhilata Navîn dema ku dewlet çêbûye bi rengekî pir îstisnayî saziyên ku desthilatiyê kontrol bikin çêbûne. Her demê desthilatî bêkontrol e, motleq e. Ji ber çi, ji ber dewlet, şaristaniya li Rojhilata Navîn a çînî û cewherê wê yê dewletê bi rengekî dogmatîk çêbûye, yanî qalibger çêbûye, ev parçebûna civakê weke çawa bi îrada Xweda rave kiriye, li ser vî esasî mîtolojî çêkiriye.

Mînak gotiye; Xweda erd, ezman, însan jî çêkirine, ev însan jî ji bo xizmetê çêkirine, felan kes jî weke temsîlgerê Xweda nîşan dane. Ji bo vê qiralê Xweda, qiralên weke Xweda, yên nîv Xweda çêbûne. Yanî qiralên ku rasteras erêkirina otorîteya xwe ya desthilatiyê ji Xweda digirin.

Ev heta roja îro jî nehatiye guhertin. Mînak em bala xwe bidinê di teşeyê desthilatiyê de heta roja me ya îro jî li Rojhilata Navîn nehatiye guhertin. Dîsa qiral Xweda ne, venêrîna ti saziyan li ser xwe qebûl nakin. Motleq dimeşin, tam dema ku lewaz bin hinek saziyan qebûl dikin, gav bi gav wan saziyan jî dikin kontrola xwe, dejenere dikin, tesfiye dikin, ji holê radikin. Yan jî heger ji wan re pêwîst be saziyan çêdikin, tenê ji bo ku biryarên wan erê bikin çêdikin.

Mînak di roja me ya îro de meclîsa li Rojhilata Navîn dewleta herî demokratîk Tirikiye ye, meclîs çi rolê dileyîze, tewisiyên MGK( milî guvenlik kurulu)pêk tîne. Li Sûriyê, Misrê, Îraqê, Îranê bi vî rengî ye. Li ser esasê komkirina hemû karbidestî (yetki), di destekî de û bi vî rengî bi rêvebirina civakê pêk tînin.

Civak beramberî vê rêxistina xwe ya taybet çênekiriye. Hêza ku civakê temsîl bike, beramberî dewletê taraza (tewazinê) çêbike, heta astekî karibe mafê civakê beramberî dewletê biparêze tine ye. Ji bo vê gotinek heye li gel Tirkan pir tê gotin û dibêjin; heger komunîzm baş ba wê dewletê bianiya. Yanî civak mafê wê tine tiştekî ji bo xwe bîne. Ji ber ku dewlet civak e, heger baş be wê dewlet bîne. Dewlet li şûna însanan difikire û dibêje.

Li welatê Ereban vê nabêjin; dibêjin, civak rêxistinek jinan dixwaze, dewlet ji wan re rêxistinekê jinan çêdike. Ya karkeran dixwaze, ya karkeran çêdike hwd, sendîka, koperatîf, rêxistinên jinan hemû jî yên girêdayî dewletê ne. Dibêjin demokrasî ev e, rê nade civakê ku xwe îfade bike.

Ji lewre li beramberî vê hewildan çêbûne. Ji ber dewlet her demê xwe bi sedemên Xwedayî xwe rave kiriye. Ji bo em

mînakekê hîna bêtir şînber li ser bidin, em hinekî destana afirandina Babil di ber çavan re derbas bikin.

### Destana Bilindbûn Û Mezinbûna Babilê

Niha Babil li ser kavilên Akadan di encama hevxebatkariya di navbera hinek ên mayî ji dewletên Sumeran û Babilan, yanî nijada Samî, bi hevdu re bûne yek li dijî nebaşan şer kirin û Babil çêbû. Nêzîkî 2000 sal beriya BZ'ê ye. Babil dewletek mezin e, ji Akad jî meztir e, ji dewletên Sumeran hela gelek gelek mestir e. Gelek komên etnîkî di nav xwe de digire. Li ser erdnîgariyekî mezin serwer e. Bi otorîteyekî navendî tê meşandin. Ev otorîta navendî, ne wiha otorîteyekî ji rêzê ye. Sîstemek tê de avakiriye, bi taybetî di vir de Hemo Rabî mirov bigire dest wê hîna zêdetir şînber be.

Hemo Rabî, qanûnên wî hene, qanûn nivîsandine. Têkiliyên di navbera însan de diyar kiriy, çîna di hundirê civaka Babil de diyar kirine, yetkiya wan çîna diyar kiriye, yanî kî xwedî erk e, kî ne xwedî erk e. Cihê kolan, cihê jinan, qanûna ehwalê medenî, her tişt di hundirê wan qanûnan de heye. Ji zewacê bigire, kuştinê, berdanê, ji gelek tiştan yek bi yek xal bi xal nivîsiye.

Pişt re bi çi wan qanûnên xwe bi dawî dike, dibêje; êdî ez razî me ku min di welatê xwe de qanûn da rûniştandin, îstiqrar çêkir, parastin çêkir, êdî ev welat di bin serweriya darê min de wê bimeşe. Weke (bi erebî dibêjinê sewlecan) dar e, yê ku qiral dikin destê xwe, di bin hikmê wî de wê her kes bimeşe.

Ji bo vê çi dike? Li gorî wê mîtolojiyê di ber çavan re derbas dike. Ew tiştê ku împeretorê Roma Kostantîn bi Xiristiyantiyê kir, Hemo Rabî bi mîtolojiya Sumer û Akada kir. Di mîtolojiya Sumer de Xwedayê wan Enlî, Enkî, Ano, Tiyamat hwd, ev hene. Ev her yek ji wan tiştekî temsîl dikin. Qismekî civakê temsîl dikin, nakokiyên di navbera wan de, desthilatiya yekî li ser ê din rewşa wê civakê temsîl dike.

Civakek pir rengiye, hîna tam hemû rengên wê nehatine helandin. Desthilatî, dewlet, otorîte, koledarî heye, zêdegaviyên li ser mafê jinê hene, lê belê tam ewqasî dijwar nebûye. Lê destana afrandinê ya Babil cuda ye.

Destana afrandinê ya Babil Xwedayekî nû derdixe, motleq zilam e, motleq serwer e, hemû Xwedayên din li derdora wî di hundirê pergalekê de dimeşin. Yanî desthilatîbûyîna xwe weke peydakirina îstiqrarê tîne ziman. Ji ber çi, dibêje; ji ber ku di navbera Xwedayên berê de bê îstiqrarî û qerebalix hebû. Ji bo vê Ano nerehet bûye, di pişt re Xweda li dijî wî derketine û taybetmendiyên wî yên Xwedayî jê girtine û ev bûye sersebebê ku Tiyamet nerehet bibe. Li dijî hemû Xwedayan bikeve nav êrîşkariyê de. Xweda rûniştine û di navbera xwe de yekî hilbijartine bi navê Mardok. Da ku wan êrîşên Tiyamat bi ser wan de tîne berteref bike.

Mardok bi awayekî bihêz xwe li bin guhê Tiyamat daye û ew parçe kiriye û parçek jê bûye erd, ya din jî bûye ezman jê û şûnda pergalek daniye. Her Xwedayek erkek dayê û di çarçoveyekî de daye rûniştandin, ji bo vê jî ew destan hinekî jî li gorî sîstema gerestêrkan weke çawa her yek di rota xwe de tevdigere, bi vî rengî pêkaniye.

Li ser rûyê erdê jî weke temsîlgerê Mardok Hemo Rabî heye. Çînên civakî jî her yek di çarçoveya kar û erkên xwe de wê bimeşe û kes dengê xwe dernexe. Dewleta Aşûr vê carê navê Xwedayê wan Aşûr bû, ew îcar hikum dike. Jê û şûnda yê Persan, heta roja me ya îro bi Misilmantiyê, Xiristiyantiyê hwd, her kes di Rojhilata Navîn de dema hikum kiriye weke temsîlgerê Xwedê ye. Weke Xweda hikum kiriye. Ev bûye kevneşopiyek desthilatiyê.

Mînak heta dema Îskender tê temaşe dike ku alem jê re sucde dike. Piştî ku Fars girt û gelek cihên din jî girt bin hikumê xwe. Ew dibêje ev çi ye; dibêjinê; ji ber ku tu qiralî. Desthilatdar e, mêtinger e, ji welatekî dûr hatiye welatê wan hikum dike, lê ji ber ku qiral e, dewlet ew e, diçin jê re sucde dikin. Nikare li dijî derkevin, pêşî şaşwaz dimîne, lê pişt re hêdî hêdî qebûl dike, ji ber ku kevneşopiya desthilatiyê wiha ye.

Ango destpotîzm esas e, desthilatiya bêkontrol, desthilatiya Xwedayî ye. Heta roja me ya îro jî bi vî rengî dimeşe. Di beramberî wî şêwazê destihilatiyê tevgerên demokratîk, komunal, civakî pêşketine. Heta roja me ya îro jî ev tevger berdewam dikin, lê mixabin di dirêjahiya dîrokê de şensê wan ê serkeftinê tine bûye. Lê belê di roja me ya îro de bi pêşveçûna îlm û teknelojiya, bi derketina dînamîkên civakî yê nû, derfetên serkeftinê hîna bêtir li pêş e.

### Li Rojhilata Navin Kevneşopiya Şidetê

Li dewletên Rojhilata Navîn  serwerî û kevneşopiya şidetê. Hemû tiştên bi xwe re berovajî yanî hewildan, yan jî tevgerên dijberî xwe bi şêwazên şidetê tesfiye dike. Mirov zêde di dîrokê de rastî wê tê, bi taybetî nêzîkbûnên Akadan, bi taybetî di serdema Narensîn de, li dijî welatên jorîn, an jî welatê Îlam, bê çawa kuştin û çêkirina kelhên bi seriyê însanan, bi vî rengî nîşan dide.

Dîsa bi taybetî di bîranînên qiralê Aşûran de bê çawa nav li xwe didin, em çûn filan welatî, me ciwanên wan kuştin, me serê wan jêkirin û jê kelhe çêkirin. Bi çermê laşê wan me pêçan, me serokê wan bi saxî çavên wan derxistin, pozê wan jê kirin, ên din me anîn û ji bo xwe kirin kole. Me miriyên wan ji mezelan derxistin û avêtin.

Ev hemû bi nivîskî heta roja me ya îro hatine. Ev kevneşopî di roja me ya îro de jî berdewam e. Wer komkujî, kuştin, tesfiye kirin, li Tirkiyê, Îran, Îraq û Sûriyê bi çekan kuştin, bi çekên jidilxwe de qedexekirî kuştin. Bi vî rengî ev kevneşopî berdewam e. zêde şidet bikar anîn, ji çi tê ev? Taybetmendiyên Xwedayî yên dewletê tên. Li Rojhilata Navîn dema em dibêjin

taybetmendiyên Xwedayî ne ku em qebûl dikin, wer şaş neyê fêm kirin, hinek dibêjin dewlet Xwedayî ye, yanî Xwedêgiravî ji bo di navbera însanan de dozen bê rûniştandin însan bi xwe û xwe nikarin, ji bo vê Xweda guncav dîtiye ku dewletek çêbibe. Ev şîroveke derew e.

Lê dewleta Rojhilata Navîn her demê sedemên desthilatiya xwe ji Xwedê digire, yanî qiral Xweda hebûne, pişt re qiralê xizmetgerê Xweda hebûne, yên girêdayî Xweda hebûne û pişt re pêxember hebûne. Xelîfe bûne, ev hemû Xwedayî ne. Ji bo vê hemû rayeksyona li dijî xwe weke li dijî Xweda digirin dest, bi vî rengî sedem û sedeman ji şêwazên tepeserkirinê re peyda dikin. Ango di encamê de em çi dikin, ji bo Xweda dikin û ji bo parastina hikmekî Xwedayî em dikin. Edalet dewlet e, qanûn dewlet e, esas dewlet e. Ji bo vê şaş ê ku li dijî dewletê derdikevin cezayê herî giran wê çaxê heq dikin. Ji ber ku sûc kirine.

Ev jî her demê li ser propoganda dikin ji bo îbret be ji nfşê din re jî ku kes tecrûbe neke, beramberî dewletê li ber xwe bide. Ev rengê teşhîrê, teşhîra wiha bê maf, bi îxanetê, bi kafirtiyê bi hemû rengê dejenerebûyînê, teşhîrkirina hemû tevgerên li dijî dewletê derketine, vê hîna zêdetir rewabûn ji komkujiyan re peyda kiriye, hem jî bûye îbret ji gelan re ku careke din serê xwe hilnedin. Wisa bi çarenûsa xwe razî bin, zilmê qebûl bikin û ev weke qanûnekî Xwedayî weke çarenûsekî ji bo xwe qebûl bikin.

Ji xwe di roja me ya îro de di Rojhilata Navîn de dewlet hîna bêtir destpot e. Ji berê bêtir destpot e, bi taybetî jî dema ku îro em lê temaşe dikin muxalefet di kîjan qonaxê de ye, di kîjan astê de ye, bi çi awayî bêdeng e, bê tevgere bê îrade ye, bê hêz e, ew vê rastiyê derdixe holê. Ev ji bo ku dewlet adil e, edaleta civakî heye, her kes wekhev e, ji bo vê muxalefet tine ye na. Ji ber ku muxalefet bi salan hatiye tesfiye kirin, lêdan, kuştin, zindan kirin û gihîştiye astekî ku teslîm bibe. Li Tirkiyê, Sûriyê, Îranê, Îraqê muxalefet tine ye. Lê di bin erdê de tije mezarên komînin. Ew kî ne? Her demê komkujî kirine, kuştine, ji bo ku careke din kes tecrube neke ku serê xwe rabike.

### Rêûresma Berxwedana Gelan Li Dij Dewletê

Di kevneşopiya berxwedana li dijî dewletê de û bi taybetî mirov dikare hinek mînakan li Rojhilata Navîn bigire dest û ev mînakan jî balkêş in. Gelek caran em behsa Spartekos dikin. Jixwe li dijî Roma rabûye, beriya niha 2000'sal rabûye. Kole bi rêxistin kirine. Bi ser neketiye, hemû hatine girtin ên hatine kuştin hatine kuştin, ên hatine girtin jî hemû bi îşkencê, bi çarmixan hatine kuştin.

Lê belê ev boyer weke serhildana kolan em dizanin, dibêjin, di derbarê wê de filman temaşe dikin, ev tiştana hemû hene. Heta tevgera Spartekos di Rojava de ektuel jî bû. Mînak yek partiya komunîst ya rasteqînî, piştî şerê cîhanê yê yekemîn di Ewrûpa de li Rojava bi taybetî li Elmaniya, partiya Roza Luksemburg navê wê partiya Spartakî bû. Yanî partiya komunîst

navê Spartakos li xwe kir. Bi vî rengî dixwestin wê berxwedanê ektuel bikin.

Wê demê di kevneşopiya berxwedana li Rojava de jî karîbûne wan hewildanên li dijî dewletê çêbûne bi navê kolan, bi navê gundiyan, tevgerên gundiyan jî li Elmaniya û cihên din jî li dijî desthilatdariyê derketine. Partiyên komunîst, yên çep, nivîskar edebiyatgeran karîbûn ektuel bikin, her demê di rojeva însanan de bihêlin û zindî bikin.

Mixabin, di Rojhilata Navîn de ev tine ye. Tevî ku mînakên berxwedanê yên derketine ji Spartakos, hîna zêdetir balkêştir in, hîna zêdetir dem dirêj mane. Heta roja me ya îro jî ew kevneşopî di cih cihan de xwe diparêzin. Kevneşopiya berxwedana li dijî dewletê.

Lê belê em nikarin zêde ektuel bikin, heta di hinek cihan de em newêrin lê xwedî derkevin. Sedem çi ye? Sedemên wê ji ber ku ji aliyê îdeolojiya resmî ve ji aliyê sîstema resmî ve awqasî hatiye teşhîr kirin, dema tu lê xwedî derdikevî, tu jî teşhîr dibî. Berovajî hatiye nîşandan. Bi temamî rastî serûbinîhev hatine kirin. Ev vê carê bi navê dîrokgerê Mislman ên ku alem wan weke referans digirin dest. Ji aliyê şêxan, melan, terîqetan û ji aliyê kesên bi nav û deng, ji aliyê îdeolojiya resmî ve hatine mehkum kirin.

Ji bo vê jî di kevneşopiya berxwedanê yê ku di roja me ya îro de dişopînin, wan nikarin zindî bihêlin, nû bikin û rojane bikin. Ev şaştiyek mezin e, ji bo vê divê ku li ser wê mirov bisekine, baş lêbikol e. Vê têkoşîna dijî dewletê li Rojhilata Navîn rojane bike.

**Li Rojhilata Navîn Rojanekirina Têkoşînên Dij Dewletî**

Bi taybetî jî di serdema Abasiyan de ev rengên tevgeran derketin. Dema Umewiyan de jî derketin. Abasiyan jê fayde kirin û bûn desthilatdar, vê carê li dijî Abasiyan derketin. Tevgera Qarmitiyan, Zenciyan, Babek, Xuresaniyan, ev hemû tevgerên li dijî derketine. Tevgerên li ser esasê edaleta civakî hatine çêkirin. Li dijî zilmê, destpotîzmê derketine, ji bo wekheviyê çêbûne. Lê belê heman ew gotinên ku îro li dijî komunîstan tên kirin, wê çaxê jî li dijî van tevgeran dihatin kirin.

Helbestên ku li dijî wan hatine nivîsandin, şîrovên ku li ser wan hatine kirin, di dîroka fermî de tiştê ku derbarê wan de hatiye nivîsandin bi vî rengî ji rê derketin, yan jî guhertinek çêkirine.

Dema ku tevgera komunîst li Rojhilata Navîn dest pê kir, bi navtêdana emperyalîzmê hema tevgera dînî kete dewrê û derbarê komunîstan şîrove kirin. Bê çawa jirêderketî ne, çawa xerab in, di rastiyê de her tiştî çawa komunal dikin, jinan jî komunal dikin, exlaq, namûs li gel wan tine ne. Bi vî rengî derbarê komunîstan de ev propoganda dikirin.

Ji bo vê Marks Englis di Manîfestoya partiya komunîst de tiştekî bi vî rengî dibêjin; "Manîfestoya partiya komunîst heye, pirtûkek pir biçûk e, di sala 1847'an de hatiye nivîsandin. Dibêjin; birjiwazî ji bo me komunîstan dibêjin ev wê jinan jî komînal bikin. Dibêjin, ya rastî ev rast e, ew li gorî xwe dihizirin, ji ber çi, ji ber ku ew jinan mulk dibînin. Em jî mulkiyeta taybet dixwazin komînal bikin, bikin malê civakê ji bo vê dibêjin jinan jî komînal dikin. Ji ber ku bi mentiqê xwe dihizirin. Jinan jî mulk dibînin, bi vî esas digirin. Lê di rastiyê de dibêjin em jinan mulk nabînin, dema ku nakokiyên çînî ji holê rabin, dema ku feqîrtî ji holê rabe wê çaxê sedema ku jin bedena xwe pazar bikin jî ji holê radibe û bi vî rengî jin azad dibin." Bi vî rengî komunîst bersiva xwe didin.

Di Rojhilata Navîn de jî ev nêzîkî sede sala ye, ji salên 1920'tan û şûnda, dema fikirê komunîst derbasî herêmê bû, bi şûnda ev propoganda li dijî wan hate dest pê kirin. Heman ev propoganda vê carê hezar salî beriya niha li dijî van tevgerên civakî hatiye kirin.

Li dijî Qermîtiyan, Zenciyan, Babekiyan, Xuresaniya hatiye kirin, li dijî van hemûyan hatiye kirin, li dijî Alewiyan hatiye kirin û heta roja me ya îro jî berdewam dike. Tiştên esl û astarê, bi heqîqetê re ti girêdanê wan tine ye, bi temamî berovajî, tanê ji bo teşhîr kirinê, ji bo sedemên komkujiyan peyda bikin, van tiştan pêş dixin.

### Pêşketina Tevgera Qermîtî'yan

Tevgerên zanistî yên ku berê jî me anîn ziman, bi taybetî jî tevgerên di serdema Abasiyan de pêş ketine, di nav van tevgeran de mirov tevgera Qermîtiyan bigire dest.

Ev çi tevger e? Ev tevger di serdema 250'yê, hicrî, yanî 860-870'yan de di wan serdeman de, di sedesaliay 9'ê PZ'ê û şûnda derketiye 800'dî û bi şûnda derketiye.

Serokê wê tevgerê yê ku seretayî dest pê kiriye, kesek bi navê wî Hemedil Eşal jê re dibêin. Lê belê ji ber ku bejina wî kinbûye, jê re gotine Qurmit, qurmit peyvek Erebî ye, wê çaxê tê wateya kinbûyînê. Tevger bi navê wî pêş ketiye, tevgera Qermîtî. Ev tevger li dijî du tiştan derketiye.

Yek, zêde parçebûna dewletê, rûxandina pergala siyasî gav bi gav di împeratoriya Abasiyan de, ya duyemîn jî, ya herî girîng jî ew e, ji bo edaleta civakî ye. Yanî tunebûna edaleta civakî di sîstemê de bû sersebebê ku ev kesana li dijî rabin.

Tevgerek komunal e, li ser esasê wekheviyê pêş dikeve. Li beramberî împeratoriya Abasiyan şer kirin. Di gelek cihan de hikum kirin, ev Behrêna ku niha şer tê de heye, di esas de li Behrên û di pişt re li hemû welatên Kendavê belav bûn. Li Uman, Behrên, Îmarat, ji lewre ev navên ha berê tinebûn, lê li van cihan hemûyan belav bûn, otorîteya împeratoriya Abasî ji holê rakir. Ev hemû bi şer kirin, lê şerê wan pir balkêş e! Mînak, hinek şer hene di navbera Qermîtiyan û Abasiyan de, şervanên Qermîtî hêjmara

wan 200’rin, yên Abasî 80’ê hezarin, heştê hezar li beramberî du hezarane, dîsa jî artêşa Abasî şikestiye. Bi vî rengî belav bûn.

Wê demê bawerî hebûye bi sîstema xwe ya civakî bawer bûne, wê demê ewqasî xerabî, ji rê derketin, dejenerebûn, di desthilatdariyê de çêbûne ku însanan nikarîbûne bidin şer kirin. Ji bo vê heştê hezar beramberî du hezaran bi bin ketin.

Ev di milê xwe yê Kendavê de ewqasî serwer bûn. Ev tiştên wer pûç, zêde bêwate, mînak nediçûn hecê. Heta nedixwestin kes biçin hecê jî. Ev tiştên sembolîk jî ji holê rakirin. Mînak, demekî kevrê hecê rakirin birin, ji wir birin û veşartin. Ji wan re wan re bê mentiq dihat.

Piştî wan Helacê Mensûr jî ev tişt îdia kirin. Ev gotin; “li şûna ku yek biçe hecê, li cihê xwe sêwiyan xwedî bike baştir e.” Heta dadkirina wî jî li ser vî esasî çêbû û hikumê mirinê li ser hate birîn. Jê re wiha hate gotin; “Te çima wiha gotiye, ji ber Hec li gorî Mislmanan hêmanekî esasî ye, bingehîne, divê ku her kes karibin biçin hecê. Lê Helacê Mensûr got; na yên ku karibin divê neçin hecê, li şûna biçin hecê li derdora xwe feqîr û birçî hene wan têr bike, wan xwedî bike baştir e.”

Qeramîta jî li dijî vê çûna hecê derketin, yanî wê demê Îslamiyet ji nû ve şîrove kirin. Dîn ji nû de şîrove kirin. Li dijî sîstema civakî derketin, rexne kirin û li şûna wê alternatîf sîstem avakirin. Li Kendavê bi taybetî Behrên, Uman, pişt re li herêma Şamê, weke bajarê Şamê na, weke herêma Şamê ku hemû Sûriyê û qismek Îraqê van deran hemû di nava xwe de dicivîne. Nêzîkî sî salî li van deran hikum kirin. Lê belê teşhîra ku hate kirin, parçebûnên ku çêbûn, di navbera wan de her demê êrîşên dewletê bi alîkariya pişt re ku Tirkan kir, êrîşên dewleta Abasiyan li ser wan, tesfiye kirin.

Lê hîna jî bermayên wê sîstema civakî li cihên weke Umanê û Behrên, li gelek cihên din jî hene. Lê belê di dîroka fermî de bi rengekî pir xerab dane nîşandan. Heta mirov dikare bêje yên herî zêde wan teşhîr dike nikare vê îdia bike û bêje ne tevgerekî wekheviyê ne. Dibêjin; tevgerek li ser esasê wekheviyê avabûne, lê di wekheviyê de vê carê wan teşhîr dikin. Wiha teşhîr dikin, her tiştên xwe li hevdu belav dikirn û vê carê meselên exlaq dikin rojevê. Dibêjin Xwedêgiravî; têkiliyên di navbera bab û qizan de, kur û dayîkê de, yanî bi vî rengî wan teşhîr dikin. Ev ne rast in.

Lê belê belê Îslamiyet ji nû ve şîrove kirin, gelek tiştên ne di cih de yên ku di Îslamiyetê esas nedigirtin. Li şûna wê weke hêzekî exlaqî, çandî, li ser esasê edaleta civakî qebûl dikirin. Bi Xwedê re ne berovajî bûn, bi Pêxember re ne berovajî bûn, dînê Îslamê qebûl dikirin, limêj û rojî digirtin, lê hinek tiştên din jî esas nedigirtin, yên weke çawa sîstema fermî.

**Pêşketina Tevgera Zenciyan**

Di esas de tevgera balkêş, ya wer çînî jî mirov dikare bêje, ya ku di navbera salên 869-883'yan de çêbûye. Yanî di navbera 13'an de salan dibe ku zêdetir be jî çêbûye. Li ku derê ev çêbû, li Besra, li derdorê Besra. Bi pêşengiya kesekî navê wî Aliyê kurê Muhemed, eslê xwe Fars e, ne Ereb e, Fars e. Lê wê çaxê ji ber ku dewlet Îslamî bûye ferq zêde nebûne, yekî Fars di welatê Ereban de dijiya, yekî Ereb karîbû li cihên din bijiya, ji bo vê demekî dijî.

Însanekî pir bi edebiyatê, helbest, çand, xîtabetê re têkildar e. Ji nêzîk ve desthilatiya siyasî şopandiye, di serayên Abasiyan de maye. Di pişt re jî ji wan cuda bûye. Ji wan cuda bûye, bi taybetî li dijî pêkanînên li ser kolan tê meşandin derketiye.

Kole hebûn, ji ber ku bi giranî jî kole yên reş bûn, yanî yên bi rengên xwe reş bûn, ji bo vê navê wê serhildanê bû, Zinciyan. Lê belê hemû ne Zincî bûn. Di nav wan de Ereb hebûn, Fars di nav de bûn hwd, gelek gel di nav de bûn. Ne tenê Zencî bûn, yanî tenê ne kole bûn, gundî jî di nava wan de hebûn.

Lê di esas de dibêjin; di serhildana Tunis de ciwanekî agir bera bedena xwe daye, bi vî rengî bû serhildan. Yanî ji ku dest pê kir, esas xala şikstinê ku der bûye? Li Besra lîtav hene, çemên Dicle û Frat digihêjin hev, ew çemana li derdora xwe lîtavekî mezin çêdikin, ev lîtavan ziwa dikin û dikin cihê çandiniyê. Ev hemû bi keda kolan çêdibû.

Zilmekî mezin dihate kirin, heta asta dawiyê karekî pir dijwar bû, li dijî vê ev kes derdikeve. Ev kesê bi navê Aliyê kurê Muhemd yê bi eslê xwe Fars e derket. Ev zilma li ser kolan red kir, yanî Îslamiyet û koletî!? Ewqas zilum çênabe, ji bo vê derket û kole li dora xwe kom kirin û vêca gundî jî li dora wan kom bûn, li kêleka Besra bajar avakirin. Li dijî împratoriya Abasî li ber xwe dan. Her împratoriyê hewil da artêş şand bi ser wan de da ku wan tesfiye bike, bi berxwedanekî wiha tund, bi cesaretek mezin, bi hêjmarek hindik li hemberî hêjmarên mezin ê artêşê, lê bi tektîkên leşkerî yên pir balkêş yê wê çaxê didan meşandin, her demê artêşa Abasiyan şkandin. Her demê mezin bûn, dewletek avakirin. Ji lewre dewleta avakirine weke ya Abasiyan nebû, lê di encamê de ew jî dewlet bû.

Lê belê dewletekî komunal bû, wekhevî esas digirt. Zilum tê de tinebû, koledarî tê de tinebû. Her kes ji bo xwe dixebitî. Ji bo vê em bala xwe bidinê cihê ku demokrasî tê de heye, wekhevî tê de heye wêrekî tê de heye, serkeftin tê de heye. Bi hêjmarekî hindik, li hemberî hêjmarê zêde zêde mezin şer li hemberî artêşa Abasiyan dikirin. Abasî di şer de dişkestin. Gelek komîtanên leşkerî yên Abasiyan hatin kuştin. Komîtan di wî şerî de hatin kuştin. Yanî yê serokên artêşê yên xelîfan ew dişandin.

Bi vî rengî berfireh dikirin, derdora Besra, herêma Îraqê, wer berfireh dibûn. Ji bo vê împratoriya Abasî hêdî hêdî kêm û lewaz dibû. împratoriya Abasiyan ji bo vê tevgerê tenê çi kir da ku ji holê rabike? Îxanet kir, îxanetek çawa kir, mînak Misr ne girêdayî împratoriyê bû. Misir li gorî xwe xîlafetek wan ya taybet

hebû, xîlafeta wan cuda bû, ya Fatimî bû. Ne girêdayî xelîfên Abasî bûn. Heta Şamê Msirê hikum dikir.

Xelîfên Abasî çû ji komîtanê dewleta yê Fatimî yê girêdayî xelîfên Msirê gotin wan; werin aliyê me, em van Zenciyan ji holê rabikin û ez te li vir bikin hakim. Wan jî qebûl kir. Wî waliyî tevî hemû artêşa xwe ya mezin, artêşa Abasiyan hemû bûn yek, dîsa jî bi rengekî pir dijwar di encamê de bêtirî 250'iyî însan di wan şeran de hatine kuştin. Di wê dîrokê de, heta ku karîbûne vê tevgera Zincî ji holê rabikin. Yan jî vê serhildana Zinciyan ji holê rakin. Piştî ku zêdetirî 13'de salan hikumê komunal, wekhevî, di wê herêmê de dan meşandin.

Tabî beramberî vê dîsa hereketên ji milê Aryen, Azirbêcanê, Xuresanê, Abo Mslûm, Babek, van jî li hemberî dewleta navendî li ber xwe dan, li ser esasê ku wekheviyê bimeşînin, edeleta civakî bimeşînin. Lê hemû jî bi bin ketin û ev kevneşopiya berxwedanê di serdema împeratoriya Osmanî de jî dewam kir.

Vê berxwedanê bi rengên cuda cuda pêşketin. Bi gelemperî bi ser neketin. Sedem ne serkeftinê taybetmendiyên dewletê yên ku tê de rolekî esasî dileyîzin. Ev dewleta xwe pîroz dibîne, bi şerîatê hikum dike, pirtûka Xwedê ji bo xwe referans digire, hedîsê Muhemed ji bo xwe referans digire. Di nava civakekî Îslamî de bi hêza xwe ya teşhîrê bi taybetî jî di aliyê exlaqî de yê li dijî van tevgerana bi komkirina hêzên leşkerî û gelek caran bi dek û dolab û îxanetê karîbûne van tevgeran bi giştî tesfiye bikin. Wan di nav golên xwînê de bifetisînin. Wan bi rengekî xerab derbasî dîrokê bikin.

Ev rengê xerab derbaskirina dîrokê bandorekî mezin çêkir. Li ser lewazkirina ruhê berxwedanê di herêmê de, d herêmê de li ser pîrozbûn û mayendebûna dewletê çêkir.

## Tevgerên Rojhilata Navîn Bi Zihniyeta Dewletê Xwe Întîhar Kirin

Ji bo vê niha em tevgerekî civakî di herêmê de pêş dikeve. Ev tevgera civakî heger ji bo desthilatiyê kar bike, perspektîfên wê yên serkeftinê çênabin. Niha jî emperyalîzm û statîkuperest dixwezin berê tevgerên civakî bidin desthilatiyê. Yanî weke çawa tevgerên civakî bi hevbeşkirina desthilatdariyê wan razî bikin.

Mînak, bêjin ji bo we jî ev e. Yanî demokrasî û daxwaziyên demokratîk wek daxwaziyekî civakî pêdiviyekî pêwîst na, wek çawa şerekî hevbeşbûnê dixwazin bidin nîşan dan, bi vî rengî bi taybetî rêvebirê tevgera civakî dema bi hinek par ji desthilatiyê bidin wan û wan razî bikin û bi vî rengî careke din şoreş di Rojhilata Navîn de dibe dijberê xwe.

Ji bo vê divê em dewletê nîqaş bikin. Ji lewre nîqaşa dewletê girîng e. Heger dewlet baş neyê nîqaş kirin, rê li pêşiya vê xapandina ku îro emperyalîzm û statîkuperest ji bo tesfiyekirina tevgera civakî xapendinên ku dikin, wê bi ser kevin.

Ji bo rê pêşiya guhertinekî cidî di aliyê gelan de bigirin, vê xapandinê dikin. Ji bo vê divê dewlet baş bê nasîn. Wê demê tevgera civakî ji bo ku dewletê bi cih bibe, pay bigire na, ji bo ku karibe qada rêxistina civakê peyda bike. Yanî civaka xwe bi xwe rêve dibe. Civaka li ser esasê edaletê, wekheviyê û li ser esasê berjewendiyên xwe, xwe bi rêve dibe.

Li Rojhilata Navîn, civak û hemû unsûrên (hêmanên) civakê, zarok, jin, ciwan, komên pîşesaz, tenê wesîlên ji bo pêkanînên xwestek û hedefên dewletê. Mînak zarok, jin û ciwan çawa tên terbiye kirin. Ev dînamîkên esasî yên ku civakê û hemû kesimên dîtir jî ku hemû li ser esasê sîstemê biparêzin. Berjewendiyên dewletê biparêzin, tenê weke amûr bin, ji bo hedefên dewletê pêk bînin. Niha tiştên ku esas di tevgera civakî li Rojhilata Navîn bê girtin çi ye? şaştiya vî tiştî, xerabiya vî rengê fikirandinê, li şûna wê gav bi gav civak weke nesne, ji bo pêkanîna hedefên dewletê na, civak weke cewher, ji bo xwe rêxistin û rêvebirin di çarçoveya berjewendiyên xwe de divê ku bê perwerde kirin. Ji bo vê jî tevgera civakî ya li ser esasê hevparkirinê, yan jî pay girtin ji dewletê pêş bikeve, ew tevger bi xwe re îxanetê dike. Bi prensîbên xwe re îxanetê dike, tevger û şoreşa li Rojhilata Navîn bi vî rengî her demê bi xwe re îxanet kir, xwekuşt. Bi çi xwekuşt bi dewletbûyînê xwekuşt, bi desthilatiyê xwekuşt, gav bi gav bi dewlet-netewê xwekuşt.Bi vî rengî şehîdên ku hatine dayîn, şerê ku hatine kirin, li dijî emperyalîzmê, li dijî desthilatdariyê careke din bi rengekî pir tiracîk, ji berê xerabtir xwe dubare kir.

Ji bo vê jî peydakirina qada rêxistina civakê pir girîng e. Ev pirsgirêkekî cidî ye, ji ber çi pirsgirêkekî cidî ye? Ji ber ku ji niha ve em tevdîra wê nagirin. Bala xwe bidinê siyaseta demokratîk çi ye, siyaseta ne endeksî dewletê û desthilatiyê be. Ew siyaset, yanî ya demokratîk heger hebe nahêle û ewlehiya ku nehêle şoreş îxanetê bi xwe re neke peyda dike.

Lê em bala xwe bidinê di gelek aliyan de em behsa siyaseta demokratîk dikin, lê nêzîkbûnên me yên desthilatîparêz, ne siyaseta demokratîke. Nêzîkbûnên desthilatîparêz baweriyê nade ku ev şoreş bi xwe re îxanetê neke. Tenê baweriya ku şoreş bi xwe re îxanetê neke siyaseta demokratîk e.

Siyaseta demokratîk, siyaseta ne endeksî dewletê ye. Siyaseta peydakirina hêza xwe bi rê ve birinê ya civakê ye. Ji bo vê têkoşînekî dijwar li dijî çanda desthilatdariyê û dewletê divê ku em pêş bixin. Bê dudilî divê em pêş bixin, bê şerm em pêş bixin.

Mixabin heta niha di nava rêxistina me de jî rexnên me yên dewletê pir şermûke ne. Pir bi dudilî ne, weke ku em sûc dikin dema em rexnên dewletê dikin. Ji ber çi, ji ber ku baweriyekî wiha di hundirê civakê de belav bûye ku çawa dewleta Kurdî azadiya Kurdistanê ye. Dewleta Kurdî serxwebûna Kurdistanê ye.

Em jî berovajiyê wê îdia dikin dewlet ti carî azadiyê û serxwebûnê bi xwe re nayîne. Tam berovajiyê wê, koletiyê bi xwe re tîne, ne dewletbûyîna, heger weke dezawantac li dijî Kurdan hate meşandin rê ji asîmîlasyonê re vekir, îro em weke ewentac ji bûyî ku bêasteng ber bi avakirina sîstema civakî ya demokratîk ve biçin, em dikarin ji bo xwe wek awantac bidin xebitandin.

Di gelek cihan de diplomasiya me hîna di çarçoveya dewletê de ye. Mirov jê re dibêje; heval tu çima wiha xeber didî? Dibêje; heger ez wiha ez xeber nedim alem zêde li me guhdar nake. Di esas de ne ku alem lê guhdar nake, ew bi xwe jî naxwaze li xwe guhdar bike. Yanî bi xwe jî di vê helwestê de zelal nebûye.

Yan jî di cih cihana de bi taybetî weke henek tê kirin, lê pala xwe dide rastiyekî û baweriyekî. Mînak bi gotinên wiha ne zêde etîkin jî, mînak carina henek heval tên û dibêjin; ya rastî ji ber ku bi dest me neketiye em naxwazin, yan jî nizanim bi gotinên wiha seyr (tîpîk) tînin ziman. Ji lewre rûvî nizanim devê wî negihaşt çi gotiye, bila xêra bavê min be. Weke çawa ne prensîb, wek ji bo me nikarîbû, lê ya rastî êrîşên li ser me di cîhanê de piştî em derbasî pradîgma nû bûn zêde bûn. Berê munewira qada me ji di cîhanê de firehtir bû.

Di Rojhilata Navîn de jî firehtir bû, gelek dewlet ji bo me rê vedikirin. Ewrûpa em weke niha terorîze nekiribûn. Wê demê mesele ne karîbûn û nekarîbûne, ne jî tewîz dayîne. Mesele prensîb e, ji bo vê moral, zanistî, motevaziyon pêwîst e, ev tiştên ha hemû pêwîst in.

Lê dema tu bi şermokî, bi dudilî nêzîk bibî, tu yê çawa gel motîve bikî, wan bikî tevgerê! Ev pirsgirêkin, ji bo vê divê ev bên derBeaskirin,  di vê derbarê de şîrovekirina dewletê baş divê bê kirin. Rexna wê divê baş bê kirin, lê belê divê mirov vê jî berbiçav nekin, hinek tişt hene di roja me ya îro de em nikarin tesewir bikin. Ralîta heye, em nikarin bêjin dewlet tine ye, yan jî weke çawa tine ye em nêzîk bibin. Yan jî em hema derbas bikin. Ji bo vê hinek qonax yên demî, yên derbaskirinê, yên aliyê dewletê, ahengî, dewlet+demokrasî heye, carina em jê re dibêjin demokrasî. Bi vî rengî encex ew rabe. Lê di rexnekirinê de divê mriov cidî be, radîka be, her demê rêkxistina civakê esas bigir. Ew rêxistina civakê pênc hezar sale wenda bûye, ji bo em carekî din karibin îrada xwe bi rêve birinê, îrada ku civak karibe temsîla berjewendiyên xwe bike derxin holê, girîng e em dewletê rexne bikin. Ji ber ku ev bi dewletê nabe. Dewlet civakê bi îrade nake, dewlet civakê bê îrade dike. Dewletbûyîn li ser esasê bê îrada kirina civakê çêdibe. Civakekî bi îrade yan dewlet tê de tine ye, yan jî pir lewaz e, civaka bê îrade dewlet tê de bihêz e, divê mirov li ser vê baş kûr bibe. Bi vî rengî prensîbên xwe biparêze.

## DI ROJHILATA NAVÎN DE PIRSGIRÊKA JIN Û MALBATÊ

Ev pirsgirêk di hemû cîhanê de beramberî pêşveçûnê asteng e, lê belê weke çawa navenda krîzê be li Rojhilata Navîn. Bi taybetî nêzîkbûnên ji jin malbatê re mirov dikare weke navenda krîzê bigire dest, ji ber gelek sedeman.

Ji lewre em neçarin careke din vegerin ser xalekî. Ew xal jî ew e ku Rojhilata Navîn çavkaniya van pirsgirêka ye. Her demekî wexta em pirsgirêkekî digirin dest, em çavkaniyên wan vedigirin Rojhilata Navîn, ev divê acizker neyê. Ji ber ku bingehê teoriya me ya civakî li ser rûdinê. Ji bo vê em wê esas digirin û çavkaniya pirsgirêkên me yên îro jî di wir de veşartiye. Em çiqasî dîroka kevn a Rojhilata Navîn şîrove bikin, ewqasî em ê pirsgirêkên xwe yên îro çareser bikin.

Ewqasî em ê şaştiyan bibînin, sedemên wê bibînin. Ji ber ku dema em dibêjin dewlet yek dibêje; dewlet neçariye, pêwîst e, pêşketin çêkiriye hwd, lê em vedigerin dîroka Rojhilata Navîn, em dinerin ku dewlet ji ku çêbûye? Dewlet ji bêmafiyê çêbûye, ji talanê, xapandinê, derewan û destdayîna ser nirxên zêde çêbûye. Dema ev di vir de digihîjin zelabûnekî, sedemên ku di roja me ya îro de dewletê rewa dikin, em dikarin wan sedeman pûç bikin. Lê belê dema hayê me jê tune be ev pêkhatin çawa çêbûye, em ê jî weke derdorên xwe motleq lê temaşe bikin, ji neçarî em ê lê temaşe bikin, weke pêkhatinekê em ê lê temaşe bikin. Em ê girêdayî wê bin û ji bo wê têbikoşin.

Ev jî xebata me çewt dike, rêka nerast dimeşîne. Ji bo vê Rêbertî çi dibêje; "Şopandina heman rê me nabe gundekî din." Yanî heger tu heman rêkê bişopînî tu naçî gundekî din. Ji ber ku tu yê biçî heman gundî. Ji bo tu biçî gundekî din divê ku tu rêkên din bişopînî. Ji bo ku em dixwazin civaka exlaqî û polîtîk avabikin rêka ku desthilatdariyê şopandiye, sîstem xistiye bin kontrola xwe, em wê rêkê bişopînin em nagihêjin civaka exlaqî û polîtîk. Em ê bigihîjin ku? Em ê dîsa bigihîjin desthilatdariyê. Ji bo vê wê xebata me vala derbas bibe. Yanî Encamê nagire, di çarçoveya armancên me danîne pêşiya xwe de encamê nagire.

Di meselên jin û malbatê de jî divê em vegerin vir. Bêguman cihê jinê û malbatê di pêvajoya civakî de, li her erdnîgariyekê cîhanê, seyrek girtin. Lê di Rojhilata Navîn de hîna bêtir orjînal, hîna zêdetir dema mirov dikare analîz bike, mirov dikare jê hinek encaman derbixîne. Vê di îlmê dîrokê û civakî de bike weke tez.

Niha di serdemekê de jin dihat rêzgirtin, heta pîroz dihat dîtin, di dîrokê de serdemek bi vî rengî hebûye, êdî her kes tê de hem fikirin. Lewre komên dînî, dîndar tevlî vê nerînê nabin, lê belê bi gelemperî îlmê civakî (sosyolojî), bi taybetî sosyalîst, heta ên birjiwa, êdî vê rastiyê qebûl dikin ku di dîroka kevn de serdemek wiha hebûye ku tê de rêz girtina pîroz dîtina jinê hebûye, lê belê di şîrovan de, tesbît kirina sedeman de hinek pirsgirêk hene.

Mînak teoriya hey vê dibêje; jin çima pîroz e? Heta hinek tenê ne pîrozbahiyê, wek serdema jinokratîk dinirxînin, yanî serdema hikumê jinê digirin dest. tesbîtekî çiqasî rast e, çiqasî bi rastiyên zanistiyê re dibin yek, mirov dikare nîqaş bike. Lê di encamê de ew rêzgirtin, ew pîrozbahî, yan jî heta wî hikumî jî dema em qebûl bikin, ji bo çi hebûye? Dibêjin; wê demê malbata yekalî tune bûye, ji bo vê di têkiliyên civakî di navbera însan de

pergala weke di roja me ya îro de tune bûye, encax û encax ayîdbûna însan, yan jî nifşê însan bi jinê dikarîbû bihata tesbît kirin, zela bû ku jin dayîka filan Kesî/ê ye. Vê jê re rêzgirtinek peyda kir. Ev nêzîkbûnek yekaliye. Dibe ku rola wê heta astekî hebe. Lê belê, ev tenê têrê nake ku jin weke rêzgirtinekê bigire dest. Wê demê tiştên din hebûne, ew tişên din çi bûne?

Bêguman têkiliya di navbera zarok û dayîkê de bi xwe re rêzgirtinekê tîne. Ew temam e, lê di aktîvîta civakî de rol lîstina di wê demê heye. Jin di eksena katîvîta civakî, rêvebirinê de bûye, ji bo vê rêzgirtin hebûye. Lewre wer çawa îdia tê kirin ji ber ku kes nedikarî vê tesbît bike ka bav kî ye, nikarîbûn tesbît bikin û tenê dayîk dihate tesbît kirin, ji bo vê pîrozbahiyek çêbû, ji bo vê rêzgirtinek dihat dayîn, ew têrê nake. Bes jî nîne, wê demê hinek tiştên din jî divê hebin da ku ew pîrozbahî bê qebûl kirin. Ew tiştana çi ne? Rola di avakirina civakê, civakbûyînê, dizyîna civakê û rêvebirina civakê de ye. ji bo vê Rêbertî dibêje: şoreşa neolotîkê şoreşa jinê ye. Wê demê tenê bi mesela wê bi cins ve girêdayî nîne, bi tesbîtkirina nifş ve girêdayî nîne. Bi meselak civakî ve girêdayî ye.

Ew bo sersebebê pîrozbahiyê, êdî zelale ku ev rastî heye. Bi çi em zelal in, bi hinek bîranînên hey, yanî biranînê civakî yên ku heta roja îro xwe berdewam dikin û mafê dayîkê, pîrozbûyîna dayîkê, ev hîna xwe diparêze, ev yek e.

Ya duyemîn, lêgerînên arkolojîk gihîştin hinek encaman ku berî Xwedayê mêr ên Xwedayên mê hebûn. Yek Xweda hebû, ew bi heykelên cur be cur, bi taybetî jî di axa Mezepotamiya jêrîn de, di dera ku îro em jê re dibêjin Kurdistan pir lê rast hatin, pir peyda bûne. Ew jî nîşanek dîtir e. Di civakên ku hîna derbasî şaristaniya çînî nebûne, bi taybetî dema ku Emerîka hate keşf kirin, di sala 1497'an de, parzemîna Emerîka Başûr û Bakurê wê dema hate keşf kirin, şêwazê jiyan di qebîle û eşîretan de ev sîstema desthilatiya mêr tê de tune bû. Heta niha jî hinek qebîlên bi kevneşopiyên xwe yên xwezayî ve girêdayî hê dijîn. Mînak ev qebîlên Aborjîn ên li Ewistoraliya hîna ev rewş di nava wan de dewam e. Yanî tiştekî navê wê serweriya mêr, desthilatdariya mêr, sîstema desthilatdariya mêr tune ye. Ev di her liv û tevgera civakê de diyar dibe, liv û tevgera jinê, nêzîkbûna jinê ji zilam re, nêzîkbûna jinê ji zarokan re, diyar dike ku çawa weke nesne, weke miluk, tabiaî zilam na, weke cewherekî cuda, ew jî di avahiya civakî de hevpariyê nîşan dide.

Ev hemû vê diyar dikin ku sîstema desthilatdariya zilam sîstemek wek çawa tê îdia kirin ku sîstemekî Xwedayî ye xwezayî ye, ji ber taybetmendiyên fîzîkî mêjî û hwd, ên zilam ev tolarans jê re hatiye nîşandan, ew îdia ne rast e, îdianî civakî ne, îdiolojîk in, hatine ferz kirin, li ser hatiye perwerde kirin, ev gihîştiye astekî weke çawa tiştekî xwezayî bê dîtin.

Ji lewre niha guftuguhkirina vê meselê ev dused sal e, bi taybetî jî zêdetirî sed û pêncî sal e, di rojevê de ye. Zanista fermî çavê xwe li ser digire, bi taybetî jî lêkolînên ên weke di derbarê dîroka civakan de, lêkolînên kesên weke Morgeng, ew jî

zaniyarekî dîrokê yê Emrekî ye, zanista fermî bi tabetî li Rojava di Ewrûpa de, li ser agahî û formîlên ew gihîştinê, tesbîtên ku di derbarê dîroka civakan de, derbarê têkiliyên di navbera kesimên nava civakê yên cuda cuda de her demê çavên xwe li ser wan girtine.

Ji ber çi, ji ber tesbîtên Morgan, yanî ji nedîtî ve nêzîk bûne. Tesbîtên Morgen îdiaya xwezayîbûna desthilatdariyê û desthilatdariya zilam ji holê radike. Yanî îdia dike ku civak bê desthilatî, bê dewlet xwe bi rê ve dibin. Civak bê desthilatdariya mêr jî xwe bi rê ve dibe. Bi lêkolînên di nava eşîr û qebîlê li Emerîka kevn kirine, encamên wan hemûyan derxistine û pirtûkên wan çêkirine. Bi taybetî pirtûka wî ya dîroka civakan, pir mijarek balkêş e. Lê zanista fermî çavê xwe li ser digire, weke meTUDEHekî perwerdê pêşkêş nake, zêde girîngiyê nadiyê. Ji ber çi, ji ber sedemên desthilatdariyê û desthilatdariya zilam ji holê rabike.

Ji bo vê zanista fermî li ser vê xalê zêde nasekine, li ser xwezaya pernsîbê wekheviya jin û mêr, heta li ser ka çawa sîstema hey ne tiştekî xwezayî ye, lêkolînên li ser van çêdibin, civaka fermî ji nedîtî ve nêzîk dibe. Lê ew formîlên xwe yên wekheviyê pêş dixe. Weke çawa îro kapîtalîzm didil xwe de wekheviya jin û mêr îdia dike û heta diparêze, mafê jinê diparêze, lê bi şêwazê xwe. Ji taybetmendiyên xwezayî dûr, weke lûtfekê ji cem xwe weke çawa sîstemekî mirovhez însanî ye. Ji bo vê jî jin ji astekî xerab derxistiye, derbasî astekî baş kiriye. Lê belê di esas de hemû şêwazê xapandinê ye. Li ser wê jî em ê rawestin.

### Tesbîtên Zanista Sosyolojiya Sosyalîst

Niha sosyalîstên destpêkê di vê derbarê de zêde ne zelal bûn û ne rast bûn. Engils di vê mijarê de rexnedana xwe dide. Engils dema pirtûka xwe ya "Eslê Malbatê, Milkiyeta Taybet dinivîse dibêje; " Ji bo ku ez vê pirtûkê binivîsînim min hinek gelala min û Marks di zemanê xwe de me nivîsandine, min li wan nihêrî. Di wan de ez rastî tesbîtekî hatim ku min û Marks ji xwe re gotiye, perçebûna seretayî (işbölumi) ya kar  a xwezayî, ya ku çêbûye û di navbera jin û mêr de çêbûye, li ser esasê çêkirina zarokan. Lê belê niha ez lê temaşe dikim ew tesbîta me çewt e. Ew yekem hevparbûna xwezayî nîne, bindestiya seretayî ye. Bindestiya seretayî bi malbata yekalî çêbûye, yanî malbata bin hegemoniya zilam de, li ser esasê milkiyeta jinê ye. Jê û şûn ve dîrok ber bi paş ve çûye. " Di wir de ew tesbîtên xwe yê berê dixwaze sererast bike.

Ji lewre di vir de işbulumi parvekirinek xwezayî tune ye, desthilatdarî heye, hemû tişt ku li ser jinê hatine gotin û hatine kirin ji bo wê desthilatdariyê mayende bike û xwezayî bide nîşandan û pîroz bide nîşandan.

Ji bo ku ev mesele baş bê fêm kirin em dixwazin hinek mînakan pê destek bikin. Em bala xwe bidinê di roja me ya îro de desthilatdarê li ser Kurdan, Kurdan çawa didin nîşan dan. Mînak, miliyetparêzên Ereb serdestên Ereb çawa nêzîkî Kurdan dibin? Ji

ber ku asîmîlasyonê esas digirin. Ji ber ku înkarê, tunekirinê esas digirin, ji bo vê di nirxandina Kurdan de jî tiştê ku vê siyaseta wan a înkarê destek bike derdixin pêş. Çi ne ev tiştên wan destek dikin? Gelek ji wan vê dibêjin; Kurd ne însan in, Kurd ziriyeta şeytan in, ne însan in! Bi çi awayî dibêjin, lewre li gorî xwe şîrove dikin. Herweha pêxember Sulêman hebûye, çil heb jinên wî hebûne, ew jinan sî û neh heb ji wan bi şeytan re ketine nava têkiliyan, zarok ji wan re çêbûne û hatine ji pêxember pirsîne, em çi bikin ji wan zarokan? Pêxember jî wiha bersiv daye wan; berdin wan bila biçin çiya. Navê wan jî bûye Kurd. Bi vî rengî Kurd çêbûne.

Ev ne ku henekan dikin, fermî tînin ziman. Tirik çi dibêjin, yanî miliyetger, desthilatdarên Tirik çi dibêjin? Dema ku behsa Kurdan tê kirin, bêhiş in, fêm nakin, teriya wan heye hwd. Hezar tiştî ji Kurdan re dibêjin. Vê tiştan çima dibêjin; heger bêjin Kurd însan in û fêm dikin, mêjiyê wan heye û birayê me ne hwd, wê demê wê çima bindest bin!?

Ji bo ku sedeman ji bindestiyê re bibînin, Kurdan weke însan qebûl nakin, tenê ev na! Wer dikin ku Kurd jî xwe weke însanan nebîn in. Ji bo vê niha otoasîmîlasyon heye. Otoasîmîlasyon çi ye? Xwe bi xwe înkar kirine. Yanî hegemoniya îdeolojîk vê carê qebûl kirin. Xwe bi xwe qebûl kirin. Di esas de xeterî di wir de ye.

Gelek caran mirov lê temaşe dike ku hevalên me dema ku hevalek şaştiyekî mezin dike, xerabiyekî dike û tiştekî wer ne li gorî aqil dike, em jê re dibêjin Kurdo. Wê demê Kurd layîqî van tiştanan e, wan ji xwe re qebûl kiriye. Di esas de ew ji xwe acizbûne.

Dîsa, zanista desthilat ê desthilatiya fermî tiştekî baş ji bindestan re qebûl nake. Mînak Rojavayî hinek derketin û li Efrîqiya û derên din jî geriyan, sedsala 19.18.'an de lêkolîn kirin. dîtin ku van gelan karin kirine. Bîna avakirine, sûr çêkirine, sîstemek wan hebûye, vegeriyan li Ewrûpa gotin encamê em gihîştinê ev in. Li Efrîqiya şaristanî hebûne. Lê ji wan re gotin; ne rast e, ev derw e, lê çima wiha dibêjin. Sîstemê dîsa bersiva wan da û gote wan; ne gengaz e ku Efrîqî karibin şaristaniyan çêbikin, ji ber ku kole ne. Ji ber ku Efrîqiyan dikirin û difiroşin. Ji bo vê divê ku taybetmendiyên wan ên însanî tine bin.

Lewre ew lêkolînan hatine redkirin û nehatin qebûl kirin. Li dijî derketin, li Elmaniya, Ingilîz li dijî derketin, tevî ku wê demê birjiwazîbûn û behsa homanîzmê dikirin, behsa demokrasiyê dikirin. Lê hemû jî tenê ji bo xwe behes dikirin, ji bo gelên din na. Heger bêjin ev ne însanin heywanin, wê çaxê meselê koletiyê kirin û firotina însanan sedem jê re peyda dibin û rewa dibin. Lê heger bêjin însanin wê demê ew tişt çênabin. Ji bo vê di derbarê bindestan de serdest her dem tiştên baş qebûl nakin.

### Li Rojhilata Navîn Şikandinên Jinê Yên Cinsî

Ji lewre di roja me ya îro de zanista fermî û pergala desthilatdar bi giştî ya ku bi hegemoniya mêr xwe bi nav dike, ti carî qebûl nakin ku di dîrokê de jin di eksena aktevîta civakî de be. Ji ber ku heger bê qebûl kirin wê demê rewşa jinê di roja me ya îro de wê ne rewa be. Ka ku her demê ev rewşa ku di roja me ya îro de dijî rewa be, çavê xwe li ser wê pêvajoyê digirin. Tiştên din yên li ser jinê hatine gotin, wan qebûl dikin. Ev tiştên hatine gotin çi ne?

Jin kirde nînin, nesne ye, ji zilam çêbûye. Ji hestiyê zilam çêbûye, ev bi Sumeran re destpêkiriye, bi dînê Yekxwedayî heta roja me ya îro hatiye. Ji bo vê du şikestinên bingehîn li Rojhilata Navîn li dijî jinê çêbûne.

Şikandina yekemîn; şikstina şaristaniya dewletî ya yekemîn e, ya çînbûyînê ye, ya ku tê de yekemîn kesimên civakî yên bindest jin bûye. Ev bi mîtolojiyan hatiye rewa kirin. Bi çi awayî hatiye rewa kirin? Jina ku pîroz bûye, weke Xwedavenda hatiye binavkirin, gav bi gav di sîstema Xwedayî de cihê wê nema û gav bi gav weke fahîşe, weke xerabî, teşwîqkirina xerabiyê, hêmanekê (ûnsrekê) teşbîs kirina xerabiyê derket pêş û ji bo vê bo nealetî.

Yanî di mîtolojiya kevn de bû nealetî û hemû hewildanên jinê ji bo karibe rewşa xwe ya civakî kevn paş de vegerine, bi ser neketiye. Ev mîtolojiya Înan ye, weke din hinek tiştên dîtir dide nîşandan. Ew şikestinek e, em bala xwe bidinê ev çi ye, ev ji holê rakirina mafê dayîkê ye, peydabûna mafê zilam e.

Ev di mîtolojiya Yewnan de hîna zêdetir şînber anîne ziman. Weke şanoyekê mîtolojîk hatiye nîvîsandin û nivîskî jî heye, heta roja me ya îro jî heye. Yê ku nivîsiye navê wî Eksxîros Ekxsîlos e; weke çawa Homîros Îlyada nivîsiye, ev jî destanek bi wî rengî ye.

Ev destan çi ye? Bibêjin piştî şerê Trova, dema ku Egemeno vegeriyaye malê jina wî ew kuştiye. Ji bo yarikê (yarê) xwe ew kuştiye. Kurê Egemenon Ernîst ji bo heyfa bavê xwe hilîne dayîka xwe kuştiye. Ji ber çi, ji ber ku wê dayîkê hem bavê wî, hem jî hevserê xwe kuştiye. Bala xwe bidinê mentiq çawa tê guhertin! Hem hevserê xwe kuştiye, heqê wê gav bi gav kêm dibe. hem bavê wî hem hevserê xwe kuştiye. Ev nîşandanên gêçîşê ne, ji mafê dayîkê ber ê bav ve diçe. Xwedayê mezin ê Yewnan Apolo, di esas de wî kurê Egemeno dehfandiye ku dayîka xwe bikuje.

Lê belê wê çaxê di mîtolojiya Yewnan de Erînos hene. Erînos kî ne, weke mirov bêje weke milyaketin, mafê dayîkê diparêzin. Bi çi rengî ji rengan kuştina jinê qebûl nakin û dema ku kuştina jinê çêbibe jî weke sûcekî mezin qebûl dikin. Ji bo ku ceza bikin kî dibe bila bibe timî di nava hewildanan de ne. Kurê Egemenon, ji ber van direve. Ji ber ku erka Erînûs parastina mafê jinê di jiyanê de ye. Lê Apolo, biryara xwe carekî daye. Kê destek dike, kurê Egemenon destek dike. Destek kirina kuştina dayîkê dike.

Ji bo vê dibêje bila dadgeh çêbibe. Seroka dadgehê Xwedaya Yewnan Atîna datîne. Dadgeh çêdibe, kurê Egemenon bi vî rengî diparêzin. Dibêje; bavê min kuştiye û hevserê xwe kuştiye. Ji bo vê jî min ew ceza kiriye. Ez mafdar bûm. Apolo vê tevgera wî destek dike. Lê ev çiqas rastî ne, yan ne, mîtolojîkin. Erînûs ji bo xwe kevneşopiyan referans digirin. Ew kevneşopî jî parastina mafê dayîkê yê ku divê neyê kuştin û kuştina dayîkê sûc e, ji bo vê bi çi rengê ji rengan be, sedem çi dibin jî divê ku dayîk neyê kuştin û kujar nayê afo kirin. Guftûguh wiha berdewam dikin.

Di pişt re biryar derbasî nava corî dibe, corî dibe du parçe. Nêvî li aliyê kurê Egemenon digirin, nîvê din jî aliyê Erînûsan digirin. Weke hev derdikevin, Atîna li gel kurê Egemenon dengê xwe bikar tîne û bi vî rengî Erînûs mehkum dibin û kurê Egemenon beraetê digire. Bi vî rengî ew mîtolojî yan jî ew şano di rastiyê de çi ye? Destpêka derbasbûna mafê zilam e. Qonaxa bi dawî anîna mafê dayîkê û derbasbûna mafê zilam e. Erînûs dimînin, lê rola wan tê guhertin. Êdî dikevin xizmeta sîstema hey de. Ew Erînûsê berê xwe vala kiribûn ji bo parastina mafê jinê, vê carê dikevin xizmeta sîstema hey.

Ev jî tê çi manê, tê mana jina ku xwe bi xwe, xwe înkar dike. Di encama înkarkirina sîstemê jin jî êdî wê rewşa xwe qebûl dike, bi vî rengî dibe parçek ji sîstemê. Ew tiştên ku berê weke zêdegavî, guneh dihate hesibandin, vê carê dibe heqekî asayî. Bi vî rengî weke ji kirdarbûnê derdikeve, dibe nesnak yan jî tabia zilam.

Ev şikestin di zemanê kevn de li Rojhilata Navîn çêbûye. Bi mîtolojiya Înana mirov dikare lê rast bê, lê di Rojava de hîna zêdetir şînber anîna ziman ji bo vê me ev mînak da.

### Bi Dînê Yekxwedayî Re Kûrkirina Şikestinên Cinsî

Dînê Yekxwedayî bi taybetî yê Yahûdî, Xiristiyantî û Misilmantî hîna zêdetir ev şikandina jinê kûrkirin. Her çiqasî hinek milê wê yên pîroz di serdema kevn de mabûn jî, ji serdema kevn heta serdema Babil, Asûr û Sumer an de, lê belê di serdemên dînên Yekxwedayî bi temamî ji holê rabû.

Jin bi temamî dibe nesne. Bi temamî dibe mal, mînak Misilmantî weke zeviyekî, weke erdê zilam bi nav dike. Yahûdîtî pir teşhîr dike, yanî weke mulk bi nav dike û ti mafekî wê yê însanî qebûl nake. Heta her tiştê jinê heram nîşan dide. Mînak, niha hinek komên fenatîk di Îsraîlê de hene, rojnamê wan hene di wan rojnameyên wan de wêneyên jinan qet tine ne.

Carê neçarin hinek nûçan bidin, mînak em bêjin, li Îsraîl hukumetek nû çêdibe, wê wêneyên hukumetê deyînin û di hukumetê de hinek jin jî hene, serê wan di wêne de jê dikin û bi vî rengî wênê wan didin. Da ku jin diyar nebe. Dengê wê guhdar nakin, TV’ê nanerin, bi vî rengî nêzîk dibin. Ango her tişt heram dihesibînin. Ev hinek komên fanatîk wiha ne, jixwe hemû Yahûdî wiha nînin. Sedema vê nêzîkbûnê ew dîn e.

Xiristiyantî jî bi wî rengî ye. Mînak, însanê herî zêde Xiristiyan, balkêş û hinekî pîroz tê hesibandin Ezîz Paol e, yanî pêxember Sampol e. Çi dibêje; zilam ne ji jinê tê, zilam bi jinê tê, yanî zilam ne parçek jinê ye. zilam bi jinê tê, jin amûreke ji bo hatina zilam. Ne kirde ye, ne tiştekî ser bixwe ye. Ji bo vê jî beramberî zilam jinê pir kêm dihesibîne û pir gotinên wî di derbarê vê mijarê de hene.

Di Misilmantiyê de jî bi vî rengî ye. Van mînakan çima em didin? Da ku em bighêjin vê xalê. Niha di vir de têkoşînek li ser desthilatdariyê heye, berî ku kole, cotkar û proleter bikevin bin destan, jin ketiye bin destan. Ev bindestî ji bo mayende bimîne serdestiy zilam ji bo mayende bimîne, sedem jê re peyda kirine. Ew sedem bi çi peyda kirine, bi gotina, jin ne özne ye, ji bo zilam hatiye çêkirin, ji zilam hatiye çêkirin, yanî sedemê xerabiyê ye. Weke çawa hemû xerabiyên di cîhanê de çêbûne bi jinê hatine rave kirin û heta roja me ya îro jî pir xerabî bi jinê tên rave kirin.

Ev ravekirinê he ji bo ku ti carî jin serî hilnede. Mafê xwe nexwaze, weke hêzekî serbixwe xwe nede nîşandan. Timî tepeserkirin li ser hebe. Ev bi hinek destwerdanên fîzîkî li ser jinê hatine kirin. Mînak heta roja me ya îro jî gelek oygilama tên kirin ji bo ku ji hemû taybetmendiyên xwe yên xwezayî dûr bikeve. Tenê tabia be, miluk be, mal be. Di gelek welat de, mixabin di nav de Kurdistan jî destwerdanên fîzîkî li ser jinê çêdibin. Mînak di aliyê sunet hwd, van hemûyan tepeserkirin li ser jinê çêkir.

Ji bo ku desthilatdariya zilam zelal bimîne, mînak desthilatiya zilam di malbatê de dest pê dike. Malbat divê ku ya wî be, ji bo vê di vê ku di mijarên zarokê xwe de zela be, zarok ên wî bin, miluk ên wî bin ji bo vê divê ku jin dernekve derve, mehkumê wî be. Ji ber ku heger jin serbest bibe gengaz e tabiabûna zarokan ya jê re wê bikeve nîqaşê. Ji bo vê divê di wî alî de motleq be, zelal b e. Da ku vê bike divê ku ev milkiyetparêzî, tepeserkirin, her demê bi hêz bike û ev jî bi çi dibe? Bi hêza îdeolojîk çêdike, bi Quran, Teorat, Încîl û bi mîtolojiyê bi cih dike. Heta roja me ya îro jî bi vî rengî dide meşandin da ku kes nikarbe rastiyê bibîne.

Ev rêkê tepeserkirinê ne. Di rastiyê de ev zêde ziyanê nade, ango tepeserkirin li ser gelan çêdibin, kuştin çêdibin, li ser însanan çêdibin, îşkence çêdibin. Ev tiştên he hemû xwezayî ne. Beramberî wan berxwedan jî heye. Pirsgirêka jinê çi ye? Pirsigirêka jinê ku taybetmendiyên berxwedanê wenda kiriye. Pir lewaz bûye, tenê di aliyê desthilatiyê de, ji aliyê siyasî, ekonomî de nehat talan kirin, di aliyê îdeolojîk de hate talan kirin. Ji bo vê îdeolojiya jinê û nasnama wê tine bû, ev qebûl kir.

Mînak Rêbertî pirî caran mînak dide û dibêje; Eyşa gotiye, xwezî ez kevrek bûma ne jin bûma. Nefreta wê li hemberî xwe ye, nefreta jinê li beramberî xwe ye. Ev qebûl kirina hukmê civakî ye. wê demê cinsiyetparêziya civakî tenê zilam temsîl nake, jinê jî temsîl dike. Di çi de temsîl dike, di înkarkirina xwe de temsîl dike. Gelek mînakên vê hene, dibêjin; Eyşa gotiy xwezka ez kevir bama ne jin bam. Jinek dema di civaka me îro de, di hemû civakên

cîhanê de, di Ewrûpa, Çînê, Efrîqa de ev hemû hene. Mînak jinek ducanî be bîst û çar seatan dua dike da ku zarokê wê kur be. Ev xwe bi xwe înkarkirine. Xerabiya mezin di esas de ev e.

Niha ev tiştên ha di Rojhilata Navîn de çêbûn, ji bo vê Rêbertî dibêje; pêdiviya Rojhilata Navîn ku şoreşek din çêbibe. Şoreşa yekemîn şoreşa jinê bû. neolotîk şoreşa jinê ye. Divê şoreşa jinê ya duyemîn çêbibe. Ji ber çi li Rojhilata Navîn rastî hemû rengên desthilatdariyê li ser bindestiya jinê hatine danîn. Desthilatdariya zilam hinekê jî ev li Rojhilata Navîn. Bi sedemin îdeolojîk jî ev rewa kirine, encama ku bi hezarê salan hatiye dubarekirin, mixabin di aliyê jinê bi xwe de jî hatiye qebûl kirin. Xwe lewaz, biçûk, bê îrade dîtin, ji xwe acizbûyîn, zilam esas girtin. Di derketina herî azad de jî zilam teqlîd kirin û bi wî rengî nîşandan, ev hemû îşaretên biyanî bûyîna îdeolojîk in. Yanî jin di aliyê îdeolojîk de ji xwe biyanî ye, ev jî pirsgirêkek kûr e.

### Li Rojhilata Navîn Çareseriya Pirsgirêkên Jinê

Niha di Rojhilata Navîn de çi çêbibe? Di Rojhilata Navîn de pirsgirêka jinê heger neyê çareser kirin, wê ti pirsgirêkên din neyên çareser kirin. Ji ber ku li Rojhilata Navîn di kesayeta jinê de nîvê civakê felc e, nîvê civaka din jî felc e. Ji ber ku sîstemeke, heger aliyekî sîstemê kole be, aliyê din nikare azad be. Ji ber ku ev du aliyê sîstemê ne.

Ji bo vê sîstemek tê de koletiya jinê hebe, tu nikarî behsa azadiya zilam bikî. Divê ev bê fêm kirin. Niha em wiha jî bihizirin, nîvê civakê felc e, tine ye nayê hesibandin. Dibêjin; jin ji hestiyê zilam çêbûye, lê rastî ne ev e, jin ji hestiyê zilam çênebûye. Tam berovajiyê vê zilam ji jinê çêbûye. Yanî eger rastiyek weke biyolojîk jî mirov bigire dest ew rastî ye. Divê îfada vê ya îdeolojîk, sosyolojîk, huner, di her derê de xwe îfade bike. Şoreşa jinê wiha çêdibe, yanî careke din bibe ya xwe, bibe cewher û karibe di qadên jiyanê yên cuda cuda de bi taybetî jî îdeolojîk, siyasî, huner yê ku mêbûyînê îfade dike. Ango ne teqlîd kirina zilam, yê ku mêbûyînê îfade dike. Divê ku di wir de ev hevsengî careke din bê sererast kirin. Lê rewşa heyî çi ye?

Rewşa heyî nîvê civakê felc e, lê nîvê civakê yê mayî jî ji aliyê wî nîvê felc ve tê terbiye kirin. Em bala xwe bidinê di roja me ya îro de kî civaka me xwedî dike, jin xwedî dike. Lê ew jin felc e, bê îrade ye, ji bo vê li Rojhilata Navîn di aliyê mayendekirin û çêkirin, berhemdayîna serdestiyê, jin rolekî serekî dileyîze, dayîkên me keçên xwe çawa xwedî dikin, bi şîretan xwedî dikin. Ha tevbigere, ha rabe rabe, ha  rûne, ha ser nerm be, ha stûxwar be, bi vî rengî tabîa dike.

Kurê xwe çawa xwedî dikin, ji bo desthilatiyê xwedî dikin. Mînak, di civaka me de kurek li malê aliyê dayîka xwe karekî bike, dayîka wî jê nerehet dibe, dibêjiyê; tu serjinkî. Ji ber çi ji kurê xwe nerehet dibe, ji ber ku jin sîstemê dubare dike. Kur li ser esasê desthilatiyê xwedî dike, jinê jî li ser esasê stûxwariyê xwedî dike.

Ji bo vê ev pirsgirêk neyê çareser kirin, civakekî bi tendurûstî azad nayê holê, dernakeve. Ji bo vê mijarek cidî ye. Gelek hevalên me çima di rojvê de ye, çima tê nîqaş kirin, hinek nîqaş hene mirov jê nereht e, nîqaşên paşketî ne, vala ne, pir zêde cinsiyetparêz in, sereserene, bi cewherê meselê re têkildar nabin, ev rêka rastiyê nîşanî mirov nadin, lê nîqaşê ku divê bê kirin ew e. Em ê çawa vê bêhevsengiyê tesbît bikin. Dema ku em behsa azadiyê dikin bi vî rengî divê em behsa azadiyê nekin. Ji lewre zilam dunya dît, fêm kir, xwe zane kir, mirohezî li gel pêş ket, ji bo vê ji destê jinê digire û wê bilind dike, jê û şûnda azad dike. Ev rê nade pêşketinê. Pirsigirêk bi vî rengî çareser nabe. Di wir de xeta tine ye, di bindestiyê de xeta tune ye, di bindestiyê de planek desthilatdariyê yê bi zanebûn heye, zordarî heye, ji bo ev zordarî mayende bibe û rewa bibe, di aliyê îdeolojîk de hatiye rave kirin û sedem jê re hatine peyda kirin. Nifş (nesl) li ser hatine xwedî kirin.

Ji bo vê bi nêzîkbûnek wiha yek alî wer çareser nabe. Ji bo çareseriyê divê ku jin weke jin karibe xwe îfade bike. Weke teqlîda zilam na, di hemû meydanê jiyanê de îdeolojiya jinê ya azadiyê hebe, siyaseta wê hebe, yanî çawa karibe bi rengekî demokratîk xwe bi rê ve bibe. Hunerê wê hebe, strana jinê hebe, wêneyê wê hebe, tabloyê wê hebe, di huner de xwe îfade bike û di ekonomiyê de. Lê di esas de di îdeolojiyê de.

Êdî jin li Rojhilata Navîn ji jinbûna xwe fedî neke. Êdî mêbûyîn weke taybetmendî çewt yan jî xerab, yan jî kêm neyê dîtin. Tam berovajiyê vê cuda bê dîtin heta di aliyê erênî de cuda bê dîtin. Wî demê êdî karibe hevsengiyekî rast bê dayîn. Ji bo vê ev mesele li Rojhilata Navîn meselak pir girêk lê ketine.

## Li Rojhilata Navîn Şoreşa Jinê Û Pêşketina Wê

Niha rêka xelasiyê di vê xalê de wê çawa be? Mixabin taybetmendiyên kevneşop di civaka me de bi rastî jî pir xerab li jinê tê meyzandin. Jinê hebis dike, digir, vedişêre, ji nêzîkbûnek cewherî zêdetir, nêzîkbûnên îzafî derdikevin pêş. Çi ne ev nêzîkbûnên îzafî, em wiha hinekî li Rojavayê xwe temaşe dikin em dibînin di Ewrûpa de jin wiha nîne, ne girtiye, ne veşartiy, di wê asta ku li vir tê kirin ne mulk e. Em ji xwe re dibêjin wê demê ew rêka rast e, em tavilê wê nêzîkabûna Rojava ji bo xwe esas digirin.

Em dixwazin proja azadiyê bi şopandina formîl û şêwazê yê ku di nava du neynûkan de azadiya li Ewrûpa peyda bûye, em dixwazin di şopandina wê de vê projê pêk bînin. Em lê temaşe dikin pêk nayê! Tam berovajiyê wê xerabtir dibe, hîna zêdetir jin dibe meta, hîna zêdetir dibe mal, hîna zêdetir bê qîmet dibe, proja azadiyê çênabe.

Mînakekê em bidin, li Lubnan teqlîd kirina Ewrûpa heye, li Tirkiyê heye, li hinek cihên din jî heye. Lê di rastê de azadî tune ye. Ji bo vê tevgera azadiyê bi her du milê xwe jin û mêr jî, di pêkanîn proja azadiyê de bi îsrar divê li ser ku ev pirsgirêk çawa di li gorî prensîbên modernîta kapîtalîst yan jî di zemînê wê de

çawa hatiye çareserkirin, divê em pir li ser bisekinin. Rexne bikin, lêkolînê bikin û em fêm bikin ka ev azadî ye, yan jî ne azadî ye.

Niha kapîtalîzm desthilatdariye, kapîtalîzm koledariyeke modern e, heman ew sîstema desthilatdariya hezarê salan li Rojhilata Navîn avabû, ew sîstem îro ya kapîtalîzmê ye. Reng, dirûv, zemîn, nizanim çi yê xwe guhertiye. Lê desthilatdariye, ev desthilatdarî çi ye, desthilatdarî navê wê li ser e, yekemîn desthilatdarî ya zilam li ser jinê ye, jê û şûnda ya çînan li ser çînan e.

Wê demê desthilatdarî weke qerekter bindestiya jinê qebûl dike. Kapîtalîzm ji wê ne cewaz e. Lê kapîtalîzmê ev dît, ger bi şêwazê berê bi girtinê, îşkencê, lêdanê, zilmê, êdî nema dikare jinê kontrol bike. Kapîtalîzmê ev dît, ji ber ku pêşveçûna civakî rê da ku jin hîna zêdetir bi hunerê xwe bihese, bi zanebûna xwe bihese, bi hêza xwe bihese û karibe şêwazê têkoşînê peyda bike da ku bighêje mafê xwe.

Kapîtalîzmê ev baş fêm kir, ji bo vê kapîtalîzmê çi kir? Xefk li pêşiya têkoşîna azadiya jinê danî. Têkoşîna jinê qenalîzeyî rêkên din kir, jin wek hêzekî civakî ji bo xwe îfade bike, bibe ya xwe û weke hêmanekê (ûnsûrekî) mêr xwe di hemû qadên jiyanê de îfade bike na, lê ji bo ku paya wê di desthilatiyê de çêbibe rê jê re vekir.

Bi giranî çi li xwe bike, yanî cil û berg, mikyac, çûna dibistanê, kar, bûna perlementer, bûna hikumet hwd, ev tiştên ha kir. Lê pişt re eşker bû, di heman demê de tevgerên jinê li Rojava jî tesbîtên wê hene, heta hinek jinên bi nav û deng di cîhanê de jî ev tesbîtên he kirine, pir balkêş e! Bîranînê Banazîr Bot hene, dibêje; "Min her tişt qezenc kir, ez bûm her tişt, lê di pişt re min fêm kir ku ez nebûm jin. Ango ez êdî ji jintiyê derketim." Di wir de weke çawa azadî xuya dibe, lê di pişt re tê fêm kirin ku di rastiyê de ne azadiye. Dev jê berdana jinbûyînê ye û tevlîbûna sîstema zilam e.

Dibe ku niha di hinek perlementan de li Ewrûpa hêjmara jinan ji zilaman zêdetir be, lê ew nayê wê wateyê ku jin azad e. Ji ber ku sîstem desthilatdar e. Qerekterê desthilatdariyê, qerekterê zilam ê destpêkê ye. Ji bo vê teqlîdkirina wê weke rêbaza azadiyê, bi me pir tiştan dide wenda kirin, li Kurdistanê, Tirkiyê, nava Eraban de dide wenda kirin û ev ne rêka azadiyê ye. Rêkên azadiyê hîna zêdetir cewherî ne. Divê ku mirov berî her tiştî talan îdeolojîk di paş de vegerîne. Yanî jin êdî tabia zilam e, pîvana wê ya serkeftinê ku bibe weke zilam na, da ku jin bibe weke xwe. Divê ew esas bê girtin û ev jî xebatek îdeolojîk e.

Li ser esasê zelalbûna îdeolojîk vê carê jin karibe ekonomî, siyaset û bi taybetî hunerê xwe, mînak di roja me ya îro de hunerê jinê tine ye. Hunerê ku mêbûyînê weke tiştekî temam îfade bike, weke kêm na, weke sûc na, li Rojhilata Navîn ew pêwîst e.

Encax bi vî rengî şoreşa jinê karibe çêbibe. Ji bo vê şoreşa jinê bi teqlîd kirina rêbaza ku tê de jin di nava du neynûkan de li Ewrûpa azad dibe, bi şopandina wê rêbazê em nagihîjin rêka rast û em ê serkeftinê çênekin.

Di vê derbarê de rastiya sîstmê girîng e bê fêm kirin. Girîng e em bigihîjin vê baweriyê, azadiya hey, em azadiya nisbî lêpirsîn bikin. Yan jî rûyê din ê madeliyonê koletî ye, divê em pê baweriyê bînin. Bi vî rengî encax baweriya bi azadiyê pêşbikeve.

Têkoşînekî civakî ye, di vê derbarê de bi tevgerên femînîst re em nabin yek, her çiqasî femînîzm di tekoşîna civakî de xwedî rol be, bi taybetî li dijî pergalê hêzekî rexnê pêşxistibe jî, lê belê di derbarê çareseriyê de em nabin yek. Sedemê wê ev e; femînîzm mijara azadiyê di zemînê cins de digire dest, zêdetir cinsiyetparêz e, cins esas digire dest. Di bin navê parastina jinê de qada xwe îfadekirinê ya civakî li pêşiya jinê digire. Jinê di çarçoveyekî de hebs dike. Qadên jiyana civakî yên din li pêşiya jinê digire, lê belê nêzîkbûnên me weke tevger em zêdetir civakbûnê esas digirin.

Yanî di sererastkirina civakê li ser esasê wekheviya di navbera jin û mêr de, jin wek kirde girêdayî (tabia) xwe, bi xwe karibe xwe îfade bike, weke me di cara derBeasbûyî de jî gotibû; îdeolojîk, ekonomîk, siyasî, çandî û hunerî xwe îfade bike, ev mafê îfadekirinê bi peymanên civakî bên ewlekirin, yan jî bên parastin.

## Li Rojhilata Navîn Malbata Yekalî Û Dewleta Biçûk

Jixwe malbat li Rojhilata Navîn dewleta biçûk e. Ji bo vê dewlet xwe bi malbatê dide îdare kirin, dide meşandin. Dewleta seretayî malbat e. Malbata yekaliye. Dema me behsa dewletê kir me got; dewlet encamê hevparbûyîna şebeka berjewendiyan e, dewlet di rastiyê de şirket e. Şirketa tevlîbûna otorîtaye, desthilatiya ye. Desthilatiya seretayî malbat e, malbata li ser esasê mafê bav e, mafê zilam e hatiye çêkirin, Ango malbata yekalî.

Niha malbata yekalî çi ye? Malbata yekalî, malbata tê de desthlatî di destê mêr, bav de ye. Malbata weke milik tê dîtin. Di serî de jin dor lê tê girtin, bi temamî tabia mêr e, mulik e. Li ser vî esasî mafê wê yê tevgerê tune ye. Îrada wê tune ye, nifşê (neslê) mêr çêdike, ango dihêle ku zarên wî çêbibin û li gorî wî namûsa wî diparêze hwd, her tiştê wî diparêz e.

Ji bo vê li Rojhilata Navîn dibêje du rengên kuştina jinê hene; yek jin xwe dikuje ji bo şerefa mêr biparêz e, mêr jinê dikuje dîsa ji bo şerefa xwe biparêz e. Mînak niha em dibîhîzin jin xwe dikujin, çima xwe dikujin? Di gelek cihan de xwe dikujin, dibe ku hinek krîzên civakî jî hebin, lê gelek caran ji ber ku carekî li derve li xortekî nehêrî ye, bi hev re keniyane, malbat pê hesiya ye û jin xwe dikuje.

Ji bo çi xwe dikuje, ji bo xwe na, nav bê ser wê, xerabî bê ser wê, ji bo wê xwe nakuje, ji bo bira û bavê xwe, da ku şerefa wan biparêze xwe dikuje. Ji bo zilam xwe dikuje.

Zilam jî jinê dikuje, keça wî şaştiyekê bike, li gorî wî şaştî, jina wî şaştiyekê bike, dikuje. Ji bo çi, ji bo alem bêjin ev zilam binamûs e. Lê mînak em bala xwe bidinê hinek tiştên berovajî hene, mînak dibêjin; filan jin fahîşeye, lê ji bo çi fahîşeye? Ji ber ku bi zilaman re têkiliyê dike. Lê ew zilamê bi wê jinê re têkiliyê dike çima gotinek li ser nayê gotin? Ji bo vê cinsiyetparêziya civakî li Rojhilata Navîn pir kûr e.

Li cem me jî em niha lê temaşe bikin, em li derve rûniştî bin, hevalek zilam bikene û dengê kenê wî bilind bibe, dibe ku kêm bala me bikşîne, lê ger hevalek jin wiha bikene, dengê kenê wê bilind bibe, em eşker nebêjin jî, lê di dilê xwe de em ê bêjin; ma ev çi fedî nake.

Em li mal yan jî li koçê rûniştî bin, em binerin keçek û xortke bi hev dimeşin, em dibêjin ma xwediyê vê keça he tune ye, lê kes nabêje ev xortê he xwediyê wî tune ye. Ev cinsiyetparêziya civakî ye. Cinsiyetparêziya civakî çi ye; heqekî xwezayî ye zilam qezenc kiriye, ji bo vê liv û tevgera wî rewa tê dîtin, lê heman liv û tevger bi cezayê mirinê tê jinê re tê birîn.

Ev li Rojhilata Navîn heye, niha li Ewrûpa kêm bûye. Ev ji mentiqê malbatê tê. Ji bo vê malbata li Rojhilata Navîn divê ku demokratîk be. Yanî divê ji taybetmendiyên desthilatiyê û milkiyetê derkeve.

Mînak niha têkiliyên me, em şoreşgerin hinek hevalên me bîst-sî sal li çiya ne. Em dibêjin em ji malbatê û civakê dûr ketine, em bûne şoreşger. Lê têkiliyên me yên malbatê ne demokratin, di gelek kadroyan de ev gelek diyarker e. Miliyekiyetger e, dibêje ez yê filan malbatê me. Ji bo vê tiştê ku bi serê malbatê tê şoreşgertiya wî/ê bandor dike. Gelek hevalên me hebûn bi taybetî di wê serdema 2003-2004'an de min bi çavên xwe dît; dayîkek dihat û bi ser kurê xwe de yan jî keça xwe de çend rondik dibarandin, şoreşgertî moreşgertî nedima û diçûn.

Niha ev têkiliya milkiyetgeriyê ne, xwe tabia dibîne nabêje ez însanekî azad im, kirde (özne) me, min lêgerînek daye pêşberî xwe û rêyeke min heye. Ez êdî ji bo wê rêkê dijîm, ji bo malbatê najîm. Nikare bi vê bifikire, niha jî mînak xebatên me yên li Bakur tu lê temaşe dikî ku dev ji karê xwe berdaye û çûye. Çima wiha dike, dibêje dayîka min nexweş bû, pirsgirêkên wan ê ekonomîk hebû, ez çûm min bi wan re alîkarî kir.

Ev milikiyetgeriye, nabêje rast e malbateke em hatin ser rûyê dinyê, lê ez yê çaxekîdîtirim, lêgerînên min cuda ne, divê ku ez wiha bifikrim, bijîn û wiha bixebitim hwd! Ez ne mehkumim ku ez kopya wê mabatê bim, ji ber ku malbat desthilatîdar e, milkiyetger e, dixwaze te bikişîne xeleka xwe, te weke xwe bike. Keçê weke xwe xwedî bike, kur weke xwe xwedî bike. Razandine (yatirime) zarok ji bo malbatê di rastiyê de razandine.

Mînak bav zarokan çêdike yek-du-sê, deh hwd, ji bo çi? Ji bo ji aliyê ekonomî ve karibin pê re alîkar bin, wî biparêzin hwd, yanî razandine, ev malbat ne demokratîk e. Di vê malbatê de milkiyet heye. Tê de zarok kur, keç çarenûsa xwe bi xwe teayîn nakin. Li gorî daxwaziyên xwe tevnagerin, bi ferman tên meşandin. Bi tiştê jê re hatî diyarkirin dimeşe.

Jin di malbatê de milk e, yanî ne xwedî îrade ye. Ji lewr ev malbat malbata yekaliye. Ji bo ev malbat bê parastin hemû hikumê li ser jinê, zarok û ciwanan hatine kirin. Bi xerabî heta roja me ya îro hatine kirin. Da ku ev malbat xwe biparêze, malbat di vê herêmê de dendika desthilatiyê ye. Ji bo vê demokratîk kirina malbatê pêwîst e. Demokratîk kirina malbatê çi ye, divê malbat bibe pir alî. Yanî di vir de wiha tiştên tên ferz kirin ne nêzîkbûnên birjiwa, mînak nêzîkbûna birjiwaziyê di vî aliyê de xeternakin. Bi taybetî ev kesima navîn û nêzîkbûna wan ji malbatê re, ji jin û têkiliya jin û mêr de, weke azadî tên xwiya kirin, lê di esas de ne azadî ye. Mînak dibêje hezkirina azad, malbata azad, di wir de xerabûna exlaqî di hundirê civakê de diparêze. Herî zêde xizmeta birjiwaziyê dikin. Herî zêde jin bin navê hezikirina azad, jin dibe weke metayekê. Ev hê sed sal berê jî Lenîn li hemberî vê têkoşîn dikir.

Weke şêwazê civaka bindest, civaka jêrîn qebûl nedikir, red kir. Di roja me ya îro de jî em jî hinek tiştan red dikin û ji me re bê wate jî tên. Çi ne ev tiştên em wan red dikin û wan bê mane dibînin? Ev nêzîkbûnên milikiyetger, desthilatiya zilam, nêzîkbûnên wer ser esasê hevpeymanên paşverû, ji azadiyê dûr, bi hikumê rêûresman yên di tekiliyên jin û mêr de datînin, têkiliyên zarok û malbatê datînin, em dixwazin ji van xelas bibin.

Lê ev weke çawa hinek îdia dikin, weke serbestkirineke cinsî na, ew serbestkirina cinsî ne daxwaziya civaka jêrîn e, ne daxwaziyê karkeran e. Ne daxwaziyê cotkara ne, ne daxwaziyê jinê ye jî, ji wê zêdetir malbata demokratîk, malbata demokratîk ne yekaliye. Tê de jin, mêr û îrada zarokan heye. Milkiyet tê de tune ye. Wê demê demokratîk kirina malbatê, malbat ji serweriya mêr xelas kirin, ji desthilatdariyê û milkiyetê xelas kirin, ew demokratîk kirina mabaltê ye. Ev serdema têkiliyan di vê herêmê de wê karibin pêşbikevin! Bêguman bi demokratîkbûna civakê ve girêdaye, bi zelalbûnê ve girêdaye. Bi kûrbûyîna felsefa azadiyê ve girêdayî dikarin pêş bikevin. Ji bo vê rexnekirina malbatê û nirxandina wê, demokratîk kirina wê pêwîst e. Ev demdirêj hatine guftûguh kirin, ji lewre li ser wê jî gelek caran tê rawestandin.

## LI ROJHILATA NAVÎN MILLIYETGERÎ, DÎN, MEZHEB, QEBÎLE Û EŞÎR E

### Li Rojhilata Navîn Bandora Dîn, Mezheb Û Terîqetan

Pêdiviya Rojhilata Navîn gelekî bi nirxandinê heye. Li Rojhilata Navîn însan bê dîn nikare bijî, dîrok tên guhertin, zeman tên guhertin, lê bê dîn û jiyana ruhî nikarin bijîn. Wê demê ev taybetmendiyên însan in, ji bo vê tesbîtên Rêbertiyê di parêznamên dawiyê de jî vê dibêje; "însan metafîzîk dijî."

Metafîzîk çi ye; milê însan yê ruhî her demê heye. Ev ferq û cudatiya di navbera însan û ne însan nîşan dide. Bi metafîzîkê dijî, cîhanek însan ya ruhî heye, utupiya însanan heye. Însan tenê hebûnek biyolojîk nîne, ruhiye, li ser esasê wê cîhana ruhî exlaq, şêwazê jiyanê, danûstandinê û karkirinê datîne.

Ji lewre bê dîn însan nikare bijî. Li ser vî esasî teoriyên ku xwestin xwe bikin şûna dîn, li Rojhilata Navîn bi ser neketin. Nasyonalîzmê û sosyalîzmê jî xwestin weke alterternatîf beramberî dîn, beramberî wê jiyana ruhî xwe bi cih bikin, li Rojhilata Navîn bi ser neketin.

Wê demê bi red kirine, bi înkar kirinê ev rastî ji holê ranabe. Ji ber ku dîn ne 1400' sal berê çêbûye, ne 2000 sal berê jî çêbûye, ji roja roj de heye. Nav guhertine, sîstematîka xwe guhertiye, formîlasyona xwe guhertiye, hinek prensîbên xwe guhertine, bi vî rengî pêş ketiye, lê her hebûye.

Animîzm jî dîn bûye, xwezaya zindî, di kevir, dar, hinek pîroz kirine, ew jî dîn bûye, her tişt zindî dîtiye. Totemîzm jî dîn bûye, ji bo xwe totem çêkirine. Bi rengekî sembolîk weke hêza xwe ya ruhî jê girtine, pot jê çêkirine. Jê û şûnda dînê pir Xwedayî û yê Yekxwedayî heta roja îro hatiye.

Wê demê li şûna ruh, metafîzkê ji bo însan nayê guhertin. Însan bê wê nikare bijî, ji bo vê heweldanên mîkanîk dema tu li şûna dîn tiştekî din bidî çandin bi zorê, yan jî bi heweldanên cuda cuda tu bixwazî pêk bînî, li welatên dûrî me û tecrûbên partiyên nasyonalîst û partiyên komunîst li herêma Rojhilata Navîn îflas kirin. Di enyê de êrîş kirin, înkar kirin, red kirin, wê îfalsk kir.

Li Rojhilata Navîn dîn weke tiştekî, pêdiviyek ji rêzê, seresera nîne. Dîn nasname ye, nasnama însan e. Hestên wî/ê, hez kirin û aciziya wê/î, pîvanê wî/ê yên exlaqî ne, hema hema li ser dîn şekil digire. Ji bo vê bê wê nikare bijî.

Li ser vî esasî divê em dîn weke pirsgirêkekî cidî bigirin dest. Di krîza Rojhilata Navîn de rolekî sereke dileyîz e. Ji ber çi, ji ber dîn heta niha bi rengekî rast nehatiye raform kirin. Li gorî pêdiviya civakê şekil nestandiye, li gorî pêdiviyê civaka îro şekil nestandiye. Ti carî ji desthilatdariyê dûr neketiye, ji bo vê jî timî bûye sersebebê krîzan.

Di krîza Rojhilata Navîn de bûye xwedî bandor. Desthilatdarî bi dîn xwe îfade dike. Ji bo vê jî moxalefetê yên civakê tesfiye dike, hewildana raform kirina dîn jî bi ser neketiye. Ji ber ku desthilatdariyê dîn ewqasî pîroz kir, motleq kir, bi taybetî Quran u hedîs, wesfê Xweda, wesfê Pêxember û Pêxemberê dawiyê ye, Xwedayê herî mezin e, her tiştî digir,

dibihîze, dizane, ev bûn sersebebê nîqaşkirina wê nêzîkbûna ji nîqaşê re weke guneh hate hesibandin û desthilatdariyê ji holê rakir.

Ji ber çi, ji ber desthilatdarî bi pîrozkirina dîn, pîroz kirina xwe kir rojevê de. Dî roja me ya îro de jî ev rewş berdewam e. Împeratorî hemûyan bi dîn tepsandin li ser gel çêkirin. Împeratoriya Osmaniya ya herî zêde dînê Îslamê daxebitandin. Bi taybetî jî Sunitî esas girt û weke nasnamek îdeolojîk ji bo xwe esas girt û bi vî rengî karîbû desteka gelê Misilman di herêmê de bigire û li dijî Ewrûpa şer bike, li dijî Xiristiyanan şer bike û bibe împeratoriyek mezin.

Ji bo vê desthilatdariya siyasî ji reforman re na, ji demokratîk kirinê re na, her demê ji dogmatîzma dînî re xizmet kir. Di dogmatîzma dînî de karîbûne sedemên hebûna xwe peyda bikin. Mijarek her demê ji bo xebitandinê destdaye. Ji bo vê weke çawa tune ye em nêzîk bibin pirsigirêkek cidî ye. Yanî însanek şoreşger êdî nema dikare wiha bifkire. Em zêde ji nedîtî ve nêzîkbûn, bênirx me nîşan da, em pê re eleqeder nebûn. Lê em bala xwe bidinê heger em wiha berdewam bikin, niha li bakurê Kurdistanê, li derên dîtir bi milyonan bin durûşmeya bijî Rêber Apo derdikevin kolanan, lê ev demboriye. Ji ber ku mirov lê temaş dike hewildanekî ku vê tevgerê qenalîzeyî nasnameyekî din, cihekî din bike heye, ew jî dîn e, pir bibandor e. Beramberî wê tu dîn înkar bikî, tu nikarî beramberî wê şer bikî. Ji nedîtî ve tu nêzîk bibî tu nikarî şer bikî. Ji bo vê di meselê demokratîk kirin, reform kirina Îslamê de divê em bi îsrar bin, hêz bidinê, em bi xwe nikarin bikin, lê divê em hêz bidin vê bizava reformkirin û demokratîk kirina wê.

Ji ber ku erovajiyê wê Îslama siyasî heye, Îslama siyasî çi ye? Îslama siyasî li ser diyanetê hinek nirxan bardike, diçîne û bi vî rengî dibe desthilatî. Yanî Îslamekî li gorî xwe pîvanê wê datîne û bi wî rengî dibe desthilatdar. Rêka desthilatiyê ji bo xwe berdewam dike, weke amûrekê desthilatiyê ji bo xwe pê peyda dike.

Em dîn weke amûra desthilatiyê ji bo xwe esas nagirin dest. Em dîn hêza exlaqî di civakê de dixwazin bigirin. Ji bo vê divê di reforman re derbas bibe û divê demokratîk bibe. Yanî bi desthilatdariyê re nebe yek. Di civakê de hêza exlaqî peyda bike. Liv û tevgera mirovan di çarçoveya exlaqê însanî de karibe kontrol bike. bi qanûnê na, bi hêza exlaqî. Dîn divê vê msyonê bigire ser xwe. Li ser vî esasî em bixebtin û vê bizavê xurt bikin û pêş bixînin.

Li Rojhilata Navîn ti carî dîn ji desthilatdariyê qut nebûye. Heta niha jî hinek dewlet bi dîn hikum dikin û hinek jî bi eşkerehî xwe weke laîq xwe nîşan didin, lê di esas de dîsa bi rengekî dîndarî bi awayekî dogmatîk hikum dikin.

Lê belê emperyalîzm bi taybet di dema dawiyê de dîn pir ji bo xwe bikar anî. Desthilatdariyê dîn gelekî ji bo xwe bikaranî.

Terîqet û mezheb çêkirin, li ser van mezheban pir bi kinahî be jî, em ê yek bi yek li ser rawestin.

**Derketina Mezhebê Şîa?**

Şîa kî ne? Şîa ango partiys HZ.Elî û kesên terefdarên Elî. Lê ev tenê nêzîkbûnekî dînî ye, nêzîkbûnekî siyasiye. Rast e aligirên Elî hebûn, lê şîîatî ji aligirbûna Elî bêtir miliyetgeriya Fars û ya hinek kesên din, şîîtî ji bo xwe esas girtin û di nava sîstema Erebî de da nehelin. Ji bo xwe weke nasnamek netewî girtin. Ji bo vê niha mînak li gel Farsan şîîtî hakim e.

Armancên wê yê siyasî ne, bêgoman çavkaniyên wê yên exlaqî jî hene. Hinek kesan piştî ku Husên hatiye kuştin pûşman bûne ka çima di dema wê de destek nedanê, li hemberî vê bêmafiyê derneketin û wijdan ezabî dikişînin. Ji bo vê carna li xwe didin û hwd...

Lê Fars ji bo ku teybemendiyên xwe weke netew weke gelekî ji Ereban bide nîşan dan, ji aliyê dînî de jî ji xwe re mezheb dane nîşandan. Di rêka wî mezhebî de taybetmendiyên xwe yên netewî dane jiyîn.

Ji lewre di nava şîîa de yên curbicur hene. Şîîayên duzde îmamî hene, weke çawa li Îranê. Ev çi ne, di rastiyê de ew kevneşopiyekî kevn di dîndariyê de didin şopandin. Li benda xelasiyê ne, kî yê wan xelas bike, Mihdî wê wan xelas bike. Mihdî kî ye? Mihdî Îmamê 12.yê di sala navbera 870'î de wenda bûyî ye. Navê wî Muhemed Mihdî ye, li gorî tê gotin, wê carekî din sax bibe. Lê ew dibêjin wenda bûye, kes nizane bi ku de çûye, wê çarekî din vegere û Şîîa xelas bike.

Ji ber wê her kesên wer hinekî bi nav û deng derdikevin, tavilê Şîîa dibêjin; "gelo ev ne Mihdî be?" Ji lewre dema Xumeyînî jî ji Fransa vegeriya û ji balefirê daket hinekan tavilê di navbera xwe de heman gotin; "Dibe ku Mihdî ev e!"

Dîndarekî demokrat yê Îranî hebû navê wî Ayetlah Telqanî bû, Telqanî di ber xwe de dibêje; "Heger Mihdî be bi balefirê nayê, wê bi tiştekî din bê." Her demê wer li vegera Mihdî digerin ka wê kengê bê û wan xelas bike. Hinek hene heft Îmaman esas digirin, yên ji ziriyeta Elî. Îsmaîlî bi xwe jî ji van e, heft Îmaman esas digirin.

Ew terîqetekin, mezhebekin, lê ne yê desthilatdariyê ye, her demê derveyî desthilatiyê ye. Batiniye, ango veşartî ye, xwe bi xwe bi rêxistin dike. Heta hinek milên wê yên pergala konfederal hene. Dada wê heye, dadgeha Îsmaîlî heye. Şêwazê wê yê ekonomiyê heye, însanên xwe xwedî dikin û ji wan re dikanan vedikin, wan dide xwendinê, bi vî rengî weke komekî cîhanî ye, li Sûriyê heye, Îran, Ewrûpa, Pakistan, bi vî rengî xwe didin meşandin.

Hinek hene cuda ne, rast e Şîîa ne, lê ne weke Şîîayên Îranê ne. Mînak niha hinek li Yemenê hene navê wan Zeydî ne, yên ku di vê dema me de car bi car li dijî dewletê şer dikin. Ew jî

Şîîa ne, lê ne Şîîayên weke yên Îranê ne. Ew xelîfan jî qebûl dikin û dibêjin; Abo Bekir jî baş e, Osman jî baş e, Omer jî baş e, ev hemû jî xelîfe ne, lê di esas de ji Elî hez dikin.

Lê Şîîayên Îranî ji Abo Bekir acizin, ji Osman nefret dikin û ji xwe Omer naxwazin navê wî jî bînin ziman. Bi vî rengî di rastiyê de teybetmendiyên xwe yên netewî û civakî di rêka van dînan de diparêzin.

Elewî ji Şîîatiyê bi temamî cuda ne. Taybetmendiyên wan ên dînî jî cuda ne, bi vî rengî têkoşîna xwe beramberî zilmê bi Elî rave dikin. Bi qebûl kirina Elî, hezkirina ji Elî re, bi vî rengî wek dînê çîna bindest ên ku timî kedxwarî li ser wan tê meşandin, bi vî rengî didan meşandin.

Niha di roja me ya îro de ev mezihebên he hema bêje ji aliyê desthilatdariya siyasî ve tê bikar anîn. Her çiqasî çavkaniyên wan ên însanî bin jî, lê ji aliyê desthilatdariya siyasî ve tên bikar anîn.

### Di Roja Me Ya Îro De Liv Û Tevgera Wehabiyan

Em ê li ser hinek xetayên di roja me ya îro de rawestin, yek ji wan tevgeran ya ku em li ser rawestin tevgera Wihabiya ye. Wehabî di dawiya sedsala 18'an de yanî 17800'iyî û şûnda, li girava Erebî li herêma ku di roja me ya îro de jê re Siûdiyê Eerbistan tê gotin, li wir derketiye. Li ser neslê kesekî bi navê Muhemed Ebdulwehab pêş ketiye.

Ev tevger li gorî xwe tevgerekî antî Rojavayî ne. Tevgerek Selefî ne, şîrovan, reforman, terîqetan, şêxan, seyîdan, van tiştan hemûyan qebûl nakin. Lê dîn qebûl dikin, Quran û hedîsê qebûl dikin. Sunî ne, ji lewre her tiştê derveyî Suniyan li gel wan weke kafirin. Ji Şîîan gelekî acizin. Ji terîqetên din acizin, nefretê ji wan dikin û qebûl nakin, di heman demê de li dijî Rojava ne.

Vê tevgerê çi gotin, gotin; Osmanî lewaz in, pirsigrêkan dijîn, ji ber ku ji rêka dîn derketine. Ewrûpa pêş dikeve, felsefe, zanistî, hilberîn, teknîk pêş dikeve û wê êrîşî me bikin, hem ji bo sererastkirina tiştên ku dema Osmaniyan de xerab çêdibin, hem jî ji bo berxwedana beramberî Rojava weke tevgerekî derketin pêş. Bi navê tevgera Wehabî, di roja me ya îro de jî di kesayetên weke Usama Biladin de berdewam dikin. Rayedarê Siûdiyê jî hemû Wehabî ne.

Ev selafî ne, ango vedigerin serkaniyê, Quranê û Pêxember esas digirin. Weke din tiştekî din qebûl nakin. Fanetîkin, asê ne, dijwarin, tekfîrî ne, ango yên ji derveyî Misilmanan kafir dibînin, ji lewre jî şidetê esas digirin.

Lê belê em bala xwe bidinê her demê ji aliyê emperyalîzmê ve hatine xebitandin. Ji aliyê kapîtalîzmê ve hatine bikar anîn. Îngilîzan çawa ji vê tevgerê sûd wergirtin? Ev tevger dilxwede li dijî Ewrûpa ye, lê Îngilîzan dît ku Osmaniyan rexne dikin, ê Îngilîz jî ji ber ku li dijî Osmaniyane, ji bo vê Îngilîzan ev tevgera Wehabî li dijî Osmaniyan da xebitandin û berxwedana

destpêkê ya Ereban li dijî Osmaniyan li Siûdiyê destpêkir. Tevgera Wehabî rolek esasî tê de lîst û bi alîkariya Îngilîzan ev rola xwe lîstin.

Di roja me ya îro de jî tevgera Wehabî di bin venêrîna CIA de, di rengê Teleban û Bin Ladin de li Efxanistanê li dijî Sovyetê şer kirin. Ev tevgerek dînî ye, ya girîng em vê fêm bikin, ev tevger çiqasî dikare însanan li dora xwe kom bike. Ango jixweber bû ku CIA hate Suadiyê Erebistanê û gotin; ka ji bo me yekî peyda bikin ku berxwedana li dijî Svyetê li Efxanistanê bi rêxistin bikin. Ev bi zanebûn bû, ji ber ku tenê bi tiştekî dikarîn li dijî Svyetê derkevin. Ew jî li ser esasê parastina Îslamê ye. Ji lewr CIA hatin Suadiya Erebistiyanê, piştî Svyetê di sala 1978'an de Efxanistan dagirkir, Emerîka çû Suadiyê Eerbistanê, CIA çû Suadiyê û ji malbata qiraliyetê re gotin; em dixwazin yek ji we ji bo berxwedana li dijî Svyetê bi navê Misilmanê cîhanê pêşbixîne, em dixwazin yek ji we bê û wê berxwedanê li derdora xwe birêxistin bike.

Ji malbata qiral kes derneketin ku biçin Efxanistanê, lê malbatek weke ya qiral weke wan dewlemend û xizmên mala qiralin, bi eslê xwe Yemenî ne, lê li Suadiyê Erebistanê dijîn. Lê pir û pir dewlemendin, hemû bînayên li welatê Kendavê di bin navê şerketên wan de tên kirin, jixwe Wehabî ne. Ev Osama Biladin ji wê malbatê ye, wî got ez amade me û ji lewre bi vî rengî derbasî Efxanistanê kirin. Ereb, Misilman û ji derên cîhanê yên cuda cuda li wir kom kirin û weke tevgereke Îslamî li dijî dagirkirina Svyetê bikar anîn. Di dilxweda ji bo rizgarkirina erdê Misilmanan dan meşandin.

Emperyalîzm bi vî rengî jê feyde dîbîne. Ya girîng di vir de li ser terîqetan Neqşîne, Qadirîne mirov dikare hîna berfireh li ser raweste, lê ya girîng di vir de em vê bigirin dest, niha li Rojhilata Navîn mezheb, dîn terîqet xalên bên îhmal kirin nînin. Wer tiştên negirîng nînin.

Em bala xwe bidinê Beas ne partiyekî dînî bû, dema li Îraqê bû desthilatdarî ne dînî bû. Lê piştî sî salî Sedam Husên li ser ala Îraqê nivîsî Elah Ekber, encax karî bû veger dîn da ku beramberî derve li ber xwe bidî. Lê berê tevgerekî nijadî mili, heta li gorî xwe sosyalîst û laîq bû. Lê carek din vegeriya dîn, gelek hêzên din jî bi heman rengî ne. Ji ber çi; ji ber ku hêzek wiha ye mirov nikare ji nedîtî ve nêzîk bibe.

Niha çi dibe bila bibe em li Îraqê temaş e bikin, heta sibê bila Emerîka projan çêbike û razemeniyan çêbike, însanan bikire, peran birjîne, bi çekên xwe û artêşa xwe derbas bibe, jêheye ku dîzayîn kir, tam dema ku bawer dike ku dîzayîn kiriye, fetwayk ji Sîstanî derdikeve, Sîstanî mercia dînî yê Şîîaye li Îraqê, nifûsa Îraqê ji serê sedî şêst şîîa ne, Sîstanî jî rêberê wan yê ruhanî ye, fetwak Sîstanî hemû planê Emerîka serûbinî hev dike. Ev hêza mezheb e. Ji bo vê wer ji nedîtî ve mirov nikar nêzîk bibe.

Yê ku Şahê Îranê hilweşandî jî desthilatiya wî ji hev xist jî dîsa ev bû. Hewiza dînî bû, Hewza dînî çi ye? Hewza dînî di şîîa de yanî mercia dînî, ew zilamê dîndar Aeytilahê ku li cihekî kom

dibin û fetwa derdixînin. Ji bo vê ev xalana li Rojhilata Navîn ne tiştên wiha mirov karibe reht wiha enternatîfê wan peyda bike, yan jî ji nedîtî ve nêzîk bibe û hesaban ji wan re neke, bi vî rengî mirov karibe tevgera civakî bimeşîne, ew zor e. Ji bo vê demokratîk kirina mezheban, naskirina mezheban, demokratîk kirina dîn, reform kirina dîn, ev yek ji pirsgirêkên bingehînin, ka em karibin çawa Îslamî siyasî na, lê ya çandî pêşbixin. Hêza wê ya desthilatiyê na, lê ya exlaqî pêşbixin û wê qebûl bikin, wê bikin hêz da ku em karibin ji wê krîza hey xelas bibin. Ev krîza ku dîn û mezheb di krîza Rojhilata Navîn de rol dileyîze.

## Di Krîza Rojhilata Navîn De Rola Miliyetgeriyê

Yek ji pirsgirêkên ku di krîza Rojhilata Navîn de rol dileyîze û bi bandor e, mesela miliyetgeriyê ye. Miliyetgerî wek nêzîkbûn û têgihêştin ne berhemekî Rojhilata Navîn e. Xerîbe û biyanî ye, ev nayê vê wateyê ku qewm, milet û netew li Rojhilata Navîn tine ne. Lê belê miliyetgerî tiştekî cuda ye, miliyetgeriya ku li ser esasê miliyetgeriya dewleta netew, yan jî dewleta miliyetger (ulus dewlet) ev ji îfadekirina komekî însanan bi rêûresm, çand, ziman û ji erdnîgariya wan zêdetir, ji wê zêdetir îfadekirina titşekî din dikin. Ew îfade çi dikin; îfeda helandina bi zorê, di hindurê netewekî de. Yanî îfadekirina serdestkirin, bilind kirina gelekî, netewekî li ser netewekî re dike. Li ser vî esasî jî helandin, alîmîlasiyon, çi bi rengekî fikirî be, lê bi giranî jî bi rengê zorê tê meşandin.

Ev fikir ne fikirekî Rojhilata Navîn e, dema ku em vê dibêjin nayê wê wateyê ku li Rojhilata Navîn netew, milet, tinebûne, ev hemû jî hebûne. Xwedî taybetmendiyê wiha ne, zimanê wan hebûye, lîteretora wan hebûye, çanda wan hebûye, erdnîgariya ku li ser diman hebûye. Ev hemû hebûn, lê her demê formîlên siyasî yan jî rêxistinên siyasî, li Rojhilata Navîn vekirî bûne. Jî nêrînê re vekirî bûne. Ev vekirîbûn tê çi wateyê? Tê wateya ku bê neçariya asîmîlasiyonê, bi neçariya neqebûl kirin, yan jî neqebûl kirina ziman, dîrok, rêûresima kesên din derfetên jiyana hevbeş her demê hebûye.

Her çiqasî car bi car zorî û zehmetî dihatin dîtin jî, lê her demê hebûne. Ji bo vê heta berî bandora modernîta kapîtalîst li ser Rojhilata Navîn çêbibe, ango beriya sedsaliya nozda û bîstan bi taybetî, heta wê çaxê bi taybetî li Rojhilata Navîn mozayîkekî pir dewlemend hebûye, pir renglî û kêm caran bi rengekî dijwar wer astengî li pêşiya îfadê hebûye.

Xiristiyan hebûne, Misilman hebûne, mezhebên cuda cuda hebûne. Dînên cuda hebûn, Xiristiyan, Yahûdî, Misilman, heta dînên kevn, mînak Bihaî, Zerdeştî, Sabia yî, hwd, gelek dînên din jî. Mezheb hebûne, netew hebûne, lê belê bi taybetî weke ev qirkirin, şikandin, bi her rengî tune kirin, asîmîlasyona di vê sedsalên derbasbûyî de çêbûye, di dîroka Rojhilata Navîn de çênebûye.

Ti carî di dîroka Rojhilata Navîn de wek ku îro nijadperestiya dînî heye, di dîroka wê ya berê de tune bûye.

Weke ku îro komên dînî di xeteriya mirinê re rû bi rû ne, beriya vê nebûne. Mînak rewşa Xiristiyanan li Îraqê, Misrê rewşa dînên din, yên weke Bihaî, Zerdeştî, Sadia yî, ti carî weke ku di wê sedsalê de îmah kirin û asîmîlasyona bi zorê ango helandina qeserî ya bi zorê, di dîroka vê erdnîgariyê de çênebûye, weke çawa di vê sedsalê de çêbûye.

Ev bandora modernîta kapîtalîst û bi taybetî jî Rêbertî dibêje "lingê sêlê yê ku modernîta kapîtalîst li ser piyan dihêle, kapîtalîzm îndustrûlîzm û delwet netew" ev berhemên dewlet netew û netewperestiyê yan jî miliyetparêziya ku Rojava çêkiriye.

**Miliyetgerî Armanca Desthilatdariyê Ye**

Niha miliyetgerî hedefekî desthilatiyê ye, yan jî daxwaziyekî desthilatdariyê ye. Bi birjiwaziyê re pêş ket, bi birjiwaziyê re çawa pêş ket? Birjiwaziyê ji bo ku karibe hîna zêdetir karê xwe bide maşandin û li ser sermayê serwer bibe, tiştê ku çêdike li her derê belav bibe, pêdiviya wê bi bazarê heye. Pêdiviya wê bi erdnîgariya yekbûyî heye. Ji bo vê ala netewê rakir. Ji bo vê bi netewparestiyê bang kir.

Ji ber ku di welatekî de heger çalakiyên jiyanê yên cur bi cur hebin, çandên jiyanê yên cur bi cur hebin, di wî welatî de kapîtalîzm nikare serwer bibe. Kapîtalîzm sîstemek navendiye. Yek welat, yek derî, yek gomrik, yek çand, yek ziman, heta yek rêûresim, yanî tîpekî hemojen ji hemwelatiyan çêdike ku karibe wan hemwelatiyana hem ji wê desthilatiyê re vekirî bin, hem jî ji xerc kirina berhemên sermayê re vekirîbe. Zewq yek be, model yek, şêwazê jiyanê yek be, ziman yek be, al yek be û van tiştan pîroz dike. Weke çawa tiştên miliyonên salan e, lê di rastiyê de ne yê milyonê sala ne. Di van sêsed-çarsed salên ku desthilatiya kapîtalîzmê de pêş ketine.

**Di Sîstema Kapîtalîst De Teoriya Netewan**

Di sîstema kapîtalîst de teoriya netewê bi temamî bi berjewendiyê desthilatdaran ve girêdaye. Ev bi hinek mînakên wiha kin, û bi lez em dixwezin bînin ziman ka bandora wê li ser Rojhilata Navîn çi bû?

Dema ku em teoriya netew ya Almanan digirin dest, em çi tê de dibînin, em dibînin ku hêmanê ziman pir didin pêş. Dema em teoriya netew ya Fransa digirin dest, em lê temaşe dikin ku hêmanê îradê derdikeve pêş. Dema em ya Îngilîzan digirin dest, em lê temaş dikin hîna zêdetir wiha rewşekî ku hinekî zêdetir vekiriye, lîberal, di çarçoveya berjewendiyên împeratoriya ku karibe li ser gelek netewan serwer be, esas digire.

Alman, ziman esas digirin, lê çima ziman esas digirin? Niha em lê temaşe bikin li gorî rastiya mesela ku em bigirin dest, Alman weke netew, weke milet di Ewrûpa de pêwîst bû ku netewên herî zêde nêzîkî komunalîzmê bin, herî zêde nêzîkî demokrasiyê jî bin. Ji kevn ve li dijî împeratoriya Roma têkoşîn kiriye, şer kiriye, heta bûye sedemek ji sedemên serekî yê

hilweşandina împeratoriyê. Yanî berxwedanekî eşîrt û qebîlan e. Ji bo vê her demê rêbazê desthilatiyê yê wiha xwecihî (yerel) esas girtin.

Almaniya heta salên 1870'î jî wek dewletek netewek yekbûyî nebû. Bi Bismark re bû dewletek netew ya yekbûyî, berî wê dewlet bûn, bi sedan dewlet bûn. Di pişt re bûn dehan dewlet. Dema ku Bismark yektiya Almaniya xist rojeva xwe, wê çaxê Almaniya sî û heşt dewlet bûn. Lê belê desthilatdar pêdiviya wan bi dewletekî Almanî bihêz, tenê ne dewletekî Almanî bihêz, pêdiviya wan bi împeratoriyekî Almanî hebû.

Ji bo vê divê pêşî dewletekî Almanî xurt çêkiribana. Ji bo dewleteke wiha bihêz hebûya çi esas girtin? Ji bo dewletekî wiha çêbibe ziman esas girtin. Gelek kes hene bi ziman Alman in, lê ne dewleta Almana de ne. Ji lewre ziman derxistin pêş. Ji bo ku karibin wan dewletên Almanî hemûyan di hundirê dewletekî de yekbikin, ji bo karibin Usturiya bikin parçek Almaniya, ji ber ku ew jî bi zimanê Almanî xeber didin. Parçek Sîwîsre, parçek Fransa, mînak hinek cihên Fransa hene Alman in, du herêm hene, Alsas û Loren, ev bi zimanê xwe Alman in. Lê derveyî Almaniya dijîn.

Di wir de jî em temaşe dikin berjewendiyên desthilatiyê çawa bandorê li ser teşegertina teoriya netewî dike. Fransa ziman esas negirt. Bêguman ziman weke hêmanekî serekî ji bo netewa xwe esas girt, lê bi giranî bal kişand li ser îradê. Ji ber ku gelek kesên bi netewa xwe ne Fransizin, bi zimanê xwe ne Fransizin, lê dixwazin bi ala Fransî bijîn û bi taybetî jî qismekî ji wan herêmên Almanî yên li Fransa ne.

Dîsa dewletek din bi rengekî din, ango teoriya netew teoriyekî wer xwezayî li ser esasê daxwaziyê gelan, pêşnektiye. Bi temamî li ser esasê berjewendiyên birjiwaziyê pêşketiye. Ji ber ku dewleta wiha bi yek ziman, yek tîp, yek al, yek deriyê bacê bigirin da ku karibin li ser serwer bin û karibin kontrolê li ser hemû welat çêbikin. Ev dewleta netew civakê ji civakbûyînê derdixe. Dewletê esas digire, dewlet bi civakê têkiliyên ferdî çêdike. Her kesek bi vî rengî bi dewletê ve girêdaye. Ferd bi hevdu ve girêdayî nînin, berpirsiyartiya wan beramberî hevdu ve nîne. Bi vî rengî desthilatdarî xwe mayende dike. Jixwe ev bi beşên kapîtalîzmê ve berfireh li ser tê rawestandin.

### Li Rojhilata Navîn Li Şûna Umetê Netewgerî Pêşxistin

Lê ev ji bo Rojhilata Navîn tê çi manê? Rojhilata Navîn di derbarê vê teoriyê de zêde agahdar nebû, elaqeder jî nebû, çima? Umetgerî hebû, Îslamiyet hebû, dînê dîtir hebûn, di nava xwe de gelek qewm û netew dicivand. Lê belê hilweşandina împeratoriya Osmanî û gav bi gav însanên ku diçûn li Fransa xwendin, li Elmaniya xwendin, li welatên din xwendin û carekî din zîvirîn ev fikirê netewî weke fikirekî pêşketî, weke rêka xelasiyê bi xwe re zivirand û li ser vî esasî pirtûk û xebatên teorîk û piratîk pêşxistin.

Rêxistin avakirin, kes pêşxistin, li ser vî esasî sedsala bîstan bi taybetî di pêvajoya berî şerê cîhanê duyemîn û piştî şerê cîhanê yê duyemîn, fikira netewî pêş ket. Fikira netewî ya Tirkiyê, Erebî, Faresî û fikira netewî her çiqasî ciliz be jî, qismî ya Kurdî, mecalê xwe rêxistinê zêde nedît û gelek fikirên bi vî rengî pêş ketin.

Lewre li Ewrûpa mînak niha em dibêjin ji bo Fransa dema em xeber didin em dibêjin cumhuriyeta pêncan. Wê demê ji 1789'an de dema ku cumhuriyet hatiye îlan kirin û piştî wê pirsigirêkên ku hatine jiyîn, heta roja me ya îro Fransa pênc serdemên cumhuriyetê jiyane. Ev formalîta nînin. Wê demê her cumhuriyetek li gorî xwe guhertinek çêkiriye ku bûye serdemek cumhuriyeta duyemîn, sêyemîn, çaremîn  û heta ya pêncêmîn.

Gav bi gav ew qalibên dogmantîk tek tîp, homojen ê dewlet netew di nava reforman re derBeaskirine. Mînak heger rojekî ji rojan Fransa rengên cuda derveyî Fransî qedexe bûne, lê îro serbestin. Îro herêmên taybet (ozerk)hene, malên taybet (ozerk) hene, di Fransa de tên qebûl kirin, wê demê dewlet netew û cumhuriyetê bi vî rengî xwe di nava reforman re derbas dike û gelek welatên din li Ewrûpa yên ku bi rengê navendî û yek alî, yek reng, tek tîp destpêkirin, îro em lê temaşe dikin ku neçar mane rengê hey qebûl bikin.

Weke çawa Belcîka û Felemena, weke çawa Elmaniya û gelek qewmên din yên di nava xwe de qebûl dikin. Îngeltera û pirsgirêka netewa Erlendî, yê Galdî, Wîls, Usktlenda, Skoçiya, weke mesela Spaniya Bask, van gelek guhertin di nava xwe de çêkirin. Dîtine weke çawa destpêkirine nema dikarin dewam bikin. Ji bo vê hinek rastî qebûl kirine, hemû qebûl kirine, teqez Na, hemû qebûl bûne, na. Lê reform derBeaskirine.

Pirsgirêka Rojhilata Navîn di wir de ye, weke çawa dîn digire dest, vê carê milet girt dest. Nîjadperestî, di bin navê şerê em li beramberî dagirkeriyê, siyonîzmê, her demê mesela netewperestî di nava Ereban, Tirkan, Farsan, pêş xist. Bi giranî van li Ewrûpa xwend in. Yên ku ev anîn. Mînak, Mustefa Kemal, bi temamî kopyakirina tevgera netewî ya Ewrûpa ye. Bi hemû milên wê ve, bi taybetî mijara dewlet netewê. Nîter, navendî, tek tîp, ji cilan bigire, ziman, cil û bergan, tîpan û her tiştî... Herwiha tevgera Nasirî ya ku bi Cemal Abdul Nasir re dereketî ev jî bin bandora Ewrûpa de bû.

Kesên ku ev tevgeran avakirin, hemûyan li Fransa xwendine, li Elmaniya xwendine. Tez çêkirine, di derbarê mesela netewî de, li ser vî esasî nirxên netewî, qebûl kirine, beramberî dîngeriyê, sosayalîzmê û beramberî hemû bizavên din jî. Ev hêza dilxweda ronakbîr "ronakbîr" xwendevan û ya ku pala xwe dide çîna navîn, di serdema piştî sala 1945'an û bi şûnda, piştî şerê cîhanê yê duyemîn bi giştî li gelek cihan bûn desthilatdar.

Ev desthilatî, ango desthilatiya vî fikirê nasyonalîst, li Tirkiyê û heta astekî li Îranê,  dibe ku li Îranê tam weke ku li

Tirkiyê serdest bûye, li Îranê tam serbest nebû, di nava Ereban de bi giştî, hemû dewletên Ereban ev serwer bû.

### Li Rojhilata Navîn Rewşa Dewletan

Niha ev pirsgirêka dewleta netewî cidî ye. Ji ber çi cidî ye? Niha Rojhilata Navîn bi awayekî xwezayî homojenbûyînek tê de tine ye, yanî em Sûriyê bigirin dest, li Bakurê Sûriyê Kurd e. Ji derveyî wê hinek miletên din jî Asûr Ermenî tê de hene. Derekî wê yê din Dorzî ne, Erebin, Erebên Sunî, ên Elewî, Tirikmen, Suryan, ev hemû hene. Lê Sûriyê niha navê wê ev e; Komara Erebî Sûrî. Bi çi tê bi rêvebirin, bi partiya Beas tê birêvebirin. Partiya Beasçi ye?

Partiya Beasli ser esasê yek milet hatiye avakirin. Ev têgihîştin bi rewşa xwezayî re berovajiye. Ji bo vê asîmîlasyonê esas digire. Kurdan asîmle dike, kesên dîtir asîmle dike, da ku karibe van daxwaziyên xwe pêk bîne.

Îraq, di îraqê de Bakurê wê Kurd e, Başûrê wê şîîa ne, Asûr, Tirikmen, miletên din, Fars tê de hene, heta di dîrokê de di zamanê xwe de heta salên 1970'yî de jî hîna nêzîkî sî hezar Sabiaî mabûn. Bi dizî dînê wan cuda ye, zimanê wan cuda ye. Zimanê wan yê Aramî yê kevn e. Wan xwe diparastin, niha ji wan sî hezarî, şeş hezar nemane. Ev hemû hene, lê ev dewlet ji aliyê kê ve tê birêvebirin, ji aliyê partiya Beas ve tê birêvebirin. Partiya Beas bi çi tê nasîn, partiya tenê bi yek milet tê nasîn, Ereb in.

Di welatê Kendavê de, Siudî, Uman, Yemen, Kuwêt, Qater, Îmarat û Behrên, ev û gelek mezhebên din, gelek netewên lê dijîn. Hinek netew hene navê wan kes nabihîze.

Mînak Uman dema tê gotin em dibêjin welatê Ereban e. Lê di hundirê Umanê de bi taybetî jî li herêma Zefarê de Miletek bi zimanê xwe bi rêûresma xwe, bi her tiştê xwe cuda ne, miletê Şearî, lê nayên nasîn nayên qebûl kirin. Di encama derve hiştinê û diştelemekirinê, weke çawa Tirik beramberî Lazan dikin, êdî gav bi gav bûne Ereb. Encax însanên wan yên mezin dikarin bi zimanê xwe xeber bidin.

Kesên bi nijada xwe Hindî li welatê Kendavê hene. Fars hene, dibe ku hinek miletên din jî yên ku hîna me jî pê nehisiyabin hebin, lê ji derve de tenê Ereb tên diyar kirin.

Di welatê Bakurê Efrîqiya de Lîbiya, Cezair, Mexrib, Fas, Tuns, di cih cihan de dibe ku hêjmarek rast û dirûst çêbibe, dibe ku hêjmarê herî hindik Ereb bin. Ji ber ku ew welatana jî bi rengê dîrokî jî welatên Berberan bûne. Berber weke miletekî bi zimanê xwe yê Amazixî ku di salên derng de, di dema Emewiyan de tevlî Îslamê bûne û bûne Misilman. Bi vî rengî çanda Erebî nas kirine, Ereb derbasî wan welatan bûne. Lê em di roja me ya îro de lê temaşe dikin ew gelên xwecih, di cih bi cihana de dibînin ku qedexeye bi zimanê xwe, xwe perwerde bikin. Nahêlin bi zimanê Amazgixî perwerdê bibînin. Ev tişt car bi car dibe sersebebê tevlîheviyan.

Me Sudan weke dewletek Erebî nas dikir, lê qismê mezin Başûrê Sudan hemû miletek dîtire, ew jî Efrîqîne, di gelek cihên din de jî mînak Garfor Eşîrên Efrîqî yên Zencî yên ne Ereb li wir dijîn. Erîtîriya, Sumal û gelek welatên din jî wiha ne.

Ji lewre dewleta netew ya ku weke kopya kirina fikirê Ewrûpa, fikirê netewî Ewrûpa bi taybetmendiyên destpot, dogmatîk, weke qalib li Rojhilata Navîn hate danîn, vê ziyanekî gelekî mezin da. Vê hişt ku rê li ber komkujî, nijadkujiyan vebe, rê li hemberî tunekirina rengan vekir. Tek tîp homojen netew xwest çêbike, bi alan, sondan, merşan, bi van tiştan derxistin pêş.

**Girîngiya Teoriyan**

Divê derbarê de girînge mirov li ser teoriyê rawest e. Teorî dema ku bi rengekî xuliqkarî, ragihandin jê re çênebe, ziyanekê mezin dide. Dîmîne weke metnekî ku tu li gorî wê civakê eyar bikî, mînak niha gelek caran behsa Kampoçiya tê kirin, Kompoçiya welatekî Hind Çînî li kêleka Veytnamê ye. Kempoçiya heta sala 1975'an ew jî bindest bû. Weke çawa Veyetnamê ew jî bindest bû. Dema ku Veytnam rizgar bû, ew jî rizgar bû. Lê dema rizgar bû, partiyekî tê de hikum kir. Navê wê partiyê, Partiya "Xmîr Roj" bû. Ango Xemîrê Sor, Xemîr navê gelê wir e. Serokê vê partiyê kî bû, Polpto bû, wî li Fransa xwendibû, tezên wî yên dixtorînê, tezê wî yê bi dawî kirina zankoyê li ser komonîzmê bû. Li gorî wî komonîzm, li gorî civakan pêknayê (oyarleme) nabe, civak xwe li gorî komonîzmê eyar dikin.

Komonîzm çi ye; herwiha her kes weke hev e, memur tê de tine ne, pere tê de tine ne, xwendevan tê de tune ye, her kes di zeviyan de dixebite, her kes bi vî rengî nêzîk dibe. Civak divê derbasî vê pergalê bibe. Bi rastî jî wî pêkanînên xwe kirin. Bankayên navendî xerab kirin, gelek tiştên din xerab kirin, memur hemû derbasî zeviyan kirin hwd. Komonîzm li ser civakê ferz kir, ne ku li gorî civakê şîrove kir. Ev bû sersebebê bi rangekî mekanîk, qalib û bû sersebebê komkujiyên mezin.

Reqemên resmî dibêjin milyonek di sê salên hikumê Polpot de, reqemên ne fermî dibêjin; sê milyon însanên Kompoçî hatin kuştin heta ku neçar ma ku Vetnam destwerdan kir û Pol-Pot ji desthilatdariyê avêtin. Di van salên dawiyê de ez bawerim mir.

Miliyetgeriya di Rojhilata Navîn de jî Polpotîzm e, weke Polpot kirin. Rastiya civakê qet di ber çavan re derBeasnakin. Ji nedîtî ve nêzîk dibin û tenê jiberkirinên xwe ferz dikin. Mînak Tirk çi dibêjin, dibêjin; Li ser vê erdnîgariyê însanê ku bijî jê re dibêjin Tirk. Tu dibêjî temaşe bike! Ez ne Tirk im, mînak dîrok û zimanê min cuda ye, lê ew dibêje; di fermiyeta îdeolojiya me de wiha hatiye nivîsandin. Tê li gorî nivîsandinê biçî, li gorî rastiyê na. Ji bo vê jî divê tine be.

Di Sûriyê de dibêje Ereb, derveyî wan kes tine ye. Yek dibêje; Ewqas Kurd hene, dibêje ew Kurdên Ereb in, lê tiştê bi navê Kurdê Ereb tine ye, lê dubare dibêje ew Kurdên Ereb in. Ne

tenê Tirk dibêjin Tirkên çiyayî, mînak di dema serhildana Qamişlo de ew serhildana di sala 2004'an de, wezîrê înformasyonê Sûriyê daxwiyanî da: Got, rast e, li wir hinek pirsgirêk çêbûne, hemwelatiyên me yên Kurdên Erebê Sûriyê, yanî çawa mirov ji nav hevdu derbixe û çawa mirov vê hevokê fêm bike. Ne gengaze, lê nikare derveyî vê jî bêje. Ji ber ku dema bêje, ne Kurd e, ewqasî jî nabe, bêje Kurd in, wê çaxê li gorî mentiqê wan li Sûriyê derveyî Ereban kes tune ye. Wê demê divê formîlekî peyda bikin, ev formîl jî çi ye? Kurdên Erebê Sûriyê. Li gorî wezîrê înformansiyonê.

Yan jî dibêjin di zemanê xwe de Tirkyê zilm li wan kiriye û hinek Kurdên ku reviyane hatine Sûriyê hene, jixwe miltecî ne, ne xelkê vî welatî ne.

Herwiha Îraq, Sudan, Misr bi vî rengî, ev krîzên mezin çêdike. Dijberiya di nava gelan de çêdike. Ji bo vê jî gelek reng, dîn, netew di xeteriyê de ne. Di nava xetetiya qirkirinê de ne. Siyasetên neteweperest ji bo tesfiye kirina vê miliyetgeriyê jî têrê nake, hînazêdetir gur dike, hîna zêdetir vê teoriyê mafdar derdixînin, hîna zêdetir bihanan pêşkêşî wê dikin.

### Panzehîra Miliyetgeriyê Netewa Demokratîk E

Ji lewre li dijî wê ji miliyetgeriyê zêdetir netewa demokratîk, divê ku prensîbên netewa demokratîk esas bên girtin, weke çareseriyê. Ev tenê ji gelê serdest nayê xwestin, ji gelên bindest jî tê xwestin. Ji ber ku şovenîzm, miliytgerî her demî serdest jê fayîdê dibînin. Ji bo vê em îro nikarin bêjin weke erternatîf, beramberî miliyteriya Tirik û Ereb divê ku em jî miliyetgeriya xwe pêş bixînin. Eger em miliyetgeriya xwe pêşbixînin wê demê em sedeman pêşkêş dikin. Em sedeman pêşkêşî miliyetgeriya hey û serdest dikin. Panzehîrê miliyetgeriyê, netewa demokratîk e. Netewa demokratîk tê de hezkirina netew, erdnîgariyê heye, qebûl kirin heye, weke nirx parastina wê ferz dike, tê de bengîniya azadiyê heye. Ev tiştên ha hemû tê de hene.

Lê tê de asîmîlasyona bi zorê tune ye, otoasîmîlasyonê qebûl nake, weke netew xwe li ser kesêdîtire nagire. Yanî nirxgeriyekî biyolojî, erdnîgarî, reng, ziman tê de tune ye. Ferq û cudatiya di navbera miliyetgeriyê û netewa demokratîk de ev e. Ji bo vê panzehîra miliyegeriyê, jixwe netewa demokratîk e. Ew pêwîst e esas bê girtin.

Di roja me ya îro de miliyegerî îflas dike û dewleta netew ya li ser esasê miliyetgeriyê hatiye avakirin îflas dike. Êdî nema dikare milet îqna bike, zanistî, rêxistin çêbûye. Eşkerbû ku hinek tişt nabin, mînak Kurd namirin, mînak hinek dîn nemirin, hinek rengên civakê nemirin, mînak li Sudan, li Bakurê Efrîqiya, li welatê Kendavê, em lê temaşe dikin bi rengekî çalak êdî gelek reng xwe bi rêxistin dikin û li ber xwe didin. Nemirin, proja netewî ya li ser esasê asîmîlasyonê li Rojhilata Navîn, wê demê nikarîbû bi ser bikeve.

Wê demê bi rengê weke lîberalîzmê yanî miliyetgeriyekî bi rengekî dîtir pêşxistin, ji wê zêdetir netewa demokratîk, yanî têkiliyê di navbera dînan, gelan, mezheban, di hundirê vê herêmê de li ser bingehê nû bên danîn, li ser esasê rêzgirtin û qebûl kirinê, bên danîn wê çaxê pirsgirêk çareser dibe. Ji bo vê îro ji her demê zêdetir ew dema ku mirov karibe netewa demokratîk weke proje biparêze û di heman demê de li cihên cuda cuda, ji Kurdistanê dest pê bike û li gelek welatan pêk bîne, ew zeman hatiye. Yanî siyaseta asîmîlasyona bi zorê, weke ku bi hilweşandina van rejîmana aloziyên ku ev rejîmana dijîn weke ku îflas bikin.

Lê wê miliyetgerî li ber xwe bide, miliyetgerî zûzûka naçe. Em bala xwe bidinê Ewrûpa jî ewqasî dilxwe de gotin, dewlet netew xelas bû, em jê xelas bûn, em ê bibin wekhev, yek cih erdnîgariya Ewrûpa de weke yek welatî, lê dema ku hinek ji bo makzagona hevpar di Ewrûpa de referendom çêkirin, di pirek welatan de nehate qebûl kirin. Ji bo vê encax karîbûne di asta weke qulubekî qayîşokî (esnek) vê xebarkariya xwe berdewam bikin.

Li Rojhilata Navîn jî jixwe xebatekî mezin jê re pêwîst e. Lê belê li Rojhilata Navîn ewqas reng hene, dewlet netew û asîmîlasyona bi zorê qebûl nake. Ji dewlet netewa ku tîpekî homojen hemwelatiyek yek tîp di xizmeta dewletê de, ji wê zêdetir formîlên ku devê wan vekirî (ucu açik) ji Rojhilata Navîn re pêwîst in. Ji ber ku li ser heman erdnîgariyê gelek netew û gelek reng bi hev re dijîn. Ji bo vê ew hîna zêdetir wê rasteqînî be.

**Pêşketina Rêxistinên Qebîle Û Eşîran**

Ji lewre hinek rêxistinên, beriya pêvajoya netewbûyînê, gelbûyînê, dewletbûyînê, hinek rêxistinên civakî pêş ketine. Tenê li ser esasê girêdanên xwînê na, hîna firehtir, erdnîgarî parve kirin. Li ser erdnîgariyekî mane, bi çandên hevpar mezin bûne. Bi giranî jî bi nirxên parastinê, bi pêdiviya bi parastinê pêşketine. Lewre ev weke eşîret û qebîletan mirov dikare bi nav bike.

Ev li herêma Rojhilata Navîn bihêz in. Ev nayê vê wateyê ku di Rojava de ev tine bûn. Li Yuewnan tine bûne, lê belê di wê asta ku di roja me ya îro de li Rojhilata Navîn de li ber xwe didin, di wê astê de nîne. Bi dewletbûyînên homojen, yanî dewletên mezin yên weke Ingilîz, Fransa, Îspaniya, Holenda, Ewstoriya, Italiya Elmaniya, ev dewletên ha yên navendî yên ku hema hema di hezar salên derBeasbûyî de çêbûne. Di dema qiraliyetê de û pişt re jî di dema birjiwaziyê de hebûne. Ev rêxistnên bi rengê qebîle û eşîran gav bi gav lezaw bûn.

Li Rojhilata Navîn tevî ku dewlet jî çêbûn, tevî ku di dewletan de fikirê nasyonalîst jî yên ku çawa di ser eşîran re be, di ser qebîlan re be, hatin ferz kirin, lê em lê temaş dikin ev rastî nehat wenda kirin. Yan jî ji holê ranebûye.

Di ku de mirov dikare vê tesbît bike, rastiya Îraqê li ber çav e. Mînak Iraq welatekî ji aliyê Îngilîzan ve hatiye dagirkirin, ji

împaratoriya Osmanî hate qut kirin. Heta demeke derng di bin destê Îngilîzan de bû, piştî wê cumhuriyet hate îlan kirin, li gorî xwe fikirê nijadî (milî) radîkal ê nû esas girt. Piştî wê ji sala 1963'an bi rengekî Fialî, bi rengekî resmî di sala 1968'an û şûnda bi hikumê partiya Beasdihate birêve birin. Fikirê milî û netewperestiya Ereban hate birêve birin.

Li di roja îro de Sedam ji bo ku hinekî zêde xwe li ser desthilatdariyê bihêle, di serdema xwe ya dawiyê de eşîretparêzî, qebîletparêzî, esas girt, xurt kir û xwe spartiyê. Emerîka jî îro ji bo ku di Îraqê de ji bo berjewendiyên xwe îstiqrarê, pêkbîne, desthilatdar be, rêbazê wê yê herî dawî pêşxist çi bû? Komên meclîsê oyaniş pêşxist. Kî ne ev komên ha, serok eşîr in. Hinek îmtiyaz, însiyatîf, nifûs û hinek jî pere dan wan, bi wan li dijî dijberên xwe şer kir.

Em dûr naçin, ev rewşa ku di rojeva me ya îro de ye, rewşa Lîbiya ya hey. Herî zêde di roja me ya îro de Lîbiya behsa qebîle û eşîretan tê kirin. Lê belê di sala 1969'an de dema ku koma bi navê "Subayên Azad" xwe bi nav dikirin, ên ku Qezafî serkêşî ji wan re dikir, gelek kes bûn û komek subayî bûn. Navê koma Subayên Azad li xwe kirin.

Dema ku wan derbe li dijî qiraliyetê pêşxistin, li dijî eşîretgeriyê bûn. Li dijî qebîletgeriyê bûn. Ev tiştên ha red dikirin û xwe weke însanên li gorî xwe nûjen (moderm), miliyetgerî, yektiya netewa erebî bi giştî weke armanc dabûn pêşberî xwe. Ji bo vê wer xwe bi meselên eşîret û qebîlê ve girêdayî nedihiştin.

Heta zêde têkildar jî nedibûn. Lê di roja me ya îro de em lê temaş dikin ka eşîret çawa hêza xwe nîşan dide û çawa gelek hesabên xwe li ser hevsengiya eşîretan û qebîletan di wî welatî de çêdikin.

Di Kurdistanê de jî ev rewş heye. Her çiqasî em behsa fikirê sosyalîst bikin, fikirê netewî giştî bikin, dema ku em bên fektorê eşîret û qebîletê di ber çavan re derBeasnekin, ji nedîtî ve nêzîk bibin, înkar, îhmal bikin, heta li gorî zanebûna xwe zêdegaviyê li ser bikin, em lê temaşe dikin berovajî bi me ve diteqe. Wê demê ew girêdan weke çawa em teswîr dikin, hîna lewaz nebûye. Ew girêdan, girêdanek wiha zûzûka lewaz bibe jî nîne. Xetayê ku ji van aliyan ve hatine kirin, encamê wan hîna jî em ji ber zoriyê dikişînin.

Mînak em behsa eşîra Jîrka dikin, em behsa Qaşora dikin, em behsa geke eşîran din jî dikin. Her derekê yên wiha hene. Nizanim, li Amedê, li herêma Amedê Badika, Xiya, Şegoya, li Dêrsimê filan eşîr lig elek cihan hwd, ev hemû hene. Lê mentiqê pozîtîvîzma ku li ser me jî serwer bû, ji lewre em şoreşgerin, sosyalîstin, lewre eşîret çi ye, qebîle çi ye, zemanê wê derBeasbûye, ji bo vê dema ku me xwest em hinek tiştan sererast bikin, hinek astengan li pêşberî xwe rabikin, me ev fektor di ber çavan re derBeasnekir. Ew weke berovajî bi me ve teqiya. Bi vî rengî ziyan da me, heta roja îro jî ev mesele berdewam dike. Wê

demê me girîngiya eşîrê û qebîletê di dîroka gelan de me fêm nekiriye.

Eşîret saziyek neçariye û xwe di dîrokê de ferz kiriye. Di dema xwe de, qebîle jî bi vî rengî ye. Dema em van gotinan dehesibînin ez hinekî li gorî lîteratora Erebî tînim ziman, dibe ku li gorî Tirikî eşîret ji qebîletê mestir e. Lê li gorî Erebî qebîle ji eşîretê mestir e. Gelek eşîret dibin yek qebîle.

Komên mirovan dema ku rû bi rû beramberî astengên jiyanê dimînin, pêdiviya bi rêxistinêbûnê dibînin. Yek ji wê rêxistinê jî eşîret û asta wê jorîn jî qebîleye. Asta herî jorîn jî konfederalîzma qebîlaye. Ev pêdiviyên parastinê ne, pêdiviyên jiyanê ne. Ev ferz kirine, wer jixweber nehatine kirin.

Ji bo vê tiştekî ku hebûna însanan elaqedar bike, eger îro qebîle û eşîret di van welatan de xwedî bandor e, sedem ji rola wê ya dîrokî ya ku lîstine. Bi taybetî di aliyê parastinê de, bi taybetî jî parastina beramberî hawildanên desthilatdariya dewleta navendî. Mînak dema ku Sumer, Akad, Babil, Asûr çêdibin û berê xwe didin derên cuda cuda da ku serwer bin, wê demê komên biçûk ji mirovan beramberî van êrîşan nikarin li ber xwe bidin, neçariyekî, yan jî rolekî dîrokî çalak li ser rêxistinên mezin, yên weke eşîre qebîle konfederasyonên qebîlan, herwiha ev derdikevin pêş. Wê demê rolek dîrokî lîstine.

Ew rola dîrokî dibe sersebebê ku heta roja îro xwedî bandor be. Wer zûzûka ji holê ranebe. Ji bo vê qebîle û eşîret Rêbertî jî dibêje “Mirov dikare wek çawa rêxstinên civaka sivîl ku rol dileyîzin, mirov dikare bigire dest.”Ji ber ku qebîle dewlet nîne. Qebîle û eşîret rêxistinên xwecihî ne. Xebatên xwe yên hundirîn, pirsgirêkên xwe yên hundirîn çareser dikin. Ji qanunan zêdetir, bi hêz exlaq esas e. Mekanîzma wê ya parastinê ji artêşekî ku bîst û çar seatan bi rengekî prefesyonal bi sîlahan bêtir, gelekî şerker in. Yanî mirovên şerker, yên parêzvan in. Ji bo vê ne dewlet in. Ger mirov van hîna zêdetir nirxên wan yên exlaqî esas bigire, li ser vî esasî mirov nêzîk bibe, qîmet bidiyê, pê re bide û bistîne, di çêkirina û lêkirina civaka exlaqî û polîtîk de xwedî rol in. Lê mixabin di roja me ya îro de bi rengekî paşverû tê hesibandin û meşandin.

Mînak, Tirkiyê ji bo damezirandina sîstema çetegeriyê, eşîret esas girt. Di roja me ya îro de emperyalîzm li Lîbiya da ku li dijî rejîmê kesan rabike ser piyan, eşîretê esas digire. Emerîka da ku hîna zêdetir li Îraqê îstiqrarê li gorî berjewendiyên xwe bide rûniştandin, eşîran esas digirin. Dewlet jî da ku karibin desthilatiya xwe li ser her derê bidin meşandin, em lê temaşe dikin ji girêdanên eşîretgeriyê sûd digirin, banî serok eşîran dikin û wan bi rêxistin dikin. Hinek îmtiyazan, derfetan didin wan rêka derfetan li pêşberî wan vedikin, bi vî rengî bi xwe ve girêdidin.

Bi vî rengî bi dewletê ve girêdidin, beramberî muhalefeta civakî dibin asteng. Niha ev tiştên xirabin, xerabin wê demê em ji holê rabikin, lê em nikarin ji holê rabikin. Ji holê ranabin, eşker bû ku ranabin. Zûzû ranabin, helbet rojekî ji rojan gelek tişt wê ji

holê rabin. Lê belê zûzû ranabin. Di roja me ya îro de heye. Rastiyeke, girêdaneke, ji lewre demokratîk kirina vê girêdanê pêwîst e. Weke rengê civaka sivîl, şêwazekî rêvebirina xwecihî, bi hêza exlaq xwe bi rê ve birin.

Li ser vî esasî bi hinek şêwazên perwerdeya demokratîk, eşîret û qebîle, ji bo proja avakirina civaka exlaqî û polîtîk mirov dikare binêrxîne. Lê divê nêzîkbûna jê re hîna bi şîyarî be, divê mirov şiyar be.

Lewre di vir de şovenizma xwecihê, fanatîzma xwecihê, ayîdî xwecihêbûnan em pêş bixin na, em ne ku ayîdiyeta eşîretan li ser hesabê netewan pêş bixînin. Ne ku ayîdiyeta eşîretê li ser esasê hesabê mirovahiyê em pêş bixin, na. Lê belê em bigihînin astekî ku bi hevdu re nebin raber zit, bibe yek ji giştî. Ango tekîl giştî, di nava giştî û gerdonî de be, mirov bi vî rengî bigire dest wê baş be.

**Li Tojhilata Navîn Ekonomî Ne Civakî Ye, Desthilatdariye**

Li Rojhilata Navîn ekonomî krîzek mezin e. Mînak erda zîraî, çem, av, ptrol, gaza xwezayî hwd, çavkanî zehf in. Bi taybetî jî yên xwezayî. Ger ev derfetên he bi rengekî baş bên nirxandin, wê bandorek wê yên erênî yê pir baş wê li ser asta jiyanê bike. Wê asta xweşiyê li gel însanan bilintir bibe. Lê belê berovajiyê wê mirov lê temaşe dike ku rewş berovajiyê vê ye û mirov lê temaşe dike ku rewşa gelemperî li Rojhilata Navîn pir xerab e.

Rast e dibe ku di welatê Kendavê de hinek dewlemendî heye, lê di wir de jî di nava hatinên civakî de, ango yên malê wê civakê û di nav belav kirinê de hendafek pir mezin heye. Seqetiyek heye, malbatên serwer, yên qiralan, mîran, mirovên wan, mirovên mirovên wan, hemû destên xwe datînin ser serwetên mezin, hatinên wî welatî bi gelemperî ji bo xwe par ve dikin. Qismekî biçûk didin gelan. Lê belê ji ber ku zêde hatin heye, zêde dewlemendî heye, ev dibe sersebebê ku mirov weke çawa feqîrtiyekî li Misrê, Îraqê, Sûriyê, Tirkê dibîne, mirov li wir nabîne. Lê dîsa jî hindaf di navberê de heye, nakokî di navbera tiştên ku tê û di aliyê reng û şêweyê belavkirinê de. Reng û şêweyê belavkirinê heta asta dawiyê li ser esasê zordariyê ye.

Di welatên din de rewş hîna xerabitir in, ev ji çi tê? Niha ev dewletên he rewabûna wan tine ye. Bi derban, bi alîkariya derve, bi vî rengî li ser desthilatiyê dagir kirine. Bi hêza leşkerî, îstixbaratê, desthilatdariya xwe didin meşandin. Ji bo vê dest datînin ser malê giştî. Ekonomiyek serbest, ekonomiyek li ser esasê pêdiviya mirovan di van welatan de tine ye. Dewlet pêdiviyên gel tesbît dike, wê li ku genim bê çandin, li ku wê pembû bê çandin, petrol wê çawa bê frotin, bihayê (fiet) wê çiqas be, ecreta karker, yê cotkarî, ev hemû ji aliyê dewletê ve tê danîn.

Li ser esasê pêdiviya mirovan bi hilberînê û ekonomiyê, ev tiştên wiha tine ne. Di van welatan de tine ye. Li Rojhilata Navîn desthilatdarî komek û şirketeke diza ye, tenê didize. Ti

alîkariya vê komê bi pêşxistina ekonomiyê tine ye. Niha dewleta kapîtal jî ji bo ku milkiyeta taybet mezin bibe, ji bo piyasa serbest û gelek tiştên din xizmeta kapîtalê dike. Sermayê zêde dike, karxanan çêdike. Pazarê peyda dike hwd. Teşwîq dike, însiyatîfên takekesî teşwîq dike, heta astekî bandora vê di aliyê erênî de li ser rewşa jiyanî ya gelan çêdibe.

Lê dewleta rojhlata navîn vê nake, vê asteng dike, hemû peyanên (teşebusên) takekesî di aliyê aboriyê de asteng dike. Tenê dewlet heye. Ji bo vê em bala xwe bidinê li Misrê serê %70, feqîr in. Bêtirî serê % 20'an di bin sînorê birçîbûnê de ne. Bi hezaran însan di mezeran de radizên. Mînak di Misrê de mezer çawa ne, xanî ne, di wir de radizên, her malbatek ji bo miriyên xwe xaniyekî çêkirine û di wir de vedişêrin. Bi hezaran mirov di wan mezeran de radizên. Cih tine lê razên, birçîbûn, zilm, feqîrtî, bêperwerdebûyîn û her tişt heye. Lê li Misrê dewlemendê herî mezin yên cîhanê tê de ne. Eşker bû ku Mubarek yek ji sê dewlemendên cîhanê ye. Serwerta wî di navbera çil-heftê milyar dolar e. Ev Mubarek e, vêca zavayên wî, xezûrê wî, berpirsiyarên wî hwd, malê dewletê hemû ji bo xwe birine.

Ji lewre dema Mubarek bû serok çi bû? Tiştek wî tine bû. Herwiha demek dirêje li ser desthilatdariyê ye, berê alîkarê serok bû, di pişt re bû serok. Berî bibe desthilatdar çi yê wî hebûye, leşkerek bû, subayek bû. Mûçek wî hebû, bi mûçê xwe dijiya. Bi mûçan mirov nikare milyarê dolaran kom bike.

Ev talan e, diziye. Li Sûriyê gel hemû di bin asta birçîbûnê de dijîn. Lê mînak xwediyê dewletê dewlemendê herî mezin in. Li Tunis liv û tevgera malbatên serwer mirov temeşa bike, mînak serokê komarê, hesera wî, almasê di destê wan de hwd, tê bêje van qet ne li Tunis, lê ku derê dijîn! Li cihekî herî dewlemend di cîhanê de ku dibe, li wir dijîn. Di aliyê jiyanê de ewqasî ferq û cudatî di nava serwer û mekuman de heye.

Em bala xwe bidinê, niha li her derê cihanê firotina goştê keran qedexe ye. Dema dewlet pê dihese kesên wî gotşî bifirûşe dikin zindanê, ji wan re dibêjin çima we firotiye. Lê li Tunis serbest e, ji ber ku eger goştê keran neyê firotinê wê gelek mirovên Tunisî wê bi salan tama goşt nekin. Jixwe li gorî goştê dinê erzan e, ev tiştekî rewa ye, li gorî qanûnên dewletê tê firotin. Di vê astê de feqîr in.

Niha ev nakokî heye, ji bo vê ekonomî li Rojhilata Navîn tine ye. Talan dewletê heye. Yê dibe desthilat ew dewlemend e û ekonomiya li Rojhilata Navîn teşebusê takekesî, heta yê milkiyeta taybet jî nînin. Ji ber ku milkiyeta dewletê ye. Milkiyeta taybet jî asteng dike. Ji bo vê desthilatiyên li Rojhilata Navîn, bi taybetî ev desthilatiya Beas, Nasirî, Birjiwaziyên biçûk, miliyetgerên radîkal, ev piştî bûn desthilatdar ew rêûresma sermayê, ticaretê yê li Rojhilata Navîn jî tesfiye kirin.

Mînak, li Sûriyê çînekî ticaran hebû, dewlemend hebûn. Heleb di cîhanê de navendekî tîcarî dihat nasîn. Ew îro tine ye, çima? Ji ber ku tesfiye kirin. Hêzekî ekonomî derveyî kontrola

xwe nahêle. Mînak, tiştekî wiha ye, di zemanê xwe de li Sûriyê Serok komarê Sûriyê Hafiz Esede hebû, birayekî wî bi navê Rfeat Esed hebû, ew jî serokê hêzên taybet bû. Birayekî wî din jî hebû ew jî serokê xebatên civakî û dînî bû. Weke din malbat, ger çi hebe her yek ji wan xwedî erkekê wan hebû.

Bazirganekî Sûriyê yê bi nav û deng, navê wî Nezîr Hedaye bû. Nezîr Hedaye yekî dewlemend bû, xwest ji Japoniya maşînên sûzokî yên çar tekelin, biçûk in. Xwest bikire û bîne Sûriyê, lê belê ji bo vî karî bike divê ku dewlet pê re alîkar be. diviya bû erêkirina dewletê hebûya. Bi tena xwe nikare, ji bo vê neçar ma ku birayê Hafiz Esed bi xwe re bike hevkarê (şirîkê) xwe. Rfeat Esed yê ku niha li mişxetiyê ye li derve ye, wî bi xwe re kir şirîk. Wê demê Refeat Esed jî bi bandor bû di Sûriyê de. Rewşa wî weke ya niha nebû.

Em bala xwe bidinê ew zilam dewlemend e, perên wî hene, bazirgan e, diçe dewletekî ticaretê imza dike û bazirganiyê dike. Wê tiştan bi perên xwe bikire û bîne bifiroşe, lê belê yek ji dewletê bi xwe re dike hevkar. Ew ê dewletê ne qurîşek pere didiyê ne jî karekî dike, tiştekî nake, lê dibe hevkarên (şirîkên) hevdu. Nîvê fayîdê jê re dimîne, bi çi? Ev hemû bi imzakî dibe, wê çi imze bike? Yek wê bacekî kêm bike, ji ber ku hêza kirînê li gel xelkên Sûriyê kêm e, lewaz e û her kes nikare tiştên biha bikire. Ji bo vê divê ku bacê daxîne da ku erzan be û karibe di pyasê de bfiroş e.

Ya duyemin divê ku beramberî wê amûrê ti alternatîfê nehêle. Wê demê di Sûriyê de amûrên herî belavbûyî yên sê tekel bûn. Biryarek derxistin maşînên sê tekel bûn, biryarek derxistin û ew qedexe kirin. Qedexe kirin da ku yê xwe bidin firotin, lê nîvê fayîdê digirin ji ber ku dewlet in.

Ji lewre dewlet li Rojhilata Navîn teşebusên serbixwe û rêrûresma bazirganî jî tesfiye kirin û her tişt talan kirin. Îstixbarat xurt kirin, artêş bi hêz kirin û van ji bo wer dewa netewî na, bi giranî ji bo çewisandinê li ser gelan çêbikin.

Li ser vî esasî vê carê modernîta kapîtalîst ya ku bandora wê li ser van welatana di aliyê ekonomî de çi ye? Di aliyê mekînekirinê de ye, endustryalîzmê de ye. Endustryalîzm bi navê xwe jixwe tiştekî ji derveyî pêdiviya mirovan e. Endustrî cuda ye, endustryalîzm cuda ye. Ango senaî cuda ye, senaîgerî cuda ye. Endustrî pêwîst e, ji bo pêkanîna pêdiviyên civakî pêwîst e. Pêdiviya mirovan bi amûran heye, bi gerecê heye. Lê endustryalîzm çi ye? Endustryalîzm dema ku hilberînê dike pêdiviya însanan ber bi çav nagire. Kar ber bi çav digire, ka wê çiqasî qezenc bike. Ji bo vê em bala xwe bidinê endustryalîzm têgîna serfkariyê pêş dixe, îsrafê pêş dixe, tesfiyekirina mada xam pêş dixe. Tesfiyekirina keda mirovan pêş dixe.

Ji ber ku her hilberînê dike, ji ber ku derveyî pêdiviyan hildiberînê dike, bi bimberdomana çandî û îdeolojîk mirovan mehkumî serfkariyê dikin. Ji bo vê tu lê temaşe dikî modela serê salê maşîn, nîvê salê maşîn, dawiya salê maşîn. Maşînên ji bo

ciwanan, ji bo jinan, ji zilamên kar (îşademiyan) hwd, pêdiviya civakî vê ferz nake. Ango renge reng tiştan derdixîne. Endustryalîzm ji ber ku kar zêde bibe, qezenc zêde bibe vê pêş dixe.

Ji bo vê endustryalîzm bi giştî jixwe derveyî pêdiviyên civakê pêş dikeve. Civakê dixe nava zor û zehmetiyê. Deyndar dike, aloziyan tê de çêdike, weke çawa krîza mezin ya beriya niha du salan di cîhanê de çêbû. Ev hemû endustryalîzmê çêkir. Hilberîna derveyî pêdiviyên însanî bû sersebebê ku hêza kirînê lewaz bibe û di hilberînê de bolik çêbibe, kirîn kêm bibe, ev bû sersebebê pêxîrtengiyê, xetimandinê û krîzê. Di encamê de dîsa feqîran baca (vergiya) wê dan.

Feqîr pê êşiyan, zor û zehmetî kişandin, dewlemend û xwediyên karxanan ji aliyê dewletan de hatin fînanse kirin, pere dan wan, dîsa li ser piyan sekinîn. Lê yên feqîr rewşa wan xerab bû.

Vê carê endustryalîzm li Rojhilata Navîn ti têkiliya wê bi pêdiviya gelan ve tine ye. Bi tememî li ser esasê bihêzkirina dewletê ye û berjewendiyên hêzên sermeyadar di cîhanê de pêş dixe. Vê bi xwe re pêdiviyên mirovan di ber çavan re nagire. Ji bo vê li şûna xweşiyê, feqirtiyê bi xwe re tîne, pêxîrtengiyê tîne, krîzên civakî bi xwe re tîne, serfkariyê pêş dixe. Mînak, serfkarî (tüketıcı) eger yekî dewlemend be û ji bo xwe xerc bike dîsa ziyana wê tine ye, lê dema yekî feqîr be û serfkar be, wê demê zor e, wê çaxê wê deyîn bike. Vê carê ev dayînan bi xwe re gelek pirsgirêkên civakî, exlaqî û tiştên din jî tîne û ev ziyanekî mezin dide.

Ya duyemîn, ziyanekî mezin dide hawirdor, endustriya li Rojhilata Navîn pêş dikeve, qet beramberî hawirdorê ne hestiyar e. Beramberî hawirdor ne hestiyar e, sîstemeke ku hawirdorê biparêze tine ye, çandekî civakî ku li hemberî hawirdorê hestiyar be ew jî tine ye. ji bo vê mirov lê temaşe dike, ji bendavan bigire, ji makînan bigire û gelek tiştên din jî dibin serserbebê ku ahenga ekolojîk ji her derê zêdetir li vir xerab bibe.

Ziwa bûn, çolbûyîn, ev hemû pêş dikevin. Ji bo vê jî ev endustrî ziyanekî mezin dide hem ahenga civakî, hem jî li Rojhilata Navîn dide hawirdorê. Ji ber ku bi temamî derveyî pêdiviyên însanî pêk tê. Bi temamî xwe neçar nabîne ku beramberî hawirdorê hestiyar be, ango xwedî têgihîştinekî ekolojîk be. Herwiha têkoşîna ekolojîk heta roja me ya îro jî li Rojhilata Navîn weke têkoşînekî bingehîn nehatiye dest girtin. Tevî ku têkoşînekî bingehîne, lê nehatiye destgirtin çendanî (nitelık) qet nayê dest dayîn, heta di cih cihan de weke çawa têkoşînekî loks be, derveyî pêdiviya mirovan e. Ev ziyanê hîna zêdetir kûrtir dike.

Niha beramberî vê ekonomî li Rojhilata Navîn taybetmendiyên wê yên civakî tine ye, desthilatdariye. Milkiyet milkiyeta dewletê ye. Olanaqên ku mirov bi xwe û xwe têr bike nahêle, ji bo vê koçberî, çarpik şehîrleşme heye, yê derveyî edetê

mezin dibe. Di derdora van bajaran de hemû tiştên dejenerebûyî, xerabûnên exlaqî, cînayeta civakî, her tişt tê de pêş dikeve.

Ji bo vê rêka xelasiyê bi pêşxistina milkiyeta taybet jî nîne. Niha Emerîka dixwaze çi bike, li şûna milkiyeta dewletê, milkiyeta taybet pêşbixe, çîna navîn pêş bixe. Di şexsê Iraqê de vê zêde ji bo însan bersiv neda. Tam berovajiyê wê di roja me ya îro de însan li Îraqê di aliyê ekonomî de zêde zoriyê dikişînin.

Hîna bêtir kûrbûna mesafê, fireh bûna hendafê di navbera feqîr û dewlemndan de zêde dibe. Di bin navê ekonomiya lîberal, piyasa serbest û pêşxistina milkiyeta taybet, em lê temaşe dikin ku pirsgirêka ekonomiyê di hundirê civaka Rojhilata Navîn de bi vî rengî qet çareser nabe.

Bêguman hemû rengê milkiyeta taybet înkar kirina wê em ji bo xwe nakin weke erk, daxwaziyên me ev e, armancên me jî ev in. Lê belê di rewşa îro de hebûna milkiyeta taybet em qebûl dikin, lê belê milkiyeta taybet ji bo çareserkirina pirsgirêkên ekonomiyê li Rojhilata Navîn ne rêbazekî rast e. Di Îraqê de ev hawildanên Emerîka yên di Îraqê de ev îsbat dike. Di roja me ya îro di Îraqê de gelek kes xweziya xwe bi serdema Sedam tînin. Herî kêm wê demê xwarin û vexwarin nedibû derd. Mal avakirin û çêkirin, nedibû derd, lê di roja me ya îro de ji peyda kirina malekî bigire, xwarin vexwarinê de, di tiştên şewatê de, benzîn, mazot, ev tiştana hemûyan bigire dest, hemû bûne pirsgirêk. Sedem ew e ku milkiyeta taybet, karê esas digire. Bi fîetan dileyîze, di çarçoveya feydeya mezin de digire dest, bandora vê dewlemendan dewlemend dike, feqîran jî feqîr dike.

Pirsgirêkê çarser nake, ji bo vê çare di ku de ye? Çare weke alternatîf beramberî ekonomiya taybet û piyasa serbest, divê ekonomiya civakî li Rojhilata Navîn pêk bikeve.

Ekonomiya civakî çi ye? Ekonomiya li ser esasê bihevşêwirandinê. Fonên civakî ne, koparatîf in, komîn in, ev in. Divê ev pêş bikevin. Di gundan de, di bajaran de derfetên pêşxistina vî tiştî heye. Lê nîzîkbûnên eznavend yên dewletê serweriya dewletê li ser ekonomiyê ruhê kolektîf di ekonomiya civakî de tesfiye kir. Her tişt bi dewletê ve girê da û gelek caran di bin navê koperatîfê de, di bin navê ekonomiya komînal de, kesên li gorî xwe çêkirin. Mînak em bêjin, li Sûriyê yan jî li Îraqê nejxweve sosyalîst bûn, li ser esasê sosyalîzmê ekonomiya sosyalîst pêşdixistin. Koperatîf pêşdixistin, komelên gundiyan pêşdixstin, lê belê wan hemû komelên talanê bûn, yên diziyê bûn. Ji ber ku hemû zilamê dewletê bûn û dewletê çêkiribûn.

Bi vî rengî weke îmac jî ekonomiya civakî wenda kiriye, di piratîkê de jî li beramberî tepisandina dewletê nedikarî li ber xwe bide. Niha girîng e ji nû de bê ava kirin. Beramberî ekonomiya taybet ya li ser esasê karê, ya li ser esasê kûrkirina hendafê di navbera feqîr û dewlemendan de, ekonomiya civakî ya li ser esasê kolektîfzmê, lihevşêwirandinê û di çarçoveya pêdiviyên civakî yên zerorî de pêş bikeve, divê ev esas bê girtin. Ev rêka çareseriyê ye.

Ji ber ku eger ev nebe, civak mehkumî mirinê ye. Ev wermandina ne xwezayî, ya derdora bajaran çêbûye, birçîbûn û feqîrbûna ku li wir tê jiyîn, hilweşandina exlaqî, bilindbûna rêjeya cinayet, ji diziyê bigire, kuştinê, tecawizê bigire û gelek tiştên din jî, ev dibin sersebebê ku her kes bawer bike êdî ev ne rêka çareseriyê ye.

Wê demê divê ku mirov li çareseriyê bigire, çarserî çi ye? Vegerandina li çavkaniyê ye, çavkanî dîsa hêz dayîna şoreşa çandiniyê, zîraetê, li ser wê esasê koperatîf û komînên gundan û bajaran pêşxistin, ekonomiya xwecihê ya ku li ser esasê bersivdayîna pêdiviyên civakî yên neçarî pêşxistin, ew esas bê girtin. Lewre dema ekonomiya civakî çêbibe, li ser esasê wê ekonomiyê pêdiviyên civakê yên din jî pêk tên.

Pirsgirêkê tendurûstiyê, perwerdê, beslenmê, parastinê, ev hemû tên çareser kirin. Ji ber vê weke çawa di aliyê siyasî de rêxistina civakê konfederal derveyî dewletê divê xwe çêbike û bi vî rengî civak ji dewletê bê parastin, di aliyê ekonomiyê de jî beramberî endustryalîzmê, ekonomiya civakî ya li ser esasê lihevşêwirandinê, hevhatinê, şêwirandinê civakî, fonên civakî û koperatîfan pêş bikevin.

**Kapîtalîzm, Endustryalîzm Û Netew Dewlet**

Di aliyê tesbîtan de girîng e mirov mentiqlî bîne ziman. Tiştên ku mirov anîn ziman divê ku hêza mirov ya îqnayê hebe. Divê ku di beramberî rexnan jî li ber xwe bide, dema ku rexne li ser hatin divê li ber xwe bide. Rêbertî her demê vê dibêje “ zarok dikarin li dayîka xwe bê, lê dayîk nikare li zarokên xwe bê” . ev tiştekî xwezayî ye, mirov dikare ji dayîkekê re bêje yaho ev tam li kurê xwe hatiye, yan jî li qîza xwe hatiye, lê mirov dikare bêje ev kur li dayîka xwe hatiye.

Niha ev gotin dema ku Rêbertî di parêznamê de tîne ziman pir xwezayî ji mirov re tê. Lê belê mirov dikare vê bêje Rojhilata Navîn dayîk e, şaneya kok e. Saziyên sereke yên civakî li vir çêbûne. Li vir jî belav bûne. Belavbûnekî fîzîkî jî çêbûye, lê bi giranî jî bilavbûnek çandî çêbûye. Ev di roja me ya îro de kes nikare red bike.

Ji bo vê em dibêjin yanî kopya kirin, weke gumlek li xwe kirin, şêwazê jiyanê, çand, bi giştî modernîta Rojava çareseriyê ji pirsgirêkên Rojhilata Navîn re nayîne. Ji ber ku qanûnên xwezayê re dikeve nakokiyê. Weke çawa em dixwazin dayîk li zarokan bê. Ji bo vê dayîk divê rêyek û rêbazek xwe ya çareseriyê ya cuda peyda bike.

Rojava ji nedîtî ve bibîne nabe, ji nedîtî ve nêzîk bibe nabe. Lê belê bi taybetmendiyên xwe re li hev bike, bi hêza xwe ya hundirîn xwe li hev bike. Bi nirxên xwe yên civakî û çandî re li hev bike, yên erênî, yên ku bi rastiya civakê re ne dijber e.

Niha em derbasî pêvajoyekî wiha bûne, ji bo vê sekina me ya beramberî Rojava ev e. Niha Rêbertî dibêje; modernîta. Divê

ku em li dijî modernîta bisekinin. Modernîta çi ye sê lingên wê hene. Her lingek wê gelek tiştan îfade dike.

Kapîtalîzm, endustryalîzm û dewlet netew, ev her sê ling temsîla modernîta dikin. Niha heger em însanbûna xwe, civak bûyîna xwe û pêşveçûna xwe li ser esasê em van her sê lingan bi dest bixin û em timî di wê hawildanê de bin, ew wenda kirine. Ji ber ku em di vir de dikevin nav pîvanekî şaş, em dibêjin; dema em bûn weke Rojava em ê pêş bikevin. Dema em karibin pîvanên wan bigirin, em ê wê demê pêş bikevin. Wiha çênabe. Çima çênabe, ji ber ku bi rastî û xwezaya tiştan re berovajiye, ya duyemîn jî Rojava vê qebûl nake. Rojava nirxên xwe cîhanî nake.

Rojava tiştên ji bo xwe maf dibîne, layîqî yên din nabîne. Rengekî xerab, ji rê derketî, çewt, van têgînaan derbasî her derî dike. Mînak, dema Rojava îsbat bike û bibîhîze ku kolmek ertqên nokler bi dizî li Elmaniya, Fransa, Îngeltera hatiye veşartin wê dinyayê li dijî wê xerab bike. Lê gemî bi gemî tije dikin û tên li Lubnan, Yemen, Sudan, Misrê vedişêrin kes bi wan nahese. Bala xwe bidinê wê demê tiştên ji bo xwe rewa dibîne, ji bo yên din rewa nabîne.

Rojava wan nirxên xwe nake cîhanî, ew gotina wê derew e dibêje “Em ê  nirxên xwe bikin cîhanî” derewan dike. Ew bihane ye, bihana dagirkeriyê ye, dibêje “Em demokrasiyê tînin, em zanistiyê tînin”, ka demokrasî, ka zanistî!? Ev derewin.

Ji lewre ev tişt nayên qebûl kirin. Wê demê tê wê wateyê ku li vir kes wê çanda Rojava qebûl neke, çanda Rojava qebûl dikin. Gelek kes dikin, li Kurdistanê ev qebûl kirin heye. Li Rojava, Rojhilatê, Bakurê, Başûrê Kurdistanê di asta dînbûnê de pêş ketiye. Ev piştî ku di aliyê îdeolojî de kesên teslîm bûne hene. Lê ev ne rastiya civakê ye, ev nexweşiyeke. Li Bakurê Kurdistanê de nexweşiye, li Başûr de nexweşiye, li Rojhilat û Rojava de jî nexweşiye. Rastiya civakê nîne, civak li ber xwe dide û dixwaze nirxên xwe biparêz e. Vê dînbûnê rast nabîne û teqlîd nake.

### Teqlîd Kirin Biyanîbûna Îdeolojîk E

Teqlîd kirin biyanîbûna îdeolojîk e. Dijmin bi artêşa xwe hat û zêde ziyan neda me, bi komkujiyan hat û zêde ziyan nedan me, lê belê dema ku oqiya me ya civakî navenda me ya civakî bandor kir û însanên wiha di aliyê civakî de teslîm bûyî peyda kir, wê ziyan da me.

Lê belê pirsgirêk be çareser nabe. Ji bo vê dema em dibêjin nabe, nayê wê manê ku qet bê bandor e, pirengî heye, heta êrîşî nava rêxistina me jî kir, ev şêwazê jiyanê şûpandin û dilbijandinên modernîta şûpandin. Bi taybetî jî li cihên ku bi Rojava re di nava temasê de ne, di serî de di nava bajaran de, di serî de li Stembolê, belavbûna cihên din jî heye. Lê belê em behsa çareseriyan dikin, derbasbûna ji kaosê dikin bi vî rengî çareserî çênabe û civak qebûl nake, civak li ber xwe dide.

Di van aliyan de divê ku mirov hina zêde mirov bi bihna fireh nêzîkî meselan bibe. Bi nerînekî (açıyeki) berfirehtir jî lê temaşe bike. Di hinek aliyên din de jî dem derBeasdibe, lê hinek gotin mirov bîne ziman wê baş be.

Mînak loksek me ya wiha nîne ku em hemû Rojava red bikin. Ne rast e jî, ezmûn û dersên me ji Rojava bigirin jî hene. Li wir zanebûn heye, zanebûn ne tiştekî biçûk e. Nasnama çaxa me ye, dema em beramberî zanebûnê li ber xwe bidin wê demê di nava çaxê xwe de em cih nagirin. Ango em biyanî dibin.

Li Rojava însan beramberî dewletê bihêz e, li Rojava hestiyarî, di heman demê de ezezî, lîberalîzm, dev ji xwe berdan, bê berpirsiyarî, ev hemû hene. Lê belê di cih cihan de hêza civaka sivîl jî heye. Mînak cotkar û gundiyên Fransa ji gundiyên Kurdistanê birêxistinîtirin. Zêdetir beramberî berjewendiyên xwe hestiyar in. Em dikarin dersan ji wir bigirin.

Jinê li Ewrûpa heta astekî maf qezenc kirine, hîna hestiyartirin beramberî xwe, dema zêdegaviyên cinsî li ser pêk tên li ber xwe dide. Anûra însan heta astekî hinek qezencên mayende çêkirine. Mînak, Polîsekî Elman di ber yekî di nava mîtingekî de li erdê ketiye, di ber re derBeasdibe û pehînekî lê dixe, ew li erdê ye, dema ew dîmen di tv de derdikeve, li gel hemû civaka Elman kelecanek çêkir, nerehetiyek çêkir.

Li Yewnan ji bo kuştina ciwanekî, bi rojan heta mehekî serhildan nesekinî. Lê li gel me her roj em çîrokên tecawizê şiyar dibin, em bi kuştina zarokan şiyar dibin, em şikandina destê zarokan şiyar dibin, lê rayeksyonek wer cidî dernakeve pêş. Lewre tiştên em ji wir bigirin jî hene, lê nirxên însanî li wir hene, da ku ew nirxên însanî li ber xwe bidin ma hindik komonîst hatin kuştin, hindik karker hatine kuştin, hindik jin hatine kuştin heta ku ev maf he qezenc kirine. Eger em wî milê civakê, milê civaka jêrîn, milê însanî, em wê jî ji nedîtî ve nêzîk bibin wê demê em nakokiyekî dijîn. Ji ber ku di her civakê de du tişt hene. Yek desthilatiye, ya din jî civak e. Divê ku em jî bîr nekin ku li her cihekê du tişt hene.

Ji bo vê van xalana mirov wiha bigire dest wê baş be. Modernîta kapîtalîst cuda ye, modernîta demokratîk cuda ye. Divê mirov van ji hevdu cuda bike. Ji lewre di vê çarçoveyê de girînge mirov lîberalîzmê û degomatîzmê jî bigire dest.

**Li Gorxwebûn û Dogmatîzm Ne Guhertin**

Niha dogmatîzm li gorî xwe bûne, neguhertine, ne lêpirsîn kirine. Ne nîqaş kirine, jiber kirine, elimandinin, xwe dubare kirine, li xwe bûyîne, li derdor çi dibe bila bibe, di jiberkirina xwe de tiştê dizane dixwîne, ev dogmatîzm e. Dogmatîzm ne tenê nezaniye, zane ye jî, xwendiye jî, bi zimanan dizane, dunya dîtiye, lê dîsa jî dogmatîk e. Dogmatîzm tenê ne dîngeriye, dogmatîzma îlmî jî heye, ya ku di xwe de îsrar dike. Dogmatîzm siyasî jî heye, mînak yek heye îro dibêje ez komonîstim, wênan rêz dike. Mrks, Engls, Lenîn û Stalîn, dîsa behsa proleteriya dike, behsa

nakokiyên çînî dike, behsa lîteratora berî sed û pêncî salî bê ku tiştekî tê de biguhere dubare dike. Dibêje ez bi prensîbim.

Lê em dibêjin dunya hatiye guhertin, tişt peda bûne û ewqasî zanistî peyda bûye, wê lîteratora berê me jiberkiribû şaş derdixe, wê demê divê ku ez dev jê berdim, lê dibêje na! Ew tiştê nû şaş e û ez rast im. Dogmatîzm ev e, di xwe de îsrar kirin.

Dogmatîzm dikare lîberal be, lîberalîzm sîstemekî cuda ye. Mînak di nava rêxistinê de yazde taybetmendiyên lîberalîzmê dihêjmêre. Berê me dixwendin û gelek ji wan me ji ber jî dikirin. Niha jî hinek ji wan taybemendiyan tên bîra min. Mînak dibêjin, dema tu fesadiyê bikî ew lîberalîzm e, parastina xetê nekî ew lîberalîzm e, tu di civînekî de bî xeber nedî û derveyî civînê nerazîbûnên xwe bînî ziman ew lîberalîzm e. Li ser hesabê rêxstinê tu maf bixwazî, ew lîberalîzm e, yazede tiştin. Lê em dikarin zêdetir jî bike rojane jî mirov dikare gelek tiştan bihêjmêr e.

Di têkoşînê de lewazbûn, pir têgihîştîn bi hev re jiyan kirine. Lê weke tarîf lîberalîzm çi ye? lîberalîzm lihevhatina bê prensîb e. Lihevhatina kesên ne weke hev tên ba hev û bi rengekî bê prensîb lihevdikin. Kapîtalê ev rêbaz ji bo tesfiye kirina muhalîfê xwe esas girtiye. Tu jê re dibêjî ez çep im, dibêje tiştek nabe wer e. Tu dibêjî ez komonîstim, dibêje were tiştek nabe, ez Kurd im, dibêje were, nizanim çi me, dibêje were, tu dibêjî temaşe bike ez ê li dijî sîstema te şer bikim têbikoşim, dibêje were.

Çend mehan derfetên têkoşînê dide mirov, lê gav bi gav bi derfetên xwe yên madî, bi hêza xwe ya fikrî wê têkoşîna te bê wate dihêle û te radest digire. Ji bo vê jî em bala xwe bidinê di roja me ya îro de medya sîstema Tirkiyê ya olîgarşîk, nijadperst, înkarperest, miliyetparêz, kî temsîl dike, çepê berê temsîl dike. Ewrûpa jî wiha ye.

Ewrûpa di demekî de şêwirmendê Fronsa Mîtrakî bû, Rêgil Dobrs bû, ew kî bû? Rêgir Dobrs yê pirtûka şoreş di şoreşê de nivîsandiye. Ew ê pirtûka derbarê şoreşa Emerka Latînî de gelekî şîrove kirine, di zemanê xwe de çûye bi Gîvara re di Polîvya de hevdîtin çêkir. Dema hate girtin got; ”mixabin ku ez ne hevalê Gîvara me. Heger ez îro dibêjim ez ne gerîla me, ne ji bo ku ez ji gerîlatiyê ditirsim, ji bo ku ez xwe bidim efo kirin, ji bo ku ew şerf bi dest min neket.” Wê çaxê wiha bû, lê paşê bû şêwirmendê Fransiwa Mitrwa. Bi eslê xwe Fransîs bû, çepekî fransîs bû. Lê bi mesela şoreşa Emerîka ve eleqedar bû.

Lîberalîzm ev e, dijberê xwe di nav xwe de dihelîne. Yanî yektiya bê prensîb, ji bo vê di wir de dogmatîzm dikare di nav de cih bigire, jixwe di roja me ya îro de lîberalîzm sîstemê diparêze. Parastina sîstemê mohafezekariye, mohafezekarî jî teşeyekî dogmatîzmê ye. Lê belê weke qalîb teqez dogmatîzm lîberalîzm be, lîberalîzm jî dogmatîzm be, di encamê de du gotinên ji hev cuda ne û her yek bi rengekî tê pênase kirin, mirov wiha bigire dest wê baş be.

### Dîroka Rast A Berxwedana Gelan E

Ji teslîmiyetê wêdetir çerxkirin heye, mînak mirov dighîjin astekî yan wê bimirin, yan jî wê tiştên resmî yên ku li ser wan tên ferzkirin qebûl bikin. Herwiha ji bo Îxwan-us Sefa jî wiha dibêjin, îlm her demê dixwaze tiştên heyî derbas bike, lê şîdeta ji aliyê sîstemê ve li ser wan tê ferzkirin pirî caran ji bo karibin hinek gotinên xwe jî derbasdar bikin bi qilif û veşartî tevgeriyane.

Ev hemû îdeolojiya resmî razî kirin e. Lê dîsa jî tiştên zanistiyê di dîrokê de zêde ye. Ne kêm e, ji aliyê felsefê, çandê pir tişt hene. Ya girîng şêwazê zanistiyê ye. Van bi şêwaz ev tişt derBeasdikirin. Mînak ji xerafetê zêdetir, ji alimandinan zêdetir, şêwaz pêş dixistin. Nexweşî, tip ji şêwazê jiberkirî zêdetir yê zanistî êdî didan pêş. Ev girîng in, lê eger kesayet û şêwazê wan yê jiyanê mirov bigire dest, kesên herî xerab weke kes û xizmeta sîstemê kiriye Fransis Bacon e. Di sîstemê de dadger bûye.

Herwiha Îbn-î Xeldun, di gelek cihan de şêwazê weke fenûfot bi kar aniye. Lê tiştê ji dîrokê re hiştiye, cuda ye. Bacon jî tiştê ji dîrokê re hiştî cuda ye, lê weke kesayet xizmetkarê sîstemê ye. Ji bav û bapîrê xwe de ji Roger Bacon bigire ta zemanê Fransîs her demê wiha bûn. Lê şêwaz guherî, wan ji însanan re xizmet kirine, ger nirxandin bi vî rengî be wê tendurûstîtir be.

Ger mirov dîrok şaş nas kir, xerbtir e ku mirov qet nas neke. Mirov dîrokê qet nas neke çêtire ku mirov şaş nas bike. Ji ber ku dema mirov şaş nas bike wê demê hêzek dîrokê yê dana meşandin heye, teşe dide kesayeta me, baweriya me dide rûniştandin. Hilwestên me beramberî meselan diyar dike. Lewre dîrok bi rengekî qirnolojîk û rêzkirina buyeran nîne. Bawerîne, nirxandinîn û gelek tiştin.

Mînak derbasbûna Muxulan bê berxwedanî nîne, welatê Farsan jî bê berxwedanî nîne. Dewletê li ber xwe neda, ji ber ku xelîfên Ebasiyan teslîmî Selçoqiyan bû, teslîmî Tirkan bûn. Weke sîstem teslîm bûn. Nikarin li ber xwe bidin. Xelîfên ku li ber xwe bidaban, bi şêwazekî komplowarî ew dikuştin, yan jî ji erkê dadixistin. Yan jî bi rêkên cuda wiha li ser wan didan meşandin.

Farsan çi kirin, bi rengekî din nêzîk bûn. Berxwedanek çors nekirin, lê hinek tiştên xwe parastin, zimanê dîwanê parastin, yê serdestiyê parastin. Lê hukmê jorîn dîsa Tirk bûn. Lê berxwedan jî hebû behsa berxwedana qela Alamut beramberî Muxulan dikin. Demekî dirêj jî li ber xwe daye, Ereban jî li ber xwe daye, geke kesên din jî li ber xwe dane.

Heta li beramberî Misilmantiyê berxwedan çêbûye. Mînak dîroka misilmanan kesên qebûl dikin bi rengekî neyînî qebûl dikin. Lê qebûl dikin, mînak Teberî, Îbin Esîr, yên nivîsandine berxwedana Kurdan beramberî Misilmanan di vê herêma navbera Şehrezor û Erdelan, bi taybetî Hîlwan, ev berxwedana wan bêhempa ye. Heta yek saxe bûye li ber xwe da ye. Sîstem di aliyê xerabûna mêjî de jî bê îstiqrarbûna siyasî û leşkerî fektoreke. Em bala xwe bidinê eger di roja me ya îro de

pirsgirêkên zihniyetê li Rojhilata Navîn hene, sedema wê rewşên awerte ye.

Rewşa awarte bê îstiqrare, mînak Suriyê ev çil û heft sal e rewşa awarte dijî. Sedemê rewşa awarte çi ye dilxwe de bi Îsraîl re şer dike. Ti şermer jî di holê de tine ye. Lê bi wê egerê çi dike, timî bê îstiqrarê, awartebûnê civîn çênabin, xebardan çênabin, rêxistin çênabin, ev dibe sersebebê ku zihniyet jî çênebe. Ango mirov gêj in. Di Misrê, Îranê, Îraqê wiha ye, wê demê bê îstiqrarbûna siyasî û leşkerî rê li pêşberî xerabiyê vedike.

Lê ger mirov vê bike weke zagonekî mutleq, wê demê pêşveçûna li Ewrûpa ji aliyê îlmî û teknolojî de divê em înkar bikin. Ji ber ku Ewrûpa kengê hindik be jî îstiqrar dît, di sala 1648'an de îstiqrar dît. Di hevpeymana Vesvaliya de, li gorî Ewrûpa yekemîn dozena cîhanê çêkirin. Gotin êdî divê em bes şer bikin. Heta wê demê mezheb li dijî mezheb, dîn li dijî dîn, dewlet li dijî dewlet, şerê Fransa û Îngilîzan, di navbera Îspaniya Holenda de, navbera Protestan û Katolîkan de, komkujiyên li dijî jinan çêbûn, bin navê nêçîra sihirbazan. Hemû bê îstiqrarbûne, talan e, kuştine, qirkirin in, pir dijwar bi ser hevdu de diçûn.

Hevpeymana Vestevaliya bi xwe re îstiqrar anî!? Wê jî neanî. Bi dû wê de şerê sed salî, sî salî, hwd, heta şerê cîhanê yekemîn her demê şer bû. Lê dîsa jî ronanses çêbû, dîsa jî raformansyon çêbûn. Dîsa jî ronakbîrî çêbû, wê demê ew tenê bes nîne. Wek din jixwe ew nêzîk bûn, hemû talan, diz hemû tişt dibe ku çêbibin, lê suyî dîsa jî li Rojhilata Navîn girîng e. Li Ewrûpa bi taybetî di zemanê Roma de komîtanekî karîbû împerator ba, tevî ku bavê wî ne împerator ba, lê li Rojhilata Navîn ev mînak kêm in. Îstiqrar çêbûye.

mînak em bêjin Pres, her yek li gorî xwe dîrokê dinivîse, lê tiştek heye, bê navber ji sala 550'î heta 350'î yanî heta hatina Skender, weke çawa çaxekî Persa hebûye. Heta bi Qefqasiya, Asya navîn, Mekedoniya heta Misrê hikum dikirin, sê parzemînan de hikum dikirin. Her derê re rê vedikirin. Sîstema wan ya psta hebû. Mînak tiştê ku qiraliyetên Rojhilata Navîn çêkirine, nîv nîvê yê qiraliyetekî tenê li Ewrûpa çêkirine. Lê di dema Persan de berovajiye. Ev cihana hemû di bin hikmê wan de bû, hemû Persepolîs, paytexta wan bi rêkan hatibûn çêkirin.

Ew gotina ku dibêje; hemû rê diçin Roma, nerast e, hemû rê diçin Persepolîs jî. Ji Misrê, Mekedoniya, ji Asya navîn, ango sê parzemînên cîhanê hikum dikirin.

Ji bo vê ew îstiqrar heye, hêza exlaqî weke ku di sedsalên derBeasbûyî de xerabûyî, di ti salan de xerab nebûye. Van civak li ser piyan hişt. Di sed salên dawî de di encama bandora modernîta, ev xerabî çêbû. Ji lewre kapîtalîzm milê wê yê modernîta heye, lewre Rêbertî ji bo vê dibêje; "şerê li dijî kapîtalîzmê, şerê li dijî modernîta weke hev nîne." Tu şer li dijî kapîtalîzmê bikî, ew milekî meselê ye. Lê têrê nake, şerê li dijî modernîta pêwîst e.

Modernîta çi ye? Modernîta poztîvîzm e, poztîvîzm zanistiyê ji dîrokê qut dike, ji exlaq qut dike, ji bo vê meteryalîzma tewş derdikeve pêş. Li ser vî esasî ev xerabûna exlaqî û civakê hîna zêdetir kûr dibe. Ev nayê wê manê ku îlm ne baş e, îlmparêzî ne baş e. Ji ber ku milê ruhî ji holê radike. Ji bo vê dema ku Marks Ribar dema dibêje; Ruhê protestantî, ruhê kapîtalîzmê ye." Ev tê vê manê, protestantî dîn milî kir, dîn ferdî kir. Dema beriya protestantiyê qiral ji ber tirsa kilîsê hinek pîvanên exlaqî neçar bû pêk bianiya, bi protestantiyê ew hevsar jî nema. Ji lewre modernîta ev e, modernîta di bin navê îlmiyetê de, bin navê reformê, endustryalîzmê têkiliyê di navbera mirovan de tewş, meteryalîst bê ruh dike ku civakê xerab dike.

Niha em li dijî kapîtalîzmê ne, çi ye em li dijî kapîtalîzmê ne, em dibêjin tê de kedxwarî heye. Rast e, kedxwarî tê de heye, lê ev kedxwarî bi çi rewa bûye, bi modernîzmê rewa bûye. Bi îlmparêziya wê, bi dewlet netewa wê, bi têgînên wê yên endustryalîzmê bi van. Ji bo vê ev erênî kirin, li dijî kapîtalîzmê şer kirin ew şer şerekî serkeftî nîne. Wê mesele xerab kiriye, di roja me ya îro de wê gelek tişt xerab kirine, em niha pir bi serbilindî dikarin xweziya xwe bi sed sal berê bînin. Sed sal berê zêdetir Kurdayetî bi hêz bû, însaniyet zêdetir bi hez bû, exlaq pir bi hêz bû. Ev nayê wê manê ku em paşverûne, em xweziya xwe bi tiştên civak li ser piyan dihîştin tînin. Ev nayê wê wateyê ku em bi destpotîzmê, uygolamê, împeratoriyê Osmaniya rewa bikin, ew fihoş e, rizandine, xerabî ye, lê tevî wan jî civak hebû.

Eger em paşveçûna Rojhilata Navîn, paş de mayîna Rojhilata Navîn, tenê bi wî faktorî rave bikin, ew zêde îqnayê nade. Ji ber ku rewşên hîna xerabtir di Ewrûpa de hebûn, bê îstiqrariya siyasî û leşkerî di Ewrûpa de qat bi qat ji ya Rojhilata Navîn xurtir bû.

Ew buyerên ku em dibêjin sed alî carekî çêdibû. Ewrûa di hindirê sed salekî de qat bi qat şer û talanên ji ya Rojhilata Navîn zêdetir çêbûn. Holenda çend carî ji aliyê Îspaniya ve hatiye dagirkirin, di demekî kin de! Bajarê Îtaliya Jeneoa, Venedîk, Mîlaniya û Roma çend carî ji aliyê Îspaniya ve hatiye dagirkirin! Di navbera wan de çiqasî şer çêbûye, pirtûka Prens yê Makyavilî çi tîne ziman?! Rojane talan tîne ziman, rojane guhertina destê hikumdariyê ji welatekî heta welatekî dîtir tîne ziman. Ji bo vê formîlê wê derdixîne, tê çawa hikum bikî, tê çawa talan bikî, eger tu mîr bî tê çawa bikî. Eger tu leşker bî tê çawa bikî, eger tu dizbî tê çawa bikî. Rê û rêbazên vê di esas de datîne. Ji bo vê di van aliyan de dibe ku di hinek xalan de zehmetî hebin.

Tiştek din jî heye dibêjin dîroka Fars weke çawa ji aliyê Yahudiyan ve hatiye nivîsandin û her tiştê wê erênî hatiye nivîsandin, ev ne rast e. Dîroka Fars li gorî rengê desthilatiyê yê Asûr, Babil û Akad heta astekî nerm e. Heta astekî însiyatîfa xwecihî tê de heye, di Fars de sîstema îyaletê heye. Divê mirov ji nedîtî ve nêzîkî vê jî nebe. yê ev gotî ne ji bo dîrokê şaş bide nîşandan, dîrok ev bûye. Lê dejenere bû, hişk bû, lê bi hêza xwe ya leşkerî rahibên xwe muxalifên xwe ji holê rakirin, Manî kuştin, rahibên Zerdeştî ew mişxet kirin, ev hemû hene.

Lê dîsa jî eger mirov beramberî Asûr, Babil bipîve, bi rengekî îzafî û nisbî turerans tê de heye, bi rengekî nisbî însiyatîfa xwecihî tê de heye. Bi vî rengî karibûye beramberî Yewnan şer bike, bi vî rengî karîbû ji Efrîqiya, Asya navîn heta Mekeduniya hikum bike. Eger em vî tîştî hemûyê red bikin û tenê bêjin rêbir bûn, talanger bûn, ti nêzîkbûnek wan a siyasî tine bû, di vir de eger em dibêjin bandora modernîta kapîtalîst e, bandora pozîtîvîzmê ye, di vî alî de rast e, çima; îlmê Rojava dibêje li Rojava sîstemekî siyasî tine bûye. Tesadûf bûne, dizbûne, qiral Xweda bûne, tê de zanistî û rêbaz tine bûye. Bi vî rengî di esas de dixwazin desthilatiya xwe bidin rûniştandin. Mirov heta asta dawiyê li hemberî dogmatîzmê, xerabiyê, mijokdariyê, şideta bê sînor, girîng e mirov bi nirxîne ku mirov karibe derbas bike.

**Lêgerîna Li Heqîqeta Dîrokî Îlmê Esas Digire**

Nirxandinên şaristaniyê pir girîng in ku mirov li ser raweste. Careke din ez dixwazim xalekî bînim ziman. Niha nêzîkbûên Rojava îlmê pozîtîv ji buyeran re, mînak guh didin felsefa îlm, lê guh nadin dîroka îlm sedem çi ye? Ji ber ku dema tenê bi aliyê wê yê felsefî re mijûl dibin, bi qanûnên wê yên hundirîn re mijûl dibin, bi rasyonalîzmê ve mijûl dibin hwd. Ev sedemekî derdixîne holê, ew jî îlm bi zemîn û zemanekî ve sînordar dimîne. Ango bi sedsaliya 16.'şûnda di parzemîna Ewrûpa de bi taybetî jî di Rojavayê Ewrûpa de bi sînor dihêle.

Ev bingehê hegemoniya ye, ji lewre bi zanebûn tê kirin. Ew kesên dinivîsin jî ne ku şaş in, ne ku nizanin, lê ev bergê wan e, hinekî jî teref e. Vê esas digirin, lê em dîroka îlm esas digirin. Em ê temaşe bikin mirov di serî de rahiştiye kevir, pişt re zîraet kiriye, xanî ava kirine, di pişt re hê bêtir bîrkarî, nivîs, astronomî, fîzîk, kîmiya hwd, heta roja me ya îro aniye. Ev nirxên însanî ne, ne malê kes in. Ji bo vê divê ku em li ser dîrokê bisekinin.

Ji bo vê bi taybetî jî tiştê weke îlm, lêgerîna li heqîqetê derveyî îrada sîstemê çêdibe. Divê em vê bizanibin, zaniyar her demê muxalf in, felezof her demê muxalf in, zaniyar her wiha ne muxalif in. Ji ber ku sîstem dewlet e. Dewlet statîkujiye, ji ber çi wiha ye; eger dewlet tevgerê esas bigire wê demê divê ku xwe derbas bike, lê dewlet naxwaze xwe derbas bike.

Lê lêgerîna li heqîqetê çi ye, lêgerîna derBeaskirinê ye. Maknîzma derBeaskirinê ye, astekî pê razî nabe û derbasî astekî din dibe, yekî din heta roja me ya îro gihîştiye astên cuda cuda.

Atom, bombe, hwd, ev zanistparêziye, vê îlmê ku bi temamî di çarçoveya mayende kirina sîstemê de êdî tê xerc kirin. Derveyî qerekterê îlmê ye. Bi qerekterê îlm re jî berovajiye. Ji bo vê kapîtalîzm tenê dijî ekonomiyê nîne, zanistparêzî jî dijî zanistê ye. Ev jî tesbîtên me ne, ferq û cudatiya di navbêna me û sosyalîzma pêkhatî de jî ev e.

Ji bo vê dema em behsa Rojava dikin di eniyê de şer kirin derveyî felsefa me ye. Rêbertiyê di eniyê de şer kirin bi niyetek baş jî lê temaş nake. Mînak di vê parêznamê de Rêbertî çi dibêje, "

ew kesên di eniyê de şerê emperyalîzmê dikin bin navê dîngeriyê yanî Îslama siyasî, ji binîve dîngerî, ew sînorê muxalfeta wan li dijî sîstemê sînorê ku bibin kole jê re, yanî ber devê deriyê wê hinek pay ji bo xwe re bigirin, derBeaskirin nabe." Ji bo vê em bi vî rengî şerê wê nakin. Ev xalek e.

Xala duyemîn em gelek tiştên erênî jî divê bibînin. Gelek tiştên erênî, îzafî hene, ên bi prensîb hene. Rêbertî di gelek cihan de pesnê Emerîka dide, Serokatî pesnê Engeltera dide, Rêbertî carina dema ku rêka çareseriyê nîşan dide behsa Îswîç re dike. Îswîç re dewletek kapîtalîst e, Emerîka kapîtalîst e. Engiltera çavkaniya kapîtalê ye, desthilatiye, lê di aliyê îzafî de hinek tişt hene. Hinek pêkanîn hene, di aliyê îzafî de di aliyê nisbî de. Ji bo vê eger Emerîka welatekî mêtinger bû, li dijî Engiltera şer kir, serxwebûna xwe xwest ew bihêza xwe ya leşkerî nestandin, bi demokrasiya xwe standin.

Çi bo ev demokrasî, sîstema îyaleta ye, hilbijartin e, mafê mirovan e, deklarasyona mafê mirovan yekem li wir hate weşandin, ev tiştên he ne. Ev çavkaniyê hêzê ne. Sîstema olîgarşîk, destpot, bi temamî antî demokratîk, derbas dike ku karibe li himberî wê sîstemê têbikoşe. Lê belê sîstemê bi dawî nake. Heta li gorî nirxandinekî dîrokî dema ku em bigirin dest, Emerîka dused sal berê Emerîka bi Birahamdaktur, Emerîka Ceferson, Emrîka Franklî, ji Emerîka Boş qat bi qat demokratir bû. Ji Emerîka Obama jî qat bi qat demokratîk bû. Heta sed sal berê di zemanê  Perasîb Wîlson de carekî din mirov bibîne ku mafê gelan di serxwebûnê de diparêz e.

Tiştê ez dixwazim li vir bêjim çi ye, teoriya civakî, siyaset, dîrok dema ku mirov pê re dide û distîne totolojî, ango em nikarin geneleman bikin. Lewre yek û yek du ne, li dera din jî heman oygilama ye, na. Divê em têkoşîna gelan esas bigirin.

Di sala 1886'an de karkerên Şîgago derketin ji bo heşt seat kar, rojekî betlanê mafê sendîka hatin kuştin. Lê di roja me ya îro de heger şerketek li Emerîka derveyî mafê sendîka li karkerekî bixebitîne ew şerket ji aliyê dewletê ve tê ceza kirin. Ev tê wateya ku dewlet demokrat e, na. Dewleta îro eger di cih cihan de rêza wê ji demokrasiyê re heye, ev di encama çalakiya gelan de ye.

Dewlet neçar kirine ku tiştekî qebûl bike, ger di roja me ya îro de li Ewrûpa mafê mirovan û aştî heye, sedema wê serhildana 1968'a ye. Serhildana 1968'an sîstem guhert, ji sîstemê re got bi vî rengî bi tena serê xwe desthilatdarî û kapîtalîzm çênabe. Em jî însanên we ne, em ciwan in, jin hene, zarok hene, çîn hene, ev hemû divê mafê wan hebe. Her tiştê kapîtalîzmê çênabe, ger hun vî mafî nedin, em ê dukanan xerab bikin. Em ê deriya bişkînin, em ê îsyanan bikin. Kirin jî, dewletan jî dîtin ku wiha nabe. Bi vî rengî her tişt yê min be, hebana Rebana nizanim çawa, çênabe. Divê ku tiştekî jî bide gel.

Niha ev têkoşîna gela ye. Birono ne birjiwaziye, Volter ne birjiwaziye, Montîsko ne birjiwaziye, Darwîn ne birjiwaziye. Ji bo

vê van dîroka gelan e, heger kapîtalîzm nebûna îlm wê hîna zêdetir pêş biketiba, sosyolojî wê hîna zêdetir pêşbiketiba. Ji ber ku kapîtalîzmê çi kir her tişt bi sînorê xwe danî pêşberî wê.

Ji bo vê mesela şaristaniyê divê ku em baş analîz bikin, em bi vî rengî lê temaş nekin. Dema ku em ji Ewrûpa tiştekî fêr bibin, ew ne teqlîd e. Dema em Brono derxînin pêş ne teqlîd e. Em Volter derxînin pêş ew ne teqlîd e. Em nizanin kê derxînin pêş ew ne teqlîd e. Ji ber ku wan gotine azadiya fikirî gotine. Huquq anîne ziman, mînak Montîsko dibêje hemû desthilatdarî xerab e, lê desthilatiya destpot hîna xerabtir e. Dema ku mirov vê gotinê bêje qey ji bo roja me ya îro baş nîne!?

Di van aliyan de divê mirov vê bibîne, lê belê tiştekî din jî heye pir girîng e, da ku mirov ji stûxwariyê xelas bibe, da ku vê kompleksa xwe ya ketîbûnê beramberî derve, xwe bi xwe biçûk dîtin, divê mirov ji vê jî xwe xelas bike. Mirovê çawa ji vê xelas bibe, di aliyê zihnî de divê em jê xelas bibin.

Niha em dibêjin ronansas, ronansas teqandina enerjiya mirovan e. Însan dighîje astekî ku êdî xwe derdora xwe, xwezayê civakê însan, sîstemê êdî bi nerînekî nû lê temaşe dike. Erdembûnê di çarçoveya sikûnetê de, feqîrtiyê de, bêdengiyê de, xwesparî, teslîmiyetbûnê na, çalakîbûnê, çalakî, jîr û jêhatîbûn, maceran û bi vî rengî. Lê her kes hem fikir e ku ronansas bi pirtûka Dantî ya Komediya Îlahî dest pê kiriye. Yanî tam ew zûtir e, lê belê dibêjin wê dest pê kiriye.

Ji ber ku ew lêgerînek heqîqetê ye, lêkolîn in, îlahiyetê nîqaş dike, cinet û cehnemê nîqaş dike, îlmê nîqaş dike. Ev tiştên pîroz digire dest, analîz dike, li gorî xwe taboya derbas dike. Yanî hêza însan di tiştên Xwedayî de jî bifikir derdixe pêş.

Lê eşker bû ku Komediya Îlahî versyoneke Rojhilatiye, di roja me ya îro de em nabêjin. Yanî fanatîzma Rojhilatî ye em nabêjin. Ev analîz di roja me ya îro de di Rojava de vê dibêje, "çîroka Îsa û Merac heye, Ji lewre HZ, Muhemed çawa çûye cem Xwedê." Li ser esasê wê çîrokê di wêjeya Fars de mentiqê teyr derketiye. Sîmorg e, ew mentiqê teyr lêgerîna li heqîqetê ye. Bi zimanê teyran, tê de guftugûyên pir balkêş tê de hene. Mînak dibjin: "Divê ku em bighîjin qiralê xwe, rastiya xwe. Ji teyran re xebar didin ji tawis re dibêjin; Were em biçin, tawis dibêje; pêdiviya min tine ye, ez ji xwe xweşik im, dîmenê min têra xwe dike, pêdiviya min a ez li tiştekî din bigerim tine ye.

Diçin û ji bilbil re dibêjin; were bi me re, bilbil jî dibêje ez nikarim. Jê dipirsin çima? Bilbil dibêje; meyla min cuda ye, ez aşqê gulê me. Jê re dibêjin, binêre temenê gulê heftek e, piştî hefteyekê diçelmise û diçe. Lê heqîqet her demî ye, ka were em bi hev re biçin. Lê bilbil dibêje; na."

Di wir de hewildanên di ber heqîqetê de, bê hewildaniyê jî rexne dike. Hewildanê jî derdixin pêş. Yê ku soz didin, bi rastî jî diçin, mesafan qut dikin, derya derBeasdikin û heta digihîjin cihekî, cihê qiral, lê qiral nabînin. Lê jê dipirsin; em hatine te

bibînin, ew çi nîşanî wan dide awêneyekî nîşanî wan dide. Di awênê de ew bi xwe diyar dibin, dibêje wan; heqîqet hun bi xwe ne. Navê teyrekî sîmorg e, yanî sîh teyr in. Sîh tenê sax man û gihîştin wir, qiral jî awênê nîşanî wan dide û ew xwe di eynê de dibînin, bi vî rengî heqîqetê dide nasîn. Li ser wî esasî dibêjin Komediya Îlahî derketiye. Yanî versyona wê ye, ji wir hatiye derxistin.

Derbasbûna fikirê Rojhilata Navîn û Rojava gelek qenalên wê hene. Ji dema Tals dest pê kiriye û hatiye Babil, çûne Misrê, Pîtagos çûye Misrê, Tals hatiye Babil. Bi êrîşê Xaçperestan hîna bêtir ev bizav (herik) zêde bûye, ev fikirê ji Rojhilat ber bi Rojava ve biçe. Bi çêbûna împeratoriya Osmanî reva Xiristiyanên Rojhilata Navîn û çûna wan ya Ewrûpa hîna zêdetir bûye. Van mentiqên îlmî, tecrûbe, ya ku rê ji ronansasê re vekir, jê hêzeke mezin girtin. Ji ber ku rastî desthilatdariya di Ewrûpa de tev hemû dijwariya wê, li gorî ya Rojhilata Navîn qayîşokî bûye. Nerm bûna wê ji ku dihat, di Ewrûpa de cumhuriyetên azad hebûn. Venedîk, ronansas li Îtaliya derket, di Îtaliya de dewletek navendî tine bûye. Cumhuriyeta Venedîk hebûye. Cumhuriyet bi meclîs dihat rêvebirin, demokratîk bû. Heta roja îro jî cumhuriyetê weke Venedîk xwe bi vîna xwe bi rê ve bibin derneketine holê.

Îngilîzan di zemanê xwe de dema bûn cumhuriyet hinekan jê xwestin weke Venedîk bikin modêl bigirin, lê belê bi ser neketin û careke din bûn cumhuriyetên navendî, di pişt re qulaptin.

Mîlano, Cenawa hwd, ev hemû yên ku bi prensan jî dihatin bi rêve birin jî, lê dîsa jî bi meclîsê hebûn. Yanî desthilatî nerm bû, desthilatiya navendî jî, desthilatiya ku însanan bi xwe ava kiriye. Mînak dewletên homojenî mezin yên di Ewrûpa de çêbûne, di sedsala dehan û şûnda Îngeltira Fransa, di pişt re Îspaniya, ev li ser çi esasî ne, li ser esasê yektiya navbera Lorda de çêbûye. Lord hatine gel hev û di navbera xwe de ev çêkirine.

**Kevenşopiya Şidetê Ya Dijwar**

Ji bo vê sîstema siyasî ne di wê hişkbûn, pîrozbahî û şidetê de bûn ku karibin fikir asteng bikin. Lê li Rojhilata Navîn asteng kir, bi îşkencê, kuştinê asteng kir. Li Rojhilata Navîn kevneşopiya şidetê dijwar e. Berxwedanek hatiye kirin, lê desthilatiyê derBeaskiriye. Niha Îraqê du bostan erdê dikolin mezarên komîn derdikevin.

Ev mezarên komîn yên kesên li ber xwe dan, li Tirkiyê û Sûriyê ji heman tişt hene. Yekî muxalf digot; ez tehedî dikim ku devancê bikin eniya min jî, ger çavên min recifîn, hun çi bixwazin ez ê ji were bikim. Lê belê min nedikarî ez bikevim hebsê, ji ber ku di zindanên Rojhilata Navîn de ji derveyî Mezlum Dogan di zindanên Rojhilata Navîn de hemû fikir teslîm bûne. Yan bûne dijberê xwe, yan mirine. Hêza berxwedanê têrê nekiriye ku sîstema siyasî ya hikumdar derbas bike.

Di roja me ya îro de em dikarin derba bikin, ji ber çi? Ji ber ku rola îlm û teknîkê heye. Mînak, Ereban dema dawiyê de karîketor çêkirine, dibêjin; Husnî Mubarek çûye gel Cemal Ebdulnasir û Sadat, Cemal Ebdul Nasir Serokê Misrê yê kevn e yê ku miriye, Sadat jî yê ku hatiye kuştin. Ji Sadat re gotine; tu sêdar bûyî, yan tu li ser textê hatî kuştin? Yanî tu bi çi miriyî? Ji ber ku Sadat li ser textê hate kuştin, di torenê de hate kuştin. Sadat ji wiha bersiv daye û gotiye; Ne ew ne jî ya din, ez bi fêzbokê ez hatime kuştin. Wê demê rola fêzbokê heye. Di xerabkirina sîstemê de, milê wê yê teknîkî û îlmî rola wan heye. Hildiweşîne û girîng e mirov bizane.

Ya girîng di vir de mîrov vê mesela sentezê em baş bigirin dest. Sentez şaristaniyekî nû ye, şaristaniya demokratîk e. Li ser esasê ku ji her du aliyên tez yanî ew û antiya wê, ji wir girtina tiştên erêniye. Ne qalibgire, hinek tişt hene hadîkapa çêdikin. Mînak hinek hevalên me, ne hemû bin jî pirtûkên Frued xwendin û derûniya xwe li gorî wan pirtûkan eyar dikirin.

Ji ber ku Frued bi rastî jî di kesayetê ji aliyê derûnî de şoreşekê çêdike. Lê ji bo Ewrûpa, di zemînê ku tê de meteryalîzm û pozîtîvîzm serwer e, di wir de kesayetê analîz dike. Lê di vir de hêza însanan a ruhî heye. Li Rojhilata Navîn tu nikarî her tiştî bi cinselikê rave bikî. Tu wiha bikî, pirsgirêk cidî dibe, pir jî cidî dibe. Tesbîta li ser malbatekî hêjmarê wan sê kes in, yek jî hêjmarê wan pazde kes in, nabin yek. Ji bo vê ew ragihandinên mekanîkî, pirsgirêkên xwe di rêka wan de şîrove kirin, ew hendîkapan çêdikin, astengan çêdike û pirsgirêkan çareser nakin.

Lê belê li Rojava berxwedanek mezin heye, divê mirov wê bibîne. Tevî ku sîstemê hinek tişt hatine ferz kirin, ew qismê wê yê zanistiyê, yê demokratîk, yê mafê mirova ye, divê mirov ji vê tecrûban derbixîne. Rêbertî dema ku azadiya jinê digire dest dibêje; “Gelek dersên mirov ji Ewrûpa bigire hene.” Ji ber ku şiyariya beramberî cinsê xwe li Ewrûpa bihêz e. Divê ku em van qebûl bikin. Niha mînak di jiyana me ya rojane de li Rojhilata Navîn jina herî zêde bêje, ez azad im, lê di jiyana rojane de gelek zêdegavî li ser mafê wê çêdibin, lê pê nahese, dernexistiye zanebûnê.

Lê di Ewrûpa de bi qasî serê derziyê tiştek çêbe herî kêm pê dihese. Ji bo vê hinek tişt divê ku mirov bigire dest. Lê ev şûna komunalîzmê nagire. Şûna hevşêwirandinê nagire, şûna berpirsiyartiya beramberî hev nagire. Mînak hinek tişt hene li Rojhilata Navîn çiqasî sîstem destpot û dejenerbûyî û xerab bûybe jî, lê nikarîbûye meselên wijdanî bikuje. Mirov beramberî hev wijdanî bûne, ji bo vê mînak tevî ku destpotîzm bi hezarê salan serwer e. Kuştin, qirkirin, serjêkirin, lê mirov beramberî mirov heta birêz e. Li Rojhilata Navîn însan nebûye gurê însan, di van sed salên dawiyê de cuda ye, lê însan nebûye gurê însan.

Dema ku mirov bihêz bûye talan nekiriye. Ji xwe re bi rê de yek dîtiye û heman ew nekuştiye. Jinek dîtiye heman ew tecawîz nekiriye. Hêza caydiricî kî ye? Ew ya exlaq e, dewlet li şûna vê hêzê nikare bigire. Bala xwe bidinê di Emerîka de niha ev

statistîkin, ne hema gotinên jixweberin. Di Emerîka de perên dewlet dide polîsan piraniya wan peran însan ji bo ewlekariya xwe pê parazvanên taybet digirin. Wê demê qanûn ewlekariyê çênake.

Qanûn nakeve şûna exlaq, qanûn niha tenê diziyê sucdar neke. Ji lewre me got însan niha li Emerîka perên ku însan bi awayekî xwezayî xerc dikin ji bo girtina nobedaran, ji perên ku dewlet li mûçê polîsan xerc dike zêdetir e. Dema ku dizgînbûna exlaqî beramberî suc tine be, bi polîsan çênabe.

Wê demê sentesbûyîn çi ye, sentezbûyîn hibirdank, yan jî têkelheviya tiştên erênî ye, lê bi zanistî şekil dayînê ye. Tenê çendaniya çendahiyê (nicel karişim) nîne. Ev vêca dibe tiştek nû, dibe şaristaniya demokratîk, dibe modernîta demokratîk. Modernîta ku piratîka wê li ser esasê rêxistinî û zanistiyê ye. Yanî komînal e û pir zanaye. Ew zanebûn, tenê mirov çavkaniya wê Rojhilata Navîn nabîne. Hinek çavkaniya wê Emerîka ye, hinek jê Ewrûpa ye, hinek Çîn e. Ev însaniye, derveyî îrada sîstema pêşketiye. Bi vî rengî mirov bigire dest wê baş dibe.

Dibe ku mirov li ser hinek xalan baş bisekine, baş derbixe pêş, ji ber ku wenda ye. Lewre divê mirov derbixe pêş, ev wiha bi rengê wiha fenatîk parastina tiştên wiha çewt divê nebe. Parastina tiştên şaş divê nebe. Lê girîng e mirov meselê derbixe zanebûnê.

Mînak em dibêjin, Spartekos heye û pîroz e. Şerekî ji bo heq daye meşandin, lê mînak bi dehan tevgerên li dijî koletiyê li Rojhilata Navîn de derketin e. Derbarê wan de em bê agahîne. Mînak tevgera Zenciyan li dijî Abasiyan, tevgera Qermîtî, ya Xurasanî hwd, divê em hêza xwe ya wijdanî ji wan bigirin. Diaya xwe ya têkoşînê ji wan bigirin. Yên Wehdatî Wicud, ev felsefeye, Mewlana ye, Xanî ye, Cizîrî ye, Helacê Mensûr e, Sehrewerdî ye, heta yên weke Xeyam jî, lî gorî min nerînên li ser Xeyam çewt in. Mînak di nav me de jî carekî wiha bi rengekî bêmaf me têgînên çewt pê navê Xeyamgeriyê mehkum dikir, çi têkiliya vê bi Xeyam re heye! Xeyam felsefe ye, îlm e, bîrkariye, astronomiye, Xeyam gelek tiştin.

Xeyam di çaryek xwe de vê dibêje; “Eger wek Xweda rojekî îrade bi dest min ketiba, min ê hemû gerestêrkên heyî ji holê rabikirana, min ê li şûna wan gerestêrkên din çêkiriba bi îrada azad tevbigeriyaban.” Ji vê zêdetir sekinekî radîkal li hemberî sîstemê heye!? Lê ji aliyê sîstemê bi rengê dejenere, ji rê derketî hatine nîşandane, em jî wan wiha dinirxînin, lê ev tiştek wiha rast nîne.

Lewre em dikarin çavkaniyên xwe yên têkoşînê dikarin ji wan bigirin. Programê xwe yê çareseriyê em dikarin ji wan bigirin. Lewre Rêbertî dibêje; “ Ronansasa Rojhilata Navîn rojanekirina Zerdeşt e.” Weke çawa li Ewrûpa dibêjin rojanekirina Roma û Girk, ya me jî rojanekirina Zerdeşt e. Divê êdî em jî rohnayê bidin ser. Rastiyek wê jî heye, lê divê mirov nekeve rewşa parastina şaştiyê. Mirov nekeve rewşên wiha red

kirinê, redgerî mirov dike xefkan, Rêbertî dibêje; Yên ku redgeriya çors dikin, di esas de ne li dijî sîstemê ne, ber deryê wê hinek par dixwaze.” Ji xwe em derveyî wan e, em proje ne, em projek şaristaniyê ne, demokratîk in, ew proje li ser nirxên madî, ezezî, kapîtalîst, endustryalîst na, li ser esasê civaka ekolojîk, ekonomîk, demokratîk û konfederalîzma demokratîkin.

**Nerîna Li Ser Polîtîka Yê**

Bi giranî em li ser gelek aliyan rawestiyan, lê beşê siyasî jî girîngiya xwe heye. Girîngiya vê yek jixwe di xebata me û piratîka me de diyar dibe. Yek jî di derbarê siyastê de Rêbertiya me şîrovên nû pêşxistin. Ji bo vê jî weke têgihêştin; divê careke din em siyasetê di ber çavan re derbas bikin.

Peyva siyasetê bi zimanê Erebî tê bikar anîn. Gelê heremê jî ji Ereban girtine. Mînak Fars, Tirk dibêjin siyaset. Di çaxa Osmaniya de jî peyva siyaset dihate bikaranîn. Ji kevn de jî weke peyva siyaset tê bikaranîn. Ji kevn de ji siyasetê re dibêjin, ji seyîs kirina hespan tê, seyîsa hespan hebûye, yên wan xwedî dikirin wiha digotin wan. Bi vî rengî gotina siyaset hatiye lêkirin. Wê demê weke hunerekî rêvebirinê digirin dest.

Lê bi latînî polîtîka ye. Bi Silavî û Îngilîzî jê re dibêjin polîtîka. Ev peyv çawa hatiye lêkirin? Ev peyv ji bajarvaniyê tê. Polîs, bi zimanê Yewnanî bajare, gotina polîtîka ji bajarvaniyê tê. Hemwate kirine, lê her kes weke polîtîka dide xebitandin. Bi zimanê Tirkî ev pênase siyasetê weke nav tune ye. Kurdan demekî gotinek dixebitandin, lê gotinek zêde cihê xwe negirtiye. Li gorî tarîfa kevn ya siyasetê dibe ku hinekî cih girtibe, lê gotinek tam cih negirtiye. Nebû gotinek tam bersivê bide. Kurdan digotin Konevanî. Kone, weke mirovê jêhatî, wiha çav vekirî, vanî jî kesên ku wî karî dikin. Bi vî rengî digirtin dest, lê gotinek zêde cihê xwe nagirtiye û her kes naxebitîne. Berê Kurdan li şûna peyva siyasetê, ev peyv dixebitandin. Lewra zêde ferq û cudatî tune ye, cudatî tinê ziman e. Di navbera wan de cudatî tune ye.

Siyaset, li gorî danenasîna ev gotin, sîstem û civaka dewletî, desthilatdarî û zanyariya sîstema desthilatdariyê nîşan daye. Di encamê de bi vî rengî dide tarîf kirin. Ev gotin û tarîf di aliyê her kesî/ê de esas hatiye girtin. Lewra bi giranî di dema derbasbûyî de tê gotin, siyasetmedarên wiha bi nav û deng hene. Mînak di sedesala 11-12.de li Îranê de di dema hukmê Selçokiyan de kesekî bi Navê Nîzam Mulk heye, di derbarê siyasetê de gelek tespîtên wî hene. Ew jî kiriye pirtûkek bi navê Siyasetname weşandiye. Bi giranî di derbarê rêvebirina civakê, ji rêvebirinê zêdetir, hukmê civakê ye.

Dîsa di sedsala 16. de Makyavellî, heye, ew bi xwe ji Îtaliye, ji bajarê Îtalya Floransayê ye. Pirtûka wî bi navê Mîr heye. Di wir de ya rastî siyasetê weke zanyariyê digire dest. Zanyariya rêvebirina civakê digire dest. Ew çawa esas digire, mînak, perspektîfên desthilatdariyê derdixîne pêş. Di wê pirtûka xwe de herî zêde van dide pêş. Bi salaye tê wergerandin û derbasî hemû zimanê cîhanê dibe, gelek akademiyên siyasî ji bo xwe wê pirtûkê weke çavkanî digirin dest. Şêwazê rêvebirinê yan jî desthilatdariyê nîşan dide.

Mînak di pirtûkê de wiha tîne ziman, mîr çawa dibe mîr? Çawa serweriya xwe li ser bajarekî dike? Li gorî wê şêwazan ji hevdu cuda dike. Nimûne, eger ew bajar di nav rewşekî demokratîk de be, mecilisên wî bajarî hebin û xwe bi rêve dibin, dema ku tu hukmê wî bajarî bikî şêwazên wê cuda ne. Dema tu hukmê bajarekî di bin siya destpotîzmê de û hukmê motleq de mabe, tê bi rengekî cuda nêzîkbûnan nîşan bidî.

Çawa wê ev bibe? Mînak miletekî di bin serweriyekî dijwar de jiyabe, serê xwe tewandî be, azadî tam ne jiya be, nizanibe azadî çi ye, nizanibe xwe bi rêvebirin çi ye…Ji bo wî gelî tu çawa birêve jî bibî tu dikarî birêve bibî. Heta ji te bê tu dikarî zextê li wî gelî bikî. Ji bo wî gelî cudatî jixwe tune ye.

Lê bajarek bi miclîsan hatibe îdarekirin û wiha heta asta dawiyê girêdayî azadiya xwe be, însanê wî bajarî zanebin, dema ku te serwerî li ser wî bajarî kir, divê wê demê tu hinek tiştan de şiyar bî. Tu wan bi xwe re bikî hevpar. Tu guh bidî meclisê wan, lê na heke ne wiha be bi şêwazê destpot tu nikarî wî bajarê ku azadî team kiribe, îdare bikî.

Heger însanek bav û kalên wî ne mîr bin, lê fermandarek be û pêşketî be û xwe kir mîr wê çawa rêveberiyê bike? Wê demê divê hinek şêwazan pêşbixîne, ew şêwaz çi ne? Arstokratî di wî bajarî de malmezinê di wî bajarî de tesfiye bike û yan jî bike bin parastina xwe, yan wê gelên li wir bêjin; "Em mal mezinin, arstokratin, begin axane, lê ev ê ha kes esilê wî nizane û hatiye bûye mîrê me! Em wî qebûl nakin. Lewra divê bi şêwazina tu wî ji holê rabikî. Di encamê de dema ku êdî bav û kalên te mîr bin, tu jî bibî mîr tê çawa bikî? Bi her awayî rêbaz, rêvebirin û hukmên li ser civakan dide nîşandan. Hedef nîşandana wan bi wî rengî hemû jî şêwazên desthilatdariyê ye.

Li gorî dide nîşandan, hedef desthilatdariye. Ango siyasetê li gorî dide nîşandan, bi gelek şêwazên desthilatdariyê nîşan dide. Yanî şêwazên her cihekî çawa wê bê meşandin nîşan dide. Jixwe tarîfa siyasetê li ser esasê zanyarî û hunera serweriya li ser civakê ye. Ev hemû jî di esas de ji Makyavellî tê girtin. Weke çawa di rêvebirina civakan de gelek îdeolojî pêşdikevin.

Ji sedsaliya 16. yan jî ya 17-18. û heta 19. bi taybetî jî ji 17-18'an û şûnda hîna zêdetir zanyariya siyasetê hate zelal kirin. Lê ev ziraviyên wê di kîjan qonaxê re derBeasbûne, em zêde nayînin ser ziman. Lê sê kesên wiha bi nav û deng di vî derbarê de tevkarî meşandine, em ê li ser wan bisekinin.

Yek ji wan Hobes e, Hobes Înglîz e. Hobes dibêje rêvebirin, divê  motleq be. Di însan de anarşî, dijminatî û xerabî heye. Lewra divê însan nebin hevparên rêveberiyê. Ji bo vê her demê bi hukmê motleq mûnarşî bê birêve birin. Heger demokrasî be, her seriyek dengek jê derbikeve, her yek li gorî daxwaziyên xwe pêşniyarekî wê bikin, wê demê civak nayê birêve birin. Divê rêvebirin motleq be. Qral ji aliyê meclîsan ve, ji aliyê saziyan ve neyên kontrol kirin. Eger bên kontrol kirin nikarin qraltiya xwe bikin. Ji bo vê jî dibêje; divê rêvebirin bi rengekî motleq be.

Piştî Hobes yekî din derdikeve. Bi navê Con Lok. Ew jî Înglîz e, li gorî xwe wiha dibêje, rêvebirin bi rengekî motleq çênabe. Ji ber çi? Di Înglterа de demekî komar çêbû. Piştî komar avabû bersiv neda daxwaz û lêgerînên gelê Îngilîz. Komarekî leşkerî bû, henekî jî dîktatorî be, di serî de şoreşger bû, lê bi demê re ew dawxazî û lêgerînên gelê Înglîz pêkneanî.

Ji bo vê piştî mirin serok komarê Kown Wilbû li Înglterа careke din Înglîz vegeriya sîstema qraliyetê. Lê çi gotin? Gotin divê ev qraliyetî rewa û bi destor be, yanî bi meclîsê bê berdewam kirin. Ev jî dihat vê watê ku qral hebe, lê li gel wî mecilîsek jî hebe, mecilîsekî hilbijartî çêbe. Liv û tevgera qral, rêbazê wî yê hukim li ber çavan re derbas bike destek bidiyê, yan jî dema pêwîst kir erê jî bike! Lê piştî demekî qralê Înglîz hemû otorîte kir destê xwe, mecilîs îptal kir û da aliyekî,  sîstema xwe kir sîstemekî motleq.

Con Lûk, li dijî vê propoganda kir, nivîs nivîsî, bi nivîsên, pirtûk, tespîtên  wî, nerazîbûna gel li hemberî vê qraliyeta mûtleq çêbû. Li ser wî esasî şoreşek wiha bêxwîn derbeyek bêxwîn li dijî qralê Înglîzan di sala 1688'an de pêkhat. Carek din çi kirin destor û makezagon û mecilîs hatin avakirin. Yanî qraliyet careke din çêbû, lê belê qralekî bi destor, ne weke serweriya motleq. Bi vî rengî divê her tiştî neke bin destên xwe. Lewra qraliyeta heyî êdî di hinek cihan de weke sembolîk be.  Ev jî nêrîn Con Lok e, Lok qraliyetê red nake! Lê belê qraliyeta bi meclîsan bê îdarekirin dixwaze. Bala xwe bidinê di nêrînên Con Lok de hukmê gel tune ye. Gel hukim nake, kî hukim dike? Arstokrat, kesên wiha di nava gel de hatine hilbijartin, ew hukim dikin.

Ew kes li şûna gel hukim dikin, lewra mirov nikare bêje ev sîstemekî demokrasiyê ye. Lê ne sîstemekî motleqiyetê ye jî,

rêbazeke, tezeke û nêzîkbûnek siyasî ye. Li ser esasê ku hinek mekanîzma tevgera qralan bê kontrol kirin û di bin venêrînê de bin.

Yê sêyemîn xeta wî çi ye? Jan Jakrûsso ye Fransî ye. Jakrûsso, ew qraliyetê naxwaze û peymana civakî dixwaze. Dibêje: "Divê dewlet bi daxwaziyên gel bê çêkirin." Desthilatdarî li ser esasê daxwaziya gel bêçêkirin. Dema ku desthilatîdar ji daxwaziyên gel dûrketin, ev dibe sedemek destpêkirina şoreşê. Yanî peymana civakî derBeaskir, li ser esasê wê li hevhatina civakî li gorî berjewendiyên gel pêknehat, wê demê dibe sedema şoreşê. Ev demokrasiye, peymanan civakî hilbijartina rasterast ji aliyê gel ve çêdibe. Desthilatdarî peyda dibin û ew desthilatdariyana li ser esasê perspektîfên ji gel girtine bi rê ve dibin. Dema ji wan perspektîfan dûrdikevin, yanî dema peymana civakî xerab dibin ew dibe sedemek şoreşê.

Can Cakros, Volter, ev kesana nêzîkbûna wan ji edaletê re, ji siyasetê re, demokrasiyê û peymana civakî re, van zemîn ji şoreşa Fransa re vekir. Di aliyê ruhî û fikrî de zemîn ji ku peyda kirin, ji şoreşa Fransî re peyda kirin. Lê ev hemû siyasetê weke zanistekî, hunerekî, hukmê li ser civakan digirin dest, bi gelemperî ev nêrînên wan in.

Niha em rû bi rû yê tarîfekî nû ji siyasetê re ne. Rêbertiya me çi dibêje? Dibêje: "Siyaset bi bajar ve girêdayî nîne. Navê wê polîtîka ye, polîtîka jî ji gotinek Yewnanî ye, bi bajarbûnê ve girêdaye. Lewra teqez bi bajar ve girêdayî nîne." Yanî siyaset bi bajarbûyînê re derneketiye. Ji ber çi? Rêbertî sîstema şaristaniyê ya desthilatdarî bi vê ve girêdide. "Desthilatdarî ew sîstema bi bajêr hatiye dayîn, bi parçebûna çînî pêkhatiye, bi dewletê ve tê rêvebirîn û îdarekirin. Siyaset dema bi bajar ve tê girêdan di heman demê de tê wateya dewletê û desthilatdariyê. Lê Rêbertî dibêj: "Qet bi gotina polîs ve têkiliya wê tune ye." Yanî siyaset qet ne gotinek bajarbûyînê ye, ne mijarekî desthilatdariyê ye û polîs bûyînê ye. Siyaset ne karê dewletê ye. Dewlet tenê îdare dike, lê siyasetê nake. Lewra siyaset têgihêştinek civakî ye.

### Polîtîka Civaka Xwe Bi Rê Ve Birine

Siyaset çi ye? Civaka ku xwe bi rê ve dibe, ew civakek xwedî polîtîkayekî rastin. Ne civaka ku desthilatîdar li ser serê wê heye. Siyaset civaka xwe bi rê ve dibe, wê demê siyaset berî dewletê hebû ye. Berê nêzîkbûna me ji siyasetê re ev bû; me siyaset weke dewlet diyar fêm dikir. Me digot em têkoşînekî siyasî dikin. Têkoşîna siyasî çi ye? Yanî têkoşîna bi armanca dewletbûyînê ve girêdayî ye. Ji bo em bibin dewlet, me têkoşîn dikir. Di nav karkeran de tiştekî wiha hebû digotin: "Filan kom tevlî têkoşînekî

sendîkayî dibe, ew têkoşîn ne baş e. Em têkoşînekî siyasî dikin, em desthilatdariyê dikin, em dewletê hedef dikin. Ew siyasî ne, ev sendîkavan in, ji bo hinek mafên bisînor kar dikin. Yanî têkoşîna siyasî mana wê têkoşîna dewletbûyînê bû. Herwiha dewlet û siyaset hemwate bûn. Lê Rêbertiya me dibêje: "Na, dewlet siyasetê nake. Dewlet îdare dike û desthilatdariyê dimeşîne."

Siyaset rêvebirina civakê ye, civaka ku bi xwe, xwe rê ve dibe, ew civak siyasetê bi awayekî rast bikar tîne. Wê demê divê em siyasetê bi vî rengî nas bikin. Lewra em dibêjin civaka exlaqî û polîtîk. Exlaq kirina tiştên herî baştirîn e, siyaset peydakirina wan tiştan bi xwe ye.

Siyaset ew tiştên ji desthilatdariyê, mijûkdariyê û ji çînbûyînê dûr e. Wê demê di vir de li gorî Rêbertiya me siyaset û dewlet ti têkiliya wan bi hev re tune ye! Tam barovajiyê vê bi dewletbûyînê siyaset ji holê radibe. Ji ber ku lewaz dibe, lewra siyaset civaka xwe bi rê ve dibe, dewlet desthilatdariyê dike.

Dema ku dewlet çêdibe, civaka ku xwe bi rê ve dibir ji holê radibe. Ji ber ku beriya dewletê jî civakê xwe bi xwe rê ve dibir hebû. Bi pîvan û qanûnên xwe yên exlaqî xwe bi rê ve dibir. Dewlet hat û ew ji holê rakir. Wê demê siyaset ne desthilatdariye û ne jî dewlet e. Siyaset xwe bi rê ve birina cavakê ye.

Siyaset ji bo civakê bi çi ve mijûl dibe? Siyaset bi peyda kirina pêdiviyên jiyanê ve mijûl dibe. Çi ne ew pêdiviyên jiyanê? Ewlekarî, bicîh bûyîn, xurek, terbiyekirina zarokan e. Yanî zêdebûne, siyaset nêvenga vê peyda dike. pêwîst e siyaset civaka xwe biparêze, karibe xwe têr bike, heger nêveng baş be, peydakirina jiyanê pêkbîne. Civaka ku xwe birêxistin bike, yanî wan pêdiviyên jiyanî peyda dike. Peydakirina wan erk û peywira siyasetê ye. Ew pêdiviyên civakê jî perwerde, parastin û tendurûstî ne. Lê dewlet tam berovajiyê vê dike. Dewlet pêdiviyên jiyanê peyda nake.

Dema em vê dibêjin yek dikare bêje; lê belê dewleta Suwêd, dewleta Siwîsra… ev dewletana wê demê çi dikin? Rast e, ew hinek tiştan dikin. Lê tiştê dikin çawa dikin? Bi zor û heftbeleyan çêbûye. Ji ber ku gelan têkoşîn kiriye, kuştin dîtine, desthilatdaran jî bawer kirine ku êdî bi vî rengî nema dikarin bimeşin, lewra dikarin bi hinek pêdiviyên civakê yên jiyanî peyda bikin. Hinek tendurûstî, perwerde, lê di bingeh de hemû pêdiviyên jiyanî yên civakê peyda nakin. Dewlet ji bo xwe dijî, desthilatdare, amûrekî serwerkirinê ye. Çînekî temsîl dike, ew jî çîna sermayedariyê temsîl dike.

Mînak, di sala 2008-2009'an de di cîhana sermayedar de, salên krîzê bûn. Krîz çima çêbû? Krîz wan bi xwe çêkir, bêplanî,

yanî hilberîna sermayedarî ji ber ku pêdiviyên civakî esas negirtin, li şûna w çi esas girtin? Kar û qezenca xwe esas girtin, ji bo vê bêtewazînî di hilberînê de çêbû. Hêza kirînê li gel însanan lewaz bû, danaserhevekî mezin çêbû, ev bû sedema krîz û îflasê.

Em bala xwe bidinê sermayedaran bi xwe ev tişt kirin. Di qasa Emerîka, Almaniya, Fransa, Japoniya de jî perên zêde hene. Ew pere ti carî ji bo tendurûstî, perwerde û ji bo van tiştana nehat xerckirin. Lê dema sîstem kete nava krîzê, me lê temaşe kir ku xezîna boça dewletê kasên xwe vekirin, bi sedmilyon dolaran, heta cihên weke Japonya bi trilyonan dolar, li Emerîka trilyonan dolar çi kirin? Pere pûmpe kirin ji bo ku sermayedar li ser piyan bisekinin û têk neçin, bi vî rengî nehêlin ku sîstem birûxe. Wê demê ev dewlet ne ji bo parastina gel e. Ji bo parastina çîna serdest kar dike. Wê demê dewlet ne gelê xwe bi rêve dibe, dewlet wesayete, dagirkere, serweriyê çêdike. Ji bo vê ne siyaset e, lê dagirkeriye.

Siyaset civaka xwe bi rê ve dibe, siyaset divê bi çi ve mijûl bibe? Divê bi peydakirina pêdiviyên jiyanî yên civakê, tendurûstî, ewlekarî, perwerde, xwedîkirin û têrkirinê ve mijûl bibe. Divê bi yên civakê ve mijûl bibe. Wê demê dibe siyaset. Siyaset peydakirina tiştê baş e. Dewlet tiştê baş peyda nake, dewlet bi giranî wê çawa gelan kontrol bike, çawa mêjiyê gelan vala bike, bi wan re mijûl dibe. Da ku civakê ji îdolojiyê dûr bikin. Ev hemû jî ji bo gel bikin zemînekî wiha bêfikir de û ji bo têgihêştina kapîtalêzmê ya xerckirinê re bikin zemîn. Lewma mirovan ji dîmenê wan yê îdeolojîk mehrûm dihêlin,  bi wan re ajoyan û daxwazên madî pêşdixîn, pê re jî xerckirin û xerckarî pêşdikeve.

Li şûna ku mirov êş û elemên xwe derman bikin, însan li dûv modelan dikevin. Êdî însan dest bi xerckariyê dike. Ev êdî bi rengekî dirinde pêşdikeve. Dewlet vê dike, ev ne siyaset e. Lewra girîng e em careke din siyasetê li ber çavan re derbas bikin. Siyaseta rizgariya netewa demokratîk siyasetek cuda ye. Siyaset desthilatdarî, dewletbûyîn nîne, siyaseta civaka xwe bi rê ve dibe, mirov dikare jê re bêje siyaset. Lewra bala xwe bidinê em niha têkoşînekî cidî di xebatên siyasî de didin meşandin.

### Polîtîka Demokratîk Ne Desthilatdarî Ye

Mînak, tevlîbûna xebata siyasî li ser çi esasî çêdibe? Hinek kesayet weke çawa bibin rêvebir, çawa bibe serokê şaredariyê, çawa bibe wekîlê gel, nêzîkbûna kesayetên wiha ji bo vê pêşdikeve. Ev nêzîkbûn perspektîfên desthilatdariyê ne, ne yê demokrasiyê ne.

Siyaseta demokratîk çi ye? Siyaseta, ji lîstik, xapandin, derew, desthilatdarî, dizî, ji van hemûyan û madiyetê hatibe safî kirin.

Siyaseta li ser esasê rêxistinkirin û rêvebirina civakê ye. Peyda kirina pêdiviyên bingehîn yên civakê ye. Lê em bala xwe bidinê hîna jî di siyasetmedarên me de, ew têgihêştin nehatiye çandin. Hinek pêkhatinên dewletê li ser civakê pêktên, siyastmendarên me li hemberî wan bêdeng dimînin, heta ku Rêbertiya me şiyariyê dike, nû diçin û dikevin nav liv û tevgerê. Ev tê çi wateyê? Siyaseta demokratîk baş nehatiye qebûlkirin û fêm kirin.

Siyaseta demokratîk girtina erkan nîne, sewerî û desthilatî nîne, mûçe nîne, cîhawazî nîne, cihekî cuda jî nade mirov, ev hemû nînin. Siyaseta demokratîk parçeyek ji civakê ye. Ji bo wê jî vê carê Rêbertiyê çi got: “Ev parlementer li Enkarê çi dikin? karê wan li Enqerê tune ye, bila biçin nava gel.” Siyaseta demokratîk ya di nava gel de ye. Siyaseta ku bi desthilatdariyê re endaze dibe, li peytextan disekine, divê mirov ji vê gelekî dûr bikeve! Siyaset bi xwe elaqederbûyîne. Lewra têkgihêştina me ya siyasî, girîng e xwe bi demokrasiyê têr bike. Ji desthilatdariyê dûr be. Ji madiyetgeriyê, serweriyê û ji berjewendiyan dûr be, bi vî rengî demokrasî wê ji bo gel bixebite. Gelê xwe zane dike, xwe bi rê ve dibe, dikare pêdiviyên xwe yên jiyanî bi xwe peyda bike, siyaseta demokratîk vê rêkê nîşanî gel dide.

Li dorberê siyastê elaqeya me lewaz e. Di van aliyan de divê em xwe bihêz bikin. Em van pirsgirêkan derbas bikin, ji bo vê em rewşa siyasî, nirxandina desthilatdariyê û şêwazê ku desthilatîdar gelan bê îrade dikin, bizanin. Em di ferqa vê de bin ka wê ev gel çawa xwe temsîl bike? Divê li ser van em baş têkildar bin û li ser bisekinin. Mînak, dirûvê desthilatdariyê li Îranê çi ye, gelek hevalên me nizanin. Nasnameya wê dewletê ya îdeolojîk çi ye? Şêwazên wê yên desthilatdariyê çi ne? Saziyên ku tê de serweriyê dikin çi ne? Dîndar çi rolê dileyîzin? Yên ku tên hilbijartin çi rolê dileyîzin? Ferq û cudatiya van saziyan çi ye? Di vê derbarê de em zêde ne têkeldar in.

Desthilatî di Tirkiyê de çi ye? Pala xwe dide kîjan çîna civakê? Şêwazên wê yên desthilatdariyê çi ne? Îslama siyasî tê çi manê? Li ser van şîrovên me tine ne. Lê ya rastî ev şêwazên dijmin hemû gelê me bindest dihêlin.

Siyaseta demokratîk tê çi manê? Avakirina mecilîsan, derxistina temsîlgerên gel, wê karê temsîgerê gel çi be? Wê çawa kar bikin, me şêwazê wan ên xebatê wê çi be? Wê bi kîjan rengî ji teqlîda desthilatdariyê xwe dûr bihêlin? Li ser van divê em bi giranî mijûl bibin.

Siyaset qadekî berfirehe, tê de mirov dîplomasî digire dest. Yanî têkiliyan tê bi kê re çêbikî, têkiliyên stratejîk, taktîkî, xwedî prensîb, di hundirê van têkiliyan de tê çi bikî, yên beramber wê ji

bo te çi bikin? siyaseta derve çi ye, ya hundir çi ye? Siyaseta derve û hundir wê çawa hev temam bikin? Beriya her tiştî siyasetmendar çi jê tê xwestin? Siyasetmedar ew kesayete ku karibe derfet û hêza heyî bi rengekî têkûz, bi şarezayiyekî mezin bi rêxistin bike û bike xizmeta çareserkirina pirsgirêkên gelm xwe de. Siyasetmedar ew kesayet e ku dizane wê ji bo gelê xwe çi biafirîne.

Ji bo Kurdistanê kesayeta siyasetmedar kî ye? Derfetên gelê Kurd çi ne? Derfetên gelê Kurd erdnîgariya wî ye, niştîchên wî ne, yên ciwan in, jin e, derfetên madî û manewî, bi gelemperî çandekî vî gelî heye û ev hemû hêzeke. Lê belê ev hêza ha niha wer nakeve xizmeta gel de. Lê siyasetmendar çi dike? Ew kese ku van hêzan û hemû derfetên heyî bi rengekî têkûz û jêhatî, şiyar, xuliqkar, baş birêxistin dike û kanalîzeyî berjewendiyên vî gelî dike. Yanî pirsgirêkên wî çareser bike. Pê asta têkoşînê bilind û rêxistinîbûna hundirîn temam bike, hêza rêvebirinê pêşbixîne, di aliyê ekonomî de projan pêşbixîne. Di aliyê civakî de projeyan pêşbixîne. Siyasetmedar kesayetek wiha ye.

Lê gelo van tiştên me gotî di piratîka xwe de em çiqasî pêktînin? Ya rastî di çalakiya me de pêkanîn pir lewaz e, Derfet û hêza ku di Kurdistanê de heger siyasetmedarên berpirsiyar derbikevin pêş, wê karibin di demekî kurt de bi rengekî zane û şiyar wan derfetan bikin xizmeta doza Kurd de. Niha hinek potansyel di Kurdistanê de hene em dibînin. Mînak îslama nerm ji bo xwe hedef digirin, dewletê ji bo xwe hedef digirin.

Ev lewazbûn di siyaseta li Kurdistanê de heye. Dijminê me hêza di welatê me de li dijî me bikar tîne. Enerjiya di welatê me de li dijî me dixebitîne. Di encamê de dema em siyaseta civakê nîqaş dikin, em dikarin bigihêjin baweriyekî bi vî rengî!

Hedef û armancên me yên herî baştirîn, nirx baştirîn çiqasî giranbiha dibin bila bibin, çiqasî têkûz dibin bila bibin, eger bi xetekî siyasî neyên temam kirin, wê tenê di warê xeyalên xweş de bimînin. Wê zêde nirxekî wan jî tine be. Lewra eger xwe bi xetekî siyasî temam nekir tenê wê her tiştê me bibin weke xewnekî. Eger ev xeta siyasî jî bi plan û bername nebû, xwe bi taktîk û stratejî temam nekir, ew jî tenê dimîne weke projeyekî ku nayê pêkanîn. Ango projeyek ku şensê wê yê pêkanînê tune be. Wê demê divê plan, bername, taktîk û stratejiya me hebe. Tenê em dixwazin xwe bi rê ve bibin, lê wiha çênabe, divê em xwe derbasî piratîkê jî bikin. Di çarçoveya plan û bernameyan de kar û xebatê bikin. Em hemû karên xwe birêxistin bikin. Eger me got birêvebirin, wê demê rêvebirin çi ye? Rêxistina wê çi ye? Birêxistinkirina wê mecilîs e, komîn e, koparatîf e, mîtîng in,

serhildanin, şerê parastina rewa ye, divê ev hemû bên diyar kirin. Wisa û bi vê nêzîkbûnê em ê bigihîjin armanc û edefên xwe.

Divê plan û bernameyên polîkayê hebin. Wê demê siyaset rasteqînî dibe. Heke îdeolojî û siyaset, bi plan û bername bin, lê eger bihêzekî pêkanînê neyên temam kirin vala ye. Hêza pêkanînê kê ye? Kadro ye, divê bi vê hêza pêkanînê temam bibe. Kadroyên ku îdeolojî qebûl kiriye, siyaset qebûl kiriye, xwe kiriye parçeyek jê, bêqeyd û bêşert, bê dudilî, li ku dibe bila bibe di oxira wê de xwîna xwe jî bide hazir û amade be. Ji bo pêkanîna hemû karan amade be.

Pêwîst e ew kadroyê wiha zelal û safî be, bê pirsgirêk, bê dudilî, milîtanê dozê be. Bi wê mirov dikar bêje wê temam bibe. Ji bo vê sekinandina li ser kadro û peydakirina kadro, zelal û safî kirina kadro, kadro di aliyekî de berfireh hiştin jî girîng e. Kadro pir alî be, komple be, karibe hilberînê bike. Ev karê bingehînin, di wî aliyê de divê zelalî çêbibe.

Eger di xebata me de ew taybetmendiyên kadro zelalbûn, wê demê siyaset plan û bernamên me wê bikevin jiyanê. Bê wan wê nikaribin şensê xwe yê jiyanê bibînin. Em bala xwe bidinê dewlet çi dike? Kadro dike hedef û digire, bi sedan kadro digire û dike zindanê. Ji bo çi wiha dike? Ji bo ku sûda pêkanîna xeta me ya îdeolojîk, siyasî, plan û bernameya me di jiyanê de pêkneyên. Ji rikê dewletê re be jî divê em çi bikin? Divê di çêkirina kadro de em jî bi îsrar bin. Akademiyên siyasî û zemînên perwerdê hemû ji bo vê ye. Ev kadro jî bi îdeolojî û xeta siyaseta vê rêxistinê divê xwe bi cih bike.

Ji lewre pêwîstî bi zelalî, bê dudilî, mirov nehêle kes bi nirxên gel û têkoşîna wî bileyîze. Divê em di navbera xwe û sîstemê de sînoran diyar bikin. Bi rengekî radîkal li hemberî sistemê di nava têkoşînê de bin. Kadroyên wiha ji bo têkoşînê pêwîst in. Ew kadroyê ku bi şêwazê xwe yê jiyanê li gorî sîstemê bijîn, lê bi çalakiyên xwe yên siyasî li dijî wê sîstemê bin, ev kadro nabe kadroyê tevgera azadiyê. Divê xwe ji sîstemê qut kiribe û têkoşînek radîkal ji bo xwe hilbijartibe, ev esas bê girtin. Bi vî rengî mirov dikare xeta siyasî û îdeolojîk derbasî jiyanê bike.

Têkoşîna me lewaze û hîna jî em negihaştine astekî radîkal. Ji kongira dehemîn û şûnda hinek şêwazê me yê têkoşînê hatiye guhertin. Em nikarin bêjin weke beriya kongirê ye. Piştî kongirê platformên kadro çêbûn, konfiransê kadro çêbûn û yên saziyan jî çêbûn. Me ev zêdegavî mehkûm kirine, heta di aliyê fîzîkî de jî hinek kes me ji nav xwe derxistin. Yên ku nedihatin xetê li ser ya xwe israr dikirin. Ji bo vê em dikarin bêjin kongira dehan qonaxekî nû ye. Ji bo têkoşînê û zelalkirina hundirê rêxistinê bi

xwe re pêşxist. Lê hina jî têrê nake û hîna jî zêdegavî hene. Bi taybetî jî di gelek qadan de pirsgirêk hene.

Taybetmendiyên Rêbertiya me hene, ew jî xwe ji sîstemê bi temamî qut kiriye. Rêbertî kesayetek serbixwe ye. Lewra tiştê dibîne em nikarin bibînin. Ji be çi, me hîna tam xwe ji sîstemê qut nekiriye. Di vê çarçoveyê de nirxandinên me, di bingeh de cewherê qutbûna me ji serokatiyê diyar dike. Mesafa di nabera me û Rêbertiyê de ev e.

Ger Rêbertî behsa demokrasî, federalîzmê, komînalîzmê, civakbûyînê, ferdiyetê, desthilatdariyê, miliyetparêziyê, şîdetê û jidil de nêzîkbûnê dike, li hemberî wê alternatîfa xwe tîne ziman. Lewra bi xeteriyan dihese, şaşitiyan zû dibîne û zû bi ser de diçe. Lê ji ber ku hîna lewaziyên me hene, me xwe ji kevneparestiyan nekiriye, weke Rêbertî dixwaze em hîna jî li hemberî xeta xwe ya siyasî ne hesas in. Lê Rêbertî hesas e, bêguman heta ji me bê divê em wê hevaltiya kêm mehkûm bikin û hevaltiyekî rast bi Rêbertiyê re bijîn. Derbarê têgihêştinên rêxistinê de bi taybetî jî ew mesafa di navbera xwe û Rêbertiyê de em rabikin. Da ku em bi xeta xwe ya siyasî re karibin pirsgirêkên xwe çareser bikin, bibin xwediyê projek herêmî û civakî, beriya her tiştî xwe avakirin.

Lewra rast e Rêbertî timî şiyariyan dike, hinek tişt hene divê em bikin lê Rêbertî dike. Ev jî kêmasiyên cidî ne. Dibe ku pêşengên me hebin, bi siyaseta xwe em modernîta kapîtalîst bi awayekî radîkal bikin mijar rexnê. Lê di serî de em ê li ser kêmkurtiyên xwe rawestin. Dema ku mirov nikaribin fikirên xwe baş naparêzin, wê demê baweriya wan lewaz e. Pêwîst e em baweriya xwe bi hêza xwe ya îdeolojî, siyasî, civakî û herêmî ronîdar bikin.

### Serdema Îslamiyetê Û Avabûna Împeratoriyan

Dema ku em dibêjin Rojhilata Navîn gelek netew, dîn, mezheb, dewlet û sîstemên siyasî em tînin ziman. Lê ev sîstemên siyasî çawa çêbûn, çima çêbûn; di çêbûna wan de çi encam bi xwe re anîn? Di roja me ya îro de bandora van perçebûnan, ev rengê siyasî li ser civakê çi ye, em ê li ser van mijaran rawestin. Ji bo vê di vê dersê de em ê wiha wan sîstemên wiha xwedî bandorek herêmî, yan jî her demê di nava hawildanekî de bin ku bibin hêzên herêmî. Em ê bi taybetî li ser van rawestin

Bi taybetî Îran, Tirkiyê, dewletên Ereban, dîsa di derbarê kesên wiha di nava lêgerînên azadiyê de ne, rû bi rû tinekirin, îmha kirin û asîmlekirinê re dimînin. Li ser van em ê rawestin bi taybetî jî li ser Kurdan. Lê belê beriya wê wiha bi rengekî dîrokî, yanî xalên ku tê de şikandin dest pê dike, xalên ku tê de lewazê li Rojhilata Navîn dest pê dike û serdema ku Rojhilata Navîn

însiyatîfê wenda dike. Weke navend na, weke ya xwe be na, di aliyê hêza xwe ya siyasî eskerî û ronakbîrî de, gav bi gav van taybetmendiyana wenda dike. Ber bi rewşekî cuda ve diçe. Rewşa ku wer li benda alemê ye, di bin bandora alemê de ye. Pêvajoya wiha dest pê kir, bi taybetî jî heta şerê cîhanê yê yekemîn li ser wê bi xetên stor be jî, bi rengê cewherî be jî mirov li ser raweste wê baş dibe.

Niha bi Îslamiyetê careke din li Rojhilata Navîn navendên împeratoriyan çêbûne. Ev di serdema xwe ya herî berfireh û bihêz de Umewî, di pişt re Abasî. Lê belê di serdema Abasiyan de bi taybetî jî di sedesala dehemîn de, êdî ev rengê împeratoriyê, yan jî ev rengê împeratoriyê, bi awayekî çakak, bihêz û serwer rol wenda kirin.

Sedemên rol wendakirinê bêguman sedemên hundirîn hene, yek ji wan xalên zanistiyê, tevgerên wijdanî, komulabûnê hatin ziman. Agno kelecan ruh, wenda kir, ew tiştên ku hêvî didan însanan wenda kir, bi însanan re kelecan çêdikir, hêviya xelasiyê li gel wan peyda dikir in, yê ku dînê îlamê pêşkêş dikirin, di kesayeta împeratoriya Abasiyan de, bi taybetî di dirûvê desthilatiyê yê ku li ser esasê desthilatiyê, di cih cihna de komplo, antirîka, îxanetê de, ev hêvî şikestin. Li ser vî esasî hêzekî wiha hevgirtî, karibe li hemberî êrîşên derve li ber xwe bide, hêzekî siyasî leşkerî bi hêz na, gav bi gav hêzekî perçebûyî, car caran jî serbixwe na, di bin desthilatiya hêzên din de dijiya. Bi tabetî jî sedsala dehan û şûnda, bandora qewmên Tirik ên ku hatin herêmê bi taybetî jî Selçoqî, pir li ser împeratoriya Abasî çêbû.

Împeratorî di çalakiyê de di fermiyetê de hebûy, lê di piratîkê de serweriya Tirkan li ser bihêz bûye. Di desthilatiyê de cih girtibûn, li ser wê serwer bûn, xelîfên bi ya wan dikir diman, xelîfên bi ya wan nedikir bi rengên cuda cuda ew ji holê radikirin. Li ser wî esasî bi taybetî jî di dema ku şerê Melazgirtê de, li hemberî Roma bi ser ketin, hema bêje bandora xwe li ser herêmê û navendên desthilatiyê Bexdad, Îran, gav bi gav jî ber bi Anatolyayê ve meşiya ye û bandora xwe li ser desthilatiyê çêkirin.

Ji lewre ev rewş rewşa perçebûnê ye, mirov dikare bêje rewşa lewazbûnê, parçebûnê cilz bûnê ye. Lê belê dîrok tiştekî wiha nîne. Dema em dîroka civakan digirin dest, wer bi rengê serdemên bi temamî ji hev qutbûyî ji hev cuda, ev xelas bû yek din dest pê kir, bi vî rengî em nikarin dîrokê bigirin dest.

Ji bo fêm kirinê, di encamê de dîrok jî îlmeke, ji bo fêm kirinê mirov hinek tiştan parçe parçe digire dest. Mînak mirov milê leşkerî parçe digire dest, milê siyasî mirov digire dest ê civakî, çandî, zaniyarî, mirov cuda cuda digire dest. Lê belê ev hemû jî cuda cuda nemeşiyan. Weke çawa dema dîroka Ewrûpa jî em dixwîn in, dîroka Ewrûpa ya nû em behsa ronansasê, reformansyoê, ronakbîriyê dikin, ev sê tiştên bê hev nemeşiyan e. Yanî heta filan salê ronansas, jê û bi şûnda raformasyon, paşê

ronakbîrî, wiha nîne. Lê belê da ku bê fêm kirin, ji hev tên cuda kirin. Lê gelek caran ev serdem bi hev re meşiyane, vê carê pareler bi van re serûbinhevbûnek siyasî û leşkerî ya mezin di hemû parzemînan de heye.

Çêbûna împeratoriyan, hilweşandina wan, çêbûna dewletan, hilweşandina dewletan, ev çêbûne. Li Rojhilata Navîn jî wiha ye. Rast e, Abasî lewaz e, lê belê bi tamamî ji holê ranabe. Xelîfeye, Navende, rû bi rû beramberî êrîşên Tirkan dimîne. Rû bi rûyê Muxulan dimîne. Ji milê din ve jî rû bi rû êrîşê milê rojava bi taybetî jî aliyê Misrê, Filistîn, Sûriyê, di van aliyan de jî bi êrîşên çi re rû bi rû dimîne? Bi êrîşên Xaçperestan, yên ji Ewrûpa re dimînin.

**Li Rojava Lêgerîn Û Pêşketina Yektiyê**

Ji lewre Ewrûpa di sedsaliya dehan û şûnda, yanî dema ku wiha împeratoriya Abasî di Rojhilata Navîn de lewazbûnê dijî, di Ewrûpa de livek çêdibe. Ev liv çi ye, dewlemendiyekî peyda dike. Bi rengekî berfireh seneata hesin pêş dikeve. Bi hesin, gîsnê giran, ev tiştên he pêş dikevin û li ser wi esasî bandora wê li zîraetê dibe, li erd zêde bi berhem dibe.

Ev bandorê li ser Lordan dike, bandorê li ser sîstema lordan dike. Hilberîn zêde dibe, dema hilberîn zêde dibe bi zêdebûna hilberînê dewlemendî, halxweşî, bilindbûna asta xweşiyê, kombûna nirxên madî zêde, ev hemû dibin sersebebê ku di sîstema siyasî de jî guhertin çêbibe. Serdema şovaliya ye, dema ku dewlemendî çêdibe, xeteriyên talanê pêş dikevin, ji bo ku ew xeteriyên he berteraf bibin, leşkerên prefesonal derdikevin pêş. Siwarî, yanî şovaliya, her lordek piştî wê dewlemendiyê êdî weke berê nema dikare bi tena xwe bijî, ji bo vê jî lêgerîna kombûyînê û yektiyê pêş dikeve.

Li Îngeltera lêgerîna yektiyê, li Fransa lêgerîna yetiyê, li gelek welatên din jî lêgerinên yektiyê pêş dikevin. Ev jî ji ber ku êdî her lordek nema dikare bi tena xwe xwe biparêze. Gav bi gav dewletên wiha homojen yên bi ala xwe, zimanê xwe, bi qiralê xwe yên mezin çêdibin, ev bi gelemperî rewşekî nû di aliyê leşkerî û siyasî de derdixe holê. Herwiha mezinbûnekî û giraniyekî çêdike. Lê Ewrûpa dîsa jî hêza desthilatiyê ya serekî tê de kilîsa Katolîk e. Ya ku di roja me ya îro de jî navenda wê li Îtalya ye, li cihekî jê re dibêjin Vatîkan, weke serkêşiya ruhî ya hemû Xiristiyanên cîhanê yên Katolîk dike, ne hemû Xiristiyanan ên katolîk tenê dike.

Wê demê kilîsa katolîk li Ewrûpa bi tena xwe hêza hakimiyetê bû. Berê lord girêdayî wê bûn, bac didan, leşker jê re pêwîst ba didan, vê carê dewlet bûn girêdayî wê. Yanî dewletên mezin, weke Îngeltera, Fransa, Holenda, li Ewrûpa dewletên din jî di Ewrûpa de girêdayî kilîsê ne.

Dewletin, lê bacê (vergi) didin kilîsê, leşkeran didin kilîsê, rêbarzê wan ê rêveberiyê hikum jî bin kontrola kilîsê de ye. Di heman demê de kilîse çi ye, hinekî jî desthilatiyê kontrol jî dike. Ji bo vê qiralê ku ji hikumê kilîsê derbiketiba kilîsê çi biryar dijî wî

bidaba afaroz jî bikiriba, yanî heger hikmê wî rewa nekiriba, nema dikarîbû hikumê wî berdewam bikiriba. Bivênevê wê berdaba, yan jî kilîsê gel li hemberî derbixist. Yanî serwerê dunyewî (sekuler) û exretî jî kilîse bû. Kilîse hem serwerê axretê bû, ji ber ku mafê wê yê afrozkirinê hebû.

Mînak yekê gotinek nebaş kiriba, tiştek bigotiba bi taybetî jî derbarê îlmî de li gorî kilîsê nebûna, kilîsê ew ji dîn diavêt. Yanî hem serwerê ruhê însan bû, hem jî serwerê dunyawî bû. Weke dewleta Ewrûpa bû.

Dema ku ev hêz di Ewrûpa de di sedsaliya 10-11'an de bi taybetî ev hêz çêbû, kilîsê xwest hîna zêdetir bandora xwe berfireh bike. Li ku wê bandora xwe berfireh bike, ji xwe re Rojhilata Navîn hedef girt. Ji ber çi Rojhilata Navîn? Ji ber ku Rojhilata Navîn navenda împeratoriyekî ye, împeratoriya Abasiya. Lê lewaz e, hinekî nexweş ketiye ev yek e.

Ya duyemîn Rojhilata Navîn çavkaniya gelek tiştan e. Dema ku em van tiştan dinirxînin, divê ku em bi çavên di roja me ya îro de lê temaş nekin. Em bi çavên roja xwe ya îro lê temaş bikin em nikarin tesewir bikin. Ji ber ku dema yek pirsekî wiha bike û bêje "Gelo ma Ewrûpa wê çaxê çi ji Rojhilata Navîn dixwaze." Ger li gorî roja me ya îro ewqasî dewlemend, zane, wê çi ji Rojhilata Navîn bixwaze. Lê wê demê ne wiha ye, wê demê tam berovajiye, di aliyê siyasî, leşkerî, çandî, zanyarî, asta jiyanê, şêwazê jiyanê, Rojhilata Navîn li pêş e. Pirsgirêkên beslemê tine ne. Xwarin vexwarinê tine, birçîbûn tine, zanebûn heye, pirtûkxanên pir mezin û binav û deng hene. Pirtûkxana Îskenderiyê, ya Bexdad, yên cuda cuda yên bi nav û deng hene. Dibistan hene, tenê dibistanên dînî nînin, ên îlmî jî hene, yê kîmya, bîrkarî, biyolojî û gelek tiştên din jî ders tên dayîn.

Dibistanên pir bi bandor in, heta roja me ya îro jî bermahiyê wan hîna heye. Li Misrê, Şamê, Bexdad hîna jî hene. Ev tiştên he hemû hene, hem di aliyê îlmî de, hem jî di aliyê asta jiyanê de, dewlemendiyekî di aliyê şêwazê jiyanê heye. Niha em dibêjin teqlîdkirina Ewrûpa em dikin, mînak di hine mijaran de bi taybetî jî mijara paqijiyê, tam tiştekî wiha nebû, tam berovajiyê vê bû. Şêwazê jiyana Rojava bi taybetî di aliyê pakbûnê de, displîna jiyanê de xwarin û vexwarin de, cihê lê dijîn, ya Rojhilat bi temamî ji hev cuda bûn. Di ya Rojhilat de binesazî (altyapı) hebû, di bajaran de, di avakirina bajaran de, çêkirina malan de, ev mesele dihatin dest girtin, bi baldarî nêzîkbûn ev mesele dihatin dest girtin.

Ev Tiştên li Rojhilat li pêş, li Rojava zêde ne li pêş bû. Ji lewre dewlemendiyek di vir de heye. Niha Ewrûpa bi ser hev de tê, xurt dibe, di aliyê leşkerî de bihêz dibe, artêş çêdibin, dewletên homojen yek al êdî çêdibin. Ev hemû girêdayî kilîsê ne, wê çaxê ev lêgerîn derdiket; ango kombûnek, xurtbûnek di aliyê leşkerî de, ev wê bi ku de biçe, tabî ber bi Rojhilata Navîn ve wê biçe.

Armanc talan e, divê ku mirov vê ji bîr neke. Lê her şerek sedemên wê hene. Hine sedem diyar in, li ber çava ne, hinek sedem neyekser in, di bingeh de sedemên neyekser girîng in. Sedemên neyekser talan kirine, yanî yê dem dirêj çi ye, qadeke tê de dewlemendî heye, Ewrûpa bi ser xwe ve tê, dixwaze bibe hêzeke hegemon, dest deyîne ser rêkên tîcaretê, dest deyîne ser rêkên ku berjewendî jê tên, armanc ev e. Ji lewre Ewrûpa çi dike, berê xwe dide Rojhilata Navîn. Ev sedemê demdirêj û dûr e, yê bingehîn e.

Sedemê rasterast ê ku pê mirovan seferber bike çi ne? Meselên dîn e, Xiristiyantiye. Gotin, em li vir Xiristiyan in, Xiristiyan hemû li vir in. Gelê Ewrûpî hemû Xiristiyan in, lê cihê ku Îsa lê çêbûye di bin destê Misilmanan de ye. Gotin, ev çênabe. Cihên pîroz hemû di bin destê Misilmanan de ye, lê em li vir Xiristiyanin. Ev çê nabe, ji bo vê weke hikmekî Xwedayî weke wezîfeyekî pîroz gotin, divê ku em wan cihên pîroz di bin kontrola Misilman û Ereb de derbixin.

Li ser vî esasî ji sala 1070'î bi şûnda, gav bi gav însan seferber kirin, ciwan kom kirin, siwarî kom kirin, artêş birêxistin kirin, Fransiz, Îngilîz, Îspanyol, ji hemû derên Ewrûpa di bin kordîneteriya kilîsê de, berê xwe dan Rojhilata Navîn.

Ji lewre hêza ku Rojhilata Navîn bikarîba biparastiba tine bû. Ji ber ku rewşa Abasiyan li ber çavan bû, parçe dibûn. Qismekî mezin ne di bin destê wan de bû. Mînak, Misr, di Misrê de xîlafet hebû, ev xîlafet Fatimî ne, ew jî xwe Elewî dihesibînin, navê wan Fatimî ne. Xwelîfê Misrê ne girêdayî Bexdayê bûn. Ew serbixwe bûn.

Li derdora Misrê bi alîkariya Fatimiyan, tevgera Îsmaîlî di gelek cihan de bi bandor bû, desthilatdar bû. Mînak gelek bajarên Sûriyê di bin kontrola wan de bû. Heta niha jî hinek kelhên wan hene, di derdora deryayê li Sûriyê yên Îsmaîliyan e wê çaxê. Ew terîqeta batinî ya ku Hesen Sebah bi navê wî tê nasîn, lê beriya wî jî hebûn. Ev bi şêwazê xwe yê fedaîtî meşhur in. Fedaîtî jî ne Hesen Sebah çêkiriye. Fedaîtî, parçek ji baweriya Îsmaîliye, berê jî hebûye. Gelek caran bi reşkujiyên xwe binav û deng in. Selahdîn Eyûbî jî du caran li ser destê wan birîndar bûye. Lê nemiriye, ev jî fedayan kiriye.

**Li Dijî Tevgera Eyûbiyan Şerên Xaçperestan**

Jixwe parçebûnek wiha heye, ji bo vê dema Xaçperest tên di sala 1070'î de PZ'ê û şûnda, tên lê berxwedanekî zêde mezin li beramberî xwe nabînin. Ji bo vê li gelek cihan serwer dibin. Qudsê digirin, cihê em jê re dibêjin Filistîn hemûyê digirin. Demekî Misrê digirin, Sûriyê digirin, li van deran de serwer dibin. Vê carê li ser esasê parastina erdê Misilmanan, Abasî dikevin dewrê. Li dijî Xaçperestan pêngavan bi rêxistin dikin. Ev pêngavana di lûtka zirva, xwe de, di serdema 1190-1180'iyê bi Eyûbiyan re gihîştin astekî pir payebilind û encam girtin.

Eyûbî Kurd in, bi xwe jî Kurdê Kurdistanê nîn in. Kurdê Şedadî yên Ezirbîcanê ne. Cihek li wir heye herêma Kurdaye, niha piştî şerê di navbêna Ezeriyan û Ermeniyan de hate vala kirin, êdî Kurd li wir najîn, ji wê herêmê re dibêjin Kelbejar. Şedadî ne, di zemanê xwe de dewleta wan hebû, serwer bûn, di gelek cihan de bibandor bûn Ev malbata ku Selahdîn jê ye, di bîrokrasiyê de xwedî cih e. Xelîfên Abasî banî wan dikin û bi rastî jî tên, li Tikrîtê bi cih dibin, ev bajarê ku Sedam jî lê çêbûye. Selahdîn li Tikrît tê dinyayê, ji dayîkbûna Selahdîn li Tikrîtê ye.

Dema ku şerê li dijî Xaçperestan dest pê dike, pêngava ku li dijî Xaçperestan bi fermana xelîfên Abasî li ser Şamê, li ser Sûriyê çêdibe bi fermandariya fermandarekî yanî mîrekî Misilman, lê bi eslê xwe Tirik e, navê wî Nûredîn Zengî ye.

Bi Nûredîn re malbata Selahdîn jî diçin. Ji ber ku mamê Selahdîn, Esedîn Şêrgo, fermandarekî mezin e. Wer fermandarekî binav û deng e, yanî weke gelek fermandarên mezin e, wek çawa em behsa Naplyon dikin hwd dikin, yek ji wan e. Bi komîta xwe bi rêveberiya şer kirinê, xwedî jêhatiye, bihêz e, di şeran de encamê digire.

Bavê Selahdîn siyasetmedar e. Ji lewre Nûrdîn serkeftiye, bi taybetî Sûriyê ji Xaçperestan xelas dike, gelek bajaran jî wiha. Di pişt re hêdî hêdî li dijî Fatimiyan li Misrê dikevin şer, piştî wê dimire. Hîna Filîstîn rizgar nekiriye dimire, lê bibandor dibin însiyatîfê heta astekî dikin destê xwe. Lê hîna jî dewletên Xaçperestan li Filistînê û her derê hene.

Piştî ku Nûrdin dimire komuta dikeve destê Selahdîn û Selahdîn Qudsê xelas dike. Jixwe jê û bi şûnda li herêma Miser, Sûriyê, Filistîn hemû dikeve bin hikmê wan. Dema ku dimire, vêca ji malbata wan hikum dikin, lê weke Selahdîn hikum nakin. Wer serxweve diçin, ji bo parastina hikum ne hestiyar in. Gav bi gav Memlûkî xwe di navberê re xwe derdixin asta jor, bi vî rengî desthilatiyê dixin destê xwe. Heta sala 1517'an heta dema Sultan Yavuz Misir ji Memlûkiyan girt, heta wê demê jî Memlûkiyan wir hikum dikirin.

Memlûkî bi eslê xwe ji gelêm cuda cudane, lê belê statuyek wan ya wiha weke azadan tine ye, hinekî nêzîkî kolan e, ne kole ne, lê girêdayî ne. Di rêka leşkeriyê de, di cih cihnan de gihîştin astê wiha di aliyê civakî de mirovatiyê deyînin, bi malbatên hakim re weke mala Eyûbiyan re. Bi vî rengî gav bi gav di nava desthilatdariyê de cih girtin heta ku desthilatî girtin. Heta sala 1517'an bênavber Memlûkiyan li wir hikum kirine.

Ji lewre serkeftina Selahdîn wateyek wê heye, ew serkftin ne serkeftinek ferdî ye. Serkeftina herêmê ye, yanî hêza herêmê bi taybetî ya çandî, ya civakî, asta moral, ev bandora xwe li ser milê wê yê leşkerî û siyasî jî çêdike, ev bû sersebebê ku her çiqasî êrîşên Xaçperestan bênavber pêngav bi pêngav, ji ber ku Xaçperest tenê pêngavekî nehatine, ji 1070'î dest pê kirin, wer dewam kirine heta 1300'dî de berdewam kirine.

Yanî di hundirê dused Salî zêdetir tim hemle li pey hemlê hatine meşandin, van pêngavan nekarîbûn bi cih bibin. Lê belê heta ji wan hat jê sûd girtin. Zanistî, felsefe, îlm, pirtûk her tiştî elimî bûn. Pêngavên Xaçperest ne wiha pêngavine ji bo xerakirin, kuştin, tesfiye kirinê tenê bûne. Di aliyê zanistiyê de jî ji bo xwe fayde kirine. Di wî alî de bi Mixulan re hinekî berovajî ne. Ji ber ku Mixul xerakirinê esas digirin. Heta dibêjin dema ku Mixulan êrîşî Bexdayê kirine, pirtûkxana wê hemû vala kirine çemê Dicle, çemê Dicle reş herikiye. Ji morekebê pirtûkan reş herikiye. Ka çiqasî milyon pirtûk tê de hebûne, Xwedê dizane. Wê demê pirtûkxanek wiha dewlemend ber bi çem de berdane.

Xaçperest wiha nakin, pirtûkxanê navêjin çem. Digirin, dixwînin, dibin, dielim. Bandorek vê ya mezin li ser derbasbûna çanda Rojhilata Navîn li Ewrûpa çêbû. Ev yek ji bingehê ronansasê ye, hemû bingeh na, yek ji bingehê ronansasê ev bûye.

**Bêbandorbûna Ebasiyan Û Hilhatina Dewleta Sefewiyan Û Osmaniyan**

Ji lewre ji sala 1300'î bi şûnda bandora Abasiyan namîne. Ji bo vê sîstema siyasî di Rojhilata Navîn de belav dibe, desthilatdarî gav bi gav dikeve destê Tirkan de. Di sedsaliya 14. pê ve Tirik serwer dibin. Di milê Rojhilat de jî Fars ji nû de dewletekî avadikin, bi navê dewleta Sefewî avadikin. Her çiqasî hakimê wan bi eslê xwe ne Fars be bin jî, lê di esas de kerekterê desthilatiyê Farsî ye. Bi wî rengî dewletek mezin li wir avadibe.

Dewletek din ji bi navê Osmanî ya ku xwe weke berdewamiya Abasiyan digire dest, ji ber ku mezhebê wan sunî ne, wî mezhebî esas digirin. Weke berdewama Abasiyan, heta navê xelîfan li xwe dikin, yanî sultanê Osmanî weke wek çawa xelîfan li xwe temaş e dikin. Navenda dewleta Misilmanan e. Bi vî rengî dewletekî wiha Osmanî di herêmê de det pê dike û çêdibe.

Ber bi Rohilat de vedibe, hemû derên ku berê Abasî li ser bi bandor bû hemûyan hikum dikin, bi vê bes nabin Misrê ji Memlûkiyan digirin. Bakurê Efrîqiya digirin, ber bi Ewrûpa ve dibin, Îstembûlê digirin. Heta car bi caran gihîştiye sînorê Ewstorî yê. Heta sînorê Viyan jî çûye.

Ev pêvajoyeke, lê di vê pêvajoyê de êdî hevsengî di aliyê Rojava de gav bi gav pêş dikeve. Rast e hêzek Osmaniyan a leşkerî heye, dewletek mezin in, di şerê xwe yê leşerî de li dijî Ewrûpa carina qezen dikin, ji nakokiyên di hundirê Ewrûpa de sûd digirin. Carina Fransa bi wan re dibe yek li dijî Ewstoriya şer dikin. Hinekî bi ser dikevin, dijî Meceristan şer dikin bi ser dikevin. Ji wan nakokiyên di nava Ewrûpiyan de feyde dike. Carina di lehê xwe de hinek tiştan qezenc dikin, lê bi giştî êdî li Rojhilata Navîn di zanistiyê de sekin çêdibe.

Di leşkeriyê de sekin, di siyasetê de sekin, êdî pêşveçûn tine ye. Ewrûpa nû ji xew radibe, her tiştî nîqaş dike. Şoreşên dînî hene, dewletên nû avadibin, bi tabetî jî dewletek weke Îspaniya. Ji ber ku Îspaniya di serdema Umewiyan de Îspaniya ji aliyê

Misilmanan ve hate bi dest xistin. Hemle li ser Ewrûpa çêkirin, Tariq Bin Ziyad, Mûsa Bin Nuseyr, ev derBeasbûn û ew der girtin.

Nêzîkî heştsed salî bê navber Ereban li Îspaniya hikum dikirin, Umewî bûn, lê Ereb bûn. Di pişt re gav bi gav Xiristiyanan li Îspaniya xwe bi rêxistin kirin, li dijî Ereban ketin nav pêvajoya şer. Di sed saliya 14.de, ango sala 1300'iyî û şûnda bav bi gav ketin şer. Di sedsaliya 15.de ev şer bi encam girtin.

Ev şer çawa bi encam girtin? Îspaniya careke din bû dewletek Xiristiyan ya fanatîk, tenê Xiristiyantiyê li ser axa xwe qebûl dike, li dijî wê ne Misilmantî, ne jî Yahudîtî qebûl nake. Bi vî rengî dewletek mezin çêbû, kengê? Dewleta Ereban ya dawiyê ya ku li Îspanya de li ber xwe dida di sala 1497'an de, di wê serdemê de Girînada bû, ew jî teslîm bû. Bi Ereb jê re dibêjin Xirnada. Mîrê wê dewletê kilîlên bajarî teslîmî qiralê Îspanî yê wê demê kir. Qiralên wê demê du bûn, yek jin bû, yek jî mêr bû, pevjînê hev bûn, lê bi berjewendî bû, yektiya hêzan bû. Firîdînan Elnfûsû û Îzabêla bû.

Heta meselek wiha jî wê demê heye tê gotin, dibêjin dema ku Mîrê Ereb kilîlê teslîmî qiralê Îspanî dike, rondik ji çavên wî dibarin. Mîrekî pasîf bûye. Derdora wî girtin deng nekir, di encamê de qet li ber xwe neda. Pasîf bû, gotin teslîmiyetger bû, ji bo vê pir dihat rexne kirin. Dayîka wî ew zehf rexne dikir. Lê di encamê de kilîl teslîm kir. Dema rondik jî çavên wî dibariya, dayîka wî jê re dibêje "Tama baş e, weke pîrekan bigirî, li ser milkekî te nekarî weke zilaman biparêze." Ev gotin li gorî wê serdemê cinsiyetparêzî be, lê gotina wê serdemê bû.

Di pişt re de ev gotina Mîrê dawiyê yê Girnada, di lîtretura siyasî de gelekî hate xebitandin. Mînak heta Çekvara bi xwe NY de, ji bo serokek Emerîka Latînî vê dibêje; pir teslmgerbû ye, ji Merîka re timî û tim derbe lê dikirin û ew avêtin, dibêje ez gotina dawiyê ya mîrê Ereban yê Girnada ji wî serokî re dibêjim. Yê di demê de nikare xwe biparêze di encamê de beramberî teslîmiyetê rû bi rû dimîne, ev gotin tê vê wateyê.

Wê demê Ereb Misilman ji Ewrûpa derdikevin. Êdî Ewrûpa bi dewletên xwe yên mezin avadibe. Îspaniya, Fransa, Îngeltera, Ewstoriya, Ewstoriya berê dewletek wiha biçûk nebû. Împeratorî bû, Maceristan, Îspaniya tevlî bû, Malbatek tê de hikum dikirin, ji wan re digotin malbata Hapsborg ev malbat di van meselên nifûsên xwe fireh kirinê de gelekî jêhatî bûn. Gelek welat himbêz dikirin û wiha împeratoriyekî mezin bûn.

Ji lewre hinek dewlet hîna çênebûbûn, mînak weke Elmaniya, Îtaliya, weke dewletên navendî hîna çênebûbûn. Van encax di salên 1870'an û şûnda weke dewletên netewî çêbûn. Berê bajar bi bajra bûn. Ji lewre vê hevsengiyê bi xwe re gav bi gav êdî hevsengî ne, serdestiya Ewrûpa derket pêş.

Vê serdestiyê di sedsaliya 18-19'an de qulipîn bi rengê tesfiyekirina bandora Tirkan a li ser Ewrûpa. Hemû welatên Belqanan, Yogozlafiya, Bilgarîstan, Yewnan, ev derana hemû wê

demê serbest bûn. Xwe ji bin bandora Tirkan xelas kirin û Tirik ji wir derketin.

Di sedsaliya 19'an de êdî yek parçe erdê Ewrûpa di bin destê Tirkan de nema û paş ve vegeriyan. Ev dibe sersebebê ku Tirik ji Rojava tengav dibin vê carê bacê zêde dikin, ji leşkeran peran dixwazin, ji bo vê serhildanên Kurdan çêdibe, yên Ereban çêdibin, nerazîbûn derdikevin holê. Ev tiştê he hemû wê demê derdikevin holê.

**Yekemîn Pêngava Ewrûpa Ya Dagirkirina Misrê**

Ji lewre di wê serdemê de di sedsala 19.de li Rojhilata Navîn gelek guhertin çêdibin. Yanî di sala 1800'î weke xalekî bingehîne li Rojhilata Navîn. Çima ev sal bingehîn e, ji ber ku di wê salê de yekem pêngava Ewrûpa li ser Misrê çêbû. bi rengê xwe yê nû yê birjiwazî li ser Misrê çêbû. Naplyon ew pêngav pêş xist û Misr dagirkir.

Van bi xwe re gelek guhertin anîn, êdî împeratoriyek heye navê wê împeratoriya Osmanî ye, serwer e, bi nav li her derê serwer e. Lê pir lewaz bûye. Êdî li beramberî vê împeratoriyê nerazîbûn çêdibin. Serhildanên Kurdan piştî sala 1800'î şûnda êdî dest pê kirin. Yê Ereban dest pê kirin, Ewrûpî hêdî hêdî derBeasbûn. Di sala 1800'iyî de Naplyon Misr girt. Piştî wê demekî dirêj gav bi gav bakurê Efrîqiya hemû ji bin kontrola wan derxistin. Fransa ket Cezaîr, Fas Tunsê, ev hemû girtin.

Ev ji bo çi bûn, mînak em bêjin deyîn hebûn, dayînê Fransa li Cezaîr hebûn. Gelek dayînê wan hebû. li Cezaîr walî heye, ew jî girêdayî împeratoriya Osmaniya ye. Lê belê deyîndarê Fransa ye. Ji ber çi, senaey pêş dikeve, pêdiviya gelan zêde dibin. Ev kesana jî ji Fransa gemiyan dixwazin, gelek tiştên din jî dixwazin, çi ji wan re pêwîst be arac gerec. Ev tiştên he hemû pêwîst in. Heta ji bo xweşiya xw ya kesî, ji ber ku hêza desthilatdar bi giranî hêzek wiha miriyê xweşiya xwe ye. Ji bo vê dibîne tiştên nû li Ewrûpa derdikeve û wan jî dixwazin, bi demê re di bin deyînan de dimînin.

Mînak Cezaîr çawa ji aliyê Fransa de hate dagirkirin. Minak konsolê Fransî tê ji waliyê Cezaîr re yê bi navê Husên e, ji waliyê Cezaîr re dibêje, ka dayînê welatê min. Waliyê Cezaîr jî ji wî aciz dibe, ka çawa ew konsoleke, ew walî ye girêdayî împeratoriya Osmaniya ye, bi nav û deng e, konslek tê jê re dibêje ka deyînê welatê min. Ew ji jê aciz dibe, di destê wî de nekaşa mêşan heye, wê nekaşê di nav çavê konsul dide. Fransa ew ji bo xwe kir weke meselak anorê. Ew bo sedemê rasteras yê sedemê ku Cezaîr bê dagir kirin. Bi vî rengî Cezaîr hate dagirkirin.

Tuns, Fas bi vî rengî yanî bakurê Efrîqiya ew herêma ku nêzîkî Ewrûpa di sedesaliya 19'an de, di sala 1850'î bi şûnda ve hema bêje hemû ji aliyê Ewrûpa ve hete dagirkirin. Jî aliyê Misrê ve hinek heweldan çêbûn.

Mînak Naplyon derbasî Misrê bû, em bala xwe bidinê taybetmendiyekî Rojhilata Navîn yê wiha heye, kê hêza bixweze bibe serwer li ser cîhanê, berê xwe dide Rojhilata Navîn. Ji ber ku rola kilîtê dileyîze. Rêkên tîcaretên ne, di aliyê erdnîgarî de du parzemînan bi hev ve dide girêdan. Asya û Ewrûpa, Asya, Efrîqiya Ewrûpa. Di navbera van her sê yan de sêkuçeke (uçkeneke.)

Rêkên tîcaretê tê re diçin û tên. Bi her hawî stratejîk e. Yek jî çavkaniya şaristaniya ye. Ji bo vê berê xwe didin vir. Naplyon jî weke hêzekî serwer di cîhanê de berê xwe da vir. Yekmîn pêngava ji der ve re li ser Rojhilata Navîn bû, li ser Misrê kir.

Naplyon bi xwe re çi anî, berî her tiştî pêngava Naplyon îsbat kir ku êdî ev împeratoriya Osmanî zemanê wê derBeasbûye, hêz û hunerê wê ku li ber xwe bide tine ye. Ev jî dişibe demdirêjkirina futbolê. Çawa ku piştî futbol bi dawî dibe û zemanê wendayî ozantme, ew eşer bû. Ji ber ku êdî nikare li ber xwe bide. Heta wê demê tiştekî Naplyon ya balkêş heye, dibêje; “dema em çûn Misrê leşkerekî Ereb, teqez dikarî leşkerekî Fransî. Birlikekî biçûk a Ereb, yek Fransî weke hev in. Lê belê bilukekî Fransî karîbû taborekî Ereb.” Ev çewaniyê, kalîtê nîşan dide. Ferq û cudatiya di navbera duzena leşkerî ya li Rojhilat de û ya di Rojava de nîşan dide.

Dema ku bi hêza çors be, yekî Ereb teqez dikare yekî Fransî, vê qebûl dikin, yek bi yek qebûl dikin. Dema ku hîna şer biçûk be, di asta birlikên biçûk de be, mînak di asta mange, taxim de be, bi vî rengî ji ber ku hunerê şer hîna tê de zêde rol nalîze, hîna tê de mewzîlendirme rol baş nalîze, teknîk baş rol nalîze, dibêje weke hev in. Wê demê di wir de hêza çors tê hevseng kirin. Ew hêza çors ya ku rola xw di dema ku yek yek de dileyîst, ev tê hevseng kirin.

Lê dibêje birlikekî Fransî teqez dikare taborekî Erebî bişkîne. Di wir de hîna zêdetir bi çekkirin, bi mewzî kirin, hunerê şer, tektîk, ev dikevin dewrê bi vî rengî di rastiyê de çi rave dike, çawanîbûna Ewrûpa, bê çawaniya ku êdî di Rojhilat de dest pê kiriye pêş dikeve. Yanî dîroka berepaş ve diçe diyar dibe.

Ev mînakek bû, bi xwe re gelek tiştên din jî tîne. Fikrê Ewrûpî êdî bi rengekî rasterast derBeasdibe. Berhemdariya şoreşa Fransî di aliyê wê yê çandî, dirûvê desthilatiyê, nêzîkbûna ji huner re, wêje re, ev derdikevin holê. Hinek tiştên din jî derdikevin holê, dîroka Misrê jî hinekî derdikeve holê.

Naplyon tenê leşker bi xwe neanî. Arkolok bi xwe re anî, dîroknas bi xwe re anîn, ziman nas bi xwe re anîn. Gelek kes bi xwe re anîn. Ev geriyan û dît ku dîrokek sêr li van deran heye. Peykerin, pîramîtin hwd, ev tiştên he dîtin di wê navberê de leşkerekî Fransî kevrek jî dît. Li ser kevr nexiş hebûn. Di pişt re yekî bi nav û deng, yekî erkolok bi nav û deng, navê wî Şambilyon ne, wiha lê temaşe kir got; ev nivîs e, yanî nivîsa hyografîk. Wê demê ev bi pêngava Naplyon eşker re bû.

Bi vî rengî di aliyê guhertina çalakiya çandî, mêjî, ew jî alîkariya wî çêbû. Piştî wê jixwe Naplyon derket Îngilîz ketinê. Îngilîzan gav bi gav wer desthilatî li gorî xwe pêş dixistin.

**Li Welatêm Rojhilata Navîn De Ferzkirin Û Pêşketina Modernîzmê**

Di dîroka Misrê de bi taybetî di sala 1840-1830'iyî, di wê demê de guhertinek cidî çêdibe. Kesek bi navê Muhemed Alî bi artêşekî diçe Misrê, li wir dibe walî, artêşa wî bi giştî Erneutin û ew li ser Misrê hikum dike. Kurê wî li ser Sûriyê hikum dike, dostekî wî li ser Lubnanê hikum dike.

Lê belê ev dixwaze dewletekî nû avabike. Yanî împeratoriya Osmanî biguhere. Dijberiya xwe jî împeratoriyê re nîşan dide. Dibêje; împeratorî bi vî rengî nameşe. Eger em bixwazin bimeşin girîng e em sîstemekî siyasî nû avabikin. Bi meclîs bi demokrasî, bi hilbijartin weke çawa li Ewrûpa dibe. Modernîzansyonê ferz dike.

Kurê wî li Sûriyê serwer e, ew jî heman tişt. Yê Lubnanê jî dostê wî ew jî heman tişt. Divê herêma cewherî de ya xwedî bandor Lubnan, Surî û Misrê, van di destê wî de ne û li hemberî împeratoriya Osmanî radibe ser piyan.

Di vir de tiştek heye, bi taybetî rola Ewrûpa di hiştina împeratoriyê de mirov divê temaşe bike. Ewrûpa bê hevsengiye. Pêşveçûna li wir çêbûye bê hevsengiye. Sedema wê jî, Îngilîz zêde li pêş e, di gelek derên cîhanê de mêtingehên wê hene. Serwerê gelek cihên cîhanê ye. Fransa dîsa li pêş e, dîsa mêtingehên wê hene. Hinek welatên din di wê astê de mêtingehên wan tine ne, lê pir mezin in. Elmaniya nû xwe komî ser hev dike, dibe dewletek mezin û navenda wê Rusya ye. Îtaliya nû bi ser xwe ve tê, senaî pêş dikeve, sîlah pêş dikeve, artêşan çêdikin, lê cihekî ku bigirin tine ye. Her der bin destê dewletên mezin de ye, Fransa û Îngilîzan de ye.

Ew şêlo û lihevketina li ser h parvekirinê, di hundirê lihevketinê de tewazin dibe sersebebê ku hîna dewletên Ewrûpa nexwazin ku împeratoriya Osmaniyan ji holê rakin. Lê ger bixwazin dehfekê bidinê wê li erdê bikevin. Tiştên ku li ser piyan bisekinin tine ye, nexweş e. Jixwe navê Osmaniyan di dîrokê de wê çaxê weke zilamê nexweş derBeasdibe. Dehfekî bidinê wê li erdê bikeve, lê nakokiyên wan yên hundirîn nahêle.

Dema ku Muhemde Alî rabû ji bo ku nû bike, Îngilîzan dît ku eger bi destê Rojhilata Navîn, Rojhilata Navîn xwe nû bike, nikarin li ser êdî serwer bibin. Ji bo vê Îngilîzan pê re îxanet kirin. Li dijî wî derketin û destek dan împeratoriya Osmanî bi vî rengî tevgera Muhemed Alî tesfiye kirin.

Tevger tesfiye kirin, ew şoreş bi ser neket. Lê Marks jî ji bo Muhemed Alî wiha dibêje; " Muhemed Alî mirovê yekem bû, yê ku jidil xwest wî kumê vala yê Osmanî bi seriyekî rasteqînî re biguhere." Derbarê Muhemed Alî de Marks vê dibêje, mirovê

yekemîne yê ku xwest, jidil û can dixwest ku wê kofiya vala bi seriyekî rasteqînî re biguhere, yanî rastî bike seriyek rasteqînî.

Ev nirxandineke, lê rastî jî divê ku em bala xwe bidinê ku xiyaneta Ewrûpa li ser çi esasî ye, eger bi xwe guhertinê çêbike, ew nikarin di pişt re dagirbikin, lewre hiştin. Derng hiştin ta ku dema wê bê, pişt re Muhemed Alî ji holê rabû. Zarokên wî berdewam kirin, zarokên wî weke wî ne radîkal bûn, teslmiyetger bûn. Girêdayî Ewrûpa bûn. Heta kolê Ewrûpa bûn. Misr ji Ewrûpiyan re pêşkêş dikirin, nirxên wê hemû difirotin. Şêwazê wan esas digirtin.

Mînak çawa, bandora Ewrûpa zêdetir li ser Misrê heye, li gorî cihên din, cil û berg, opera hwd, bi vî rengî ew mesele bi ser neket. Lê dema ku em ber bi şerê cîhanê yê yekemîn ve tên, em lê temaşe dikin ku êdî Ewrûpa nakokiyên xwe nema dikare biguhere, nema dikare veşêre. Ev nakokî gav bi gav dixwazin biteqin, ev jî bi şerê cîhanê yê yekemîn bi encam bû. Şerê cîhanê yê yekemîn ji ber ku Osmanî jî tê de terefek bûn, ji bo vê jî di dawiya şer de ew teref yê ku Osmaniyan tê de cih digirt şikestin, Elmaniya. Ji ber ku şikest Osmanî jî şikestin. Bi vî rengî êdî dema parçebûna wan hat.

**Sedemên Şerê Cîhanê Yê Yekemîn**

Di şerê cîhanê yê yekemîn de statuya ku îro li Rojhilata Navîn heye, xwedî rol e. Bi giştî nexşeya siyasî her çiqasê di vê sedsalê de hinek guhertinên biçûk tê de çêbûbûn jî, di asta guhertina hikmetan de ye. Lê di sînorên erdnîgarî û sîstema siyasî de, weke xwe ma û hilberîna şerê cîhanê yê yekemîn e.

Şerê cîhanê yê yekemîn çi ye? Niha rewşa Ewrûpa li ber çav e. Hêza Îngilîz ya tîcaretê, leşerî û serweriya wê ya li ser cîhanê berfreh tê nîqaş kirin. Dirêj dirêj jî di parêznamê de Rêbertî li ser rawestiya ye.

Dîsa hêza Fransa ya împeratoriyê, bi taybetî jî di serdema Naplyon û şûnda, haweldanên wê yê serweriyê yên li ser gelek parçên din ên cîhanê, ew jî li ber çav e. Rojhilata Navîn, Efrîqiya, hemû Ewrûpa, herweha hawildanên wiha serdestiyê li pêş in.

Lê belê di sedsala 19.de hevsengiyek cuda çêbû ku ew dîzayîna ku 1648'an de hatiye dayîn, li ser esasê hevpeymana Westfalyayê êdî têrê nedikir. Ew payleşima mantiqê nifûsê, yan jî bin navê lêgerîna îstiqrarê, ew peyman, ya Westfalyayê êdî nema dikarîbûn nakokiyên hey di nava berjewendiyên dewletên Ewrûpî de ji nedîtî ve nêzîk bibin, yan jî veşêrin.

Ji ber ku di sedesala 19'an de taybetî jî 1870î, şûnda di Elmaniya de hêzek komkirinê pêş ket. Dewleta herî mezin li Almaniya, Rusya pêşengtî ji yektiya Almaniya re çêkir. Pêşengitî jê re çêkir. Ev yektî bi durûşma, yektiya di nava gelan de, encax bi agir û hesin çêbibin. Bi vê durûşmê wezîrê Elmaniya yê mezin wê çaxê mesela yektiyê xist rojeva xwe. Bi hêzê, hesin û agir bi qiwetê kir rojeva xwe.

Li ser vî esasî hemû dewletên biçûk ên Alemiya xistin bin venêrîna xwe û dewleta Alamaniya ya mezin çêkirin. Ev di bin qiraliyeta Elman qiral Wilhelm de çêkirin, di bin serokatiya wî de çêkirin.

Li Îtaliya jî dîsa qiralê bi wî rengî li ser esasê yektiya Îtaliya derket holê, Garîbaldî, ew jî yektiya Îtaliya çêkir. Êdî Îtaliya ji rewşa wer bajar bi bajar derket bû dewletek. Ev her du jî lêgerinên wan yên împeratoriyê hene. Dixwazin împeratorî bin, naxwazin tenê dewlet bin, dixwazin bi împeratorî bin.

Hem di Ewrûpa de xwedî bandor bin, bihêz bin, ji ber ku hêzek leşkerî ya mezin çêkirine. Mînak heta niha jî dibêjin filan tişt Elmaniye, di aliyê sînaî de. Mînak tifingên Elmanî, topên Elman, di aliyê silahgeriyê de gavên pir mezin avêtin. Heta roja me ya îro jî senaiya giran di Elmaniya de dîsa li pêş e.

Di Îtaliya de jî bi vî rengî ye, senaî pir bilind dibe, hilberîn zêde dibe. Dewletek mezin yekalî çêdibe, lê nikare belav bike. Dixwaze Rojhilata Navîn bike bin venêrîna xwe, lê asteng li pêşiyê wî hene.

Çav berdaye Qafqasiya, Îran, Tirkiyê, heta astekî jî bi Tirkan re têkiliyên pir xurt çêkirin. Ji ber çi? Osmanî û Îngilîz diberî hev bûn, Osmanî Fransîz dijberê hev bûn. Elman û Îngilîz jî dijberî hev bûn. Ji bo vê Osmanî zêdetir destê xwe dane Elmanan. Di gelek serhiladanên li dijî Osmaniyan çêbûne, Elamanan bi alîkariya Elmanan ji holê hatine rakirin.

Heta yên Kurdan jî, heta mînak Meraşalekî Elmanî yê mezin heye, bi nav û deng e. Tezên wî yên leşkerî hene, Moltke, Moltke di Kurdistanê de şer kiriye li dijî Kurdan. Weke çawa em behsa Kilawswîz dikin, Naplyon dikin, Moltke jî yekî wiha ye. Nerînên wî hene, derbarê şer de gotinên wî hene.

Wî jî di Kurdistanê de bi alîkariya Osmaniyan ji bo alîkariya Osmaniyan li dijî serhildanên Kurdan jî şer kiriye, heta hinek nivîsên wî hene. Mînak, çawa wer hinek serekên Kurdan kuştine. Piştî ku serhildanên wan tesfiye kirine, ew çawa bi îşkencê kuştine. Heta di nav ava kelandî de ew kuştine. Wer behsa van tişan tên kirin.

Di destpêka sedsala 20'an de, Alman hîna zêdetir bi dijwarî îdia li ser mentiqê nifûsê dikirin. Heta hinek îdia wan yên wiha jî hebûn ji bo gelê Rojhilata bi xwe ve girê bidin, digotin wer propoganda belav dikirin, li Îranê, Tirkiyê, digotin; di rastiyê de Elman ne li dijî Misilmanan ne, heta Elman jî Misilmantiyê hez dikin, pêş dixin. Qiralê Elmanî bi xwe Misilmantî qebûl kiriye, heta çûye hecê. Navê wî kirin hecî Wilhelm. Weke çawa niha carê li vir dibêjin hecî Boş.

Ew lîstik wê demê jî hebûye. Bi rastî jî Elman bi destek kirina tevgerên dînî û Îslamî de di wê çaxê de rolek lîstine. Yanî Îslama siyasî rola Elmana di çêbûna wê de heye. Heta di Tirkiyê de jî Erbeqan ji nêzîk ve Elman pê re eleqeder bûne.

Îtaliyan jî bi vî rengî, lê belê di esas de nifûs, nifûsa Îngilîz û Fransa ye. Êdî ew rêzgirtina beramberî hev ji holê radibe. Şer jî êdî mehkum dibe. Di sala 1914'an de şer cîhanê yekemîn dest pê kir. Ji ber ku gelek hêz di wî şerî de cih digiritin navê wî şerî bû yê cîhanê yê yekemîn. Kî ne ev hêzên he?

Aliyekî jê Îngilîz in, Franses û Rusya ye, ev aliyekî şer e. Aliyê din yê şer Elmanin, Îtaliyanin, Osmanî ne, Awstoriya jî bi Elmanan re ne. Li her eniyê(cebhê) şer dest pê kir. Lê dema ku şer dewam dike, di sala 1916'an de, di navbera Fransez û Îngilîzan de îtîfaqek çêbû. Ew îtîfaq bi navê Sykes- Pico çêbû. Îtîfaqa Sykes- Pico çi ye? Mirov dikare bêje du delegesyonin, yek Fransî ye, yek Îngilîzî ye. Nav jî ji serokê delegesyonan pêk tê. Sykes, Îngilziye, Pico Fransî ye. Ev serkêşiyê jê re dikin.

Li ser masê rûdinên, encamên şer nîqaş dikin. Di encamên şer de mentiqên nifûsan wê çawa li hev par ve bikin, li ser wê nîqaş dikin. Wê demê serkeftina xwe di şer de hildane ewlahiyê. Piştî du salan 1914'an de dest pê kir. Lê di eniyê şer de gidîşad di aliyê wan de dimeşiya. Elman lewaz dibin, Îngilîz lewaz dibin. Di vê navberê de Îngilîzan çi kir, hemû Ereb li dijî Tirkan bi rêxistin kirin.

Bi serokatiya kê? Bi serokatiya waliyê Meka, Meka ku niha Hec lê ye. Walyê wê yekî şêx zade bû, navê wî Şah Husên yan jî Şerîf Husên bû. Van xwe ji malbata Muhemed dihesibînin, Haşimî ne. Ji wê malbatê tenê niha li Urdun hikum dikin. Mînak, ew Şah Husên bû, kurê wî Ebdulah bû, li Urdunê hikum kir, kurê Ebdulah careke din Husên bû, kurê Husên carekî din Abdulah bû ku niha Urdunê hikum dike, ji wê malbatê ye.

Niha Qiralê Urdunê navê wî Abdulah e, ew naviyê çaremîn e, nevîçirk e. Ew wê demê li Mekê serwer bûn. Ji bo vê ji Ereban re ev gotin, jixwe wê demê yekî îstixbaratgerê Îngilîzan bi navê Rolens hebû. Heta jê re dibêjin Rolensê Ereb, ji ber ku bi Ereban re dijî, cilên wan li xwe dikir, bi Erebî diaxivî, weke wan xwarin dixwar. Rabûn û Rûniştina wî, her tişê wî weke Ereban bû. Jixwe di bîranînên xwe de dibêje; " tiştê jê xerabtir tine ye, lê ji bo berjewendiyên welatê xwe ez neçar bûm min bikiriba. Weke wan min xeber bidaba hwd, her tişê weke wan kirin. Ev hemû xerabûn, lê ez neçar bûm ji bo welatê xwe pêk bînim."

Ew casûs bû, yê Îngilîzan bû, weke erkdarekî bû. Îstixbaratger bû. Ereb li dijî Osmaniyan bi rêxistin dikir. Cih bi cih digeriya. Hem li welatê Kendavê, herêma Hicazê ya niha Siûdiyê ye, wê demê navê Siûdiyê tine bû. Pişt re nave Siudiyê çêbû. Hem li wê herêmê, hem jî li herêma Şamê derdorê Sûriyê tevgera Ereban li dijî Osmaniyan xwest bi rêxistin bike.

Bi çi sozê, ji Ereban re gotin; "Ev Osmanî êdî mafê wan yê ku hikum bike tine ye" jixwe Osmanî ji hev ketibûn. Ji ber ku ji hev ketibûn vêcarê zor didan meşandin. Li dijî Ereban, Kurdan, gelên din jî zor didan meşandin. Ji ber ku pere jê re pêwîst bûn. Bi zorê bac distandin, leşker jê re pêwîst bûn, ji ber ku di şeran de

bûn. Bi zorê leşker kom dikirin, vê nerazîbûna gelan beramberî wê hîna zêdetir dibû.

Divê navberê de Îngilîzan gotin "temam şoreşekê çêbikin û xwe ji wan xelas bikin, em ê we destek bikin, ev teqez jî kirin." Da ku em bibin dewletek serbixwe hûnê me destek bikin, Îngilîzan ev qebûl kirin û wiha dest kirin. Bi vî rengî dest pê kirin şer li dijî Osmaniyan, bi serkêşiya Şah Husên li Mekayê dest pê kir, li welatê Ereban li dijî Osmaniyan tevgera serhildanê bi hêviya avakirina dewletekî Erebî ya mezin, ketin nav vî şerî.

Bi karê xwe re pereler Franses û Îngilîzan mentîqên nifûsan li hev par ve kirin. Neqşeya Rojhilata Navîn danîn, li gorî wê herêmên kesk, sor û yên zer diyar kirin. Sînorê wan diyar kirin, ev wê ji kê re be, ev wê ji kê re be. Ango kîjan herêm wê ya Fransa be, kîjan wê ya Îngilîzan be. Li ser wê li hev kirin. Ev hevpeyman bi dizîka dikirin. Kes bi vê îtîfaqê nizane. Ji ber çi, ji ber ku wan soz bi Ereban re daye ku Ereb bibin dewletek serbixwe. Ne ku welatên wan di nava xwe de parçe bikin. Ev bi dizîka kirin. Li ser wî esasî hêviya encamên şer bûn ku van planên xwe pêk bînin.

Mînak, erkên wê îtîfaqê, Sûriyê, Lubnan, ev yên Fransa ne. Dema em dibêjin Sûriyê û Lubnan, dema ku Sûriyê tê gotin heta sînorê Çikuruva diçe, ango heta Adana diçe. Ev dibe yê Fransa.

Îraq, Urdun, Filîstîn, welatên Kendavê, ev yên Îngilîzan bûn. Welatên Bakurê Efrîqiya yên Fransa bû, mînak Cezaîr, Tuns, ev yên Fransa bûn. Misr, Sudan yê Îngilîzan bû. Ev wer sînorên erdnîgarî yê xwezayî tê de tine ye, cihna jê jî heye. Mînak sînor tam diyar kirin.

Dema em dibêjin Rojhilata Navîn, bi manakê ev herêma hene, herêma ku Misr, Sûriyê, Tirkiyê, Îraq, Îran, di navbera xwe û welatê Kufresê bi vî rengiye. Ev bi wateya xwe ya erdnîgarî teng e. Lê dema îro li Rojhilata Navîn tê gotin, ji bakurê Efrîqiya, ango Tuns, Morîtaniya, Lîbiya, bakurê Efrîqiya em bigirin ta Efxanistanê. Ev herêm hemûyê dide navbera xwe. Ji ber ku em bixwazin nexwazin di aliyê gel de, dîn de hev bandor dikin. Her çiqasî di aliyê erdnîgarî de ne Rojhilata Navîn be jî, lê bi berfirehiya xwe ya ziman, dînî hemû hevdu bandor dike. Ji bo vê Emerîka jî dema ku dibêje Rojhilata Navîn, nabêje Rojhilata Navîn, dibêje Rojhilata Navîn a mezin.

**PROJA ROJHILATA NAVÎN A MEZIN LI SER ÇI ESASÎ HATIYE PÊŞXISTIN**

Rojhilata navîn a mezin ya ku jî Morîtaniya, ji bakurê Efrîqiya dest pê dike ta Efxanistanê, heta bi sînorê Hindê diçe.

Bala xwe bidinê, ev sînorê di navbera Lîbiya û Misrê de, ev sînorê di navbera Misr û Sudanê de, yê di navbera Sûriyê, Urdun û Îraqê de, wer xîzên rast in, bi rastkêşê hatine çêkirin. Ev kî ne yên ku ev çêkirîn. Ev ew heyeta ku li hevdu rûniştin, herêma li hevdu par ve kirin. Yên rengê wê sor, yê filan dewletê ye, yê

rengê wê zer yê filan dewletê ye. Bi vî rengî di navbera hevdu de, par ve kirin.

Niha hayê kes ji vê tine ye, Ereb hayê wan jê tine ye. Ereb li ser sozê ku Îngilîzan dane wan, bi wî rengî tevdigerin. Soz çi ye, piştî împeratoriya Osmanî bikeve wê Ereb dewleta xwe avabikin.

Ji lewre, di serdema şer de bi taybetî di sala 1917'an de pêşketinek çêbû kes ne li bendê bû. Çi bo ew pêşketin? Di Rusiya de şoreş bi ser ket. Yanî di cutmeha 1917'an de di Rusiya de şoreşa komunîst bi ser ket. Rusiya jî împeratorî bû. Rusiya jî wê demê qiraltî bû, di şer de bû. Li dijî Osmaniyan di şer de bû. Gelekî jî pêş ketibû, mînak heta Betlîsê Rus hatibûn. Artêşa wan heta Bidlîsê hatibû.

Lê belê dema şoreş çêbû, şer navxweyî yê Rusan, hikumeta Rusî ya nû neçar ma ku hemû artêşa xwe paş de vegerîne, bi Tikan re îtîfaqiyê bike. Li ser vî esasî şer di navbera xwe û Tirkan de da rawestandin, artêşa xwe bi taybetî ji bakurê Kurdistanê derxistin, heta ne tenê ji bakurê Kurdistanê derxistin, qismê ku berê di bin venêrîna Rusan de bû jî dane Tikan, mînak Qers, ew jî dane Tirkan.

Bi vî rengî Rus ji şer derketin. Eniya Rusan sekinî, lê belê eniyên din berdewam bûn. Rusan, dît ku îtîfaqiyek di navbera Îngilîz û Fransa de heye. Ji ber çi? Rus berê mutefîqê Îngilîz û Fransa bûn. Hayê wan jî îtîfaqiyê çêbûbû. Ji ber ku dostên hevdu bûn. Lê belê eşkere nedikirin. Lê dema ku Lenîn hate ser desthilatiyê, yanî dema şoreşa sosyalîst bi serket, ev tiştên bi dizî hemû eşkere kir. Gotin, ev kar talan e, di holê de heqbûn, bêheqitî tine ye. Şerekî parvekirinê tine ye, feyda kes di vî şerî de tine ye, kesên feqîr bindest, welatên bindest divê ku hemû li dijî emperyalîzmê rabin, li dijî kapîtalîzmê rabin, xwe rizgar bikin. Kes nekeve vî şerî, ev şer ne şerê fiqîra ye, şerê dewlemenda ye. Lê kes lê guhdar nekir, ji xwe ne gengaz bû ku kes guhdar jî bike. Ji ber ku hemû hest bi şovenîzmê hatibûn eyar kirin û şer jî di asta herî jor de dihat meşandin.

Di sala 1918'an de, şer rawestiya, çima şer rawestiya? Ji ber ku eniya Elmanî lewaz bû, Elmaniya îtîfaq kir, teslîm bû. Yanî îtîfaqa teslîmiyetê çêkir. Gelek parçe ji erdê xwe da, dev ji Ewstoriya berda, dev ji Poloniya berda, dev ji Çekoslavakiya berda, ev welatên Silava hemû di bin destê wê de bûn. Lê dev jê berdan, heta qismek ji Elmaniya jî ji Fransas û Îngilîz re berda bi vî rengî teslîmiyet qebûl kir.

Jixwe Hîtler hemû propoganda wî pişt wê li ser wê bû ka çima em teslîm bûn. Digot; " me dikarîbû em şer bikin, me teslîmiyet heq nekiribû, gelê Elman ev teslîmiyet heq nekiribû." Bi vî rengî şovenîzm bihêz kir, bihêz kir ta ku gihîşt ku Nazî bibin desthilatdar, vê carê şerekî din di cîhanê dest pê bike.

Di encam şer de Elman şikestin êdî ti hevsengî, ti çekinge, ti tiştê ku bibe sersebebê ku Fransîz û Îngilîz di derbarê împeratoriya Osmanî de planên xwe careke din paş de bihêlin

nemabû, ti sedemên wê nemabû. Ji bo vê planê xwe xistin dewerê, bi şikandina Elmaniya re mutefîqê wê Osmanî, ew jî şikestin. Li ser vî esasî parvekirinê dest pê kir. Di navbera Îngilîz û Fransa de, Ereb bi hêviya serxwebûnê bûn, ji nişkê ve dîtin ku di lîmanê wan de artêşa Îngilîz û Fransîz dadikevin û welatê wan ji aliyê van artêşan ve hate dagirkirin.

Lewre di cîhana Erebî de dewlet avakirin, yanî mînak ev dewletên heyî hemû wan avakirin. Sûriyê, Îraq, Urdun, dewletên Kendavê, mînak Siûdî, Qeter, Kuwêt, ev dewlet hemû avakirin. Heta di wê demê de wezîrekî Îngilîzî hebû pişt re bû Serokwezîr, wê demê Wezîrê mêtingeha bûn, navê Çirçirt pişt re bû Serokwezîr. Di serdema şerê cîhanê yê duyemîn de serokwezîr bû.

Çirçirt navê wî bi vî rengî derBeasdibe, dibêje; “xuliqkarê textan erşa qîralan. Ji ber ku ev textên Ereban hemû wî çêkirin. Ev qiraliyetên Ereban hemû wî çêkirin. Yê Îranê jî wan çêkirin, ev Riza Pehlewî Îngilîzan çêkir. Ji ber ku berê ne qîral bû. Riza Pehlewî di artêşê de Subayek bû. Wan kir qiral.

Sîstema mêtingerî piştî hilweşandina împeratoriya Osmanî sîstema, dagirkeriyê li Rojhilata Navîn, di navbera Fransa û Îngilîzan de li ser esasê welatên parçebûyî û sînorê sunî, hate çêkirin. Sîstema dagirkerî bi vî rengî hate çêkirin, beramberî vê hewldan çêbûn, hinek şer li Îraq, Sûriyê, li cihên cuda cuda, li dijî van hebûn. Lê belê bi giştî bi ser neketin. Bi binketin. Beramberî artêşa Fransa, Îngilîz nikarîbûn zêde li ber xwe bidabana. Lê belê wiha reht jî derBeasnebûn. Hinek şer pêk hatin, derên cihên biçûk biçûk xwecihî bûn. Berfireh nebûn, hemû deran gel bi hev re ranebûn ser xwe. lê cihên parçe parçe şer çêdibû, lê nikarîbûn dagirkeriyê asteng bikiribana.

Ji lewre di vê sîstemê de gelek tişt hene, li gorî berjewendiyên Îngeltira û Fransa gelek tişt esas hetine girtin. Ev xalên ku esas hatine girtin, weke ku çawa xwestine dibe ku pêk nehatibin. Mînak li gorî planên wan diviya bû Tirkiyakî ewqasî mezin çênebûba, lê belê çêbû. Lê ev teqez e ku li gorî planê wan diviya bû ku Kurdistan çêbûbûya. Ew di derbarê Kurdistanê de biryarê hatine standin weke biryara Sevrê, tiştên ku derbarê referandum diviya bû li Kurdistanê çêbûba û li ser vî esasê tercîha Kurdan di hundirê çend salan de referandum çêbûbûya da ku biryarek bê standin, ew biryar çîrokî bû. Tenê da ku karibin pê tepeserkirinê li ser hêzên din hîna zêdetir bikin. Li ser Ereban, Tirkan çêbikin. Lê belê ji bo Kurdan statuyek tine be.

Ji bo Ereban statxu hebû, ji ber çi? Ereb weke çawa çavkaniyên dînê Îslamê ne, hêza serekî ne di herêmê de, hêzekî li ser hev e, dîrokek wan ya bi vî rengî heye. Dîsa çavkaniya ptrolê eşker bûn ku zehf li welatê Ereban de heye. Bi taybetî di welatê Kendavê de zehf heye. Gav bi gav girîngiya ptrolê zêde dibû ji bo Rojava. Yek din jî weke hêz bi dewletên Ereban yên ku di bin kontrola xwe de çêkirin, bi wan deweltên Ereban encax karîbûn hêza Tirik û Farsan hevseng(denge) bikin. Îngilîz ji bo ku hêzeke mezin di herêmê de nemîne, pêdiviya wê bi hevsengiyê hebû. Ji

bo vê hêza Tirkan ya ku ji keveşopiya împeratoriyê tê, hêza Fars ya ku ew jî ji kevneşopiya împeratoriyê tê, eger ev hêzana piştî şerê cîhanê yê duyemîn li ser esasê dewletekî milî navedî xwe bi rêxistin bikin, wê bêkontrol bin, wê bibin hêzekî herêmger ya herî mezin. Lê bi Ereban ancax karibe çi bike, Frans û Îngelîz bi Ereban encax dikarin daxwaziyên ji nû de bihêzbûnê, yê Tirk û Frsan hevseng bike.

Ji bo vê Îngilîzan û Fransa zêde girîngî dan Ereban, lê belê heta asta dawiyê Kurd îhmal kirin. Weke ku bû sersebebê ku heta di roja me ya îro de Kurd êşa vê polîtîkayê dikişînin. Bi kuştina, bi komkujiyan, bi asîmîlasyonê ta ku heta roja me ya îro hatiye.

Niha şekilgirtina piştî şerê cîhanê yê duyemîn, em ê yek bi yek bigirin dest. Her hêzek çawa mezin bû.

### Îran Çawa Mezin Bû

Îran dewletek kevn e, bi taybetî piştî hilweşandina Abasî xwe weke deweltekî împeratoriyekî dewletek Sefewî, qîraliyetekî bi rêxistin kir. Mezhebê şîa esas girt. Mezhebê şîa ji bo xwe kir weke nasnameyekî, herweha ji bo parastina berjewendiyên nijada Fars mezhebê şîa ji bo xwe weke nasname esas girt.

Sefewiyan bi malbatên Ezerî (Ecem) ên qîralan piştî şah Îsmaîl, şah Abas, heta astekî hatin, lê jê û şûnda bi taybetî di sala 1800 û şûnde êdî malbatekî din di Îranê de desthilatdarî xist destê xwe. Ji wê malbatê re dibêjin; malbata Qacaran, weke gelek caran di stranên Kurdan de navê wan derBeasdibe. Bi taybetî şerê herêma Serhedê dema tê gotinê, her demê navê Qacaran jî derBeasdibe.

Qacar qiralên Îranê bûn. Di sedsala 19.an de, di dawiya wê sedsalê de sîstema siyasî li Îranê di rewşa xwe ya herî lewaz de bû. Ji xerabî, feqîrtî, perçebûn, bi her hewî ji rê derketin, di asta xwe ya herî pêş de bû. Nerazîbûna gelan beramberî vê rewşê gelekî li pêş bû.

Mînak li wir qiralê wan hebû bi navê Nesredîn Şah. Di pişt re Muzeferdîn şah, di navbera salên 1890-1906'an de, di wê serdemê de, ev qiralên he serwer bûn. Nasredîn bi reşkujiyê hatibû kuştin, yan jî Muzeferdîn bi reşkujiyê hatibû kuştin. Bi xwe yekî dîndar bû, we li ser tê gotin ku dostê Cemaledînî Efxanî bûye, ew hatiye kuştin.

Wê demê nerazîbûna mirovan li beramberî wan zehf hebûye. Ev sîstem bi çi awayî xwe bi rê ve dibe! Desteka wê ya ji gel tine bû, bi hinek moderinkirina dewletê jidil xwe de, yanî çêkirina dibistanan, heta şandina xwendevana ya ji derve ku biçin Fransa, Îngeltera, Elmaniya bixwînin. Wê hîna zêdetir pirsgirêkên wan zêde kirin.

Ji ber ku wan kesên ku li derve dixwendin vedigiriyan Îranê, vê carê fikrê Rojava belav dikirin. Fikrê Rojava çi bû? Dema ew xwendevan vedigeriyan Îranê hilbijartin, rewabûn, ango destora bingehîn jî qiraltiyê dixwestin, qiralitiya bi destor, ne ya

motleq, mûnarşî û tîrane, ev dixwestin. Vê hîna zêdetir pirsgirêk ji şahê Îranê re çêdikir.

Ji bo vê van şahan, ango mala Qacaran, bi temamî bi desteka ji derve de li ser piyan disekinîn. Gel birçî perîşan bû. Feqîrtî heta asta dawiyê belav dibû, beramberî wê nerazîbûna mirovan pêş diket. Ji ber ku nedikarîn vê nerazîbûnê binpê bikin, rê dan şêwazên nû.

Çi bûn ev şêwanan. Bi temamî xwe firotin derve. Ji lewre Îran di rastiyê de weke mêtngehekê bû. Rast e navê wê dewletek serbixwebû, lê welatek mêtinger bû, ku dera wê mêtingeh bû? Sînorê wê ji aliyê Rusan ve dihat parastin, gumrika Îranê jî Rusan wê demê digirt. Birlikên artêşa qiraliyeta Rusan, Qazax, artêşa qiraltiyê ya Rusan Qazax wan sînorê Îranê diparast. Ji ber wê jî wan gumrik digirt, her tişt yê wan bû.

Heman birlikan yên Qazaxan qiraliyet jî diparast, weke muhafizên qiraliyetê bûn jî. Posta, îletişim, telegraf ev tiştên he hemû di destê Belcîkiyan de bûn, ên wan bû. Ptrol hemû di destê Îngilîzan de bû. Şirketên Îngilzî, Belcîkî, Rusî bûn, van gumrik, ptrol, heta ne tenê ev, mînak tutuna Îranê jî dîsa milkê biyaniyan bû. Çawa saziya tutunê qiral bi pereyek hindik difirot Îngilîzan, wer her tiştê welêt firotibûn.

Ev ne bes bû, vê carê Îran di hundir de firotin. Çawa firotin? Mînak pêdiviya dewletê bi peran hebû, em bêjin yek tê û dibêje; ez dixwazim vê herêmê bikirim, mînak herêma Urmiya ez ê bikirim, herêma Maku, Şino, hwd, cihên Xuresan, li nav Ereban ez dixwazim herêmekî bikirim. Bihaê wê dipirse û dema bihayê wê diyar dibe û yê dikire bihayê wê dane serayê; jê û bi şûnda ew herêm azad dibû. Êdî di aliyê vergiyê de, çandinî, heywan xwedî kirin, hemû polîtîka wê, yê ku pere dane serayê her tiştê wê herêmê bi destê wî dikeve.

Serayê Îran bi xwe  frot feodalan, yên ku perên wan hebûyan dikirîn. Rewşekî pir xerab di Îranê de di aliyê ekonomiyê de pêş diket. Feqîrtî zêde dibû heta, mînak dighîştin astekî malbat xerab dibûn, însan beramberî deyînan qîzên xwe difrotin. Di vê astê de dejenerebûn û xerabûnek mezin di civakê de çêbû.

Da ku vê carê ev tiştên he nebe sedema nerazîbûnên mezin, qiralan siyasetên taybet didan meşandin. Bi taybetî ev di serdema Muzefer Dîn de ev siyaset dihate meşandin.

Çawa kirin, çanda parçebûnê û xwecihêbûnê pêşket. Îran welatekî pir netewe, pir mezheb û pir dîn e. Di Îranê de Fars hene. Nifûsa mezin Fars e, paşê Ezerî ne, piştî wan re Kurd in, Tirikin, bi taybetî jî li herêma Xurasanê nêzîkî sînorê Tirikmenîstanê Tirik hene, li cihên din jî Tirik hene. Hinek gelên din jî yên ku tam nasnameya wan ya nijadî zelal nebûye hene.

Mînak bextiyarî, Lor, ev ên xwe cuda dibînin, xwe ne Kurd, ne jî Fars xwe dibînin. Asûrî, Eremen, ev hemû di Îranê de

hene. Misilman hene, di nava wan de şîa, sunî, bi taybetî jî Kurd bi giranî sunî ne. Zerdeştî hene, Bihayî hene, Xiristiyan hene, Yahudî hene ev hemû hene. Ev mirov ji vê re dibêje dewlemendî, lê qiralên Îranê bi rengekî berovajî ev bi kar anîn. Ew kirin zemînê parçekirinê. Parçekirin û bihêz kirina xwecihêbûnê pêş xist. Parçe bi parçe, mînak Fars li dijî Azariyan, Azarî li dijî Kurdan, Kurd di navbera hevdu de li dijî hev. Şîaî li dijî Suniya, bi vî rengî ev tişt bi hêz kirin.

Heta ne tenê wiha di aliyê mezheb de, di aliyê cih bi xwe de. Mînak em bala xwe bidinê niha di çanda xwecihî di li Rojhilatê Kurdistanê pir rûniştiye. Ne tenê li Rojhilatê Kurdistanê, li Îranê hemûyê bi vî rengî ye. Ji ber ku siyaseteke netewî hevpar di nava galan de, mezheban de, di nava gelê ku feqîrtî, xerabiyê dibîne, siyaseteke hevbeş dernekeve.

Ji bo ku ev tiştê he bê ewlekirin, da ku kes serê xwe raneke bi taybetî jî şahê Îranê wê demê çi dikirin? Zilamê xwe yê herî nêzîkî xwe dikirin hakimê îletan, Kurên xwe dikirin hakim. Wê demê hakimê Kurdistanê kurê Muzeferdîn bi navê Salar bû. Kurekî xwe dikir hakimê Azirbêcanê, yek hakimê Kurdistanê hwd. Ger kur hebûna, ger kur tinebana, vê carê mirovên xwe di asta duyemîn de dikirin. Bi vî rengî da ku kontrol bikin. Perçe kirin, dijberî hev derxistin, bi vî rengî lewaz kirin ji bo ku karibin kontrol bikin.

Ya din jî hêza derve bû,  bi hêza Rusan. Lê tevî wilo jî, nerazîbûn roj bi roj zêde dibûn. Ev nerazîbûn pirsgirêkên siyasî, perçebûn, ekonomî, sedemên wê ev bûn. Yên ku tevlîhev didan jî sê hêzên sereke bûn.

Yek, ronakbîr bûn, yên ku bi taybetî jî li Ewrûpa xwendine û vegeriyane. Duyemîn jî, ticar yanî çîna navîn yên ku dixwestin wiha teqlîda kapîtalîzmê yên li Ewrûpa bikin, di aliyê tîcareta serbest de be, milkiyeta teybet be, sermaya netewî pêş bixin, ji ber ku şah her tiştê Îranê firotiye. Sê, dîndar bûn. Dîndar bi teybetî jî şîayî yên ku weke hêzekî dînî ruhî û exlaqî di hundirê civakê de, di navendan de. Mînak, li Qum û cihên din dibistanên wan hene, hawizên wan hene, fetwan derdixin, beramberî dejenerebûna ku sîstem dijî nerazîbûna wan çêdibû.

Yek jî desteka ticaran dikirin, ji ber ku hêza dînî çavkaniyek wê ya gelirê tine ye. Çavkaniya wê ya gelirê çi ye, ew perên ku ticaran didin wan, pê dibistanên xwe ava dikin û karê xwe pê dikin. Ev bû sersebebê ku wiha hêzekî sê alî li dijî qiraliyetê derkeve û vê di sal 1906’an de bi şoreşekî bi encam bû. Şoreşa Meşrutiyetê di sala 1906’an de li Îranê çêbû.

Encamê vê şoreşê çi bû, yek encamê wê çêkirina perlemento bû. Ango  çêkirina meclîsê bû, derxistina destora bingehîn, pêşketina ticareta netewî, ango sermaya netewî êdî bihêz bû, bi kesayet bû. Belavbûna tevgerekî ronakbîrî ya mezin jî pêkhat. Tevgera ronkabîran ya wiha mezin, pêş ket. Ev ji bo gelê Îranê gavekî pir li pêş bû. Bi gelemperî gavek li pêş bû.

Lê belê hêzên derve, wê ev gav qebûl nekiribana. Bi demê re bi alîkariya hêzên derve, bi taybetî jî hêzên leşkerî yên Rusan, piştî demekê testora bingehîn ji holê hate rakirin, li ser meclîsê basqin çêbû, meclîs ji holê rakirin. şah careke din bi rengekî motleq hikum kir. Bi alîkariya Rusan, bi alîkariya Îngilîzan û Belcîkayê, bi alîkariya hêzên dereve, hêzên ku li ber xwe didan jî yên şoreşger nema karîbûn dirêj bikiriban. Di rastiyê de li ber xwe jî dan, mînak gelek cihên weke Teberîzê pir li ber xwe dan, lê di encamê de şikstin.

Ji bo vê tevgera destorî li Îranê, ya 1906'an weke stasyonekî bû. Heta dema ku şoreşa Xumeyînî jî derket gelek kesan digotin; em carekî din destorên 1906'an vegerînin. Di aliyê sîstema siyasî de balkêş e. Di aliyê maf, azadiyê de, rakirina qedexebûnê li ser çapemeniyan, di van aliyan de destorekî li pêş e. Lê belê bi ser neket, bi vî rengî şerê cîhanê yê yekemîn, çêbû. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn, Îngilîzan girîngiya petrolê hîna zêdetir derxist pêş. Îranê hîna zêdetir girîngiya wê derxist pêş, weke cihekî stratecîk. Îngilîzan dît ku êdî ev malbata Qacaran, nema dikarin kar bi rê ve bibin.

Gel wan nas nake, qebûl nake, lewaz bûne, kes li wan guhdar nake, êdî gel timî li ser piyane, dîndar li ser piyane, ticar li ser piyane, ronakbîr li ser piyane. Dît ku di rêka Qacaran re nikarin desthilatdariyê bidin rûniştandin. Çiqasî hikumet çêkirin, lê wan hukmetan îflas kirin, di demekî kin de hildiweşiyan.

Di pişt re Îngilîzan çi kir, Îngilîzan yek bi navê Riza Pehlewî, bi xwe di artêşa Qazaq ya Îranê de, jixwe artêş di bin venêrîna Rusan û Îngilîzan de bû, di wir de subayî bû. mirov dikare bêje di esas de subayê Îngilîzan û Rusan bû.

Ew anîn kirin serokwezîr, wezaret çêkirin. Lê ev kesayet pir otorîter bû. Îdiayê wî yê nûbûnê hene, bi taybetî jî sala 1922'an de bû desthilatdar. Bi taybetî jî tevgera Kemalîst di Tirkiyê de dişûpand, daxwaziyên wî ew bû êdî di Îranê de dewletekî netewe, navendî, heta li gorî xwe cumhuriyet weke Tirkiyê çêbike. Ev daxwaziyên wî hebûn.

Wî mala Qacaran ji erkê avêtin, êdî qiraliyeta wan, bandora wan nema kes nas kir. Lê piştî demekê dît ku weke Tiriyê nikare bike. Hêza wî weke ya Mustefa Kemal xurt nebû. Di Tirkiyê de hêza împeratoriyê, hêza yên umetger û yên dîndar beramberî Îthat û Tereqî lewaz bûbû. Beramberî Mustefa Kemal bi temamî lewaz bûbû. Mustefa Kemal li hemberî Îngilîz û Fransa şer kir, bi ser ket. Ji bo vê serkeftina wî çi tiştê ku dixwest karîbû bi Tirkan bide qebûl kirin. Kes nikarîbû serî li hember rabike.

Ji bo vê dîndar li Tirkiyê rabûn, pir serhildan çêbûn. Ne tenê di nava Kurdan de çêbûn. li Tikiyê jî li dijî Kemalîzmê ji bo vegerandina împeratoriyê, lê hemû çewisandin. Mînak, Înûnû ji milekî ve şer dikir, Edhem Çerkez ji milekî ve şer dikirin, van hemûyan serhildan diçewisandin. Serhildanên gundiyan yên bajarên cuda cuda di Tirkiyê û Enedolê de diçewisandin. Tevî

wilo jî bi ser ket û karîbû tiştên xwe bida qebûl kirin û cumhuriyetek layîq, dîn û dewlet ji hev cuda kir, hwd.

Şahê Îranê beriya bibe şah, Riza Pehlewî dît ku li Îranê nikare vê bike. Ji ber ku hêza dînî bihêz e, serkeftinekî wî weke ya Mustefa Kemal tine ye ku pê rewabûnê pê qezenc bike. Ji bo vê nikare wî şêwazî bide meşandin. Di Îranê de gelek netew tê de hene, ev netewana bi hêz in. Ne wiha biçûk in ku karibe zû wan daqurtîne. Ji bo vê dewletek wiha homojen, yek tîp, navenî cumhuriyetger, layîq nikarîbû çêbike.

Çi kir, qiraliyet ava kir, yekî nû ava kir. Niha ev qiraliyet di asil û feslê xwe de ne qiralin, ji berê de ji bav û bapîrên xwe de ne qiralin, di nava artêşê de subayî bû, ew anîn û kirin serokwezîr, di piştî ku Qacar ji holê rakirin di sala 25’an û şûnda qiraliyeta xwe îlan kirin, bû şah.

Heta şahin şah, textê tawis ango bi vî rengî bi nav dikir. Heta mînak qiraliyetek wiha qebûl kir, mînak pir ji Ereban nereht bûn. Ev rast heta carekî jê re dibêjin; tu çawa bûyî qiral divê ku qiraliyet ji sûyê bê, ew jî wiha bersiva wan dide û dibêje; ma çima Erebên çolê dikarin bibin qiral, çima ez ê nebim qiral. Ji ber ku di Erebistanê de jî wê demê qiraliyet çêbûbûn. Heta Îngilîzan hemû welatên Ereban dikirin qiral, wî jî digot; ma çima ew dikarin bibin qiral, çima ez nikaribim bibim qiral.

Bi vî rengî qiraliyet li Îranê avabû. Qiraliyetek nû ya navendî, dewlet ava dibe, ev dewleta navendiye û hemû nerazîbûnên ku li dijî dewleta navendî yên ku li kêlekan çêdibin, wan bêbandor dike.

Mînak, Simkoyê Şikakî, hinek tevgerên Azeriyan, tevgerên din yên ku dixwestin destûra esasî di sala 1906’an de vegerînin, hemû hatin çewisandin, dewleteke navedî û bi temamî girêdayî Îngilîzan, di Îranê de hate çêkirin û ev dewlet heta sala 1941’ê bi vî rengî berdewam kir. Di sala 1941’ê de hinek guhertinên nû çêbûn.

**Armanc Û Sedemên Pêşketina Şerê Cîhanê Yê Duyemîn**

Di vê demê de li Îranê bi taybetî ji aliyê nifûsên Rojava bi giranî jî yên Îngiltera zêde serwer bûn. Her çiqasî Riza Şah bi rengekî Şah di sala 1925’an û şûnda îlan kiribe jî, her çiqasî bi armancê hikumetek navendî ava kirin be jî, otorîter, kontrolî, lê bi ser nekt. Di wan milan de nikarîbû bi ser biketiba, gav bi gav pêvajo ber bi şerê cîhanê yê duyemîn ve diçû.

Şerê cîhanê yê duyemîn, ew jî sedemên wê hebûn. Şerekî parevekirinê bû, şerê kapîtalîzmê bû. Bi taybetî jî Elamniya ti carî binkeftin (hezîmet) qebûl nekir. Di senaiya xwe ya li pêş de, bi taybetî jî ya leşkerî, bi serkeftina partiyekî nijadperest bûbû desthilatdar. Êdî bi zimanekî dirêj, bi dengekî bilind gotin; em encam şerê cîhanê yê yekemîn qebûl nakin, ev zilm e, Elamniya ev heq nekiriye. Ji bo vê jî em van encaman qebûl nakin, divê em

ji nû de dizayînekî çêbikin. Perelêr bi Elamniya re Îtaliya, Japoniya, di heman xetê de dimeşiyan.

Mîlîtarîzm leşkeriyatî, bi taybetî sanaiya leşkerî di van dewletan de pêş diket. Pê re pereler partî û hêzên nijadperest, şoven, nijadperest, ew derdiketin pêş. Yek jî hebûna dewletek sosyalîst di cîhanê de nedihat qebûl kirin. Nifûsa wê jî zêde, erda wê zêde, ji ya cîhanê ji şeşan yek, xetek pir mezin, nifûsek pir mezin, sosyalîst weke sîstemekî nû, ew jî nedihat qebûl kirin. Elamniya li ser esasê vegerandina hêza xwe ya berê li Ewrûpa, dest bi kar kir.

Çawa bû ev kar, di serî de êrîş kir Awstoriya girt, dagir kir. Ewrûpiyan got protestû kirin, lê helwestek piratîk li bermaberî wê dernexistin. Dema ku Elmaniya wiha dît vê carê di sala 1938'an de êrîş kir û Ewstoriya girt. Piştî wê Çekzlovakiya girt, ew jî dagir kir, dîsa kes dengê xwe nekir.

Ji bo vê Elmaniya di propoganda xwe de behsa hinek cihên din kir, behsa Poloniya kir behsa Rusa kir, behsa van welatan kir û gotin; em ê wan jî dagir bikin, ew jî yên me ne.

Di şerê cîhanê yê yekemîn de bi darê zorê ji me hatine standin û bê mafiye, em ê careke din bigirin bin kontrola xwe. Ewrûpiyan jî ev got; Eger Elmaniya Poloniya jî bigirin, em ê wê demê şer bikin. Rastî jî yekê Eylûlê di sala 1939'an de Elmaniya Poloniya dagir kir û şerê cîhanê yê duyemîn destpê kir.

Di sala 1939'an yekê Eylûlê şer destpê kir. Niha jî yekê Eylûlê bûye roja aştiya cîhanê, di rastiyê de berê roja şerê cîhanê yê duyemîn bû. Lê wê rojê ji bo şer helwestên xwe nîşan bidin ew roj kirine roja aştiya cîhanê.

Rusya destpêkê neket şer, di serî de peymanek bi Elmaniya re mohr kir, li ser esasê ku dijberiya hevdu nekin. Di wê navberê de Rusya zane wê şer bi ser de biçe, yek ji hedfê vî şerî ew e, ji bo vê senaî pêş xist. Artêşa xwe hinekî dizayîn kir, xwest hinekî xwe bi ser hev de bîne. Elmaniya encax ev sebir kir ta kengê, ta sala 1941'an, di wê sale de êdî eniya Rusan jî şer dest pê kir. Elmaniya gelek parçên axa Rusiya dagir kir.

Emerîka jî ket şer, bi vî rengî du hêz di cîhanê de hebûn. Yek jê Elmaniya, Îtaliya û Japoniya. Ji van re digotin dewletên eksen, yên (muhwerî). Eniya dijdemokarsiyê, nazî, faşîzm bi vî rengî nav lê dikirin. Bi vê eniyê re hikumetên faşîst di cîhanê de hebûn. Li gelek welatan hikumetek destek dida wan, mînak cihên weke Yewnan, Roma, Bulgarîstan, Portekîs, Îspaniya û di gelek cihan de hevalbendên wan hebûn. Yên heman xetê dişûpînin.

Beramberî vê di serî de Fransîz û Îngilîz, pişt re tevlîbûna Sovyet û Emerîka eniyek navnetewî dijî faşîzmê van jî navê xwe kir eniya demokratîk, ya antî faşîst, di cîhanê de partiyên dijî faşîzmê bi taybetî yên çep komunîst, li gel vê eniyê şer kir.

### Di Îranê De Guhertinên Nû Û Sedemên Pêşketina Wan

Li Îran jî çalakiyek wiha dest pê kir. Gav bi gav eşker bû ku Riza Şah, bavê Şahê ku Xumeyînî bera wî da, şoreşa gelê Îranê di sala 1979'an de, ji erş hate avêtin û reviya surgunê, em qala bavê wî dikin. Riza Şah çalakiyek wî yak ku bi Elmanan re bibe yek hebû. Lê piratîka wê tine bû.

Ev têkiliyên wî bi Elmanan re bûn sersebebê ku Elmaniya bin navê aktîvîtên cuda cuda de hinek Elmanan rêbike Îranê. Hêjmarek dused, sêsed tê gotin, lê îdiayê Îngilîz û Emerîka yên ku li bihanek digeriyan, dibêjin bi hezaran bûn. Lê diyare ku ne bi hezaran bûn. lewre ger çend bin jî Elman li Îranê tevger dikirin û gelek tişt dixwestin pê gelê Îranî bandor bikin.

Mînak yek jê meselên Aryanî, duyemîn jî meselên dîn bû. Ji ber ku Elmaniya xwe gelekî dostê Misilmanan didîtin. Heta dijberiya wan ya bi Yahudiyan re vê meselê hîna zêdetir xwestin dostaniyê pê bihêz bikin. Herwiha mesela Aryentiyê jî nijada Arî yê herî pîroz dibînin. Bi vî rengî propogandek dihat kirin, her demê Elmaniya weke stratejî, boyutê wê yê stratecîk timî çavê xwe bera Îran û Qefqasiya daye. Ji ber ku dixwaze weke împeratoriyekî mezin hikum bike, ev cihên stratecîk timî çavên xwe bera wan daye.

Ev xeterî Îngilîz û Rusan fêm kir. Ji bo vê hîna ku Elmaniya neketî dewrê, heta kîjan astê planek Elmanî wiha heye yan jî tine ye, lê çalakiyek wiha li Îranê hebû. Hem jî zemînek hazir ji aliyê Elmaniya de hebû. Hina ku Elmaniya neketî dewrê, Îngilîz û Rusan bi artêşên xwe Îran dagir kirin. Di sala 1941'ê de dagir kirin. Di navbêna xwe de parçe kirin, qismek ji erda Îranê ket bin destê artêşa Rusa, qismek jî ket bin destê artêşa Îngilîzan. Bi taybetî jî ev cihên weke Urmiya, Azerbêcana Îranî, ev hemû artêşa Rusa tê de bûn. Qismê Kurdistanê yê ku niha Îranî weke Azerbêcana Xerbî dihesibînin, ew jî bandora Rusan li ser hebû. Heta artêşa Rusan, hîna pêş ket heta Rawendoza, ev Rewendoza li Başûr heta wir hata wir hat.

Yên din jî di bin destê Îngilîzan de bû, Şahê Îranê jî peywirê xistin, ew avêtin û surgun kirin. Surgunî Başûrê Efrîqiya bajarê Hasburgê kirin. Ji xwe li surgunê mir. Di pişt re jî ji wir çû Misrê û li Misrê mir. Careke din venegeriya Îranê.

Li şûna wî Îngilîz û Rusa, kurê wî Mehmed Riza kirin Şahê Îranê. Emrê wî wê çaxê 23' bû, ciwan bû. Ew kirin Şah, bê otorîte bû. Jixwe ti tecrubeyek wî wiha tine bû, di nava dengên hêzên pir balkêş û mezin de zêde tiştek ji hev dernedixist, ango nedikarî tam li ser meselan hakim be. Lê di esas de Îngilîz û Rusan kar bi rêve dibirin.

Şerê cîhanê yê duyemîn di sala 1945'an de xelas bû. Di vê navberê de bi alîkariya Rusan û bi alîkariya Îngilîzan di cih cihna de, bi taybetî jî bi alîkariya Rusan gelek xebatên siyasî di Îranê de pêş ketin. Di nava Kurdan de pêş ketin, di nava Ezriyan de pêş ketin. Şahê Îranê, yê nû yanî kurê Şah Mehmed Riza Şah, dema ku bû Şah, dema ku erk danê di dewletê de, hinek reform çêkirin.

Yek ji wan reforman çi bû, berdana girtiyên siyasî bû. Di nava wan girtiyan de bi dehan heta bi sedan jî endamên partiya komunîst hebûn. Ew jî derketin û rêxistinên xwe çêkirin. Efwek siyasî derket û ji zindanê derketin. Li Ezirbêcanê bi alîkariya Rusan partiya komunîst li wir kar kir. Çepan kar kirin, li wir dozenek xwe çêkirin. Li Kurdistanê bi alîkariya Rusan bi navê Komele, pişt re partiya demokratê Kurdistanê, li wir gav bi gav ber bi îlankirina cumhuriyetekê ve çûn. Bi vî rengî di dema ku dewleta navendî navendî di Îranê de lewaz bûye, bi alîkariya ku ji artêşa bi taybetî jî ya Rusan dihat, hem Kurd hem jî Azarî li gorî xwe rêxistin pêş xistin, vê jî li dawiya şerê cîhanê yê duyemîn, bi rengê cumhuriyet îlankirin.

Cumhuriyet Teberîz, ya Mihabad, bi vî rengî cumhuriyet îlankirin. Ji lewre ev pir bi pirsgirêk derBeasbûne. Lê dema şerê cîhanê yê duyemîn xelas bû, Îngilîzan Şah bihêz kirin û gav bi gav nifûsê Rusan xwestin lewaz bikin, ji bo vê heta asta dawiyê li dijî wan tevgerên bi alîkariya Rusan mezin bûne, li dijî wan Şah xistin dewerê û destek kirin. Li dijî Kurdan, Azeriyan, Rusan jî heta asta dawiyê helwestekî bê prensîb nîşan dan.

Yek payek jî petrola Îranê danê, duyemîn Rus her demê li dostaniya Îranê digerin. Ji ber çi li dostaniya Îranê digerin? Ji ber ku Rus dixwazin li ser Îranê re xwe bigihînin zeryayan, yanî xwe bighînin avên germ. Ji ber ku Rusya, pirsgirêkên wê yên ava hene. Deryak heye ya bi navê Baltik heye, lê zêde stratecîk nîne. Behra Reş jî girtiye, neçare ku di boxaza Tirkiyê re derbas bibe. Her kêliyê Tirik ji wan re pirsgirêkan derdixin. Ji bo vê Rus her demê dixwazin di ser Îranê re xwe bighîne zeryaya mezin a Hindî.

Ji bo vê her demê dixwaze têkilîne li ser esasê dostaniyê û xweşiyê bi Îraniyan re deyîne. Li ser esasê van têkiliyan, payek ji ptrola Îranê, her du cumhuriyetên dostê wê bûn. Hem Mihabat, hem jî Teberîz, ango beramberî hilweşandina van cumhuriyetana, temaşevan ma. Qet destwerdan nekir, destek nekir û wiha ji çarenûsa wan re ew berdan.

Bi rastî jî piştî salakî, di sala 1946'an de dawiya wê di serî de Tebrîz, pişt re jî Mihabat hatin tesfiye kirin û paşê Şahê Îranê serweriya xwe gav bi gav li ser dewletê xurt kir, ew efûya ku di sala 1941'an de derxistibû, ew teng kir. Bi taybetî jî di sala 1949'an de, ango piştî çar salan bi bihana ku reşkujî li ser hate kirin, bi wê bihanê biryarek derxist TUDEH partiya komunîst ya Îranê qedexe kir. Endamên wê hemû girtin û kirin zindanê. Zêdetirî bîst û pênc kesan hatin sêdar kirin, bi giranî jî di zindanan de man. Bi vî rengî navendîbûna xwe çêkir, ji lewre Îngilîz destek dikir. Rewşa Îranê di wê demê de bi vî rengî bû.

Lê belê di wê demê de tevgerek lîberal, rewşenbîr, welatparêz li dijî vê ferdiyeta Şah û li dijî talan ku Îngilîz ji ptrola Îranê re dike, li dijî wê kombûyînek di tevgera netewî de çêbû. Bi serokatiya Dr.Musedeq ev çêbû.

Dr.Musedeq kesekî ji arstoqratên Îranê tê. Bi emir pir mezin e. Ronakbîr e, lê welatparêz e. Bi serkêşiya wî tevgerek

wiha pêş ket. Şahê Îranê li dijî vê tevgerê bi taybet xwest bi çewisandinê tesfiye bike, lê nikarî. Ji bo vê çi kir, banî Musedeq kir got, "temam tu bibe hikumet." Ji bo çi wiha kir, ji bo Şah ji krîzê derbas bibe. Yanî ew Musedeqê serokê tevgera netewiye, wê bi xwe wî bike serokwezîr, ango bike serokê hikumetê, bi vî rengî nerazîbûna gel pûç bike.

Musedeq di sala 1951'ê de bû serokwezîr, lê Musedeq weke Şah kar nekir, prensîbên xwe yên netewî pêk anî. Çi kir, efoyek derxist û careke din endamên TUDEH komunîst ji zindanê derxist. Tevgera çep serbest kir, rojname hemû serbest kirin. Gav bi gav dest danî ser ptrolê û kir ya dewletê. Petrola Îranê ya ku Îngilîz talan dikir, gev bi gav dest danî ser. Musedeq gelek tişt kirin.

Di serî de Îngilîz û Emerîka ketin kelecanê. Ji ber ku Musedeq, komunîst berdan. Tevgera çep di Îranê de bihêz dibe, bi rastî jî berê di Îranê de gelekî bihêz bû. Çawa tepeserkirin li ser radibû zû di nava gel de belav dibû. Tevgera çep dema ku di Îranê de bihêz bibe, dibe potyanselek xeternak. Ji ber ku Îran li ser sînorê Suvyetê ye. Di nava roj û şevekê de dikare derbeyek komunîst jî di Îranê de çêbibe.

Îran milyonek kîlometre kare, erdnîgariye, bi milyonan nifûs e, li ser deryak ji ptrolê ye, gaza xwezayî, li ser okyanûsê ye, pir stratecîk e. Ji bo vê li dijî Musedeq ketin nava hewildanan. Şah xwest Musedeq bi sînor bike, nikarîbû. Neçar ma bireve, Şah wê demê ji Îranê reviya derve. Îngilîzan çi kirin, ambargo danîn, mînak ekonomiya Îranê di asta yekemîn de li ser ptrolê ye, ptrol jî dewletên weke Îngilîz, Fransa, ev dewletan dikirin, Emerîka dikire, ji nişkê ve ptrola Îranê nema kirîn.

Ji derveyî wê qulê pêncemîn xistin dewrê. Taborên pêncemîn xistin dewrê, hêzên fitnê, fesad, antî propganda, li dijî rêxistinê, diziya tiştan, stop kirina mal ji bo ku di pazarê de nemîne û birçîbûn çêbibe, fîat biha bibin. Pêdiviyên herî girîng ji bo însan neyê dîtin, kar kirin, bi taybetî jî CIA'ê bi rengekî berfireh kar kirin. Heta pere di rêkan de belav dikirin, wer di rêkan de disekinîn û pere belav dikirin ji bo ku gel li dijî Musedeq rabikin.

Ev tevgera li dijî Musedeq, bi vî rengî gihîşt astekî ku aheng xerabûn, duzen xirabû, gel rabû, artêş ket tevgerê û Emerîka Îngilîz dostên wan nokerên wan ketin tevgerê û derbe çêkirin û Musedeq ji hikum avêtin. Hevalên wî yek du sêdar kirin. Ew bi xwe jî kirin zindanê Şah careke din vegerandin. Vê carê hîna bihêztir, vê carê tenê bi alîkariya Îngilîzan na, bi temamî bi alîkariya Emerîka vegeriya, di sala 1953'an de vegeriya.

Di sala 1953'an de Şah vegeriya, Şah êdî weke ciwanekî nû bê tecrûbe nîne. Mezin dibe, tecrûbe girt, gelek bihêz bû, alîkariya Emerîka jê re pêş ket, xurt bû. Ji bo vê piştî demekî Şah programek îlan kir. Çi bo ew prgram? programê şoreşa Spî bû. Ev di sala 1963'an de, şoreşa spî çi ye? Şoreşa Spî modernîzasyone,

moderin kirina Îranê ye. Torîzm, senaiya montac, mafê jinan di hilbijartinê de hwd. Ev tişt he derxistin pêş.

Gav bi gav Rojavabûn derxist pêş. Ji lewre beramberî vê tevgera Şah, dema ku Musedeq ji holê rabû, vê carê tevgera çep qedexe kir, TUDEH hemû girtin xistin zindanan, her tiştên wan qedexe kirin, terorek mezin li jî wan dan meşandin. Li dijî partiyên siyasî, mînak partiya TUDEH, rengên îşkencê yên ku dihatin pêkanîn, di pişt re dema Xumeyînî di sala 1979'an de dema ku Şah reviya, belgeyên SAVAK, SAVAK îstxbaratê Îranê ye, weke îtîlîatê niha ye, lê wê demê navê wê savak bû. Belgê savak ketin destê wan, hinek tişt belav kirin, mînak kasêt îşkencê hebûn, yên vîdyo belav kirin. Di wan kasêtan de ev hebû ku çawa savak endamê TUDEH îşkence dikir.

Wê demê tenê ne TUDEH'a bûn, Fedayên Xelq bûn, Mucahîdî Xelq bûn, ev kasên wiha çep bûn. Hinek milî bûn, lê belê bi giranî TUDEH bûn. Mînak di hinek kasêtan de dîmenên wiha derdiketin, çawa jinên TUDEH'iyî wiha bi saxî singê wan dişewitandin. Bi vî rengî da ku li xwe mukur bên. Renge reng îşkence dihat meşandin. Rengên pir dijwar, lewre kevneşopî hemanin û di roja me ya îro de rêûresma vê hîna xerabtir tê meşandin. Ji lewre pê van tiştan qaşo zemanê Şah teşhîr dikin, lê niha jê xerabtir dikin.

Di sala 1963'an de pêngava şoreşa Spî Şah dest pê kir. Moderm kirina civaka Îranê. Lê dema ku şoreşa Spî dest pê kir vê carê Şah şoreşa Spî li ser nirxên Rojavayî da rûniştandin. Vê carê bi dîndaran re ket nava nakokiyê. Bi taybetî jî tevgerek dîndar, wer li pêş hebû.

Mînak, Xumeyînî li dijî Şah propoganda kir ev rast e. Demekî hate girtin û berdan, wê demê peywira wî wiha mezin nebû, di nava dewletê de bû. Ayetilah bû, lê ne yê mezin bû, piştî ku bû ayatilahê mezin vê carê nema karîbûn wî bigirin, ji ber ku zagonên Îranê ayetilahê mezin nagirin. Wê demê wiha bû, ji ber ku digihîje astekî weke pîroz e. Vê carê negirtin, lê ew surgun kirin, çû Tirkiyê ji Tirkiyê çû Necef û ji Necef jî çû Fransa.

Xumeyînî yekî wiha zêde jî balkêş nebû. Lê belê dijî sîstemê bû, di esas de koma dîndar ya ku li dijî sîstemê, komekî cuda bû. Bi taybetî Ayetilah Telqanî, Alî Şîraetî hebû. Ev demokrat bûn, nirxên Îslamî diparastin, lê sosyalîst bûn. mînak Alî Şîraetî di rastiyê de weke çawa em bêjin Voltêr û Can Cakroso, di şoreşa Fransî de lîstine, di rastiyê de Alî Şiraetî jî mirov dikare bêje di şoreşa Îranê de rolekî wiha lîstiye.

Bi propoganda xwe, bi tiştên xwe, ji ber ku van derve dîtibûn, demokrat bûn, heta çep bûn. Sosyalîzm red nedikirin, rast e dîndar bûn, lê sosyalîzm jî red nedikirin. Mînak Alî Şîraetî dostaniya wî bi Frantz Fanonê Fransî re heye, bi Sartre re jî heye, desteka şoreşa Cezaîr kiriye, yanî mirovên wiha ji kevneşopiya têkoşînê tên, wiha ev derketin pêş.

Her Şah milî bû, her Şah moderin bû, ewqasî bi dîndaran re kete nava nakokiyan. Mînak boyerek wê demê heye di sala 1971'ê de, Şah salvegera 2500. ya împeratoriya texmînî pîroz dike. Li ku pîroz dike, li Perspolîs pîroz dike. Perspolîs tine ye, kavl e, di zemanê xwe de paytext bûye. Di zemanê Persan yên kevn de paytext bû. Li wir çadir vegirtin, cenetorê mezin yê ceyranê danîn, yexçal danîn, hemû qîral û serokên cîhanê deawetê wê pîrozbahiyê kir. Her kes hate wir, heta wê demê serokê Suvyetê jî hatibû wir, wê demê serokê Suvyetê bû, lê ne bi gelemperî sekraterê partiyê bû, navê wî Bod Gornî bû, ew jî hatibû wê deawetiyê, qiralên Ereban hemû, serokên cîhanê hemû ji her derê hatibûn wir. Pîrozbahiyek wer şaşalî, mesrefekî wiha mezind dabû wê pîrozbahiyê, heta wê demê hinek rojnamevanan wiha nivîsandibûn ku175 milyon dolar mesref kiribû.

Dihate gotin ku ewqasî mesref kiribû ku xwerinên pir biha, weke havyar giran bûn xwarina wan. Wiha pîrozbahiya salvegera 2500.ya texmînî pîroz dikir.

Vê pîrozbahiyê dîndar nerehet kir. Dîndaran gotin, ew ne qiralên me ye, em Misilmanin, ew kavfirbûne. Ji bo vê em di roja îro de çawa wê dîrokê pîroz bikin! Yê me dîroka me dîroka Îslamê ye, em ji Alî hez dikin. Em ji Kîros hez nakin. Ev tevgera Şah ya miliyetger, yê modernîst gav bi gav mesafeta di navbera wî û dîndaran de fireh kir.

Ev nakokî kûrbûn, heta sala 1978'an êdî nerazîbûna gel derketin pêş. Li Azerbêcanê, li cihên din jî derketin pêş, êdî şah nema dikarîbû qontrol bikiriba, di serê sala 1979'an de Îran berda û derket. Yanî hinek soz dan û got; ez ê wiha bikim, wiha bikim, weke serokên Ereban yên niha. Lê êdî zeman derBeasbûbû, gel nema pê bawer dibû.

Li ser vî esasî li Îranê şoreşa gel çêbû. Di vê şoreşê de kî hebûn? Di vê şoreşê de gel hebûn, Kurd hebûn, Azerî, Beloc, Ereb hebûn yanî gelên bindest hebûn. Di vê şoreşê de çep hebûn. Tevgera çep bi rengekî berfireh di nava vê şoreşê de cih digirtin.

Di vê şoreşê de zêdetir hêzên civakî bi taybetî jin û ciwan hebûn. Jinan zêde cih di vê şoreşa Îranê de girtin. Di vê şoreşê de dîndar jî hebûn. Yanî saziya dînî wê jî tê de cih girt. Dema ku Şah reviya Xumeyînî li Fransa bû êdî roportacên wî, di hemû rojnamên cîhanê de derdiketin. Şîrovên wî derdiketin, xîtabê gel dikir ji wir hêdî hêdî beralî dikir.

Di meha şibatê ya sala 1979'an de Xumeyînî hate Îranê. Li Qomê sekinî, lê her desthilatdarî bi rê ve dibir. Mînak, wê demê hikumetek çêbû, jê re digotin Mihdî Bazirganî. Lê wê hikmetê nedikarî tiştekî bi rê ve bibe. Ji ber ku Xumeyînî beralî (yonlendirme) dikir. Her tiştê wî vala derxistin. Hikumetek din dîsa hat, lê ti hikumetan nekarîbû li ber xwe bidaba, heta hinekan weke Bazirganan eşkere gotin, ji ber van dîndaran em nikarin tiştekî bistînin, îstîfa kirin, yên din jî wiha îstîfa kirin. Di pişt re Xumeyînî got, " êdî zemanê te teqiyecitiyê xelas bû, êdî em ê bi desthilatdar bin, em dibin wîlayeta feqî, şîa bê îmam nikarin bijîn,

desthilatiya ku di erdê şîîa de divê ku di bin hikumê îmam de bin. Em ê hikumetê çêbikin, wezîran em ê teayîn bikin. Komîtanên artêşê em ê deyînin, êdî zemanê ku em bi dizî, derveyî desthilatiyê kar bidin meşandin, ew zeman çû em dibin desthilatdar.”

Gelek dîndaran gotin; ev berovajiye, wîlayeta feqî tiştek cuda ye. Wîlayeta feqî çi ye? Wîlayeta Feqî, dibêjin şîîa timî bi îmaman tê birêve birin, lewre îmam Hesen, Husên, Musa Eskerî, Kazîm hwd, heta tê îmamê dozdan, Muhemedê Mihdî dibêjin wenda bûye. Ji bo wê hêviya vî îmamî ne ku wan bi rê ve bibe. Ji ber ku ew îmam tine ye, divê ku wîlayeta wî hebe. Yanî yê ku bi navê wî hikum bike hebe, tiştek hatiye çêkirin, di şîîatiyê de tine ye. Lê Xumeyînî ev tiştê he ferz kir. Gelekan weke Alî Şerîetî, Telqanî, Muntezerî, van gotin tiştê hûn dikin çewtin, tiştekî wiha tine ye. Divê ku em şîretan bikin, exlaq, dîn, wezan bidin, lê em rabin bibin desthilatdar çênabe.

Ji lewre Xumeyînî bi ser ket. Hêza rêxistinî ew bûn ya dîndaran bû. Wan gotin, divê em biçin raferandomekî li ser çi esasî, gotin eger em ê biçin raferandomê wê demê bi vî rengî raferandomê bikin, yên ku bixwazin cumhuriyeta Îslamî, yên ku bixwazin cumhuriyeta Îranê. Xumeyînî got, na. Ji ber ku dizanî eger bi van her du bendan biçe raferandomê wê gel cumhuriyeta Îranê bixwaze, kes cumhuriyeta Îslamî nexwaze, wê gelo kî wê demê cumhuriyeta Îslamî bixwaze!

Lewre Xumeyînî got, divê ku bi yek tiştî em raferandomê bi yek tiştî çêbikin, ew jî yên ku cumhuriyeta Îslamî dixwazin, yên ku naxwazin. Di bin tepeserkirinekî mezin de gelek jî gel neçûn raferandomê. Dibe ku ser sedî pêncî nifûsa Îranê neçû raferandomê bi vî rengî navê wê kirin cumhuriyeta Îslamî. Dozen danê lê pir tevlîhev bû. Dema ku mirov vê dozenê fêm jî neke, mirov dikeve nava lawaziyan.

Mirov dikare wiha li ser vê mînakê jî bide, dema ku Xatemî bû serok komarê Îranê di serî de Kurdan û gelek kesan li Îranê wer bi erênî nêzîk bûn, gotin êdî pirsgirêk wê çareser bibin. Ji ber ku bi rastî soz da, ew soz dibe ku ne derew be. Mînak, weke kes ez bawer dikim ku Xatemî bi demokrasiyê bawer e. Dibe ku pê bawer be, ji ber ku nivîsên wî hene, nêzîkbûnên wî ji meselan re hene. Ango yekî wiha pir ji rêzê nîne. Geriya soz da, nava Kurdan de soz dan, her kes got wê bê guhertin, ji ber ku yê herî berpirsiyar ew bû, dibe serokê komarê, ewqasî soz dane. Bi xwe jî reformger e, bi xwe jî vî tiştî qebûl dike.

Lê li Îranê tiştek nehat guhertin, sedem çi ye? Heşt salan hikum kir, lê tiştek nehat guhertin. Sedem çi ye, sedem sîstema ku hatiye ava kirin, sîstema wîlayeta feqiye. Li Îranê sîstemekî li ser esasê wîsayetê ye. Waliyê feqî berî her tiştî, mînak berê Xumeyînî bû, niha Alî Xamenî ye. Ev çi dike? ev dikare serokê komarê ji erkê bigire, dikare parlementerê çareser bike, komîtanê leşkerî ew erkdar dike. Wîzaretên taybet mînak ya îtîlaetê, ya hundir, ev wîzaretanan ew datîne. Di vê astê de li ser her tiştî serwer e.

Mînak em bêjin ger perlemento xwestin tiştekî bike, eger bi wîlayeta feqî re berovajî be, yanî bi îmam re berovajî be, wê demê îmam dikare biryarekî derbixe û perlemento çareser bike. Erka wî ev e, lewre îmam heye, li kêleka îmam, meclîsa xubera, ya dîndaran, yên ku derbarê dîn de û wîlayeta feqî hildibijêre, ew heye. Saziyek din jî heye bi navê şorayê teşxîsa berjewendiyên nîzamê, ne weke mehkumên makzagoniye, hîna jî dijwartir e. Gelek saziyên din jî hene, heta ku digihîje serokê komarê. Ji bo vê hêza hilbijartî li Îranê, her demê ne bi bandor e. Kengê bi bandor e, dema ku di çarçoveya perspektîfên, îmam de tevdigere. Mînak weke di roja me ya îro de Ehmedê Necat. Lê di roja me ya îro rewş li Îranê aloz e. Aloziya wî di ku de ye? Yek civaka Îranî gav bi gav rewabûna sîstemê êdî nas nake. Sîstem bi çi rewa bû, bi hilweşandina Şah. Gel jê re got, mala te û bavê te ava te Şah hilweşand, sed carî seat xweş.

Di pişt re sîstem bi şikendandina dagirkirina Îraqê xwe rewa kir. Ji ber ku Îraq ji nişkê ve êtîş li ser Îranê kir. Di demekî ku Îran parçe parçe bû, ne artêş, ne çek, tiştek di holê de tine bû, anarşî bû. Her roj hevdu dikuştin, lê Îraq êrîş kir vê sîstemê êrîşên Îraqê şikenand. Ew jî baş e.

Lê di roja me ya îro de rewabûn nemaye. Ji ber çi rewabûn nemaye, ji ber ku Îran, civakekî zindiye, bi reng e. Dixwaze xwe îfade bike, heta civakekî wiha çawa ji derve de tê diyar kirin ku girtiye nîne, nisba xwendina jinan li Îranê dibe ku di hemû cîhanê de zêdetir be. Civakekî di wî aliyê de dînamîke, zindiye, bi tîcaretê ve mijûl dibe. Ji bo vê ev şêwazê siyasetê, ev hikum civaka Îranî zêde tengav dike.

Di çanda wî ya jiyanê de tengav dike, di xebatê wî yê ekonomî de tengav dike, di fikirê siyasî de tengav dike, di her milî de tengav dike. Îraniyên ewqasî di astekî wan yê çand, huner, xwendinê de heye, nizanim divê ku heta ku pûrê xwe girê bide, çi li xwe bike, çawa tevbigere hwd, ew civak wê ranake. Ji bo vê mirov lê temaşe dike ku di roja me ya îro de muxalefetek hundirîn pêş dikeve. Ew muxalefet cidî ye. Ew muxalefet ne lîstoka emperyalîmê ye. Em şaş neçin, heta eger emperyalîzm xwe wiha weke çawa dostê vê muxalefetê ye, ew wendahiye ji muxalefetê re, wenda dike.

Ev muxalefet di hundirê sîstemê de ye, bi van şêwazên otorîter qedexe kirinê, êdî civak nema radike. Her diçe Îran tund dibe, her diçe bi sîstema navnetewî re dikeve nava nakokiyê ev bi rengekî neyînî, bandorê li ser rewşa hundirîn dibe. Feqîrtî çêdibe, di roja me ya îro de embargo heye.

Mînak em bala xwe bidinê di welatekî de ku di nava hilberîna ptrolê de di cîhanê de yê sêyemîn e, gaza xwezayî, di erdnîgariyek mezin de ye, erdnîgariya Îranê jî ne çol e, erdnîgeriya Îranê pir dewlemend e. Vê car li ser deryaya ye, mînak milek wê zeryaye, milê din jî derya Xezere ya ku niha tê de yetaqê ptrolê derketiye, wekî din jî dev ji van hemûyan jî ber de, eger tenê xwe bispêre çavkaniyên din jî wê herî dewlemend be.

Lê bi vê sîstem çênabe. Sîstema ku wiha li ser esasê qedexan hatiye pêşxistin, çênabe. Ji bo vê niha tengaviyek mezin heye. Niha Îran sîstem rewabûna xwe bi şerê li dijî emperyalîzmê dixwaze bide sekinandin. Lê ev jî di hilbijartinên dawiyê yên serok komar de, zêde pere nekir. Tevî ku embargo jî, lê gel careke din rabûn ser piyan û serhildan pêk anîn. Ev bi dawî nehatiye kirin, êdî muxalefet tesfiye nabe, niha Îran, bi gelek hêzan re rû bi rû ma ye.

Yek emperyalîzm bi taybetî civîna dawiyê li Stembulê ti encam negirt, nakokî kûrtir bûn. Di navbera Îran û dewletên pênc_yek, dewletên endamtiya wan dayîmî bileşmîşmiltleran de cih digirin heye, Emerîka, Rusya, Îngeltera, Çîn û Elmaniya, milekî Îranê li hev nekirin. Heta rendewiyek ji bo civînek din jî daneanîn. Wê demê pirsgirêk kûr e, hêzên navnetewî, bê ambargoya li ser Îranê kûr bikin, ev embargo bandora xwe dike. Mînak dema dawiyê Îranê çi kir, desteka li ser pêdiviyên herî girîng yên hemwelatiyên Îranê rakir.

Destek çi ye, mînak benzîn, bi awayekî xwezayî heger hemwelatiyek Îranê bi dolarekî wê bikire, lê dewlet ji ber ku destek dike, erzane, şekir, çayê, birinc, xwarin vexwarin, ev tiştên neçariya jiyanê ne, heta niha dewletê destek dikir û ji bo vê jî erzan bûn. Lê niha dewletê beriya çend heyvan biryarek standin û bi awayekî eşkere belav kirin û gotin, em desteka xwe li ser van madan radikin, em hew dikarin destek bikin.

Wê demê zoriyê dikişînin, ev destek rabe wê demê wê feqîrtî çêbibe. Wê demê muxalefet hîna bihêztir bibe. Ev yek, ango ambargo wê li ser dewam bike.

Ya duyemîn, her ku dîzayîn li Rojhilata Navîn çêbibe, her ku bi taybetî bandora Emerîka li ser dewletên Kendavê bihêz bibe, wê Emerîka her demê wan dewletan li dijî Îranê sor bike. Siûdî, Qeter, Îmarat, wê wan sor bike. Wê ev her demê bibe qadeke gergîntiyê, dijminatiyê wê enerjiyê bi Îranê bide wenda kirin.

Ji aliyekê din ve jî êrîşên leşkerî yên ku gengaze ku li ser Belocistanê re pêş bikevin, li dijî Îranê êdî di rojevê de ne, ji ber çi, ji ber ku ew qad di bin kontrola Emerîka de ye. Emerîka wê çavê xwe li ser êrîşên ku çavkaniya wan Afganîstane li ser Îranê de tên, wê bigire. Bi rengekî şînber û eşkere nebe jî, wê çav li ser bigire. Ev çalakiyên ku di milê Belocistanê de çêdibin, nava dem û demekê de, heta asta dawiyê di aliyê ewlekariyê de Îranê diêşîne.

Tevgera azadiya Kurd, gav bi gav pirsgirêkên di navbera Azariyan de hiştiye Îran êdî bi rengekî îstiqrarlî, bi wê rawebûna ne jixwe ve berê pê wer qezenc kiribû, pê desthilatî dida meşandin, êdî nikare bimeşîne.

Ji bo vê îhtîmala herî nêzîk ew ku bi neqontrol kirina muxalefeta hundirîn, hêdî hêdî wer çalakiyên xetên lîberal qismî demokrat, di hundirê Îranê de pêş bikevin û vê sîstemê ji nû ve di ber çavan re derbas bikin. Eger nebe, wê demê îhtîmala

şikandinên mezin jî li Îranê hene. Di derbarê Îranê de em bî vî rengî digirin dest.

### Bandora Tirkiyê Li Ser Herêma Rojhilata Navîn

Tirkiyê di herêma Rojhilata Navîn de hêzek e. Bi taybetî jî ev hezar sal e, ango ji salên hezarî û şûnda, heta mirov dikare bêje beriya wê jî lê di esas de ev hezar sal e Tiriyê bibandor e. Tirk ji Asya Navîn derbasî herêmê bûn. Misilmantî qebûl kirin, bi taybetî jî di împeratoriya Abasî de bûn xwedî bandor. Li ser Fars bûn xwedî bandor, di sala 1070'î de di şerê li hemberî Bîzansan de bi ser ketin, di Anadolê de bi cih bûn. Ew cih bû bingehê împeratoriya Osmanî. Li serdemên cuda cuda de ber bi Rojava ve bûn paytextê Bîzans di sala 1453'an de girtin. Bi navê Kostantîno Polîs, ya ku di roja me ya îro de jê re dibêjin, Stembûl. Li şûna peytexta Bîzans be vê carê bû paytexta Osmaniyan, yan jî bi rengekî din bû paytextê Misilmanan.

Beramberî hilweşandin û ji holê rabûna împeratoriya Abasî weke navenda împeratoriya Îslamî xwe girtin dest. Dînê Îslamê qebûl kirin, mezhebê Sunî qebûl kirin, weke mezhebekî desthilatiyê qebûl kirin. Li ser vî esasî jî desteka Misilmanan di herêmê de bi taybetî Ereb, Kurd, li pişt xwe girtin.

Bi vî rengî di sala 1514'an de ber bi Rojhilat ve belav bûn. Heta sînorê xwe yê îro beramberî împeratoriya Sefewî, dewleta Sefewî qezenc kirin, kirin garantiyê. Ev bi îtîfaqekî mayende di sala 1639'an de sînorê di navbera xwe û Sefewiyan de diyar kirin. Yanî ber bi Rojhilat ve diyar kirin. Weke dozenkî çêkirin, di navbera van her du împeratoriyan de bi vî rengk diyar kirin.

Dîsa di vê serdemê de ber bi Başûr, Rojava, bi taybetî jî Misir, Bakurê Efrîqiya, xistin bin venêrîna xwe. Piştî ku dewleta Memalîkan ji holê rakirin. Ew jî di sala 1517'an û şûnda, bi vî rengî weke împeratoriyekî berfireh, hem di milê Ewrûpa de, hem di milê Efrîqiya de, hem jî bi xwe di Asya biçûk de, di sînorek wiha berfireh de împeratoriyek hate ava kirin.

Lê belê ev împeratorî ew parformansa dewleta Îslamî ya berî xwe di aliyê hêza ekonomî, zanistî, teknolojî de nikarî pêk bianiya. Ji bo vê jî ev împratorbûyîn pereler bi şiyarbûna Ewrûpa re çêbû. Yanî parzemînê din yê formîlê, yê ahengê milê Ewrûpa bû. Pereler bi împeratorbûyîna Tirkan di herêmê de, bi şiyarbûna Ewrûpa ji nû de çêbû.

Gav bi gav dewletên navendî mezin ên homojen, dewlet netew ku pakla xwe didin îlm, teknolojiya zanistî, yanî hêzekî wer di her milê xwe de berfireh dibe, mezin dibe, bihêz dibe. Ji bo vê ev împeratorî neçar ma ku xwe di ber çavan re derbas bike. Dem dem di hundirê împeratoriyê de tevgerên bi vî rengî endeksê Ewrûpa, weke çawa xwestin tevgerên raformê pêş bikevin.

Ji bo vê rewabûna yekemîn, di sala 1870'iyî wan deman de bû. Rewabûna duyemîn di sala 1908'an de di vê çarçoveyê de çêdibin. Weke Rojavabûyîn, ji bo vê jî di esas de dewleta Tirik bi

gelemperî ne bi Mistefa Kemal re bûye Rojavayî, berî wê jî ev mijara Rojavabûyînê çêbûye. Hêzên Rojava bi taybetî jî Îngilîz û Fransîz, demek dirêje ji bo girîngiya herêmê, şekilekî didin dewleta Tirik. Heta roja îro jî ev bandorbûyîna li ser dewleta Tirkiyê berdewam dike. Ji aliyê Rojava de ev bandor berdewam dike û teşe tê dayîn.

## Pêşveçûn Û Pêşketina Miliyetgeriyê Li Tirkiyê

Ji lewre milyetgerî di Tirkiyê de berî Kemalîzmê, berî cumhuriyetê dest pê kir. Bi taybetî jî ronakbîr bi giranî yên eslê wan ne Tirik, ya Yahudiyên çerxbûyî, yên ku bûne misilman. Dîroka van jî heye, bi taybetî di sala 1500-1490'î de di serdema ku Îspaniya bû dewleteke mezin bû împeratoriyek Xiristiyan, wê demê hêjmarekî mezin, zêde mezin li gel Erebên Misilman, Yahudî jî li Îspaniya hebûn. Beramberî Ereb û Yahudiyan di Îspaniya de şerekî dest pê kir. Li ser esasê Xiristiyan kirinê, ango yên ku li Îspaniya bimînin divê ku bibin Xiristiyan. Êdî ne Misilman, ne Ereb, ne jî Yahudî di vî welatî de nayên qebûl kirin.

Ji lewre gelek Yahudî bûn Xiristiyan. Lê li gorî uslubê xwe bûn Misilman. Teqyetcitî kirin weke ku bûne Xiristiyan. Weke Xiristiyanan xwe dane diyar kirin, lê di esas de Yahuditiya xwe parastin.

Lê gelekan nikarîbûn vê bike, ji lewre neçar man ku birevin. Wê birevin ku? Eê birevin împeratoriya Osmanî. Ji bo vê gotinek împeratorekî Osmanî heye, dibêje " Tiştek seyre, derbarê vî qiralê Îspaniya de dibêjin însanekî pir biaqil e, lê belê bi berdana Yahudiyan di restiyê de memleketa xwe feqîr dike û ya min jî dewlemend dike." . Wiha Yahudî ji wan re balkêş tên. Bi dewlemendiya xwe ya madî, bi asta xwe ya zihnî de pir balkêş tên.

Ji bo vê beramberî vê birçîbûna zanistiyê ya ku di împeratoriya Osmanî de heye zû tên himbêz kirin, zû tên qebûl kirin. Yahudî ji vê fayde dikin û dikarin, hem yên çerxbûyî, yên ku weke ku Misilmantî qebûl kirine, hem jî yên weke çawa Yahudî mane, ji ber ku zêde tepeserkirin li Ewrûpa li ser wan hebûy, di împeratoriya Osmanî de tine bûye. Ji bo rehet dikarîn di împeratoriyê de di mekanîzma biryara desthilatiyê de cih bigirin.

Rojavabûyîn û miliyetgerîbûn, di rastiyê de cara yekemîn li ser destê van belav bû. Bi taybetî di serdema îtîhad û tereqî de. Ango berî şerê cîhanê yê yekemîn, di serdema îtîhad û tereqî de, ev her du navê wan jî li ser esasê "yektî û bilindahiyê" di wê çarçoveyê de ev navê milî lê hatiye kirin. Yektiya dewleta Tirik û bilindahiya wê.

Di vê serdemê de serdema ku Tirkiyê di serdema îtîhad û tereqî de, Tirkiyê bû zemînekî gelek destdayî ji bo belavbûna serbest ji qulubên masûn re, bê asteng li her derê van qulubanan karîbûn xwe bi rêxistin bikin.

Di serdema îtîhad û tereqî de dema ku tê de heta asta dawiyê Yahudî bi qedir û qîmet bûn, bê asteng xebat û karên xwe dikirin. Li ser vî esasî jixwe fikrê milî yê Tirikan pêş dike. Lê belê îtîhad û tereqî, bi îdiayê xwe yên hakimiyetek navendî li ser hemû împeratoriyê weke çawa berê bike, piştî şerê cîhanê yê yekemîn êdî negengaz bû. Cîhanê nikarîbû rê bidiyê, ew hêza miliyetgeriya Tirik ku careke din karibe hemû hêzên împeratoriyê di bin venêrîna xwe de bigire, ew derfet û hêza wê jî tine bû. Ji bo vê tevgerek din li Tirkiyê derket.

Em bala xwe bidinê Tirkiyê di vir de navenda împeratoriya Osamanî bû. Împeratorî şikest, diviya bû ku Tirkiyê jî bişkestiba. Lê wê çawa bişkestiba? Tirkiyê encex welatekî biçûk, yan jî dewletek biçûk di hundirê Anadolê de bima ya. Ji ber ku plan ev bû, qismek mezin ji Bakurê Kurdistanê, jixwe Îraq Îngilîzan ji bo xwe cuda kiribûn. Mînak herêma Hekarî, Şirnex, Botan û Musil, dema ku em dibêjin ne tenê behsa bajarê Musil dikin, wê demê Musil hemû Başûrê Kurdistanê bû, îyalet bû. Ev yê Îngilîzan bû.

Heta bi Çikurava û Adena, ev para Fransa bû. Jixwe herêma Serhedê bi rengekî xwezayî di bin venêrîna Rusan de bû. Ev milê Kurdistan bû. Milê Rojava, bi taybetî herêma Ege, Mermera, ev îdiayê Îngilîzan bi Îngilîzan re yên Yewnan li ser hebû. Jixwe hêjmarek mezin ji Yewnan di wê herêmê de hebûn, di geravê hemûyê de ew tê de bûn. Xwedî derfet bûn wê çaxê dewletê Rojava di şer de serkeftî bûn. Ji bo vê bi taybetî jî Îngilîz dixwest di wê herêmê de Xiristiyanan bi cih bike. Ji ber ku weke niha nebûn, wê demê pir zêde zêde hebûn. Gundê wan, bajarê wan, giravên wan, tije Yewnan bûn. Ji bo vê encex ji bo Tirkiyê ev dima, di Anadolê de weke dewletek biçûk bimaba.

Lê gelek faktor bûn sersebebê ku Tirkiyê bi vî şeklî nebe. Ji bo vê em bala xwe bidinê dema ku me dest bi nirxandinê jî kir, me got, Rojhilata Navîn weke çawa wiha bihesibîne ku qebirstana hemû planên ku berê tên hazir kirin. Yanî her planek derbarê vê herêmê de tê amade kirin, ew plan bi ser nakeve. Ji ber ku hinek hêzên ne madî, di herêmê de hene di bin faktorên ku karibin planan biguherin.

Ewrûpa dema ku plan derbarê herêmê de çêdike, pirsgirêkên madî pir digire dest. Mînak, dibêje Sadan faşîst bû, dibêje em ê jî biçin wî faşîstî bixin, wê gel jî ji me re li çepikan bixe û em ê jî rûnin. Lê nahesibîne rast ev gel ji Sedam aciz e, lê belê naxwaze di bin hegemoniya Xiristiyanan de be. Vê nahesibînin.

Berê planê Şwartîsko hebû, yê di zemanê şerê Kendavê yê yekemîn de komîtanê artêşa Emerîka bû. Di got; "em ê di şer de lêxin, wê artêş bişkê. Em ê bisekinin, em ji Kuwêt derbixin. Wê artêşa Îraqê bişkê û paş de vegere." Artêşek dema ku beramberî binkeftinê rû bi rû maye, dema vegere tişta destpêkê bê bîra wê derbê li artêşê bide. Bi vî rengî Sadam ji holê rabike. Lê di aqilê yek leşkerê Îraqî re derBeasjî nabe, di ferhengoka wî re derBeasnabe. Tiştekî wiha nas nake. Ev hesabana pir çewt in,

hesabên madî, îlmî yên li gorî xwe dikin di wir de çewt derdikevin.

Ji bo vê Tirkiyê, dewletek desthilatdar e. Bi gelan pir xwîn daye veraşandin. Pir xerabî kiriye, lewre dema ku hêza Îngilîz û Fransîz bê vê herêmê, wê hemû gelê herêmê wê himbêz bikin û li dijî Tirkan pê re bibin yek. Bi vî rengî wê Tirkiyê tesfiye bibe. Lê belê tiştê derket holê rast bû ku gel ji Tirkan nerehet in, lê ne weke ku ji Fransîz û Îngilîzan acîz in. Ji Tirkan acîz in, lê Tirik tevî her tiştî Misilmanin. Lê Îngilîz û Fransîz Xiristiyanin. Ji Tirkan acîz in, lê tevî her tiştî taybetmandiyên çandî di navbera Tirkan, Eraban, Kurdan de çêbûne.

Lê ti hevpariyek çandî di navbera Kurdan û Fransa, Îngilîzan de tine ye! Lewre ev faktoran bûn sersebebê ka çawa hesabên ku hatiye nivîsandin, di piratîkê de pêk neyê. Dema şerê cîhanê yê yekemîn xelas bû di eniya Ereban de pêşketinên ku çawa Fransîz û Îngilîzan dixwestin pêk hatin, ew rast bû. Ew tiştê ku hazir kirbûn, rêxistina ku di nava Ereban de çêkiribûn, dehfandina Ereban, ango sorkirina Ereban li dijî Tirkan heta astekê bi ser ketibûn. Gelek hêzên ku bi Îngilîzan ve girêdaybûn di nava Ereban de hebûn xurt bûn, li ser piyan bû. Lewre li Hicazê Şêx Husên, li welatên din jî yên Ereban yên ku xwe weke rêze zincîra Ewrûpa didîtin hebûn. Bi taybetî jî kesên wiha hinekî ronakbîr, çûbûn Ewrûpa xwendibûn, zîvîrî bûn. Weke hêzên civakî dihatin hesibandin, bi Ewrûpa re bûbûn yek.

Ji bo vê tiştên ku derbarê Ereban de û planên li ser Ereban mirov dikare bêje heta astekî bi ser ketiye. Bi rengekî rehet piştî hilweşandina împeratoriyê artêşa Îngilîz û Fransîz, li hemû welatên Ereban de bi cih bûn. Êdî welatê Ereban hate parçe kirin, bû mêtingeha Frans û Îngilîzan.

Tirkiyê ev rewş qebûl nekir, rewşa dagirkirinê qebûl nekir. Bi kê qebûl nekir? Yek artêşek Tirkiyê hebû, ev artêş pir biçûk nebû, mezin bû. Li gelek cihan şikestibû, lê dîsa jî hebû. Ango hêza leşkerî li Tirkiyê hebû.

Ya duyemîn hêzek wê ya madî hebû, ji ber ku navenda împeratoriyê bû, ne dewletek nû weke Ereban çêdibû. Berê robûriya wê heye. Ew kevneşopiya wê ya dewleta navendî hebû.

Ya sêyemîn, hîna jî xîtaba dînî bi bandor bû. Bi taybetî jî ev ji bo Kurdan derbasdar e. Bangên tevgera milî ya Tirik bi taybetî jî tevgera Kemalîst, bangewaziya wê ya ji Kurdan re yên ji bo şerê li dijî kesên biyanî, bi taybetî jî Fransîz û Îngilîzan encam girtin. Bi rengekî xwezayî di cih cihan de bi rengekî rêxistinkirî şerekî li dijî Fransîz û Îngilîzan di herêmê de pêş ket.

Bi rengekî xwezayî weke çawa êrîşên hinek komên çekdar yên Kurdan li ser stargehên, Fransa li Urfa, Mareşê bi bandor bû. Ew ne şerekî bi rêxistinî bû, komekbûn êrîş dikirin, Fransîz jî dît ku nikare li herêmê bimîne, lewre paş de zivirî. Di cihna de jî bi rêxistinkirî bû, weke çawa şerê li Çanakelê, Gelîbolî de, ku tê de hêjmarek mezin ji leşkerên Îngilîzan hatin kuştin.

Heta roja îro jî naviyên wan leşkerên kuştî tên wir bîranînan digirin, ji Nîwzelanda, Ewustiralya, ji ber ku berê artêşa Îngilîzan bi van gelan çêdibû. Artêşa Îngilîzan tenê Îngilîz nebûn, ji cihên ku dagir kirine artêşa xwe çêdikirin. Mînak Ewstoralî hwd, gelek gelên din jî bûn, lewre ev dihatin û di wî şerî de nêzîkî 240' hezar leşkerên Îngilîzan tên kuştin. Bi vî rengî Îngilîz dişkê.

Faktorên din yên ku rolek bingehîn dileyîst bi hêzbûna tevgera Kemalîst di Tirkiyê de çi bû? Rewşa Rusya bû, Rusya tê de şoreş çêbû, şoreşa Rusya şoreşek sosyalîst bû. Di cîhanê de cara yekemîn şoreşek wiha çêdibe, bi ser dikeve û dewletê jî dike destê xwe de. Ev di sala 1917'an de ev çêdibe.

Şoreşa Rusya çewisandina ji aliyê Rusya ve di ser Tirkan de ji milê rojhilat de, ew çewisandin ji holê rakir. Artêşa Rusan paş de vekişiya, bi Tirkan re lihevhatin, êdî beramberî Rusan ti xeterî çênedibû.

Eger şoreş di Rusiya de çênebûbûya, şoreşa sosyalîst di Rusyan de çênebûbûya, seranserî sînorê Tirkiyê bi Rusan re wê bûbûya cihekî bê îstiqrarê û cihekî tepeserkirinê. Mînak herêma Kurdan, ji ber ku artêşa Rusan heta Bedlîsê jî hatibû. Dîsa herêma derya Reş, ev hembû wê bûbûna cihê tepeserkirin. Lê dema Rusya ji şer derketin, di wir de Tirkiya nefeseke mezin girt. Dev jê berde nefesek mezin girtin, tepeserkirin li ser wan rabû, ji vê bêtir dostekî wan yê cidî çêbû. Ew îtîfaq li ser çi esasî bû? Ew li ser esasê şerê li dijî emperyalîzmê bû.

Tevgera Kemalîst di Tirkiyê de şerê Fransîz û Îngilîzan dikir, Rusya jî weke dewlet şerê Fransa û Îngilîzan dikir. Ji ber ku Rusya jî di dorpêçiya emparyalîzmê de bû. Ji bo vê dorpêçiyê veke hema li dostekî digeriya. Hemû tevgerên antî-emperyalîst, antî-dagikerî tevgera Mirê Afxanîstanê, Mîr e, lê ji ber ku dijî emperyalîzmê ye. Tevgera Kemalîst di Tirkiyê de ev hemû Rusya ji bo xwe weke awantac girtin, ji ber ku li ser sînorê wan bû. Li hemberî dagirkeriyê, emperyalîzmê têkoşînê dikin şer dikin, ji bo vê bi rengekî xwezayî, objektîf weke çawa parçek ji xwe didît.

Ev îtîfaqiya di navbera Rusan û Tirkan de pir li pêş ket. Gihîştin astekî stratejîk. Di sala 1925'an de di navbera Tirkiya û Rusya de îtîfaqa pevraparastinê hate imza kirin. Ew jî weke çawa niha îtîfaqa NATO ya jê re dibêjin bendê pêncan, ew bend jî wiha ye, dibêje ger tedak li ser dewletek NATO bê, wê dewleta din biparêze. Ew îtîfaq heman îtîfaqa jê re dibêjin parastina hevparastinê. Di vê astê de îtîfaqek girîng çêkirin.

Tirkiyê di sala 1920'an de mirov dikare bêje gelek xeterî ji holê rakirin. Yek ji wan, xeteriya Yewnana bû, ji holê rakirin. Xeteriya Îngilîz û Fransa ji holê rakirin, xeteriyên Kurdan ji holê rakirin, bi Kurdan re îtîfaq çêkirin. Tevgera Kemalîst dît ku îtîhad û tereqî ji nû ve avakirina împeratoriyê planekî ne rasteqîniye, ti bingehê wê yê madî tine ye. Ji bo vê ev plan bi ser nakeve. Li şûna vê divê ku planek din hebe, çi ye ev plan?

Avakirina dewletek navendî, homojen, Tirikî, nû, moderm. Yanî kopyakirina dewlet netewa li Ewrûpa, ew ji bo xwe esas girtin. Li ser vî esasî îdeolojiya fermî di Tirkiyê de wê demê hate diyar kirin. Bi avakirina cumhuriyetê, avakirina cumhuriyetê mirov dikare bêje di sala 1923'an de zelal bûye. Di sala 1920'an de prleman çêkirin, di sala 1923'an de jî cumhuriyet hate îlan kirin, navê wê bû cumhuriyeta Tirkiyê. Êdî împeratorî ji holê rakirin, herî dawî îperator Wehdedîn ew jî surgun kirin, çû li Ewstoriya mir, yanî împeratorê dawiyê Tirkan hebû ew jî ji holê rakirin û surgun kirin û cumhuriyet hate îlan kirin.

Îdeolojiya cumhuriyetê ya resmî êdî zelal bû, çi bû ev resmî îdeolojiya cumhuriyetê? Yek milî bû, di hundirê wê erdnîgariya ku Tirkiyê weke navê Tirkiyê maye, di hundirê wê erdnîgariyê de nijadparstiya Tirik esas hate girtin. Ev nijadparastî di astekî xwezayî de na, di astekî nijadparstiyê de hate dest girtin. Ji bo vê teoriya nijadî, nijadperstî di hundirê Tirkiyê de wê demê zêde zêde li pêş ket. Beramberî Kurdan, Ereban, xirirstiyan hwd, ev teorî pêş ket. Wê demê milek îdeolojiya resmî milê wê yê nijadparestiye. Ev mil di hundirê heştê salî de, bênavber û heta roja me ya îro ku hîna jî ev îdeolojiya fermî qet nahatiye guhertin, tenê desthilatdar hatine guhertin, şiklê desthilatiyê di Tirkiyê de hatiye guhertin, lê îdeolojiya fermî nehatiye guhertin.

Ev îdeolojiya fermî ji ber ku di hundirê Tirkiyê de yê ku gefan lê bixwe tenê Kurd e, ji bo vê ev îdeolojiya fermî di hundirê van heştê salên derBeasbûyî de, bi temamî li dijî Kurdan hatiye meşandin, her demê Kurd weke potansiyel xeternak hatine dîtin. Her demê Kurd weke xeteriyekî parçekirina Tirkiyê û tine kirina nijadparestiya Tirik dîtin, ji bo vê hemû şêwazê tepeserkirin, tine kirin, îmah kirina li ser Kurdan heta roja îro rewa kirin. Ev parçek ji îdeolojiya fermî ye. Ev hilbijartina desthilatiyekî nîne, hilbijartina serokekî nîne, Kenan Evren hat Kurd kuştin, nizanim kê Kurd nekuştin, ev çîrok e tiştek wiha tine ye. Ev îdeolojiyek fermiye, îdeolojiya fermî milek wê nijadperst e. Nijadperstî tenê vê qebûl dike, dewletek tenê, netew tenê, zimanek tenê, alek tenê, bi vî rengî nijadperestiyê hatiye eyar kirin.

Xeteriya li ser yekdestiya (tekgeriya) di hundirê Tirkiyê de ji ku tê, ji Kurdan tê. Ji ber ku nifûsa herî mezin Kurd e. Ji bo vê ev îdeolojî bênavber li ser esasê înkarkirina Kurdan hatiye meşandin. Ev îdeolojiye, îdeolojî pîroz e. Li ser esasê vê pîrozbahiyê hemû şêwzên îmhakirinê, yê li dijî Kurdan hatiye rewa dîtine.

Ji ber ku vê neke nabe, ev neçariyeke. Em bala xwe bidinê di roja me ya îro de jî em çiqasî bixebitin bila bixebitin, eger îdeolojiya fermî di Tirkiyê de neyê guhertin, poteynsela komkujiyan her demê heye. Heger îro nakin, ji ber ku nikarin bikin nakin. Ji ber ku ew îdeolojiya fermî li ser esasê nijadeke homojen tek tîp e, tek ziman derdikeve pêş. Ji bo vê li ser îdeolojiya resmî girînge mirov pir û pir rawest e.

Ev îdeolojiya resmî raformê qebûl nake. Heta roja me ya îro jî qebûl nake, guhertinê qebûl nake. Weke çawa li Fransa çêbûye, gelek caran reform di cumhuriyetê de çêbûne, di Tirkiyê de nehatiye kirin. Tiştê di Tirkiyê de heyî weke metnekî quranê ye û nayê guhertin.

## Şaxek Din Yê Îdeolojiya Resmî Li Tirkiyê Dîngeriye

Dîngerî Misilmatî, ji Misilmantiyê jî Sunutî, ji Sunutiyê jî Henefî. Weke dînekî desthilatdariyê, li ser wî esasî hemû mezheb û komên dînî yên di Tirkiyê de hatine derve de hiştin, diyaneta wan bi rengekî fermî hatiye qedexe kirin. Tengasî ji wan re hatiye derxistin, hatine lînç kirin, ji derve de hatine hiştin, gelek mafê wan yê îbadetê hatiye qedexe kirin.

Bû nimûne, heta roja me ya îro jî hinek dêr hene qedexe ye yekî Xiristiyan tê de li mêj bike. Ên ku mane jî û nikarîne tine bikin, deng û rengê wan nehîştine. Kes nizane ka hene, yan jî tine ne. Bi vî rengî tesfiye kirine. Ev di piratîkê de bi çi awayî meşiya ye, di piratîkê de bi komkujiyên li ser Xiristiyanan, li ser Ermenan, Asûran, piştî wan komkujî hatin temam kirin vê carê rêûresma wan ya dînî jî li gelek cihan hate qedexe kirin. Mînak dêran çend roj berê piştî heştê salî nû Xiristiyanan dikarîbûn biçûbana Axtamara ku li wanê bû, nû vekirin. Bi vî rengî qedexe kirin. Lê bi vî rengî jî bes nedîtin, pir bi rengekî nijadparest xerab, kevneşopiyek din derxistin pêş, ew jî pevguhertin e.

Pevguhertin, derxistin pêş, mînak ev giravên li Egê, Mermera, li gelek cihan nifûsek mezin li wan deran Rom ûYewnan hebûne. Ev kesana li Tirkiyê bûn, di zemanê Osmaniyan de ew jî diçûn leşkeriyê, leşkerî dikirin, alîkarî didan, dînê wan serbest bû, lê di zemanê cumhuriyetê û beriya cumhuriyetê de jî yanî di dema Kemalîzmê de çi kirin, bi Yewnan re pevguhertin kirin. Heta asta dawiyê nêzîkbûnek nijadparstiye, bi biryarek dewletê ew kesên ku bi sedê salan bi hezarê salan li ser erda xwe mezin bûne, di navbera dewletan de wan Tirik şandin Tirkiyê, wan jî Yewnanên ku reviya bûn şandin Yewnanstanê.

Bi vî rengî biryarek dewletê û çand û daneheva ku bi sedê salan kombûye, bi biryarek dewletê ji holê rakirin, bi vî rengî kirin.
Ev kî ne wiha dikin û armancê wan çi ne? Gav bi gav ber bi homojen bûyînê ve çûne. Ber bi yek tîpbûnê ve çûne. Ji lewre ev felsefe bû ku bû sersebebê komkujiya Kurdan. Yanî pirsgirêk ne ev e ku Mustefa Kemal wiha gotiye, nizanim yê din wiha gotiye, ev zêde diyarker nîne. Ya girîng îdeolojiya resmî ya ku pala xwe didiyê çi ye. Yekê zêde kuştine yekê kêm kuştine, lê armanc çi ye? Armanc di hundirê sînorê Tirkiyê de yek gel hiştin. Ev armanc nehatiye guhertn, di roja me ya îro de jî nehatiye guhertin.

Di roja me ya îro de mirovê herî demokrat di Tirkiyê de yê di eniya sistemê û partiyên Tirkiyê weke CHP, MHP, DYP partiyên dibêjin? Dibêjin, sucê me ye, bi rastî me li hemberî Kurdan şaş kiriye, ji ber ku me ew hînî zimanê Tirikî nekirin. Rexnedayîna wan ev e, nabêjin me gelek înkar kir, me tesfiye kir,

me kuştin, me zimanê wan qedexe kir, na. Dibêjin; me çima bi demê re me we hemû hînî Tirikî nekirin ku di roja me ya îro de behsa Kurdayetiyê nekir ku di roja me ya îro de behsa Kurdiyatiyê dikin. Şaştiyê di vir de dibînin.

Di serdema avakirina vê cumhuryetê de çi bû? Yek desteka Suvyetê ya cidî, jê re hebû. Ev destek heta salên 1930'î bênavber berdewam kir, di gelek cihan de wer çawa êrîşên li ser Kurdan bi hevxebatkariyek, hevparî li çiyayê Agirî, di navbera Rusan û Tirkan de çêbûye. Wê bihdayînek mezin da tevgera Kemalîst û ji bo avakirina Tirikiyekî mezin bû mîna hêzekî. Hêzek madî û hêzek meanewî.

### Siyaseta Ku Îngilîz Û Fransa Dane Meşandin

Xala duyemîn siyaseta ku Îngilîz û Fransa dane meşandin. Ev siyaseta ku dane meşandin çi bû? Ev siyaset li ser esasê mentîqê nifûsê bû, di heman demê de dest dayîna li ser çavkaniyên ptrolê bûn. Dema ku dîtin Tirkiyê weke hêzekî herêmî dixwaze hêza wan deng bike ev weke ptyenselekî xeternak dîtin. Ji ber çi, ji ber ku li Tirkiyê nijadperestî heye, kevneşpiyek Tirkiyê ya dewleta kevn heye. Nifûseke wê yê mezin heye, erdnîgariyek wê ya mezin heye. Tirkiyê di herêmek stratejîk de ye. Li ser gelek deryaya ye. Ev hemû dibin serserbebê ku ger Tirkiya bixwaze bi rengekî serbixwe pêş bikeve û bixwaze dikare nifûsê Fransîz û Îngilîz di Rojhilata Navîn de aheng bike.

Ango dikare li dijî wê derbikeve. Dema ku ev xeterî hatin dîtin Fransîz û Îngilîz bi rengekî nerasterast destwerdan li ser Tirkiyê kir. Car bi caran mînak Kurd derxistin pêş, mînak îtîfaqa Sêverê Kurd tê de heye, çi dibêjin? Em ê herêmek heye ya Kurda ye, bi taybetî Musil, ji bo vê divê ku reşwekî wê yê taybet hebe, ev rewşa taybet bi rengekî taybet bê rêvebirin, ev rewşa taybet heta pênc salan berdewam bike. Piştî pênc salan referandom çêdibe, eger gel xwest tevî Tirkiyê bibe tevî Îraqê bibe, eger nexwest wê serbixwe be. Ev hevpeymana Severekê derbarê Kurdan de ye.

Niha ev îtîfaq bi lêgerînên Tirkan yên nijadparest berovajiye. Ew dixwazin di vê erdnîgariyê de yek gel hebe. Eger di herêmê de statuyek Kurdan, hela yekî serbixwe ya Kurdan çêbibe, ew siyaseta tinekirina Kurdan di herêmê de bi ser nakeve. Mînak eger dewletek biçûk jî ya Kurdî hebe, her demê wê bibe çavkaniya xeteriyê li ser dewletan, bi taybet li ser Tirkiyê û Îranê. Ji ber ku Îran jî dijberiya Kurdan dike. Weke Tirkan çawa bi tundî înkar nekiriye, lê timî li dijî Kurdan bûne. Ta ji zemanê şah ABeasde ev wiha ye, mînak niha Kurdên li Xuresanê yên surgunê ne. Weke çawa Îskana neçarî di zemanê osmaniya de pişt re di yê Tirkan de çêbûye, yê Kemalîstan çêbûye, Kurd ji cihekî dibin cihekî din bi cih dirin. Di Îranê de jî ev siyast her demê li dijî Kurdan hebûye. Lewre vê ew nerehet dikirin. Ev îtîfaqî bû sersebeb ku şantacek be, li dijî Tirkan da ku Tirik serê xwe ji Îngilîz û Fransa re deyîne. Ji bûyî vê bi rengekî ji rengan Fransîz û Îngilîz nifûsên xwe di hundirê Tirkiyê de xurt bikin.

Bi rastî jî ev tiştê he bû. Gav bi gav desthilatiya fermî di Tirkiyê de ya siyasî tewîz dan Îngilîz û Fransa, her du dewletan jî di derbarê mesela Kurd de destor dane Tirkan da ku wan tine bikin. Jê û şûnda her tişt li dijî Kurdan de meşiya. Bi taybetî di sala 1923'an îtîfaq Lozanê, piştî wê hîna xerabtir, di sala 1926'an îtîfaqa di navbera Enqera û Îngilîzan de çêbû, ku li ser wî esasî bi rengekî fermî Kurdistan parçe bû. Parçê Kurdistana Rojhilat jixwe di bin kontrola Îranê de ma. Başûrê Kurdistanê bi çavkaniya xwe ya ptrolê ket bin destê Îngilîzan.

Li gorî îtîfaqa Enqerê di sala 1920'an di navbera Fransa û Tirkan de parçê Rojavayê Kurdistanê ket bin destê Fransa, parçê mezin yê bêtirî nîvê Kurdistanê weke erdnîgarî di bin destê Tirkan de ma. Herwiha sîstema navnetewî pergala cîhanî Tirkiya qebûl kir û pêanînên Tirkiyê li dijî Kurdna qebûl kirin. Beramberî wan bêdeng man. Li ser vî esasî pêvajoya komkujiyan li dijî Kurdan ya ku ji sala 1925'an ta ku sala -1938-1940'î bê navber berdewam kir.

Tirkiya weke sîstem bi temamî ket bin kontrola Rojava. Bi taybetî Îngilîz û Fransîz, her çiqasî Elmaniya jî xwest demekî li ser Tirkiyê bi bandor be, lê belê zêde nikarî bi bindor be. Di esas de bandora mezin ya Îngilîz û Fransa bû. Mustefa Kemal, ji serkeftinên xwe fayde kir, tiştên ku dixwest di Tirkiyê de pêk bîne pêk anî. Mustefa Kemal di herêmê de jî bû weke modelekî Rojavabûyînê.

Mustefa Kemal li dijî Îngilîz û Fransa bi serket, li gorî xwe tiştên ew bi nav dikin, li dijî fitnê hundir jî bi ser ketibû. Ji ber ku navê hemû serhildanê beramberî Kemalîzmê radibûn weke fitne bi nav dikirin. Çi yên li Anadolê, çi jî yên li Kurdistanê, li hemberî van jî wiha bûn.

Ji bo vê li gorî baweriya xwe Tirkiya çêkir. Kes li hemberî wî derketiba tine bû. Ev Tirkiya ku çêkiribû çi bû, Tirkiyakî bi temamî li gorî çand, perspektîfên civakî yên Ewrûpa dihate çêkirin.
modernîzasyon bû, modernîta esas dihat girtin. Çi bû ew modernîta, tîpên latînî bû. Ev girêdana bi Rojava ye, cil wiha, qiyafet, meselên hilbijartina jinan, jin bi rengekî çalak tevlî pêvajoyê bibin. Ev ne wiha mesela demokrasiyê û azadiya jinê ye, ti têkiliya wê pê re tine ye. Ji wê û pê ve kopya kirine. Di gelek mesalan de her tişt wer li gorî Rojava çêkir. Ev niha jî bi rengê şoreşa Mustefa Kemal digirin dest, yanî îlke û înqîlab, ya Mustefa Kemal digirin dest, lê ev hemû çi ne? Ev hemû projên Rojava kirinê ne.

Em bala xwe bidinê ev proje di rastiyê de li dijî zihniyet, çand û sosyalîta Tirkiyê ye. Gelê Tirkiyê heta niha jî van tiştên ku di TV'ê de derdikeve nîne. Tirkiyê tam tiştek dine, tam berovajiyê vê ye. Di Tirkiyê de jiyana gundan heye, urf, edet, exlaq hene, ne civakekî Rojava ye. Lê fermî tiştê ku derdikeve holê ew e. Ew esas tê girtin, ew pîvan tê girtin, Tirikbûyîn teqlîd kirina wan pîvana ye. Ji ziman bigire, ta cil û bergan bigire, Tirikbûyîn ev e, lewre Tirikên niha orjînal li ku ne, li Stembûlê ne. Di rastiyê de divê ku

Tirikê herî ne orjînal li Stembûlê bûya. Ji ber ku yê herî zêde hatiye kopya kirin, asîmîlekirin, di aliyê civakî, çandî ve ew e. Lê di roja me ya îro de ew weke mînak tê girtin, îdial e, her kes di pêşbirka ka çawa wî Tirikî teqlîd bike.

Bi ziman, bi cilan, bi şêwazê jiyanê û bi her tiştî, ev bê asteng kir, ji ber çi, ji ber ku rewa bûn qezenc kir. serkeftî bû, yekî serkeftî be tiştê dixwaze pêk tîne. Kes nikare dengê xwe li beramberî wî derbixîne. Pîroz dibe, mînak bala xwe bidinê niha Mustefa Kemal di Tirkiyê de pîroz e, di rastiyê de bi xwe ne pîroz e, morvekî ewqas jî nîne, Tirikbûna wî jî biguman e.

Mînak her kes dizane ku Mustefa Kemal Yahudiyê çerxbûye, Selanike. Dîsa enTirikagere, mînak Edhem Çerkes da xebitandin, di pişt re derdora wî girt û mehkumê îxanetê kir, lewre çû teslîmî Yewnanan bû, li Surgunê mir. Gelek kesên din jî bi vî rengî wiha kir. Li dijî Kurdan komkujî da meşandin. Lê belê pîroz tê dîtin, ji ber çi? Ji ber ku dewlet avakiriye, dewleta Tirkiyê avakiriye. Bi vî rengî rewabûn qezenc kiriye, heta roja me ya îro li ser esasê wê rewabûnê ev pîrozbahiya ku pê ve girêdidin tê.

Ji lewre ji serdema 1940'î û şûnda Tirkiyê gav bi gav weke siyaseta derve, ji xwe ya hundir girêdaye Rojava ye, lê weke siyaseta derve jî êdî Tirkiyê hate guhertin çêkirin. Gav bi gav ji Suvyetê qut bûm û bi Rojava re bû yek. Bi Îngilîzan re bû yek, bi Emerîka re bû yek.

Ev di şerê cîhanê û şûnda êdî sîstema Tirkiyê ya siyasî li ser esasê daxwaziyên Rojava bi taybetî jî li ser esasê daxwaziyên Emerîka hate dîzayîn kirin, ji bo vê NATO, gelek xebatên hundirîn hatin kirin.

### Nêzîkbûna Dewelta Tirkiyê Ji Diyarde Û Buyeran Re

Di sala 1939'an de, Tirkiyê neket şerê cîhanê yê duyemîn. Siyasetek şûpandinê esas girt. Lê belê di bin venêrîna Îngilîz û Emerîka de ew siyaset dimeşiya. Her çiqasî bendewariyek wiha hebû jî ku li gel Elmaniya cih bigire jî, lê negirt. Di şerê cîhanê yê duyemîn de bi giştî her çiqasî çalak nebe jî, lê weke parçek ji eniya li dijî naziyê girt dest. Lewre biawentajlî derket. Weke Îran nehat dagir kirin, artêşên derve de tê de bi cih nebûn, lê di cih cihnan de ji bûyî temam kirinê, ji bo tiştên wiha axa wê hate bikar anîn.

Di sala 1947'an de di Tirkiyê de guhertinek çêbû. Heta vê demê di Tirkiyê de partiyekî hikum dikir. Ew jî partiya cumhuriyetê CHP'ê bû, partiya Mustefa Kemal, pişt re Îsmet Îninû bû serokê wê, yek partî bû. Yek partî tê maneya ku her tişt artêş, byrokrasî, her tişt di destê yek partiyê de ye. Muxalefeta tune ye, rexne tune ne. Teşek desthilatiyê yê yek aliye. Tiştê ku dewlet bixwaze pêk tê.

Ji lewre ev yekpartîbûn bû sersebebê ku komkujiyên çêbibin jî bi yek xîtabê derbasî dîrokê bibe. Mînak, di derbarê Kurdan de çi ye? Hemû nêrîna fermî ev e, çete derketine çiyê, li

hemberî dewletê îsyan kirine, eşqiya ne, lewre hatine tine kirin, bi vî rengî derbasî dîrokê kirine. Heta hinek boyerên din jî hene bêdeng in. Ango dewletê çi rapor da ew e. Kes nabêje gelo ev rast e, yan ne rast e.

Weke mînakek jê di sala 1943'an li Ozapê'gundî hatin kuştin. Çi bû ev, gundiyan hinek nerehetiyên xwe nîşan dabûn. Ji ber ku hinek komên çetan yên dizan li Rojhilatê Kurdistanê li milê Îranê bi alîkariya cendirma, yên Tirkan pezên gel talan dikirin û didizîn. Alîkariya cendirman bi wan re hebû. Gel hêdî hêdî nerehetiya xwe nîşan da, şikayet kir. Ew şikayet, ji aliyê Mustefa Mixlalî ve, "Mustefa Mixlalî subayê Tirik yê ku li wir komîtanê cendirma bû" weke çawa îsyanek nîşanî Kurdan da ku Kurd çawa şikayet dikin, divê ku Kurd şikayet nekin, dengê xwe nekin! Ango piştî ewqas komkujî, lêdan, kuştin, çi bi serê wan bê divê ku şikayet nekin û her tiştî qebûl bikin.

Lê dema ku Kurd şikayet bikin wê demê tê wateya ku hîn a jî mirov in. Hîna ruh di wan de heye. Ji bo ku ev rêka van şikayetan bê girtin, çi kir, mînak çû sî û heşt kes ji malê wan derxist. Ew sî û heştanan birin cihekî sî û sê ji wan kuştin, pênc jî girtin. Gutin van xwestin sînor derbas bikin, cendirma ji wan re gotiye bisekinin nesekinîne, şer derketiye û di şer de sî û sê me kuştine, ji xwe yek sax birîndar difilite. Pêncên din jî me girtine û kirine hebsê, wer derBeasbû.

Kes nizanîbû ka çawa ev buyer derBeasbûye. Encax di sala 1947'an de dema ku propoganda hilbijartinê çêbûn, wê demê hinekan behsa vê buyerê kir. Êdî bi rengekî cuda hate dest girtin. CHP'ê her tişt bi vî rengî dida meşandin.

Rewşa Kurdan jî ev bû, heta mînak rewşa Kurdan, bi taybetî gelek caran hatiye ziman bi vî rengî, lê bi rengekî balkêş Seydayê Cegerxwîn di helbestekî xwe de tîne ziman. Navê helbestê jî Pîra Torê ye, dibêje:

Pîra Torê

Hilkişîme çûme jorê her du rex min bend û rez,

Min dî pîrek tê ji Torê ker di ber de tê bi lez.

Hate nêzîk rojbixêrek da û wek min dil bi xem,

Pîre bî bû por-sipî bû taqî-reş bû rû gewez.

Min ji pîrê xweş dipirsî ey metê tu ji kû ve tê;

Go ji Sêrtê diçme Bêrtê, xûniya romê me ez.

Xan û eywan kirne wêran, mêr û jin serjê kirin,

Min go pîrê qey tu Kurdî? çûye tilyên xwe bi gez.

Belkî benda rez bi guh bit dengê xwe pir hilmeke;

Pir ditirsim ez ji derbê singûyê roma teres.

Min digot, axa û beg; wê go kurê min guh medê,

Ew şivan in sermiyan in dane gur wan col û pez.

Min kurek tenha heye ew şandî bajêr medresê,

Wî du sê pirs bo me gotin pê helandin cerg û bez.

Gotî dayê em dixwînin wek Cegerxûn gotiye;

Zû bixwînin hev bibînin biçne Kurdistan bi lez.

Şair Cigerxwîn

Di wê helbestê de jin derdê xwe dibêje, surgun bûye, reviya ye. Cegerxwîn di wir de dibêje min jê re got: qey tu Kurdî? Dibêje çûye tiliya xwe bi gez. Ango tiliya xwe qez kiriye, gotiye dengê xwe hilnede, dibe ku bi guh be benda rez.

Ew helbest rewşa Kurdan tîne ziman. Kurdê bi temamî bêdeng ma ne, qet nikare xwe îfade bike, navê xwe nikare bîne ziman û ew rewş qebûl kiriye. Dema ku rengekî rexne yan jî weke nerehetiya Kurdan bê diyar kirin, cardin bi komkujiyan tê bersivandin. Bi vî rengî bi temamî rayeksyona li hemberî dewletê, pêkanînên dewletê, rexna liberamberî dewletê di Kurdistanê de mirov nabîne û ji holê hatiye rakirin.

Ji lewre di Tirkiyê de birjiwazî mezin dibe. Ev birjiwazî di esas de sparteka ekonomî kupalê ekonomiyê yê civakî yê derve ye. Ji bo vê bi alîkariya dewletên derve jî gav bi gav birjiwaziya Tirkiyê, ne ya milîtarîst, ne ya byrokrat, ne ya ku mekanîzma dewletê tam di destê wê de ye, ya serbest, ew birjiwazî jî divê ku di tabela dîmena siyasî de xwe îfade bike.

Ji bo vê di sala 1947'an de partiya Demokrat çêbû, ket hilbijartinê. Ji lewre di hilbijartinê de nebû desthilatdar, lê cara

yekemîn bû ku dengekî cuda ji derveyî yê CHP'ê derket. Piştî sala 1950'iyî, di hilbijartinên din de jî vê carê, partiya demokrat ya Ednan Menderes dengên cuda û zêde di parlemanterê de anîn. Vê di Tirkiyê de nerehetiyek mezin çêkir, CHP'ê digot, bila heta sibê dengan bîne. Perlemento qezenc bikin jî bila qezenc bikin, dewlet a me ye. Artêş a me ye, du rojan de divê ku kes derveyî me hakim neke.

Lê alîkariya derbê bû sersebebê ku ew partî bibe desthilatdar. Pareler bi desthilatîbûna vê partiyê re sîstema siyasî di Tirkiyê de bi temamî ket bin kontrola Emerîka de. Ji ber pozîsyona wê ya stratejîk, ji ber şerê sar, ji ber gelek sedeman Emerîka bi balkêşî li Tirkiyê dinêrî. Tirkiyê li ser sînorê Suvyetê bû, lewre diviyabû Tirkiyê di çarçoveya şerê sar de li dijî Suvyetê de bihatiba xebitandin.

Di sala 1952'an de, Tirkiyê bû endamê NATO, organîzyasyona leşkerî ya sîstema kapîtal di cîhanê de. Ji derveyî van dewletên Rojava, tenê Tirkiyê di nava NATO de heye. Îsraîl ji ne di nav NATO'yê de ye, tenê Tirkiyê di nav de bû. Ji ber vê girîngiya wê di nav de bû. Dewletên din hemû dewletên Rojava di nava NATO'ê de cihê xwe digirin. Tenê Tirkiyê Misilman û ne Rojavayî , di nava sîstema NATO'ê de ye.

Partiya Demokrat serwer bû, kapîtalstên Tirkiyê desthilatî xistin destê xwe. Gav bi gav zagonên li gorî berjewendiyên kapîtalîzmê dane meşandin. Kapîtalîzma hundirîn dane meşandin. Vê bi taybetî feqîr tengav kirin, ferqekî mezin di navbera zengîn û feqîran de çêbû, olîgarşên sermayê derketin pêş. Yên weke Sabancî, kesên din, sermaya zîraî ya li ser erdê. Van di civakê de nerehetî çêkirin.

Lê hinek karên din jî hatin kirin. Rast e, Tirkiyê bû endamê NATO'iyê, lê bi vê bes nebû. Di Tirkiyê de Giladyo çêbû. giladyo girêdayî NATO bû. Giladiya Tirkiyê daîra şerê taybet e, ya ku di pişt re navê wê bû daîra şerê taybet. Heta sala 1974'an mûçeyê wê Emerîka dida. Van çi dikirin, tevgerên çep tesfiye dikirin. Bi çi awayî karê xwe didan meşandin?

Ya yekê di nava karkeran de Sendîka çêkirin. Tirkîş, sendîkayên Emerîka, Karkerên miliyetger çêkirin. Ji bo ku Tirkiyê bi sosyalîzmê bandor nebe. sosyalîst tesfiye dikir, yanî kesên sosyalst û komunîst tine dikirin, li dijî belavbûna komunîzmê çebera kesk di Tirkiyê de dane rûniştandin. Bi taybetî jî mînak Fethulah Gulen, yê wê çaxê ye. Fethulah Gulan di dema xwe de di çarçoveya xebatên Giladiyoyê li dijî komunîzmê li Erzûrêm dernekên li dijî komunîzmê  ava kiribxwn.

Bi vî rengî di sîstema hundirîn a di Tirkiyê de bi taybetî di nava saziyên dewletê de Emerîka xwe dabû rûniştandin. Lê belê ev serkeftinên siyasî yên ku partiya Demokrat di Tirkiyê de pêş dixistin çêdikrin, ev serkeftinana weke zêde bi ser xweve çûn. Wer her tişt bi destê xwe ve girtin. Kûrbûna hendafan di navbera feqîr û dewlemendan de çêbûn. Pirsgirêkên cuda cuda çêbûn. Yên

xwediyên dewletê weke çawa CHPê, wan bi temamî hatin derve hiştin.

Ev bûn sersebebê hem rayeksyona gel ên feqîr çêbibe, hem jî yên leşker çêbibin, hem yên CHP'ê komên miliyetger çêbibin, bi vî rengî di sala 1960'iyî de li Tirkiyê derba leşkerî subayan qewîmî.

Di wê derbê de têkiliyên navxweyî yên Tirkiyên ji nû ve hatin dozen kirin. Ew hevsengiya ku bi temamî di aliyê kapîtalîstan de hatibû eyar kirin, bi temamî serdestiya kapîtalîzmê çêbûbû, vê carê bi zagon û yasay 27'ê Mayîsê yê sala 1961'ê, bi wan zagonan çi bû? Hinekî di aliyê civaka jêrîn, karkeran, çîna navîn, zagon hatin sazkirin. Mînak mafê rêxistinê, heta mafê partîbûyînê, mînak partiyên sosyalîst, mînak partiya karkerên Tirkiyê wê çaxê serbest bû. Mafê birêxistin kirinê derdikeve pêş. Sendîka tenê Tirik kar na, vê carê sendîkayên li dijî Tirik îşyî yên di nava karkeran de çêdibin.

Bi vî rengî weke ku gelek kes jî dibêjin; derbek çep e, lê di rastiyê de ne derbeyek çep e. Lê ew têkiliyên ku bi temamî di aliyê kapîtalîzmê de li Tirkiyê hatibûn eyar kirin, bi derba 27'Gulanê, zagonê 27'ê Gulanê ji nû ve tê eyar kirin, hinekî jî di çarçoveya wê eyar kirina nû de, çînên din di Tirkiyê de karibin xwe îfade bikin, rêxistinên xwe ava bikin û hinek mafê wan bê parastin.

Ev ha yek ji para tevgerên çep, tevgera bindestan re vekir. Ew pay derba 1971'ê derbek leşkerî di Tirkiyê de çêbû, ziyan dayê, lê bi temamî ji holê ranekir. Lê belê derba 12' eylûlê bi temamî ji holê rakir. Niha Tirkiyê, di vê demê de bi temamî dibe dewletek parçek ji sîstema kapîtalîst a cîhanê, dibe parçek ji sîstema emperyalîsta cîhanî. Dibe endamê NATO, Giladyo tê de heta asta dawiyê hakim e, ji bo vê Tirkiyê di roja me ya îro de jî, eger çiqasî gotinên wan ên antî emperyalîst derdikevin pêş jî, ev hemû derew in.

MHP'ê dibêje ez antî emperyalîst im, liberhemê Emerîka ye. MHP'ê berhemek emparayalîzmê ye. CHP'ê vê dibêje ew jî berhemê wê ye, yanî dostê wê ye, AKP'ê ji jixwe projek Emerîkiye. Lokseke Tirkiyê derveyî vê sîstemê bimîne tine ye. Ji ber ku ev sed û pêncî sal e, Tirkiyê ji aliyê Rojava ve tê dîzayîn kirin, di sala 1950'iyî şûnda vê carê hîna zêdetir bi rengekî kûr û berfireh Emerîka destwerdana tiştên hundirîn yê Tirkiyê kir.

Mînak em bala xwe bidinê konsolosekî Tirkiyê li Edenê yan jî konsolosekî Emerîka li Edenê, yan jî sefîrekî Emerîka li Tirkiyê, ango Buyuk Elçîkî Emrîka li Tirkiyê, weke waliyê mêtingeran tevdigere. Civînan çêdike, li bajaran digerin, derbarê siyaseta hundirîn de daxwiyaniyan didin. Ev girêdanên organîk a di navbera sîstema siyasî di Tirkiyê û Emerîka de tê meşandin. Girêdana bi Emerîka ve dide nîşandan, ji bo vê Tirkiyê her demê di çarçoveya berjewendiyên Emrîka de tevdigere û kar dike. Li ser vî esasî gelê ku li Tirkiyê dijîn, Kurd dibe, Tirik dibe, gelên din

dibin di sala 1950'yî û şûnda di bin du tepeserkirinan de tên meşandin?!

Yek ev sîstem bi kapîtalîzmê ve tê girêdan ji bo vê her demê di aliyê leşkerî, siyasî, ekonomî de biryar, ferman, fermanên sîstema kapîtalîst di wir de tên meşandin, ev tê meşandin. Ev ziyanê dide gel, mînak weke roja me ku îro çawa IMF, bihayê tiştan bigire, ji mûçê memûran bigire, ji zemê bigire, ji rojnamê bigire û hemû IMF eyar dike, da ku Tirkiyê karibe kirîdî jê bikire. Ev yek e. Ango di milekî de tepeserkirina kapîtalîzma cîhanî li ser gelê Tirkiyê heye.

### Li Tirkiyê Pîrozbûna Dewlet Netewe Ya Sînora Ye

Li Tirkiyê di milekî din de jî tepeserkirina dewlet netewê heye. Dewlet netewa li Tirkiyê çi ye? Dewlet netewa li Tirkiyê pîrozbûna dewletê esas digirin, pîrozbûna sînorên dewletê esas digirin, pîrozbûna sîmge û îmegeyên dewletê esas digirin. Ji bo vê hemû civak ciwan jin, karker, çotkar, qîmeta wan li ser esasê xizmeta dewletê ye.

Eger jinek Tirik bi qîmet be, qîmeta wê ka çiqasî ji dewletê re xizmet dike, qîmeta wê diyar dibe. Eger ciwanek Tirik qîmeta wî hebe, çiqasî ji dewletê re xizmet dike. Civak di Tirkiyê de tine ye, civak bi temamî nesneye, di çarçoveya pêkanîna daxwaz û hedefê dewletê de dijî û tevdigere û xwe bi rêxistin dike. Ji bo vê em bala xwe bidinê nakokî di navbera civak û dewletê de tine ye. Civak dewlet e, ev dewlet li ser esasê asîmîlasyonekî mekanîk tê meşandin.

Lewre dewleta netew tê çi wateyê, yek gel, yek al, yek ziman hwd, yanî tekger, xwezaya Tirkiyê vê red dike. Laz, Rom, Xiristiyan, Elewî, Sunî, Kurd, Ereb, Çerkez hene, ev hemû hene, lê her kes neçare rojane derewan bike. Berovajiyê xwe xeber bide, di dema ku ne Tirik be, bêje ez Tirikim. Dema ku ji Tirkiyê hez nake, divê bêje ez ji Tirkiyê hez dikim. Dema ku li dijî dewletê ye bêje ez bi dewletê re me. Civakekê ji sibê heta êvarê, li ser esasê derewan hatiye ava kirin, ev derew dema ku pêk neyên, bi darê zorê wê bidin pêk anîn.

Ji bo vê dewlet netew di Tirkiyê de ji her derê cîhanê zêdetir xeternake. Ji ber ku bi temamî li ser esasê asîmîlaysonê hatiye ava kirin. Ji ber ku resmî îdeolojiya zelal e. Di îdeolojiya fermî de çi heye? Tê de li ser xaka ku navê wê Tirkiyê ye, di neqşeya cîhanê de weke Tirkiyê tê nîşandan, di wê nexşeyê de yek milet heye navê wî Tirk e. Ev jî bi hinek nêzîkbûnên cuda cuda pîroz kirine, mînak gotina "nemutlo Tirikim diyen." Pîroz kirine di vir de nijadparestî heye.

Nijadparestî çi dike, nijadparestî netewekî pîroz dike bilind dike, di netewên din de bîst û çar saetan kompleksa aşalxê çêdike. Ji ber ku rezîl dike, teşhîr dike, kêm dide nîşandan, Kurd ha kêm in, Ereb ha kêm in. Xiristiyan ha ne, Elewî ha ne, bi vî rengî di nava kesên ne weke xwe bomberdomanekî îdeolojîk çêdike. Bomberdomanekî çandî çêdike, li ser esasê rexnekirin,

teşhîr kirin, tecrîd kirina nirxên civakî yên van gelan, mezheban, dînan çêdike. Ji ber ku di hundirê van gel û mezheban de, dînan de kompleksa kêmbûnê û ketîbûnê çêbikin. Da ku ew jî bêjin; na em ne Kurd in, ne Çerkez in, ne Laz in, em ne Rom in, em Tirikin "ne motlo Tirik diyene".

Ev bi temamî daxwaziyekî desthilatdariyê ye. Di vir de baweriyek civakî tine ye, zagonin îdeolojiya fermî ye, dewlet e, birokrasiye. Ew vê esas digire ji ber ku xizmeta berjewendiyê wan dike, li ser gel jî bi vî rengî didin meşandin.

Ji lewre Tirkiyê vê siyaseta xwe tenê di Tirkiyê de nade meşandin. Bi taybetî jî li dijî Kurd, niha çima em dibêjin li dijî Kurd wiha kir, ji ber ku em behsa Tirkiyê dikin. Niha ti têkiliya Tirik û Kurd têkiliyek xwezayî nîne. têkiliya asîmîlasyonê ye. Careke din divê ku em li ser vê xalê rawestin. Ev pir girîng e, divê ku Kurd hemû di vê mijarê de şiyar bin. Mirov li ser vê xala Tirkiyê çi ye, rawest e, beramberî Kurd çi ye? Niha Tirkiyê tenê li dijî Kurda ye. Ji ber çi, ji ber ku avabûna miliyetgeriya Tirik li ser esasê tinekirina Kurd e. Ji bo vê hemû hesasiyet û şiyarîbûna desthilatiya Tirkiyê li ser esasê înkara Kurd çêbûye. Eger Kurd rojekê bi xwe bihese, tê wateya ku teoriya netew di Tirkiyê de şaş e, tê wateya ku hemû tiştên wê yên pîroz vala ne.

Ji bo vê heta jê tê şiyarbûna Kurdayetiyê red dike. Tenê di Tirkiyê de na, tenê di Bakurê Kurdistanê de na, di wir de jixwe asîmîlasyon, lêdan, kuştin tên kirin û heye. Lê belê li Îraqê jî nahêlin. Li Îranê jî nahêle. Li Sûriyê jî nahêle, li Ewrûpa jî nahêle, li Rusya jî nahêle.

Mînak di welatê Asya navîn de derên ku Kurd lê hene, li Rusya dema ku ji bo Kurdan di meselên çandî de serbestî çêdibe, tavilê Tirkiyê rexne dike. Li dijî derdikeve. Ji ber çi wiha dike, eger bi navê Kurdayetiyê li kîjan derê cîhanê, li Emerîka, Keneda, li Sibîriya li ku derê cîhanê bi navê Kurdatiyê pêşketinek çêbibe, ew ji bo polîtîka înkarê ziyan e. Tirkiyê ji polîtîka înkarê re serkêşiyê dike. Ji ber ku Tirkiyê ne bi destê xwe de ye, teoriya netew li ser wî esasî hatiye dayîn.

Îdeolojiya fermî li ser wî esasî hatiye dayîn. Nijadperest e, dînger e, nijadpereste li dijî Kurda ye, dîngere li dijî mezehbên din e. Ji bo vê di Tirkiyê de her Kurd xerab e, lê Kurdê Elewî hîna xerabtir e. Ji ber çi, ji ber ku hem Kurd e, hem jî Elewî ye. Bi du taybetmendiyên xwe li dijî îdeolojiya fermî ye.

Ji bo vê divê ev bê fêm kirin, ev îdeolojî bê dad kirin, yan jî wê têkoşîna me ya li dijî Tirkiyê vala ye. Dijî sîstemê vala ye. Eger ev îdeolojiya dewlet netewa Tirkiyê neyê analîzkirin, li ser vî esasî ji heft salî heta heftê salî Kurd, heta mêjiyê hestiyê xwe pê nehesin, nerazîbûna li hemberî pergala Tirkiyê çênabe. Ji bo vê niha mirov lê temaş dike Tirkiyê yek AKP'iyî ye, yek MHP'iyî ye, yek CHP'iyî ye hwd.

Ji lewre partiya pergalê li ser resmî îdeolojiya hatiye avakirin. Resmî îdeolojiya dijminê hebûna Kurd e ya fîzîkî ye.

Kurdan fîzîkî qebûl nake. Lê pir xwezayî tê kirin, ji bo vê mînak heta partiyekî pergalê di Kurdistanê de hebe, pirsgirêka Kurd çareser nabe.

Em di roja me ya îro de behsa pêşketinan û pêşveçûnan dikin, lê belê derdora me tije partiyên dagirkerin û resmî ne. Di Geverê de bîroya AKP'ê heye, di Şemzînan de bîroya AKP'ê heye, di Hekarî de ya CHP'ê heye. Ev pir xwezayî tê dîtin. Di Bakur de ev derûnî neyê şikanandin, ev meselên azadî, rizgarî hwd, hemû çîrok in, ti wateya wê tine ye.

Ji ber ku dagirker bi rengekî rewa di nav de xwe bi rêxistin kirin. Ma mirovê çawa rizger bibe?! Divê ku ev bê rûxandin. Siyaseta resmî qebûl kirin divê ku di Kurdistanê de suc be. Lê niha berovajiye, niha yekî/a bibe BDP'iyî weke ku suc bike, lê yê rewa AKP'iyî ye. Ji ber ku dibêjin ê me em welatê xwe temsîl dikin. Lê di rastiyê de welat tine ye, welat ne yê wî/ê ye.

**Dive Sîstema Înkarê Bê Tesfiyekirin**

Eger ev şer çênebe, fikirê dewlet netew nayê şikandin. Netewa demokratîk çi ye? Parastina nasnamê ye, parastina nasnamê çawa çêdibe, bi hilweşandina sîstema înakrê re çêdibe. Tesfiyekirina sîstema înakarê re çêdibe.

Sîstema înakrê dewleta Tirkiyê bi xwe ye, ji lewre ev dewlet divê ku ji nû ve di ber çavan re bê derBeaskirin. Ji ber ku ne rewa ye. Ji ber ku li ser esasê derwan ev heştê sal e hikum dike. divê ku ev bê derBeaskirin.

Niha Tirkiyê du tiştan temsîl dike, yek netew dewlet e, nijadperestiye, şovenîzma Tirik temsîl dike, ji bo vê hemû sazî li ser esasê vê hatine avakirin, yanî li ser esasê asîmîlasyonê hatine ava kirin. Hemû kesên ne Tirik di nava xwe de asîmîle bike, ji bo vê yek tîp derbikeve pêş. Heta niha ev nehatiye guhertin, weke me got, dozên em ji bo vê polîtîkayê li aliyê Kurdan de na, li dijî Kurdan e. Dibêjin; çima em zêde dibistanan venakin, em çima zêde memûran rênakin Kurdistanê da ku şêwazê jiyanê biguherin, em çima zêde wê civakê, yanî ya civaka Kurd zêde asîmîle nakin, li gorî xwe Tirik dibêjin enteger, lê di esas de asîmîlesyone.
Di baweriya Tirkan de derveyî asîmîlasyonê tiştek din tine ye, entegre kirin çîrokek e. entegerbûn jî navê din yê asîmîlasyonê ye, ev yek e.

Ya duyemîn, Tirkiyê di herêmê de emperyalîzm temsîl dike, ev girîng e. Tirkiyê rojekê ji rojan endamê NATO, bû. Di şerê sar de di eniya pêşiyê de li dijî Sovyetê têkoşîn dikir. Çemberekî kesk li derdora Sovyetê danî bû, nedihîşt ku komunîzm li ser Tirkiyê belav bibe. Hemû hêzên komunîst, çepên Tirik tesfiye kirin. Bi kuştinê, radest girtinê, bi îşkencê, qedexe kirinê tesfiye kirin. Bi vî rengî ji bo kapîtalîzmê rol dileyîst. Ev têrê nekirê, bi derba dozdê Îlonê faşîst, hîna zêdetir di çarçoveya dirinde de ev karê xwe meşand.

## Rola Tirkiyê Di Lîberalîzekirina Rojhilata Navîn De

Niha kapîtalîzm çalakiyên xwe guhert, kapîtalîzm niha lîberalîzmê esas digirin, dixwazin herêmên girêdayî xwe jî lîberalîze bikin. Lîberalîzm tê çi manê? Lîberalîzm tê wateya azad kirina tevgeran. Fikrê sermayedarî, malê sermayedaran bê asteng, li her derê. Ji bo vê sîstema siyasî di herêmên cuda cuda de, li ser esasekî dixwazin eyar bikin ku wan astengên li pêşiya tevgera sermayê û sermayedaran fikrê wan, malê wan wê astengê rabike. Tirkiyê pêşengiya vê bingehî dike. AKP' ê li ser vî esasî projek Tirkiyê ye, proja lîberalîzekirina Rojhilata Navîn e. Ev bi AKP'ê, xwestin bi Ozal bikin bi serbikevin, lê bi ser neketin. Niha jî dixwazin bi AKP'ê vê projê bidin meşandin.

Tirkiyê niha çi dike, Îslam ji nû ve di nû kirinê re derbas dike, bi navê Îslama siyasî, yan jî Îslama îlîmlî, yanî Îslama navîn, ya navendî. Dibêjin navend sax, aşîrî sax. Ev aşîrî Îslam heye, navendî Îslam heye, navendî Îslam bi edaletê re rabûne, li Îraqê bi edaletê rabûn heye, li Bakurê Efrîqiya jî heye, li cihên cuda cuda jî heye. Ev tîp heye.

Ev Îslama çi ye, ev ya bi nirxên Rojava hatiye aşî kirin. Îslama bi nirxên Rojava hatiye aşî kirin, Îslama piyasa serbest e. Li ser mulkiyetê ye, lîberalîzmê ye, rakirina astenga ye. Dixwazin vê weke model di Rojhilata Navîn de bidin meşandin.

Wê ev karibe cih bigire, ji lewre ev hewildanin. Lê wê nikaribe bibe, ji ber çi ji ber ku îdeoloiiya resmî di Tirkiyê de hîna di cihê xwe de ye, heta niha lêgerîna dewleta Tirkiyê li îstiqrarê bi vî rengî ye. Îstiqrarê li ser esasê tesfiyê çêbike. Mînak dibêje çi, doza Kurd kengê wê di Tirkiyê de tine bibe? Dema ku dozger tine be, dema ku kesên li pey dozê de tine bin. Ji bo vê tesfiya PKK'ê uncelîkliklî ye, planê AKP'ê ye. Ji ber ku eger PKK'ê di Tirkiyê de tine be, kes behsa Kurdan bike tine ye. Bi vî rengî mesela Kurd jî namîne.

Ji ber ku Kurdê sîstemê ji Tirkan Tiriktirin. Seyre, niha propoganda carina çêdibe, panêl di tv Tirkan de çêdibin, tu lê temaş dikî mirovekî Tirik e, lîberale, yan jî heta astekî baweriya wî bi azadiyê, demokrasiyê heye dibêje; mafê Kurdan, heqê wan yê rêxstinê heye, mirov dikare xweseriyê jî munaqeşe bike. Lê Dengîr Frat e, Metîner e, hwd, dibêjin na çênabe. Kurd dibêjin çênabe, ev kesên he miletwekilê Batmanê ne, yê Amedê, Urfayê ne, ev dibêjin çênabe, ev welatên me perçe dikin.

Ji bo vê PKK' heger hebe, ew weke xayînan tên diyar kirin, heger PKK'ê tine ba, wê ew weke îdial bên nîşandan. Însanên Tirkiyê yên herî têkûz wê bên nîşandan.

Ji bo vê esas uncelîklî xebata AKP'ê tine kirina PKK'ê ye. Eger PKK'ê û girêdayî wê saziyên demokratîk di Kurdistanê de ji holê rabibin tesifiye bibin, wê çaxê îstiqrara Tirkiyê wê peyda bibe, bi vî rengî AKP'ê yan jî Tirkiyê wê karibe rola xwe ya lîberalîz kirina Rojhilata Navîn bê asteng wê bileyîze, lê niha nikare bileyîze. Niha nikare wê rolê bileyîze ji ber ku nikare

şîretan li kes bike. Ji ber ku hêzekî muxalefetê yê xurt di hundirê Tirkiyê de heye, bi taybetî jî hêzekî têkoşînê weke Kurd heye. Ev dibe weke rengê asteng beramberî daxwaziyên Tirkiyê.

Bi giştî Tirkiyê rola wê nehatiye guhertin, berê dijî Sovyetê bû, niha jî Tirkiyê rolekî stratecîk di sîstema emperyalîst de dileyîze, misilman e, Rojhilata Navîn de ye, li ser xeta Avrasya ye.

Niha Tirkiyê ji bo Emerîka weke rola termînalekî dileyîze. Hem girêdana xwe bi Qefqasiya û Asya navîn re çêbike bi ser Tirkiyê re, bi taybetî bi hinek xelkên ku bi eslê xwe nijadê xwe Tirik in, yan jî cumhuriyetên Tirikî li wir hene, dînê Misilmantiyê li wir heye. Li ser Tirkiyê re hem girêdana xwe bi wir re çêbike, weke qadeke îstiqrarlî ji bo ku enrcî bi rengekî rehet derbasî Rojava bibe, bi vî rengî Rusya û Çîn ji dewrê derkevin, di heman demê de Tirkiyê hêzekî destwerdanê ji bo Rojhilata Navîn e, bi taybetî destwerdana çandî û siyasî. Rojhilateke navîn li ser esasekî ji nû de ev herêm li ser esasê plan, daxwazî, berjewendiyên emperyalîzmê bên dîzayîn kirin.

Ji bo vê desteka emperyalîzmê ji Tirkiyê re wê berdewam bike. Ev tiştên ku tên gotin, mînak nakokiyên di navbera Tirkiyê û Îstaîl, navbera Emerîka û Îsraîl, ev zêde bingehekî wan ê cidî tine ye. Tam berovajiyê wê. Piştî ku Erdogan li Daosê li dijî Şîmon Pîrêz ew gotin kirin, ji wê demê û vir de hecmê tîcaretê di navbera Tirkiyê û Îstaîl de gelekî gelekî bilintir bûye. Danûstandinên îstxbaratî di asta herî jorîn de berdewam dikin, piştî wê demê balafirên heronê dane Tirkiyê. Ji bo vê bi gelemperî ji bo ku Tirkiyê hîna zêdetir karibe serbest di nava rayagiştî de ya Ereban de karibe kar bike. Mînak weke dostê Ereban tê nîşandan, lê bi NATO re diçe li Lîbiya dixe. Weke dostê Misilmanan tê nîşandan, lê kalkanê foziya di erda xwe de qebûl dike li dijî Îranê.

Ev ji ber çi propoganda jê re tê qebûl kirin, Emerîka jî, Îsraîl jî qebûl dike, ji bo ku Tirkiyê vê propogandayê neke, înandiricî nabe. Eger vê propogandayê li dijî Îstaîl neke, eger van têkiliyên xwe bi Îranê re, bi Ereban re van têkiliyên xwe yên tektîk çêneke, wê demê di çarçoveya berjewendiyên Emerîka de di nava rayagiştî ya Ereb de, nava sîstema siyasî ya giştî ya Ereb û Misilman de nikare tevbigere. Ji bo vê weke çawa bi rengekî danişiqlî, bi zanebûn, ji Tirkan re dibêjin; Temam hun dikarin van tiştan bikin, da ku plan bi ser bikevin. Ev pêdiviya bi rolê ye, lê ti bingehê wê tine ye. Tiştê bingehîn ev e ku Tirkiyê parçek ji sîstema Rojava ye, li ser esasê berjewandiyên Rojava di herêmê de kar dike.

Bi gotine din jî ya Rêbertiyê, mînak behsa hinek tiştan dike divê ku em şaş fêm nekin. Mînak Rêbertî behsa nirxên komunal di qebîlên Tirkan de dike. Ew rastiyek e, di hemû sîstema qebîlet û eşîretan de nirxên komunal hene. Nerazîbûna li hemberî dewletê heye. Divê ku mirov vê weke rastî qebûl bike, weke çawa di qebîle û eşîretên Kurdan de nirxên komunal hene,

di yên Tirkan de jî hene. Ev nirxên komunal li dijî dewletên navendî li ber xwe daye, ev rast e.

Li dijî dewleta navendî ya Çînê, yên li Ewrûpa de, li ber xwe dane. Qebîlên Tirkan ketine şer, lê ev divê ku me nedehfîne vê hizrînê, em nikarin niha vê îdia bikin wê demê Muxul hatin Rojhilata Navîn û bi xwe re komunalîzm bi xwe re anîn, na. Bi xwe re komunalîzm neanîn, ew nêrîn çewt e.

Ji ber çi? Rêbertî vê jî dibêje; “qebîle li dijî desthilatiyên navendî şer kirin, ew şer mafdarbûye, lê di pişt re îcar sîstem teqlîd kir. dewletên xwe ava kirin, desthilatî ava kirin. Ew ne rewa ye, ne tiştekî bi maf e. Ji bo vê dema ku em tevgera qebîlê, ya Tirkan digirin dest, divê ku em van her du milên wê bibîne. Milê wê yê komunal weke nerazîbûna li dijî dewleta navendî şer kirine, lê jê û bi şûnde, hîna zêdetir desthilatdariya navendî pêş xistine. Yan jî xerabî, kuştin bi xwe re anîne. Divê ku mirov vê wer di şertên wan yên dîrokî de bigirin dest, ev yek e. Ji ber ku carina hinek hevalên me weke çawa dikevin rewşekî wiha, Rêbertî dibêje “ nirxê komunal”wê demê dema ku Muxul hatine Rojhilata Navîn komunalîzm bi xwe re anîn. Komunalîzm bi xwe re neanîn, xerabî bi xwe re anîn. Kuştin anîn, yan jî di roja me ya îro de desthilatdariya di Tirkiyê de ti têkiliya wê bi komunalîzm, nirxên komunal re tine ye. Bi temamî desthilatdariyek dewletiye, li ser esasê tepeserkirinê tê meşandin.

Lê nirxên komunal di Tirkiyê de tine ne, hene, tije ne. Di gundan de di roja me ya îro de jî hene. Di gundan de kesimên derveyî desthilatdariyê re mane, bi awayekî seyr wan nirxana diparêzin. Heta gengaze ku ji Kurdan zêdetir diparêzin. Yên ku derveyî desthiltiyê mane. Divê mirov di vê xalê de şaş nebe.

Xala duyemîn Kemalîzm e, Mustefa Kemal keskî li gorî xwe pîvanê împeratoriyê derBeaskiriye. Zihniyeta çaxê esas girtiye, li ser vî esasî ava kirina sîstemekî siyasî çêkiriye. Ev xalên erênî ne. Mirov dikare bi rengekî erênî bigire dest. Van tenê em na, her kes bi vî rengî erênî digire dest.

Di destpêka vê lêgerînê de hinek xebat hene, mînak eger Kurd hêzekî xurt bûna, beramberî îmahayê karîbûna bi rengekî serkeftî li ber xwe bidabana, dewleta Tirkiyê bi vî rengî çênedibû. Ya wê Kurdistanek serbixwe hebûya, yan jî dewletekî weke federal di navbera Kurd , Tirkan de çêbûbûya.

Lê ev nebû, komkujî çêbûn Kurd hatin înkar kirin. Ev dema ku Mustefa kemal saxbûye, komkujî bi vî rengî çêbûne. Heta li Dêrsimê komkujiyên Kuto Deresî, Elî Boxzî, dema ew komkujî li wir çêbûye bizat li ser sekiniye û agahî giritiye. Divê ku kes li wir sax nemîne. Şûnpê divê ku nemîne, yekî wênek girtiye û gotiye ev wêne maye, ew jî qetandiye û avêtiye.

Ji bo vê tesbît, behskirina Kurdan, heye. Heta Mustefa Kemal li cihekî wiha dibêje, diçe ser mezera leşkerê bênav, leşkerê bênav kevneşopiyeke, yanî yê ku nayê zanîn, weke sembol e. dibêje; “ tu mechulî , lê dîsa jî ez wer bawerim ku Kurd

e.” Vê gotina xwe bi vî rengî dide diyar kirin,  ango Kurdan jî Tirkan zêdetir ji bo avakirina vî welatî xizmet kirine. Ev gotin hene.

Meselên xudmuxtarî, gotina Kudistan, ev di xeberdanên wî de derBeasbûne. Ji bo vê Kemalîzm cuda ye. Kemalîzm çi ye, înkare Kurda ye, komkujiye, dewlet netew e. Ji ber ku di roja me ya îro de dewleta Tirik da ku di hemû tiştên xwe yên di Kurdistanê de hemû pêkanînên xwe yên di Kurdistanê de rewa bikin, bi sedam bikin, bi Kemalîzm dikin. Peykerê Mustefa Kemal jî ji Şemzînan bigire, nizanim heta ku di Kurdistanê de bela dikin.

Divê ku em di vir de jî şaş nebin. Hinek hevalên me carinan hinek nirxandinan dikin, dibe sersebebê xurtkirina kesên li dijî me. Ev divê ku mirov xwe jê xelas bike. Mirov divê bi zanistî binirxîne. Kesayetek e, ev kesayeta he bi têgînên xwe împeratorî derBeaskiriye. Cumhuriyet avakiriye. Pozîtîvîzm aniye. Şêwazê zanistiyê anîne, heta di çareserkirina pirsgirêka gelan de di serî de bi rengê komkujî, tinekirinê jî nefikiriye. Di van aliyana de mirov dikare bîne ziman.

Ji bo vê Rêbertî carina dibêje,  “makzagoên bîst û yekê, em wî ruhî çêbikin,” di wî ruhî de çi  heye,  hebûna Kurdan tê qebûl kirin. Divê ku ev nebe referansekî weke çawa vê carê hinek ji me rabin xwe Kemalîst bidin nîşandan.

Yan jî em Kemalîzmê biparêzin, divê ku em vê jî baş bala xwe bidinê di nirxandina sîstema Tirkiyê de. Divê ku em her demê îdeolojiya resmî timî esas bigirin. Çiqasî sistema siyasî Tikiyê rexne bike, dozdê Îlonê komkujî kir, hebis kir, ev hemû çîrok in, vala ye. Mînak Demirel jî kir, Demirel hate Amedê di Amedê de çend nêzîkî deh hevalên me zêdetir, zerê wan bi qelasan hate şikandin û mêjiyê wan li dîwaran ket. Di sala 1996’an de ev tişt çêbûye, şazdeh sal ku dozdê Îlonê derBeasbûbû, lê heman pêkanîn kirin.

Ji bo vê ji meselên siyasî zêdetir divê ku em bingeh bigirin dest. Îdeolojiya resmî em bigirin dest. Şerê me hemû li hemberî îdeolojiya resmî ye, ji ber ku dewlet netewa îmahager, înkarger li ser resmî îdeolojiya dirûne. Divê ku em vê ji gel re bikin mal. Zarokên Kurd ji heft salî heta heftê salî divê bi vê mezin bibin. Bi şerê li diji îdeolojiya resmî. Bi vî rengî înkarkirin vala derdikeve.

**Pêşketina Tevgera Nasirî Ya Bin Rêveberiya Cemal Ebdul Nasir De**

Tevgera Nasirî ya ku bi navê Cemal Ebdul Nasir derket holê tevgerekî milî bû, mirov dikare bêje demê qismek ronakbîr, subayî di nava Ereban de bi navê tevgera milî ya Erebî xwe bi nav kirin. Cemal Ebdul Nasir jî yek ji wan e. Bi vî rengî miliyetgeriya Ereb esas digirtin.

Antî emperyalîst bûn, ji ber ku miliyetgeriya Ereb di wê demê de li dijî dagirkeriyê ye, li dijî parçebûnê ye. Weke çalakiyekî bû, ji bo vê bi hikumê bi xwazaya xwe ya li dijî

parçebûnê, dagirkeriyê, bi rengekî otomatîk xwezayî li dijî emperyalîzmê bû. Ango li dijî Îngilîz û Fransa bû, di pişt re jî Emerîka.

Tevgerekî li dijî monarşiyê bû, ango li dijî qiraliyetê bû. Li ser esasê qîraliyetê sîstema feodalî bû. Ji bo vê tevgerek tê de noveyê modernîta, dewlet netew, lîberalîzekirina bi taybetî têkiliyên civakî, rê dayîna jinê, ciwanan, belavkirina erdan, bi vî rengî hinek pêkhatinên ku wer mordernîzasyonê û xwe moderin nîşan didan. Bi vî rengî derdiketin pêş.

Navê sosyalîzmê lê dikirin, ti têkiliya vê bi sosyalîzmê re tine bû. Lê ew bi xwe navê sosyalîzmê li xwe dikin. Hedefê wan yek jê yektiya Ereb û rizgarkirina Filistinê dane pêşberî xwe. Yektiya welatên Ereban dewletek Erebî mezin çêbibe û rizgerkirina Filîstinê ji Yahudiyan dane pêşberî xwe.

Ji bo vê destek ji her kes girtin, hemû hêzên netewî Erebî jî destek dane wan. Cemal Ebdul Nasir piştî demekê hîna zêdetir ev durûşmeyên xwe xwest bike rastî, bi vî rengî gavek dîrokî avêt. Ew gava dîrokî çi bû, destdayîna li ser Qenal Siwês. Li Misrê qenalek heye navê wê qenal Siwês e.

Ev qenal çi ye? Hun jî dibîn di vê nexşê de Misr di navbera, derya Sor  û derya Spî de ye.

Niha berê da ku em ji Îngeltera  yan jî ji Îspaniyayê, yan jî ji Ewrûpayê kesek bixwesta biçe Hindistanê, biçe Çînê, Îranê biçe van deran, li gemiyê siwar dibû, hemû derdora Efrîqiya badida li ber Umud Birono, dîsa dizîvirî heta dihat. Rêyeke pir dirêj bû. Lê belê li vir di navbera derya Sor û ya Spî de, girtî bû, ax hebû, gelek difikirîn digotin; gelo em di vir de qenalekî vekin wê çawa bibe? Digotin; em qenalê vekin ava derya Spî bi ser bikeve, wê vêcarê her kes dibin avê de bimîne. Newêrîbûn bikin.

Di pişt re qanûnên fîzîkê îsbat kirin ku av wiha nîne. Qanûna avê heye, ”Mebde Ewanî Mustetreq e” prensîbekî fîzîkê ye. Mînak em bêjin varêlek heye, teştek heye, dewlek (kuve) heye, piyanek (tasek) heye, gelek tiştan bi vî rengî em rêz bikin. Di binî de em bi xertomê bighînin hevdu, em van kuvanan hemû ji varêlê, teştê, satilê bigire, em avekê bera varêlê bidin, tije varêlê av bikin, piştî demekê sewiya avê di wan firaxan de hemû dibe weke hev. Ango sewiyek avê bi xwe heye û diyar e, li cihekî bilintirî cihekî din nabe, ji bo vê av di ku de be xwe dike yek. Wê demê av li cîhanê jî divê ku wiha be. Wê demê sewiya deryayan û zeryayan di cîhanê hemûyê de yek e. Ev li gorî prensîba fîzîkê derxistin.

Di sala 1845’an qiralekî Misrê bi navê Xidêwî Îsmaîl, got; heke wiha ye, wê demê em wê qenalê vekin, wê demê av li ser hevdu nakeve. Dest pêkirin karker tê de dane xebitandin. Bi hezaran însan, yên ku mirin, yên ku hatin kuştin, bi zorê dane karanîn ev qenal vekirin. Di navbera derya Sor û ya Spî de qenal vekirin. Vê carê gemî li vir nafitilin, gemî rasterast tên derya Spî, ji derya Spî derbasî derya Sor dibin, bi vî rengî tên zeryayan. Ji bo

vê rêyekî tîcarî û pir balkêş di cîhanê de, di dema ku ew rê bê girtin tevger lewaz dibin, hemû gemî li cîhanê di wir re derBeasdibin. Ev gemiyanan dema ku derBeasdibin, gelirekî wan heye, ango peran didin.

Misriyan piştî demekê îflas kirin, deyndar bûn, qirqalin, mesrefê zêde dikin, xerabiyê dikin, tiştên wiha dikin û deyîndar dibin. Di sala 1880'iyî şûnda di wê demê de, di dawiya sedsala 19'an de çûn gel Îngilîzan. Wê demê serokwezîrê Îngilîzê navê wî Dîzraîlî bû. Dîzraîlî bi eslê xwe Yahudî bû. Dîzraîlî serokwezîrê Îngilîzan bû. Hakimê Misrê çû ji Dîzraîlî re got; pêdiviya me bi peran heye, ji bo vê em dixwazin Qenala Siwêsê bifiroşin. Eger hûn bikirin peran bidin me, em ê bifiroşin we. Ger hûn nakirin, em ê bidin mezadê, em ê îlan bikin, wê demê kî bikire ew ê bikire.

Îngilîzan dît ku heger Fransa bikire, pirsgirêkek cidî ye jî bo wê. Yan jî welatek din bi peran bikire pirsgirêkek cidî ye. Ji bo vê gotin na, lewre Îngilîzan gotin; deng dernexin. Wê demê perlementa Îngilîzê di betlanê de bû. Biryar pêwîst e hwd, Dîzraîlî ev tiştên he hemû nekirin, wê demê li gel Îngilîzan ewqas pere jî tinebûn. Perên bihayê Qenal Siwêsê wê demê dihatin xwestin jî çarsed milyon strlînî bû. Dixwestin ev qasî peran heqê qenalê bistînin, ewqasî pere tinebûn. Bi dizî Dîzraîlî çû dewlemendek Yahudî hebû, dewlemend bû, bankerekî mezin yê Yahudî li Îngeltera bû navê wî Roçter bû, çû jê re got; peran deyîn bide me, da ku em Qenalê Siwês bikirin. Bi rastî jî yê Yahudî hese senediyên xwe bi dizî wilo bi rengekî derbê nexwe jî, li her derê firotin pere komkirin da hikumeta Îngilîzan wê qenalê bikirin. Îngilîzan ew qenal kirîn. Qenal yê Îngilîzan bû, şirketa Îngilîzan dida bikar anîn, perê wê wan digirt. Ti têkiliya Misrê pê re tine bû.

Ev rewş heta kengê dewam kir, heta sal 1956'an wiha bû. Ebdul Nasir got; em dixwazin hemû welatê Ereban rizger bikin, ev hatine di hundirê Misrê de şirketên me girtine. Em vê qebûl nakin. Bi dizî ji nişkê ve basqin li ser şirketê kirin, şirket qamoleştirme kirin. Leşkerên Îngilîzan jî ji wir derxistin û bi vî rengî girtin, Qenal Siwês bû ya Misriyan.

Vê nerazîbûna Îngilîzan çêkir, ya Fransîzan jî çêkir, ya Îsraîl jî jixwe çêkir. Ji ber çi? Em bala xwe bidinê ev serdem serdema şikandina Îngilîzan bû. Ya Fransa bû, yanî mêtingerî klasîk hildiweşiya. Mînak di van salan de ji Misrê derketin, ji Sûriyê derketin, di sala 1946'an ji Sûriyê derketin, ji Îraqê derketin. Gav bi gav welatên Bakurê Efrîqiya de şer dijî wan hebû. Mêtingeriya klasîk bi rengê xwe yê leşkerî îflas dikir.

Lê belê Îngilîzan digot; na em ê dewam bikin. Îngilîzan bi vê liv û tevgera xwe dixwestin bihanekê li hemberî Cemal Ebdul Nasir çêbikin û careke din vegerin wan erdana dagir bikin.

Zeman derBeasbibû, cîhan tevlî vî şêwazî nedibû, Emerîka jî lî hemberî bû. Heta Emerîka şiyarî kirin got; teqez êrîş nekin, êdî zemanê mêtingeriya klasîk çûye. Van karan nekin, bi vî rengî hûn nikarin bi ser bikevin. Lê belê Îngilîz û Fransa bûn yek,

bi alîkariya Îsraîl êrîşek di sala 1956’an li ser Misrê kirin. Ev jî li dijî biryara Ebdul Nasir ya girtina wî ya Qenal Siwês bû.

Di wî şerî de Misr bi ser ket. Lê serkeftinek çawa bû, ji lewre sedemên wê serkeftinê hebûn. Îngilîz, Fransîz û Îsraîl bi hevdu re şer kirin. Lê Misriyan li ber xwe dan û bi ser ketin. Sedemên wê serkeftinê yek jê ew bû ku civaka Misrê li ser piyan bû, bi hêvî bû, dewlet û sîstem diparast, weke çawa yê xwe ye diparast, hîna nakokî di navbera civakê û deshilatdariyê de çênebibûn. Mînak hîna wiha bi rengekî çalak li dijî komunîstan, Îslamiyetgeran hîna sîstem neketibû dewrê. Ji bo vê, civak pê re bû. Ew germahî di wê serkeftinê de bandora wê hebû. Ev sedemê yekemîn e.

Sedema duyemîn a serkeftinê, Sovyetê alîkarî da Misrê. Çima Sovyetê alîkarî kir; yek firsendek dest wê ket, ji nişkê ve Sovyetê dît ku di cihê herî stratejîk di cîhanê de desthilatdariya ku çêbûye dostaniya wê dike. Li dijî Emerîka, li dijî Îsraîl e, behsa sosyalîzmê jî dike. Ji bo vê pir destek kir, di aliyê leşkerî de di aliyê dplomatîk de, destek kir.

Sedemê sêyemîn jî Emrîka bi xwe ne bi vî şerî re bû. Di nava sîstema kapîtalîst a cîhanê de hemfikirbûyîn tinebû. Emerîka li djî vî şerî bû, ew şiyar kirbûn, tavilê dema ku lewazî jî di şer de derket, tavilê bileşmîş miletler, civînek çêkirin û li ser sekinandina operasyona li dijî Misrê biryar girt. Bi vî rengî Îngilîz Fransîz û Îsraîl şkestin. Vê hesabên Cemal Ebdul Nasir di nava Ereban de pir mezin kir. Êdî weke pêxemberekî li Cemal Ebdul Nasir hat, Ereban jî wiha lê temaşe kirin.

Li Sûriyê, Îraq, li welatên bakurê Efrîqiya, li welatên Kendavê, her kes Cemal Ebdul Nasir weke xelasker didîtin. Êdî Cemal Ebdul Nasir çi bikira Ereban jê bawer dikirin. Pê bawer bûn, bi vî rengî hêviyek mezin da Ereban.

Lê belê miliyetgerî, miliyetgeriye. Mileyetgerî ne civakî ye, ji bo vê bi demê re li ser hesabê van serkeftinan Cemal Ebdul Nasir xwest vê carê fikirê xwe feriz bike. Nerazîbûn li beramberî wî çênedibûn. Zêde çênedibû, nerazîbûna gel tinebû, gel himêz dikir. Bi vê alîkariya gel xwest gav bi gav muxalifên xwe tesfiye bike. Nifûsên xwe berfireh bike. Yek ji vê hewildanên berfireh kirina nifûsê di sala 1957’an de bi Sûriyê re yektî çêkir.

Di sala 1957’an Sûriyê hinek rêvebirin Sûriyê çûn cum Cemal Ebdul Nasir û gotinê; Em dixwazin bi te re yek bin. Ew jî jixwe lê digeriya. Li ser vî esasî yektî çêkirin, êdî navê Misr û Sûriyê ji holê rabû, êdî navê bû Cumhuriyeta Erebî Ya Yekbûyî.

Lê belê vê yektî nebû bingeha yektiya Ereban. Bi awayekî xwezayî xwestin bi Sûriyê re yek bin ji bûyî di pişt re Urdun, Lubnan, Îraq jî tevlî wan bibe, gav bi gav berfireh bibe, lê ev nebû.

Sedemên neyekbûnê çi bûn? Sedemên wê ev sîstema otorîter bû ku her tişt xist xizmeta desthilatdariyê, ji ber ku gotin; em li dijî emperyalîzmê şer dikin. Em li dijî siyonîzmê ne. Xeterî li

ser me heye, ji ber vê divê ku em hemû enerjiya xwe li dijî emperyalîzmê bidin xerckirinê. Dem ne dema muxalefetê û parçe kirinê ye, ji bo vê kê behsa tiştekî cuda kir, lêdan û tesfiye kirin.

Ev bû sersebebê ku bi taybetî sîstema siyasî ya Ereban hinekî mesefetê deyîne. Weke din jî di hundirê vê yektiyê de, di rastiyê de ne yektî bû, mêtingerî bû, mînak Sûriyê bû weke mêtingeha Misrê. Ji ber çi? Ji ber ku çavkaniya fikirê Nasirî tenê Misr e, ji bo vê dema ku Sûriyê û Misr bûn yek vê carê ji Misrê Subayî, mamost e, Mamûr dihatin Sûriyê wan bi rêve dibir. Mamostekî Misrî ji qeyqamekî Sûriyê bêtir bi erkdartir bû. Gav bi gav Sûriyan ev nêzîkbûn qebûl nekirin. Hinek tevgerên siyasî li Sûriyê li dijî yektiyê derketin. Ji lewre Suîdiyê jî pere dan wan da ku ew yektî xerab bibe. Tirkiyê ew destek kirin da ku ew yekîtî xerab bibe. Ji ber ku Tirkiyê pir ji vê yektiyê nerehet bû. Mînak gotineke Ednan Menders heye dibêje;( wê demê serokwezîrê Tirkiyê yê wê demê bû); "  Tiştekî wiha dibe! Duh ez razam dewleta cîranê min nifûsa wê heşt milyon bû. Ez vê sibê şiyar bûm bûye sî û heşt milyon." Ji ber ku bi Misrê re bûye yek, wê demê nifûsa Misrê Sîh bû, yê Sûriyê hest bû.

Heta hinek sînaryo hebûn ku di rêka Tirkiyê de êrîşekî leşkerî li ser Sûriyê bikin da ku wê yektiyê xerab bikin. Ew nebû, ji bo vê hem Tirkiyê, hem welatên Kendavê, tevgera cudabûyînê di Sûriyê de destek kirin, pêkhatinên ku Nasiriyan di Sûriyê de kirîn jî hîna zêdetir ji vê meselê re zemîn hazir kirin. Ji bo vê di sala 1961'ê de Sûriyê parçe bû. Careke din perçe bû û bû dewletek serbixwe. Bi vî rengî yektiya di navbera Misr û Sûriyê de çiqasî dewam kir, çar salan dewam kir.

Lê belê Misrê hîna jî hêz bû, Ebdul Nasir hîn jî hêzek tê guhdar kirin. Tecrûba yektiya bi Sûriyê re bi ser neket, lê dîsa jî dewam dike. Di vê serdemê de li Misrê hem bi bandora danûstandina bi Suvetê re, tevgera çep hinekî pêş ket, hem jî bi alîkariya Emerîka tevgera dînî pêşket. Ev her du tevger ji aliyê Ebdul Nasir ve weke xeterî hatin dîtin, bi ser wan de çû.

Tevgera Îslamî lê da, gelek însanên wan girtin, teorîsiyenên wan yê herî mezin di zindanê de kuştin, Seyd Qutub. Gelek kesên din jî wiha. Di beşê Îslamê de em ê li ser van tevgeran hinekî zêdetir berfireh bisekinin.

Tevgera komunîst jî bi vî rengî tesfiye kirin. Dema ku tesfiye dikir, Suvyetê dengê xwe nekir. Çima dengê xwe nekir, ji ber ku dostê Suvyetê bû. Suvyetê ji bo vê çav li ser lêdana komunîstan girt. Tesfiyekirina komunîstan heta asta dawiyê siyasetek bêprensîb da meşandin. Hemû donanim li ser esasê ka çawa Filistînê xelas bike, her kes li benda vê hêviyê bû ku Cemal Ebdul Nasir wê Filistînê xelas bike. Êdî gihaşt astekî ku bivênevê Ebdul Nasir divê ku gavekî li dijî Îsraîl biavêje. Dema ku gavekî neavêje pê bawerbûna wî wê ji holê rabibe. Di encamê vê de şer îlan kirin.

Di sala 1967'an di meha Hezîranê de şer dest pê kir. Herwiha van digotin, eniyên şer hene, Ereb yek in, mînak Urdun

dema gotin; em ê şer bikin qiral Husên yê Urdunê çû gel Ebdul Nasir tevî ku dijminê wî bû jî, çû gel gotê; “Eger hunê şer bikin, ez tevlî we dibim.” Cemal Ebdul Nasir jî got: Ger tu tevlî me dibî, ez ê subayekî bişînim da ku artêşa Urdunê birêve bibe. Qiral Husên jî got temam. Ji ber ku qiral Husên tirsiya, eger şer bikin bi ser bikevin, wê her tişt bikeve destê Ebdul Nasir êdî kes nema dikare beramberî wî dengê xwe bike. Eger şer bike û bin bikevin, wê ji Ereban re bêjin; Temaşe bikin, me şer kir Urdun alîkariya me nekir xayîn bûn. Wê dîsa nebaş be, ji lewre qiralê Urdunê got; “artêşa me amade ye, di bin venêrîna te de ye, tu çi bixwazî bikî bike.

Sûriyê jixwe weke enyekî şer bû, Misr eniyekî şer bû, Lubnanê wê demê got; “em nakevin vî şerî ti têkiliya me pê re tine ye.” Lubnan neket şer. Şer di sala 1967’an de dest pê kir. Hesabê wan ê sûk û malê li hevdu derneketin. Îsraîl hêzek wê xurt hebû, ji Îsraîl re hesab nekirin. Di demekî kin de di şeş rojan de Îsraîl lê da, di eniya Urdun de qsmek Urdun dagirkir, tenê ev na, ev Xeza û Batî Şeriya berê ne di bin destê Îsraîl de bûn, ew jî girtin. Ji derveyî wan qsmek ji Urdun girtin. Qsmek ji Sûriyê girtin, ev çiyayê Golan, Bajarek ji Sûriyê navê wê Qunetera, di sala 1974’an de careke din Îsraîl jê derket. Lê belê heta wê demê tê de bûn.

Yê Misrê jî Sîna girtin, ew qsmê erda Misrê yê ku li kêleka Îsraîl, ew girtin. Heta Qenal Siwês hatin. Bi vî rengî Îsraîl di hundirê şeş rojan de sê artêşên Ereban şkenandin sê welatên Ereban de erd dagirkirin. Ev bû sersebebê ku heta astekî rewabûna Cemal Ebdul Nasir bikeve û lêgerînên nû çêbibin, gav bi gav wer ber bi çepayetiyê jî di nava Ereban de tevgerek çêbû, ji ber çi bû?

Mînakek heye dibêjin; dema ku Misrî şkestin wezîrekî Misrê diçe cem Buyku Elçiyê Rusya yê li Misrê dibêjiyê; ”ev çekên xerab dane me, me nikarîbû pê şer bike, ji ber vê em şkestin. Xwe nerehet dike, wî azarleme dike.” Buyuk elçiyê Rusya jî wî debersivîne: “ me heman çek dan Vêtnamiyan jî, lê ew bi ser ketin.”

Niha ev gotineke, lê çi îfade dike, lêgerînekî ji rêyekî re vedike. Ji bo vê di nava Ereban de Fikirekî wiha pêşket. Wê demê mesele ne bi çekan e, mesele bi fikir e, bi zihniyetê ye. Wê demê heger em çep bibûyan em ê jî bi ser ketiban. Ew binkeftina he rê li hemberî tevgerên çep vekir ku di nava Ereban de pêş bikevin, bi taybetî jî di nava Filistîniyan de.

### Avabûn Û Pêşketina Eniya (Cebha) Şeabî Ya Filistînê

Di sala 1968’an eniya gelêrî (cehba şeabî) ava bû, bi serkêşiya Corc Hebeş, Corc Hebeş însanekî Marksîst, Lenînîst, Filistînî bi navê mamost e tê nasîn, mamostê Marksîzmê. Mirovekî bi prensîb bû, bi eslê xwe Xiristiyan e, dibe ku miribe, ger nemiribe, felçbûye. Ji ber ku bû demek dirêj siyasetê nake.

Navê wê Eniya eniya Red bû, Cebha Red kirinê. Tivngên wan paçekî sor pê ve dadleqandin, di nivîsandin ”em hemû projên aştiyane red dikin.” Marksîzm Lenînîzm esas digirtin, çalakiyên fedayî pêş dixistin, mînak ev çalakiyên ku Îsraîl tengav kir, revandina balafiran, gelek hedefên din jî eniya red dikirin, Milîtaneke wan yê pir bi hêz hebû wê demê navê wî Wedîa Hedad bû. Wedîa Hedad li Îraqê mir. Li Îraqê mir bi dizî bi zemanlî zihrlemê mir, Mosad di Îraqê de dixwarina wî de zihrlema zemanlî bandor bike, bi vî rengî ji nişkê ve mir kes nizanî çima miriye, heta hinekan gotin; Gelo Corc Hebeş ji bo ku wî ji ber xwe rabike kuştiye! Di demên dawiyê de eşker bû ku Mosad ew kuştiye, bi jehriyê. Wedîa Hedad pir çalakiyên balkêş li dijî Îsraîl dane kirinê. Wedîa Hedad çalakiyên pir balkêş di nava Îsraîliyan de kir.

Tevgera çep tenê di nava Filistîniyan de na, ev ne partiya komunîst ên klasîk e. Ev tevgereke çep a nû ye. Çekdar e, wer perspektîfên wan yên desthilatdariyê hene, bi vî rengî pêş ketin. Di welatê Kendavê de jî dewlet bi destê xwe xistin. Li Yemena başûr bûn desthilatdar, dîsa heman ev tevger bû.

Di Filistînê de Cehbe di nava Filistînyan de çêkirin, li Yemen jî bûn desthilatdar. Li başûrê Yemenê dewletek çêkirin. Ew dewlet heta salên 1986-1987’an jî hebû, lê di pişt re pirsgirêkên wan ên hundirîn derketin. Bi xwe û xwe hevdu kuştin, jê û şûnda teslîmî bakurê Yemenê bûn, bûn yek dewlet. Lê berê başûrê Yemen dewletek sosyalîst bû. Bi ser kêşiya kesekî bi navê Ebdul Fetah Îsmaîl çêbû, pişt re hate kuştinê.

Tevgera çep ya çekdar bi taybetî li dijî Îsraîl bi vî rengî pêş ket. Misr gav bi gav ew rola xwe ya ku ji bo hemû Ereban a balkêş wenda kir, bi taybetî jî bi mirina Cemal Ebdul Nasir re hîna zêdetir rol wenda kir, ji ber ku Cemal Ebdul Nasir weke sembolekî bû, yê ku li şûna wî hatin cihê wî danegirtin, ew karîzma wan tine bû.

Welatên Ereban ên xwestin teqlîda wî bikin jî, bi ser nektin. Mînak, li Îraqê Sedam Husyên xwest teqlîda wî bike, bi durûşmeyên li dijî emperyalîzmê, li dijî syonîzmê, bi van xwest teqlîda wî bike bi ser neket.

Dîsa li bakurê Efrîqiya Qezafî xwest teqlîda wî bike, Qezafî xwe weke kurekî wî yê fexrî dihesiband. Lê belê piştî mirina wî xwest ew wê rolê bileyîze, wî jî nekarîbû. Kes nikarî rola Ebdul Nasir bileyîsta.

Cemal Ebdul Nasir piştî ku mir, gav bi gav Misr têkiliya xwe bi Suvyetê re hêdî hêdî qut kirin. Bi emperyalîzmê, Emerîka û Ewrûpa ve girêdan. Piştî şerê 1973’an bi Îsraîlê re li hevdu hatin. Sedemên wan jî yên li hevhatinê çi bû, erda Misrê vegerandin, Îsraîl ji çola Sîna derket da Misriyan. Misriyan jî gotin, me pirsgirêkên xwe bi Îsraîl re çareser kir, erda me ya bindestê wan me paş de vegerand. Ji bo vê agirbest bi Îsraîl re îlan kirin. Heta roja îro jî berdewam e.

Di sala 1977-1978’an de bi şûnda peymana Kamdêvêt, têkiliya bi normal leşmê, ya ku Îsraîl re danîn heta roja me ya îro dewam dike. Misr bi vî rengî ji eniya berxwedanê û temsîla miliyetgeriya Ereban a li dijî Emperyalîzmê, li dijî Syonîzmê derket.

Potensela Misrê ya ku bibe hêzeke herêmî heye, potensela wê zanistiye, potensela wê nifûs e. Lê belê Misr nahêlin ku ser bi xwe bibe. Ji ber çi, ji ber ku li kêleka Îsraîl e. Eger di Misrê de hêzek serbixwe derkeve pêş, wê ev bihêle Îsraîl tengav bibe. Ji bo vê Emperyalîzm berê Fransîz û Îngilîz di pişt re jî Emerîka her demê Misrê bi qeydê bi baxên organîk bi xwe ve girêdidin, da ku Misr her demê di çarçoveya berjewendiyên wan de tevbigere. Sîstema siyasî ya Misrê li ser wî esasî timî di bin kontrolê de ye.

Ji ber ku Ebdul Nasir gelek tişt bi wan dane wenda kirin. Careke din naxwazin Ebdul Nasirek din hebe û derkeve. Ji bo vê dema pirsgirêk li Misrê derketin, hema Emerîka destwerdan kir, ji bo çi, ji bo ku nerazîbûna gel qenalîzeyî rêkên din bike. Ji Mubarek re got in, îstîfa bike, artêş kirin dewrê, bi vî rengî meselê venêrîn dikin û bi xwe ve girê didin.

Ji lewre ger Misr bibe hêzekî herêmî, ji ber ku ew potensel tê de heye. Ji bo Îran û Tirkiyê jî nebaş e. Ji bo vê niha Tirkiyê pir qaygîliyeli beramberî van rewşên di Misrê de. Ji ber çi, ji ber ku Misr ne di dewrê de ye, Tirkiyê ewqasî dikare di nava sîstema Erebî de xwe bi cih bike. Ji ber ku Misr ne di dewrê de ye, Îran ewqasî dikare di nava sîstema Erebî de xwe bi cih bike. Yanî sîzme bike, derbasbûyîna sîstema Erebî bikin. Ji ber ku sîstem bê xwedî ye. Aktorê serekî di sîstemê de felc e, Misr e ew jî felc e. Ji bo vê di şiyarbûna  Misrê de rê li pêşiya pêşketinan vedike. Lê belê hêza gel rêxistina wê, têrê bike ku careke din msyonekî bide Misrê? Ji lewre ew hîna ne diyar e.

Di wê astê de bikaribe ji nû ve avabûnekî çêbike! Mirov vê baş nizane, hêza wê ya rêxistinî, biryarlîbûna wê, ji ber her roj sîstema navnetewî dixwaze lê babide. Her roj dixwaze weke çawa guhertin çêbûye bide nîşandan, lê sîstema berê bide berdewam kirin. Heta niha Muxalefet şiyar e, nerazîbûnê nîşan dide. Kontrol dike, lê hêza wê ya rêxistinî wê têrê bike ku li gorî îrada xwe sîstemekî çêbike, ev muxalefet di tabloya siyasî de di dîmena siyasî de di Misrê de wê karibe çalak be? Tabî ev hîna jî mirov nikare tam tesbît bike, lê hewildanek heye, cidî ye, balkêş e. Bi qedir û qîmet e, divê ku mirov bi vî şeklî binêrxîne.

Mirov dikare Misrê bi vî rengî binêrxîne. Ji lewre pêşketinên li Sûriyê, Îraqê, hene, ew jî hem me eleqeder dike weke Kurd me eleqedar dikin. Hem jî herêmê eleqedar dikin. Ji bo vê girîng e, mirov li ser bisekine.

### ŞOREŞ ÊN LI MISIR, CEZAÎR, IRAQ, LÎBYA Û SÛRIYÊ

Li ser Misrê, rewş û bandora wê ya li ser Tevgera Milî ya Ereb em hinek sekinîbûn. Tabî di vir de mirov çi dibîne, miliyetgerî û yan jî dewlet-netew di Rojhilata Navîn de

taybetmendiyên hundirîn ti carî esas negirtine. Yani çi heye; ol, mezheb, komê etnîkî, şêwazên jiyana cûd cuda, ev esas negirtine. Li beramberê van taybetmendiyanan ji nedîtî ve nêzîk bûye. Çawa tûne hesibandiye û bi derfetên dewletê bi zora şîdetê, bi êrişên birdozî, asîmîlasyon esas girtiye.

Misir ji esas ve welatekê ji tek tîpbûnê re zêde ne dest daye. Ji ber taybetmendiyên wî ên dîrokî, çandên wî ên ji hevdu cuda ku lê dijîn. Dîsa gelek olên li Misrê hene. Mînak, Xirîstiyantî, Misilmantî, heta hinek dînên dîtir jî weke Bihayî. Ev hemû dibin sedem ku welatekî, bi birdoziya fermî û bi rengekî li ser bingehê avakirina hemwelatiyekê tek tîp, projeya serkeftî nebû. Bi xwe re qrîzan û nakokiyan tîne û ew nakokî di civaka Misrê de heta roja me ya îro berdewam dikin.

Rastiya şoreşê di Rojhilata Navîn de di mînaka Misrê de mirov dikare pir mînakan jê derxe. Di esas de li Misrê şoreş e, Cezaîr, Lîbiya, Îraq û Sûriya jî şoreş e. Di serdema 1945' an û şûn ve, di sala 1950-1956-1958-1960 hwd, di dîrokên cuda de li van welatan şoreş çêbûn.

Di çi wateyê şoreş e? Bi têgihîştina xwe ya siyasî, bi pergalê, bi gelek tişta guhertinên bi bingehîn çêbûn. Ew rast e, lê belê dema ku mirov van mînakan dide ber çav, wê demê mirov fêm dike ku di roja me ya îro de çawa şoreş bixwe re di Rojhilata Navîn de îxanet tîne.

### Sedemên Li Xwe Îxanetkirina Şoreşên Li Rojhilata Navîn

Çima şoreş di Rojhilata Navîn de bi xwe re îxanetê dike? Ji ber ku şoreşa Rojhilata Navîn taybetmendiyên wî ên demokratîkbûnê nîne. Bi taybetmendiyê demokratîkbûnê ihmal dike û gav bi gav red dike qedexe dike.

Taybetmendiyên demokratîk di şoreşê de çi ne? Taybetmendiyên demokratik di şoreşê de ew in; ku hêzên civakî karibin xwe ifade bikin û di oxira prensîbên şoreşê de xwe înkar nekin. Ji bo armanc û prensîbên wê şoreşê, hêzên civakî xwe înkar nekin. Nasnameya xwe zindî bihêlin. Li ser bingehê meta, nesne, weke nirxekî bi tenê madî çors neyê xerc kirin, bi xwe hebin, karibin xwe îfade bikin, xwedî sûd û di encamê de xwedî reng bin.

Şoreşa Rojhilata Navîn bi serdikeve, ji demokratîkbûnê zêdetir motleqbûyînê esas digire. Bi vî rengî ji demokrasiyê zêdetir, dewamkirina pergala kevn, lê belê bi şêwazekî din esas digre. Heta bi hinek tewşbûyîna xwe, ji pergala kevn xirabtir e, lê çima? Ji ber ku pergala kevn rewabûn pê re tine ye. Gel li dijê wê ye.

Lê belê ve pergala bi navê nûbûnê, bi zirxê rewatiyê hemû rêbazên çewisandinê, inkar û îmhayê, ji bo xwe rewa dibîne. Ji bo vê pir xeternaktir e. Ji aliyê asîmîlikerinê, tine kirinê ve, pir bi xetertir e ji bo hêzên civakî.

Ji bo şoreşa li Rojhilata Navîn girîng e, hîn di pêvajoya şoreşê de be, tevdîrên demokrasîbûnê bigre. Şoreş çi dibe, bila bibe, dema ku hê di pêvajoya şoreşê de be û tevdîrên demokrasîbûnê negirin, ew şoreş piştî ku bibe desthilatdar, wê berovajiyê xwe bizivire. Bi prensîbên xwe re îxanetê bike û bi

kesên ku jê re bûne bingeh jî re îxanetê bike. Bi hêzên civakê re ên ku jê re bûne bingeh jî re îxanetê bike.

Tabî Rojhilatanavîn şekilgirtina wî ya statuya wê ya sîyasî, dozena siyasî ya ku di Rojhilata Navîn de hatiye danîn, bi temamî girêdayî berjewendiyê Fransizan û İngilîzan e. Di serî de wiha bû û niha jî girêdayê berjewendiyên Emerîka ye. Ango yê emperyalîzmê ve hatiye girêdan.

Ji lewre emperyalîzm ji bo ku dem dirêj berjewendiyên xwe pêkbîne, dîzayînek da. Bi çi dest pê kir, bi daxwaziyên gelan destpêkir, lê bi berjewendiyên xwe berdewam kir. Ev taybetmendiyekî sîyaseta Îngilîzan e. Îngilîz her demê ji xalekê ji terefê din ve dixwaze dest pê bike. Lê belê meselê ber bi tiştê ew dixwaz ve dajo.

Ji bo vê dîpolomasî, sîyaset û têkiliyên Îngilîzan bi cîhanê re her demê ji xala ku alem dixwazin dest pê dike. Xala ku Ereban dixwest çi bû? Serxwebûn bû, Îngilîzan gotin, "temam." Jixwe em ji bo serxwebûna we kar dikin. Lê belê encam çi bû? Encam berjewendiyê Îngilîzan bû. Ji lewra lîberalîzm, pirtûka demokratîk ya Îngilîzan vê derfetê didiyê. Ji tiştê ku aliyê din dixwaze her demê dest pê dike. Her tiştê dipejirîne. Lê belê her tim pêvajoyê diherikîne ber bi berjewendiyên xwe ve.

Ji bo vê jî nexşeya ku danîn, li ser esasê ku pêvajo ber bi berjewendiyên wan ve biherike daniye. Bi vî rengi dewlet çêkir. Heta ji wan hat, hêzên desthilatdar, ji kesên wer hilbijartin ên ku têkiliyên wan zêde bi civakê re tine bûn. Yanî girêdana wan bi civakê re tine bûn. Aîdiyeta wan a civakî zêde tine be, ji bo ku li hemberî pirsgirêkên civakî ne hişyar bin. Ji bo ku li hemberî çareseriyê ne hişyar bin, berjewendiyên gelan, civakê esas negrin, her demê di bin emr û nêrînên kapitalizmê de sekinî bin. Her demê di çerçoveya daxwaziyên emperyalîzmê de tevbigerin.

Ji bo vê demekê Şah Huseyên li Hîcazê alikariya wan kir. Lê belê li wir nikaribû bibe desthilatdar, neçar ma ku bireve. Lê belê ji bo ku alikariyê bi Îngilîzan re kirîbû, Îngilîzan çi kir, wek xelat hinek welat xistin bin venêrîna wan de. Bo mînak; hinek ji wan li ser Îraqê xist desthilatdar, ên Qiraliyetê, hinek li ser Urdunê xistin desthilatdar. Mirov dibêje; qey weke ku hinek welat bi taybet ji bo wan çêkirine. Bo mînak; Urdun ti sedemak wê yê dîrokî û netewî nîne. Heta demek dirêj jî, gelek hêzên şoreşger di nava Ereban de li Urdun weke pergalekê nedipejirandin. Weke ji rê derketinekê qebûl dikirin. Weke tiştekî quqla qebûl dikirin. Heta bernameya Cebha Şeabî ya Corc Hebeş bi vî şiklî bû. Di destpêkê de li Urdunê şoreşê çêbikin, wê pergalê ji holê rabikin û Urdun bikin bingeh û li dijî Îsraîlê bikevin şer. Ji bo ku ew desthilatdarî rewa nedidîtin. Ew xelatek Îngilîzan ji bo mala Şah Husên bû. Urdun dan kurê wî, Îraq dan kurekî wî yê din. Bi vî şekli ji bo wan qraliyet avakirin.

Sûriyê bi teşeyê xwe yê sîyasî di sala 1920' an de di encamê îtîfaqeke di navbera Fransa û Tirika de çêbûye, li Enqerê çêbûye. Li gorî wê îtîfaqê, bi rengekî fermî Tirkan dev ji desthilatdariya xwe ya li ser Sûriyê berdan û Sûriye bi temamî bûye herêmek nufûsa Fransa. Di wî îtîfaqê de tiştekî Tirikan ku di Sûriyê de bimîne tine ye. Tenê dema ku Tirk derbasê Anadolê bûne, li wir bi rê de serokekî wan, bi rê de li Kobanê li ber Ava Firat miriye, li wir bin erd kirine. Di wê îtîfaqê de dibêjin; ew Tirb

a me ye, wekî din her tişt yê we ye. Ji bo vê niha ji bo wê tirbê di erda Sûriyê de ye, lê belê leşkerên Tirkan li ber in. Riyek heye, weke stargehekê diçin û tên û nobeta wî tirbê digrin. Ez bawerim ku navê wî Silêman e, dema ku bi rê de çûne Anadolê ez bawerim ku miriye.

Sûriyê bû mêtingehekî Fransî, hemû hewldanên gelê Sûriyê yên li dijî Fransayê bi ser neketin. Di serdemên cuda, cuda de berxwedan li hemberê Fransa peşeket, şer çêbû. Di sala 1920' de, 1925 'an de şer çêbû, şerekî berfireh bû. Navê wî kirin weke şoreşa Sûriyê ya mezin. Ji çiyayê Dûrizya dest pê kir û li her derê Sûriyê belav bû. Ji wê û şûn ve gav bi gav li Helebê, li mentîqa Cizîrê, li nava Kurdan, li cihên cuda cuda tevgerên berxwedanê li hemberê Fransayê pêşdiketin.

Fransa piştî şerê Cîhanê yê yekemîn di sala 1946' an de ji Sûriyê derket. Bi temamî leşkerên xwe girt û derket. Li şûna xwe hikumetek wiha qûqla hîşt û bi vî şiklê pêvajoyekî sîyasî ya nû li Sûriyê dest pê kir.

Tevgera Siyasî li Sûriyê bi giranî tevgerekî lîberal bû, teqlîdgerê Ewrûpa bû, ango fikirê milî yê Ewrûpî ji bo xwe bingeh digirt. Beşek ji tevgera sîyasî dînger bû, lê belê zêde xurt nebû. Beşeke komunîst bû, çep bû, heta astekê xurt bû û hevsengî çêdikir. Bizavên sîyasî zehf bûn, weke çawa di roja me ya îro de yekdestgerî li ser siyasetê tine bû.

Vê bandora xwe li ser peşeketinan jî kir. Ji bo vê li Sûriyê detshilatdariyekî wiha karibe, dem dirêj hikum bike, xwe bide runiştandin, li gorî xwe hikum bike, desthilatdariyek wiha derneket. Desthilatdariya wiha bê navber dem dirêj bi rengekî îstîqrarlî li Sûriyê hikum kiribû ya ku ji sala 1957 û heta sala 1961 'ê bû. Di serdema yekîtya wan a bi Misrê re dewam kir. Ew jî pirsgirêkê wî zehf bûn. Ji bo wê jî Sûriyê bi ferzkirinan û alîkariya hinek hêzên derve weke; Ewrûpa, welatên Kendavê, Tirikiye û gelek kesên ku li dijî vê yekîtiyê bûn, her demê hêzên sîyasî milî, milîyetgerî di Sûriyê de dehfandin da ku serxwebûna xwe ji Misrê bigirin. Bibin weke dewletek serbixwe. Bi rastî jî di sala 1961'ê, Sûriyê ji Misrê serbxiwe bû.

Dema ku Sûriye ji Misrê serbixwe bû, di sala 1961'ê de, bi giştî hêzên miliyetger êdî gihaştibûn astekê ku bi bandor bibin. Yek ji van hêzên mîliyetger ê ku bibandor bû, Partiya Baas bû.

**Rola Dewleta Sûriyê Di Pêşketin Û Avabûna Partiya BeasDe**

Partiya Baas di 1947'an de li Şamê bi rêveberiya hinek kesên ku di pişt re navê wan belav bû çêbû. Wek Mîşêl Efreq, bi xwe Xirîstiyan e, ne Misilman e, Selah Beytar, van ew partî damezirandin.

Ev partî ji ku û bi çi awayî pêşket? Ev partî ji du nêrînan ev partî pêşket, yek tevgera milî ya Ereba li Sûriyê hebû, yek jî tevgera Sosyalîst a Ereba hebû, ji wan pêşket. Sosyalîstên em behsa wan dikin ne Komonîst bûn, ne weke çawa em bêjin Marxîst, Lenînist bûn. Lê belê li gorî xwe hinekê Lîberal, li ser bingehê wekheviyê, edaleta civakî, hinekê ev tişt derdixistin pêş. Tevgera milî ya Erebî jî hebû, ve her du tevger di sala 1947' an de li Şamê gihîştin gel hevdu û bi hevdu re bûn yek û partiyek çêkirin, navê wê partiyê kirin partiya Baas a Ereb a Sosyalîst.

Baas çi ye; tevgerekî milî ye, qewmiye erebî ye. Rêveberên Baas bi taybetî jî bi fikirê milî yê Rojava, bi taybetî jî bo fikirê Nazî zêde bandor bûn. Hem Selah Baytar û hem jî Mîşil Efleq li Elmanya xwendibûn û bandora fikrên Nazi ili ser wan heye.

Di heman demê de ev partî, li ser bingehê vejîna hêza desthilatdariya hêza Ereba li herêmê çêbûne. Ji bo wê jî navê wê Baas e. Baas yanî vejîn, ango ji nû ve çêbûn. Vejîna çi, vejîna hikumdariya Ereba di herêmê de. Û bi taybetî jî serdema Emewiyan de, Baas serdema Emewiyan pir diecibîn in. Ji ber çi? Dibêjin; serdema Emewî, serdema ku dewleta Erebî tê de li her derî xurt e. Li her derê hikum dikir û bi îstîqrar hikum dikir.

Ji bo wê carek din serdemekê wiha dixwazin. Baas bi bandor bû. Bi taybetî pişti dema ku Cemal Abdul Nasir hakim bû, Baas nikaribû bi bandora ba. Dema ku yekitiya di navbera Misir û Sûriyê de hilweşiya, Baas firset dît û ew valabûna ku Abdul-Nasir hîştiye, wan xwestin ku dagrin û bi rastî jî li ser desthilatdariyê bi bandor bûn. Jixwe desthilatdariya li Sûriyê, piştî perçebûnê jixwe miliyetger bû. Projên miliyetgeriyê pêşdixistin.

Bo mînak; li dijî Kurdan hinek buyer pêşxistin, di 1961'an de li Amûdê Sînema şewitandin, tê de hemû zarokên Kurdan mirin. Zarokên dibistana seretayî bûn, hemûyan di sînemayê de civandin û bi vî şiklî şewitandin. Dîsa piştî wê bi salekê sala 1962' yan de hêjmar çêkirin, di hêjmarê (sayîm) de bi zanebûn gelek Kurd li derveyê hêjmarê hiştin, bi zanebûn wiha kirin. Ew Kurdên ku li derveyî hêjmarê mane, bi giranî di sala 1957-1958 ' an de leşkeriya Sûriyê kirin. Lê belê pişt re ne hemwelatî hatin hesibandin. Ên Kurd bûn, ên mentîqa Cizîrê bûn. Pişt re bi proje pêşxistin. Projê paralele bi Partiya Cûmhûrî ya Tirkiyê de bi CHP'ê re, Baas jî beramberî Kurdan siyasetek wiha dane meşandin, ew siyaset çi bû, digotin, "Kurd li Iraqê pirsgirêkan derdixin, ji bo wê jî li Sûriyê jî dikarin van pirsgirêkan derbixin. Li ser vî esasî divê em wan dûr bixin, bi taybetî di erdnîgariyê de Kurd xwe bi xwe negihînin hevdu.

Ji ber vê peşeniyar kirin, mînak hinek subay hebûn, yên ku di herêma Kurdan de Subaytî dikirin û gelek beşên din ên milîger proje pêşxistin. Projeyeke çawa bi zorê Kurda ji cihê wan hemûyan rabikin û li Başûrê Sûriyê bi cih bikin. Bi vî awayî xeteriya Kurda ji holê rakirin. Polîtîkayekê (asîmîlasyonê) pişaftinê bi xebatê CHP'ê yê li Tirkiyê, Baas jî li Sûriyê li ser Rojavayê Kurdistanê didan meşandin. Baas û beriya baas milyetgeriya ereban.

Baas li her derê bi bandor bû. Di nava artêşê de bi bandor bû û di sala 1963' yan de mixabin di 8'ê Adarê de Baas bû desthilatdar. Ji bo vê Baasî roja xwe ya desthilatdariyê 8'ê Adarê bi nav dikin.

Ev roj ji bo jinên cîhanê bê şansiyeke mezin e. Roja wan ya cîhanî û roja desthilatdariya Baas di heman rojê de ye. Bi vî şêwazî di 1963'yan de desthilatdarî xistin destê xwe.

Baas partiyekê milî bû. Lê belê ne desthilatdar bû. Di sala 1963'yan de bûn desthilatdar. Dewlet bû ya Baas, artêş û sîyaseta perwerdê û aborî bû ya Baas. Her tiştê saziyên dewletê ji aliyê aborî, perwerdê û leşkerî ve ketin destên wan.

Ji bo vê bi kêfa xwe û li gorî armancên xwe şêwaz dan civakê û civak li gorî xwe eyar kirin. Milyetgeriya Ereb pir derxistin pêş. Durûşmeyên yekîtî, azadî, sosoyalîzm rakirin. Yekitiya Ereban, ango dewletên Ereban hemûyan bikin yek.

Dîsa wek proje şerê li dijî Îsraîl esas girtin. Gotin; divê ku em hemû derfetên dewletê seferber bikin ku em bigîhînin astekê ku em dengeya stratejîk bi Îsraîl re çêbikin ku em bikevin êrişê û wan tesfiye bikin. Heta roja îro jî bi derew û xapandinê dengeya stratejik bi Îsraîl re hemû malên civakê dixwin.

Ji lewre dest pê kir û hêzên muxalif tesfiye kirin. Dostanî bi Sovyetê re kirin û bi vî rengî karibûn tevgera komunîst perçe bikin û tengav bikin, di dawî de jî dîl bigrin.

Tevgera komunîst li Sûriyê tevgerek mezin bû, xurt bû, xwedî dîrok bû. Lê belê dibin hikumê Baas û ev tawîzên ku Sovyetê dan ev tevger hilweşiya.

Tevgerin din ên ku gengaze alternatif bin bermayê Nasiriya yanî ên girêdayi Cemal Abdul Nasir ew lewaz bûn, biçûk bûn tevgera îsalamî tengav bû. Ji bo wê porjeya milî, heta cih bi cihan de şoven, di hinek kireyarên xwe de faşist ew di Sûriyê de hakim bûn.

Heta sala 1970'iyî Baas xwe bi rengekî pergalekî yek alî, navendî yek partî xwe li Sûriyê ferz kir. Di hundirê Baas de gav bi gav bizavên ku wer hinek demokrat, li gorî xwe kesîmên ku hinek bawriya wan bi sosyalîzmê tê, ew gav bi gav lewaz bûn, zeîfbûn, tengav bûn û heta ku hêdî hêdî hatin avêtin. Bi taybetî jî di sala 1970'iyî de derbek di hundirê Baas de çêbû.

Ne ji derveyî Partiya Beasbû, di hundirê wî de derbe çêbû. Kê ev derbe çê kir? Hafiz Esed ev derbe çêkir. Hafiz Esed di sala 1970'iyî de; hem di nava rêveberiyê de bû, wezîrê parastinê bû, hem jî serokê artêşê bû. Bi derbekî bê şer ji ber ku di nav artêşê de bihêz bibûn, bi taybetî jî subayên Elewiyan gelekî bi bandor bûn. Ji ber ku Elewî weke komekî dînî di Sûriyê de di demên kevn de rewşa wan xirab bû. Ji bo vê riya xilasiyê tenê di nava artêşê de, di nav îstîxbaratê de didîtin û gav bi gav, di nava artêşê de tebeqeya jorîn û bitaybetî ya subay, general û sûbayên mezin, bi giranî jî bûn Elewî. Bi rengekî planlî bi salan berê ciwanên xwe ber bi artêşê ve kirin. Lê belê piştî salan ew ciwanan di artêşê de gihîştin payeyên bilind.

Ji bo wê alîkariya subayên Elewî ya artêşê derbeyekê bê ku şer çêbibe, bi însîyatîfa xwe dest danîn ser hikum. Di civînekê Baas de zext li ser civînê kirin û civîn bi dest xistin. Hem sekretere giştî, ê Baas û hem serokê cumhûriya Sûriyê û hem jî fermadariya giştî ya artêşê, van peywir hemû kirin destê xwe. Ev pêvajo hîna zêdetir navendîbûna destilatdariyê di Sûriyê de çêkir. Jixwe rewşa awarte berdewam dikir, rewşa awarte ji dema Baas de dest pê kiriye, lê belê di dema Hafiz Esed de hîn zêdetir bi dijwarî dewam kir.

Serokê Cumhûriyê yê berê navê wî Nûredîn Etasî bû, ew avêtin zindanê. Sekretere giştî yê partiya Baas navê wî Selah Cedîd bû, bi eslê xwe Elewî bû, lê belê tam bi Hafiz Esed re ne yek bû, ew jî avêtin zindanê. Ev her du kes di zindanê de mirin. Her yek ji wan bîst sal-sî di zindanê de man, heta ku mirin. Hîna bêtir ev sîyaseta milî di Sûriyê de hakim bû.

Pêvajoya Hafiz Esed gelekî dirêj kir, heta salên 2000'iyî dirêj kir. Ev rewşên awarte ne. Di hundirê vê serdemê de Hafiz Esed çi kir? Di vê serdemê de tenê carekî şer bi Îsraîl re di sala 1973'yan de kir. Bi alîkariya Misrê di enîyan Sûriyê re li hemberî Îsaraîl şer kirin. Êrîşê Îsraîl kirin, şer dest pê kirin. Di wî şerê de di bingeh de tiştek nehat guhertin. Cihên stratejîk ên erda Sûriyên ên dibin destê Îsraîl de nezivirîn. Lê belê di lihevhatinê de Îsraîl ji bajarekê Sûriyê derket. Bajarek navê wî Qinetra ye, Îsraîl ev bajar hemû xirab kir û wiha derketin. Ji wê şûn ve tu guhertinek cidî çênebû. Lê belê bi wî şerî heta roja me ya îro ev pergal li ser lingaye. Lehengê şer e, serkeftin çêkiriye, cara yekemîne înîsîyatîf di deste Ereba de bûye hwd. Heta roja me ya îro bi wî şerî ev pergal dixwaze rewabûnê qezenc bike.

Dîsa li gorî xwe li dijî Îsraîl xwedî helwest bû, Misir bi Îsraîl re lihevhat, ew pê re li hev nehatin. Di Lubnanê de rol dilîst. Bi vî şiklî xwe xistin nav çi, gotin em hêzê nepejirandinê ne. Ne pejirandina çi, nepejirandina xwezayî kirina têkiliyên bi Îsraîl re. Ango em hêzên berxwedanê ne, me xwe dîlnexistiye, rewşa awarte jî bi vî rave dikin. Dema ku tê gotin çima rewşa warte heye, dibêjin; rewşa awarte ne ji bo me ye, ji bo gel e ev rewşa awarte heye. Rewşa awarte Xwedê giravî em bi Îsraîl re di nav şerekê de ne. Ji bo vê em neçarin ku di rewşekê awarte de bin ku dijmin nikaribe, zirarê bide eniya me ya hundirîn. Lê belê di bingehê de jixwe rewşa awarte bi temamî li hemberî gel e.

Serdema Hafiz Esed û rewabûna şerê di sala 1973' yan qezenc kir, bû sersebebê ku hê rehetir, weke çawa ku Cemal Ebdul Nasir rojekê ji rojan li Misrê kir. Ew jî di Sûriyê de wek silindir, li dijî hemû partiyên muxalefetê bû. Muxalifên ku li dijî wî derketin, ya surgûn bûn, yan reviyan, yan jî hatin kuştin. Ên din jî hemû teslîm bûn. Partiya komunîst a bi emrê dirêj, partiyên Nasirî yên girêdayî Cemal Ebdul Nasir û hinek partiyên din ên lîberal li şûna ku weke partî bi sîyaseta xwe û bi prensîbên xwe kar bikin, li şûna wê jî prensîbê xwe zêdetir hemû bûn borezanê ku porpaganda Baas û Hafiz Esed bikin.

Pergala sîyasî li Sûriyê ji holê rabû, li şûna wê pergaleke yek deng û ferdî derket ser desthilatdariyê. Bo mînak; zagonên bingehîn ya Sûriyê heye, li gorî zagona bingehîn ya Sûriyê, rewşa awarte hatiye çêkirin. Tevî wê rewşa awarte jî çi kirin, ji bo ku dem dirêj hikum bikin, zagonekê wiha çêkirin gotin; pergala me pergala Serok Cumhûriye, ne a hikumetê ye. Pergala Serokatiyê ye. Gotin; her serok komarekî Sûriyê dikare heft salan hikum bike û ji bo sê caran bê hilbijartin. Yanî her carekê heft salan û ji bo sê caran jî bê hilbijartin.

Hafiz Esed di sala 1970'iyî de bû serok, heft sala derBeasbû, sal bû 1977, dîsa bû serok, jixwe di Sûriyê de hilbijartinên serokatiyê tine ye. Referandum heye, erê yan na. Jixwe ji % ,99 dikevinê ev e. Yek ew jî dewlet bi zanebûn dibêje; ku demokrasî heye va yekî gotiye na! Wî jî diavêjin nav û bi wî şeklî didin pejirandin.

Sal bû 1984, dîsa bû serok, 1991 xilas bû, lê Hafiz Esed hê sax e. Got; "bi rastî min dixwest ku ez dev ji vî karî berdim, lê ez naxwazim zagona bingehîn bidim zoriyê. Zagona me ya bingehîn sê caran firsetekê dide mirovekê ku bibe serok. Lê belê gel gotiye, bibe nebe tu yê heta saxbî serokê me bî. Ez jî nikarim gotina gelê

xwe vala derbixim, ji bo wê jî ez ê heta ku hebim ez ê serok bim. Bi vî şiklî heta ku mir serok bû.

Dema ku mir hê tam ji bo cihê xwe kurê xwe amade nekiribû, bîr nedibir ku wer zû bimire. Kurê xwe tam amade nekiribû. Kurekî xwe yê din amade dikir, ew bi qezayekê mir, bi emir jî têrê dikir, mezin bû. Hinekê jî pijyabû, li ser sîyasetê hatibû perwerde kirin. Dema ku ew kurê wî yê din mir, yê ku namzet bû ji bo ku piştî wî bibe serokê komarê, Beşar Esed dixwend ti girêdana wî zêde bi sîyasetê re nebû û Sûriyê banê wî kir û ew xistin nav artêşê ji bo ku bibe subayekî mezin û bi vî rengî ew amade kirin.

Lê belê dema ku Hafiz Esed mir, dîsa jî valatiyek çêbû, ew zagona bingehîn çi dibêje? Li gorî zagona bingehîn ya Sûriyê serok komar divê ku temenê wî çil salî be. Wê demê temenê vî sî û çar salî bû. Parlemento rûnişt, di hundirê çend deqeyan de, zagonek nû derxistin û gotin; serokê Sûriyê dikare sî û çar salî be jî. Bi vî şiklî ew kirin serok û heta roja me ya îro jî wiha dewam dike.

Ango rengê siyasî, jiyana siyasî, di hundirê Sûriyê de nehîştin. Bi temamî xirab kirin (yozlaştırma), bo mînak; partiya komunîst e, cûda ye, Baas nîne, rabûrdiyekê wê heye di sala 1924’ an de hatiye damezrandin, lê belê bê şerm û fedî serokê partiya komunîst bîst û çar seatan radibûn, propaganda Baas dikirin. Propaganda Hafiz Esed dikirin. Partiyên din bi vî şeklî bûn. Weke rizandina muxalefetê bû.

Civakê bi temamî dibin kontrolê de hiştin. Kontrol çawa kirin; ên gotin; em demokratin, demokrasî çi ye? Gotin demokrasî organizasyonên gelî ne. Organîzasyona gel çi ne? Organîzekirin karkera, cotkaran, xwendevanan, jinan a hemû beşên civakê dixe nava xwe û yekser organîzekirina wan hebin û bi vî şeklî demokrasi çêdibe, her kes nûnertiya xwe dike. Baas ev organizasyon hemû çêkirin. Hemû xistin bin kontrola xwe. Hêzên civakê yên bi rêxistinkirî bi temamî yên girêdayî xwe, dibin kontrola xwe de çêkirin. Ên ku li hemberî Baas derketana, jixwe nikaribûn di nav wan organîzasyonan de cih bigirtana.

Ne bi tenê ew, hinek faklute hebûn li Sûriyê, ên ku ne Baasî ban nikaribûn bixwendana. Bo mînak; fakulteya çapaemeniyê yê ku ne Baasî bûna qedexe bû ku vê fakulte bixwendana. Dîsa Zankoya Zanista Sîyasî, ne fakulteye, lê ji fakultê bi qedirtir e, sê sal e, lê ger kesek ne Baasî ba nikaribû bixwendana. Di van salên dawî çawan e ez nizanim, lê di dema me de wiha bû.

Di hevpeymana eniya hundirîn de- tabî ew eniyekê formalite bû, dîsa Baas hakim bû, di hevpeymana wê de ev hebû:

1-Artêş ji ber ku hêza parastina gel û netew e, ji bo vê qedexeye, ji derveyê partiya Baas tu partî tê de kar bikin.

2-Xwendevan ji ber ku pêşroja civakê ne, ji bo vê qedexeye ti partiyên din derveyî partiya Baas de kar bikin.

Ev partiyên hem hemû ku qaşo bi wan re ketibûn nav eniyekê de jî ev şert qebûl kiribûn. Tiştên ku bi van saziyên formalîte, şiklî têrê nedikirin ku civakê kontrol bikin, vê carê jî bi rengekî din, rasterast bi hêza polîs û îstîxbaratê kontrol dikirin. Ji

bo vê ji sala 1973' yan û şûn ve, her ku çû di esas de hemû hêza sereke Elewî bûn jî, ji wê serdemê û şûnda li hemû bajarên Sûriyê ên biçûk mezin, bîrimên îstixbaratê pêş xistin û saziyên îstixbaratê ji hev cuda cuda çêdikirin, lê ji bo heman karî çêkirin.

Mînak li Sûriyê çend saziyên îstixbaratê hene, polîs jixwe heye, Baas hemû endamên wê îstixbartgerin. Rapor didin, agahiyan didin. Weke din îstîxbaratên sîyasî hene, ewlekariya dewletê ew jî navê wê emin dewlê jê re dibêjin, îstîxbaratê leşkerî emin cewî jê re dibêjin; li erdê ne, ne li hewayê ne. Ê cînayetan reng bi reng hene. Di her bajarekê biçûk de çend ekîbên îstîxbaratê bi cih bûne û bi vî rengî her demê lêpirsîn, lêdan, dizî, talan, şantac, di ser gel de didin meşandin. Bi taybetî jî di mentîqê Kurdan de ev hê bêhtir bi rengekî balkêş û bêsînor didin meşandin.

Li ser Kurdan siyasta înkarê dewam kir, lê belê bi çi awayî dewam kir? Yek ew projeya berê Baas a ku pêşkêş kiribûn, ji bo Kurdan bi zorê ji mentîqê wan rabikin wan bibin Başûrê Sûriyê bi cih bikin. Ew ji rojevê derxistin, lê belê li şûna wê çi kirin, bi hinek bihaneyên dîtir, ev proje pêkanîn. Çi bû yek ji wan sedeman? Bi alikariya Sovyetê li ser ava Fratê bendav çêkirin. Bendavê li dora xwe  av kom kir û gelek gundên Ereban ên li wê çolê di bin avê de man. Ew gundana hemû anîn, dibin navê Sûriye ye, erd û gundê wan dibin avê de mane, em wan dibin cihekî dîtir, cih diguherin. Lê bele cih li ku derê bû, navê wê kirin Xeta Dehan. Li ser firehiyê deh kîlometreya, ji Serêkaniyê heta bi Cizîra Botan. Ji cihê Serkaniyê (Ceylanpinar) destpê dike, ango ji sînorê Tirkiyê re, heta bi Silopiyayê bi Cizîrê bi dawî dibe.

Seranserê herêma Kurdan deh kilometre firehbû, hemû erdên ku heyî yê zîraî yê pir biberhem, ew erdê he hemû dagirkirin, ji gundiyan re negotin derkevin? Lê belê erdê wan ji wan stendin. Bihûstek erd ji bo kes nehîştin. Li şûna wan gundê Ereban ava kirin. Di wê xeta sînor de Kemera Erebî ava kirin, Kemera Erebî ev e. Kemera Erebî li ser deh kilometre bêhtir, seranserê sînorê bi Bakûr re di herêma Cizîrê de Gundê Kurdan ranekirin, lê belê erdê wan ji wan stendin û di wan erdan de gundê Ereban avakirin. Gundê Ereban çawa avakirin, xanî avakirin, dibistan avakirin, av anîn, elektirîk anînê.

Vê carê Ereb ji çolê anîbûn wir, halê wan nexweşbû, tiştek nizanîbûn, di xaniyan de wer nizanîbûn bijiyana, ava paqij nedîtibûn, tiştên wiha bûn. Ew anîn li wir û ew Erdên zîraî yê bi berhem dan wan, di demekê kurt de dewlemend bûn. Piştî demek derBeasbû, vê carê jî bela xwe li Kurda dan.

Ji lewre beramberî wê Kurdan hinek reaksiyon nişandan, reayksiyon çi bûn? Danezan belav kirin. Ji bo wan danezanan hinek kes hatin girtin, yazdeh salan di zindanê de man. Ji bo ku danezan belav kirine. Ji derveyê wê Kurdan çi kirin, boykot kirin. Ew erdê ku dewletê dagirkiribû, neçûn lê nexebitîn, ên ku li bixebitiyana weke kesên nebaş didîtin.

Bi hinek protestoyên tişt îfade kirin, lê belê nikaribûn, asteng bikrana. Jixwe tiştê ku bû, derBeasbû û heta roja me ya îro jî dewam kir.

Tabî ev pêvajo dema ku pêkanîn, Kurd neçarbûn ku bar bikin. Ji bo vê em lê dinêrin ku di salên 1975' an û şûn ve em lê temaşe dikin ku bi taybetî ji Cizîrê, li derûdora Şamê, Helebê û li hemû bajarên dîtir, hêjmarek mezin ji Kurdan kom dibin. Dibin şertê dijwariya aborî û zexta sîyasî gav bi gav Kurdan ji welat bar kirin û berê xwe dane wan bajarê Ereban.

Ev rêbazek bû, ji derveyê wê meseleya qedexekirinê hebû. Her tim girtin, eşkence, teror ev tiştên wiha hebûn. Lê bele di salê 1980'iyî de guhertinek çêbû. Di salên 1980'iyî de hinek rewş hatin guhertin, wek prensîb tu guhertine çênebû. Yanî Kurd nehatin pejirandin, nehatin nasîn, wek milet nayên dîtin. Ev encax di sala 2004' an piştî serhildanê, hinek rayedarên deweletê behsa Kurdan kirin. Wek Milet nayên dîtin.

Lê belê çi hebû, pergala sîyasî detshilatdar di Sûriyê de û pergala milî ya Erebî li derveyî Sûriyê, navbera wan de nakokî çêbûn. Ji ber her tim kompleks heye. Ev rast in, yan dij emperyalîst, dij Sîyonîst nizanim çi, çawa dibêjin; lê belê di esas de meselek mezhebî heye. Di encamê de Elewî ne, ên ku li Sûriyê de hikum dikin. Ji bo vê hem Suniyên di hundirê Sûriyê de ên Ereb, ên Ereb ên ku zêde sempatiya wan bi Îraqê re hebû, li dijî desthilatiyê weke potansiyel muxalefet bûn, ji sala 1980 'iyî û şûn ve bûn muxalefetgerên çalak.

Bi İxwan Mislimîn re bûn muxalefetên çalak û şerê çekdarî kirin. Tabî Sûriyê ev xeterî jê re ji ku tê, ji Îraqê, Tirkiyê û ji Îsraîl tê. Ji lewre Iraqê û Tirkiyê pirsgirêka Kurd di wir de pir yaygine. Hem di Îraqê de şer heye, hem li Tirikiyê de şer heye. Ji bo vê Sûriyê dît ku pêdiviya wê bi destek kirin û danûstandina bi tevgera Kurd hem li Iraqê û hem li Tirkiyê pêwîstî heye. Ji bo ku karibe van êrîşan li ser xwe bide rawestandin.

Da ku ev pêwendî, ev têkilî hinekî bibawer bin, girîng bû ku ew zexta ku li ser Kurdan dihet kirin, heta wê demê, heta astekê bihatana kêmkirin. Çawa kêm bikin bo mînak; Kurd derbikevin cejina Newrozê pîrozbahiyan bikin. Wek berê ji bo ku yek bi Kurdî xeber dide, li radyoyê guhdar bike, qasetekê pê re ye neyê girtin. Ji bo vê yekê û bilindbûna asta tevgera Kurd li perçeyên din Kurdistanê bandorek li ser rewşa Kurdan a li wir jî hate kirin.

Ew nermahî yanî dema ku em dibêjin nermahî; ew sekinandina îşkenceya kêyfî, ew bû sersebebê ku bi qismî derfetê rêxistin kirinek hundirîn çêbibe, bi tevgera PKK'ê re moral jî hate girtin, hêvî çêbûn, ew rewşa şikestinê, bêhêvîbûnê, perçebûnê, belavbûnê, dev jixwe berdanê ji hole rabû. Li şûna wê hîn bêhtir moral, hîn bêhtir wer hêvî peyda bûn û her çiqas bi rengekî aloz be jî, heta roja me ya îro ev rewş dewam dike.

Sûriyê pirsgirêkên cidî dijî, beramberî pirsgirêkên cidî rû bi rû ye. Hêzekî mûxalefetê bi rêxistinî bi giştî di Sûriyê de tine ye, lewaz e. Hatiye tûnekirin, lê belê civak li hemberî pergalê pir neraziye. Ji ber ku civak birçiye, dibin zextê de ye, bi her awayî nezan hatiye hiştin, yanî di bingeh de di zindanê de ye. Ji bo vê Sûriyê di encamê de bi pirsgirêk e.

Di bingeh de Sûriyê yek ji rejîmê di çerçoveya ji nû ve dîzayinkirina Rojhilata Navîn yek ji rejimên ku namzet e ji mudaxeleya leşkerî re. Ji ber ku Boş Sûriyê di eksena şer de nirxand. Yanî namzet bû ji mudaxeleya leşkeri re. Lê belê rewşa ku di Îraqê de derket, ev mudaxele da rawestandin, ji ber çi da rawestandin, Emerîka ev dît, dewletek dema tê hilweşandin, ew dewlet gelek kadro tê de hene. Ew kadroyana bi rengekî profesyonel dikarin li dijî Emerîka şer bikin. Bo mînak; Sûriyê artêşa wê zêde zêde heye. Nifûsa wê 18 milyone, lê belê artêşa wê nêzîkî 1 milyonekiyê ye. Tê de gelek komên îstîxbaratê hene, hemû perwerde kirîne. Wiha ji rêzê nînin, hemû perwerde kirîne, li Îtalya perwerde dîtine, li Fransa dîtine, dema berê li Sovyetê dîtine. Profesyonelin.

Dema ku ev dewlet hilweşe, çend kes wê ji van kesana wê li gel Emerîka cih bigrin. Lê belê ên din wê hemû li dijî bin. Ew dijberî di mînaka Efxanistan û Îraqê de eşkere bû ku nayê kontrol kirin. Bo mînak; çima çalakî li Îraqê çêdibin, li Efxanistanê çêdibin? Ji ber ev berê dewlet bûn. Zanin çawa şer bikin, çawa çalakiyan bikin, çawa îstîxbaratê kom bikin, çawa gel birêve bibin. Van tiştan hemûyan dizanin. Ev giraniyê çêdikin.

Ji bo vê mudaxela leşkerî pir bi mesref e. Li ser Sûriyê ev nebû. Lê belê di ablûkay de ye, dibin zextê de ye, ji bo vê şoreşekî weke çawa Misir, Tuns derkeve di Sûriyê de îhtîmala kontrol kirina wê pir zor e. Ji ber ku Sûriyê welatekî namzet e ji şerê mezhebî re. Welatekê namzete ji şerê etnîkî re jî. Mesela Kurd û Ereb, mesela Erebên Sunî û gelek meseleyên din jî hene. Li Sûriyê milyonek Îsmaîlî hene, tevgera Batinî, navê wê Îsmaîlî ye. Li Sûriyê Asûrî, Ermenî, Çeçen, Çerkez, Tirikmen, Xirîstiyan, Misilman hene, Elewî, Sunî, Durzî Kurd hene, ji bo vê ev hemû bi darê zorê, bi hêza artêşê û îstîxbaratê di zept û reptê de hatine hîştin.

Niha eger ku valatiyek di desthilatdariyê li wir çêbibe wê rewş çawa bibe, gengaze ku rê li pêşiya anarşîzmekê mezin vebibe. Ji bo vê hêzên navnetewî û hêzên hundirîn jî heta ji wan tê dixwazin li Sûriyê guhertinek bi kontrol çêbikin. Gav bi gav çêbikin, wê karibin? Ji lewre hinek tişt hene li gorî planan neyê îyar kirin. Bo mînak; bûyerek biçûk derbikeve, tu mêze dikî bandorê li ser damarê gelan ên hesas dike, ev dikare rê li pêşiya şerek mezhebî, şoreşekê, komkujiyekê, renga reng boyeran vebike. Ji bo vê di serdemên wiha awerte de her tişt nikare bi planl bimeşe. Lê belê di aliyê kontrolê de pirsgirêkek cidî ye.

Rewşa Sûriyê bi vî şeklî ye, lê belê cihek stratejik e. Her kes dixwaze di wir de serwer be. Niha eşkere ye, pergala Sûriyê wek berê nema dikare dewam bike. Ne bitenê Sûriye, li Rojhilata

Navîn êdî tiştek weke berê nema dikare berdewam bike. Her tişt tê guhertin, lê belê ev guhertin, wê berê wê bi ku de be, wê li aliyê kê de be, ber bi ku ve biçe, hîna jî ew hêza bi rêxistinkirî ya gelan wê diyar bike.

**Girîngî û Dîroka Iraqê**

Niha yek ji hêzên wiha bi bandor in, gelekî di rojevê de mane, yek jê jî Îraq e. Îraq welatekî wer zêde xwazayî nîne. Di aliyê erdnîgarî de, di aliyê dîrokî de, di aliyê derfetên madî de, xwezayî nîne, hem di aliyê derfetên xwe yên madî de, erdnîgarî stratejîk e di Kendavê de, bi taybetî dîroka xwe ya balkêş. Ji bo vê her demê wer welatekî xwezayî nebûye. Weke çawa mirov dikare bêje ku bi hezarê salan rêvebirî ji hemû cîhanê re kiriye. Navenda dewletan bûye, ya şaristaniyan bûye, demdirêj weke çawa navendekek cîhanî bûye.

Nivîsîn, dîn, dewlet, huqûq, sazî, îlm hwd, gelek tişt di seretayiyê de li wir derketiye. Îraq, di encama bi awayekî temamî piştî sala 1923'an bi taybetî jî piştî 1926'an, îtîfaqa di navbera Îngilîz û Tirkan de çêbû, weke du dewletan, Îraq bi rengekî fermî ji Îngilîzan re hate hiştin, bû malê Îngilîzan. Îngilîz di Îraqê de çi kir? Ji lewre Îraq ji bo Îngilîzan gelek pêwîst bû. Ya yekê, pterol tê de zehf bû.

Xala duyemîn jî ji bo bandora Îngilîzan li ser Kendavê, ji lewre Îraq pêwîst bû. Ji ber ku heger Îraq di bin kontrolê de nebe, Îraq weke welatekî ji fikrên cuda cud re, ji hêzên curbecur re vekirî bimîne, wê demê wê berjewendiyên Îngilîzan di Kendavê de, yanî di yataxê betrolê yê her mezin di cîhanê de, di wir de dikevin xeteriyê.

Ji bo vê Îraq bi taybet li ser disekinî, heta Îraq qîraliyeta Îraqê Îngilîzan bi xwe teyîn kir. Zêde têkiliya wan bi xelkên Îraqê re tine ne, ne Îraqî ne. Ev Haşimî ne, ji malbata Şah Husên in, yên ku di şerê cîhanê yê yekemîn, di sala 1914'an de, bi Îngilîzan re alîkarbûn, Îngilîzan jî weke odol, ango ji bo hevkarên wan bûn, hikmê wan li ser Îraqê dane rûnişkandin.

Dawîbûna şerê cîhanê yê duyemîn ê di sala 1918'an de Îraq bû mêtingeha Îngilîzan. Artêşa Îngilîzan kete Îraqê. Qiraliyet teyîn kir, bi qiral desthilatiya xwe ya di Îraqê de da meşandin.

Dîsa, Îngilîzan li Îraqê jî, pişt re jî Emerîka bi awayekî stranetjîk li Îraqê temaş e kirin. Ji bo vê Îraq her demê li Rojhilata Navîn kirin cihekî ji parkên leşkerî re pê çêbike. Mînak bi taybetî di sala 1945'an piştî şerê cîhanê duyemîn û şûnda, destpêkirina şerê sar, Emerîka xwest hemû cîhanê têxe bin kontrola xwe. Dixwest vê di rêka rêxistinên ekonomî û leşkerî re vê bike. Ji bo vê îtîfaqa NATO, îtîfaqa SNTO, îtîfaqa Bexdad, di navbera Pakistan, Îraq, Tirkiyê, Îran, xwest wan weke hêzekî leşkerî bike yek.

Li Rojhilatê Asya SYTO hebû, ango li cihên curbecur ên cîhanê, ji bo ku desthilatiya xwe bihêz bike, astengiya li pêşberî

belavbûna Sovyet û komunizmê deyîne, parkên leşkerî çêdikirin. Îtîfaqên leşkerî çêdikirin di nava hevalbendên xwe de çêdikir. Îraq yek ji van hêzan bû. Weke çawa Tirkiyê di NATO de bi vî rengî bi xwe ve girêdan, bi rêka parêkên NATO bi xwe ve girêdan, di rêka îtîfaqa Bexdayê de xwest Îraqê jî bi vî rengî bi xwe ve bide girêdan.

## Dijiberiya Miliyetgeriya Ereban Li Dij Tevgerên Kurdî

Miliyetgeriya Ereb di Îraqê de pêş diket. Lê belê heta demekî dirêj, nakokiyek wer cidî û kûr di navbera miliyetgeriya Ereb û Îngilîzan de derneket. Çima; ji ber ku Îngilîzan, di aliyê siyasî de Ereb qebûl dikirin. Otorîta wan qebûl dikirin, di encamê de ew kirin dewlet. Lê belê Îngilîz beramberî Kurdan her demê neyînî bûn. Timî bi rengekî xerabî lê temaşe dikir. Ji ber çi, ji ber ku îtîfaqeke Îngilîzan û Tirkan hebû, hevpar li dijî Kurdan kar bikin, êdî Îngilîz mafê Kurdan neyîne ziman. Pereler bi Tirkan re hemû hewildanên Kurdan ji bo azadiyê bitepisîne. Ev yek bû.

Ya duyemîn jî Îngilîzan tevgera milî ya Erebî li dijî tevgera milî Kurdî pêş xistin. Ji ber çi, ji ber berjewandiyên Îngilîzan di cîhana Erebî de zêde bûn. Ji bo vê Îngilîz ji ber berjewendiyên xwe neamade bûn ku ti tiştê xwe bikin qurbana mesela Kurdan.

Ji bo vê her demê destê Ereban li dijî Kurdan bû. Li ser vî esasî jî hewildanên Kurdan ji bo avakirina dewletekî netewî di Iraq de bi lêdana Îngilîzan ve rû bi rû ma, bi taybetî jî tevgera Şêx Mehmûdê Berzencî mînaka vê ye.

Du caran Mehmûdê Berzencî li dijî Îngilîzan şer kiriye. Ew serhildan bi balafirên Îngilîzan hatiye tesfiye kirin. Şêx Mehmûdê Berzencî jî hatiye surgun kirin. Ev di navbera salên 1920-1930'î de pêş ketiye.

Dîsa tevgera Berzaniya jî ya ku birayê Mela Mustefa Berzanî dest pê kiribû, tevgera Berzaniya jî bi rengekî xerab ji aliyê Îngilîzan ve hatiye nerîn, şer li dijî wan kirine, heta di sala 1940'î de Berzanî neçar mane ku birevin Îranê. Di serdema cumhuriyeta Muhabatê haziriyên cumhuriyeta Muhabadê li wir jî bi cih bûne.

Wê demê Îngilîz li dijî Kurdan xwedî helwestekî neyînî bû. Îngilîz dema ku weke artêş ji Îraqê derketin jî û Îraq teslîmî hikumetê kirin, teslîmî hikumeta qiraliyetê kirin, artêşa xwe ji Îraqê derxistin jî di derbarê statuya Kurdan de tiştek nîşan nedan. Kurd bê statu hiştin. Behsa mafê wan nekirrin. Ji bo vê pirsgirêka Kurd her demê li wir weke pirsgirêkekî cidî xwe da nîşandan.

## Bandora Partiya BeasLi Ser Îraq Û Sûriyê

Îraq di sala 1958'an de, di meha Temuzê de, bi derbeyekî re ket rojevê. Derbeyek leşkerî bû, subayan kir. Ev subayî kî bû, Ebdul Kerîm Qasim bû û du kesên din jî bûn. Subayî hevalên wan hebû, lê belê yên ku bi pêşengetî dikirin, yan jî pişt re xwe bi navê konseya şoreşê binav kirin. Yek ji wan Ebdul Kerîm Qasim bû,

subayek Dunî û Ereb bû. Yek jê Kurd bû navê wî Ebdul Rezaq Mecîd bû. Yek jî şîayî bû, xwe weke konseyekî şoreşê birêxistin kiribûn.

Derba leşkerî li Îraqê di sala 1958'an de çêbû. Heta qiraliyet hilweşandin, serokwezîrê qiraliyetê kesekî bi nav û deng bû, bi paşverûtiya xwe, hevalbendiya xwe ya bi Rojava re, bi sîxûrtiya xwe ya ji Îngilîzan re dihat naskirin. Pir serwer bû, rast e qiraliyet hebû, lê di esas de yê serwer yekî bi navê Nûrî Seayd bû. Nûrî Seayd hem dijmintiya Kurdan kir ye, hem dijminatiya hemû kesên pêşketî di herêmê de kiriye. Bi temamî sîxûrekî Îngilîzan bû.

Rêvberiyek pir xerab bû, ji rê derketin, xerabî tê de hebû. Ji bo vê navê wî bi rengekî xerab her demê derBeasdibe, heta Kurd jî bi rengekî xerab wî bi nav dikin. Bermayî wî de li Qadîşê cihek heye tam ne Qadîş e, lê cihekî nêzîkî wir e, Enîşke. Li wir qeserek mezin heye, ne ya Sedam, qesra Nûrî Seayd jî heye, ya ku ji wê demê de maye. Jixwe dibêjin ku Sedam hatiye ew der dîtiye, gotiye; Ev ya kê ye, jê re gotine, ev cihê Nûrî Seayd e, li ser Garê temaşe kiriye gotiye; bila ya min jî yek li ser Garê çêkin. Jixwe li serê Garê çêdikirin, beriya ku xelas bikin, hilweşiya.

Ebdul Kerîm Qasim bi derbakê qiraliyet avêt û li şûna wê cumhuriyet îlan kir. Jixwe di wê demê de Basî jî êdî di Îraqê de kar dikin. Basiyên Sûriyê, qismekî wan êdî di Îraqê de kar dikirin, hêzekî mezin çêkiribûn. Ji ber Basî xwe weke yên dewleteke nabînin. Ango dibêjin em partiya hemû Ereban e. Ji bo vê li her derê li hemû welatên Ereban, xwestin partiya Bes ava bikin. Lê belê zêde nehate qebûl kirin. Li cih cihna de hinek rewşenbîr, miliyetger di welatên cuda cuda de hinek tevger kirin ji bo ku di nava xwe de partiya Beasçêbikin, lê belê zêde serkeftî nebû. Ji ber ku bandora Sûriyê hebû, di Lubnanê de Basiyan hinekî kar kirin, lê bi giranî Beasli Sûriyê û li Îraqê bibandor bûn.

Li Sûriyê bûbû desthilatîdar, li Îraqê jî bi bandor bû. Heta parazvanê partiya BeasMîşêl Efleq piştî ku li Sûriyê Beasçêkir, lê nakokiyên hundirîn çêbûn, nema karîbû li Sûriyê bimaya, reviya û çû Îraqê. Li Îraqê vêcarê Beasbi rêxistin kir. Li Îraqê mir jî, eslê wî bi xwe ji Sûriyê bû.

Tevgera Ebdul Kerîm Qasim, tevgerekî radîkal, hinek taybetmendiyên şoreşê tê de hene. Li dijî qiraliyetê dijwar e, tesfiye kir jî. Li ser esasê ava kirina Îraqa nû, ya serbixwe tevgeriya. Ji bo vê têkiliya bi Îsraîl re qut kirin. Ji ber ku di zemanê qiraliyetê de têkiliya wan bi Îsraîl re hebûn, ptrola Îraqî qismek jî û xetên petrolê heta bi Îsraîl hebûn, heta bi Heyfa hebûn. Ew xet qut kirin. Dixwest dest deyîne ser ptrolê. Gelek reformên din jî kirin, yên nû kirinê, şêwazê birjiwaziya biçûk çîna navîn, xwendevan, leşker, li dijî mûnarşiyê, feoldalîzmê li dijî van tiştana girişim çêbûn. Di heman salê de di mesela Kurdî de jî xwest gavekî biavêje. Ji bo vê deawet kir, Berzanî wê demê li Sovyetê li surgunê bû. Ew deawet kirin ku vegere di mesela Kurdî bê munaqeşe kirin û bê çareser kirin.

Di vê demê de mesela Kurdî çareser nebû. Ferzgeriya miliyetgeriya Ereb, ferzdariya miliyetgeriya Kurd, bûn serserbebê ku çareserî na, nakokî bi hêz bibin, mijûl kirin, bêbawerî, ji ber çi? Di esas de niyetek wiha durust ji aliyê miliyetgeriya Ereb ku çareseriyekî demokratîk ji bo mesela Kurdî bîne tine bû. Di kesayeta Ebdul Kerîm Qasim de, dibe ku hebe, di kesayetên hinekên din de jî dibe ku hebe, lê belê taybetmendiyên miştuxul kirinê bêtir li pêş bû, ev yek e.

Di tevgera Kurdî de nêzîkbûnên xweseriyê li pêş bûn. Xweserî ji bo çi bo? Xweserî di rastiyê de ji bo ku ew têgînên siyasî bê alternatîf karibe di Kurdistanê de serwer be. Yanî têgihîştina hikumeta navendî ya Bexdê, yê lîberal yên ku li gorî xwe radîkal heta astekî modern, li ser esasê belavkirina erdan, tine kirina feodalîzmê, ev ji aliyê rayadarên Kurd ve bi taybetî jî tevgera Berzanî, nedihat qebûl kirin.

Ji bo vê di asta têgînê de jî pirsgirêk e. Ev bo sersebebê ku şer çêbibe. Şer di sala 1961'ê de dest pê kir. Di vê salê de şer di navbera Kurdan û hikumeta navendî de dest pê kir. Ev şer car bi caran hinek agirbest, yan jî danûstandinên wiha çêdibûn, lê bi giştî bê navber di sala 1961'ê de heta sala 1970'î berdewam kir.

Di vê navberê de li Îraqê çi bû? Di vê navberê de di Îraqê de hikumeta Ebdul Kerîm Qasim, di bin tehdîdê de bû. Ebdul Kerîm Qasim bi xwe di bin tehdîdê de bû. Heta carekê li ser reşkujî jî çêdibe. Komboyî lê didin, yê ku reşkujiyê dike jî, Sedam Husên bû.Wê demê Sedam Husên wê demê ciwanekî 23'ê salî bû. Hewildan kir ku Ebdul Kerîm Qasim bikuje, wê demê Sedam Besî bû. Bes êdî di Îraqê de rêxistina wan çêbibû, lê dan bi birîndarî Ebdul Kerîm Qasim filitî. Lê belê Sedam reviya çû Sûriyê, ango nehat girtin çû Sûriyê.

Piştî wê bi demekê kurt di sala 1963'an de li dijî Ebdul Kerîm Qasim derb çêbû, ne Besî, lê nêzîkî Besiyan bûn desthilatdar. Miliyetgerên Ereb yên ku hem dijminê Kurd in, hem jî wer Îraq weke dewletekî Erebî tenê dinasin. Yên weke Ebdul Selam Arif, ev kesana.

Ebdul Kerîm Qasim di cih de kuştin, hema bi dadgehekî li ser piya ew kuştin. Ji lewre derbek bi vî rengî çêkirin û gav bi gav Baasî vê carê li ser desthilatiyê êdî xwe xurt kirin. Piştî demekê êdî du kesên tam ne Basî, nikarîbûn kar bi rêve bibirana, ji bo vê xwestin ji wan jî xelas bibin. Mesele ev Ebdul Selam Arif, carekê diçe milê Beser bi elîkopterê, diçe wan deran ji bo ku kontrolê bike, ji nîşkê ve xelk dinêrin ku elîkopter ecayîb ecayîb dizîvire, deriyê wê vebû û mirovek jê ket, çû û mir. Ebdul Selam Arif bi vî rengî mir. Yanî wê demê qeza bûye, ketiye, elîkopter xerabû, çi bû kes nizane! Di encamê de ji Ebdul Selam Arif bi vî rengî xwe jê xelas kirin.

Basî di Îraqê de di sal 1968'an de, bê alternatîf serwer bûn. Bi taybetî ekîbê Ehmed Hesen Bekir, Sedam Husên, gav bi gav wiha hatin ser hikum. Ji xwe Sedam bi bandor bû, di hikumetê de, erê ne serok bû, lê hakmiyeta wî ji serokekê bêtir

bû. Her tişt wî îdare dikir. Heta demekê, di pişt re bi temamî Ehmed Hesen Bekir dûr xist û ew bi xwe bû serok. Hem Basî bûn hem jî ev ekîba ji wan re dibêjin Tikrîtî, yanî Ehmed Hesen Bekir, Sedam Husên ên bi wan ve girêdayî, van desthilatî di Îraqê de xistin destê xwe.

**Xweseriya Îraqê Û Erdnîgariya Wê**

Niha Îraq ne dewletek ji rêzê ye, Îraq dewletek ji aliyê petrolê de dewlemende, erdnîgariyek stratejîk e, bi bandor e. Îraqê yek ji dewletên Ereb e ya ku bi Îsraîl re îtîfaqa sekina şer çênekiriye. Heta niha jî çênekiriye. Lê di rastiyê de niha têkiliyên wan bi dizî çêdibin. Lê belê bi rengekî fermî mesele, di navbera Sûriyê û Îsraîlê de agirbest heye. Di navbera Misrê û Îsraîl de heye, nevbera Urdun Îsraîl de heye, di navbera Lubnan û Îsraîl de heye, lê Îraqê îtîfaqekî wiha bi Îsraîl re çênekiriye.

Îraq bi taybetî di serdema sedam de, yanî Basiyên Tigrîtê, di wê serdemê de bi misyona ku li şûna Cemal Ebdul Nasir bigirin derketin. Dewletek mezin e, 500 hezar kîlometra kare ye. Hema hema bi erdnîgariya xwe weke Tirkiyê mezin e,. Di aliyê madî de pir dewlemend e, di aliyê nifûsê de jî zêde ye, li gorî dewletên Ereban ên dîtir, ne weke Misrê ye, lê zêde ye. Li gorî Urdun, Sûriyê, li gorî cihên dîtir, zêde ye.

Ev derfetên madî, fikira Basî ya milî, alîkariya Sovyetê ji derve de, van hemûyan hişt ku Îraq weke hêzekî muxalefetê li dijî Emerîka be. Dest danîn ser ptrolê, şirketên Îngilîzî hemû qamoleştirme kirin, ptrol kirin ya Îraqê, van tiştê he ew hestên milî yên Erebî pir li pêş dixistin, ji bo vê jî serbest karîbû Emerîka û Îsraîl tehdît bikiriba.

Vê pirsgirêk derdixist, ji Emerîka re pirsgirêk derdixist. Ji bo vê Emerîka li dijî Îraqê, her demê bi şiyarî tevger dibû, Îsraîl li dijî Îraqê bi şiyarî tevger dibû, her demê xwestin Îraqê tengav bikin. Ji bo vê em bala xwe bidinê Îsraîl û Emerîka bi munasebetek yan jî yekîditir her demê dixwest ku têkiliya bi tevgera Kurd li Başûrê Kurdistanê re çêbibe, ji ber çi?

Ji ber ku Îraqê Îsraîl tehdît dikir, wer bi ergomanên miliyetgeriya Ereb desteka tevgera Filîstinê dike, bi taybet jî desteka rêxistinên radîkal di tevgera Filîstinê de dike.

Mînak Eniya Red a Iraqê, ya ku di nava Filîstîniyan de destek dikir. Abo Nîdal destek dikir, Abo Nîdal hevalên ku di zemanê xwe de li Lubnanê mane nas dikin, Abo Nîdal ê ku ne di rêxistina Filîstiniyan de bû. Ji Fetih qut bûbû, bi navê rêxistina Fetih Meclîsa Şoreşgerî, yanî ji Erefat qut bûbû, li ser esasê çalakiyên wiha çawa yên ku navê terorê lê tên kirin. Bi vî rengî dihat naskirin. Abo Nîdal heta ku mir jî li Îraqê bû. Di sala 2002'an de li Îraqê mir. Ji nişkê ve li mala xwe li Îraqê mirî hate dîtin.

Hêzên radîkal ên li dijî Îsraîlê destek dikirin, bi peran destek dikirin, bi sîlah destek dikirin, li dijî Îsraîl xwedî

propoganda bû, îtîfaqa agirbestê di navbera xwe û Îsraîl de mohr nekiribû, bi vî rengî nerehetî çêdikir. Îraq dema ku li dijî Îsraîl be, ne weke dewletek din li dijî Îsraîl e, ji ber ku di Îraqê de ptrol, pere û hêza madî heye.

Îraqê Îran jî tehdît dike, bi çi awayî tehdît dikir? Bi vî rengî di Îranê de Ereb hene, ew Erebana her demê dixwest li dijî Îranê bixe dewerê. Dîsa hinek girav hene di navbera Îraq û Îranê de, girava Tamba mezin, Tamba biçûk, Abo Mûsa, ev girav in. Ev giravên he timî Basiyên Îraqê digotin, ev Erda Ereba ye, Îranê dagir li ser kiriye, divê ku ev ji me re vegere, divê careke din ji me re vegerînin.

Îran, kî ye? Îran stargeha bingehîn a Emerîka di herêmê de ye. Stargeh bûye, sîstema girêdayî Emerîka bûye, ji bo vê Îraq hem ew tehdît dikirin, hem jî Îsraîl tehdît dikir. Hem jî Îran tehdît dikirin. Îraq di fikirê xwe yê miliyeger yê Erebî de, qîraliyetên ku li Kendavê jî tehdît dikir, Kuêt, Qeter, Siûdî, ji ber çi, ji ber radîkal bû. Ji ber ku miliyetger bû, ji ber propoganda cumhuriyetê dikir. Behsa sosyalîzmê dikir. Ev hemû dibûn serserbebê ku dewletên Kendavê nerehet bibin, bitirsin, fikarên wan çêbibe. Ji bo vê Emerîka her demê xwest ku Îraqê daqurtîne. Biwestîne, lewaz bihêle, qels bihêle, nexweş bihêl, her demê ev ji xwe re kirin hedef.

### Têkiliya Hinek Tevgerên Kurd Bi Emperyalîzmê Re

Ji bo vê mesela Kurdî her demê di vê çarçoveyê de xwestin bidin xebitandin. Ji lewre bîranînên Dêvit, Timhî, welkîlê wezareta derve ya Îraîlê, di zemanê xwe de unsûrekî (hêmanekî) Mosadê yê bingehîn bû. Di bîranînên xwe de vê dibêje, “Bênavber di ser Îranê re, di sala 1969’an heta, sala 1979’an bi partiya Demokratê Kurdistan re têkiliyên me hebûne.

Ev têkilî bi alîkariya madî û çek jî di nav de, herweha perwerde jî, her demê jî di serdema şer de jî, şerê di navbera Kurdan û hikumeta navendî ya Îraqê de di wê serdemê de jî gelek wesîqe û agahî hene ku Mosad, bi xwe neketiye şer, lê belê di aliyê perwerdê de di aliyê alîkariya madî de, çek di ser Îranê re, her demê ev pêwendî bi PDK’ê re çêkirine.

Di vê derbarê de hinek mînak ji bo ku bi vî rengî em têkiliyên emperyalîzmê, tevgera Kurd jî nas bikin, dibe ku ev mînakan bi me re bibin alîkar.

Îraq di şerê li dijî Kurdan de, nikarîbû demdirên bidaba meşandin. Ji bo vê jî îtîfaq çêkirin. Di sala 1970’î di 11’ê Adarê de di navbera hikumeta Îraqê û PDK’ê de îtîfaq çêbû. Navê wê jî îtîfaqê 11’ê adarê ye. Li gorî wê îtîfaqê çi bû, li gorî wê îtîfaqê çar sal agirbest, di hundirê van çar salan de, pêvajoyek ahengê wê çêbibe, alîkarî wê bi hevdu re bê kirin, bi taybetî jî di Kurdistanê de derên ku di şer de hatine xerakirin bi alîkariya hikumeta navendî wê bê ava kirin. Di vê demê de, di aliyê madî de, avahî, wê bê meşandin, yanî ji aliyê hikumeta navendî ya di Kurdistanê de, Kurd bi xwe wê xwe birêve bibin. Lê hinek xalên ku li ser

îtîfaq tinebûn hebû. yek jê mesela Kerkokê bû. Kerkok diahilê vê îtîfaqê be, yan jî na? Ew wer di asqiyê de ma. Dîsa hinek herêmên Musilê bûn. Yên ku Kurdan weke herêmên Kurdistanê dizanîn, lê Ereban jî weke herêmên Ereban dizanîn. Bi vî awayî ev îtîfaq li ser esasê ku çar sal agirbest pêk bê, hate pêkanîn.

Piştî çar salan wê çi bûbûya, piştî çar salan wê bi rengekî fermî, wê xweserî (otonomî) ji bo Kurdan bihatana nas kirin. Bi vî rengî Îraq wê bûbûya dewletek tê de otonomiya Kurdan heye.

Ev îtîfaq bi ser neket, ji ber çi? Emerîka û Îran xwestin vê pêvajoyê li gorî xwe bidin meşandin. Yanî eger Îraq û Kurd li hev bên û Îraq bibe dewletek bihêz, wê demê pirsgirêk wê dewam bikin. Ji bo vê Emerîka û Îranê xwestin vê pêvajoyê asteng bikin.

Fektorê dîtir di asteng kirina pêvajoyê de çi bû? Beasbû, Beasheta asta dawiyê dixwest bi ziyanên hindik, ji vê meselê derkeve. Yanî heta jê bê mafê Kurdan tengav bike. Di çarçoveya qadeke teng de, bi hinek mafê teng bi vî rengî dixwestin bidin meşandin. Bo vê li şûna ahengê nakokî kûr bûn. Emerîka ket dewrê, Şahê Îranê ket dewrê. Bi vî rengî têkilî bi tevgera Kurdî re pêş xist.

Di sala 1975'an de endamekî kongirsê Emerîkî îfada xwe dide, "ev danezan nivîskî ne", dibêje, "Rast e, me alîkarî bi şoreşa Kurdan di Îraqê de kir. Ev alîkariya me bi vî rengî dest pê bû, Berzanî di sala 1972'an, li ser endamê SAA'ê, yê Tehranê re alîkarî ji me xwest. Me ev agahî da Nikson, Nikson wê demê serokê Emerîka bû, Nikson tavilê xwest ku em alîkariyê bi tevgera Kurdî di Îraqê de bikin. Rast e, me alîkarî bi tevgera Kurdî re kir. Lê belê ev alîkariya me bi tevgera Kurdî re diviya bû ku nebûba serserbebê da Kurd bibin xwedî otonomiyek berfireh, ne jî bibin sersebebê ku Kurd bibin xwedî dewletek serbixwe. Alîkarî me bi Kurdan re kir, ji ber ku Îraq dostê me yê di herêmê de, em nerehet dikir, ji bo vê diviyabû me ew tengav bikiribûya ku careke din dostên me yên herêmê nerehet nekin. Dema ku Îraqê nema dostê me yên herêmê nerehet kir, me jî alîkariya Kurdan da rawestandin." Ev îfada endamê kongirsê yê ku têkilî bi tevgera Kurdî re çêdikirin, navê wî Bayîk e, di sala 1975'an de di kongirsa Emerîkî de ev îfade daye.

Şahê Îranê di roprtajek xwe bi rojnamevanekî Ereb bi navê Muhemed Hesenên Heykel e, Şahê Îranê di wê roprtaja xwe de vê dibêje; "Îraq ez tengav dikirim, diviyabû ku min şeqamek lê bixistiba, bo vê min alîkarî bi şoreşa Kurdan re kir. Alîkarî ji min xwestin, ez fikirîm û min alîkarî pê re kir.

Rojnemavan dibêjiyê:

Tu çiqasî fikirî yî? Şah wiha bersiv dide û dibêje; Seatekî ez fikirim."

Ewqasî hazirbû ku tiştekî wer di Îraqê de distek bike. Dibêjin "Ev alîkarî gelekî jî li ser me bûn mal. Sêsed milyon dolar me xerac kirin. Lê belê Îraqê ez tengav dikirim, ji bo vê jî diviyabû

ez şiqamekê lê bidin. Dema ku nema em tengav dikirin, me alîkarî li ser şoreşa Kurdan qut kir, dema ku me alîkarî qut kir sekinî."

Di van be danezanan (belge) de çi tên nîşandan, ev teştên nivîskî ne, hatine weşandin, yanî ne texmînî ne. Weke din jî tiştê ku mirov dikare binêrxîne, zehf in.

Ev çi dide nîşandan, dide nîşandan ku sîstema emperyalîst di cîhanê de ti carî nebûye xwedî perspektîfekî ku mesela Kurd di herêmê de çareser bike. Hezkirina wan ya ji Kurdan re, desteka wan ya ji Kurdan re, ti carî sînorê ku Kurdan weke şantac li hemberî dewletekê bidin xebitandin derBeasnebûye. Dema ku wê dewletê tewîz dayê wan, teslîmî wan bûye, êdî Kurd jî firotine.

Îngilîzan jî ha kiriye, Fransa jî ha kiriye, Emerîka jî ha kiriye, ha jî dikin. Ji bo vê Kurd wek biperspektîfên azadiyê ti carî Emerîka destek nedayê. Li ser esasê xebitandinê her demê nêzîk bûye. Dema ku Sedam li gorî îtîfaqa Cezaîrê ya di sala 1975'an de bi Îranê re mohr kir, li gorî wê îtîfaqê êdî nema ew doza wan ya giravê dane Îranê, nema Îran nerehet kir, nema ku êdî weke berê bi rengekî çalak Îsraîl nerehet kir. wê demê Îran alîkariya xwe ji Kurdan re qut kir, Emerîka jî ev qutkirina wan ya alîkariyê erê kir, bi vî rengî tevgera Kurdî hate hilweşandin.

Ji lewre hinek pirsgirêkên bi tevgera Kurdî ve girêdayî hene. Ev cuda tên guftugûkirin. Lê belê di milê wê yê Îraqê de bi vî rengî ye.

### Li Iraqê Nijadkujiya Tevgera BeasLi Ser Gelan

Niha Îraq dewletek bi taybetî bi hikumê Basiyan re gelek perîşan bûye. Ev taybetmendiyên desthilatiyê yê kevneşop dema ku bi fikirê milî tên girêdan çiqasî ziyanê didin civakan, mînaka Îraqê li ber çav e.

Îraq welatekî bi vî rengî ye, du çemên mezin tê de derBeasdibin. Ne tenê du çem gelek çem, lê du çemên mezin di Îraqê re derBeasdibin. Derdora xwe hemû dikin cihê zîraetê, hela dema ku dighîjin nêzîkî Kendavê, qadekî berfireh, avî, derdixe pêş. Îraq welatekî werbûye ku berî şerê Îraq û Îranê hilberîna Îraqê ji xurman re, heştê milyon dar bûye.

Di şerê Îraq û Îranê de ev darana hemû hatin rakirin. Niha jî ji aliyê hilberîna xurman de encex Îraq dikare para xwe ya hundirîn rabike. Ji ber çi, ji ber ku daristana xuraman di esas de li herêma sînorê Îranê de ne, ew herêm pirî caran dest guhert, Îran ketiyê, Îraq ketiyê hwd. Ji ber sedemên şer ew deristanên xurman hemû ji holê rakirin.

Îraq welatekî wiha ye ku hilberîna wê ya ptrolê her rojê sê milyon varêl e. Bi van taybetmendiyên xwe di esas dikare bi astê jiyanê, zanistiyê gelek-gelekî li pêş be. Lê kevneşop desthilatdariyê, mînak niha Sedam çi wî heye? Li Besra qesra Sedam heye, li Bexdê qesra Sedam heye, Li Babil qesra Sedam heye, li her derê qesrên Sedam hene.

Vêca her qeserek Sedam weke mozayê ye. Di van demên dawiyê de Emerîka hinek ji wan qesran kirine otêl, hwd. Lê belê qesr çêkirine. Hinek ji wan qesran Sedam rojekê ji rojan neçûyî yî, li wir ranezaye. Lê çi ye, beramberî serayên Asûr, Babil, qesrên Sedam. Serê Gare qesir daye çêkirin. Li Babil li kêleka wan kavilên Babil ên asarê dîrokî yê pênc hezar sal berî niha ne, çar hezar sal berî niha ne, qesrek Sedam jî heye. Lî Musil, Bexdayê, qesrên sedam.

Dîsa da ku Iraqê ji bo daxwaziyên xwe yên milî pêk bîne, hemû hêza dewletê, avakirina artêşê, îstixbaratê û bi çek kirinê xerc kir. Îraqê êdî çek nedikirî, êdî çêdikir. Îraqê ne çek dikirî, karxanên çekan dikirî. Mînak gelek foziya li gel xwe çêdikir. Gelek sîlah li gel xwe çêdikir. Klaşînkof li gel xwe çêdikir. Bombe li gel xwe çêdikir. Demançe li gel xwe çêdikir, fozye, yên sam pênc yên li erdê davêjin erdê, yên Rusî dikirî, lê birêkupêkirin li ser çêdikirin, ji nû ve dîzayîn dikir bi rengê ku karibe bi mesafeyekî hîna mestir, milyon û nîvek artêş çêkir, bi hezaran subayî derxistin, hêzeke îstixbaratê yê mezin çêkir. Çakdariyek mezin çêkir.

Ev hemû ji bo çi bûn? Ji bo parastina Îraqê bû, na ne ji bo parastina Iraqê bû. Ji bo parastina rejîmê bû. Yanî kevneşopiya desthiladariyê yê kevn, yê berî hezarê salan di şexsê xwe de derxist pêş, wek çawa qiralek Babil li xwe nihêrî, wek çawa qiralekî Asûr li xwe nihêrî û bi fikirê netewî yê yek alî, yê miliyetgeriya Ereb îca bi rengekî vahîm ziyan da civakê.

Li hemberî hemû komên etnîkî, yên ne Ereb bi vî şeklî siyasetek asîmîlasyonê pêk anî. Asûr, Tirikman, bi taybetî vê carê Kurd, bi komkujiyan, dîsa li hemberî şîa hinek komên din yên etnîkî dînî hebûn yên ku pir kêm mane, mînak weke cara berê me gotibû Sadyî di zemanê xwe de sî hezar bûn, niha kêmtir mane. Niha şeş hezar mane, nema ne. Bi zimanê xwe, bi rêûresma xwe, bi dînê xwe, ji wan pê ve kes nemane, ew jî herin ew çand namîne.

Bi vî rengî bi îdeolojiya Beasya Irqger şoven, bi hêza madî, ya ku li ser wî esasî artêş çek, îstixbarat avakirin, weke çawa civaka Îraqê berbextiya xwe ya herî mezin, çaxa xwe ya herî xerab, di vê serdemê de jiya. Civakek wer bêdeng, kopya, bê îrade, ji rê derketî, dev ji huner, Edebiyatê, lêkolîn, lêgerînê berdaye. Bi temamî di xizmeta rêjîmê de hatiye çêkirin.

Halbike Bexdad ne wiha bû, Bexdad navendekî çandê bû. Navendekî ronakbîriyê bû, Basiyên Îraqê ev tiştên he hemû tesfiye kirin.

### Komkujiyên Ku Rejîma BeasDi Iraqê De Li Ser Kurdan Daye Meşandin

Ev bi rengê xwe yê herî faşîst, bi taybetî bi pêkanîna silahê kîmawî, qirkirin, mezarên komîn, yanî di îşkence, kuştinê, komkujiyan de, mînakên weke wan hîna çênebûne hatine meşandin. Mînak, di derbarê Kurdan de gelek tişt hene, niha

Helbça, em dibêjin komkujî, silahê kîmawî hate bikar anîn, tiştek pir xerabûye, di Helbça de hêjmarê kuştiyên Kurdan pênc hezar in, hejmarek ji wan bêtir jî birîndar hene. Bajarek xerabûye, lê berî Helbça û piştî Helbeça ev pêvajoya enfalê heye.

Di pêvajoya enfalê de bi rengekî resmî, yanî hêjmarê resmî sed û heştîyî û du hezar 182'du hezar Kurd wenda ne. Di heman demê de nifûsa welatekî ye, kî ne ev wendahiyên he? Bi giranî kesên ciwan in, jin û mêr in. Enfal ji kevneşopiya Quranê yê ku dema Misilman dijî kafiran xezû dikin, şer dikin ji wê gotinê tê. Ango Kurd weke çawa kafir in, vê carê derdora xwe çetên Kurdan, yên xayîn weke qontira, Erebên miliyetger, faşîst di Kurdistanê de seferberiyek îlan kirin, her derê ji wan girtin, kom kirin, di encamê de hatine kuştin. Lê çawa hatine kuştin?! Bi saxî hatine kuştin, ezmûn li ser wan hatine kirin, organên wan hatine girtin di pişt re hatine kuştin, gelek tişt hene, gelek mînak hene bi taybetî jin hatine firotin. Ew firotine Misrê, Siûdiyê, Kuwêtê. Dema di şerê kuwêtê de mînak hinek hene ew jin kirîne, lê weke fahîşe nedane xebitandin, bi wan re zewîcî ne. Wê demê Misilmanin dibe ku ew jî du-sê heb wiha derketibin, dema di şerê Kuwêtê de, wan jinan û malbatên xwe nas kirin. Ew jin hatibûn firotin, lê ew zilamên ku bi wan re zewîcî bûn weke çawa nesnekê cinsî, bi rengê fahîşe nedabûn xebitandin. Ji bo xwe bi wan re zewîcî bûn, mînak hinek mînakên wiha derketin. Kes behsa wan jî nake, kes li van buyeran jî napirse. Çima, niha yek nas jî bike, yanî malbatek nas bike jî, jixwe dem derBeasbûye, sala 1988'an li ku, sala îro li ku ye, nas bike jî di bin hikumê civakî de, nikare lê xwedî derbikeve. Lê xwedî dernakeve, lê belê ger lêkolînek çêbibe niha jî însan dikare bişûpîne ka ew jinana li ku ne. Li Misrê, li welatê Kendavê çawa hatine bikar anîn, çawa hatine firotin, çawa hatine kirin, wê karibin zû peyda bikin. Lê gelek kes di civaka Kurdî de ji bo vê ne amade ne, weke eybekî, arekî dibîne, ji bo vê dûv van meselan nakevin.

Çi bi wan zilamên wê demê hatin? Di mezerên komîn de hatin kuştin, hatine tesfiye kirin. Ji lewre ev dewlet netew e, di encamê de qirkirine. Dîsa derê ku jê re pêwîst e ji bo ku homojen bike oygolama pêk tîne. Mînak, li Bexdê, li Xaneqîn, li gelek cihên dîtir Kurd hene, Kurdên şîa ne, fîlî ne. Lê ji ber ku şîa ne, di aliyê mezhebî de dibe ku bandora Îranê li ser wan hebe. Kurd in, di herêmên nêzîkî Ereban de jî bi cih dibin, pir jî dewlemend in, ji bo vê weke çawa di zemanê xwe de Tirkan bi serê Ermeniyan de aniye ji bo serweta wan bigire, beramberî Kurdên fîlî ji wiha bûye. Kurdên fîlî gelekî dewlemend in, ya seyr jî tiwaniyekî wan di kombûna peran de gelekî bi hêz heye. Timî di Surgunê de bûne, timî dest danîne ser malê wan, lê tevî vê jî her demê karîbûne qezenc bikin. Ew tehcîr kirine, yanî çawa? Nîvê şevê girtin ser malê wan gotin, "Hûn ne hemwelatiyên Îraqê ne derkevin biçin Îranê." Dest danîn ser malê wan, malê ku bi keda xwe ava kirine, bi xwe dane hevdu. Perê wan, maşîn, hemû derfetên wan destdanîn ser.

Kerkok cihê ptrolê ye, ji bo vê diviyabû Kerkok bihatiba asîmîlekirin. Ji bo ku her demê mayende ji Îraqê re bimîne, bibe

malê Îraqê, êdî her carê nebe pirsgirêkek di navbera Kurd û Ereban de, ji bo vê Erebkirina Kerkokê xistin rojevê. Tearîbkirin, yanî Erebkirin e. Ango li şûna Kurdan Ereban bi cih bike. Berpirsiyarê siyaseta Erebkirinê, di Kerkokê de kî bû? Elî Hesen Mecîd bû, yê ku fermana bombebaran Helbça bi kîmyasalê dabû.

Elî Hesen Mecîd biryargehek li Kerkokê çêkir, hesab çêkirin. Di hundirê demekê de serê sedî sî ji Kurdan rabikin, li şûna wan Ereban bînin. Di hundirê demekê kin de bi zorê bi hezaran malbatên Kurd ji Kerkokê di nîvê şevan de, tana pêcaman, cilên xewê, nehîştin bixçikekê jî bi xwe re bibin, tiştên xwe bikinê û bar bikin. Bi vî rengî ji Kerkokê derxistin. Li şûna wan Ereb bi cih kirin, ev têrê nekir, cuda jî Ereb anîn û her malbatek Ereb deh hezar dînar danê, ji bo ku ji xwe re li Kerkokê xaniyan ava bikin.

Mînak hinek tax hene yên Erebane di wê serdemê de hatine ava kirin, beriya wê tine bûn, hatine fînanse kirin ji bo ku dîmografiya bajêr biguherin, taybetmendiyên Kurdayetiyê ji holê rabikin ku bi rangekî mayende li ser esasê asîmîlasyonekî bi vî rengî bi qirkirinek fîzîkî Kerkok her demê bi çavkaniya xwe ya ptrolê, ji miliyetgeriya Ereb re  bihêlin.

Ji lewre ev birînan dihêlin dilê mirovan de, ev ji rê derketinin, targmane. Ji bo vê gelek tişt hene, miliyetgerî tiştên wiha peyda dike ku careke din gel nema karibin li hevdu bên û li hevdu temaşe jî bikin. Careke din nikaribe ahengiyê bi hevdu re çêbikin. Zemînê wê ji holê radikin, lê dîsa jî ji ber ku meselê hevdu qebûl kirinê çanda hevpar, nirx, ji ber ku ev tişt di dîrokê de feşartîn ji bo vê jî dema ku hinek derfet olenaq peyda dibin, mirov lê temaşe dike di gelan de zêde pirsgirêk tine ne. Gelek zû dikarin hevdu fêm bikin, zû dikarin hevdu bibînin, zû dikarin bi hevdu re bijîn.

Di Îraqê de jî rewşek wiha mirov dikare di roja me ya îro de piştî ewqas komkujî jî peyda bike, lê miliyetgerî hîna jî dixwaze rol bileyîze, hîna jî dixwaze wê proja ku Sedam dest pê kirî, vê carê bi rengekî dîtir bidin dewam kirin. Îraq bi vî rengî mirov bigire dest wê baş bibe.

### Rol Û Bandora Siyaseta Îsraîl Li Rojhilata Navîn

Hêzeke din jî ya ku li Rojhilata Navîn bi hêza xwe ya madî, leşkerî û fikirî siyasetê li Rojhilata Navîn diyar dike, Îsraîl e. Dema mirov behsa Îsraîl dike ji xwe rewşa Yahudiyan derdikeve pêşberî mirovan. Ez bawerim derbarê Yahudiyan de di milê dîrokî de berfireh tê diyar kirin û nîqaş kirin, ji lewre heta ji me bê em ê dubare jî nekin, ji rewşa wê ya dîrokî zêdetir aliyên wê yên dîroka Îsraîl mirov bigire dest. Di vê çarçoveyê de analîzên derbarê Yanhudiyan de tên kirin, bi taybetî analîzên me yên tên kirin em ê wan di ber çavan re derbas bikin.

Niha Yahudî di encama belavbûn, mişxetîbûn, bi taybetî jî di sedsaliya 19-20’an de lêgerînên wan yên avakirina dewletekî netewî çêbûn. Jixwe fikirê dewlet netew, sermayedarî di milê wê

yê fînans ê peran de Yahudiyan rolekî mezin tê de lîstine, ew rastiyeke.

Lê dewlet netewa Yahudiyan a taybet girêdayî Yahudiyan ew çênebû. Ji bo vê her demê Yahudî bi pirsgirêkên talanê re rû bi rû dimînin û diman jî. Di roja me ya îro de dema mirov gotinekî xerab ji bo Yahudiyan dike, gelek dadgeh di cîhanê de deawan li dijî mirov vedikin.

Gotinekî biçûk be jî tavilê dibêjin ev antî Semîtîk e, dijî Samiya ye, ji bo vê propoganda, teşhîr, heta şûpandina huquqî jî çêdibe. Ji lewre ev kengê çêbûye, piştî şerê cîhanê yê duyemîn, komkujiya Naziyan li dijî Yahudiyan dema çêbûn, piştî wê bi navê Holokos dikeve dîrokê. Holokos yanî mehreq, şewitandin, qirkirina Yahudiyan bi şewitandinê.

Di kîjan astê de çêbûye, bê guman wehşiyetek di wir de heye. Gelek dibêjin ev komkujiya Yahudiyan nepixandiye, tiştekî wiha di wê astê de nîne, gelek kes jî dibêjin ne di wê astê de ye, gelek dibêjin di wê astê de ye. Di encamê de komkujî hatiye kirin, li ser destê Naziyan Yahudî hatine qirkirin. Piştî wê êrîşê li ser Yahudiyan weke sucekî însanî hate eşkere kirin û li ser vê esasî heta demekî dirêj jî hikumeta Elmaniya hem ew suc mehkum dikir, hem jî rexnedayîn dida, hem jî di aliyê madî de razandin (tezmînat) ji bo Yahudiyan didan.

Gelek şêrketên Elmanî di çarçoveya wan razandinan de di proja avakirina Îsraîl de cih girtin. Di roja me ya îro de wiha ye, hem di aliyê ziman de, hem jî di aliyê piratîk de êrîşê li ser Yahudiyan bi vî rengî tên pêşwazîkirin, yan jî rayeksyon li dijî wan hene.

Ji ber sermaya navnetewî bi taybetî Emerîka û Îngeltera têkiliya wan bi sermaya Yahudiyan re bi awayekî susret kûr in, organîk in, hêza siyasî ya Yahudî hem di Ewrûpa de, hem di Emerîka de hêzekî zextê ya mezin e. Gelek caran yun dide siyaseta van dewletana. Biryarek dewlet distîne bi taybet jî biryarê di derbarê Îsraîl de di bin bandora hêzên tepeserkirinê yê ekonomîk ên Yahudî li van welatan çêdibin.

Gelek caran di desthilatiyê de ev içiçeye jî, mesele sekreterekî sereke yê Obama di sala 1992'an de leşkerekî Îsraîlî bû, ango li Îsraîl leşker bû, niha jî mûdîrê mekteba wî ye.

Gelek kesên wiha hene, di esas de tevlîhev bûye. Di dîrokê de gelek eserê Yahudiyan jî heye. Bi taybetî jî di dîroka zanistiyê de, di felsefê de, di zanistê de, gelek tevlîbûn û alîkariya wan heye. Pir jî balkêş in û guhertin jî çêkirine, aso fireh kirine. Zanistî zêde kirine, bi giştî ev rol jî lîstine.

Heta di fikirê civakî yê azadiyê de jî xwedî tevlîbûnin. Gengaze ku êrîşên li ser wan, ji derve hiştina wan, tepeserkirina li ser wan dibû sersebebê ku di vî zemînî de lêgerînek wan a azadiyê zêdetir bin û gelek kesên bi vî rengî di fikirê sosyalîzmê de tevlîbûn çêkirine, heta di asta milîtantiyê de helwest nîşandan.

Wiha jî derketin. Bi taybetî di tevgera sosyalîst a Ewrûpî de gelek mînakên bi vî rengî hene. Mînaka herî balkêş Roza Loksmberg e, gelek kesên din jî hene.

Di serî de sermaya Yahudî, desthilatdariya Yahudî bi gelemperî di nava lêgerîna ava kirina dewletekî netewî ji bo yahudiyan de bû. Demekî xwestin bi rêka împeratoriya Osmaniyan çêbikin. Bi taybetî di serdema îhîhad û tereqî de ev hîna zêdetir bû. Gelo li cihekî ji cihan di wî erdê Osmaniyan de dikarin dewletekî ji bo xwe çêbikin? Ev zêde piratîkî nebû. Lê daxwaziyekî wiha hebû.

Demekî behsa welatê Efrîqiya dikirin, bi taybetî Oxlenda ji bo xwe esas bigirtina da ku dewletekî netewî ji bo xwe çêbikin. Ew jî piratîk nebû. Di sala 1898'an de li Siwîsra kongira tevgera Siyonîst ya cîhanî çêbû. Yanî tevgera Yahudî di nava Yahudiyan de yên herî miliyetparêz pir Siyonîst, tevgera Siyonîst tevgerekî nijadperest e. Siyonîzm weke têgîn di danezanên bileşmîş militler de, danezanên Yektiya Netewan de weke tevgereke nijadperest e, wiha di danezanan de jî hatiye qebûl kirin.

Ji lewre niha Îsraîl nabêje em Siyonîstin, lê belê Siyonîstin. Bi taybetî jî rêvebirên wan Siyonîstin. Ji ber ku ew tevger bi vî rengî hatiye bi nav kirin, ji bo vê xwe jê dûr dixin. Sihyon cihek e, gireke di Filistinê de, ji bo Yahudiyan pîroz e, weke çiyayekî ye, ji çiyan biçûktir e gireke. Navê xwe ji wir digir in, Siyonîzm ji Sihyon tê.

Di sala 1898'an de kongirek çêkirn, di vî kongirê de biryar girtin. Biryar ev bû, yek divê ji bo Yahudiyan dewletek netewî bê avakirin.

Duyemîn jî, ev dewlet ji bo taybetmendiyên wê yên dîrokî divê ku Filistîn be. Ji ber ku axa wan ya kev e, dewletek wan ya kev in li wir çêbûye. Di zemanê qiral Dawid de ev dewlet çêbûye. Her demê li wir bûne, jê re dibêjin Erda Ji wan re soz hatiye dayîn, yanî Xwedê ji wan re soz daye. Jixwe li gorî Tewratê li gorî baweriya dînî ya Yahudî Filistîn erdekî ku Xwedê daye wan. Soz bi wan re daye, bi cih bûna wan jî, weke ku Xwedê daye wan, heta di Încîlê de wiha hetiye nîşandan, ewqasî Xwedê ji Yahudiyan hez dike û ewqasî gelekî wî yê hilbijartiye ku erda xwe ya herî baş ser rûyê cîhanê daye wan, ew jî Filistîn e. Ji bo vê Filîstîn esas girtin, ji bo vê gotin divê ku ev dewlet jî li Filîstînê be.

Ya sêyemîn gotin; divê ku ji niha û pê ve hemû Yahudiyên li cîhanê berê xwe bidin Filîstînê. Yanî Yahudî bar bikin û biçin Filîstînê.

Ya çaran jî gotin; ji bo ku ev çûna Filîstînê pêk bê, divê ku seremaya Yahudî vê hicretê fînanse bike. Sermaya Yahudiyan ango dewlemendên Yahudiyan divê ku vê hicretê fînanse bikin.

Ji lewre Yahudî li Ewrûpa belav bûn, dema ku Emerîka keşif bû vê carê berê xwe dane Emerîka jî. Li Ewrûpa li ku belav in, li Engiltera. Li Holenda, li Elmaniya, li Elmaniya zêde hebûn. Ji

ber çi, li Elmaniya dînê Protestantî zêde tepeser kirin li ser Yahudiyan çênedibû. Ew red nedikirin. Li Îtaliya berê hinek Yahudî hebûn, lê belê piranî erda herî baş cihê herî zêde Yahudî tê de bi îstiqrarl bûn, Elmaniya bû, Engeltera bû, ev cihê he bûn.

Piştî vê biryara Yahudiyan gav bi gav têkiliyên xwe bi Elmanan re lewaz kirin. Li şûna Elmanan Îngilîz ji xwe re hilbijartin. Bi sîstema siyasî ya Îngilîzan re bûn yek. Ji ber çi? Îngilîz împeratorî bû, serwerê cîhanê bûn, Rojhilata Navîn jî ket bin bandora Îngilîzan, ji bo vê heger niyetek Yahudiyan di avakirina dewletekî qewmî di Filistînê de çêbikin bê erê kirina Îngilîzan çênabe.

Ji bo vê sermaya Yahudî her demê ji Îngilîzan xwest ku erê kirinê bidin ku di Filîstînê de welatek ji wan re çêbibe. Ji lewre erê kirin nedan, lê kengê erê kirin dan, pişt re di sala 1917'an de wezîrê derveyî Engiltera navê wî Bilfor bû, Bilfor namek şand ji yekî Yahudî yê dewlemend ê mezin Ruçild re. Di namê de wiha dibêje " êdî divê ku hikumeta qiraliyetê biçavekî erênî li avakirina dewletekî Yahudî di filîstînê de binêre" ev weke sozekî Îngilîzan da Yahudiyan.

Ev name bû nama sozê, heta niha jî her sal ez bawerim dîroka wê 16'ê cotmehê ye. Dibe ku vê demê be, her sal Ereb wê rojê şermezar dikin. Çima, ji wê rojê re dibêjin roja soza Belfor, yanî Belfor soz ji Yahudiyan re daye ku dewletek Îsraîl li Filîstînê çêbike.

Li ser vî esasî Îngilîz di herêmê de û erê jî kirine, ji bo vê tevgera hicretê ya Yahudiyan ber bi Fîlîstînê ve zêde bû, ji her derê ji Îraq, Sûriyê, Îran, ji welatê Rohilatê Ewrûpa, ji Rojavayê Ewrûpa, Yahudiyan berê xwe dan Filîstînê. Li wir jî sîstemên xwe avakirin. Gund çêkirin, koparatîf çêkirin, partiyên siyasî çêkirin, tenê partiyên siyasî yên nijadparêz na, yên sosyalîst jî çêkirin.

Di esas de yên ku di wê herêmê de bi rêkûpêk sosyalîzm jî derBeaskirin, hinekî jî ew bûn. Sosyalîzm jî bi xwe re anîn. Lê belê komên nijadperêz jî hebûn, yên ku wiha Ereb dijmin didîtin, heta dixwestin Ereban bikujin, yên wiha jî hebûn. Lê belê perspektîf çi bû, perspektîfa giştî avakirina dewletek Yahudî bû.

Hejmara Yahudiyan di Filîstînê de zêde dibûn, sîstema Erebî ne di asta ku karibe bersivê bide. Ereb parçebûyî bûn, di bin destê Îngilîzan de bûn, hakimê Ereban bi giştî jî sîxûrê Îngilîzan bûn. Ji bo vê wan jî qunfilaş dikirin, Erebên Filîstînê bi xeteriyê dihesiyan, rayeksyon nîşan didan, lê belê Erebên Urdun mînak qiralên wir, yên cihên din çi dikirin, ew sakin dikirin. Heta ew dixapandin, diketin navberê û nedihiştin ku wer şer bikin.

Ji bo vê di rastiyê de astengekî wiha cidî li pêşberî bi cih bûna Yahudiyan di Filîstînê de çênebû. Îngilîzan destek dikir û sermaya Yahudî fînanse dikir. Yahudî di gelek cihan de nerehet bûn, bi taybetî jî yên di nav welatên Ereban de. Mînak li Îraqê Yehudî gelek hebûn, li Sûriyê, Tirkiyê, Îran û yên van cihan berê xwe dan Filîstînê.

Bi demê re jixwe hinek şêwazên din jî bi kar tanîn. Hem rêxistina wan hebû, hem jî Îngilîzan ew destek dikirin, hem jî hêza wan a peran hebû. Ji ber ku ev mesele dihate fînanse kirin, ji aliyê sermayedarên Yahudiyan ve dihatin fînanse kirin. Ew hêza peran jî dibû desteka çûna Yahudiyan a Filîstînê.

Ji ber vê jî erd dikirin, mal ji Ereban dikirin, Ereb derdiketin. Vê heta sala 1936'an wiha berdewam kir. Di sala 1936'an de Ereb gihîştin astekî ku zêde bi xeteriyê bihesin û li hemberî vê bicihkirinê hem li dijî Îngilîzan, hem jî li dijî Yahudiyan şer bikin. Şerekî berfireh bû, lê bi serkeftinê bi encam nebû. Gelek kes tê de cih digirtin. Mînak niha jî dema çalakî lidijî Îsraîliyan çêdibin dibêjin; kê çêkir, dibêjin hêzê Qesam çêkir. Ew navê wê demê yê ku berê li dijî Îngilîzan li ber xwe didan yekî bi navê Îzedîn Qesam hebû, hîna navê wî li xwe dikin.

Ew şer bi navêbêngeriya Urdunê, yan jî bi îxaneta Urdunê bi encam nebû, ango tesfiye bû. Piştî wê ti asteng li pêşberî Yahudiyan hema mirov dikare bêje nema. Vê heta sala 1947'an, di wê salê de Netewên Yekbûyî biryarek girtin. Di wê biryarê de vê dibêjin "Di Filîstînê de divê ku du dewlet çêbibin, dewletek a Yahudiyan paytextê wê Tilebîb be, dewletek jî ya Ereban be, Ereban gotin; em qebûl nakin. Gotin; Filîstîn welatê Ereban e. Yahudî ji derve hatine ji bo vê jî em vê biryara he qebûl nakin û em tevlî nabin.

Lê belê Yahudiyan li ser esasê biryara ku Netewên Yekbûyî derketiye, di sala 1948'an de Îsraîl îlan kirin. Wan biryar pêk anîn. Biryara ji Yektiya Netewan derketî di sala 1948'an bi serokatiya Dawid Bingiryo yan jî Dêvid Bingiryon Îsraîl hate îlan kirin. Hema gelek dewletan ew qebûl kirin, mînak weke Emerka, Engeltera, Sovyetê û gelek welatan ew qebûl kirin, ne tenê van welatan ew qebûl kirin. Hinek welatên Misilmanan ew qebûl nekirin. Welatê Ereban bi gîştî ew biryar qebûl nekirin.

Lê piştî salekî ji çêbûna Îsraîl, yekemîn dewleta Misilman di cîhanê de Tirkiyê Îsraîl qebûl kir. Hebûna Îsraîl qebûl kirin, ji wê demê û vir ve têkiliyên Tirkiyê û Îsraîlê di aliyê diplomatîk de bênavber dimeşin. Di sala 1967'an de her çiqaşî di gelek dewletan têkiliya xwe ji Îsraîl qut kirin jî, lê Tirkiyê dîsa qut nebûn. Tirkiyê her demê bû deryekî Îsraîl ku di deriyê alemê ji Tirkiyê re karibin xwe bighînin Îsraîl. Bi taybetî Yahudiyên Îranê, ên Rojhilata Navîn di ser Tirkiyê re dikarin xwe bighînin Îsraîl.

Bi vî rengî têkiliyek wiha dîrokî, nûjen di navbera Tirkan û Yahudiyan de her demê hebû ye. Di sala 1948'an de Ereb beramberî rewşeke wiha man, şer kirin Yahudiyan Îsraîl îlan kir Erebên di nav xwe de jî derxistin. Qismek hindik Ereb man di nava Îsraîl de, dewlet îlan kirin. Ereban gotin "Em vê dewletê qebûl nakin, em dewletek Erebî dixwazin, lê li ser hemû Filîstînê em dixwazin, ne li cihekî tenê, ji bo vê divê Îsraîl bê hilweşandin û bê xerab kirin. Yahudiyên hatine divê ku di paş de vegerin, ji bo vê Ereban gotin; em niha dewletek Erebî di Filîstînê de avanakin. Em ê çi bikim, em ê demborî Xezayê bi Misrê ve girê bidin, bi rengekî îdarî ü Batî Şeriya bi Urdinê ve girê bidin. Ango ji Urdunê

bê birêve birin, Batî Şeriya Defa Xerbî, Xeza jî ji aliyê Misrê ve bê girêdan heta ku em Îsraîl xerab bikin û em ê carek din dewletekî Erebî li ser hemû Filîstînê avabikin, niyeta wan ev bû.

Lewre Îsraîl weke dewlet di sala 1948'an de hate îlankirin. Ji aliyê gelek dewletên cîhanê ve jî hate qebûl kirin. Bû endamê Netewên Yekbûyî jî bû dewleteke xwezayî. Lê gergîntî di navbêna Îsraîl û Ereban de heye. Piştî ku hinek hêzên radîkal di dewletên Ereban de bûn desthilatdar, li Misr, Sûriyê, Îraq û ev bû sersebebê ku Îsraîl êdî weke berê xwe di nav ewlekariyê de nebîne. Pirsgirêkên Îsraîl ên ewlekariyê derketin pêş. Ji ber ku nêzîkî wê dewletên radîkal milî Ereb hene, li ser dijminatiya Îsraîl desthilatdariya xwe pêş dixin.

Vê qaygî li gel Îsraîl çêkirin, li ser wî esasî wer di têkiliyan de nerehtî xerabî û her demê propogandayên li ser esasê kûrkirina wê nerehetiyê çêbûn. Ev bi çi encam bû, di 1967'an bi şerê di navbera Îsraîl û Ereban de bi encam bû. Di wî şerî de Îsraîl bi hêza xwe ya leşkerî bi alîkariya Emerîka, Îngeltera jê re hebû, lê bi hêza xwe ya leşkerî û bi hostetiya xwe ya di şer de wer xwe nîşan da.

Wî şerî sawekî Îsraîl çêkir, Îsraîl kir weke destanekî, efsanekî, weke dijminê ku nayê hilweşandin, ji ber ku dewletekî ewqasî biçûk bi nifûsekî ewqasî hindik beramberî hêzên leşkerî yên herî mezin ên Ereban şer kir û bi ser ket. Ji bo vê şerê di sala 1967'an Ereb jê re dibêjin nekse, weke şikestinekî wiha bi xemgînî bi nav dikin. Bi her awayî dev ji xwe berdan e. Nerazîbûne, di nava Ereban de rewşeke wiha peyda bûye. Ji ber ku tiştên ne xwezayî di wê demê de çêbûne. Di hindurê şeş rojan de Îsraîl Xeza girt, Batî Şeriya girt, derbasî erda Misrê bûn, parçek axa Misrê yê bi Xeza ve girê dayî heye bi navê Çola Sîna, hemû girtin. Heta gihîşt nêzî Qenat Siwês.

Li Sûriyê da ev çiyayê stratejîk hem ji aliyê leşkerî ve, hem jî ji aliyê çavkaniyên avê yên Golan hemû girtin, bi wê bes nebû, derbasî bajarê Sûriyê yê pişta Golan jî kir, derbasî Qinêt re bûn. Qismek ji Urdunê jî girt, bi vî rengî rewşekî wiha bû ku weke çawa felaketeke mezin bi serê Ereban de anî. Tiştê ku nayê bawer kirin! Sîstema siyasî ya Erebî beramberî vê wer bêçare, lewaz û heta asta dawiyê bêqîmet derket holê.

Vê bandor li ser Ereban kir ku êdî çawa li bermberî xwe bêbawer bûn û bawer kirin ku êdî careke din nema dikarin Îsraîl bişkînin. Yanî hêza leşkerî ya Îsraîlî bû weke destanekî ku nayê şikandin, ev gel Ereban pêş ket.

Ji lewre hêzên fedayî yên Filîstînî xwestin vê efsanê bişkînin, hinek çalakiyên fedayî pêşxistin û êdî bi xwe meşandin. Êdî Filîstînî li hêviya Ereban ku bên wan rizgar bikin na, bi xwe û xwe dest bi karê çekdarî kirin. Rêxistin avakirin, rêxistinên çep, yên rast cuda cuda rêxistin avakirin, lê hemû çekdarîbûn, hemû jî têkoşîna çekdarî esas digirtin. Di cih cihan de ji bo xwe osleme çêkirin. Bi çalakiyan li dijî Îsraîl şer pêşxistin. Ev li ser eniya Filîstîniya pêşdike.

Jixwe Îsraîl bi vê gava xwe qada menawira xwe berfireh kir. Êcar ji cihekî din hê bihêztir bi Ereban re êdî danûstnd, Erebên ku berê qebûl nekirin bi Xeza û Batî Şehirê ku dewletê çêbikin vê carê ew jî bi dest wan neket. Dev jê ber de Xeza û Batî Şehiriya, erdê wan bi xwe mînak ê Misrê, Sûriyê bi xwe çû. Vê carê Ereb nikarin bêjin em ê Filîstîn vegerînîn, erdê xwe wê çawa vegerînin!? Ew bû pirsgirêk.

Qadekî Îsraîl yê menawera çêbû, lê di nava cîhanê de hate teşhîr kirin, ev çawa çêbû? Geke welatan têkiliyên xwe yên dplomasî jê qut kirin, gotin ev bê mafiye, lê wan guh nedan kes. Desteka wê Îngilîz û Emerîka bû, di van aliyan de pirsgrêk dernakeve. Di aliyê çekan de, di aliyê peran de pirsgirêk dernediket, ji bo vê bê ku tengasiyê bibînin meşiya. Heta roja îro jî tê.

Bala xwe bidinê Îsraîl ne weke Îranê ye, dema dewlet ambargo li ser Îranê datîne zoriyê dikişîne, lê Îsraîl ne wiha ye. Ji ber ku Emerîka Îngiltera, Fransa yanî sermaya navnetewî li piştа wê ye. Îsraîl piştî wê wer hêza xwe xurt kir, di aliyê erdnîgarî de, di aliyê nifûsê de xwe hîna zêdetir bi cih kir. Çekên nokler bi dest xwe xistin. Pêdiviya Ereban bi taybetî sîstema wan ya siyasî pêdiviya wan bi eatîbarekî hebû, eatîbara xwe vegerînin.

Ji bo vê di sala 1973'an de Misr û Suriyê bi dizî planek çêkirin. Yanî kesên din bi xwe nehesandin, qet agahî nedan welatên din. Bi dizî di dema ku di Îsraîl de cijin hebû. Mînak, cijnekî Yahudiyan heye jê re dibêjin cejina Kîpor ya Xufran, tam di dema ku cejine û tiştên din jî hebûn. Yanî Misr di aliyê propoganda de tiştine wiha nîşan dan ku ti niyeta wê ya şer tine ye. Propogandeyekî wiya jî hate kirin, ji bo vê rahabetek di Îsraîl de peyda bûbû, di şeşê Cotmehê 1973'an de di du eniyan de Ereban li dijî Îsraîl şer îlankirin.

Yek jê aniya Misrî li ser Sîna, yek jî eniya Sûriyê li ser Golan. Di du eniyan de şer îlankirin. Ev şer di serî de ji ber ku Îsraîl bê hazirî bû, di serî de zû têk çû. Misriyan heman xeta li ber Qenat Suwês şikandin û Sîna kirin destê xwe. Sûriyê jî heman Golan derBeaskirin, zû derBeaskirin.

Di vê demê de Îsraîl xwe bi ser hev de anî, xwe komî ser hev kir, ket êrîşê û di zivistana di navbera 1973-1974'an de şerê enî bi enî beramberî hevdu di navbera Îsraîl û Ereban de çêbû. Ev şer di navbêngeriya Netewên Yekbûyî hate rawestandin. Li gorî rawestandina wî şerî erdê Misrê hemû vegeriya jê re, agirbest îlankirin. Sûriyê jî tenê jê re bajarek vegeriya ew bajarê ku berê Îsraîl dagirkiribû Qinêtra, ew jê re vegeriya, çiyayê Golan jê re vegeriya. Lê çiyayê Golan ji ber ku stratejîk bû nedanê. Heta roja me ya îro jî pirsgirêka Sûriyê bi Îsraîl re di esas de Golan e.

Golan, zozan e, bilind e, di aliyê leşkerî de pir stratejîk e. Li ser Sûriyê serwer e. Yek ew cihê wê yê stratejîk heye, du ava vexwarinê bi giranî ji kaniyên Golan diçin ji Îsraîl re. Yanî pirsgirêkên avê li Îsraîl hene. Bi taybetî ava vexwarinê. Ji bo vê jî Îsraîl Sîna berda, rast ji Misrê re zû berda, lê Golan bernedan,

zûzûka bernade û dibe ku qet jî bernede. Eger rewş wiha berdewam bike, ji ber ku cihekî wê yê stratejîk heye.

**Beramberî Îsraîl Pêşketina Tevger Û Serhildanên(Întîfada) Filîstînê**

Ji wê demê û vir ve rewş wiha sekinî. Piştî wê şerê Lubnanê yê 1982'an çêbû, ji ber ku hêzên Filîstînî hemû di Lubnanê de kom bûbûn, di sala 1982'an de Îsraîl xwest xeteriya wan dûrî xwe bike, ew ji wir derxistin. Lê belê bi hêza leşkerî madî, Îsraîl nikare mesela Filîstînê çareser bike. Hêza wan ya leşkerî di sala 1982'an de di Lubnanê de tesfiye kirin, heta wê demê hevalên me jî li wir şehîd dikevin, dîl hatin girtin.

Lê belê piştî wê êdî serhildanan dest pê kir. Ew serhildan ne wiha serhildaneke jixwe ber bû, di serî de weke çawa bê reng derket, bê duruşme derket, weke çawa rêxistina rizgariya Filîstînî têkiliya wê pê re tine ye derket, lê wiha nebû. Ew serhildan bi temamî bin kontrolê de pêş ket. Bi temamî rêxistina Rizgariya Filîstînî eyar kir, bi rêxistin kir, duruşma wê diyar kirin, lê belê da ku zû neyê tepeserkirin, serhildana ku ji sala 1983'an û şûnda ve dest pê kir.

Navê wê bû Întîfade, ew serhildan bê çek bû, bi kevran bû, lê bi temamî di bin venêrîna rêxistinê de pêş ket. Çima, ji ber ku rêxistinê di aliyê çekdarî de êdî nema dikarî bû destwerdana Îsraîl bike. Ji Lubnanê derketibû, hêza wê ya leşkerî lewaz bûbû, parçe bûbû û yê mayî jî birin Tuns, li wir bi cih bûn. Tuns li ku û Îsraîl li ku dûrî hev in. Di aliyê leşkerî ve nikarîn destwerdanê bikin, ji bo vê li rêkên din geriyan, tê de Îsraîl tengav bikin. Ew rêk jî çi bûn, rêkên serhildanê bûn.

Însanê ku rol lîstin di aliyê tevlîbûneke wan ya mezin di serhildana Filîstîniyan de çêbû, yekî rêvebirekî Filîstîniyan bi navê Xelîl Wezîr, Abo Cihad jê re digotin, di sala 1986'an de Îsraîl ew li Tunsê kuştin. Sedem çi bû, Xelîl Wezîr hostê serhildanan bû. Her tişt bi rengekî planlî pêş dixistin.

Mînak, niha jî carê heval dibêjin çima wiha nabe, hinek tişt jê re plan pêwîst e, wiha tu xwe dayînî holê, jixwe em Kurd nikarin bi xwe, carina gotina ku divê em dawiyê bikin, em li pêşiyê de dikin. Çiqasî em nepenî jî tiştan bigirin, dîsa jî eşker dibin. Lê belê yê wan ne wiha ye. Mînak Xelîl Wezîr dibêje; "Di serî de divê ku nerazîbûn hatiba nîşandan, lê belê weke çawa nerazîbûnek bi temamî FKO serbixwe, yanî bi temamî ji partiya Rizgariya Filîstînê serbixwe be, lê dibêje; "ger me ev pêvajo zêde berdewam bikiriba wê demê dê rêxistin bihata dişteleme kirin. Wê bê mane hatiba dîtin ji bo vê ew jî ne baş bû, ji lewre dem eyar kirin pêwîst bû. Me bi demê re gav bi gav duruşmê rêxistinê derxistin pêş, rengê wê derxist pêş û xîtaba wê derxist pêş. Lê di serî de na, ji ber ku di serî de zû neyê tesfiye kirin, lê digot; " eger me dem dirêj jî bikira bê ku em xwe tê de bidin nîşan dan, wê demê wê alemê gotiba ev FKO ji holê rabûye û êdî gel rabûye, ew jî ji bo me ziyan bû. Ji bo vê diviya bû ku em zemanê wê baş diyar

bikin. Komîtên wê çawa hatine çêkirin, duruşme çawa hatine tesbît kirin. Ev tiştên he hemû hatine çêkirin."

Jixwe Filîstîniyan weke me çalakiyên çekdarî nekirine. Çalakiyên wan demsalî bûn. Weke me nekirine, weke me şer nekirine. Weke me li ber xwe jî nedane, weke me zehf nexebitîne jî. Lê belê awantacê wan çi bûye, têkiliyên wan bi gel re, têkiliyên organîk bûn. Xwezayî bûn, danezanek li Tuns derdixistin, gel tavilê radibû ser piyan. Ew pirsgirêka rêxistina Azadiya gelê Kurd heye.

Ew têkiliya xwezayî bi gel re hîna me baş çênekirine, ger hema her danezaneke me gel pê bikeve nav tevgerê, ew pirsgirêka me hîna jî heye. Di derbaskirina nava tevgerê de, di mitevasyonê de hîna pirsgirêkên me hene. Ew jî ji ber çi ye, ji ber bêrêxistiniyê ye. Yê wan ew pirsgirêka wan zêde tine bû, ji bo vê serhildan (întîfade) pêş xistin.

Çima me ev tişt got, wê demê Îsraîl bi hêza xwe ya madî û leşkerî wê demê nikare mesela Filîstînê çareser bike. Yek jî eger Yahudî mesela Filstînê çareser nekin, mesela Yahudiyan jî ne di ewlekariyê de ye. Bi dijminatiyê ev pirsgirêk çareser nabe.

Ji bo vê Yahud Olmert, carekê dema ku ji ziyaretek xwe ya ji derve de vedigeriya dema ku serokwezîr bû, dema vegeriya Îsraîlê ev tişt got; Em neçarin meselê çareser bikin, ji bo ku Yahudî hebin em neçarin meselê çareser bikin. Ji ber ku pirsgirêk li ser esasê dijminatiyê, înkar kirinê, red kirinê dibe serserbebê ku dawiya wê neyê. Her demê beramberî wê miliyetparêziya Ereb ya li dijî Yahudiyan pêş bikeve. Ev tiştê he dema bû şerê gelan, kes nikare kontrol bike. Di roja me ya îro de kontrol kirina wê zor e. Di rojên li pêşiya me de hê bêtir zortir dibe. Ji bo vê heger Yahudî di Rojhilata Navîn de weke hêmanekî Rojhilata Navîn bimînin girîng e li ser esasê çareseriyekî demokratîk bi gelê herêmê re têkiliyê deyne.

Niha di herêmê de komkujiya Yahudiyan, Ermeniyan, Asurî her çiqasî miliyetparêziya Ereb, fanatîzma dînî ya Îslamî rol tê de heye jî, lê liv û tevger û xeta siyasî ya çîna serwer ya van gelan jî tê de xwedî rol e. Ji ber ku ev gelan gelên herêmê ne, lê belê xwe dikin weke ozantiyekî Rojava.

Mînak Asûrî miletê Rojhilata Navîn e, bingehîn gelê Rojhilata Navîn e. Ermenî gelê Rojhilata Navîn e, yekemîn gelê ku bi awayekî komîn bûne Xiristiyan Ermenî ne. Di Rojhilata Navîn de bûne. Yahudî jî miletê Rojhilata Navîn in, lê belê serkêşiya van gelan, ango desthilatdariya van gelan sermayedarê wan, desthilatdarê wan her demê xwe weke çawa ozantiyekî Rojava nîşandane. Rojava jî ev fektor bikar anîne. Bi çi bi kar anîne, bi dînê Xiristiyantiyê bikar anîne. Vê sedem ji komkujiyan re peyda kiriye. Bala xwe bidinê li vir komkujî ne rewan e, lê sedemên komkujiyan hene, di asta yekemîn de emperyalîzm di ber de berpirsiyar e.

Fransa û Îngilîz bi rengekî çewt dema xwestin kerta Ermenî, Asûrî, bileyîzin û di roja me ya îro de jî bi kerta Yahudî dileyîzin, di heman demê de van gelan dikin qurbanê siyaseta xwe. Ji bo vê çareserkirina pirsgirêkê bi demokratîkbûyîna hundirîn çêdibe. Yanî Yahudî di nava xwe de demokrat bibin, li ser vî esasî têkiliyên demokratîk bi derdora xwe re deyînin û wê çaxê pirsgirêka Yahudiyan çareser dibe.

Pirsgirêkek din ya Yahudiyan heye, pirsgirêka yekdestiyê ye. Yahudî yekdestiyê didin ava kirin, çapemenî di destê Yahudiyan de ye. Sermaye di destê wan de ye, huner di destê wan de ye hwd, ev yekdestî dibe serserbebê ku beramberî wê timî çavnebarî qsqancibûyîn çêbibe. Ew çavnebarî her demê dibe sersebebê ku Yahudî weke hedef bên nîşandan û her demê zemînekî êrîşê be. Dibe ku bû çil-pêncî sal e hinekî xwe parastine, lê heta kengê wê xwe biparêz in?!

Ji bo vê demokratîkirina hundirîn, agno dûrketina ji yekdestîbûnê ye. Ji siyaseta yekdestiyê dûr ketina ji wê siyaseta yekdestiyê di heman demê de Yahudiyan ji zemînê komkujiyan jî derdixîne. Yanî xeteriya li ser wan jî radike.

Heta niha têgihîştinekî ku li ser esasê demokrasiyekî ku tê de Yahudî jî cih bigirin, zemînekî li ser vî esasî peyda nebûye. Heta niha beramberî kûrbûna miliyetgeriyê, ya Ereban jî ev her dem bi şeran bi encam dibe. Di roja me ya îro de jî bi taybetî di şexsê partiya Hemas de, di kesayeta hinek komên miliyetparêz ên din de, hîna zêdetir ev di eniya Ereban kûr dibe, di eniya Yahudiyan de jî bi vî rengî kûr dibe. Weke dijberiyê ku hev têr bikin pêş dikevin.

Jixwe hêzên navnetewî û herêmî jî li gorî berjewendiyên xwe dinirxînin. Mînak Îran her demê dixwaze Hemas li diji Îsraîl şer bike. Ji ber çi; ji ber ku eger astengekî di beramberî Îsraîl de tine be, wê Îsraîl hîna zêdetir bikaribe gefan li Îranê bixwe. Ji bo vê miliyetgeriya Ereb, dînparêziya Fars her demê dixwezin bi hêzên Îslamî û miliyetparêz ên Ereb di Filîstînê de xwe biparêzin.

Ji lewre jî Yahudî jî li ser esasê fikirê dewlet netewê, sermayedar, desthilatdariyê hem ji bo Yahudiyan, hem jî ji bo sermaya navnetewî wek erkekî vê siyaseta dewletê ya fermî dide meşandin.

Jixwe li ser konima dewleta Îsraîl, girîngiya wê ji bo siyaseta emperyalîst em ê rawestin. Lê bi gelemperî rewşa Îsraîl ev e. Di rastiyê de hemû Yahudî hemû ne li Îsraîl in. Yahudiyên li Îsraîl de jî hemû ne yek in. Di civaka Yahudiyan de nakokiyên kûr zêde tine ne. Ji ber ku şovenîzm heye. Ji ber ku miliyetparêzî heye, miliyetgerî weke dînekî nakokiyên çînî, siyasî kêm dike. Bi propogandayekî taybet vê kêm dike.

Bi taybet van nakokiyan kêm dike. Ji bo vê mirov wiha dema ji der ve de lê temaş dike, mirov dibêje qey weke civakekî ku tê de motabeqat heye, ewqasî jî nine. Mînak niha di nav Îsraîl de di navbêna Yahudiyên Rojhilat û Rojava de nakokî hene. Heta

hinek Yahudî hene zêde qîmeta wan tine ye. Bi taybetî ev Yahudiyên ji Efrîqiya anîne, wek leşkeran wan didin xebitandin.

Milîtalîzm gav bi gav di civaka Îsraîl de lewaz dibe. Ji ber ku civaka Îsraîl hemû leşker in. Jin jî leşker in, mêr jî leşker in. Qîzên Yahudiyan diçin leşkeriyê, zilamê wan jî diçin leşeriyê. Dema ku qîz bizewice dikare ji leşkeriyê derbikeve.

Lê di dema dawiyê de pir rexne pêş dikevin, gelek jinên Yahudî li ser enternetê demej didin û tînin ziman ka di leşkeriyê de çawa cewherê xwe wenda kirine. Çawa dirinde bûne, çawa ketine xizmeta sîstemê, çawa xerabî kirine, li xwe mukur tên.

Ev gav bi gav milîtarîzmê di civaka Yahudî de hinekî lewaz dibe, qels dibe. Heta beramberî pêkanînên dewletê li dijî Ereban dengên wiha demokratîk, li dijî sîstemê, bi rengê mîtîngan, bi rengê meşan, derdikevin.

Lê belê Yahudî sîstema nav netewî jî wan ji bi xwe dixebitîne. Bi taybetî dema di Rojhilata Navîn de bi cih kirine ji bo Yahudiyan na, ji bo Îngilîz dilê wan bi Yahudiyan şewitiye û welatek ji wan re çêkirin na, ji ber ku her demê biryargehek wan di vir de hebe pê herêmê kontrol bike. Bi xelkê herêmê re dijber be, têkiliyê wan bi hev re tine be, tenê dijmin be, bi vî rengî her demê karibin herêmê kontrol bikin.

Dînamîkê herêmê qels bike. Emperyalîzmê ji bo vê ew dewlet çêkiriye. Ji bo vê heger Yahudî bixwazin jî nikarin demokrat bin. Ji ber ku sîstema navnetewî ya kapîtalîst, her demê misyonek daye Yahudiyan û daye Îsraîl. Ev misyon jî dijberiya xelkê herêmê ye, kontrolkirina dînamîkê di hundirê herêmê de ye. Ji bo vê pirsgirêkekî cidî ye.

Ji lewre demokrasîkirina hundirîn wê pirsgirêka Yahudiyan jî çareser bike. Ji bo vê derbarê Yahudî, Ermenî û Asûriyan de di parêznamên Rêbertiyê de parçe parçe hatine dest girtin, di rastiyê de çavkaniyên pirsgirêka wan heman tişt e, çavkaniya pirsgirêkên wan desthilatdarên wan e, sermayedarên wan e, nêzîkbûnên miliyetparêz in, girêdanên bi derve re ne.

**Rêka çareseriyê jî demokratîk kirina hundirîne, bi vî rengî mirov bigire dest wê rastir bibe. Derbarê Yahudiyan û Îsraîl de jî ev, êdî bi vî rengî şekildaneke siyasî li Rojhilata Navîn çêdibe. Dewletekî navendî Tirik, Fars, gelek dewletên Ereban yên cuda cuda, bi rengê xwe yê siyasî, Kurdistaneke înkar kirî, Îsraîlek biyanîbûyî hatiye çêkirin. Bi vî rengî kaos di aliyê xwe yê siyasî ve kaosa Rojhilata Navîn qat bi qat kûrtir dibe û di serdema kapîtalîzma cîhanî de.**

### Bandora Miliyetgeriya Cemal Abdul Nasir Li Ser Tevgera Rizgariya Filîstînê

Li ser bingeha ku di Misrê de miliyeteriya pêş ketî, serkeftinên ku Cemal Ebdul Nasir bi xwe re anîn, di nava Ereban de tevgerekî bi navê tevgera miliyetger ya Ereb derket pêş. Bi Ereb jê re dibêjin tevgera Miliyetgeriya Ereban, yan jî Tevgera

Miliyetgerên Ereb, derket pêş. Di encamê vê tevgerê de, tevgera Rizgariya Filîstanî çêbû. Serokê vê tevgera Rizgariya Filîstînî Erefat bû, ji xwe kesyetek Filîstînî bû, lê li Misrê bûye, endezyar bûye, di tevgera miliyetger ya Ereb de bûye. Tevgera miliyetger a Ereb di nav xwe de li gorî wezîfan perçebû, lê girêdanên wê yên organîk hebûn. Di sala 1964'an û şûnda bi rengekî resmî rêxistina Rizgariya Filîstînê pêş ket.

Ji lewre piştî binkeftina sala 1967'an, ya Ereb rû bi rû pê re man, tevgera Filîstînî misyonek dîtir ji bo xwe peyda kir. Yanî tevgera Filîstînî weke perçekê ji tevgera giştî ya milî Ereb na, vê carê hîna bêtir cewherê xwe qezenc kir, hîna bêtir bi xwe re bo mudaxîl, êdî bendewariyek wan ji Ereban zêde nema, li benda Ereban bin ku bi hev re li Îsraîl bixin, bi vî rengî mesela Filîstînê çareser bikin na, di rêka şerê çekdarî de gav bi gav Filîstînê bi vî rengî rizgar bikin.

Piştî vê binkeftinê tiştek din jî derket, di civaka Filîstînî de perçebûn çêbû. yanî ferq û cudatiya di nava feqîran û dewlemendiyê de, di nava multeciyan de bi vî rengî, di nava bizavên siyasî de bi vî rengî. Bi taybetî pêşketina çepên şoreşger di cîhanê de hebûn, tevgera Vetnamê, çepê Ewrûpa, tevgera ciwanan ya di sala 1968'an û gelek tevgerên din di cîhanê de ev çalakiyekî wer çêkir, çep bi ser dikevin. Rast bi ser nakevin, di esas de qerekterê tevgera rizgariya Filîstînî qerekterek rast e, yanî rasgir e, yê ku Erefat jê re serkêşiyê dike. Ji bo vê hinek kesên dîtir derketin, Corc Hebeş, Nayîf Hewatimê, hinek kesên din jî wer şoreşger bûn, şoreşgerên radîkal bûn. Baweriya wan bi Marksîzmê Lenînîzmê dihat, xwe di cîhanê de kirin parçek ji tevgera çep. Tevger di sala 1968'an de tevgera çep di nava Filîstîniyan de derket.

### Li Filîstînê Pêşketina Tevgera Çep

Tevgera çep derketina wê jî hinekî jî rengê PKK'ê tê de hebû. Lê belê zêde dewletger bû. Zêde girêdayî Sovyetê bû. Zêde girêdayî dewletên ên di nava Ereban de li dijî Îsraîl bûn. Ji bo vê weke PKK'ê serbixwe nebû. Lê belê sedem ev bû, çi bo ew sedem? Bêhêvitiya li beramberî partiyên komunist ên kilasîk bûn, rexnên li ser Sovytê bûn û dîtina nakokiyên çînî di nava civaka Filîstînî de bû. Hema hema zemînê derketina tevgera çepger ya di Filîstînê de, tevgera çepger ya bi navê PKK'ê di Kurdistanê de, sedemê pêşketin û derketina wan yek bûn.

Lê belê liv û tevger, yek neman. PKK'ê bi îsrar serxwebûna xwe diparast, lê wan nikarîbû biparêzin. Ji lewre di nava wan nakokiyan de nikarîbûn xwe biparêzin.

PKK'ê serxwebûna xwe çawa parast, PKK'ê serxwebûna xwe bi înadê parast. Bi tiştê biçûk razî bû, wer parast. Bi birçîbûnê razîbû parast, bi feqîrtiyê razî bû, parast, bi veşartinê razîbû parast. Yê wan tevlî van encaman nebûn. Yanî li derfetan digeriyan, dema ku însan derfetan bixwaze, divê ku beramberî wê jî tewîzê jî bidin. Ji lewre tewîz dan jî. Lê pêşketine mezin bû di qada Filîstînê de. Bandora li ser hemû cîhana Erebî jî kir. Heta

ew tevger dikarîbû di Yemen de bibe dewlet, di Yemenê de perçek ji Yemana başûr desthilatî bi destê xwe xistin wer ma heta salên 1987'an.

Tevgera Filîstînî bi xwe xwest meselê xwe çareser bike, lê belê pir xwe zêde spart ( dayeleyî) îltîcayê bû. Demekê li ser Urdunê kom bûn, kûr bûn. hêjmara Filîstîniyan li Urdunê ji xelkê Urdunê zêdetir bû. Hêjmara Filîstîniyan zêde bû. Vê carê hêza leşkerî Filîstînî jî ket Urdunê, piştî demekê qiralê Urdunê dît ku însaytîf ji dest wî derdikeve. Ango Filîstînî hêz in, rêka qontrol dikin, venêrînê li ser gel dikin, nizanim çi dikin, çi dikin... Ji lewre Îsraîlî jî nerehet bû, ji ber ku di Urdunê de hêza Filîstînê ewqasî xurt bibe li ser sînorê wê nerehet bû. Ji bo vê komplok çêkirin, komkujiyek mezin ji Filîstîniyan re çêkirin.

Ew komkujî bi zêdeyî tevgera çep encamê wê girt. Yanî esas li dijî hemû hêzên Filîstîniyan bû, lê bi giranî çep derbe xwar, ew pûç kirin. Gelek ji wan kuştin, di lîteretora Filîstîniyan de bi navê Eylûla Reş, di sala 1970'î de Eylûla Reş li Urdunê li dijî wan çêbû.

Vê carê ji Urdun derketin ketin Lubnanê, di Lubnanê de jî bi ser xwe ve çûn. Filîstînî bi hêza xwe ya leşkerî, bi derfetên xwe yên madî bi ser xwe ve diçin. Li şûna têkiliyên hevaltiyê bi tevgera rizgariya netewî Lubnan re çêbikin, têkiliyê bi lîsayet re çêdikin. Hêza leşkerî bi dest wan de bû, hêza peran bi dest wan de bû. Hemû cîhanê pere didan wan, tevgerê Filîstînê tangên wan hebûn, panzêrê wan hebûn, maşîn, herêmên di bin venêrîna wan de hebûn, pere mûçe, vêca hinek rêxistin hebûn zêde zêde mûçe didan. Hinek rêxistin hebûn kêm didan, lê bi giranî mûçe didan.

Maşîn ji bo wan, fon ji bo wan vekirîbûn, Soveytê, gelek welatên din jî pere didan wan. Pir bi ser xwe ve çûn. Bûn weke desthilatiyê, ji desthilatiyê jî xerabtir. Ji bo vê dema ku Îsraîl di sala 1982'an de êrîş kir, ne wan zêde li ber xwe dan, derfetên madî zêde bi ser xwe ve çûbûn, rizandin (dejenerebûn) di nava wan de çêbûbû. Heta mînak hevalên me hinekê bi prensîb bûn, nêzîkbûnên wan şoreşgerî bûn, wan henekê xwe li hevalên me dikirin. Digotin "berê em jî wiha bûn."

Di sala 1982'an de, xalek şkestinê di aliyê leşkerî de cidî bi Filîstîniyan re çêbû, hêza wan ya leşkerî bi giranî derket. Niha di Lubnanê de hene, lê çawa bi taybetî kampên pinaberan di bin venêrîna wan de ne. Heta niha hikumeta Lubnanê nikare wan qampan kontrol bike. Ew bi xwe bi xwe, xwe kontrol dikin. Ew awantacê wan heye. Lê belê weke berê bi hêzekî leşkerî mezin ku karibe Îsraîl tehdît bike na, encax niha hêza ku Îsraîl tehdîke li Lubnanê bi taybetî li başûrê Lubnanê de, hêza Hizblah e.

Filîstînî tevgera wê ya rast, di nava xwe de hinek perçebûn jî jiya. Lê belê dîsa bi alîkariya paşverûtiya Ereb her demê li ser piya man. Yanî bihêz ma, bi taybetî heta ku Erefat sax bû. Îro jî di parçek Filîstînê de, desthilatdar in. Di roja îro de yên weke Mehmud EBeasbermayê wê ne.

Tevgera çep li Urdunê lêdan xwar. Wê ew lewaz kir, ji bo vê tesfiyegerî dî nav de pêş ket.Tesfiyegeri çi ye? Tesfiyegeri ew dema ku tu ji armancê xwe dûr bikevî. Ev hinekê pêş ket, encamê wê di nava wan de hêzek derket, gelekî ji wan re dostaniya me jî bi wan re hebû di esas de. Hêzek derket got; "Ji binîve çareseri na, lê çareseriyên demî, hinek xal danîn û gotitin, em ê wiha bikin, wiha bikin, bi vî rengî em ê çareseriyê bikin."Ev bi rêhberiya keseki navê wî Nayîf Hewatimê bû. Nayîf Hewatimê ji Corc Hebeş parçe bû, di salê 1970'î û şûnda, eniyek din çêkir, navê wê Aniya (cebha) Demokratîk bû. Ew jî Marksîst bû, têkiliya me zêde jî bi wan re hebû, heta stargehên me jî nêzîkî hevdu bûn. Berê hevalan lî stargehên wan jî hevalan perwerde didît.

Di pişt re ji heman bizavê kesimeki din derket bi temamî bi desteka Lîbiya, perên wan, mûçê wan, çekên wan, her tiştên wan ji aliyê Lîbiya ve dihat dayîn, ji aliyê Lîbiya de dihate dayin. Ew jî Eniya Gelêrî bû, rêveberiya gîşti, genel onderlika. Navê xwe wiha lê kirin, navê serokê wan Ehmed Cibrîl bû. Yekî din bi alîkariya Îraqê derket, ew jî çep bûn Îraqê ew destek dikirin, ji wan re digotin Xebata Gelêrî, Nîdal şeabî bû. Serokê wan Semîr Xoşî bû hwd, di pişt re yek derket navê wî Teleat Yaqûb bû, ew jî çep bû, ew jî bi navê Eniya Rizgariyê derket. Yanî tevgera çep pir parçe bû, di nava Filîstîniyan de. Niha jî zêde bandora wê tine ye, tevger heye, çalakiyan jî dikin, serokê wan yê Eniya Gelêrî li Îsraîlê di zindanê de ye, lê belê weke hêza rastgir bihêz nînin. Jixwe hêza Îslamî di aliyê girsayî de hemû jî derBeaskirine. Tevgera Filîstîniyan bi vî rengî ye, yanî teşegertina wê, bi vî rengî ye. Lê belê rewşa ku di roja me ya îro de dijîn, ew tiştek din e.

**Mezhebê Şîa Ne Binesaziyek Homojen E**

Bêguman niha mesela şîa û dîn taybetmendiyên wan yên hevbeş hene, ew jî dîn e. Şîa ne binesaziyek (yapi) homojen e, hemû weke hev in, weke hev difikirin, ji ber ku şîayên Fars hene, yên Kurd hene, Ereb hene. Yên cuda cuda hene. Li Pakistan şîa hene, li Efxanistan hene, yanî li her derê cîhanê şîa hene. Nakokî di navbera wan de hene.

Lê hinek tiştên wan yên hevbeş hene. Baweriya wan yek e, hestên wan yek e, di aliyê wijdanî de ji bo heman tiştî digirîn, li xwe didin, ango ev tiştên ku wan hevbeş dike.

Di esas de hêza otorîte di nava şîa de her demê Necef bû, navenda îlmi şîayî timî Necef bû. Necef mezerê HZ. Elî tê de ye. Ji bo vê serokê dînî, yê şîa her demê ji wir derdiketin.

Piştî şoreş di Îranê de çêbû, şîayên Îranê bûn desthilatdar, vêcarê Necef bêdeng bû, ji ber ku Sedam ew bêdeng kiribûn. Rêberê şîa yê mezin kuştibû, hinek bera wan da bû. Pîrozbahiyê wan, çûna wan ya Kerbela qedexe kiribû, mînak di salê 1970'î de kes nediçû Kerbela, heta van salên dawiyê, ew jî piştî ku Emerîka ket Îraqê gel çûn Kerbelayê. Berê çûna Kerbela qedexe bû, ji bo vê navenda şîayî, di Îraqê de paş ket, di Îranê de pêş ket.

Îranê şîa ji bo xwe dan pêş. Îranê got; êdî zemanê tevgera milî derbasbûye, zemanê hatî yê tevgera dînî ye. Li dijî Emperyalîzmê dîn em dikarin şer bikin, bi miliyetgeriyê na, ji bo vê Xumeyînî banî Erefat kir û jê re got; " were dev ji mesela qewmiya Erebî berde, were dînger be û em bi hevdu re kar bikin." Erefat qebûl nekir. Îranê tevgera dînî esas girt, ji dînî jî şîaytî esas girt.

Lê bandora wê li ser şîa heye, mînak tevgera siyasî şîayî ya li Îraqê bandora Îranê pir li ser heye, Hzbilaha Lubnanê Îranê bi xwe çêkir. Navê tevgera şîayî berê di Lubnanê de ne Hzbilah bû, berê Emel bû( hêvî) niha jî tevgera Emel hîna jî heye. Kê Emel çêkir, bi alîkariya Lîbiya yak navê wî Musa Sedirî çêkir.

Mûsa Sedir li Lubanê bû şîayî bû tevgera (mustedaîfîn eal erd), niha jî li Tirkiyê navê xwe kirine mustedaef, mustedeaf tê wateya mirovên feqîr, wan çêkir.

Di pişt re Qezafî dît ku ew zilam hinekî sîxûriya Îsraîl dike, lê ket gumanê, Qezafî banî wî kir û ew wenda kir. Heta niha jî wenda ye. Kes nizane bi ku de çû, tenê Qezafî dizane bi ku de çû. Qezafî jî ger van rojên dawiyê eger behsê bike jî, nizanim! Qezafî pê hesiya ku ew zilam pê re xiyanetê dike. Ji ber ku Qezafî bi peran, bi hemû derfetan destek kir ji bo ku serkevin. Tevgerek feqîr bûn, şîa di Lubananê de feqîr bûn. Îranê dît ku bi Emelê nikarin baş kontrol bikin, diplomatê Îranî Hzbilah çêkirin. Bi temamî Hzbilaha Lubnanê bi fikrê Îranê hate damezirandin. Bandora wê heye, li Îraqê heye, li gelek cihan heye.

Lê divê ku hinekê mirov rasteqînî be, nifûsa Îraqê ji serê sedî şêst şîa ye. Heşt salan Îraq û Îranê şer kirin, eger ew serê sedî şêst bi temamî bi Îranê re tevgeriyabana, Sedam nikarîbû bi Îranê re şer bike. Tevî ku şîa bûn jî, lê bi yekî biyanî ve nebûn dijminê dewleta xwe. Ev rastî heye, divê ku mirov qebûl bike. Eger ev rastî nebe, wê çawa Sedam karîbû xwe bide milekî Kurd, milekî qismî be ji Sunî, serê sedî şêst jî şîa, lê tevî wilo jî Îraqê bi Îranê re heşt salan şer kir.

Ji bo vê tam mekanîk nîne, lê bi bandor e. Mînak di roja me ya îro de Îran êdî şîayê Kendavê şiyar dike. Îran sor dike, lê belê miliyetgerî jî di encamê de heye, yanî herî dawiyê Ereb in. Di wan aliyan de jî divê ku mirov wiha zêde mekanîk lê temaş neke. Lê Îran em bixwazin nexwazin, li ser cîhana şîayî bi bandor e, ji bo ecendên xwe yên siyasî her demê dixwaze bixebitîne. Ango her demê dixebitîne jî.

Lewre mijara Îraq û Îranê, Îraq dewletek sosyal nîne. Miliyetger bû, radîkal bû, Îsraîl, Îran, car carna jî Tirik nerehet dikirin bi wan gotinên xwe yên milî, ev dibû sersebebê ku Emerîka jê aciz bibe, bitepisîne. Lê belê di sala 1975'an û şûnda teslîm bû. Piştî îtîfaqa Cezaîr û şûnda Îraq teslîm bû, Îraq teslîm girtin. Rast e, behsa dijîtiya Îsraîl dikirin, hwd, lê teslîm hatibû girtin. Têkiliyên xwe yên tîcarî hemû bi Ewrûpa re bûn. Biçekbûna xwe jî bi Ewrûpa re bû. Mînak balafirên zêde yên Îraqê ne yên Rusî bûn, mîd felan bûn, mîrac bûn ên Fransî bûn, gelek

tiştên wan ên dîtir Fransî bûn. Reyektorên nukler Îraqê dixwest çêbike, Îsraîl lê da teqand û nehişt çêbiki. Bi balafiran bi dizî lê dan, rojekê lê dan û çûn. Wê demê Fransa jê re çêdikir.

Îraq teslîmî emperyalîzmê bûbû. Îraq weke netew ji hevpeymana Cezaîrê ne rezîbûn. Ji ber çi ne razî bûn, di bin darê zorê de qebûl kirin, di bin tepeserkirina Kurdan de qebûl kirin. Ji ber vê Îraq her demê li frsendekê digeriya da ku wê stoxwariyê careke din ji holê rabike. Heta şah hebû nikarîbûn, dema şah hilweşiya Îraqê ev got; me ev îtîfaq di zemanê şah de çêkiriye, ew îtîfaq ne derbasdar e.

Dewletên Kendavê, Siûdî, Kuwêt hwd, gotin Sedam bavê me ye, Sedam Rêberê Ereban e, parazvanê deriyê Rojhilatê Ereba ye, rojnamên Kendavê hemûyan li ser helbest dinivîsîn. Ew ji Îrana nû ditirsiyan, ji Îrana şoreşger, dînger hwd, Emerîka jî jê tirsiya.

Emerîka roniya kesk ji Îraqê re vêxist ku êrîşî Îranê bike. Çekên Sedam hebûn, alîkariya Emerîka jê re hebû. Alkariya peran Siûdî, Kuwêt, bi milyonên dolaran didanê. Heta niha jî Îraq deyndarê wan yê wê çaxê ye. Bêsînor destek kirin, ji ber çi, da ku Îran rawestîne.

Emrîka çi difikire? Emerîka li vê difikire, Îran li dijî Emerîka rabe, lê belê ev demborî bû, ji bo vê Îraqê êrîşî Îranê bike, Îran belav bibe, artêşa wê belav bibe, subayî hatine avêtin, henek wê çaxê wê neçar bibe çi bike? Ya yekemîn; neçare bibe banî wan fermandarên kevn bike, ji xwe ew fermandar ên artêşê ne. Artêş jî di destê Emerîka de ye. Eger ew fermandarên kevn careke din vegerin Îranê û erkê bigirin û di artêşê de bibin xwedî biryar, wê demê Emerîka bi rengekî ji rengan kontrol dike. Ev ya yekê ye.

Ya duyemîn, ji şer re çek pêwîst e, çekên Îranê hemû Emerîkî ne, yanî tangek vîdek wê xerab bibe, ew tang sekînî. Wê Îran wê vîdê ji ku bîne, wê cardin Îran ji Emerîka bîne. Ji bo vê heger êrîşek li ser Îranê çêbibe, Îran çiqasî behsa durûşman bike, li dijî Emerîka hwd, van bêje jî, lê di encamê de wê neçar bibe cardin biçe ber lingê Emerîka, Emerîka wê careke din bi rengê şah na, lê wê bi rengekî ji rengan bixwaze kontrola xwe di Îranê de vegerîne.

Lê belê Îranê ev nekir, bi hinek faktorên din şer kirin, ji bo vê jî ew encam nehat girtin. Ev şer gîhaşt asta xetimandinê. Ne wî qezenc kir, ne jî yê din qezenc kir. Bi milyonan însan hatin kuştin, ji her du aliyan nêzîkî du milyon însan hate kuştin. Erdnîgarî gemarî bo, ji kemyasalan, alt yapî xerb bû, her du jî neçar man wî şerî bisekinînin. Sedemê destek kirina Emerîka ji Îraqê re, Îran neçarîkirina ku careke din vegere bin venêrîna wê.

**Kemalîzm Û Layîsîzm**

Mesela Kemalîzm û dîngeriyê, kemalîzm li dijî dîngeriyê ye, layiktiyê esas dîgîre. Laykbûn çi ye? Yanî Rojavabûyîna

Ewrûpa esas digre û dîn û dewletê ji hevdu cuda digire dest. Hêza dînî ji lewre tesfiye jî kir, bi gelek şêwazan tesfiye kir.

Lê belê piştî şerê cîhanê yê duyemîn, di serdema şerê sar de her demê li dijî komunîstan, li dijî Kurdan li Tirkiyê dîngerî hatiye bi kar anîn. Hatiye bikar anîn, şêst salan bênavber dîngerî li dijî tevgera demokratîk şoreşger hate bikar anîn, di wî şêst salî de dîngeran karîbûn careke din di aliyê ekonomî de xwe bihêz bikin û di saziyên dewletê de xwe bi cih bikin. Bi dizî be jî xwe bi cih bikin. Yanî bê berdêl ev xizmet jî ji sîstemê re nekir.

Di ser dema me ya nû de, niha di Tirkiyê de dînger sermaya kesk pir serwer in. Bêdeng in, lê pir dewlemendin. Yanî dewlemendên Tirkiyê bi navûdeng in, timî li ber çavan e. Lê belê yên Anadolê yên Koniya, Keyserî bêdeng mezin dibin. Niha jî êdî xwe îfade dikin, zêde zêde dewlemendin, niha di lîteratora ekonomî de navê wan kirine Plingên Anadolê.

Di aliyê ekonomî de, ji lewre AKP'ê di aliyê siyasî de jî desthilatî xistine destê xwe, lê belê sîstema miliyetger a Kemalîst, ya dewletger, dewlet netewa Tirkiyê şoven, nijadparêz, ev sîstem her demê dînger e. Nasnama vê sîstemê ev e, milek wê nijadperest e, yek jî dînperest e.

Ji bo vê sîstema Tirkiyê her demê, ji dema ku çêbûye heta roja me ya îro her demê qada wê ya çûn û hatinê di nav çi û çi de ye? Di nava faşîzm û dîngeriyê de ye, çûye û hatiye. Her demê faşîzm û dîngeriyê xwe timî li ser piyan hiştiye. Heta roja me ya îro jî heman lîstik berdewam e.

Mînak, artêş ne Kemalîst e, di asta yekemîn di Tirkiyê de, lê di roja me ya îro de dîngerî kê bingehê wê danî? Kenan Evren danî, dibistanên Îmam Xetîb, bi zorê di hundirê zindanê de bi wan nimêjê didan kirin, rojî gortin hwd. Ev hemû Kenan Evren dikir. Ji bo vê rast e sîstemek di destpêkê de dînger bertaraf kirin, di pişt re Kurd, ev hene. Lê dîngerî weke çekekê ji bo tesfiye kirina tevgera demokratîk di Tirkiyê de bi kar aniye, di roja me ya îro de jî dîn ji bo hegemoniya li ser Rojhilata Navîn bikar tînin.

### Pêşketina Tevgerên Serbixwe

Tv tevgerên bê Teref,  di navbera her du parzemînên ku cîhan kiribûn du qutup hate avakirin, di nava van her du qutuban de, hevsengiyeke ku di navbera van her du qutuban de çêkirî jî hinek hêzên navnetewî bûn û xwestin jî wê hevsenghiyê sûd bigirin û xetekî serbixwe ji bo xwe esas bigirin. Lê çiqasî serbixwe ye, ew mijareke nîqaşê ye.

Lê di encamê de kapîtalîzmê ji wê tevgerê fayde dît, ji ber ku di encamê de niha hemû di eniya kapîtalîzmê de cih digirin. Kî bûn ev tevger? Yên serkêşî ji vê tevgerê re çêkirîn kî bûn?

Sê kesên wiha bi nav û deng bûn, yek Nehro bû, yê din Tîto bû, yê din jî Cemal Ebdul Nasir bû. Misr, Yoxuzlafiya û Hindistan bû. Van tevgerek çêkirin, bi navê dewletên bê teref, terefsîz, yanî ne Rojava ne jî Rojhilat, ne sosyalîst ne emperyalîst,

xetekî serbixwe ji bo xwe girtin. Wan ji dengê sûd girtin. Denga di navbera her du parzemînan heye, jê sûd girtin di roja me ya îro de ji xwe ti eserê wan tevgeran jî tine ye. Ji ber ku ne Misr, ne Hindistan, ne jî Yoxuzlafiya, jixwe rewşa wan bi xwe tevlîhev bûye, tevgerek bi vî rengî nemaye. Di sala 1956'an, di van deman de çêbûye. Lê belê yên ku jê re rêbertî kirin, Nehro serokê Hindê bû, Tîto serokê Yoxuzlafiya, Cemal Ebdul Nasir bû.

**Bandora Emperyalîzmê Li Ser Kûrbûna Krîza Rojhilata Navîn**

Emperyalîzm li Rojhilata Navîn çi dike, ji Rojhilata Navîn çi dixwaze? Em ê vê xal bi xal bigirin dest. Da ku wiha tevlîhev nebin. Bi awayekî şînber daxwaziyên emperyalîzmê di Rojhilata Navîn de çi ye? Bi çi awayî siyaseta xwe pêk tîne?

Berî her tiştî ya yekemîn, emperyalîzm her demê armancê wê li Rojhilata Navîn gewdekî nexweş e, li Rojhilata Navîn weke gewdeyekî nexweş e. Ev nexweşî bi çi çêdibe? Bi yunlendirmê, lê ji yunlendirmê zêdetir, her demê çavkaniyên nexweşiyê li Rojhilata Navîn bihêle. Yanî her demê tiştên hebin bibin sersebebê nakokiyan li Rojhilata Navîn. Ji bo vê emperyalîzm, dema ku ji herêmê derket, bi rengê xwe yê leşkerî hinek sebebên nakokiyan hiştin û çareser nekir.

Yek ji van sedeman, mînak mesela Kurdî çareser nekir û çû. Lê halbike hêza emperyalîzmê ya ku mesela Kurdî çareser bike, biçe hebû. Statuya Kurd nas bikiriba, li gorî wê di hundirê Kurdistanê de ji bo bi rengekî xweser gelê Kurd xwe birêve bibe karîbû tiştekî wiha bikiriba, ji ber ku di venêrîna wê de bû.

Ev çareser nekir, ti statu ji bo Kurdan neda nîşandan, bi vî rengî bê ku wê statuyê diyar bike derket. Vê heta roja îro jî bû sersebebê ku her demê di navbera Kurd, Tirik, Fars û Ereban de her demê nakokî, şer û qirkirin, dewam bike. Ev her demê bibe sebebek ku emperyalîzm kîjan roja bixwaze, kaxeta Kurdan ji bo ku tewîzan ji Ereb, Fars û Tirkan bigire, kaxeta Kurdan bide xebitandin.

Ji lewre mesele ne tenê Kurd in. Gelek nakokiyên dîtir hene, emperyalîzm sînorê di navbera dewletên Rojhilata Navîn de li ser esasê cedwelê çêkir, yanî li ser esasekî xwezayî çênekir. Da ku Ereb û Tirik her demê li dijî hev bin, ji bo ku yektiyek di navbera Tirik û Ereban de çênebe, her demê wer têkiliyên di navbera Ereb û Tirkan de her demê li ser esasê şovenîzmê, li ser esasê red kirinê be, pirsgirêka Mûslê her demê weke pirsgirêkekî nakok ma. Gelo Mûsil ya Tirika ye, yan ya Ereba ye, yan jî ya Kurda ye? Ji bo vê Tirkan her demê, ango miliyegerên Tirik her demê îdiaya wan ya Mîsaqê Milî hebû.

Îdiaya mîsaqê milî çawa ye? Îdiaya dibêje ku Mûsil parçek ji Tirkiyê ye, lê bi darê zorê hatiye girtin. Ji bo vê her demê têkiliyên di navbera Îraq û Tirkiyê de li ser esasê gumanan e.

Dîsa Fransa parçek ji nifûsên xwe, yanî di bin venêrîna wê de bû ew li ser serwer bû, ji nişkê ve bê ku sedemek hebe, xelatî Tirkiyê kir. Ev herêma ku em jê re dibêjin, Skenderon, Antakiya, ev herêm parçek ji nexşeya Sûriyê ye, gelên tê de jî di rastiyê de Ereb bûn. Di bin destê Fransa de bû, lê bê ku mirov sedeman fêm bike, Fransa ji nişkê ve ew herêm xelatî Tirkiyê kir.

Çima xelatî Tirkiyê kir? Lê belê ti carî Sûriyê heta sala sala 1998'an yanî heta îtîfaqa Edenê, Sûriyê ew meşrûa qebûl nekir. Her demê di nexşeya Sûriyê de parçek ji Ereda xwe weke kilît Îskenderon Entakiya, nîşan dide. Ev her demê nerehetiyê li gel Tirkan çêdike.

Tirkan çi kir, gotin rast e ev ne Tirkiyê ye, Ereb in, ji bo vê cumhuriyetek çêkirin, cumhuriyeta Entakiya di sala 1937'an de, di pişt re wê cumhuriyetê got, em tevlî Tirkiyê dibin, bi vî rengî xwe tevlî Tirkiyê kirin û heta roja me ya îro jî Tirkiyê ye. Ev jî sedemek bi nakoke.

Di navbera Kuwêt û Îraqê de herêmek heye jê re dibêjin herêma bê teref, di wir de jî nediyariyek heye. Ew herêm ya Îraqê ye, ya Kuwêtê ye kes nizane. Îraq hinekê bihêz dibe dibêje ev Kuwêt jixwe çêkiriye (yapayi ye), jixwe Sedam ev mesele wer derxist pêş û Kuwêt dagirkir. Kuwêt jî her demê nerehet e. Her demê tirsa Îraqê li ser heye. Ji bo vê her demê di welatê xwe de hêzên biyanî dihêle da ku wan ji Îraqê biparêz e.

Îspaniya ji Fasê derket, yanî ji Mexrebê derket, lê statuya herêmekî jê re dibêjin Çola Xerbî, di zemanê xwe de eniyek lê dixebitî jê re digotin Polîsariyo, di wir de nediyariyek heye. Herêmeke li ser oknosê ye, fosfar tê de heye, eşîre qebîlên çolê tê de dijîn, lê qet statuya wê ne diyar e. Ji bo vê wan gotin em dewletek in, em dewletek serbixwe ne, Fas jî dibêje; na ev erda min e, heta roja me ya îro jî şer berdewam dike.

Ji lewre ew şer çi dike, ew li dijî Fasê şer dikin, Cezaîr wan destek dike. Herweha vê carê jî Cezaîr û Fas dijminê hev in. Morîtaniya wan destek dike, herweha Morîtaniya û Fas jî dijmînê hev in.

Di navbera Sudan û Misrê de pirsgirêkên li ser herêman hene. Di welatê Kendavê de bi vî rengî, di navbera Lubnan û Sûriyê de pirsgirêkên wiha hene, jixwe mesela Îsraîl meslek dîtir e. Ev hemû ji bo çi ne?!

Ev hemû ji bo ku di herêmê de ahengî çênebe, lê nakokî hebe. Ji bo ku her demê mecalekî ku emperyalîzm karibe destwerdana herêmê bike. Her demê herêm nexweş be, bi van nakokiyên çêkirî pirsgirêkên sînoran, bi meselên herêmê li ser nakokiyên herêman hene, bi van her demê dijminê hev in. Ahengî çênebe, her kes pêdiviya wan bi Rojava hebe.

Mînak, niha hinek girav di Kendavê de hene, di navbera Îran û Behrên de ne, di navbera Îran û Îmart, Îran û Îraqê de, Ereb dibêjin yên me ne, Îran dibêjin yên me ne. Vê carê da ku

hîna zêdetir van daxwaziyên xwe rewa bike, Ereb dibêjin tenê ev na, Xuzustan jî parçek ji Erdê Ereban e.

Xuzustan îyaletek Îranê ye Ereb tê de ne, di hundirê Îranê de ye. Dibêjin ew jî Ereda Ereban e, berê tevgerek çêkiribûn, tevgera rizgarkirina Erebistan, Îran dibêjin Xuzustan, tevgereke hebû navê wê Tevgera Rizgariya Xuzustanê, yanî Erebistanê bû. Îran çi dibêje, Îran dibêje na, esas ev girav na, Behrên jî ya me ye. Dibêjin Behrên ne Ereb in, di rojnaman de dinivîsin, nerehetî çêdibe. Fransa ji Behrên re çi bibêje!? Îngiltera, Emerîka jê re çi dibêje, dibêje; "temşe bike, eger em usê leşkerî di welatê we de çêbikin Îran nikare êrîşî we bike. Lê ger tine bin, Îran her demê dikare êrîş bike."

Ji bo vê em bala xwe bidinê di van deh salên dawiyê de bi milyarê dolaran dewletên Kendavê çekan dikire. Siûdî çekan dikire, Kuwêt, Qeter dikire hwd. Ji bo şerê Îsraîl bikin teqez na, ji bo şerê Emerîka bikin, na. Ji bo tehdîda Îranê li ser xwe rakin, bi milyaran çekan dikirin. Bi vî rengî herêm nexweş hiştin, li ser tepisandin çêkirin, ev her demê emperyalîzm weke hedef, weke rêbazekî siyasî di herêmê de dewam dike. Di roja me ya îro de jî heman rêbazê ji bo ku karibe bê hêz be, timî di bin tehdîdan de be, timî bi şantacan bê birêve birin, emperyalîzm vê polîtîkayekî ku berî sed sal berê kirî, di roja me ya îro de berhemên wê digire. Ev yek e.

### ÊRÎŞÊN EMPERYALÎZMÊ LI SER ROJHILATA NAVÎN JEOSTRATEJÎ Û ŞARISTANÎ NE

Niha milê wê yê staratejîk yê rednîgarî yê Rojhilata Navîn çawa mirov dikare fêm bike? Hêzek ji bo împeratortiyê kar bike cuda ye, hêzek ji bo dewletekî netewî tengk kar bike cuda ye. Emerîka ev e, Emerîka împeratoriyek cîhanî ye. Lê di vir de, li bakurê topa dinyayê ye, li derekî dûr e.

Emerîka dixwaze împeratoriyekî cîhanî be. Yanî Emerîka nû kirin, demokratîk kirina cîhanê naxwaze. Emrîkîkirina cîhanê dixwaze. Emerîkîbûyîna cîhanê dixwaze. Ev sed sal e, armancê Emerîka ev e.

Berî wê armancê kê bû, armancê Îngiltera bû, Fransa bû, yanî yê Ewrûpa Rojava bû. Wê demê ev dixwazin cîhanê hikum bikin, împeratoriye. Împeratoriya ku cîhanê hikum bike derfetên stratecîk jê re pêwîst in. Rê, qad, venêrîn, ev jê re pêwîst in. Ji bo vê em bala xwe bidinê Rojhilata Navîn ku derê ye? Rojhilata Navîn ev herêm e, ev Rojhilata Navîn e, ev der Asya ye. Ev der Efrîqiya ye. Ev der Ewrûpa ye, ev der Emerka ye, yanî termînal e, herêma navîn e.

Bi vî cihê xwe stratejîk e. Eger îro çavkaniyên enerciyê di Asya navîn de heye, Kazaxistan de heye, Qafqasiya de heye, eger tu di Rojhilata Navîn de ne hêz bî, tu nikarî van çavkaniyana bigirî. Ev çavkaniyana wê ji kê re bimînin, wê ji Rusya re bimîn in, wê ji Çînê re bimînin.

Ji bo vê Emrîka dixwaze Çîn û Rusya baypas bike. Wan çavkaniyên enerciyê di vir re derbasî gel xwe bike, ji bo vê dixwaze li Rojhilata Navîn xurt be. Ev di zemanê şerê sar de, her demê Emerîka ji bo vê kar dike. Emerîka ji ber ku yê bixwaze di cîhanê de hakim be, divê ku li ser Rojhilata Navîn hakim be.

Yê ku bixwaze di cîhanê de serwer be, divê ku li ser Rojhilata Navîn serwer be. Şerê hegemoniya ku Emerîka heta niha di van şêst salan de kiriye, yê wan şêst salên derBeasbûyî de, bi dirêjahiya şerê sar de çi bûye? Emerîka destpêkê çi kir, pêşî Rojhilatê Ewrûpa xist bin venêrîna xwe de, Romaniya, Bolgarîstan, Mecerîstan, Poloniya ev hemû xistin bin venêrîna xwe. Niha ev bûne sîstema wê, hinek bûne endamê Yektiya Ewrûpa, hinek hêdî hêdî wê bibin endamên NATO, bi vî rengî ew xistin.

Dema ku ew xist çi girt ewleyê? Xerta Avrasiya girt ewlahiyê. Xeta Belkan, Tirkiyê û Asya Navîn. Ev xistin ewlehiyê. Di vir de serwer bû, ev ji bo çi girt? Ji bo ku karibe li ser herêma Rojhilata Navîn serwer be, bi vî rengî hegemoniya xwe ya li ser cîhanê ewle bike.

Ev di aliyê leşkerî de termînal e, qaîde ye, ji ber ku Emrîka nikare şerê li Efxanistanê ji Florîda bike. Divê ji Sûadiyê, Qeter, Îraqê bike, ji ber ku dûr e. Di aliyê leşkerî de use, di aliyê guzargeha xetên enerciyê de termînal e, divê ku di wir re derbas bibe.

Ji bo vê di aliyê stratejîk de qadekî hegemoniya ye. Bê wê venêrîn kirina li ser cîhanê negengaz e. Ev taybetmeniyên hegemoniya cîhanî ferz dike. Ji ber ku qadek ewqasî stratejîk e. Bala xwe bidinê çiqasî stratecîk e:

Divê ku li vir nexşe hebe.

Em ê mînakekî bidin, eger alîkariya Kurdan di şerê 2003'an de bi Emerîka re neba û Tirkiyê bi xweber wer bi rengekî weke ku boyerek çêbûye, Tirik jî nizanin çawa çêbûye, biryarek girt ku leşkerên Emrîkî di erda wan re derbasî Îraqê nebin. Deh rojên din jî hêzên Îraqî di Kendavê de li ber xwe bidabana, Emerîka felc dibû. Ji bo vê erdnîgariya Rojhilata Navîn, di şerê hegemoniya de pir stratejîk e. Yanî hevsengiyê xerab dike, eger di pişt re Emerîka hinekê Tirkiyê daye zorê jî ji bo vê bû. Ji ber ku pir ew êşand, eger faktorên Kurdan tine ba, alîkariya bi Emerîka re, Emerîka wê pir tengav bûbûya.

Ji bo vê emperyalîzm ev qad her demê bi rêbazên xwe yên siyasî daye meşandin. Ji bo vê reşwa wê ya stratejîk e. Di serî de dîtiye ku xeteriyek ji Rojhilat ve bi ser wê de tê. Ew xeterî çi ye, ew xeterî çêbûna yekemîn dewleta sosyalîst e.

Cara yekmîn e, di cîhanê de dewletek sosyalîst çêbû, vê beramberî kapîtalîzmê, îdîayekî cidî ye. Kaptîlîzmê tengav dike, kelacanê bi mirovan re çêdike, bi taybet bi kedkar an, bi kesên di eniya kedê de di cîhanê de, bi karker cotkar, bi ronakbîran re, li

her derê radibin ser piya li dijî kapîtalîzmê, referansê wan çi ye, hêza moral ya ku ji Sovyetê digirin.

Ji bo vê Emperyalîzmê xwest Rojhilata Navîn bike qada ku kuşatmekirina Sovyetê. Bi çi, bi peydakirina kembera kesk. Ev rêxistina ku navê wê Rêxistina Kongira Îslamî, ew rêxistin kê çêkir? Emerîka çêkir. Analîzên Lenîn di derbarê wê de hene. Ji ber çi, herêm pirsgirkên çînî na, meselên dînî derkevin pêş û jixwe Soveyet û komunîzm di aliyê zihnî ve bi vî rengî dihate teşhîr kirin, ka çawa li dijî dîn e. Ji bo vê jî Sovyet xistin çemberê de. Wê demê Rojhilata Navîn, qadek ji bo çamberkirina Sovyetê ku fikirê komunîst li cîhanê belav nebe hate xebitandin.

Di roja îro de jî di wan erdnîgariyan de wek bingehekî leşkeriye. Fîloyê şeşan, hêzên destwerdana zû, ev hemû li Rojhilata Navîn in. Di welatê Kendavê de ne, di Misrê de ne, her demê usê wan heye. Eger di roja me ya îro de Emerîka ewqasê ji Qezafî aciz e ji bo çi ye? Ji ber ku Qezafî dema ku bû desthilatdar en ustê mezin yê Emerîka di herêmê de ji holê rakir, di Lîbya de useki leşkerî yê mezin qadek leşkerî mezin Emrîka di herêmê de bû, Qezafî ew ji holê rakir. Heta roja me ya îro jî ji lewre tolê jê digire.

Dîsa sîstema siyasî li gorî xwe çêdike. Berê faşîzm bû, mînak di Tirkiyê de faşîzm, di Pakistan de faşîzm, di Îran de hikumetek otoqratîk, di cihên din hemûyan de dewletên wiha monarşî hişk, dijwar, bi van li dijî tevgera çep demokratîk li dijî xeteriya Sovyetê şer dikir. Di roja me ya îro de jî ji bo ku herêmê bike rêyeke ku enerciya ku jê re pêwîst derbas bike, çi dike, li gorî xwe, li gorî rêbazê xwe yê siyasî herêmê lîberalîze dike. Herêm bibe cihek kapîtalîzma navnetewî, tê de xwe bi cih bike, bi vî rengî careke din hêzê elternatîf, yên ku gengaz e ku beramberî Emerîka bin, Rusya, Çîn, Hindistan, baypas bike, lewaz bihêle, her demê bi xwe ve girêdayî bihêle.

Ji bo vê Rojhilata Navîn, di aliyê stratejîk de ji bo berjewendiyên hêzên navnetewî her demê girîng e. Li ser vî esasî jî teşegirtina siyasî li gorî daxwaziyên xwe her demê dixwazin çêbikin.

**Emperyalîzm Li Rojhilata Navîn Dixwaze Li Ser Ptrolê Serwer Be**

Ji lewre zêdetirî sed saliye ptrol ketiye rojevê. Lê belê zêde xwedî girîngiye, heta niha jî tevî ku gelek lêkolîn û lêgerîn, daxwaziyên peydakirina alternatîf enerjiyê hene, lê hîna jî enerjiyek ku karibe petrolê bike arternatîf û girîngiya petrolê kêm bike, derneketiye.

Senaiya giran, navenda wê Rojava ye. Maşîn, tang, top, balafir, hemû senaiya giran navenda wê Ewrûpa ye. Amûrên mezin yê ku bi tonan hesin jê re pêwîst in, ew tişt jê re pêwîst in, hemû Rojava ye. Demê dawiyê Çîn, Hindistan, Rusya jî gav bi gav hinek di aliyê senaî de gav avêtine, lê ji bo ku karibe bibin weke

Rojava bi taybetî Emerîka û Ewrûpa re pêşbaziyê bikin hîna gelek dem jî wan re pêwîst in.

Berhemên senaî, hilberîna di cîhanê de serê sedî bêtirî pêncî Ewrûpa Emerîka dikin. Ev her rojê bi milyonên varêlan petrol jê re pêwîst in. Her rojê bi milyonên varêlan petrol jê re pêwîst in. Yanî milyonek tenê na. Emerîka carna her welatekê rojê milyonek varêl jê dikire.

Wê demê rojane xercema wan ya petrolê zêdetirî milyonek varêl e. Bi taybetî welatekî weke Emerîka. Cihê petrolê yê di cîhanê de herî zêde li ku ye, li Rojhilata Navîn e. Kapasîta hilberînê ya Siûdiyê rojê heft milyon varêl e. Ewqasî nafiroşe, ji ber ku sînor hene. Rêxistineke heye navê wê, OPF'e, ew sînoran nîşan didin.

Lê belê rojê dikare heft milyon varêl kapasîta derbixîne. Îran rojê dikare pênc milyonan derbixîne. Îraq dikare zêdetirî sî û sê milyonan derbixe hwd.

Gaza xwezayî li Misrê, Îranê û li gelek welatên din jî, heta di cih cihna de behsa petrola qalîtelî dikin, ya bê qalîte dikin. Mînak niha li Lîbiya ew jî kapasîta wê ya hilberînê ya petrolê zêde ye, lê belê taybetmendiyên wê petrolê heye. Petrola sivik e, ya tê de wer tiştên avêtinê weke madên zêde yên avêtinê tê de tine bin. Bi biranî zû rafîne dibe, zû gaz be, mazût be, benzîn jê derdikeve, ji bo vê hîna zêdetir xwestek li ser hene. Di encamê de ev zêde ne diyarker in. Lê di esas de petrol li vir heye.

Petrol xwîna rehê sanaiya Ewrûpa û Emerîka ye. Dema xwîn kêm be, ew senaî wê nexweş bikeve. Her xeteriyek li ser petrolê çêdibe, beramberî wê di Rojava de krîz çêdibe. Bihayê wê zêde dibin, pirsgirêkên ekonomîk derdikevin. Fîet bilind dibin. Ji bo vê her demê dixwazin ku sîstemekî siyasî ha di Rojhilata Navîn de hebe, ew sîstem rojekê ji rojan nebe asteng li pêşiya petrol bi rengekî serbest biherike ber bi Rojava ve.

Çeka petrolê heta niha Rojhilat nexebitandiye. Carekê xebitand, ew jî pirsgirêkên cidî çêbûn. Kengê bû di sala 1973'an de dema ku Ereban û Îsraîl şer kirin, Ereban ji Siûdiyê xwestin ku îxraca petrolê bide rawestandin. Rastî jî demekî kin da rawestandin, pêsîrtengiyek mezin di cîhanê de çêkir.

Heta di salên 1967'an qiralekî Siûdiyê ez bawerim Melek Feysel bû, yekî pir xerab bû, fermî sîxûr bû. Mînak Cemal Ebdul Nasir, her demê dibêje; "divê ku Siûdî vê petrolê bisekinîne, divê ku petrolê bisekinîne." Ew qiral dibêje, "me tiştek ji Cemal Ebdul Nasir fêm nekir. Me nizanîbû petrol çi ye, yabanciyan hat nîşanî me da. Me nizanîbû em derbixînin, ji me re dirxistin. Me nizanîbû em bifiroşin, ji me re difiroşin. Paya xwe digirin û yê me jî didin me. Em ê çima qut bikin." Yanî ev çek çawa li dijî Rojava ji bo berjewendiyê doza xwe ya navendî ji bo Filîstînê, ji bo doza Ereban bişûxulîn in, bîrnebirine, jixwe misyonek wan yê wiha jî tine bû. Ji ber ku Emperyalîzmê ew bi destê xwe çêkirine. Ji bo vê yekî bi destê xwe çêbike, wê çawa li dijî xwe çêbike!

Di sala 1973'an de,  ji bo hinek zordariyan tiştek wiha kirin, lê demborî bû, tevî wilo jî zordariyek mezin ji bo emperyalîzmê çêkirin. Ti têkiliya petrolê bi nêzîkbûnê emperyalîzmê di Rojhilata Navîn de heye?

Emperyalîzm endustryalîzm e, yek ji lingê emperyalîzmê yê sereke endustryalîzm e. Endustryalîzm petrolê çêdike. Yanî senaî bi petrolê pêş dikeve. Petrol jî di vir de ye. Niha ji bo vê dîzayîn, derbe, guhertin, çêkirina rêjîmên kukla, bi giranî jî ji bo çi ye? Yek ji sedemên wê yên sereke jî ji bo ku ev serwerta balkêş û hêja nekeve destê kes in ku rojekê ji rojan weke şantac li hemberî emperyalîzmê bikar bînin.

Ji bo vê emperyalîzm dema dibîne rejîmek hinekî bi ser xwe ve çû, bihêz bû, behsa petrolê kir, behsa qamûleştirma petrolê kir, behsa bikaranîna çekên petrolê li dijî Rojava kir, hema dest datînin ser. Lêdana Sedam jî ji bo vê ye, destwerdanên din jî yên li ser Rojhilata Navîn ji bo vê ye. Ji bo vê ev çek girîng e. Ji bo ku ev çek bi rengekî cidî di çarçoveya berjewendiyên herêmê de neyê xebitandin, emperyalîzm hemû rengê dîzayîna di vê herêmê de dike.

Petrol pir bi bandor e, mînak ji kevn de rêxistinek navê wê OPK' e ev Rêxistina Dewletên Ku Petorlê Îxrac Dikin,  navê wê biçûk OPK'ê ye, nave wê yê berfireh Rêxistina Dewletên ku ptrolê îxrac dikin. Kî ne di van dewletan de, yên çiqasî zêde îxrac bikin ewqasî bi bandor e. Mînak Siûdî, Îran, hinek welatên din in, yên ku petrola wan heye.

OPK' çi dike, dibêje ev dewlet divê ku du milyon varêl rojê derbixe, yê din sê milyon, yê din çar, yê din yek, yê din pênc sed hezar, bi vî rengî diyar dike. Ji bo çi, ji bo ku fîet bi xerabî bandor nebe. Mînak Siûdî dikare heft milyona derbixe, lê pêncan derdixe, ji ber çi? Ji ber ku OPK' jê re gotiye; divê ku tu zêdeyî pêncan dernexe. Heger zêdeyî pêncan derbixe wê petrolê erzan bifiroş e.

Dema ku petrol zêde erzan didin, OPK' li hev dirûne çi dike? Dibêjin; em ê hilberînê kêm bikin, ji bo ku fîet zêde bibin. Di salên 1970'î de, OPK' li hev rûnişt gotin, "petrol zêde erzan bûye, divê ku em hilberînê kêm bikin ji bo ku fîet bilind bibin." Siûdî li dijî vê biryarê derket. Herî zêde ew sûdê jê dibîne, lê dijî derket. Ji ber ku yê herî zêde petrolê difiroşe Siudiyê ye, li dijî derket. Lê çima?

Wezîrê petrolê yê wê demê li Siûdiyê navê wî Ehmed Zekî Yemanî bû, jê pirsîn gotinê; "we çima tevî OPK'ê biryar negirt, da hûn hilberînê kêm bikin, da ku fîetê petrolê zêde bikin? Wî bersiv wiha da; niha li Îtaliya hilbijartin hene, Îtalîya jî wê demê komunîstan dengê zêde tê de danî û carê nêzîk dibûn ku bibin desthilatîdar. Partiya komunîst bihêz bû li Îtaliya, lewre bersiva wezîrê Siûdiyê ev bû; "li Îtaliya hilbijartin heye, eger em hilberînê kêm bikin, petrol biha bibe wê krîz di Ewrûpa de çêbibe, ger krîz çêbû wê komunîst li Îtaliya jê sûdê bibînin, bi vî rengî wê dengê wan zêde bibe, wê bibin desthilatîdar, ji bo vê me qebûl nekir." Bala xwe bidinê çawa ji sîstemê re dixebitin. Yanî esas li gorî

berjewendiyên xwe diviya bû ku kêm bikiribana da ku fîet bilind bûbûya. Herî zêde pere, kar jê re vedigere. Lê ji ber ku sîstema emperyalîst vê naxwaz e, wan jî li gorî sîstem çi ji wan re dixwaze bi wî rengî tevdigerin.

Ji bo vê mesela petrolê li Rojhilata Navîn cidî ye. Yek ji sedemên ku emperyalîzm cidî li ser vê herêmê disekine, mesela çavkaniyên petrolê yê mezin di vê herêmê de ye.

**Armancê Emperyalîzmê Ji Parastina Îsraîl Çi Ye?**

Niha ji bo Rojava Îsraîl li Rojhilata Navîn girîng e. Ji ber çi, Îsraîl ne xwe tenê temsîl dike. Îsraîl wekîlê şirketa kapîtalîst ya navnetewî ye. Wekîl e, di heman demê de bi navê wê yê biyanî jî sîxûr e. Yanî yê ku ji cihekî re dixebite. Îsraîl wekalet e, Îsraîl bi wekaletê berjewendiyên emperyalîzmê li Rojhilata Navîn de dimeşîne.

Ji bo vê hemû rengê xeteriyan li ser Îsraîl ji aliyê Emerîka, Îngeltira û Ewrûpa ve nayên qebûl kirin. Ji bo ku ewlekariya Îsraîl di ewlehiyê de be her demê, Rojhilata Navîn lewaz dihêlin. Ji ber çi, Îsraîl weke hêzekî leşkerî Rojhilata Navîn di bin xeteriyê de dihêle, çekên wê yên nukler hene, çekeke wê ya balafiran yê pir berfireh heye, hêzeke wê ya îstixbaratê yê mezin heye, ekonomiya wê jî heye.

Ji bo vê di aliyê leşkerî ve her demê herêmê di bin kontrolê de dihêle. Îsraîl dikare vî karî bike, ji ber çi, girêdanê wê yê civakî bi herêmê re tine ye, biyaniye. Heta niha jî hîna ew biyanî bûna derBeasnekiriye. Ji der ve re dixebite, erê welatek Rojhilata Navîn e, lê sîstema Rojava ye. Yanî girêdayî sîstema Rojava ye. Hembûna Îsraîl çi dike, hebûna wê her demê li Rojhilata Navîn rewşekî ewarte dihêle, her kes liv û tevgera xwe bi Îsraîl rave dike.

Mînak sîstema serdest ya Ereban, muxalifan dikuje çima? Dibêje ji ber Îsraîl, yek aliye, milîtarîst e, şoven e, nijadparest e, hemû xerabiyên xwe bi çi rave dike, bi Îsraîl rave dike.

Ji ber çi, dibêje Îsraîl dijminê me ye, Îsraîl yaylmaciye, jixwe hinek nêzîkbûn û gotinên Îsraîl hene vê nêrînê têr dikin. Mînak dibêjin, sînorê Îsraîl ji Frat ta Nîlê ye, yanî ji çemê Nîlê ta Frat e. Ev gotinên wan, hîna zêdetir kaygiyê gelan çêdikin, li sîstema Ereban jî ji vê sûd digire û li ser vî esasî gel dide sekinandin.

Dibêje ev dewlet hatiye me hemûyan qir bike. Me ji holê rabik, dagir bike, erda me bigire, ji bo vê muxalefet e, astê xweşiya jiyanê ye, ev hemû ne pêwîst in. Ya girîng em hebûna xwe li beramberî Îsraîl biparêzin. Ji bo vê her tişt fedayî wê ye. Bi vî rengî dînamîkên civakî li Rojhilata Navîn ev pêncî sal e, qet tevnagere. Sedem çi ye ku tevnager e, ji ber ku tevgerek biçûk dînamîkê civakî de bi sîxûriyê tê sûcdar kirin.

Wê demê emperyalîzm bi hebûna Îsraîl dînamîkên civakî li Rojhilata Navîn dide rawestandin. Yek jî hebûna Îsraîl dibe

sersebebê ku civaka Rojhilata Navîn nikaribe xwe nû bike. Tiştên pêşî yên wê cuda ne, tiştên pêşî yên Rojhilata Navîn ne nûbûne, ne pêşketbûne, ne refaha ekonomiyê ye, tiştê herî li pêş ji bo wê ewlekariye.

Dema ku di serê her tiştî de ewlekarî bû tiştên serke û pêşîn çi dibe? Civak parçe dibe, yek dibe polîs, yek dibe poteyensel xeterî. Bi vî rengî timî hev dixwe. Ji bo vê emperyalîzm her demê dixwaze Îsraîl biparêz e. Her demê ewlekariya wê bike xeteriyê. Ji bo vê dema ku binêre rejîmek, hebûna wî li ser Îsraîl dibe xeterî hema tavilê êrîşî wî dike. Lêdana Lîbiya, ya Îraqê, ambargoya li ser Îranê û gelek şêwazên dîtir, polîtîka ku li ser Misrê dane meşandin hemû jî yek ji sedemên wê jî parastina ewlekariya Îsraîl e.

### Nakokiyên Emperyalîzmê Bi Rojhilata Navîn Re Yê Şaristaniyê Ne

Emperyalîzm Rojhilata Navîn weke antî-tez fêm dike û dizane antî tez e. Dizane ku hêzek dijber e, weke potyensel e. Ji ber çi, ji ber ku Rojhilata Navîn hêzek wê ya berxwedanê heye. Rojhilata Navîn, orjînal e, taybetmendiyên wê yên çandî, fikirî, zihnî yên ku pala xwe didin kûrbûna dîrokê heye, ji bo vê jî ev proja modernîzasyonê, proja lîberalîzekirinê, yanî projên wek Rojhilata Navîn a mezin, Rojhilata Navîn a nû, projên ji nû de dîzyan kirina herêmê dengvedana xwe di nava gel de nagire. Ev nakokiyek çandiye. Her demê cewher, dîrok, rêûresm, bi taybetî jî rêûresmên wer paqîj mirovan dikişîne.

Tiştekî seyr e, li Rojhilata Navîn, bala xwe bidinê li hemû cîhanê, em di aliyê mozîkê de bigirin dest, mozîka Rojava serwer bûye, li Japoniya, Çîn, Efrîqiya serwer dibe û êdî ber bi rêûrsman ve kes nema paş de dizîvire. Lê em meselê Kurdan bihesibînin, ên Ereban, mozîka Rojava aramiyê nade mirovan. Zêde balkêş nabe, di van salên dawiyê de zêdetir di aliyê mozîkê de di nava Kurdan de haye, di nava Ereban de jî bêtir ber bi orjînalê ve vedigere.

Wê demê ew nabe alternatîf, ji ber ku ev herêm di zemanê baranên wê cuda ne, berfê wê jî wiha, çemên wê cuda diherikin, mirovên wê cuda dijîn. Ji bo vê tiştê ku aramiyê bide însanan li Rojava û cihên din heman aramiyê nade însanên Rojhilata Navîn.

Rast e dibe hinek tişt hene îro li qenalên tv'an de, pêşbazî, şêwazê nû ji mozîkê derdixin, lê belê hemû demborîne. Yanî wê zêde nemîne, zêde wer mirovan di esas de razî nake. Mirov nizane ka çawa hinek mirov ji wan mozîkan re çepkan dixin, lê zêde bersivê nade.

Dîsa di aliyê şêwazê jiyanê, dibe ku hinek ji çeloxwarkirina bajarbûyînê çêbibe, di çarçoveya wan bajaran de rêûresm hatibin wenda kirin, dibe, lê nebûye modelek di jiyana Rojhilata Navîn de. Nikare bibe modelek jiyanê jî. Di encamê de proja moderm kirinê ya çandî, ya civakî, heta ya siyasî li Rojhilata Navîn zêde bi ser nakeve. Emperyalîzm vê dibîne, emperyalîzm dizane rewşa vê herêmê ne weke cihekî din e. Yanî însan li vir

bomban li xwe dipêçin û diteqînin. Ev bombe bi xwe pêçan û tenqandin, ne fenatîzma Îslamê ye. Ev nirxandinên dibêjin fenatîzma Îslamî ne, rast e. Mînak hevala Zîlan, ne Îslamger bû! Di vir de kevneşopî li ber xwe dide. Çi ye ew kevneşopî, mînak dîrokek e, însan qebûl nake ku ev dîrok bê pêlêkirinê, ji bo vê hazir û amade ye ku xwe biteqîne. Bi wê nejî, di wê astê de bersiv dayînek heye.

Ji lewre ev ji bo Rojava pirsgirêkeke. Rojava bi artêşa xwe ket Rojhilata Navîn de, du rojan ma. Gemiyên xwe di sala 1918'an de gemiyên xwe tije leşker kirin, derbasî Îraqê bû, derbasî Sûriyê bû, derbasî derên din bû, kes nikarîbû li ber xwe bide. Ekonomiyê talan dike û heta roja me ya îro talan dike, kes tiştekî nabêje. Yanî enî li pey eniyê dişkê, kes tiştekî nabêje. Lê di tiştekî de teslîm nabe ew hêza ruhî ye. Ew teslîm nabe û ew li ber xwe dide.

Mînak li Îraqê ew li ber xwe dide, li Efxanistan ew li ber xwe dide. Yan jî mînak çek, artêş du rojan li ber xwe nadin. Di dema ku di aliyê leşkerî de dagirkerî pêk tê, dema ku di aliyê siyasî de dagirkerî pêk tê, dema ku di aliyê ekonomiyê de talan pêk tê, eger ev dagirkirina leşkerî û siyasî talankirina ekonomî bi dagirkirinekî ruhî temam nebe, serkeftin ne di ewlehiyê de ye.

Serkeftina emperyalîzmê li Rojhilata Navîn eger bi serkeftinekî ruhî, îdeolojî, çandî temam nebe, ew serkftina ku îro kirî demboriye. Ne di ewlehiyê de ye, pê neraziye, têrê nake. Ji bo vê emperyalîzm dixwaze vê bike, di vir de têkoşînek şaristaniyê heye. Yanî fektorekî şaristaniyê ye. Çi ye ev fektor, îmha kirina kokên dîrokî ji nedîtî ve nêzîkbûyîn, biçûk xistin, rencîde kirin, hov kirin, bihêle însan wê ku ber çavê mirovên xwe jî reş bibe, însan êdî ayîdiyeta xwe ya wê çandê jibîr bike. Bi temamî di aliyê çandî, îdeolojîk ve asîmîle bibe, bibe parçek ji Rojava. Bi vî rengî dagirkirina siyasî û leşkerî bi ser dikeve. Ji bo vê şerê li dijî modernîta girîng in.

### Divê Şerê Me Li Hemberî Zihniyet Û Şêwazê Jiyana Modernîta Be

Mînak din jî em bidin, dema ku tu şer li dijî kapîtalîzmê bikî, lê li dijî modernîta nekî, tu nikarî vî şerî bi ser bixî. Ji ber ku kapîtalîzm bi ser dikeve, tiştê ku nahêke ku kapîtalîzm bi tamamî bibe desthilatdarî çi ye, dema ku modernîta wî, ango zihniyetê neguhere, nikaribe şêwazê jiyanê biguhere, wê demê alozî jê re derdikev in.

Ji bo vê şerê tenê li dijî kapîtalîzmê bi navê proleteriya û kedê têrê nake. Şerê li dijî dagirkeriyê têrê nake. Ev şer divê ku hêzek wê yê zihnî û fikirî hebe. Yanî di aliyê zihnî de divê ku em û emperyalîzm ne yek bin. Di aliyê liv û tevgerê de em ne yek bin, di aliyê şêwazê jiyanê de em ne yek bin.

Şêwazê me yê jiyanê ger weke yê wan be, zihniyet ew be, liv û tevgera me ew be û em îdîa bikin ku em li dijî wê têkoşînê dikin, ew têkoşîna me pûç e, encamê nagire. Niha yek ji pirsgirêka me ya serekî weke rêxistin, bi taybetî jî li Bakurê Kurdistanê ev e

ku em li dijî kapîtalîzmê şer dikin, li dijî dagirkeriyê şer dikin, lê em li dijî modernîta şer nakin. Tam berovajiyê wê em modernîta temsîl dikin. Ji binê lingê xwe heta serê xwe. Bi şêwazê jiyanê, bi teşe, bi nêzîkbûnên ji meselan re, ji kesan re, ji civakê re, em modernîta esas digirin.

Ev dibe sersebebê ku em nikaribin xwedî şêwazê jiyana xwe bi xwe bin. Em şêwazê jiyana Rojava qebûl dikin, em li dijî wê şer dikin. Halbikî şerê me kengê rewa ye, kengê rasteqîniye? Dema ku em şêwazê jiyana Rojhilat  qebûl bikin. Wê demê wê hîna zêdetir şerê me bi wate be. Bi exlaqê xwe, civakbûna xwe, bi nirxên xwe yên komînal ên ku pala xwe didin dîroka mirovahiyê, bi fedekarî, bi van tiştan mirov dikare xwedî têkoşîn be.

**Emperyalîm Şerekê Dîrokî Û Çandî Dike**

Divê têkoşîna me ji bo cewher parastinê be, ne têkoîneke şeklî be, ev dihêle şer serkeftî be. Ji bo vê emperyalîzm niha şerê wê li dijî Rojhilata Navîn, meselên şaristaniyê ne. Yanî şerê şaristaniyê dike. Çi dike, bomberdomanekî îdeolojîk çandî pêk tîne. Ji bo ku însanan felc bike, ji kokê wan yê dîrokî qut bike, xerîzan pêş bixe, ferdiyetê pêşbixe, ziakirinê pêş bixe ku însan bibe kolê kapîtalîzmê.

Weke çawa niha li başurê Kurdistanê dike, li Îraqê dikin, li cîna dîtir dikin, bi hinek ergomanên ku heta bala civakê jî dikşîne, bi sporê, cinsiyetperêziyê, cinseltiyê, ezeziyê, bi van tiştan dike. Dixwazin felc bikin ku hêza muxalefetê nemîne. Muxalefet çi be, formalîta be. Ji bo kursiyan be, ji bo ketina perlemanê, ji bo ku belediye bibe ya min, ji bûyî parê bigire, ne ji bo civakê biguhere. Niha emperyalîzm vî şerî dike.

Ev şer ji bo emperyalîzmê stratejîk e, bi prensîb e. Ji bo çi bi prensîb e? Ji ber ku tirsên wê hene. Tiştê ku em behsê dikin Rojhilata Navîn e. Ne cihekî din e, lewre mirov biçûk nabîne. Efrîqiya biçûk nabîne, cihên din biçûk nabîne, hemû jî însan in. Lê Rojhilata Navîn ne Efrîqiya ye, ne heta Çîn e. Rojhilata Navîn erdnîgariyek stratejîk e. Rojhilata Navîn derfetên madî yên mezin e. Ptrol e, Rojhilata Navîn nifûsek ciwan e, ev nifûsa ciwan girîng e. Her demê ev nifûsa ciwan potyensela şoreşê ye.

Welatên ku tê de ciwan zêde dibin şoreş tê de heye. Şoreşa di roja me ya îro de li Rojhilata Navîn de dijî, berhemê ciwana ye. Ji ber ku ciwan hêza îsyanê ya serekî ye. Asoya ciwanan firehtir e, li gorî kevneşopiyan naxwaze bijî, dixwaze tiştê heyî derbas bike. Dema ku bi astengan re rû bi rû dimîne, şoreşê çêdike. Şoreşa 1968'an sedemên wê pirbûna ciwan bû. Ji bo vê dema ku Ewrûpa pîr dibe, Emerîka pîr dibe, Çîn pîr dibe, maşelah li Rojhilata Navîn ciwanbûn îflasyon çêkir.

Cihek weke Mexmûr nifûsa wê heft hezar e, sê hezar xwendevanên dibistana seretayî de hene. Di hemû dîroka cîhanê de tiştek wiha tine ye. Ev hêzek e, wê demê cihê erdnîgarî, derfetên madî, nifûsa ciwan, ev hemû tiştên madî ne, ev jî tiştên madî ne, eger ev hemû bi kokê xwe yê dîrokî re bibin yek, wê

demê proja şaristaniyê derdikeve, ya alternatîf derdikeve. Yanî hêza moral, peyda bibe, zihniyet, hêza moral, ustunlika derûnî, dema ku ev çêbibin wê demê kes nikare zevit û rebtê bide Rojhilata Navîn.

Bi derfetên xwe yên madî, bi hêza xwe ya ciwan, bi erdnîgariya xwe ya stratejîk, bi hêza xwe ya ku şaristaniyê tê, hêza moral, ya ku di kûraniya dîrokê de veşartiye. Ev hemû derkevin, bi rengekî têkûz di çarçoveya projeyekî komunal, zanistî bi hev re bibin yek, wê çaxê dibe alternatîf.

Ji bo ku ev nebe, emperyalîzm di hundirê têkoşînekî de ye. Şerê li dijî PKK'ê jî ev e. Em bala xwe bidinê ku PKK'ê çalakiyekî leşkerî li dijî Emerîka nekiriye, li dijî Fransa nekiriye, li dijî Ewrûpa nekiriye. Tam berovajiyê wê, Rêbertiyê ji sala 1995'an de ev got; "êdî dema ku sosyalîst, sing e sing, enî bi enî şer bikin nema ye, em di nav hev de digerînin." Rêber Apo ev di sala 1995'an de analîz kir, SAA'iyî jî vê dizane. SAA'iyî dizane ku carina PKK'ê cixare qedexe kiriye, içkî bi temamî qedexe ye, dev jê ber de oruştircî, her roj raporekî derdixe û dibêje; PKK'ê tîcareta orutirciyê dike, bikar tine, ev hemû ji bo ku kirmînalîze bike.

Dizane ku PKK'ê van tiştana nake, dizane ku eger di cih cihna de, çewt şidet hatiye meşandin jî, ji derveyî perspektîfên PKK'ê hatiye meşandin. Vê jî baş dizane, ji ber ku PKK'ê rexnedayîna xwe dide. Lê tevî wê jî terorîze dike, kirmînalîze dike, xerab dide nîşan dan ji bo çi, ji bo ku PKK'ê xwedî proje ye. Ev proje li dijî ferdiyetê ye, li dijî tuketicitiyê ziabûnê, li dijî xerîzebûyînê ye, li dijî van tiştê he komînal e, civakî ye, demokratîk e, li ser esasê ku hêza madî ya Rojhilata Navîn û hêza zihnî bi hev ve girêbide û bi vî rengî teqandinekî çêbike. Ji ber van êrîşê li ser PKK'ê dike.

Tenê ne PKK'ê, êrîş li ser hemû hêzên ku jidil û can bi rastî dixwazin civakên xwe temsîl bikin heye. Ev êrîş cidî ye, ev parçek ji siyaseta emperyalîzmê derbarê Rojhilata Navîn de ye. Ji bo vê emperyalîzm li Rojhilata Navîn çi dike? Miliyetgeriyê, cinsiyetparêziyê, dîngeriyê, zanistparêziyê, van tiştana xurt dike û van tiştana ne tenê bi navê tewş û dibêje; ev zanistîparêziye bigirin, ev cinsyetparêziye bigirin, tam berovajiyê wê, herî zêde xwe azadîxwaz dide nîşan dan. Di aliyê cinsyetperêziyê de jî, lê di roja me ya îro de jinên Îraqê sed carî xweziya xwe bi serdema Sedam tînin. Ji ber ku Îraq seranserî Îraqê bûye weke çawa fihoşê, tenê ev na, êdî welatên derdorê jî êdî bi rengekî xerab îmacek ji jinên Îraqiyan re hiştine. Lewre azadiya jinê ya ku ji Îraqê re anîn ev bû.

Ev hemû xizmeta proja lîberal dike, ya li ser esasê ferdiyetê, ezeztiyê, parçekirina civakê, înkar kirina civakê da ku însan bi xerîzên xwe bijî û wiha emperyalîzm karibe kontrol bike, armanc ev bû. Miliyetgeriyê di zemanê Sedam de ewqasî Suniyan û şîa hevdu nedikuştin, ewqasî Kurd û Ereban hevdu nedikuştin. Ewqas Xiristiyan nedihatin talan kirin û kuştin. Ji lewre emperyalîzm vê projê ferz dike.

Ev bi xwe re pirsgirêkên cidî tînin. Ji bo vê beramberî wê girîng e ku bi projên zelal em dakevin meydanê ku li dijî vê proja lîberalîzekirina herêmê, em proja azadiyê bixin. Porja azadiyê li dijî modernîta kapîtalîst e. Bi taybet bingehê wê yê komunal, li dijî modernîtayê ye. Ev wê esas bê girtin ku projên modernîta kapîtal li ser herêmê bi ser nekevin.

Bi vî rengî em lê temaşe bikin wê demê emperyalîzm gelek sedemên wê hene û gelek şêwazê wê yê hegemoniya li ser Rojhilata Navîn bike hene, lê belê bi van çar-pênc xalana, mirov dixwaze wer hîna zêdetir şînber bike. Her demê emperyalîzmê tovê parçekirinê hiştin vê herêmê, yanî nakokiyên sunî yên her dem di navbera dewletan û gelan de hiştin. Dînî, mezhebî, Erdnîgariya stratejîk, li ser wî esasî hewildanên desthilatdariyê, çavkaniyên enerjiyê bi taybetî jî petrol, parastina Îsraîl û astengkirina proja şaristaniya demokratîk a Rojhilata Navîn. Ev nêzîkbûnên emperyalîzmê ne. Ji lewre beramberî wê weke alternatîf, nêzîkbûnek çep derket pêş, demek dirêj xwest hikum bikin. Li ser vê mijarê jî em ê rawestin.

## SOSYALÎZM BI CEWHERÊ XWE YÊ RAST JI RASTIYA ROJHILATA NAVÎN DÛR NÎNE

Sosyalîzm di bingeh de bi cewherê xwe fikrekî ji rastiya Rojhilata Navîn dûr nîne. Dîroka Rojhilata Navîn, tevgerên civakî, komunal, li ser esasê wekheviyê edelatê, mirov di vê herêmê de pir dikare lê rast bê. Ev şêwazê civakî yê li ser esasê wekheviyê, heta demên nêzîk jî, li cihên cuda cuda, bi hêza xwe ya cewherî gelek însanan birêve dibir.

Ji bo vê weke cewher sosyalîzm ji rastiya Rojhilata Navîn dûr nîne. Lewre nav, terîm, têgîn, bêguman guhertîne. Lê belê ev nerazîbûna beramberî desthilatdariyê, nerazîbûna li beramberî desthilatdariyê, têkoşîna li dijî wê, dûrketina ji dewletê, ji derveyî dewletê jiyîn, bê dewlet jiyîn, mirov dikare bêje her demê li Rojhilata Navîn lê rast bê û hebûye.

Lê belê tevgera sosyalîst, bi rengê xwe yê rêkûpêk bi nav, bi teorî di sedsaliya 20'an de derbasî Rojhilata Navîn bûye. Li milekî miliyetgerî, dewlet netew, kapîtalîzm, milkiyeta taybet, van li Rojhilata Navîn serwer bûn. Beramberî wê bi taybetî jî weke çawa li cîhanê nakokî di navbera kapîtalîzmê û sosyalîzmê de, bi taybetî jî bi çêbûna Sovyetê re wek sîstemên siyasî li dijî hev ên dijber çêbûn, vê bandora xwe li Rojhilata Navîn jî bi çi awayî dît, dema ku rayedar, desthilatdar, hakim, dewlet, yanî hêza jorîn di civakê de xwe bi sîstema kapîtalîst a cîhanê ve girêdan, jê re bûn sîxûr, xizmeta wê kirin. Beramberî wê cotkarî, karker, kesên feqîr fikirên sosyalîst qebûl kirin. Gav bi gav li dijî desthilatdariyê, li dijî newkheviyê ji bo edaleta civakî, rêxistin li darxistin.

### Li Rojhilata Navîn Pêşketina Tevgera Komunîst

Tevgera komunîst li Rojhilata Navîn ji sala 1920'an û şûnda fermî bûye. Yekemîn li Tirkiyê, Partiya Komunîst a Tirkiyê

di sala 1920'an de çêbûye. Li Çînê çêbûye, Çîn hinekî ji Rojhilata Navîn cuda ye, yanî di Rojhilat de ye.

Di sala 1924'an Partiya Komunîst li Sûriyê Lubnan çêbûye. Sala 1936'an Partiya Komunîst li Îraqê çêbûye. Li Sudan çêbûye, li Îranê di serdema 1930'iyî û şûnda TODH çêbû. Bi vî rengî li gelek welatên Ereb, Tirkiyê, Fars, partiyên komunîst çêbûn.

Niha ev partiyên komunîst taybetmendiyekî wan a çawa hebû? Partiyên komunîst ên ku Li rojhilat çêbûn, di serdema ku tê de Sovyet û partiya komunîst a Sovyetê di tevgera çep li cîhanê serwer bû. Di wê serdemê de çêbûne. Ji ber ku beriya Sovyetê perçebûn çêbû. Di tevgera komunîst a cîhanî de parçebûn çêbû. Kes in ku bûn sosyalîstên milî ku Lenîn wê demê navê wan kirin Sosyal Şovenîst, yanî bi nav sosyalîst in, lê bi helwestên xwe şovenîst in. Van sosyalîzm lîberalîzekirin û xistin xizmeta kapîtalîzmê. Di roja me ya îro de jî li gelek cihan desthilatdar e.

Mînak, partiya sosyalîst a Fransî, sosyal demokratên Elamniya hwd, partiya karkerên Îngiltera, bi demê re ev pêk hat û bi temamî bi kapîtalîzmê re bûn yek.

Li dijî wan çepayetî, komunîzmê di kesyeta partiya komunîst a Sovyetê ya Lenîn de li dijî li gorî xwe oportonîzm, tesfiyegeriya di tevgera karkeran de çêbûye, ji nû ve pîvanê komunîzmê danîn. Li ser vî esasî rêxistine çêkirin, navê wê rêxistinê çi bû, komunîzma sêyemîn, **enternasyolîzma sêyemîn,** enternasyonalîzm komunîst. Yan jî komentre, bi navê wê yê dîtir komentre bû. Komentre çi bû, komentre, di sala 1919'an de, partiyên komunîst ên li dijî tesfiyegeriyê, li dijî lîberalîzmê, li dijî sosyal şovenîzmê, di nav xwe de bi cih kirin.

Kî bûn, bi giranî yên Rojhilat bûn. Partiya komunîstî Tirkiyê bû, ya Sûriyê bû, ya Çînê bû, ya Bilgarîstanê bû, ya Romaniya bû, ya yên li Rojhilat bûn. Bi komunistên radîkal di Ewrûpa de, mînak partiya komunîst a nû ya Elmaniya. Yên weke Roza Lîksemborg, komentren, bi vî rengî tevgera komunîst birêve dibir.

Komentren di rastiyê de baş bûn. Di aliyekî xwe de baş bûn, kîjan alî bû yê baş, yekbûyîna têkoşîna li dijî desthilatdariyê, li dijî kapîtalîzmê, karkerên cîhanê, sosyalîstên, cîhanê kirin yek, yanî yektiyek wan a ku çêbû baş bû. Di wî aliyê xwe de baş bûn.

Lê belê aliyê wê yê xerab çi bû? Zêde eznavend bû ku însiyatîfa tevgera komunîst a cîhanî nehiştin. Mînak her tevgerek komunîst li welatekî cîhanê girîng e ku rewşa welatê xwe esas bigire, li gorî wê polîtîka çêbike, ew însiyatîf lewaz bû. Wê însiyatîfê destpêkê ve lewaz bû ziyan da, lê di serdema Stalîn re, serdema ku Sovyet bû dewletek netew yanî bo weke dewletek netew, bin navê parastina sosyalîzmê de berjewendiyên xwe esas girtin, ev kir, ev însyatîf bi temamî ji holê rabû, gav bi gav partiyên komunîst, li gorî rewşên welatê xwe na, di çarçoveya berjewendî û daxwaziyên Sovyetê de tevgeriyan. Di çarçoveya

berjewendî û daxwaziyên Sovyetê de tevgeriyan. Vê ziyanek mezin da tevgera komunîst li Rojhilata Navîn.

Ji ber çi? Sovyet di cîhanê de bû dewletekî mezin. Dewletekî ku tê de desthilatdarî li pêş bû. Dewletek birokrat e, dewletek di aliyê sîstema otorîter de weke mînak, ev dewlet berjewendiyên wê hebûn. Vêcarê ji bo fikirê wekheviyê bela bike na, wek hêz ji bo ku di cîhanê de bibe desthilatdar, kar kir. Yanî weke beramberî Emerîka kar kir.

Di esas de sedemên hebûna Sovyetê berê çi bû? Sovyet weke navendekî sosyalîzmê karibe tevgerên gelan li dijî emperyalîzmê destek bike, ne ji bo berjewendiyên xwe. Lê di serdema Stalîn û Şûnda jî, gav bi gav taybetmendiyên dewletê xwe derxistin pêş, berjewendiyên wan derketin pêş, li ser esasê wan berjewendiyana, vê carê nêzîkî cîhanê bûn.

Ji bo vê li ser esasê belavkirina sosyalîzmê na, li ser esasê berjewendiyên xwe, bi herêmên cîhanê cuda cuda sîstem çêkirin. Destwerdana Emerîka Latînî kir, ji bo ku Emerîka bixe zoriyê. Destwerdana Rojhilata Navîn kir, destwerdana van deran kir. Lê belê li gorî Emerîka Sovyet pir bi feydexwaz (avantac) bû. Ji ber ku dema ku girseya gel hemû li dijî kapîtalîzmê mêtingeriyê nerazîbûn, di Sovyetê re xelasiyê dibînin. Hêzekî di her welatî de çêbû, ew hêza he bi awayekî xwezayî girêdayî Sovyetê bû, ew partiyên komunîst girêdayî Soveytê bûn.

Li şûna ku Sovyet van kesan bike hêz, ji bo ku di welatê xwe de wekheviyê û demokrasiyê bînin, li şûna wê ew ji bo xwe kirin weke maşen û di çarçoveya berjewendiyên xwe de dane xebitandin.

vê komna partiyên komunîst lewaz kir, propoganda ku li dijî wan hîna zêdetir mafdar derxist, li dijî wan çi digotin, digotin, “ Ev partiyên netewî nînin, komunîzm tiştekî barkiriye, ji derve ye. Ne fikirekî Rojhilatiye, em mirovên dîndar in, gelê me hene, netewên me hene, bi vê propoganda komunîzmê propogandakî ji me biyanî ye. Ji derveyî vê ji jixwe ev partiyana ji bo welatê xwe na, ji bo Sovyetê dixebitin. Girêdayî Sovyetê ne.” Heta hinek gotinên wiha seyr derdiketin, mînak digotin, eger li Moskova baran dibare, komunîstên Rojhilata Navîn sêwanê radikin. Tevî ku di welatê wan de baran tine be jî, lê dîsa sêwanê hildidin.

Ev ji bo çi bû, ango li gorî şert û mercên xwe na, li gorî daxwaziyên Sovyetê her demê tevdigeriyan. Xuliqkariyek partiyên komunîst di herêmê de li ser esasê ku di aliyê siyasî de di gelek tiştan de xwe ji Sovyetê cuda bikin derneket. Her demê tabîa man, her demê Sovyet ji bo xwe weke quble nîşan dan. Wek esas nîşan dan, vê Sovyetê bikar anî, îstismar kir, her demê ew weke maşetan dane xebitandin, heta ku Sovyet hilweşiya jî kunima partiyên komunîst di Rojhilata Navîn de ev bû. Partiya komunîst li Sûriyê, li Misrê, Îraqê, Îranê ev bû û bi vî rengî bûn.

Sovyetê çawa kir, di salên şêstî de, desthilatiya radîkal a Ereb çêbû. Miliyetger û radîkal e, lê behsa sosyalîzm kirin.

Sovyetê çi got, gotin; ”temam, Bas, Nasirî, ev sosyalîst bûn, lê ne sosyalîstên bi hêz bûn, ji ber çi? Karker lewaz in, fikir lewaz in, ji bo vê gotin em ê bi van welatan re alîkar bin, senaiyê derbasî wir bikin, bi wan re di aliyê madî de alîkar bin, gav bi gav ev desthilatiyana wê bibin sosyalîst, bê ku di kapîtalîzmê re derBeasbibin wê bighîjin sosyalîzmê. Ji bo vê teoriya Xorşêt hebû, di pişt re jî Brjener jî berdewam kir, di zemanê xwe de hev her du jî skreterên partiya komunîst a Sovyetê de.

Teoriya wan ev bû, **Pişketina ne Kapîtalîst**. Yanî rêka ne kapîtalîst. Çi bû ev rêka ne kapîtalîst, ango welatên weke Misrê, Sûriyê, rêxistinên birjiwaziya biçûk radîkal miliyetger bûne desthilatdar tê de, wê bi van rêxistinan re alîkar be, wê wan yunlendirme bikin wan ber bi sosyalîzmê ve bibin. Ev xapandin e, esl û astarê wê tine ye, jixwe tiştek ha çênabe.

Lê belê tiştê ku ziyan da çi bû? Dema ku Sovyet Misr, Sûriyê, Îraq weke hikumet muxateb digirtin, dostanî bi wan re datanîn, konumê komunîstan lewaz dikir, destê dewletan li dijî komunîstan bihêz dikir, kuştinên komunîstan çêdibûn Sovyetê beramberî wan bêdeng dima, heta di cih cihna de jî Sovyet bi xwe ji partiyên komunîst re digot, ”rêjîmê nerehet nekin. Ji bo ku têkiliyên me xerab nebin.”

Ango komunîst xistin xizmeta dewleta netew, li Misr, Sûriyê, Îraqê wiha kir. Dihatin kuştin, lê dîsa xizmet dikirin. Dihatin kuştin, Sedam her roj komunîst sêdar dikirin, lê dîsa jî pê re bûn, bi perspektîfên Sovyetê. Sûriyê tiştek nema bi serê wan de neanî, lê dîsa jî pê re bûn, Misrê hemû xistin zindanan lê dîsa jî pê re bûn. Vê ziyanek mezin da tevgera komunîst.

Dîsa ziyana mezin li Îranê çêbû. Çi bû ew ziyana mezin li Îranê? Pirsgirêkên yên ku TUDEH'a dijiya. Mesele TUDEH'a endamên wê pir hebûn. Pir li ser gel bi bandor bûn. Ji ber TUDEH'a heta astekê rastiya civaka Îranê fêm kiribû, ji bo vê hinekê gotinên wê nêzîkî gel digotin. Gel li derdorê kom dibûn, lê têkiliyên Sovyetê yên çewt ew TUDEH' jî kir qurbana berjewendiyên xwe.

Her demê têkilînî baş bi Îranê re deyîne, her demê beramberî berjewendiyên xwe komunîst jî firotin, Kurd jî firotin, gelek kesên din jî firotin. Ev nêzîkbûnên Sovyetên yên berjewendîparêz, bû sersebebê ku tevgera komunîst derbên mezin bixe. Perspektîfên wê yên desthilatiyê çênebin, nikaribin bibin desthilatdar. Ew enerjiya li dijî dewletê ya ku kom bûbû, hemû weke çawa mirov bêje vala hate xerc kirin.

Niha ew enerjî ne enerjiyek ji rêzê ye. **Dema em dibêjin tevgera komunîst li Rojhilata Navîn, em behsa însanê herî hêja di vê civakê de dikin**. Bi exlaqê xwe, terbiya û zanistiya xwe, ji her tiştî girîngtir bi qehremantiya xwe. Yanî bi komunîzmê bawer bûn. Di oxira baweriya xwe de hemû rengê îşkencê didan ber çavên xwe.

Di binê zindanan de, beramberî vê hovitiyê, faşîzmê, îşkenca xerab, di Îraq, Misrê , Sûriyê, Tirkiyê û Îranê de li ber xwe dan, pir li ber xwe dan. Însanên herî bi nirx di vê civakê de, bi wan mirovanan eger di rêka rast de bimeşiyana deh şoreşên zihniyetê, deh caran wê şoreşên civakî çêbûbûna. Lê belê vê nêzîkbûna Sovyetê ya berjewendîparêz, yunlendirma çewt, bi awayekî eznavendî dana meşandin, bû sersebebê ku ti carî ev tevgerana însiyatîfê nexin destê xwe, ti carî li gorî berjewendiyên welatên xwe tevnegerin, ji bo vê timî bêbandor man, bûne tevgerên bêbandor.

**Yek ji sedemên ku tevgera komunîst li Rojhilata Navîn bi ser neket yek jê nêzîkbûnên Sovyetê bûn.** Ya duyemîn, nêzîkbûnên tevgera komunîst bi xwe bûn.

**Nêzîkbûnên Tevgera Komnîst Ên Dogmatîk Ji Rojhilata Navîn Re**

Tevgera komunîst Marksîzm, Lenînîzm bi rengekî xuluqkarî negirtin dest. Bi rengekî dogmatîk girtin dest. Herî dogmatîkên mezin, komunîstên Rojhilata Navîn bûn. Li Ewrûpa dîsa mînak komunîstên Fransî, yên Îtalî, li gorî xwe hinek di ber çav re derBeaskirin. Li gorî mercên xwe ji nû ve Marksîzm nirxandin. Mektebên nû derketin, di Rojhilata Navîn de cesaret nekirin. Weke metnê Quranê girtin dest. Ji bo vê propoganda dihat kirin, lê ew propoganda ne rast teqînî bû. Rastiya civakî ya Rojhilata Navîn îfade nedikir. Çima ji ber ku metîn bû, jiberkirin bû.

Komunîstên Rojhilata Navîn Marksîzm bi rengekî li gorî rewşa welat derBeasnekirin, pirtûk wergerandin. Ji bo vê Lenîn wiha gotiye, di filan rûpelê de ha gotiye, di filan pirtûkê de ha gotiye, Marks ha gotiye, lê ev ji bo Elmaniya derbasdar bû. Ji bo Rusya derbasdar e, lê ji bo Sûriyê, ji bo Misrê, ji bo Sudan, ne wiha ye.

Ji bo vê mînak carna, nîqaş wê çêbûbana, wê dawiya dawiyê wiha bigitiban, wê yek bihatiba li ser radyo, di rojnamê de wê pirsek jê bikiriba, wê bigitiba, mînak Ebdul Xaliq Mehcub hebû, demekî bû Serokê Sudanê, yanî skreterê partiya komunîst bû, di astê ku bibin desthilatdar bi hêz bûn. Di pişt re derbe li ser kirin ew kuştin, rojnamevan jê re vê dibêje; “Xwedê heye, tine ye?”Niha bêje heye li dijî komunîzmê ye, bêje tine ye wê gel jê nereht bibe. Lê belê nikare bi fikirê xwe re berovajî bibe, dibêje; Xwedê tine ye.

Halbikî li Rojhilata Navîn komunîst divê ku neketibana nava nîqaşekî wiha ka Xwedê heye, tine ye. Li Rojhilata Navîn îdialîzm cuda ye, meteryalîzm cuda nikare bibe. Ji bo vê komunîzma Rojhilata Navîn pêwîst e. Ango pirsgirêk di ku de bû, xuliqkarî tine bû, metîn bû, bi rengekî qalibger ferz kirin hebû.

Ev dibû sersebebê ku wer civak li dora tevgera komunîst zêde kom nebin. Jixwe tevgera komunîst bi rengê xwe yê kevneşop ev bû. Roj bi roj paş diket. Berê zêde berfireh bûn, bi

taybetî di nava Ereban de, li Îraqê, komunîstên Îraqê zêde belav bûn. Ji ber çi, ji ber ku senaiya petrolê hebû, karker hebûn, feqîr zêde bûn, dora wan kom dibûn. Ya Sûriyê ya Misrê, Sudan wiha bûn.

Li Tirkiyê pir zorî kişand, nikarîbû tam bibe hêzek mezin, ji ber ku nikarîbû xwe ji Kemalîzmê xelas bike. Di bin navê netewperstiyê de nikarîbû vî sînorî dayîne. Kemalîzm şerê emperyalîzmê kiriye, ew jî li dijî emperyalîstane, wê demê di navbera xwe û Kemalîzmê de wê çawa sînor deyînin, kirin nekirin, nikarîbûn sînoran deyîne, heta roja me ya îro jî nikarin bikin. Ji bo vê nebûn tevgerek civakî timî bûn weke milê çep yê miliyetgeriya Tirik. Sekina wan ya neyînî li hemberî tevgera azadiyê jî timî li ser wî esasî pêş ket.

Tevgera komunîst bi rengê xwe yê klasîk ev bû. Tevgera komunîst dema ku Sovyet hilweşiya tirajediya xwe ya herî mezin jiya. ji ber çi? Tevgera komunîst sedemên xwe yên hebûnê, rewabûna xwe bi erêkirina Sovyetê digirt. Mînak, berê dema ku nû PKK'ê di bakur de di çi rewşan de pêşket û mezin bû, çawa nîqaş kirin, em zêde ne şahidbûn, lê me dibîhîst, lê dema ku PKK'ê derbasî Sûriyê bû pirsa yekem ev bû? PKK'ê Marksîst, Lenînîst e, lê ev bû, Sovyet we nas dike? Hevalan digotin, Sovyet çi ye? wan jî digotin, yaho du heb zilamên we tine ne, hûn Sovyetê rexne dikin! Qey tiştek wiha çêdibe, çawa komunîstin, çawa Sovyet we nas nake! Eger Sovyet we nas neke, wê demê hûn ne komunîst in. Wê demê ev ji rê derketin e. Bi vî rengî nêzîkî PKK'ê dibûn, ji ber çi? Ji ber ku pîvanên partiyek komunîst, divê bi erêkirina Sovyetê re derbas bibe.

Partiya komunîst têkiliya wê bi Sovyetê re hebûn, ji bo vê komunîst kî bûn, partiya komunîst ya Sûriyê bû. Ya Îraqê bû, ya Tirkiyê bû, hwd, yên ku Sovyetê ew qebûl dikirin. Yên derveyî wê ne komunîst bûn, komunîst nedihatin dîtin, ji aliyê partiyên komunîst ve dihatin teşhîr kirin, weke ji rê derketin, heta weke sîxûrên emperyalîzmê dihatin nirxandin.

Ji bo vê digotin, PKK'ê ji emperyalîzmê re şer dikin, dixebite. Ji ber çi, ji ber ku li dijî Sovyetê bû. Sovyetê rexne dike, dema ku Sovyet hilweşiya, vê carê wê kî erêkirinê bide wan, çavkaniya xwe yên erêkirinê û rewabûnê wenda kirin. Ji bo vê hilweşiyan, wiha sêwî man, berê wer çawa pozbilind bûn, li xwe danetanîn ku li mirov temaş bikin. Ji ber çi, Sovyetê ew qebûl dikirin, her çend salan carekê sekretêrê wan diçûn Moskova ziyaretê, li otêlên loks didan rûnişatandin, xwendevanên wan didan xwendin, bi vî rengî wer xwe mezin didîtin. Ji nişkê ve, bavê wan mir û sêwî man. Kesê erêkirinê bide wan, kesê ku wan qebûl bike tine.

Vê bi xwe re nexweşiyek derûniyek pir xerab derxist holê, çi nexweşî bû ew? Nexweşiya çerxbûyînê bû, çerxbûyî kî ye, morted e. Tu ji tiştekî bawer bî, pişt re tu dev ji wê baweriyê berdî. Ji bo vê kesmekî wer di nava komunîstan de derket dejenerebûyî, xwe firoş, sîxûr, her tiştên xerab. Ji ber çi, hêviya wî hemû hilweşiya tiştê ku pê bawer bû xerab bû, çi rê pêşberî wî

ma? Rêka li pêşberî wî ma radest bûn. Xwe teslîmî sîstemê bike, bibe parçek ji vê sîstemê. Bêje, me heta niha ji bo wî kar kir xerab bû, ji lewre hinek bûn dîndar, hinek bûn diz, hinek bûn sîxûr, hwd. Bi vî rengî tevgerek çerxbûyî wer xerab derket, vê jî jixwe êşand.

Bi giştî ziyana tevgera sosyalîsta pêkhatî li Rojhilata Navîn bi çi çêbû? Esas hêza ku berendame ku çareseriyê bi xwe re bîne, hêza ku berendame bibe alternatîf, hêza berendame bibe dînamîkê têkoşînê yê serekî, bi vî rengî Rojhilata Navîn ji kaos derbixe, çareseriyê bi xwe re bîne dozenekî adil nû deyîne, ew hêz di çarçoveya armancê gelên Rojhilata Navîn de na, bi perspektîfên derve de hate birêvebirin. Ji bo vê jî fayda wê li gel çênebû. Hîna zêdetir ji rastiya xwe biyanîbûn çêbû.

Tişek din jî têkoşîna li dijî sîstemê em tiştekî li ser nabêjin, rastî jî di gelek pêvajoyên xwe de qeheremaniyek mezin dane nîşandan. Kapîtalîzm teşhîr kirin, lê belê yê herî zêde modernîta temsîl dikirin li Rojhilata Navîn komunîst bûn. Ji bo ku xwe di civakê de bin navê şerê li dijî kevneşopiyan de, ji bo xwe ji civakê cuda bike her tişt kir. Vê propoganda çewt ya li dijî wan hinekê mafdar derdixist. Jixwe ew propoganda ne mafdar bû, esl û astarê wê propogandayê tine bû, lê bi teşeyê xwe, bi qebûl kirina modernîta, bin navê nûbûyînê de ev zemîn pêşkêş dikir.

Ji bo vê tevgera komunîst klsîk li Rojhilata Navîn ji cewher bêtir ew dûr xistin yanî biyanîbûn çêkir. Carek din dînamîkê gel ji derveyî xetê hatin xerc kirin. Yanî ji derveyî berjewendiyên wî hatin xerc kirin. Di oxira berjewendiyên Sovytê de hatin xerc kirin.

Gelo qet tevgereke alternatîf tine bû? Tevgera alternatîf hebû, kî bû ev tevgera alternatîf? Mînak, di kesayeta tevgera çep ya Filîstînî de me behs kiribû, tevgera Eniya (Cebha) Gelêrî di bin rêveberiya Corc Hebeş de, wan gotin êdî ev partiyên komunîst klasîk bersivê nadin û tevgerên rast jî bersivê nadin, xeta miliyetger jî êdî nema dikare bi ser bikeve, ji bo vê encax çep dikarin bikin, çepên Marksîst, Lenînîst ên serbixe. Lê belê bi wan prensîbên xwe demdirêj nikarîbûn li ber xwe bidin. Ji ber ku her kes ew li ber xwe ve kişandin. Li wan dan, li Urdun li wan dan, li Lubnanê li wan dan, ew di aliyê leşkerî de lewaz kirin, di aliyê fikirî de jî xistin bin bandora xwe bi teşwîqên madî jî ew hinekê lewaz kirin, lê belê ew gavek bû.

Dîsa li ser esasê nirxên ku ji tevgera çep hatiye girtin, ya Ewrûpa, ji ber ku tevgera şêst û heştan li Ewrûpa tevgerekî ne tenê li dijî kapîtalîzmê bû. Tevgerek li dijî komunîstên klasîk bûn. Tevgerek di heman demê de li dijî Sovyetê jî bûn. Lê çep bûn, ciwan bûn, hedefên xwe bi rengekî cuda formîle kirin, rengê çalakiya xwe jî bi rengekî cuda derxistin holê, di seranserî Ewrûpa bû qadeke serhildanê.

Bi taybetî li Fransa, Elmaniya bû qadeke serhildanê. Bandora vê gelekî li ser Rojhilata Navîn kir. Di aliyê erênî de kir. Ji bo vê dema ku tevgerek çepî nû derket, li Misrê, Tirkiyê, bi

taybetî. Ya Tirkiyê bi sêdarkirina Deniz Gezmiş, Mahir Çayan wan, bi kuştina wan tesfiye bû. Yan jî lîberalîz bû, yanî derbe xwar.

Ya Misrê çalakiya wê ya herî dawiyê çi bû, di sala 1977'an dîsa heman di meha ocaxê de, weke çawa Misrî di heman mehê de rabûn, di heman mehê de ew tevgera çep rabû ser piyan di hemû Misrê de heman weke Ewrûpa di Fransa Elmaniya de çawa ciwanan kir, heman li Misrê de jî ha bû. Saziyên dewletê hatin dagirkirin, malê dewlemendan hatin talan kirin, mixazên wan hatin şikandin, weke çawa ciwanên Ewrûpa çi kirin ên Misriyan jî wiha kirin.

Lê belê nikarîbûn bibin desthilatdar, ev yek. Dewletê ew tepeserkirin, di piştî wê re Ewrûpa piştî sala 1968'an prensîbê sosyal dewlet derxistin pêş, yanî dewletê xwe nerm kir. Rê ji demokrasiyê re vekir.

Di Rojhilata Navîn de ev çênebû. Rojhilata Navîn dewletê çi kir? Çep kuştin, avêtin zindanan û rê ji dîngeran re vekir. Ji bo vê mînak muxalfeta Misrê heta salên heştêyî qerekterê wê çep bû. Di zindanan de tije însanên çep bûn, ji heştê û bi şûn de, vê carê Îslamîgir jî kuştin. Sedemên wê çi bûn, welatên Kendavê, petrol, dewlemendî, mûçe, karker di nava xwe de digirin, Milyonek Miserî çûn Siûdiyê, milyonek û nîv çûn Lîbya, nîv milyon çû Kuwêt, hwd, van çûn wir hem pere qezenc kirin, lê hem jî fikirê wan jî hate guhertin bûn Îslamger. Bi vî rengî tevgera çep wer tesfiye bû, li şûna wê tevgerên dînî derketin pêş.

Di Kurdistanê de, vê tevger PKK'ê temsîl kir û heta roja me ya îro jî çepatiya Rojhilata Navîn, sosyalîzma Rojhilata Navîn, gav bi gav bi xuliqkariya Rêber Apo ve di aliyê teorîk de, sedemên xwe peyda dike. Di aliyê piratîk de jî rêxistinbûyîna xwe pêş dixe. Bi vî rengî mirov dikare tevgera çep bi nav bike.

### Li Rojhilata Navîn Pêşketina Dînê Îslamê

Yek ji pirsgirêkên ku wer hem çavkaniyên wê yên hundirîn hen, lê ji aliyê der ve de tên meşandin. Bi vî rengî enerjiya civakî ya Rojhilata Navîn bi rengekî berovajî dide xerc kirin. Yek jê jî meselê dîn e.

Niha jixwe dîn gelek aliyên wê hene, lê belê em ê di vê xalê de bi taybet li ser dînê Îslamê rawestin. Dîroka wî, kengê derketiye, çi bûye, em ê li ser vê ranewestin; lê belê em ê li ser hinek tevger û rêxistinan bisekinin ka bi çi awayî bandor li ser pêvajoya civakî kirine û bi çi awayî rê ji krîzê re vekirine.

### Tevgera Wehabî

Ji lewre hêzên dînî yên bihêz di Rojhilata Navîn de tevgera Wehabî ye. Tevgera Wehabî divê ku mirov baş binirxîne. Tevgera Wehabî weke rêyekî xelasiyê xwe nîşan da. Di dawiya sede sala 18, yanî di sala 1780'iyî bi şûnda, di destpêka sed saliya 19. de belav bû. Yê ku ev tevger dest pê kir, mirovekî ji welatê Hicazê ye, herêma Necîb, li Siûdiyê ye. Navê wî Muhemed Ebdul

Wehab e. Muhmed Ebdul Wehab, ev tevger dest pê kir. Ev tevger çi ye?

Tevgerek selefiye, ango pala xwe dide bingehan, yanî vedigere esil, dîrokê, dîroka Îslamê, tevgerek li dijî Rojava ye. Li dijî îştîhada di Îslamê de ye. Îslam weke metin weke Quran weke hedîsê Pêxember esas digire. Ji derveyî vê tiştekî din qebûl nake. Li dijî nûbûnê ye.

Bi vî rêbazî Muhemed Ebdul Wehab, dixwest ku hêza şaristaniyê di Ereban de careke din bihêz bike, weke navendekî şaristaniyê, dewletekî bi hêz careke din têkeve dewrê.

Sedemên wan ev in, eger îro em nikarin pêşbikevin, sedemên wê em jî Îslamê dûr ketine. Dema ku em Îslam bûn, em rasteqînî Îslam bûn. Wê çaxê me hemû cîhan hikum dikir, lê ji ber ku îro em dûr ketine, terîqet derketine, mezheb derketine, perçebûn çêbûye, ev bûye sersebebê ku em nikaribin li nava cîhanê xwedî deng bin. Xeteriya herî mezin Ewrûpa ye, Rojava ye, ji bo vê beramberî fikirê Rojava felsefe, hemû fikirê Rojava divê ku em girtîbin, red bikin. Bi vî rengî em karibin xwe biparêzin.

**Tevgerekî muhafeze kar e,** îltîcaî ye, yanî li ser esasê paş de vegerandinê esas digire û tevdigere.

**Derûniya Tevgera Wehabî**

Dema ku em vê binirxînin, ji ber ku ev tevger di roja me ya îro de jî li gelek cihan dixwaze belav bibe. Sedemên wê çi ne, yan jî mirov çawa dikare bi rengekî obcektîf meuduaî binirxîne? Acizbûna beramberî pêşketinê, însanek dema ku nikaribe pêş bikeve, paş de vedigere. Însanek dema ku hêza wî pêşketinê tine be, hêza wî ya pêşbaziyê tine be, paş de vedigere.

Xelasiyê di paş de vegerandinê de dibîne. Wiha çavê xwe digire. Bi vî rengî xwe xelas dike. Ew ziyan e, ziyanê dide civakê. Li şûna bi ked, çalakî, zanistî, bi Rojava re bikevin pêşbaziyê, li şûna wê, wê hêzê di xwe de nabîne, çi dike, yan jî wê perspektîfê nabine, ew tine ye; bi paş de vedigere. Ev beriya her tiştî programekî xelasiyê nîne, bi xwe re xelasiyê nayîne. Tam berovajiyê wê ziyan e.

Ev aliyekî wê ye, aliyê duyemîn ev tevger ti carî serbixwe nemaye. Yanî rast e gotin em li dijî Rojava ne, lê ji sedsaliya 19.ta roja me ya îro her demê sîxûriyê ji Rojava re dikin. Bi çi awayî sîxûriyê dikin? Bi Îngilîzan re bûn yek li dijî Osmaniyan şer kirin. Piştî wê bi emperyalîzmê re bûn yek li dijî komunîzmê şer kirin.

Mînak hevkariya mezin, di navbera Wehabî, yanî koktencî Îslam û di navbera emperyalîzmê, mînak herî mezin û balkêş mînaka Telîban û Elqaîde ye.Niha em vê bi vî rengî dikarin bigirin dest.

Şerek di navbera komunîzmê û kapîtalîzmê de hebûye, şerek di navbera sosyalîzma pêkhatî û kapîtalîzmê de hebû. Ew şer, şerekî gelek xerabiyên wî hebûn, li ser qismê xerabiyê yê ku

bandora xwe li ser Rojhilata Navîn kirî bi kurtayî be jî em rawestiyan. Lê gelek sûda wê jî hebûn. Fayda wê çi bû?

Yek dema ku Sovyet hebû dijmin, dijminek navê wî Sovyet beramberî emperyalîzmê hebû. Emperyalîzm neçar bû ku gavên demokratîk biavêje. Dema ku Sovyet ji holê rabû, emperyalîzm êdî pêwîstiya xwe nabîne ku gavên demokratîk biavêje. Hîna zêdetir navendî bû, hîna zêdetir destpot bû, hîna zêdetir bêsînor şidetê dide meşandin.

Lê belê emperyalîzm her demê xwest Sovyetê tengav bike, tine bike, bi şêwazên cuda cuda, ev gelek in, yek ji van şêwazan jî Îslam bû. Bi taybetî jî di Rojhilata Navîn de bi çeka Îslamê li dijî Sovyetê xwest bisekinin.

Hemû tevgerên dînger destek kirin, bi xwe destek kirin, bi peran destek kirin, hemû tevgerên dînî li Rojhilata Navîn çavkaniyên wê Rojava ne. Erbekan çavkaniyên wî Elmaniya ye. Fethulah Gulan di roja me ya îro de li Emerîka ye. Nizanim, ên Rojhilata Navîn jî bo vî rengî ne.

Sovyet belav dibû, nifûsên xwe zêde dikirin. Serweriya xwe zêde dikir, bi taybetî jî li Asya Navîn xwedî hêz bû. Qismek mezin ji asya navîn jixwe parçek ji Sovyetê bû. Ji lewre Girgîziya, Uzbekstan, Tacikstan, ev parçek ji axa Sovyetê bûn. Bi vî rengî dixwestin bandorê li ser Efxanistanê jî bike. Her demê dostên wê di Efxanistanê de hebûn. Komunîst di Efxanistanê de hebûn, sosyalîst hebûn. Li ser vî esasî şerê hundirîn ê ku li Efxanîstanê çêbû, pirsgirêk derketin. Ji bo ku Sovyet vê meselê kontrol bike, bi gavekî xetalî, ango bi biryarekî şaş di sala 1978'an de, dagirkir.

Dema ku dagir kir li dijî vê propogandak çêbû, xwestin Sovyetê di wir de di nava çiravê de bihêlin. Ev boyera Elqayîdê bi vî rengî çêbû.

**Çêbûna Elqayîde**

Komek SAA'ê piştî dagirkirina Sovyetê li Efxanîstanê diçin Siûdiyê Erebistanê. Li Siûdiyê bi malbata qiral re li ser rewşa Efxanîstanê nîqaş dikin û dibêjin; "Em dixwazin berxwedanekî li dijî komunîzmê lidarbixin, lê ji bo ku ev berxwedan bide bawer kirin, divê ku hinek kesên ji we di nav de hebin, hemû Mislimanên cîhanê di nav de cih bigirin. Ji bo ku bide bawer kirin jî pêwîst e yekî jî mala qiral jî di nav de hebe ku em karibin alemê li derdora vê berxwedanê kom bikin."

Jixwe Siûdî ji van tiştan re amade ye ku li dijî komunîzmê kar bike. Lê kes ji mala qiral ji mîran yên malbata qiral yên serwer kesî ev peywir qebûl nekirin. Encex kê qebûl kir, Usama Biladin qebûl kir. Ew jî ji malbatek pir dewlemend bû. Mirovatiya wan û mala qiral re heye, jin dane hevdu, jê û şûnda di aliyê madî de pir dewlemend in, Wehabî ne, yanî bi dîn ve girêdayî tên nasîn.

Usama Biladîn ev peywir qebûl kir û çû Efxanistanê, bi xwe re gelek ciwanên Misilman birin. Ji Siûdiyê, Sûriyê, Misrê, Urdunê,

Îraqê, ji her derê ciwan pê re çûn. Bi vî rengî di rastiyê de van dewletan çi kirin? Yek şerê li dijî komunîzmê bihêz kirin, ya duyemîn yê ku gengaz e muxalif bin li dijî wan, Îslama radîkal xwe ji wan xilas dikirin.

Elqayîd e, wê demê rêxistinekî SAA'ê ye! Bi vî rengî çêbûye, bi vî rengî jî ji hemû welatên Ereban li dora wê Misilman kom bûn. Cîhada li dijî komunîzmê îlan kirin. Ji bo rizgarkirina erdê Misilmanan.

Vêca ev çi dibû, ew wiha bi rêxistin dikirin, fînansekirinê vêcarê wê çawa çêbibe? Li Îmarat banqek çêkirin, navê wê banqê, benkil îamar weltenmiye, yanî îemar ve qalqime bankasî, çêkirin ji gel heye ku banqekî xwezayî ye. Perên ku wê bişînin Mucahîdên Efxaniyan re, Elqayîde û girêdayî wê rêxistinên din, perê ku ji wan re dişînin hemû di wê banqayê de di wir de kom dibin. Ti kareke din yê wê banqê tine bû.

Jixwe seyr bû, dema ku Sovyet ji Efxanistan derket, wê banqê jî îflas kir û çû. Ji ber ku ti karê wê nema, ji ber ku bi milyonên dolaran didanê. Bi wan peran çi dikirin? Çek dikirin, çekên modrm dikirîn.

Ji ber ku dema Emerîka bi xwe çekan bide wan wê demê dibe aliyek şer li dijî Sovyetê. Zangonên şerê sar vê qebûl nakin. Ji bo vê Emerîka weke çawa sîlah difiroş e. Bi çi difiroş e, bi wan perên ku ji Siûdiyê, Îmarat, Kuwêt, Qeter, ji welatên Kendavê yên Ereban di banqayê de spî dibin, bi vî rengî pê çekan ji bo tevgera Cîhadê di Efxanistan de tên kirin.

Jê û şûnda ev şer wiha mezin bû. Wê demê şerê li dijî Sovyetê di Efxanistan de hate kirin çi bû? Perên Siûdiyê bûn, yanî perên welatên ku petrol tê de hebûn yên Ereban bû. Teknîka Emerîkî bû, yek jî zindîkirina Misilmantiyê bû.

Bi rastî jî van di encamê de qezenc kirin, Sovyet çi bû, Sovyet di paş de derket. Dema ku Sovyet derket Emerîka êdî bêxem nêzîkî vê rêxistinê bû. Ji ber ku karê wê pê qediya bû, eger Elqayîde li dijî Emerîka çalakiyan dike, li dijî Emerîka niha şer dike, sedemên wê wer şerekî bi prensîb nîne.

Ev şerkî derûniye, nêzîkbûnên feodalî yên ku dibêje yekî ez bikar anîme û di pişt re de ez avêtim, tolê jê radike. Yek sedemên vî şerî jî tolhildan e. Ji ber çi, Emrîka Misilmantiyê bi kar tîne, jê re xizmetê nake. Misilmantiyê bikar tîne ji bo ku pê sîstemekî rabike, ya xwe ava bike. Ne Misilman in.

Ev dibin serserbebê ku ev Misilmanên radîkal li dijî Emerîka piştî hilweşandina Sovyetê bikevin nava şerekî, ev jî rast e ew şer heye. Lê ew şer ne şerekî bi prensîb e. Şerekî parê ye, yanî para xwe bistîne. Hatiye xebitandin û hatiye avêtin. Nerazîbûnê nîşan dide, ji bo vê perspektîfên wê yên serkeftinê tine ne. Heta îdîayên wiha jî hene mînak Kastro, îdîa dikir, û digot; "Ez niha jî îdîa dikim ku mûçê Biladin hîna jî SAA'ê dide." Di vê astê de girêdanên di navbera emperyalîzmê û tevgera dînî ya

radîkal, yan jî koktencî bikok de heye ku wer zû zû ji holê ranabe, emperyalîzm dide xebitandin.

Wihabî, Elqayîde rewşa wan ev e. Di roja me ya îro de jî li derên cuda cuda dixwazin hebûna xwe bînin ziman. Lê belê her demê ji bo xebitandinê vekirîne. Yanî serbixwe nînin, ji bo berjewendiyên gel nînin, ji bo bikaranînê her demê amade ne.

**Pêşketina Tevgera Îxwan Muslimîn**

Tevgera din ya dînî ku li Rojhilata Navîn derket çi bû? Tevgera Îxwan Mislimîn bû. Ev tevger ne Wihabiye, hîna zêdetir siyasî ye, hîna zêdetir ji bo desthilatdariyê kar dike. Yanî desthilatdariyê hedef digire. Zanistiye, wer bi taybetî çanda Rojava heta astekî qebûl dike, lê belê dînger e. Ev tevger, di sala 1930'iyî bi şûn de li Misrê çêbûye. Di sala 1920-1930'iyî di wê demê de li Misrê çêbûye.

Bi serkêşiya kesekî bi navê Hesen Bena, tevgera Îxwan Mislimîn li Misrê çêkir. Li her derê welatên Ereban belav bû. Li Sûriyê, Îraq, Lîbiya, Urdun, Sudan hwd, li gelek welatên Ereban ev tevger belav bû. Di cih cihna de niha jî xwedî cih in.

Mînak li Urdun, di perlemeterê de hene, li Sûriyê de bihêz in. Di Sûriyê de di şerekî de wenda kirin, şerekî pir dijwar bû di salên 1980-1982'an de, lê belê di aliyê siyasî de hîna jî rêxistinek wan heye.

Perspektîfên wan ê desthilatdariyê hebû, kar kirin, mezin bûn. Bi taybetî di Misrê de gelekî vê carê deng vedan, ew jî di salê 1960'iyî de bû. Dema ku hêza wan a teorîk pêş ket. Hêza wan a teorîk kê pêşxist. Kesekî bi navê Seyd Qutub. Seyd Qutub mînak pirtûka **Dînê Me Ev e**, çêkiriye, gelek pirtûkên din derbarê şerîatê de çêkirine. Pirtûka **Tefsîra Quranê** çêkiriye. Seyd Qutub di aliyê teorîk de pir li pêş e.

Cemal Ebdul Nasir di sala 1964'an de Seyd Qutub carekî girt û xist zindanê. Di zindanê de gelek pirtûk nivîsandin. Lê belê wê demê ne kuştin, sêdar nekirin. Diviya bû ku sêdar bikiribana, dixwestin sêdar bikin, lê serokê Îraqê Ebdul Selam Arif wê demê çû fermî ji Cemal Ebdul Nasir tîka kir, gotê; "wî berdin." Cemal Ebdul Nasir jî qebûl kir û ew berda. Piştî ku ew berda û di demekî kin de, careke din boyerek çêbû, reşkujiyek li dijî Cemal Ebdul Nasir çêbû, Îxwan Mislmîn sucdar kirin, hema Seyd Qutub û birê wî girtin û tavilê ew sêdar kirin. Her du jî sêdar kirin, birayê wî jî pê re her du jî sêdar kirin. Seyd Qutub hate sêdar kirin.

Lê heta roja me ya îro jî berhemên wî yên teorîk, çavkaniyên zanistiya tevgera Îxwan Mislmîn ne, ne tenê ew tevger gelek kesên din jî Seyd Qutub weke referans digirin dest. Di Tirkiyê de jî nav û dengê wî heye.

Îxwan Mislimîn, perspektîfên wan ên desthilatdariyê hebû, lê nebûn desthilatdarî. Sedem ew bû ku beramberî tevgera milî ya Ereb nikarîbûn hevsengiyê çêbikin. Kirin nekirin, çalakiyên civakê ber bi Misilmantiyê ve li dijî miliyetgeriyê ve

nikarîbûn bibirana. Ji bo vê beramberî hêzên miliyetger wenda kirin.

Mînak beramberî Bas, Nasiriyn wenda kirin, bi taybetî jî bi şêwazên şidetê jî bi ser wan de çûn, nikarîbûn zêde li ber xwe bidabana. Lê belê weke hêz di roja me ya îro de jî heye. Lê weke salên pêncî şêstî, nînin, lê heye.

Ji lewre terîqet û mezheb hene. Ev jî bi kinayî be jî li ser hinek bandorên wan em rawestiyan, lê belê divê ku em vê bizanibin. Mezheb sedemên wan yên dînî hene. Divê ku em vê qebûl bikin û ev rastiyek e.

**Sedemên Pêşketina Mezheban**

Mînak mirovek tê û temaşe dike ku pêdivî bi hinek guhertinan heye. Pêdivî bi hinek nirxandinan heye. Ji bo vê mezhebekî nû derdixe. Ango mezheb jî pêdivî ne, lê ev pêdivî ji aliyê desthilatdariya siyasî ve her demê tê îstismar kirin. Bi taybetî jî di roja me ya îro de Nexşebendî ji aliyê desthilatiya siyasî ve di Tirkiyê de bi rengekî pir berfireh de tê xebitandin.

**Pêşketina Mezhebê Nexşbendî Li Kurdistanê**

Nexşbendîtî kengê li Kurdistanê belav bûye, kengê li Rojhilata Navîn belav bûye? Nexişbendîtî di sedsala 19. sala 1930'iyî di wê demê de di zemanê dewleta Baban de, însanekî ji eşîra Caf navê wî Mewlana Xalid e. Mewlana Xalid diçe Hindistanê li wir bi Nexşîgeran re naskirina xwe pêş dixe.

Ji ber ku mezhebê Nexşiyan kevntir e, meqsedê mezhebê Nexşî li ser destê kesekî ji Boxara, Boxara niha Bajarek Uzbakstanê ye, li wir derketiye û belav bûye. Li ser çi esasiye, li ser esasê tobekirinê ye. Yanî însan ji bo ku karibin bigihîjin Xwedê, karibin aîbadeta xwe baş bike, divê ku di navbera wan û Xwedê de aracî di navbera wan û Xwedê de hebin.

Kî ne ev aracî, Şêx in. Her însanekî ji bo ku karibe dînê xwe serast bide meşandin, divê ku her demê li ser destê wan şêxan de di navbera dem û demekê de bi hinek ritwelan, dînê xwe nû bikin û tobe bikin. Ji lewre ev bi gotinan, tevgeran hwd.

Li Hindistanê Mewlana Xalid ev nas kirin, Mewlana Xalid ev nas kirin. Ji wan fêr bû, ji wan hinek tiştên din, bi taybetî mijarên dermankirinê, medatsyon hwd. Paşê vegeriya welatê xwe.

Li Silêmaniyê behsa vî mezhebê xwe kir. Lê Silêmanî piranî û hemû jî Qadirî bûn. Qadiriyan li dijî wî nerazîbûn nîşan dan. Bi ser de çûn. Lê ji ber ku ya yekemîn însanekî zanebû, bi bandor bû. Ya duyemîn jî ji eşîra Caf bû, ew eşîrek gelekî mezin bû, ne kuştin, lê pir tengav kirin û Mewlana Xalid neçarbû bireve Bexdê. Reviya Bexdê, li aliyê Bexdê derbarê wî de raporek ji Sultanê Osmaniyan re şandin.

Ji Sultan re gotin; kesekî wiha heye, sultanê Osmaniyan jî got; ev tiştek baş e û em ê destek bikin. Sedem çi ye wê destek bikin? Yek ji sedeman li dijî Osmaniyan Wihabî pêş diketin, li dijî Osmaniya tevgera axa, began li Kurdistanê pêş diket. Ji bo vê hêmanekî hevsengiyê pêwîst bû. Hem li dijî axên Kurdan ên ku êdî serî li hemberî împeratorî û begên Kurdan serîhildidan, hem jî li dijî mezhebê Wihabî yê ku li dijî Osmaniyan e.

Ji bo vê rê danê, bi cih kirin. Li Helebê bi cih kirin, derfetên kar danê. Wî çawa dikir, mînak şêxek li Bidlîsê teyîn dikir, yek li Edenê teyîn dikir hwd, bi vî rengî bi şêxitiyê, yanî şêxitî bû navend, ev bû navenda balkişandina civakê, ne axa û beg.

Di ser vê şêxitiya ku Nexişbendiyê re dewletê dîsa otorîta xwe li ser herêmê xurt kir. Di roja me ya îro de jî dixwazin bi vî rengî bidin meşandin. Ji ber çi, di Nexşbenditiyê de netewbûn tine ye. Ji bo vê dema ku Nexşbendîtî li Kurdistanê serwer bibe, hestên netewî êdî lewaz dibin, dewlet bi vî rengî êdî dikare bêtir civaka Kurd kontrol bike.

**Di Rojhilata Navîn De Sedemên Pêşxistina Îslalama Siyasî**

Ji bo vê dîn, mezheb pir tên xebitandin, di roja me ya îro de Îslama siyasî, bi rengê xwe yê Îslama nerm, dixwazin vî tiştî bidin meşandin. Vê partiyên weke Erdugan, hinek tevgerên Îslamî li cihên dîtir dimeşînin, ev pir tê fînanse kirin.

Mînak em bala xwe bidinê li başûrê Kurdistanê, dibistan avakirin, nexweşxane çêkirin, mûçe dayîn, alîkariya qut û zad, ev hemû çêdibin. Kî vê dikin, dewlemendên Kurd dikin na, ew hêza wan tine ye. Lê çavkaniyê hemûyê li ku ye, li Siûdiyê ye. Yanî tên fînanse kirin ji bo ku her demê çalakiyên civakê di vê çarçoveyê de bigirin dest, bi vî rengî wer nakokiyên hey, li dijî emperyalîzmê, li dijî desthilatdariyê, lewaz bikin, di bin stara Îslamê de desthilatdarî xwe bide dewam kirin.

Ji bo vê jî tabî ev pirsgirêkekî cidî ye, weke têkoşîn jî me eleqedar dike. Ji bo vê di rojeva me de ye. Divê ku em baş şîrove bikin, li ser vî esasî jî tevgera dînî li Rojhilata Navîn em baş nas bikin, binirxînin. Kî pala xwe dide ku derê.

Mînak em di roja me ya îro de tenê em bêjin Hizbilah û bes, nabe! Hizbilha girêdanên wê bi Îranê re çi ne, girêdanê wê bi Tirkiyê re çi ne, bi Siûdiyê Erebistanê re çi ne?! Divê em van fêm bikin û li gorî wê em polîtîka pişt de bibin.

Pirsgirêka me ya dînî cidî ye, Hizbilah çi kir, weke cinayetger, weke canî ketin zindanê de. Desthilatdariyên cuda cuda bi taybetî jî mînak ji efoya Rehşanê bigire, heta zagonên pûşmantiyê hemû ne ji bo me bûn. Dibe ku ji bo ku rêxistinê lewaz bikin dibe, lê hemû ji bo ku Hizbilahgeran ji zindanê derbixînin. Ji bo ku kontra ji zindanê derbixînin. Hizbilha kes di zindanê de neman, çend heb zilamên wan ên bi nav û deng di

zindanê de man ên din hemû jixwe ji zindanê derxistibûn, her zagonekî pûşmaniyê derdixistin, dilxwe de ji bo me derdixistin, lê Hizbilahgerên di zindanê de çûn pelek mohr dikirin û ji zindanê derdiketin.

Li derve çi dikirin rêxistin çêdikirin, rojname belav dikirin. Dernek çêdikirin, mixabin Hizbilah li Amedê, mîtîngên sî-çil hezar însan çêdikirin. Li Batmanê sî-çil hezar însan çêdikirin. Li Şirnexê mîtîng çêdikirin. Ji ber ku em şîrove nakin. Ji ber ku em Îslama siyasî weke amrûrekî desthilatiyê di destê dewletê de em nagirin dest û di rojeva me de tine ye. Ji bo vê bandorê li ser gel dikin.

Me behsa Misrê kir, Misr heta sala 1980'iyî tevgera civakê çepger e. Ji sala 1980'iyî û şûnda rastger e, Îslamger e. Wê demê civak tê guhertin. Em niha wer bi xwe bawer bin, me şer kiriye, alem bi me re ne. Ji bo vê wê her demê li gel me bin, ev çîrok in. Ti sedemên wê yên madî tine ne. Çalakiyên însanan bi bandora ku li ser tê diyar kirin. Heger di roja me ya îro de di qadan de Îslamger hene, herwiha sibadusba ev Gevera ku ji serê sedî sed em dengan tê de qezenc dikin, wê sibadusiba ji dest me derbikeve.

Ji ber ku em dingan tînin, lê Fethulah dibistanan vedikin. Qursê Quranê vedike hwd, ev wê siba bibe rêxistinek siyasî, wê çaxê xwîna me rijandî hemû wê vala biçe. Ji bo vê divê ku em vê tevgerê baş bigire dest, baş perwerdê li ser bide kirin. Dema ku em li dijî derdikevin girîng e, em baş zanibin hêza zanistiyê, hêza meanewî, em baş hevdu re bigirin dest.

Ji ber ku mirovên Rojhilata Navîn bê meanewiyat nikar e bijî. Bê ruh nikare bijî, bê dîn nikare bijî. Ji bo vê emperyalîzm Îslama siyasî pêş dixe. Emperyalîzm dît ku çepgeran nikaribû qezenc bikiriban, miliyetgeriyê nikarîbû qezenc bikiriba, dîn esas girt.

Dîn ewlehiye, ji ber ku mirovên Rojhilata Navîn ji xîtaba dînî tavilê fêm dikin. Ji bo vê ergomanê xwe bi xîtaba dînî derbasî nava civakê dikin. Beramberî wê mirov nikare têbikoşê bike? Mirov dikare têkoşînê bike, hem jî serkftî mirov dikare têkoşînê bike. Ji ber ku şêwaza wan bi tiştê dibêjin re berovajiye. Dizin, şovenîst in, milkiyeta taybet diparêzin, zalim in, îşkenceger in, ji bo vê mirov dikare vala derbixîne. Lê belê baldarî lewaz e, li ser vê xalê jî divê ku mirov baş bisekine.

Em ê piştî vê beşê derbasî rexê çareseriyê bibin, di van fektorê diyarker de, ji bo kûrkirina krîzê û guhertina ji rê derketinê, yan jî mirovên Rojhilata Navîn ji erkên xwe dûrketin. Çawa ji xwe biyanî bûye, boyera biyanîbûnê çawa pêş ketiye. Bi emperyalîzm, sosyalîzma pêkhatî, bi tevgerên dînger me xwest em van mijaran rave bikin.

## ÇARESERIYA PIRSGIRÊKA ROJHILATA NAVÎN

Dema em dibêjin çareserî, wê demê em behsa hêzên ku çareseriyê dixwazin dikin, wiha em digirin dest. Çareserî weke

tiştekî motleq û rastî mirov bigire dest, ne di cih de ye. Çareserî di encamê de nisbiye. Her yek li gorî berjewendiyên xwe çareseriyê ferz dikin. Niha divê çarçoveyê de em ê li ser sê heb projên çareseriyê li Rojhilata Navîn bisekinin rawestin.

Projek ya kapîtalîst e, projek ya statukperesta ye, yanî yên muhafezekar yên kevneşop, herêmî. Projek jî proja demokrasiyê. Ev her sê proje bi şêwazê xwe, bi formîlên xwe yên rêxistinî, bi rengên xwe yê têkoşînê ji hevdu cuda ne û ne yek in. Bi hevdu re gelek bi nakokin jî. Di xalên serekî de bi nakokin. Di serî de:

### Proja Çareseriya Emperyalîst A Kapîtalîst

Ev proje, proja welatên Yekbûyî yên Emerîkayê ye, proja Ewrûpa ye. Ev proje li ser esasê ji nû ve dîzeyîn (tenzîm) kirina Rojhilata Navîn e. Ji nû de sazkirina Rojhilata Navîn e. Çavkaniyên vê projê çi ne?

Niha berê Sovyet hebû, Emerîka hebû, du hêzên xurt li dijî hev, her tim ji bo hilweşandina hevdu de di nava karekî û xebatekî de bûn. Îstixbarat, ekonomî, dplomasî, şerê navxweyî lokal ên ku pê hevu tengav dikirin, di encama vê têkoşînê û şerî de Sovyet di serî de pirsgirêkên xwe yên hundirîn, di astê têgîn de, di şêwazê avakirina sosyalîzmê de şaştî, pirsgirêk, krîza hundirîn, di asta duyemîn de jî êrîşên derve, nikarîbû xwe li ber bigirtiba, ji hilweşandinê re rû bi rû ma. Sovyet bi vî rengî hilweşiya.

Ji bo vê Emerîka ji **nû ve sazkirina cîhanê** derxist holê. Niha di holê de ji nû ve sazkirina cîhanê tine ye. Dozen kirina cîhanê çi ye, dozena cîhanê dema ku hêzên cîhanî bên gel hevdu, li ser prensîba li hevdu bikin, wê çaxê dozena cîhanê çêdibe. Ev dozena cîhanê wer rojane ne tên guhertin, rojene jî çênbin. Ev girêdayî asta saneayî, zîraet, tîcaret, li gorî wê sîstema siyasî, li gorî wê asta zihnî, dozeyîn, ev bandorê li ser çêbûna dozenên cîhanî cuda cuda çêdikin.

**Dozena cîhanê ya nû** ji aliyê Emerîka ve xepandin e. Hevsengiya (tewazina) cîhanê ya du parzemîn hilweşiya. Bi hilweşandina Sovyetê re hilweşiya. Elam girîng e ku dozenekî nû çêbikin. Ji ber ku dozena berê îflas kir. Dozenekî ji bo her kesê razî bike, her kes tê de hevpar bin, her kes tê de berjewendiyên wan pêk bên, her kes tê de li beramberî hevdu rêzdar bin beramberî hevdu. Dozenekî wiha pêwîst e. Piştî hilweşandina Sovyetê.

Lê belê Emerîka got; dozena cîhanê ya nû. Çi ye, siyaseta Emerîka ye. yanî di dema ku mîratekî yê ku li şûna dozena kevn bigire, tine bû, ne yektiya Ewrûpa di wê astê de ye, ne jî gelê cîhanê yê bindest di wê astê de bûne. Nikarîbûn însiyatîfê bi dest xwe bixistibana. Nikarîbûn valabûna hey dagirin, Emerîka ji ekonomiya xwe ya mezin, hêza xwe ya madî ya mezin, gelek gelek mezin e, ji hêza xwe ya leşkerî ya xurt, ji bandora xwe ya siyasî û ji serkeftina xwe ya li dijî Sovyetê fayde kir û xwe weke mîratxwirê dozena kevn îlan kir. Xwediyê dozena nû îlan kir.

Serkeftin bi dest xwe xist. Bi wê serkeftinê tiştekî ku ew nîne, weke ku çawa ew xwe nîşan da, bi vî rengî xwest xwe li ser cîhanê ferz bike.

Yên ku qebûl nekirin bi lêdanê li wan da. Emerîka ne tenê şerê Îraqê, Efxanistanê kir, Emerîka di sala 1986-1984'an wan de, li Lîbiya da. Piştî wê li Sudan da, piştî wê Panama de derbe çêkir. Li Hayîtî da, li gelek welatên din jî da.

Herî dawiyê Efxanistan û Îraq da, ew lêdanan çi bûn? Ew lêdanan Emerîka ji cîhanê re wiha digot, "Xwediyê cîhanê yê nû ez im, yê ku bi ya min bike mafê wî jiyanê heye, yê ku bi ya min neke, wê rû bi rûyê lêdanê were." Bi vî rengî ew şerê ku li dijî Sovyetê kiribû encamek girt, xwest wan encamana vê carê serweriya xwe li ser cîhanê çêbike.

Meylê Emerîka yên nû, bi taybetî jî mohafezekarên nû, yanî ew Boş, Boşê Bav, pişt re Boşê kur, ekîbê wî Ramsfêr, Kondelîza Rays, Dkçînî, ev ekîb e, ev vê dibêjin, "Cîhan di rewşekî bê hevsengiyê de dijî. Yanî tevlîhev e. Pêdiviya wê bi rêberekî heye, yek ev.

Ya duyemîn, divê ku ew rêber Emerîkî be.

Ya sêyemîn, Emerîka ji bo rêbertiyê divê ku ji fedekariyê re amade be. Yanî baca wê bide, çi pêwîst bû wê bike.

Ya çaremîn, hêza leşkerî Emerîkî weke hilbijariyê herî dawiyê na, weke hilbijartiyê seretayî bê bikar anîn. Yanî ev hêza leşkerî ji bo çi ye, weke hilbijartina dawiyê na, wek ya destpêkê de jî em dikarin bikar bînin.

Ya pêncemîn, saziyên navnetewî ne şerte her demî erêkirinê bidin karê me. Yanî her karekî em bikin, Netewên Yekbûyî, qebûl bikin, Yektiya Ewrûpa qebûl bikin, rêxistina efoya cîhanî qebûl bike, ev ne şert in. Li ser vî esasî xwestin hakimiyeta xwe li ser cîhanê çêbikin.

Hakimiyeta li ser cîhanê li ser Rojhilata Navîn e. Eger Emerîka li ser bakurê Rojhilatê Ewrûpa sekinî, li ser Belqan sekinî, li ser Evrasiya sekinî, ev hemû ji bo ku karibe enî bi enî (cebhe û cebeh) ber bi Rojhilata Navîn ve biçe. Dema ku hat Rojhilata Navîn, dema ku dor hat Rojhilata Navîn ku ji nû de dîzayîn bike, projak eşkere kirin, navê wê projê, porja Rohilata Navîn a mezin.

**Proja Rojhilata Navîn A Mezin**

Proja Rojhilata Navîn a mezin çi ye? Dozenekî siyasî nû ye ji bakurê Efrîqiya, heta Efxanistanê bê çêkirin. Bakurê Efrîqiya, Misrê, Siûdiyê Erebistanê, derdora wê, Suriyê, Urdun, Îraq, Luban, Îran, Efxanistan, Pakistan, ev herêma he hemû dozenekî nû bidinê.

**Xîtaba vê çi ye, azadî û demokrasî**. Bi vî rengî xwestin dakevin herêmê. Ji lewre Konderlîza Rayîs di sala 2003'an de çi

digot; “Ji Bakurê Efrîqiya heta Efxanistanê, em ê li hemûyê demokrasiyê belav bikin.”

Demokrasî çi ye, demokrasî çandina nirxên Emerîkî ye. Yanî Emerîkîkirina Rojhilata Navîn e. Bi rêbazê wê yê siyasî, bi şêwazê jiyanê, bi çandê, bi ekonomiyê, bi her tiştî Emerîkîkirina Rojhilata Navîn e. Sîstema Emerîka li ser Rojhilata Navîn bidin rûniştandin.

Emerîka ji kevn de vê ferz dike, ev sed sal in Emerîka got; “Êdî em bi hundirê xwe re bes e mijûl bibin, me dozenek çêkiriye. Beriya sed salî digotin, ta dema serokê wan Wîlson de, di wê demê de ev digot; “ me dozenek çêkir, dozena demokrasiyê. Lîberal demokrasî, bilind bûna asta xweşiyê, dewlemendiya ekonomî, me ev dozen çêkir. Niha pêdivî heye em vê dozena xwe ber bi Rojhilat ve bibin. Em mehkumin ku bibin, eger em nebin, wê li şûna me hov serwer bibin, ji bo vê em neçarin bibin.”

Li ser esasê demokrasî, şaristanî, nûbûyînê dixwazin vê projê bibînin. Bi vî rengî pêvajoya mêtingeriyê, pêvajoya dagirkeriya Emerîkî li ser cîhanê dest pê kir. Emerîka di van aliyan de bi taybetî di şerê cîhanê yê duyemîn û şûnda ve dema ku bi rengekî serkeftî derket, vê nêzîkbûnên xwe li ser cîhanê ferz kir. Bû weke polîsekî cîhanê, heq, huquq, edalet, qanûn hemû li gorî pîvanên xwe li gorî normê xwe nîşan didan. Yên ku li gorî wan bûbûyan, dihat qebûl kirin. Yê ne li gorî wan bûyan li dijî wan şer dihat kirin.

Mînak heta dema ku balafirên Emerîkî li Serbistanê didan, bi balafiran bîst û çar seatan bomberdoman dikirin, gelekan gotin, “Îraq ket Kuwêtê we cîhan bi serê wê de xerab kir. Nizanim kî çi dike hûn cîhanê bi serê wan de xerab dikin. Lê çima hûn li Sirbistanê dixin, li Yoxizlafiya kevn dixin?” Madrîn Olbrat ew ev got; “Em dikarin vê bikin, ji ber ku em Emerîka ne, em dikarin.” Yanî ji Emerîka re pêkanîna van tiştan serbest e. Çima, ji ber ku xwediyê dozena cîhanê ye.

Di aliyê teorîk de jî jê re ev zemîn amade kirin, ên nivîskarên ku di gelek caran de di Rojeva me de jî cih digirtin. Foko Yama, Handînten, eksena nivîsên van hemû çi ne? Serkeftina lîberal demokrasî ye, serkeftina kapîtalîzmê ye. Bê alternatîf hêzekî serkeftiye di cîhanê de. Ji bo vê komunîzm, sosyalîzm, dîngerî, ev hemû beramberî demokratên lîberal nikarin li ber xwe bidin. Beramberî kapîtalîzmê nikarin li ber xwe bidin, sîstema herî îdîal ji bo însaniyetê kapîtalîzm e, herweha divê ku her kes entgereyê vê sîstemê bibe. Divê ku her kes vê sîstemê qebûl bike. Piratîka wê bi taybetî jî di serê vî sedsalî de, ji sala 2000’î şûnda bi proja Rojhilata Navîn ya mezin berê xwe dan Rojhilata Navîn.

Ev proje li ser esasê guhertina Rojhilata Navîn e. Ji ber çi, sîstema li Rojhilata Navîn sîstema dewlet netew, dogmatîk, girtî, li gorî berjewendiyên kapîtalîzmê yên kevn bûne, li gorî serdema şerê sar bû. Tirkiyê bi rengê xwe yê kevn, welatê Ereban bi wî rengî, yên din jî wiha. Ev li gorî berjewendiyê kapîtalîzmê yên

kevn ji ber ku kapîtalîzma kevn dagirekerî bû, madên xam jê re pêwîst bû, pazar jê re pêwîst bû. Ji bo vê gel di bin hikumê otorîter, olîgarşîk, monarşîk de dihiştin ku qet pêşketin çênebe, timî karibin bi awayekî hêsan madên xam ji xwe re bibin. Wan welatana jî ji bo malê xwe bikin pazar. Ew jê re pêwîst bû.

Weke din jî şerê di navbera bilokên sosyalîst û emperyalîst de dihîşt ku teşegirtina siyasî di wan welatan de jî di wê çarçoveyê de be. Li ser esasê şer yanî wer nerm bûn, lîberalîzm tiştê ha diviya bû tine bûya, tewş ba, contaba, hişik ba ku karîba di wî şerî de beramberî hevdu bisekinyana, rewabûn ji wir digirt.

Mînak li Tikiyê derbên leşkerî çêdibûn, ji ber çi, digot; li beramberî xeteriya komunîzmê em xwe diparêzin. Hinek rêjîmên din hebûn, wan jî bi navê sosyalîzmê tevdigeriyan. Kesê behsa mafê mirovan bikiriba tine bû, behsa nermbûnê, azadiya fikir bike tine bû, ev tiştên he tine bûn.

Niha rewabûna vê sîstema he ji holê radibe, şerê sar xilas bû. Ji bo vê divê ku li gorî berjewendiyên nû yê kapîtalîzmê bê îyar kirin, bê dîzayîn kirin. Çi ye ew berjewendiyên nû yên kapîtalîzmê, global kirina kapîtal e. Yanî cîhan kirina sermayê ye. Sermaye tenê di Emerîka, Ewrûpa de, Rojava de na, di her derê cîhanê de hebe, lê gelîr ji heman însanan re vegere.

Ji bo vê şirket, razandin (yaptirim), fînanse kirin, ev hemû belav dikin. Yanî pera dişînin, karxanan çêdikin, van tiştana dikin. Lê ji bo ku ev pêk bên, divê ku sîstema siyasî jî li gorî wê bê dîzyîn kirin. Mînak, kapîtalîzm li Rojhilatê Asya pêş ket, yanî Endunûziya, Viyetnam, Malîziya, Sangafor, Çîn, ev di Rojhilatê asya de pêşdikevin. Em bala xwe bidinê karxane dema hinek tişt bi navê Sonî ye, lê tu lê temaşe dikî li ku hatiye çêkirin, li Çînê çêbûye. Li ku hatiye çêkirin, li Endunoziya hatiye çêkirin. Mirov dibêje ev şêrket Japonî ye, lê belê ew tişt li wir tê çêkirin hwd, gelek tiştên din jî. Maşîn bi vî rengî, kompyoter bi vî rengî, razemeniyên zîraî bi vî reng, torîzm, tu li van hemûyan dinêrî li Sengafor e, lê xwediyê wê Emerîkiye. Li Çîn e, lê xwediyê wê Elmaniye, li Vêtnam e, lê xwediyê wê Holendiye.

Ewqasî razemenî dema ku di van welatan de tê kirin, ji bo ku hîna zêdetir sermaye li van welatan mezin bibe, girînge ku dozena siyasî jî li gorî wê xwe îyar bike. Ji bo vê çi dikin, wan sîstemana lîberalîze dikin.

Em bala xwe bidinê ji deh pazde salan bi vir de sîstema li Rojhilatê Asyayê lîberalîze dibe. Endunoziya berê ew jî weke van dewletên Ereban bû, di zemanê Suharto de tenê komunîst, tenê endamên partiya komunîst Endunoziya milyonek komunîst hatiye kuştin, ne tenê wer gel, tenê endamên partiya komunîst hatine kuştin. Kes dengê xwe nedikir, lê dema ku sermaye derbasî van welatan bû êdî bi Suharto, van sîstemên wer yekalî, navendî, totolîter, nema karîbû bimeşya, ji bo vê emperyalîzmê çi kir, destwerdana wê sîstemê kir, lîberalîze kir, weke xwe kir. Weke xwe kir ku sermaye di wir de kar bike.

**Dewlet Netewa Li Rojhilata Navîn**

Niha dewlet netewa li Rojhilata Navîn jî ket vê rewşê. Rojhilata Navîn dewlet netewa Îraq, Siûdiyê Erebistan, Sûriyê ye, raste ev li dijî gelên xwe tepsandinê dikin, kuştinê, zilmê dikin van tiştan dikin, lê di heman demê de jî bi vî qerekterê xwe van teybetmendiyên xwe li pêşiya sermayê jî asteng e. Milkiyeta dewletê bi sermaya navnetewî re dijber e. Sermaya navnetewî hîna zêdetir lîberal e, teşebusê ferdî tê de hene, ew jê re pêwîst e.

Dîsa şêwazê jiyanê yê ku di bin hikumê van desthilatdariyan de çêdibe, yek aliye. Wer tek tîp e, ev dibe sersebebê ku ew taybetmendiyên tuketicî li van welatan zêde pêş nekeve. Sermaye ji van jî ziyanê dibînin. Ji bo vê xwestin vê sîstemê biguherin, wê vê sîstemê çawa biguherin, di cihna de destwerdanên leşkerî, di cihna de destwerdanên siyasî, weke çawa li Tirkiyê destwerdanên siyasî çêbûn, li Îraq destwerdana leşkerî çêbûn, li cihna de jî destwerdanên reng bi reng çêbûn.

**Emperyalîzm Pirsgirêkên Rojhilata Navîn Çawa Çareser Dike?:**

**1-Serweriya Bitendurustî**

Ev proje çi dide pêş, proja Rojhilata Navîn a mezin, yek dibêje hikumê durust, saxliqli hukum, ev yek e. Ya duyemîn piyasa serbest, ekonomiya kapîtalîst, sêyemîn etkîn kirina jinê. Niha ev her sê li gorî xwe bingehê projên Rojhilata Navîn ê mezin e. Dema ku mirov lê temaş e dike mirov dibêje zêde ti nakokiya me pê re tine ye. Her kes hikumekî baş dixwaze, her kes weke çawa di aliyê ekonomî de refahekê dixwaze, her kes jî li bendê ye ku jin li Rojhilata Navîn ji rewşa hey xelas bibe.

Lê belê nêzîkbûnên Emerîka bi vî rengî nînin, mînak dema ku dibêje **hikumê durust**, li gorî wî çi ye? Hikumê ku tê de gelek partî tê de hebin, hilbijartin hebin, lîberal be, qanûn hebin, bi vî rengî tîne ziman. Lê belê em bêjin, li Filîstînê hilbijartin çêbûn û Hemas qezenc kir, Emerîka qebûl nake. Lê kanî we digot divê bi hilbijartinê her tişt çêbibe. Gotin; erê lê divê ku Hemas dernekeve. Lê çi têkiliya we jê heye, gel çûye ser sindiqan û dengê xwe bikar aniye û Hemas derketiy! Gotin na çênabe, nehiştin Hemas bibe desthiltdar. Ji bo vê Hemas reviya încex li Xezayê ji bo xwe desthilatdariya xwe parast.

Li bakur hilbijartin çêdibin, mînak em di cih cihna de qezenc dikin, tevî hemû asteng hwd, Emerîka qebûl nake. Tê BDP'ê kom dike dibêje; temaş e bikin eger hûn dûrî PKK'ê bikevin, em ê hemû derfetan bidin we. Heger hûn dûr nekevin em nadin. BDP'ê ji wan re dibêje, em çûn hilbijartinê, me ewqas tişt qezenc kirin, Tirkiyê wekîlê me digirin, ji erkê dixin, yên belediyan dixin hebsê, Emerîka dengê xwe nake.

Wê demê kîjan hilbijartinê dixwazin, hilbijartina ku sîxûrê wan bibin desthilatdar dixwazin, ew hilbijartin li gorî wan adil e. Ew sîstem li gorî wan adil e. Lê halbikî demokrasî ne

hilbijartine jî, em tev demokrasiya hilbijartinê nagirin. **Demokrasî li gorî me sîstemekî nirxa ye,** ne hilbijartine, hilbijartin milek wê yê biçûk e. Lê di esas de demokrasî sîstema nirxa ye. watek wê ya nirxan heye, demokrasî ne hilbijartine.

Heke em qebûl bikin bêjin bila tenê hilbijartin be, hilbijartin jî çêdibe dema ku encam ne li gorî wan be dibêjin, çênabe, qebûl nakin. Emerîka li Îraqê de çi dike, Îraq weke mînakekê ji bo xwe digire, li Îraqê de çi dike, peymangehan çêdike. Du heb peymangeh di Bexdê de hene. Yek ya partiya Cumhuriyê ye, yek a partiya Demokrat e, du partî li Emerîka hene û ji bo wê du heb peymangeh di wir de çêdike.

Ew peymangeh çi dikin, bireşûran çêdikin. Birşûrên wiha xweşik biçûk biçûk çêdikin, bi Erebî heta bi Kurdî, dinivîsînin, yanî ji bo gel bi giştî. Yek partî çawa çêdibin, duyemîn qampaniya hilbijartinê çawa dest pê dike. Alîkarî çawa tê lihevdan. Hikumet çawa tên avakirin, civaka sivîl çawa çêdibin. Hemû ktelok in, yanî nirxên lîberal, siyaseta lîberal ji bo ku di vî welatî de tam bide rûnişkandin, bîst û çar seatan mêjî diguvêşin.

Peymangeh çêkirine, înstuyo çêkirine, pîrtûkan diweşînin, bi hezaran pirtûk bi milyonan pirtûk, li her derê belav dikin. Ji bo şêwazê avakirina partiyan, pêşxistina qampaniyê hilbijartinê, rêxistin kirina civakê, hemû li gorî daxwaziyên gelan li vir na, li gorî perspektîfê Emerîka pêşbikeve. Gelekî jî tên xwendin, mînak her kes wan pirtûkan dixwînin.

Ji ber ku bi hûrûkûrî dinivîsin. Mînak hinek pirtûk hene dibêjin; tu yî biçî alîkariyê bihevdî, tu yî biçî gel filan kes tê bêjî, peran bide me, wê ji te re bêje, ji bo çi, tê bêjî; em diçin hilbijartinê, wê bêje çi ji min re. Pişt re tu yî careke din biçî gel tu yî bêjî em peran dixwazin, wê bêje çima, tu yî bêjî, rewşa te ev e, ev e, jê û şûnda em dixwazin vî rengî biguherin, li ser vî esasî eger em bibin desthilatîdar em ê wiha bikin, wê demê wê îqna bibe wê peran bide.

Yanî danheva peran jî bi çi şêwazî çêdibe, wer bi ziravî dinivîsîne. Bi vî rengî dixwazin modelekî çêbikin. Ji bo vê hikumê adil, yê ku Emerîka dixwaze pêk bîne, hikumê ku siyaseta Emerîka red neke, li gorî rêbazê Emerîka siyasetê bide meşandin. Girêdayî siyaseta Emerîka di herêmê de bimîne, ew vê dixwaze. Ew jî bi gel re nabe yek, mesela sîstema adil li Efxanistan û Îraq çêkiriye. Her roj bi sedan kuştî hene. Dizî, ewqasî dizî tê kirin ku deh qatê ku di serdema Sedam de dizî hatiye kirin, di hundirê van heft salên ku Emerîka li Îraqê hikum dike hatiye dizîn. Her kes didize, bi milyonan, bi milyaran dolar hatine dizîn.

Disa di gelek meselan de pirsgirêk çareser nebûye, mesela mesela Kurdî nehatiye çareser kirin. Serbestiya partiyên siyasî nîne. Li gorî berjewendiyan e, partiya ku hinekê azadî, demokrasî, van tiştana bixwazin tu lê temaşe dikî jê re bihanekê derdixin û digirin, qedexe dikin. PÇDK'ê qedexe kirin.

PÇDK'ê di Îraqa nû de tenê partiya yasal e. Partiyên din hemû derveyî yasalê ne. PÇDK'ê dema ku hatiye çêkirin, bi hazirbûna hakimê dewletê bi şahid û bi safciyan hemû hazirbûne kongira xwe çêkirin û fermî, rêveberiya xwe hilbijart û bi vî rengî bû partî.

Yên din yek partî li Îraqê ev tiştê ha nekiriye. Tenê PÇDK'ê rewa ye, ew jî qedexe kirin. Ji ber çi, ji ber ku Emerîka û Tirkiyê wiha dixwestin. Dozenekî adil nîne, ew çîrok e ji bo pê gel li dijî rejîma kevn rabike, hêviya çêbike, însanan derdora xwe kom bike, lê belê piştî demekî kin eşekere bû ku di wan aliyan de wer îdîayekî ku rastî demokrasî sîstemekî adil, qanûnên adil, wekhevî, peyda bibe, tiştekî wiha nîne. Tam berovajî wê ye, rewş hîna xerabtir bûye.

Di roja me ya îro de sîstema siyasî li Îraqê ne adalet diyar dike, ne daxwaziyên gel diyar dike, berjewendiyên malbatan, eşîran, mezheban, netewan, ew diyar dikin. Ji bo vê bê adalet e.

Ji derveyî vê eşker bû ku proja Rojhilata Navîn a mezin îdîayekî wê sîstemekî nû siyasî li Rojhilata Navîn çêbike tine ye. Ji ber çi, rast e Îraq hilweşand, temam, lê belê Misr ji Îraq deh qat xerabtir bû, lê Misr mutefîqê wê di asta yekemîn de ye. Heta Mubarek ket jî mutefîqê Emerîka yê bingehîn bû. Tuns, Tirkiyê, welatên Kendavê, Kuwêt, Qeter, Siûdî ev hemû bi vî rengî ne, hemû qiraliyetin zorban e, dizin, talangerin, lê hemû mutefîqên asta yekemîn yê Emerîka ne.

Emerîka wan cidî rexne nake, bi vî rengî eşker dibe ku ew îdîaya dozena nû ya tendurûstî, ew tenê ji bo ku xapandinê ji bo ku gelan li dora xwe kom bike, qamoyê çêbike, bi vî rengî astengê li pêşiya xwe rabike. Dozena adil li gorî Emerîka, dozena ku berjewendiyên wê diparêze. Dozena ku pê re di nirxan de hem fikir e, yanî heman nirxan parve dike. Nirxên ferdî, yê kapîtalîst, milkiyeta taybet, wan pê re hevpar dike, ew tên qebûl kirin. Di encamê de jî kuştin e, derve hiştine, xerabiye, ev tiştana ne.

**2-Ekonomî**

Niha Emerîka vê dibêje, ekonomiya dewletê tiştek çewt e, rast e, çewt e. Yanî milkiyeta dewletê tiştekî xerab e. Civakan talan dike, diziyê dike, bi her awayî birçîbûnê û feqîrtiyê çêdike, rast e.

Berovajiyê wê, wê demê tiştê serbest çi ye, ew jî piyasa serbest e. Yanî qanûna faydê ya serbest e. Çima, dibêje; temaşe bikin li gel me wiha ye, li Ewrûpa wiha ye, li Emerîka haye, binêrin pirsgirêkê gel yên xwerin û vexwarinê tine ne, pirsgirêkên wan ên mala tine ye, her kes xaniyê wan heye, her kes karê wan heye, her kes xwarina wan heye, ji bo vê pirsgirêk dernakevin. Eger hûn jî weke me bibin, ji bo we jî wê wih bibe.

Li ser vî esasî çi dikin, ji bo ku bingehê vê projê bi hêz bikin, ezezî, propoganda li dijî komunîzmê, li dijî sosyalîzmê, pêş dixe. Ferd heta asta dawiyê ji barkirinên exlaqî yên beramberî

civakê dûr dixe. Vê carê ferd li Rojhilata Navîn dema ku ji barkirinên xwe yên exlaqî beramberî civakê dûr ket, pir wehşî (dirinde) dibe. Niha însanekî Ewrûpî ferdî ye, lê belê di encamê de însan e. Yanî însan e, dîsa hinek perpirsiyartiyên wî hene. Hinek pîvanên wî hene, li Rojhilata Navîn de însan ku ji taybetmendiyên xwe yên civakî û exlaqê dûr ket, bû ferdî ti sînor jê re namînin. Herî zêde rizyayî, herî xerab, yên herî serserî, bi her awayî dijminê civaka xwe ye.

Bê sînor talan, dizî, serserî dibe û sînoran nas nake. Ji ber ku ferdiyet ne tiştekî taybetmendiyên Rojhilata Navîn, veguhezandin e, extirim e. Yanî rêûresmekî derve ye. Ji bo vê dema ku însan pê ve tê girêdan, ji hemû girêdanên xwe yên civakî dûr dikevin.

Em bala xwe bidin vê di nava partiyê de jî heye. Mînak ferdiyet, bireycitî çi kir, bala xwe bidinê PDK'ê jî ferdiye, YNK'ê jî ferdiye, lê weke însan dema ku mirov yekî PDK'iyî û Ferhad, Botan, ew koma çetan ya ku reviyan e bide ber hevdu, pîvanê yê PDK'iyî hîna zêdetir nêzîkî însaniyetê ne. Ji ber çi, ji ber ku di navengekî komînal de dema ku yekî ferdiyet qebûl kir, wê demê sînorê ji xiyanetê re nas nake.

Diçe temslîmî sîstemekê dibe, dema ku tu teslîmî sîstemekê bû, ew sîstem te bi awayekî xwezayî qebûl nake. Ew sîstem çi ji te dixwaze dibêje, "cihê tu jê hatî baş pê re xiyanetê bike ku ez te qebûl bikim." Yan jî wê çawa qebûl bike, PDK-YNK'ê wê ji Ferhad re bêjin; rast e tu hatî gel me, lê heta duh te şerê me dikir? Ka berovajiyê wê îsbat bike da ku em ji te bawer bikin. Ji bo vê jî berovajiyê wê îsbat dike.

Êrîşî Rêbertiyê dikin, êrîşî nirxan, şahîdan, êrîşî her tiştî dike, ji bo ku karibe weke dewara li ser sifra dijminê xwe yê radestî wî bûye têr bixwe. Yan jî mafê wî jiyanê tine ye. Ji bo vê ji rastiya xwe dûr ketin, bi vî rengî heywantiyê bi xwe re tîne. Li Rojhilata Navîn bi awayekî pir balkêş bi xwe re tîne. Zêde balkêş e, yanî ji Ewrûpa xerabtir e.

Dema ku ev pêş dikeve, ev dibe bingehê piyasa serbest. Dibe bingehê milkiyeta taybet. Ji bo vê niha teşwîq dikin. Mînak, malê civakê ye, teslîmî hinek mirovan dike, dibêjin; em ê îhala bi we din, nizanim çi bi we din, projên xwe pêşkêş bikin em ê her tiştî bidin we. Lê di esas de ew mal, malê civakê ye. Civak birçî ye, lê tu lê temaşe dikî ewqasî dewlemend derdiketin, çi ye? Dibêjin; em ekonomiyê ji dest dewletê derdixin û em dikin destê gel de. Gel kî ye, çend heb dizinên ku xwe firotine, sîstema kapîtalîstê.

Ji bo vê em bala xwe bidinê deh sal berê tevî ambargo, tevî ji rê derketinê, tevî hemû xerabiyan jî deh sal berê însanekî Îraqî rojekê ji rojan nediket heyra ka çawa xwarinê bixwe. Însanekî Îraqî rojekê ji rojan nediket heyra ka çawa benzînê peyda bike. Yanî ev jê re nedibûn derd, lê tu di roja me ya îro de lê temaşe dikî însan nikare zarokên xwe xwedî bikin. Ji bo ku xwedî bike neçare teslîmî dozenê bibe, xwe bifiroş e, bibe kolê wî,

leşkertiyê jê re bike, îstixbaratê jê re bike, bi vî rengî ku hinek mûçe bigire.

Ji bo vê piyasa serbest pirsgirêkê çareser nake, hîna zêdetir pirsgirêkê kûr dike, ji lewre jî di navbera feqîr û dewlemendan de jî çînekî navîn jî çêdikin, ji bo ku ew çîna navîn çi bike, nerazîbûna gel, yanî nerazîbûna di hundirê xwe de vala bike. Nerazîbûnan wer bê bandor bike. Belav bike, nermbûnê çêbike, lîberalîzmê çêbike, bi vî rengî nerazîbûnên civakê beramberî sîstemê pêş nekevin. Di vir de jî pirsgirêkên ekonomiyê çareser nebûn.

**3-Mijara Jînê ye**

Çalakirina jinê kapîtalîzm weke amûrekê nêzîk dibe û dixe destê xwe. Ji ber çi, niha yek ji bingehê sîstema kevneşop li Rojhilata Navîn çi ye, girtina jinê ye. Bêhed û hesab înkar kirine, aşîrî vederkirin, (diştalama) ne, hinekî tine hesibandin e.

Ji bo kapîtalîzm vê sîstemê lewaz bike, dixwazin tiştê wer dibin serserbebê hişkbûna çors bûna sîstemê, li ser wan tiştan teserfê bike. Çi ne ew tişt? Yek jê mesela jinê digire dest, yanî di rêka kar, rêka xwendinê, bi vî rengî ji bo jinê rê vedikin.

Ji lewre di milekî de ev dibe, lewazbûna sîstema kevneşop, bi hovtiya xwe, bi înkarkirina xwe baş e, lê rêka kapîtalîzm ji bo jinê li Rojhilata Navîn nîşan dide rêyekî xelasiyê nîne, tam berovajiyê wê çi dike, jinê weke hêzekî civakê bi nirxê xwe bijî, daxwaziyên xwe îfade bike, li ser wî esasî rêxistin bibe, li ser wî esasî siyasetê bike na, lê di rastiyê de qadên ku tenê ji bo zilam serbest bûne, hinekê ji bo jinê jî serbest bike. Yanî jinê jî dike weke zilam, kapîtalîzm têgînên wê yên azadkirina jinê ev e.

Jinbûyîn tê de tine ye, zilambûyîna jinê tê de heye. Yanî qadên berê tenê ji bo zilam tê de serbestbûne, vê carê hinekê jî ji bo jinê serbest bibin.

Ev di şexsê hinek welatan de pirsgirêkekî cidî anî. Mesele yek jê Îraq rastî di roja me ya îro de rewşa jinê di Îraqê de pir berbat e. Ji ber ku projekê azadiyê tine be, nakokî kûr dibin. Nakokiyên malbatî, yên derûnî, ji bo vê xwekuştin, ji bo vê kuştin, ev tiştên he derdikevin pêş.

Yek jî cinsiyetparêziya derBeasnebûye, mînak di roja me ya îro de Emerîka dizane di Îraqê de mafê jinê tine ye. Di Kurdistanê de tine ye. Mesele perlemanê Kurdistanê pirjinî qebûl dike. Pirjinî qebûl kirin rewa kirina fihoşê ye. Yekî perê wî hebin ji xwe re sê-çar heb jin bîne. Ev bi qanûnan tê qebûl kirin.

Emerîka tevî ku di proja wê de çalabûna jinê heye, lê nikare ji wan re bêje çima hûn ha nakin. Ji ber çi, wan nerehet nake, di Îraq de jin zêde tê kuştin. Hîna cînayetên namûsê zêde heye, lê Emerîka nabe asteng li pêşberî wê.

Cidî projek ji bo azadiya jinê pêş nexistiye, projê lîberalîzkirinê pêşxistiye. Mînak Efxanistan, dema ku nû Emerîka

kete Efxanistan jidil xwe de qanûnek derxistin, gotin, “şideta di hundirê malê de li dijî jinê qedexe ye, yanî ne li derve, di hundirê malê de.” Bi awayekî xwezayî di civaka Rojhilata Navîn, di gelek civakan de jî şideta di hundirê malê de tiştekî xwezayî ye, yan jî ji wê zêdetir rojane ye. Mînak wê zilamek li jina xwe bixe, ma çi ye, qanûniye. Ji bo vê ev qanûnên ku derxistin gotin, şideta hundirê malê qedexe ye, yanî tê çi manê? Tê meana ku eger jinek biçe gilî bike, bêje mêrê min li min daye, yan jî birayê min li min daye, yan jî bavê min li min daye, divê ku hikumet wî bigire, lêpirsîn bike, bêje te çima ha kir. Lê di hilbijartinên dawiyê de di qanûna dawiyê de yên Efxanistanê ew qanûn ji holê rakirin. Gotin çênabe, çima çênabe, Xerzayî got; “eger em vê qanûnê qebûl bikin, wê eşîr dengên xwe nedin me, em ê çawa hilbijartinê qezenc bikin?”Emerîka dengê xwe dernexist.

Wê demê ev tiştana tiştên jidil, bi prensîb, li ser esasê bi rastî guhertinekî cewherî li Rojhilata Navîn ji bo demokrasiyê, ji bo wekhevî çêbibe na, ji bo ku ev astengên li pêşberî desthilatdariya sermaya navnetewî di şexsê dewlet netewên totolîter, yekalî, teng de heye, wan astengan li pêşberî xwe radike, armanc ev e.

Ji lewre eşkere bû ku rewş wer rehet jî nîne, li Îraqê **Emerîka binkeftî bû. Di Efxanistan de Emerîka binkeftî bû. Di hinek derên din de jî Emerîka binkeftî bû.** Di van serhildanên dawiyê de li Rojhilata Navîn çêdibin, binkeftina Emerîka ye. Ji ber ku serhildan li Misrê çêbû, li dijî Tuns çêbûn, li Tirkiyê çêdibin, ev hîmê bingehîn yê mutefîqên Emerîka bûn. Lewre ev serhildan di heman demê de li dijî Emerîka ye, ev binkeftinin.

Lê belê pêwîst e em vê bizanibin, Emerîka împeratoriye. Împeratorî bi serneketinê naşkên. Di vir de erq û cudabûn heye, di navbera têkçûnî û serneketinê de ferq heye. Serneketin, di cihekî de tu bi ser nakevî, têkçûnî hezîmet e, tu berdidî û direvî. Emerîka bernade nareve, Emerîka biserneketiye, li hemberî binkeftina Emerîka çi dike? Şêwaz diguhere, pêşî Boş got; “ev şerekî xaçperstiyê ye, hemû kesên li beramberî me, em ê ji holê rabikin, yê bixwaze bila bixwaze, yên nexwazin jî bila serê xwe li dîwaran bixin. Yê ne dostê me bin dijminê me ne.”

Ew binkeftiye, di pişt re raporek derxistin, rapora Bêkir Hamilton, li ser esasê wê raporê hikumetek nû çêbû. Ji lewre çûna Remswêr, çû li şûna wî Ges hat, nizanim çi bû. Di pişt re Obama hat. Van çi kirin şêwaz guhertin, vê carê negotin yên ku ne dostên me ne dijminê me ne, vê carê negotin, biryara me ev e, yê ku tevlî bibe bila tevlî bibe, yê tevlî nebe jî weke çawa bêje bi cehnema wan kirî. Wer negotin, vê carê gotin pêdiviya me heye ku her kes tevlî bibe. Ji bo vê ji nû ve Yektiya Ewrûpa têkiliyên xwe pê re xweş kirin, bi Îranê re têkilî çêkirin, bi Misrê re çêkirin. Çi nav li vê kirin? **Navê vê kirin, proja Rojhilata Navîn a nû.** Yanî proja Rojhilata Navîn a mezin heye, ya nû heye.

Proja Rojhilata Navîn ya nû çi ye? Vê carê li ser esasê hilweşandinê na, li ser esasê îtîfaqên herêmî, mînak Tirkiyê, Misr,

Urdun, Îsraîl, yanî ev îtîfaqên herêmî li ser wan esasana Emerîka dîsa proja xwe derbasî jiyanê bike.

Ji bo vê bi hinek partiyên siyasî re têkilî çêkirin, bi eşîrên Îraqê re têkilî çêkirin, bi Îranê re rasterast yan jî nerasterast têkilî çêkirin. Bi vî rengî şêwazekî nû da pêşberî xwe, ji ber çi, ji ber çi şêwazê nû dide pêşberî xwe? Ji ber çi yê Emerîka hîna jî şêwazan biguhere, her şêwazek binkeftî be wê yekî din biguhere? Her yek binkeftî be wê yekî din biguhere, ji bo vê ye, ji bo ku Emerîka loksekî wê ye paşde vegere, bişkê, paş de vekişê, li Rojhilata Navîn tine nebe. Emerîka berjewendiyên wê li Rojhilata Navîn jiyanî ne, tenê ne stratejîk in, jiyanî ne. Yanî bi hebûnê ve girêdayî ne. Ewqasî jiyanî ne, ne paş de vegerandinê, ne jî têkçûyînê qebûl nake. Emerîka di Rojhilata Navîn de binbikeve di hemû cîhanê de bindikeve!

Ji bo vê jî şêwazan diguhere. Ji bo vê jî her tiştê bi destê wan nabe. Eger hêzên civakî li Rojhilata Navîn xurt bin, birêxistin bin, karin ji vê kaosa navîn, (iqici anarşi), di vir de heger hêzên civakî bi rêxistinî bin, wê karibin tenê meydanê ji Emerîka re na, ji bo xwe jî gelek mafan qezenc bikin. Heta hîna zêdetir bi rêxistin bibin, dikarin tewazinê di aliyê xwe de jî biguherin, ew derfet jî heye.

Ji ber statîko lewaz dibe, Emerîka di gelek aliyên xwe de binkeftiye, di vir de hêza civakî birêxistin bibe dikare gelek tiştan ji bo xwe qezenc bike. Pir bi kurtayî têkiliya vê meselê bi Rêbertiyê re çi ye? Em ê bigirin dest, têkiliya vê meselê bi Rêbertiyê re ev e? Rêbertî, Rêbertiya PKK'ê ye, PKK di Rojhilata Navîn de navenda hêzê ye. Rêxistina bi çek û xwedî teorî, xwe dispêre hêza civakî, ya herî bi hêz li Rojhilata Navîn e.

Emerîka planên wê yên Rojhilata Navîn a mezin hene, wê derbasî herêmê bike. Ger derbasî herêmê bibe wê çi bibe? Statîko wê lewaz bibe, Îraqê hilweşe, statîkoperest wê lewaz bibin. Dema ku statîko lewaz bibin, hêzên şoreşgerî wê jê faydê bigirin, wê însiyatîfê bi dest xwe bixin. Ji bo vê beriya ku Emerîka bikeve Rojhilata Navîn çi kir, bi ser PKK'ê de hat. Rêbertî hedef girt ku hêzên şoreşgerî ne amade bin, lewaz bin, nikaribin faydê jî vê anarşiyê bigirin û însiyatifê bi dest xwe bixin. Ji bo vê jî Pangalos jî ev got; gelek jî di roja me ya îro de vê rastiyê fêm dikin, nas dikin. Jixwe ji aliyê PKK'ê ev ev rastî diyar e, li ber çava ye. Beriya ku derbasî Rojhilata Navîn bibe di serî de rêxistina me hedef girt, di kesayeta Rêberê gelê Kurd Abdulha Ocelan de.

### Çareseriya Statîkoperest

Sîstema desthilatdar li Rojhilata Navîn de, li gorî xwe ew jî çareseriyê pêş dixe. Çareseriyên wê çi ne? Yektiya hêzên paşverû, dîsa hîna zêdetir xurt kirina şidetê, yanî hîna zêdetir pêkanîna şidetê. Bi van şêwazana dixwazin emerê xwe dirêj bikin.

Ji lewre ev sîstem li gorî xwe teoriyan pêş dixe, berê jî gelek kes hebûn behsa sîstema îdîal dikirin, ji lewre jî sîstemên

mûnarşî, yên serwer yên motleq, tepeserkirin, otorîter, îdîalîze dikirin. Ango digotin yên herî baş ew in.

Mînak di sosyolojiyê de jî ev îlmê siyasetê mirov dikare di nerînên nivîskarên Îngilîz di salên 1650-1640'î wê demê de Hobbes de bibîne. Hobbes dibêje; "Ji lewre însan gurê însan e, ji bo vê her demê divê ku di bin hikumê dewletekî bihêz, motleq, otorîter de be ku hevdu nexwin." Rojhilata Navîn jî statîkucitî jî li ser vê pêk tên. Yên dixwazin guhertinê bikin Rojavayî ne, çavên xwe bera welatê me dane. Demokrasî tiştekî li gorî Rojhilata Navîn nîne. Berovajiye, em zêdetir bi xwe dizanin em ê çawa xwe bi rê ve bibin. Bi van nêzîkbûnên wer çewt, hem dixwazin hestên mirovan îstismar bikin, hem jî rewabûnê qezenc bikin. Li gorî wê heta astekî temenê xwe dirêj bikin.

Ev sedemên wê neman, sebeb çi ye sedem nema? Yek rastî astê zanebûnê, li Rojhilata Navîn jî li pêş e. Çavkaniyên agahiyê zêde bûn, yanî dewlet li Rojhilata Navîn êdî weke berê nikare her tiştî bixe yekdestiya xwe. Çavkaniyê agahiyan zêde bûne, mînak Rojhilata Navîn berê bi derfetên xwe dewletan dikirin qedexe bike, sansor bikira, nehîştan însan tiştekî bibihîze, ne hişta însan tiştên xwe jî bighînin derve.

Di roja me ya îro de êdî ew negengaz e. Ev rewabûna sîstemê lewaz dike. Bilindbûna asta zanistiyê ragihandinê, hêza xwe îfadekirinê, hêza xwe gihandina derve, hêza pêşketinên derve fêm bike, bişûpîne, ev hemû dibin sersebebê ku baweriya bi sîstemê lewaz bibe, hêza wê lewaz bibe, weke berê wer bêsînor desthilatdar nebe.

Ev aliyek e, yanî di aliyê zanistiya gel de, di aliyê zanebûnê de rewabûna wenda dike. Yek jê ev sîstem bi çi xurt bû, bi desteka emperyalîzmê bihêz bû. Yanî ev dewletana bi desteka emperyalîzmê bihêz bûn. Ne bi hêza xwe, ne bi zanebûna xwe, ne bi başbûna xwe xurt bû. Di roja me ya îro de emperyalîzm qismî be jî, destê xwe ji ber dide aliyekî. Heta emperyalîzm bi xwe dixwaze wê biguhere. Ji ber ku bi taybetmediyên xwe, bi qerekterê xwe êdî ji bo emperyalîzmê jî nebaş e.

Mînak Kondelîza Rays, çi digot, digot; "Em gelekî pûşmanin, ev şêst sal in me ev sîstemên destpot destek dikirin, me şaştî kiriye." Di rastiyê de şaştî nekirine bi zanebûn destek dikir. Lê belê di roja me ya îro de êdî ev sîstem bi berjewendiyên wan re berovajî tê, destê xwe jê didin aliyekî.

Wê demê hem guhertinên di hundirê gelan de çêbûne, zanistî, derketin dînamîkên nû, birçîbûn, yanî zorî, zehmetî, hem jî guhertinên ku di sîstema navnetewî bi taybetî emperyalîst de jî çêbûne, dibin sersebebê ku sîstema hey li Rojhilata Navîn yanî sîstema statokujî rewabûna xwe wenda bike. Êdî nema dikarin rewa bin. Ji lewre li ser vî esasî mehkumê rûxandinê ne.

Lê ji ber ku em di zemînekî şoreşger de dinirxînin em dibêjin mehkumê hilweşandinê ne, lê belê sîstem bi xwe nabêje; em mehkumê hilweşandinê ne. Sîstem dixwaze li ber xwe bide, bi

çi awayî li ber xwe bide? Yek bi tewîz dayîna emperyalîzmê, hîna zêdetir tewîz dayîn, hîna zêdetir teslîmiyet, ku emperyalîzm destê xwe ji ser rabike, hinekî zextê nema li ser bide meşandin. Bi vî rengî karibe demekî dirêjtir emerê xwe dirêj bike û demekî dirêjtir hikum bike.

**Sîstema Destpot Bi Tewîz Û Îtîfaqên Herêmî Emrê Xwe Dirêj Dike**

Ji bo vê hinek dewlet hene heta ji wan tê tewîzan didin, mînak Sûriyê, Emerîka çi ji Sûriyê xwestiye û nekiriye?! Got, ji Lubnan derbikeve, ji Lubnan derket, got çi û çi kir, hwd yanî her tiştî dike. Bi qasî serê derziyekî Sûriyê Îsraîl tehdît nake. Di mesela Îraqê de ji Sûriyê re got, ji erda we hinek kesên çalakger derbasî Îraqê dibin wan bisekinînin, wan sekinand. Girtin, heta kuştin. Her tiştî dike, lê Emerîka hîna zêdetir tepeserkirinê dike, bi van tewîzan sîstem dixwaze emrê xwe dirêj bike.

Bi van şêwazê ku sîstem pê emerê xwe dirêj dike çi ye? Îtîfaqê herêmî çêdike, mînak Tirkiyê, Îran, Sûriyê Tirkiyê, hinek kesimên dîtir. Îtîfaqan wer çêdikin ku beramberî xeteriyên heye, hem yên ji gelan tên, hem ji yên ku ji derve de tên karibin xwe pê biparêzin. Bi vî rengî rewabûnê qezenc bikin. Lê belê ev îtîfaq ne îtîfaqên mayende ne, ne jî serkeftîne. Ji ber ku loksekî van dewletana ku vê îtîfaqê heta dawiyê dewam bike tine ye.

Mînak îtîfaqa Tirkiyê û Îran, demboriye. Îran jî dizane ku Tirkiyê ne dostê wê ye, Tirkiyê jî dizane ku Îran ne dostê wê ye. Dîrokî jî nakokiyên wan hene. Weke din jî her yek sîstemekî temsîl dike. Ji bo vê niha nakokiyên di navbera Emerîka Îran de kûr bibin û bigihîjin astê şer, gelo wê Tirkiyê dostaniya xwe bi Îran re dewam bike? Negengaz e.

Dîsa Tirkiyê û Sûriyê ev jî zêde ne dost in. Ev jî polîtîkakî Tirkiyê dide meşandin, wer dide diyar kirin ka çawa dostên wan in. Heta cih cihna jî bi vê polîtîkayê Tirkiyê çi dike, diyar dike ku dostaniya Sûriyê dike. Dostaniya Îran dike, ya Hemas dike, ji bo çi, beramberî PKK'ê hîna zêdetir tewîzan ji Emerîka bistîne. Yanî bi vî rengî dide xebitandin. Ji bo vê îtîfaqên wer dem dirêj li ser esasê wer karibin parastina sîstema heyî bikin, ne di wê astê de ne. Ji bo vê nikare rizgar bike.

**Şêwazek Din Çareseriyê Jî Şidet E**

Şêwazê sêyemîn şidet e, lêdan e, tesfiye kirine, kuştine, tevgera muxalefetê ji holê rabike, tesfiye bike. Tirkiyê dike, Sûriyê dike, welatên Kendavê dikin, bi vî Îran dike. Lê di van rojên dawiyê de eşekere bû ku bi şêwazê şidetê, zêde şidet bikar anîn êdî gel weke berê çavtirsandî nabin û teslimiyetê qebûl nakin. Tam berovajiyê wê hîna zêdetir serhildan, nerazîbûn, mayende dibin, ruhê întîqamê kûr dibe, gel beramberî şidetê hedefê xwe hîna zêdetir bilind dikin û kêmî hilweşandina sîsteman nema razî dibin. Yanî kêmî hilweşandina sîsteman, dewletan, hikumetan nema razî dibin.

Ji bo ku li van bidin çi dikin, hinek teşwîqan pêş dixin. Mînak peran belav dikin, hinek hebsiyan berdidin, zemanê vê jî derBeasbûye. Di dema xwe de nekirin, niha dikin, niha Sûriyê dibêje wê hinek qanûnên nû derbixe, nizanim Siûdiyê peran li memûran belav dike. Misrê nizanim çi kir, Yemen çi soz da, bi vî dixwazin wer li muxalefetê babidin. Lê ev tevdîrekî zêde dibe ku serkeftî nebe. Gel herî kêm pê razî nabin. Pê nema tên xapandin. Her çiqasî dem kurt dibe ku serhildanên gelan navberê bidinê, lewaz bibin, navberekî bidiyê jî, lê êdî weke berê dstpotîzm, monarşî, bê edaletî, derve de hiştin, înkar kirin êdî li Rojhilata Navîn nema dikar bimeşe. Vê sîstemê rewabûna xwe wenda kir. Herweha mehkumê hilweşandinê ye.

**ÇARESERIYA DEMOKRATÎK**

Proja sêyemîn ya demokrasiyê ye. Ev proje kî ye, ev proje serhildana Misrê ye, ya Tunsê ye, Serhildanên di welatê Kendavê de ye, ev proje heta serhildanên Îranê ne. Lê belê bi rengê xwe yê rêxistin kirî, bi perspektîfên xwe yên teorîk tevgera PKK'ê ye. Bi rengê xwe yê rêxistinkirî, bi perspektîfên xwe yên teorîk, tevgera PKK'ê ye.

Niha ev proje çi ye? Proja demokratîkirina Rojhilata Navîn e. Demokratîkirina çanda Rojhilata Navîn e. Yanî ji nû ve înşakirina Rojhilata Navîn e. Ev proje bingehê wê çi ne, bingehê wê nirxên însanî ne, civakbûyîne, komînalîzm e. Bingehê wê ev in.

Li ser esasê demokratîkirina çandê ye. Ji bo vê ev proje çi esas digire, li şûna dewlet netew sîstemekî demokratîk esas digire, sîstemekî demokratîk ku devê wê vekirî be, ji rengan re vekirî be, rengên mezhebî, yên dînî, yên milî, etnîkî, heta ji hemû rengên civakê re. Karibin bi rengekî serbest xwe îfade bikin. Mafê wan ê hebûnê hebe, ev maf bi peymanên civakî bên parastin.

**Ev Proja Azadiya Civak, Jin Û Ekonomiya Civakî Ye**

Bi taybetî di eksana malbat û jinê de ji nû de girtina dest li ser esasê perspektîfên azadiyê. Yanî derBeaskirina cinsiyetparêziya civakî û çalakirina jinê. Weke çawa di çarçoveya proja kapîtalîst a li ser herêmê tê meşandin na, bi temamî berovajiyê wê û li dijî wê li ser esasê ku jin rêxistina xwe ya cewherî, fikirina xwe ya cewherî, siyaseta xwe ya cewherî, rêxistina xwe ya cewherî, ekonomiya xwe, hunerê xwe formîle bike, bi serbestî îfade bike, bi peymanên civakî jî bên parastin.

**Ev proje ekonomiye,** li dijî milkiyeta taybet e. Ji derveyî milkiyeta dewletê, milkiyeta civakî pêş dixe. Yanî ekonomiya civakî ye. Ev ekonomiya civakî li ser çi esasî tê avakirin. Li ser esasê fonên civakî tê avakirin. Li ser esasê hevşêwirandinê bi hevdu re karkirinê, bi vî rengî pêş dikeve.

Ev ekonomî **ekoekonomiye**, yanî ekonomiya dostê xwezayê ye. Ekonomiya dostê ekolojiyê ye. li ser esasê xerabkirina xwezayê, li ser esasê kopyakirina endustryalîzmê

Rojava, li ser esasê karê na. Ekonomiya ku bi temamî girêdayî pêdiviyên civakî yên zerûriye. Bi temamî girêdayî pêdiviyên civakê yên herî pêwîst e. Ekonomiya civakî ev e. Yanî kar, qezenc, rand, tekel, nîne. Ekonomiya ku li ser esasê pêdiviyên civakê ye, li gorî wê hilberînê dike. Li ser esasê qezenc kirina perên zêde na, ji bo vê milê wê yê komîn heye, koperatîf heye, hevparbûyîn heye, fonên civakî hene, hevşêwirandin hene, bi vî rengî ekonomiya esas bêgirtin. Di proja niha ya Rojhilata Navîn de.

Yanî kes wê birçî nemîne. Kes wê bêkar nemîne, bêkarî, birçîbûn, bi temamî encamên kapîtalîzmê ye. Bêkarî ji bo çi di kapîtalîzmê de heye? Ji bo ku karibe her demê artêşekî yedek ji karkeran, ji karkerên erzan ji bo xwe peyda bike, kapîtalîzm bêkariyê pêş dixe.

Di welatên weke Rojhilata Navîn de bi erda xwe bi ava xwe, bi erdnîgariya xwe, bi derfetên xwe yên madî kes bêkar bimîne tine ye.

**Proja Demokratîk Ahenga Di Navbera Bajar Û Gundan De Ye**

Bi taybetî jî proja demokratîk ji nû ve şoreşa zîraetê ye. Endustryalîzm berhemê wê yê civakî tine ye. Talan e, xerckirine, tuketim e. Lê zîraet berhemê dide, tu erdê diçînî tu pê re dewstî, di encamê de behrem derdikeve. Berhemê heqîqî ew e. Ji bo vê çolbûn çi dike, birçîbûnê çêdike, însanan bi rengekî bê dozen di bajaran de kom dike, krîzên civakî derdikevin holê. Nexweşî, bê perwerdehî, cînayet, dizî, nezanî, ev tiştana hemû pêş dikevin.

Ji bo vê ahengkirina vê rastiyê heye. Yanî ahengkirina navbera gund û bajar, di navbera zîraet û sînaetê de divê çêbibe. Yanî zîraet û sînaet divê ku di navbera wan de ahengî çêbibe. Ji bo vê demokrasî li ser esasê daxwaziyê gelan, li ser esasê berjewendiyê gelan, bersiv dayîna hemû pirsgirêkên civakê ye.

Pirsgirêkê bajar, çîn, bîrokrasî, dewlet, şidetê, cinsiyetê, hemû pirsgirêkên hey bersiv dayîna wan e. Yanî civaka ku tê de ye bê ferq û cudatî di nav ayîdbûna dînî, etnîkî, çandî, hejmarê, bê ferq û cudatî di navbera van de hebe, her kes karibe bi serbestî xwe îfade bike, lê ziyanê nede yên din, yanî yê dîtir jî qebûl bikin. Ev serbest îfade kirin, ne tenê di qedeke jiyanê tenê de be, di hemû qadên jiyanê de bin. Siyast, ekonomî, cîvak, rêxistin, parastina rewa, huner, çand, ziman, di her milî de ev serbestî hebe, demokrasî ev e.

**Demokrasî Tenê Ne Hilbijartin E, Kombûna Nirxa Ye**

Demokrasî ne hilbijartin in, demokrasî nirx in. Niha li Emerîka hilbijartin heye, lê demokrasî tine ye. Li Tirkiyê hilbijartin heye, lê demokrasî tine ye. Li Tirkiyê parlemento bi hilbijartinê çêdibe, hikumet bi hilbijartinê çêdibe, yargî bi hilbijartinê çêdibe hwd, ev hemû temam in, lê belê demokrasî tê de tine ye. Ji ber ku demokrasî ne tenê hilbijartin in, demokrasî sîstema nirxa ye.

Nirx çi ye? Yanî tu însan qebûl bikî, bi çand, hebûna, zimanê bi vî rengî qebûl kirine. Displîna cewheriye, perwerde ye, xwe perwerde kirine, demokrasî ruh e. Ji bo vê demokrasî em weke derve lê temaşe nakin.

Demokrasî ne teşeyê (şeklek) yê desthilatiyê ye. Teşeyê desthilatiyê navê wê nabe demokrasî. Demokrasî şêwazê jiyana civakan e. Di vir de em dîsa bi Marksîzma reyal re, klasîk re, dîsa bi sosyalîzma reyal re dikevin nakokiyê. Lenîn çi dibêje; "Bawer bikin, demokrasî şekilek ji şeklê dewletê ye, dema ku dewlet çû ew jî wê biçe." Em jî dibêjin; "bawer bikin, demokrasî ne rengek ji rengê dewletê ye. Demokrasî şeklê civakê ye, heta civak hebe wê demokrasî hebe."

Wê demê demokrasî ne şeklek desthilatiyê ye ku tenê di hilbijartinan de bê pênase kirin. Demokrasî sîstema nirxa ye, wijdan e, zanin e, qebûl kirina yê dîtir e, jiyîna yê din e, azadiye, bi vî rengî mirov demokrasiyê bigire dest wê baş be. Ev demokrasî ji bo Rojhilata Navîn pêwîst e. Demokrasiya jiyîna nirxên civaka xwezayî ye, ew rêka derbasbûyîna ji kaosê ye.

Ji bo vê di Rojhilata Navîn de wê demê em ê çawa bijîn, jiyan bi xwe çi ye, em çawa watê bidinê, em ê çawa kar bikin, em ê ji ku de dest pê bikin, rêxistina me wê çi be, zanîna me wê çi be, bi çi şêwazî em ê têbikoşin, ev hemû pirsgirêkên serekene!?

**Heqîqet Lêgerînek Bê Navber E**

Jiyan li Rojhilata Navîn tê talan kirin, ji ber çi? Ji ber bi heqîqetê re berovajiye. Li dijî heqîqetê ye. Heqîqet lêgerînek bê navber e. Têkoşîneke bê navber e. Bi sîstema siyasî, bi qalibên qewmî dînî, cinsî, zanistiya pozîtîv bi sînor nabe. Ji bo vê Soqrat çi dibêje; "Ez ji her kesî/ê zanetir im, ji ber çi? Ji ber ku her kes nezan e, lê nizanin ku nezanin. Ê min ez dizanim ku ez nezan im. Ji bo vê ez ji her kesî/ê zanetir im." Wê demê heqîqet bi astekî zanistiyê bi sînor nabe. Lêgerînek bê navber e. Ji bo vê heqîqet azadiye.

Azadî bi dewlet bûyînê pêk nayê, azadî bi qadekî şer jî ewle nabe. Azadî bi hewildanekî biçûk jî bi encam nabe. Azadî bê navber têkoşîn e, ji bo vê heqîqet bi vî rengî ye. pênasa jiyanê bi vî rengî ye**. Jiyan çi ye, kîjan jiyan**?

Di jîna Rojhilata Navîn de zanistî erêkirinê nadiyê, prensîba azadiyê erêkirinê nadiyê, jiyanekê li gorî ferzkirinên sîstema kapîtalîst, li ser hatiye ferz kirin. Yan jî li gorî desthilatiya kevneşop a xwînxwar li Rojhilata Navîn pîvanên wê hatiye diyar kirin.

Ji bo vê dema ku em jiyana xwe ya di roja me ya îro de bi aqil re, bi mentiq re, bi îlmiyetê re bipîvîn, em lê temaşe dikin jiyanek çewt e. Bi wijdan re bipîvîn, jiyanek çewt e. Bi azadiyê re bipîvîn jiyanek çewt e. Wijdan tê de tine ye, ji ber çi, ji ber ku her roj li ber çavan ewqas zêdegavî li ser mafê mirovan tên kirin kes dengê xwe nake.

Her roj tiştê ku li ser esasê elimandinan, qaliban, ferz kirinan, jiberkirinan, bi zorê li ser me tên ferz kirin, em di vê herêmê de pêk tînin, lê kes li dijî dernakeve. Wê demê pênasa jiyanê divê ku em hinekî li gorî azadiyê, esas bigirin. Bala xwe bidinê ta beriya niha 2400 du hezar û çarsed sal berê, Soqrat dema ku li ser hikmê sêdarkirinê li ser hatiye birîn û wê sêdar bikin, wê jahrê pê bidin vexwarin, dixwazin wî birevînin, lê ew qebûl nake. Jê re dibêjin; "Wê demê dilekçakî bide da ku meclîsa hakiman te efo bike. Efoya xwe di dilekçê de bixwaze, tu yê sax bimînî." "Soqrat wan dibersivîne û divêje; " Na, eger jiyan rastbûna xwe bi aqil îsbat neke, wê çaxê ne hêjaye ku em bijîn, jiyana bi aqil re rastbûna xwe îsbat neke, em ê çima bijîn, wê demê mirin jê çêtir e." Eger em bi vî rengî bi jiyana hey re têkevin nakokiyê, em ê rêka rast bigirin, yanî em ê qet vî formê jiyanê qebûl nekin. Wê çaxê em ê bikevin rêka rast. Wê çaxê êdî wateya jiyanê wê derkeve. Wê demê bi wate dibe, lê hêjaye ku mirov bijî jî, ji derveyî wê na.

**Baş e, em ê çawa bijîn?** Em ê komînal bijîn, em ê bi zanistî bijîn, em ê bi aqil bijîn, bi lêgerîn û lêkolîn bijîn. Bi têkoşînê bijîn, keda me, karê me, jiyîna me ya ji nirxan re ew ê watê bide vê jiyanê. Civakîbûyîna me wê watê bide vê jiyanê. Ji bo vê di meselê zelal kirina jiyanê, felsefa jiyanê li Rojhilata Navîn de ked, têkoşîna azadiyê, zanistiye. Komînalîzm e, civakîbûyîne, ev e.

Dijberî me jiyanê çawa li ser me ferz dikin? Dibêjin tiştê hey bikin. Ferdî bin, li gorî xwe bin, ji xwe re bin, bi vî rengî sîstem şiklekî jiyanê ferz dike. Bêwijdan bin, ji ber niha ferqa di navbera bireycitî û civakbûyînê de çi heye?

Ferdparêzî ev e, mînak em welatê xwe bigirin dest, ez mirovekî ji Amadê me, ji Dêrsimê me, ez rûpelên rojnamê vedikim ez lê temaşe dikim dibêje; li Sêrtê ji bo zarokek yazde salî tecawîz bûye, ez li Amedê me, ez ji wir im, min eleqedar nake. Huqûq heye, dewlet heye, wê li ser rawest e. Ev birîcitiye. Ev qutbûna ferd ji civakê re ye, ev bêwijdaniye, ji ber çi? Tu bêmafiyê dibînî, lê beramberî wê tu hesasiyetê nîşan nadî, ji bo vê Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocelan çawa nerazîbûn nîşan da? Got; "Eger wê ev bixebtin, bila bixebitin, ger nexebitin ez ê bi dijwarî bi ser wan de biçim. Ew qîzika li Sêrtê hatî tecawîz kirin, dibe xwîşka wan be, jina wan be, dibe ku dayîka wan be. Bi vî rengî divê ku lê temaş e bikin. Yan jî wer xwe jê dûr bigirin, weke çawa wan eleqedar nake, wer bila nekin. Bila biçin mîtîng çêbikin, bila dinê xerab bikin."

Piştî vê gotina Rêbertiyê nû hevalên me ketin dewrê û cih bi cihna mîtîng kirin. Bireycîtî ev e, yanî di esas de xwe jiyîn e. Beramberî pirsgirêkên civakê bê berpirsiyarî ye. Em çawa bikin, dibêje; alem çawa dikin tu jî wiha bikî. Alem çawa bike tu jî wiha bikî nabe! Alem kolê sîstemê ye, çênabe tu koletiya sîstemê bikî, lê pêwîst e tu çi bikî? Pêwîst e tu li hemberî sîstemê têbikoşî. Em çi bikin ev e. Pirsgirêk bi vî rengî tên çareser kirin, tiştê ku pêwîst e bê kirin, di hundirê sîstemê de, lê li dijî wê şer kirine. Bi vî regnî kar têkoşîn, rêxistinbûyîn, rêbazê xebatê wê derbikevin holê.

Lê tiştê ku sîstem ji te dixwazin çawa ye? Kî/ê çawa bike, tu/ê jî ha bikî. Bireycitî, milkiyeta taybet, xwe fikirinadin, xwe xelas kirin, xwe esas girtin, vê nîşanî te dide. Tu yê vê bikî yan tu yê li dijî sîstemê bixebitî? Ya rast têkoşîna li dijî sîstemê ye.

Lê em ê ji ku dest pê bikin? Sîstem dibêje; dera ku her kes jê dest pê dike tu jî jê dest pê bikî. Li ku ye, dibistan e, zanîngeh e, ji bo çi, ji bo ku tu karibî bibî xwedî agahî di derbarê çawa tê bibî parçek ji vê sîstemê û di nav sîstemê de cih bigirî. Tê çawa bibî parçek jê, tu yê çawa vê sîstemê biafirînî, biparêzî, bimeşînî, yê me em ji wir dest pê nakin. Em ji cihekî din de dest pê bikin!

Em ê jiyana xwe ji şoreşa wijdan û zihniyetê dest pê bikin. Em ê bi vî rengî dest pê bikin. Em ê xwe derbixin derveyî sîstemê, li dijî wê têkoşînê bikin. Bi vî rengî gotina Marks pêk tê. Marks çi dibêje; “Heta niha feylesofan tenê cîhan analîz kirin, lê belê divê ku bê guhertin.” Wî neguhert sedem çi bû? Ji ber ku di hundirê sîstemê de bû, modernîta wê qebûl kir. Hêza wî ya guhertinê tine bû. Lê ya me, me xwe jê derxistiye, me xwe jê cuda kiriye, me xwe tenê ji ekonomiya wê na, ji siyast û şêwazê jiyana wê cuda kiriye.

Ji bo vê em niha tenê nirxandinê nakin, bala xwe bidinê fîlozofên herî mezin di cîhanê de sîstemê rexne dikin. Heta gelek rexnên wan bi nirxin jî, lê şêwazê guhertinê derBeaskirinê li gel wan  tine ye. Ferq û cudatiya di navber Rêberê gelê Kurd Abdulha Ocelan de û Varştayîn, Çoskî, Kokîn hwd, gelek kesên din de çi ye, ew tenê dinirxînin. Tenê rexne dikin, lê Rêbetî diguhere, ya girîng guhertin e. Ya girîng ji nû ve înşakirine. Ew esas girtine. Ji bo vê divê ku em li dijî wê têkoşînê bikin. Çawa em têkoşînê bikin? Ruhê xwe ji sîstemê re bigirin, bandora sîstemê di hundirê xwe de vereşînin. Rêberê me dibêje; “Ew gumlekê li me kirî, em wî gumlekî biavêjin. Tiştê ku bandora modernîta kapîtalîst di hundirê me de bandorkirî em vereşîn, xwe bi vî rengî jê pak bikin. Têkoşîna me ya li dijî sîstemê û ya kesên dîtir ne weke hev in.”

Dînger, hêzên kevneşop, yên ku îdîa dikin ku li dijî kapîtalîzmê şer dikin ew derewan dikin. Ev weke kuçikan e, di devê deriyê sîstemê ji bo parekî bigirin vê têkoşînê dikin. Lê yê me na, em dixwazin vê sîstemê bi erdê re bikin yek. Em derbas bikin, li şûna wê civaka exlaqî û polîtîk avabikin.

Ji bo vê girîng e berî her tiştî bandora modernîta bi taybetî jî şêwazê wê yê jiyanê, şêwazê jiyana wê ya çêkirî, bireciî, madî, vî şêwazê jiyanê em ji holê rabikin. Li şûna wê şêwazê jiyana komînal, xwerû, cewherî, zanistî, exlaqî, em wê esas bigirin. Ji bo vê jî li dijî sê siwariyên mehşerî, yên modernîta kapîtalîst divê ku em şer bikin. Ev her sê siwarî çi ne?

### Şerê Li Hemberî Şêwazê Jiyana Fînans Kapîtalîzmê

Kapîtalîzm bi hemû rengê wê, bi taybetî jî kapîtalîzma fînansê. Fînans kapîtalîst ji ber ku gelan perîşan dike. Fînans kapîtalîst hilberîna wê tine ye. kaxet e, Emerîka milyarek dolar dide Tirkiyê, piştî du salan du milyonan jê distîne. Bala xwe

bidinê tangan, balafiran, xwarin, vexwarinê naydiyê peran didiyê, kaxetê didiyê, lê du qat jê digire. Ji kê digire, ji zarokan digire, ji jinan digire, ji karkeran, ji cotkaran digire, ji ber ku Tirkiyê da ku karibe wî deyînî wî fayîza Emerîka careke din lê vegerîne çi dike? Zam çêdike, fîeta bilind dike, vergiyê zêde dike, ev hemû ziyanên wê ne. Ji gel digire, wê demê kapîtalîzm bi taybetî jî kapîtalîzma fînansê, endustryalîzm, bi taybetî jî endustryalîzma dijminê xwezayê û însan. Ya ku hilberîn tê de polîtîka wê li ser esasê qezencê çêdibe, ne li ser esasê pêdiviyên civakê ye. Divê ku em wê mehkum bikin.

**Dewlet Netew**

Ev dewleta ku dixwaze tîpekî homojen, tek tîp ji hemwelatiyan çêbikin, hemwelatiyên kol e, li ser esasê berjewendiyên dewletê kar bikin, tevbigerin. Li şûna wê bi sê melekên modernîta demokratîk em pê şerê wê bikin. Çi ne ev her sê melekên modernîta demokratîk?

**1-Ekolojiya civakî,** Ekolojiya civakî, yanî parastina xwezayê, ahenga xwezayê, ev tenê mesela çandina darekê nîne, hîna zêdetir kûrtir e.

**2-Ekonomiya civakî,** ekonomiya hem dostê xwezayê ye. Hem jî dostê civakê ye, li ser esasê peyda kirina pêdiviyên civakî pêk bê.

**3-Konfederalîzma demokratîk e**, ango sîstemekî siyasî ku tê de hemû rengê civakê karibin xwe îfade bikin. Ev konfederalîzma demokratîk li gorî hevparbûna xwezayî di nava gelên Rojhilata Navîn de dikare çêbibe.

Hevparbûyînê erdnîgarî, xwezayî, di navbera Tirk, Ereb, Kurd, Farsan de hebe. Di navbera Ereb Yahudî de hene. Di navbera welatên Bakurê Efrîqiya de hene, di navbera welatên Kendavê de hene, bi vî rengî gav bi gav organîzesyon û yektiya di navbera gelan de wê li ser esasekî konfederatîk, li ser esasekî demokratîk, li şûna dewlet netewa ya ku asîmîlasyona bi zorê esas digire, li şûna wê li hevhatina civakî, ya gelan û her kes bi rengekî xwezayî karibe xwe îfade bike. Ev proje ji bo gelê Rojhilata Navîn pêş bikeve.

Ji bo ku ev pêşbikevin, hêz pêwîst e. Yanî şêwazekî jiyanê pêwîst e. Şêwazê jiyanê çi ye, hêza ku şêwazek wê yê jiyanê heye. Çi ye ev şêwazê jiyanê, **yektiya di navbera fikir, zikir û piratik de ye**. Yekitiya di navbera van her sê yan de ye. Însan çawa difikirin, çawa dibêjin, çawa kar dikin, divê ku weke hev bin. Ne bi rengekî bifikire û bi rengekî din bikin, ne bi rengekî bêje û bi rengekî din bikin. Yektiya di navbera van de.

Milîtantiya ji bo vê rastiyê, milîtantiya ku Rêberê gelê Kurd Abdulha Ocelan jî dibêje; ”Milîtantiya ku her demê û di her deqê de fikir, zikir û çalakiya te yek be, hundirê xwe ji bandora modernîta kapîtalîst serad (arindirme) kiribe, her demê, di her seatê de hazir û amade be weke feylezofê berê, weke bîlgiyê berê,

hazir û amade be di oxira heqîqetê de canê xwe feda bike. Ji vê re amade be.”

Ev jî bi durustbûyînê pêk tê, bi paratikekî rêxistinî û zanistiyê pêk tê. Yanî piratîkek zanistî û rêxistin kirî ve pêk tê. Zanistî çi ye, akademî ne, hemû mijarên civakê divê ku akademî bin, divê ku tê de hebin. Akademiya pirsgirêkên netewî, dîngeriyê, cinsiyetparêziyê, zanistparêziyê, desthilatdariyê, şidetê, her tiştê ku jiyana însan eleqeder dike, nîqaş bike. Ne bi îlmê statîko yê pozîtîvîzma kapîtalîst, ne bi wê. **Akademiya azad, ya ku rohniyê li pêşiya gel çêbike da ku karibe bimeşe, karibe xwe nas bike, derdora xwe nas bike, rêka jiyana rast hilbijêre**. Ev akademî divê ku vê zanistiyê bidin nasînan. Wê demê hêza zanistiyê akademî ne.

Em carna dibêjin em ji Rêber Apo fêm nakin, hinek ji me dibêjin, **hinek heval gotin li cih be dibêjin; me ji Rêbertiyê Fêm nekir,** lê rastî jî ev heye. Rêbertî her dibêje; ”akademî” bi salan e dibêje akademî. Akademî çi ye, fikirê azad e. Ji ber saziyên hizirê yên sîstemê wî fikirê azad nadin me. A**kademiya azadiyê wî fikirê azadiyê dide me**.

Ew dibe sersebebê ku kadroyên pêşeng yên civakê derkevin pêş. Gel rohnî bibe, ronakbîr bibe. Rêka xwe hilbijêre, li dijî modernîta kapîtalîst xwedî rexne be. Lê hevalên me ji wan heye ku Rêbertî, tiştekî seyr dibêje, tiştekî loks dibêje, tiştekî ne di zemanê wê de dibêje. Yanî dibêje tiştên girîngtir hene, tiştên girîngtir hene, ”ez ê biçim filan derê kar bikim, ez ê nizanim çi bikim. Di esas de wê jî nake, divê mirov rastiyê jî ji hevdu re bêje, wê jî zêde nake, lê akademiyê jî çênakin.

Dema ku Rêbertiyê tehdîd kir, vê carê akademî çêkirin, lê demek dirêj formlîta ma. Bê berhem ma, di vê dema dawiyê de hinekî ketiye sîstemê. Lê bala xwe bidinê ji bo ku modernîta demokratîk nebe hêz, bênavber sîstem çi dike, kadro diavêje zindanê. Dema ku akademî tine bin tu yê çawa vê valabûnê dagirî?! Yan jî tu yê piratîka bi zanistî çawa derbixînî holê?

Piratîka zanistî akademî ne, di derbarê pirsgirêkên sereke de îlm e. Piratîka rêxistinî çi ye, komîn e, koperatîf in, rêxistin kirina civakê ye. Rêxistina zarokan, jinan, komên pîşesaz, bijîjkan, karkeran, endeziyaran, dîndaran, yanî kesek di Kurdistanê de divê ku bê rêxistinî nemîne. Lê ev rêxistinên he hemû li ser esasê azadiyê, li ser esasê wijdan, li ser esasê zihniyetekî nû, li dijî dagirkeriyê, li dijî kapîtalîzmê, li dijî mijûkdariyê şiyar be, hesas be, têkoşînê bike.

Ev rêxistin pêwîst e bê çêkirin. Civaka jêrîn bê rêxistin kirin, civaka jorîn rêxistina wê heye, dewlet e, artêş e, mehkeme ye, perlementoye, ev hemû rêxistinên civaka jorîn in. Ew rêxistina wan heye, pêdiviya wan bi rêxistinê tine ye. Civaka jêrîn bê rêxistin e, ew divê rêxistin wê bê çêkirin. Ev rêxistin, ev zanistî bi çi çêdibe, bi kadro çêdibe. Bi kadroyên ku şopandina heqîqetê dikin. Kadroyên bi fedekariya bilgeyê kevn yê ku beramberî sêdarê, şewitandinê, kuştinê serî dananî ne, ev kadro pêwîst in.

Rêber Apo çi dibêje, “Weke *qilcan damaran* divê ku di nava civakê de be.” Yanî çawa damarên biçûk xwînê derbasî nava hemû gewdê mirov dikin, kadro jî divê ku wê rolê bileyîze. Dera ku xwîn bighîjê, di wir de jiyan heye. Dera xwîn neghîjiyê qangirên dibe, paşê mirov jê dike.

Ji bo vê dive kadro li her derê bin, kadroyê ku fikir, zikir û çalakiya kiribin yek. Kadroyên ji bo xwe na, ji bo civakê bijîn. Kadroyê di oxira azadiyê, heqîqetê de her demê hazir û amade be ji bo ku fedekariya mezin bikin. Ji bo vê jî rastiya jiyanê çi ye, rastiya jiyanê ev e, “Şehîd namirin.” Yê di oxira heqîqetê de hatine kuştin namirin, lê kengê namirin? Dema ku em kevneşopiya wan bişopînin, dema ku em rêka wan bişopînin namirin sax in. Bi vî rengî mirov beramberî wan bersiva xwe bide, yanî erka xwe pêk bîne.

Rêka çareseriyê li gorî mantîqê modernîta demokratîk ev e. Bala xwe bidinê navê wê lê ye, modernîta demokratîk e. Ne tenê demokrasiye, modernîta demokratîk e. Ango demokrasiya nû ye, ya zanistiyê ye, ya rêxitinkiriye, parastinê ye. Ji bo vê bi taybetî di qadên zanistiyê de divê ku em her demê em hazir û amade bin bi sîstemê re bikevin pêşbaziyê. Bi lêkolîn û lêgerîna xwe, bi zanebûna xwe, bi şêwazê xwe yê zanistî, lê di heman demê de rojekê ji rojan, divê ku em hêza exlaq jibîr nekin. Em ruh jibîr nekin, em wijdan jibîr nekin. Tiştê ku bihêle em têkoşînê bikin, divê hêza me ya wijdanî be. Hêza wijdanî jî ne madî ye, ruhî ye. Ango berpirsiyartiya me ya beramberî civakê ye, bi taybetî jî hilwesta me ya beramberî zêdegaviyên li ser civakê çêdibin. Hesasiyet pêwîst e, heger di roja me ya îro de civaka me tê talan kirin, wê demê hilwestê me wê çi be?! Divê ku em bi wî rengî nêzîk bibin.

Ji lewre eger programekî li ser esasê van nirxana, programekî siyasî li ser esasê van nirxana çêbû û bernameyekî bi kadroyên bi vî rengî, kadroyên temîz, xwe ji bin bandorê sîstemê zelal kiribin, bi perspektîfên azadiyê tevbigerin, bi vî kadroyê ku xwe bi temam kiriye proja demokrasî, proja modernîta demokratîk li ser nirxên komînal dikare bi ser bikeve.

Di roja me ya îro de di demê ku proja emperyalîst binkeftiye, proja îstatîkoperst lawz e, di vê demê de zeman hatiye ku proja demokratîk bi ser bikeve.

Ev serkfetin her demê wer motleq nîne. Yanî li Rojhilata Navîn dibe ku sîstemekî wiha jî çêbibe, sîstemekî hevpar jî çêbibe. Yanî ne statîkoperst bi temamî ji holê rabin, ne jî emperyalîst bi temamî hilweşin, lê hêza demokratîk jî hîn bêtir qezencên xwe bi cih bikin.

Ev jî dibe, lê hedefê me ew e ku demokrasî bi ser bikeve. Lê ev hedef carna tam pêk nayê, ji ber çi? Ji ber siyaset û têkoşîn her demê di navengekî ku em dixwazin de pêk nayê. Rewş wê bandor dikin, ji bo vê carna serkeftinên ku em dixwazin di zeman û mekanê ku em dixwazin de em nikarin pêk bînin. Ev nayê wê manê ku em demî serkeftinan qebûl nekin, lê belê divê ku

serkeftinên demî(donemsel) ti carî me ji armancên me yên dawiyê dûr nexîne. Serkeftinên nisbî, serkeftinên biçûk divê ku ti carî me jî armancên me yên dûr, dûr nexe.

**Dijberiya Dînê Çandî Bi Kaptalîzmê Re**

Bêguman dîn weke nirxekî çandî, bi taybetî jî exlaqî bi kapîtalîzmê re berovajiye. Kapîtalîzm qanûnan esas digire, şêwazê madî esas digire, yê zanistî esas digire, li dijî exlaq, dîn e û ruh e. Ji bo vê Marks Rabart dibêje; ”Protestan ruhê kapîtalîzmê ye.” Di rastiyê de Protestantî ji bo kapîtalîzmê çênebûye, ti têkiliya wê bi kapîtalîzmê re tine ye. Tevgerke dîniye li ser esasê reformê, li dijî hegemoniya dêrê, şêwazê dêrê yê rêvebirinê û eznavedî bûna wê, gotin; “Mirov divê ku bi xwe û xwe Xwedayê xwe nas bike, ti têkiliya dêrê pê re tine be. Însan divê ku bi zimanê xwe Încîla xwe bixwîne. Divê ku tiştekî zêde pîroz tine be, keşe jî divê weke mirovekî xwezayî be. Pepaz bixebite, bixwîne, bizewîce, wer taybetiyekî pîroz jê re tine be.”

Vê pîrozbahî lewaz kir, şêwazê ferdî derxist pêş, însan bi xwe û xwe bi Xwedê re didin û distînin. Bi araciya na, ev ferdparêziye, kapîtalîzmê ji vê nêzîkbûna feydî fayde dît. Gotin, va dîn jî ha dibêje; ”Divê ku tiştek pîroz tine be, her kes netewa wî/ê hebe. Încîlê bi zimanê xwe bi xwe bixwînin. Divê ku her kes di rêka xwe de Xwedê nas bike. Bi uslubê xwe Xwedê nas bike.” Ji bo vê ferdiye, ji bo vê miliyetger e. Ji bo vê bê exlaqî ye, meteryalîzm li dijî exlaq e.

Ji bo vê kapîtalîzmê bi cewherê xwe jixwe dijberî dîn e. Dijberê dînê Misilmantiyê ye. Lê belê kapîtalîzm bi tena xwe li cîhanê nîne. Kapîtalîzm li dijî sosyalîzmê, hêza ku zêde ji kapîtalîzmê re zorî çêkir, sosyalîzm bû. Ji bo vê kapîtalîzmê çi kir, hemû hêzên hey beramberî sosyalîzmê seferber kir. Karîbû çi seferber bikiriba kir. Kapîtalîzm rast e meteryalîst e, bilîmsel e, hwd. Lê ev hemû heta demekê ye.

Kapîtalîzm li dijî dêrê rabû, ji bo ku her tiştî bike meta, her tişt bike peran, exlaq nemîne. Lê dema ku dêr jê re pêwîst bû, dêr da pişt xwe, çima? Bi dêrê berxwedana karkeran lewaz dikir, bi xepandinên dînî lewaz dikir. Ji bo vê bala xwe bidinê kesî weke Can Polê duyemîn xizmet ji kapîtalîzmê re nekir. Ev papayê ku berî niha mir, yê beriya Dîktos.

Li Emerîka Latînî digeriya, li Ewrûpa digeriya, li Ewrûpa Rojhilat digeriya, bajar bi bajar, der bi der li dijî komunîzmê propoganda dikir. Xiristiyan bû, Papayê dêrê bû, lê xizmeta empeyralîzmê dikir. Ji gelan re digot; ”Rast e, sebera Xwedê bikşînin, esas cîhan li wir e. Hûnê biçin cinetê, têkoşîna çînî ji bo çi ye, nizanim çi ji bo çi ye.” Bi vî rengî dixapand, gel li dijî komunîzmê sor dikirin, ji bo vê jî bala xwe bidinê li Poloniya yên li dijî hikumeta sosyalîst derdiket jidil xwe de kî bûn? Sendîkayên xirisitiyanî bûn ên ku girêdayî Papa wan li dijî dewletê têkoşîn dikirin. Li dijî sosyalîzmê têkoşîn dikirin.

Ji bo vê kapîtalîzm ne tenê ji bo Misilmantiyê, Xiristiyantî jî bikar anî. Misilmantî çi kir, dema ku Sovyet derket dît ku li Rojhilata Navîn alem pir bi sosyalîzmê, Sovyetê dilxweş e. Kê bihîstiye pê kêfxweş bûne, weke xewnekî ye, digotin, li welatekî wekhevî heye, sosyalîzm heye, karker, axa tine ne, karker serbest in, beg tine ne, sermayedar tine ne, vê bandor kir. Mînak helbest hene, helbesta Cegerxwîn dibêje, "Ala sor ala zer, ji Mosko hate der, berê xwe da Çînê."Ev mizgîniye, her çiqasî însan nezan bin jî, lê ev jê re weke mizgîniyê ye, di aliyê moral de ew qezenc kirine. Kapîtalîzmê ev xeterî dît. Bi çi dikare li dijî vê bisekine, li Rojhilata Navîn bi çi dikare li hemberî vê bisekine? Bêje ez bêm, gel jixwe jê nerehet e, Fransa û Îngilîz berê weke dagirker di vê herêmê de bûn. Ji bo vê gotin, Misilmantî, ev li dijî nirxê Misilmana ne, ev dibêjin Xwedê tine ye, exlaqê wan tine ye hwd, yanî şîrove kirin. Gelek dîndar birêxistin kirin. Li dijî kapîtalîzmê na, li dijî sosyalîzmê pirtûk nivîsandin.

Mînak yek li Şamê heye, Botiye ji Harûna ye bi eslê xwe, lê pir navdar e, li Sûriyê dekanê faklta şerîetê ye. Gelek dplomên wî hene, ya felsefê, şerîet û edebiyatê hene. Navê wî Muhemed Remedan Botî jê re dibêjin, eslê xwe Botiye. Mînak pirtûk derdixistin li dijî meteryalîzma diyalektîkê. Li dijî kapîtalîzmê dernedixist, li dijî meteryalîzmê derdixist. Di pişt re li dijî Kurdayetiyê jî rabû xeber da, mînak carekî gotibû, "Ez şerm dikim ku ez Kurd im." Piştî ku hinek boyer çêbûn Kurdan hinekî serî hildan, ji bo ku sîstemê red bike. Dîn kes bi vî rengî ket xizmeta sîstemê.

Ji bo vê em bala xwe bidinê Îslama siyasî, Îslama çandî cuda ye, milê wê yê exlaqî, wekhevî hwd cuda ye. Lê Îslama siyasî bi taybetî ji aliyê Rojava ve hatiye çêkirin. Elmaniya çêkiriye, Emerîka çêkiriye, Fransîz, Îngilîzan çêkiriye. Yên ku di roja me ya îro de serokên tevgerên Îslamî ne hemûyan li wir perwerde dîtiye. Erebeqan, Seyd Qutub, hwd, van hemûyan li wê derê perwerde dîtine.

Têkoşîna li dijî komunîzmê ya emperyalîzmê, têkoşîna emperyalîzmê li beramberî komunîzmê çi bû? Quşaxa kesk bû, quşaxa kesk çi ye? Derdora Sovyetê bi Îslamê bihêz bike ku derBeasneke. Bi vî rengî jî serkeftî bû. Eger tevgera Îslama siyasî li Rojhilata Navîn nebûna, wê tevgera çepger di herêmê de pêş biketiba. Li dijî me jî niha bi vî rengî didin xebitandin. Mînak Fethulah Gulen didin xebitandin. Fethulah Gulen kî ye? Fethulah Gulen di zemanê xwe de li Erziromê dernekê li dijî komunîzmê çêkirin, yekemîn derneka antî-komunîst li Erzuromê wî çêkirin. Niha jî derneka li dijî Kurdayetiyê çêdike.

Ji sîstemê re çawa pêwîst be bi wî rengî teşe (şikil) didiyê. Ji lewre ev ne nakokiye, ji bo vê jî Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocelan dibêje; "Neyên xapandin." Di parêznama xwe de wiha dinivîse. Ev kesên bi navê Îslama radîkal, nizanim li dijî emperyalîst, divê ku ev durûşmên wan we nexapînin. Ev li benda payekê ne, payekê dixwazin ne guhertinê dixwazin. Pay dixwazin mirov van wiha nas bike.

**Sedemên Pêşketina Partiya Hemas**

Mijara Partiya Hemas, di Îslamiyetê de ev jî heye, Îslamiyet tiştek wiha ye jî, dibe ku zû nayê kontrol kirin jî. Mînak Erdugan zilamê Emerîka ye, lê em nikarin bêjin hemû AKP'iyî zilamên Emerîka ne. Ji bo vê taban cidî ye di dijberiya xweyî Îsraîl û Emerîka de, lê rêveberî bilof e, derew e, esl û astarê wê tine ye! Ji ber ku dema nakokiyên AKP'ê û Îsraîl bihêz bûne, herî zêde hecmê tîcaretê, îstixbaratê di navbera Tirkiyê û Îsraîl de zêde bûye. Reqem hene, ji bo vê taban carna ji kontrolê derdikeve.

Niha Hemas çi bû, Îsraîl Hemas çênekir. Hemas encamê îflaskirina bizavên milî, îflas kirina bizavên sosyalîst, di cîhana Erebî tevgerên dînî geşbûn. Çima, ji ber ku tevgerên milî zêde encam negirtin. Yanî têkoşîna milî tevgera milî êdî zêde encam nedigirt, pirsgirêkên wê çêbûn, tevgera dînî pêş ket. Îran hîna zêdetir zexim dayê, hîna zêdetir moral dayê. Îsraîl dît ku tevgera dînî pêş bikeve zêde ziyana wê tine ye, lê di esas de dijminê wê rêxistina Rizgariya Filîstînê ye. FKO' ye. Ji bo vê çavê xwe li ser girt.

Mînak Ehemed Yasîn di Îsraîl de serbest. Şêx Ehemd Yasîn ê ku Hemas damezirandî li Îsraîl serbest bû. Piştî ku Sovyet hilweşiya tevgera dînî hîna zêdetir bi sîstemê re ket nakokiyê, para xwe xwest. Tevgera dînî çawa vê para xwe tîne ziman û dibêje; " We ez li dijî sosyalîzmê xebitandim, niha sosyalîzm hilweşiya, hûn her tiştî dibêjin yê min, na para min jî tê de heye." Li ser vê nakokî çêbûn, tabî ev nakokî Hemas fayde jê dît. Hemas lewazbûna tevgera milî, ji bo weke encamê wê di Filîstînê de, lewazbûna tevgera sosyalîst e, weke encamê wê, weke nerazîbûna beramberî wê ye. Ya din jî ji rêderketina ku di nava FKO de derket, ew jî weke çawa niha ji rê derketin di nav PDK-YNK'ê de hene, qaşo hemû şoreşger bûn, heta duh pêşmergebûn. Niha bi milyonan peran didizin. Di nava Filîstîniyan de jî wer bû.

Ev ên Îslamî hinekî navê wan zêde di diziyê de çênebû, ji bo vê gel hîna zêdetir di wan de hêvî didît. Deng dan wan, bûn desthilatdar ji kontrolê derketin. Dema ku ji kontrolê derketin bi ser de diçin. Niha rewşa Hemas ev e.

Niha li Xezayê desthilatdarin, lê belê ne rêka çareseriyê ye, ango pirsgirêk bi wan çareser nabe. Eger reforman çênekin, wiha nikarin pêşbikevin cîhan jî wan bi vî rengî qebûl nakin. Civak jî wan wiha qebûl nake. Civak jî tepeserkirina dînî qebûl nake. Bala xwe bidinê Îranê bi tepeserkirina dînî xwestin civakê bidin meşandin û sekinandin, lê zor e. Civak jî însanin, însan taybetmendiyên wan yê jiyanê hene, çanda wan heye, şêwazê wan ê jiyanê heye. Mînak tu lê temaş e dikî jinek û mêrê xwe wê destê xwe bi hevdu bidin û bimeşin, ji bo xwe torekî biavêjin, yekî polîs dibêje;"Çima hûn destê hevdu digirin." Ew jî wê bêjin," Yaho em jin û mêrê hev in, hûn çi ji me dixwazin." Na dibêje, çima we wer kiriye, digirin dikin zindanê. Nizanim, jinek hinekê şerpa wê li ser porê wê biçe û pûrê wê xuya bike wê bigirin.

Ji lewre li Îranê prefesoreke jin xwendekarek wê odilek mezin girt, xwendevanê wê ye. Jin bi xwe jî profesor e, bi temen e, ewqasî kêfxweş bû pê, dema ku xwendekarê xwe pîroz kir ew maçî kir, ew jî weke kurê wê bû. Jê re gotin; ”Çawa di qada giştî de jin û mêr fîzîkî temas kirine, hindik mabû jinkê biavêtina zindanê. Derbarê wê de dadgeh vekirin. Wê jî rabû daxiyaniyek da û wiha got; ”Ez poşman im, min xeta kiriye, ez carekî din tiştekî wiha nakim.” Ev got heta ku efo kirin. Vê rewşê alem qebûl nakin. Ji bo vê heger demokratîkbûyîn tê de çênebe, ango wê hilweşe, negengaz e wiha bimîne. Mesela demê ye, salek-du-sê di encamê de wê hilweşe, ew sîstem bi xwe re çareseriyê nayîne, bi wî rengî wê ber bi hilweşandinê ve biçe.